

LI PIŞTÎ PEVAJOYA PEVCUNAN DAXWAZÊN EDALET Û RÛBIRÛBÛNA BI RABIHURIYÊ RE

# TU TIŞT NE LI CIHÊ XWE YE

Nesrin UÇARLAR

Werger: Luqman Guldivê

DiSA
ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

# TU TIŞT NE LI CIHÊ XWE YE

## LI PIŞTÎ PEVAJOYA PEVCUNAN DAXWAZÊN EDALET Û RÛBIRÛBÛNA BI RABIHURIYÊ RE

**NESRİN UÇARLAR**

Werger: **Luqman Guldivê**

**WEŞANÊN DÎSAyê**

ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ
(DÎSA)

**TU TIŞT NE LI CIHÊ XWE YE**
**LI PIŞTÎ PEVAJOYA PEVCUNAN DAXWAZÊN EDALET Û RÛBIRÛBÛNA BI RABIHURIYÊ RE**

**WEŞANÊN DÎSAyê**

**Nivîskar:** Nesrin Uçarlar
**Serkêşiya Projeyê:** Murad Akıncılar
**Werger:** Luqman Guldivê
**Rastkirin:** Fatma Kaya
**Berpirsiyarê Projeyê Yê Dîtbarî:** İshak Dursun
**Alîkarê Lêkolînerên Qadî:** Berivan Alagöz, İshak Dursun
**Sêwirana Nasnameya Weşanê:** Bang Medya
**Sêwirana Bergê:** Şendoğan Yazıcı
**Rûpelsazî:** Şendoğan Yazıcı
**Wêneyê Bergê:** Ubeydullah Hakan
**Cihê Çapê:** MATSİS MATBAA SİSTEMLERİ - Tevfikbey Mah. Dr. Ali Demir Cad. No: 51 Sefaköy / İSTANBUL Tel: 0212 624 21 11
**Dema Çapê:** Hezîran 2015
**ISBN:** 978-605-5458-24-9

**Copyright © Hezîran 2015**
Hemû mafên vê weşanê veşartî ne. Beyî destûra ji Enstîtûya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DÎSA) tu beşeke wê nayê zêdekirin.

DİSA

**DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ**

**ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ**

**DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL AND SOCIAL RESEARCH**

Mimar Sinan Cad. Aslan Apt. B Blok No: 12
21100 YENİŞEHİR/ DİYARBAKIR
**Tel:** 0412 228 1442
**Faks:** 0412 224 1442
**www.disa.org.tr**
**disa@disa.org.tr**

**Nesrin Uçarlar**, sala 2009'an li zanîngeha Lund Beşa Zanistên Siyasetê doktoraya xwe kiriye. Li zanîngeha Bilgi li Stenbolê li Beşa Têkiliyên Navneteweyî dersan dide. Di peywenda felsefeya hevdem a siyasetê de di çarçoveya peyvên desthilatdarî, berxwedan, siyasîbûn û dadê de li ser meseleya kurd xebatan dike. Ji bilî berhemên wê yên ferdî û hevpar ên weşandî, tevî Büşra Ersanlı û Günay Göksu Özdoğan berhevkariya pirtûka bi navê *Türkiye Siyasetinde Kürtler - Direniş, Hak Arayışı, Katılım / Di siyaseta Tirkiyeyê de Kurd - Berxwedan, Doza Maf, Beşdarbûn* kiriye. Herî dawî di lêkolîna DİSA'yê ya bi navê *Geçmişten Günümüze Türkiye'de Paramiliter bir Yapılanma: Köy Koruculuğu Sistemi / Ji Do Heta Îro Li Tirkiyeyê Sazîbûneka Nîvleşkerî: Pergala Cerdevaniyê* de beşa bi navê *Meclis Tutanaklarından ve Basından Koruculuk Sisteminin Kurulması, İnşası ve Sürdürülmesi / Ji Belgeyên Meclîsê û Çapemeniyê Damezrandin û Domandina Pergala Cerdavaniyê* nivîsiye.

Rapora bi navê **Tu tişt ne li cihê xwe ye / Li piştî pevajoya pevcunan daxwazên edalet û rûbirûbûna bi rabihuriyê re** weke beşek ji wê projeya lêkolînê ya bi navê Dada Dema Derbasbûnê ya Xwe Disipêre Civakê ye ku Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DÎSA) Weqfa CHRESTê, Weqfa MOTTê, HBSD û Sefareta Swîsreyê destek danê. Fikrên di raporê de dibe ku bi temamî li hev nekin bi fikrên sazî yên DÎSAyê, Weqfa CHRESTê, Weqfa MOTTê, Komeleya Heinrich Böll Stiftungê û Sefareta Swîsreyê re.

Ji bo daxistina raporê ji înternetê biçin malpera http://www.disa.org.tr/tutistnelicihexweye.pdf yan jî bi rêya agahiyên têkilîdanînê ên li jor, bi me re peywendiyê deynin.

Bi alîkariyên

CHREST VAKFI

CHARLES STEWART MOTT FOUNDATION®

HEINRICH BÖLL STIFTUNG DERNEĞİ TÜRKİYE TEMSİLCİLİĞİ

Schweizerische Eidgenossenschaft
Confédération suisse
Confederazione Svizzera
Confederaziun svizra

**Embassy of Switzerland in Turkey**
**İsviçre Büyükelçiliği Türkiye**

## Malavahî

Em malavahiya İshak Dursun dikin ku lêkolîna meydanî ya vê pirtûkê mumkin kir bi peyivîna pêş a bi tevahiya malbatan re û bi amadekariyê; ya Berivan Alagöz dikin ku piştgiriya wê ya fiilî û fikrî di lêkolîna meydanî de heye; ya Ubeydullah Hakan dikin ji ber alîkariya teknîk û lojîstîk. Em minetdarên Nihali Ayrıbir û Aydın Bolkan in jî ku li cem Berivan û İshak di transkripsiyon û wergera dengên tomarkirî de xwedî ked in. Di xebatên atolyeyê yên dewra amadekariya projeyê de ji Navenda Dad û Bîrê Özgür Sevgi Göral, ji Zanîngeha Boğaziçi Nazan Üstündağ, Şemsa Özar û Bülent Küçük, ji Weqfa Henrich Böll Semahat Sevim, ji Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê Ayşe İclal Küçükkırca, ji Federasyona Huqûqzanan ji bo Mafê Mirovan û Demokrasiyê Hüsnü Yılmaz, ji Baroya Diyarbekirê Cihan Aydın, birêveberê İDD'yê yê Herêmê yê salên 90'î Mehdi Perinçek, ji Komeleya Mafê Mirovan a Stenbolê Hulusi Zeybel, ji Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyeyê Murat Aba, ji Navenda Hunerê a Diyarbekirê Övgü Gökçe, serokê berê yê Baroya Diyarbekirê Emin Aktar, ji Navenda Bipêşxistina Civaka Sivîl Lezgin Yalçın, weke mufetişa projeyê Nurcan Baysal, ji Komeleya Mafê Mirovan a Diyarbekirê Gamze Yalçın, malbatên ji Meya-der, Göç-derê ji bo kamilbûna projeya me pêşniyaz û nirxandin kirin û bi vê jî bi alîkariyên mezin tevlî projeyê bûn. Elizabeth Oglesby di mijara parvekirina tecrûbeyên li dinyayê de, ji Weqfa Chrest Lou Anne Jensen, ji Weqfa C. MOTT Walter Veirs, ji Nûneriya Tirkiyeyê ya Komeleya Henrich Böll Stiftung Ulrike Duffner, ji Sefareta Swîsreyê Didier Chassot bûn xwedî dewreke girîng di destekkirina projeya me de. Xwediyê esas ên ve lêkolînên ew malbat in ku qebûlkirin dil û mejiyên xwe bi me re parve bikin. Ev lêkolîn divê weke hewldana qismî be jî dayîna wî deynî were qebûlkirin ku dilsozî li ser me ferz dike. Hûn hemû her hebin.

# Naverok


Destpêk 7

*Beş I* Rûbirûbûna bi rabihuriyê re: Gerîna li edaletê **11**

Xebatên li ser edaleta piştî şerî 12

Gerînên li edaletê yên cezaker û yên selihandinê 16

Mexdûr, şahid, yên saxmayî 23

Fail, berpirsiyar, yên temaşe kirî 24

Mafê Heqîqetê 29

Komîsyonên Heqîqetê 33

Xebatên heqîqetê yên ne-fermî 36

*Beş II* Siyaseta di biwara rabihuriyê de **42**

Bîr (Hafize) 42

Şîngirêdan 45

Lêborîn 50

Rikdarî û xeyd 58

Dostaniya siyasî 66

*Beş III* Salên notî li Tirkiye û Kurdistanê **71**

Rewşa îstîsnaî ya Tirkiyeyê:Kurdistan û Salên Notî 75

Rewşa Serhildanê ya Kurdistanê: Têkoşîna siyasî û civakî 85

*Beş IV* Îhtîmalek: Vegotin, Binavkirin, Watedarkirin **96**

Rêgeh û serdan 98

"Çi hat serê te, te çi dît?" 100

Mexdûr, şahid û yên saxmayî 102

Muş: "êdî weke berê nabe" 102

Bedlîs: "rahiştinê û birin" 107

Wan: "yê çûyî, çû êdî" 109

Colemêrg: "tu vê binivîse, wisa û wisa" 111

Şirnex: "ma wê ji dilê me derkeve qey?" 116

Mêrdîn: "çi roja me roj e, çi êvara me êvar e bi me" 120

Batman: "şûna piyê wî li wir bû" 122

Diyarbekir: "serketin jiyan bû" 126

*Beş V* Li benda edaletê: Dewleta Mixateb **135**

Hewldan: Gerîna li edaletê 135

Fikra edaleta cezakar: "Ceza edalet e"; "heke tu dipirsî ka kê kiriye, dewletê" 136

Rabûna li ber vê fikrê: Bêcezamayîn, kêmkirina ceza, tezmînata madî 161

Daxwaza edaleta selihandinê: Qebûlkirina heqîqetan, gor,lêborîn 170

Daxwaz nekirin: "Dilê tevahiya gelê Kurd maye" 180

*Beş VI* Hizirîna li edaletê: “Kardeş Türkler (Tirkên Bira)” 185
Îhtîmala rûbirûbûn,lêborîn, lihevhelalkirinê 186
“Ma tu bûya tu wê lê bibihuriya” 188
“... heke bibêjin ‘apo em poşman in, me xwe avêtiye bextê te ...” 192
“Serokê me jî were ser masê...” 198
“Ji bo aştiyê zimanê min kin e” 204
Qewlê biratiyê 210
“Bila ew jî bibêjin êdî bes e” 214
“Bi Tirkan re tu tişta min nîne” 220
Têkoşîna îtîbarê 224
Şensekî din 231
*Beş VII* Nirxandin Û Pêşniyar 236
Derxistina holê ya heqîqetan û qebûlkirina wan 236
Darizandina fail û berpirsiyaran 236
Ji wezîfeyê girtina berpirsiyar û rayedaran, aşkerekirina wan 237
Sazkirina Komîsyona Heqîqetê ya fermî 237
Dana tezmînata madî û misogerkirina xizmetên civakî 237
Dayîna daxuyaniya fermî ya xwestinalêborînê 238
Destekdana fermî ji bo xebatên hafizeçêkirinê 238
*PÊVEK:* Lîsteya Komîsyonên Heqîqetê 240
ÇAVKANÎ 245

# Destpêk

Mukaddes Xanê got “êdî gotinan xwe binax kir”. Hêna jî nizane ka çi bi serê bavê de hat yê ku beriya bi bîst salan hatibû binçavkirin. Ya rastî sedema wê yekê ku Mukaddes Xanê gotinên xwe binax kirin, ne dewlet bû ku bavê bir, paşê neanî û hesabê nebûna bavê wê neda. Welatiyên din, akademîsyen, siyasetmedar, rojnamevan jî ku li halê “Welatiyên Kurd” ên bav, xwîşk û bira, zarok û mêrên wan “tine” kirî nepirsîn, guh nedan gotinên wan û êşên wan nedîtin, kirin ku were tercîhkirin ku hin gotin werin binaxkirin. Lê belê dema ku me herduyan axaftin dewam kir yan jî li bendê man bêdeng, hin gotin vegeriyan. Lê gotin, teqabilî hin wateyan nakin.[1] Piştî bîst salan, em hewl didin hem gotinên binaxkirî bibînin û derxin holê û hem jî li wateyên gotinên me derxistî holê serwext bibin. Lê belê para bêhtir em neçar dimînin ku qebûl bikin gotin wê tu carî têra vegotina tiştên qewimî nekin.

Dîsa jî em hewl didin yekê ji wan xebatên “rûbirûbûna bi rabihuriyê” re bikin ku pê em hewl didin guh bidin hest, fikr û daxwazên wan kesên ku dûçarî şîdeta wan dewletan bûne ku şeht in bi şer, qirkirin, gunehên li dijî mirovahiyê, û van hest, fikr û daxwazan bînin bîra wan dewletên berpirsiyar in ji şer, qirkirin û gunehên li dijî mirovahiyê, û bînin bîra gel û kesên din ên ku dema ev tişt diqewimîn, bêdeng bûn. Em weke saziya Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî hewl didin vê bikin. Weke nivîskarê vê xebatê gelo ez bi xwe dixwazim çi bikim? Mirov dikare min weke yekê ji wanên bêdeng mayî bihesibîne. “Şensê” min hebû ku salên 90’î li rojvayê Tirkiyeyê zarok û ciwan bûm; bi awayekî ji siyasetê azad min xwendina xwe ya zanîngehê di beşa “têkiliyên navneteweyî” de kir, û bi tenê di dema perwerdeya xwe ya doktorayê de “şensê” min çêbû bi awayekî bi rastî agahdar bibim ji “Pirsgirêka Kurd” a li rojhilatê Tirkiyeyê. Niha ez hewl didim şahidiyê bikim li wê tişta ku ez beriya bi salan jê haydar bûm. Mukaddes Xan jî weke kesên ku di çarçoveya vê xebatê de em diçin serdana wan, dibêje, “hûn bi xêr hatin”; dibe xwediyê wê nazikbûna guhdana me û behskirina ji me re. Wê bi rikeke ku mexdûrbûna bi nebûna bavê wê peyde bûyî veguherandibû mexrûrbûnê, hewl dida behs bike, lê her dima sekinî û dipirsî “çima?”

Me li ser xeta Mûş, Bedlîs, Wan, Colemêrg, Mêrdîn, Batman, Diyarbekir û Stenbolê pêncîûşeş hevpeyvîn pêk anîn û di van hevpeyvînan de gotina herî zêde me bihîstî “çima?” bû. Bersiveke watedar a ku mirov bide vê pirsê nîn

1 Binihêre li Atay, 2004, 101.

e. Tu gotin ne xwediyê wê wateyê ye ku ev pirs lê digere. Gelek gotinên werin gotin hene, tu carî em ne li wê deverê ne ku êdî gotinên werin gotin nemabin; gotin wê qet bi dawî nebe, lewma wê hîç kafî nebe. Ev xebat jî wê li ewqas gotinên kirî zêde bibe. Wê gotinên Mukaddes Xanê û kesên din ku deriyê xwe li me vekirin bike yek bi gotinên kesên li deverên din ên dinyayê xwedî serhatiyên bi êş ên bi heman rengî re, bi gotinên felsefî û siyasî yên li ser edalet,lêborîn, kînê yên di rewşên bi heman rengî de gotî re bike yek. Ev xebat wê şahidiyê bike li wê yekê ku mirovên mehtigehkirî, xizankirî, bêdengkirî, ji cih û warên xwe kirî, xizmên wan "tunekirî" wan nirx, gotin û siyasetên ew bi rik zindî dihêlin û bi têkoşîna xwe hildiberînin, bikin diyarî ji bo wan mirov, jiyan, zanistên ev zilm li wan nebûyî, ev zilm nebihîstî da ku "bi rabihuriya xwe re rûbirû bibin". Ne mukin e mirov şahidiya li zilmê ragihîne, lê belê dibe ku em "vegotina zilma" me şahidî lêkirî ragihînin. Belkî em van serhatiyan veguherînin doktrînekê, siyasetekê, lewma weke ku Bhabha gotî, "em dersên xwe yên herî ebedî yên di biwara jiyan û fikr de ji wan kesan digirin ku êşa hikmê dîrokê – ya tepeserkirinê, tehekumê, dîasporayê, ji cih û warê xwe bûnê – kişandine."[2]

Beriya ku ez behsa şahidiyan bikim, di beşa yekem de ez ê hewl bidim binihêrim li xebatên rûbirûbûna bi rabihuriyê re ku mijara van şahidiyan in; ez ê her weha hewl bidim binihêrim li armancên van xebatan, amûrên wan, mixatebên wan. Ez ê behsa pirsgirêk û waedên wan xebatan bikim ku navê "edaleta dema derbasbûnê" li wan tê kirin, lê belê ji ber sedemên ku di beşa piştî wê de tên minaqeşekirin ez navê "edaleta piştî şerî" li wan dikim. Ez ê li têgihiştinên edaleta cezaker û ya selihandinê bikolim; minaqeşeya têgehên "mexdûr, şahid, yên saxmayî" û "fail, berpirsiyar û yên temaşekirî" bikim; ez ê rahêjim wateya heqîqetê ji bo van mixateban û çawaniya komîsyonên heqîqetê û xebatên heqîqetê yên nefermî.[3] Liberhevgirtina têgihiştina edaleta cezaker û têgihiştina edaleta selihandinê ya ku di esasê xwe de li ser rexneyên li têgihiştina edaleta cezaker bi gewde bûye, dibe sedem ku carinan têkiliya di navbera herdu têgihiştinan de weke têkiliyeke dijberbûnê xwe bide der. Li aliyê din, çawa ku di beşên vê xebatê de û di seyra hevpeyvînên me kirî de mirov dikare bibîne, ji bo pêkanîna edaletê hem di warê hiqûqî û hem di warê civakî de, mirov divê bibêje ku têkiliya di navbera van herdu têgihiştinan de têkiliyeke hevtemamker e.

2 Bhabha, 2001, 172.

3 Lîsteya komîsyonên heqîqetê yên ku di pêvajoyên edaleta piştî şerî damezrandî, di pêvekê de cihê xwe digire.

Di beşa duyem de ez ê minaqeşeya têgehên “bîr”, “şîngirêdan”, “lêborîn”, “rikdarî û xeydê” û “dostaniya siyasî” bikim. Ev têgeh metna jêr a xebatên navbirî ne û rê didin ber hevpeyvînên me yên bi şahidên ku salên 90’î dûçarî şîdeta dewletê bûne. Di vê xebatê de ez pûte pê didim ku bikolim li îhtîmala ku mexdûr li fail û berpirsiyaran bibihurin, dema ku ev îhtîmal nebe bikolim li hestên rikdarî û silbûnê û beramberê van hestan ên siyasî. Min xwest ez ji nû ve binihêrim li “biratiya bi Kurdan re” ya ku Tirk her ji kursiya birayê mezin lê dinihêrin, li dora dostaniyeke siyasî ya muhtemel a bi Tirkan re ku Kurd dixwazin wan weke hevparên derd û têkoşîna xwe bibînin. Di beşa sêyem de min bi hewldana teswîrkirina “rewşa îstîsnaî” ya ji bo Tirkiye û Kurdistanê ya salên 1990’î ji xwe re kire armanc ku çarçoveya siyasî ya beşa şahidiyê pêşan bidim.

Sê beşên paşê tên jî ji bo hevpeyvînên me bi şahidan re kirî hatin veqetandin. Di beşa çaran de ku ya pêşî ye ji van beşan, ez rêgeha hevpeyvînan û çarçoveya serdanên me rave dikim û hewl didim kesên em bi wan re peyivîn bidim nasîn. Di beşa pêncan de ez ê behsa lêgerîna li edaletê ya kesên em bi wan re peyivî bikim ku hêviyên wan ên ji dewletê dide der, ez ê behsa van tiştan jî bikim, daxwazên wan ên Darizandina fail û berpirsiyaran û cezakirina wan; îtîrazên wan li dijî bêcezamayînê, kêmkirina cezayê fail û berpirsiyaran di ber lixwemikurhatinê û heqîqetê de û dana tezmînata madî; derxistina holê ya heqîqetan û naskirina wan, fikrên wan ên di wê biwarê de ku dewlet ji wanlêborînê bixwaze û rewşên “nebûna daxwazan”. Di beşa şeşan de ez ê qala van tiştan bikim: îhtîmala rûbirûbûna kesên em bi wan re peyivîn bi fail û berpirsiyaran re, yalêborîna wan û ya li hev helalkirinê, hêviyên wan ên der barê îhtîmala qewlekî biratiyê yê nû/dostaniyeke siyasî ya bi Tirkan re û têkoşîna wan a ji bo îtîbarê. Fikrên giştî yên bi min re di encama hevpeyvînan peyde bûyî jî di dawiya heman beşê de cih digirin. Beşa dawî jî ji nirxandin û pêşniyaran re hat veqetandin.

Me hewl da hevpeyvînan di nava çarçoveyeke bi giştî ji bîstûneh pirsan de ku di bin sernavên “qalkirina mexdûrbûnê û terîfkirina wê”, “daxwaza edaletê”, “rûbirûbûn,lêborîn û rikdarî” de li sê beşan dabeşkirî, pêk bînin. Me dizanî ku em ne mecbûr in van pirsan yek bi yek bikin, me îmtiyaz da seyra hevpeyvînê, lê belê me hin mijarên girîng elaqedarî armanca pirsa têkildar îfade kirin û hewl da fikrên kesê em pê re dipeyivin fêr bibin.

Êvara ku me hevpeyvînên xwe temam kirin, dema ku me sohbet dikir li ser tiştên ku me panzdeh rojan dîtin û guh da wan, Bêrîvanê got, “ti tişt ne li cihê xwe ye” pê jî ew êş bi bîr xistin yên dergûşên li goristanê avêtî yên li Şirnexê

ku di wêneyê bergê de ne.[4] Ne pitik di dergûşên xwe de ne, ne jî bav, jin û mêr, xwîşk û bira bi hezkiriyên xwe re; ev bîst sal in tu tişt li cihê xwe nîne. Heke ev xebat karibe vê yekê bibêje, karibe tişta ku cihê wê nikare were dagirtin bi bîr bîne; hingê me yê gotineke mutewazî kiribe.

Em hêvî dikin ku bi vê xebatê alîkariyeke kêm bikin li siberoja nêz a Tirkiyeyê ku çav li rê ye ji pêvajoya çareseriyê veguhere pêvajoya aştiyê û li pêvajoya vê siberojê ya "rûbirûbûna bi rabihuriyê re". Ne mimkun e em minetdariya xwe ya ji bo wan mirovan bi gotinan îfade bikin ku qebûl kirin bi me re bipeyivin, deriyên malên xwe, dilên xwe li me vekirin. Xwedê ji we razî be.

4 Bi vê minasebetê ez dixwazim ji dil malavahiya van kesan bikim: Bêrîvan Alagoz a ku piraniya hevpeyvînên bi Kurdî pêk anîn û piştî hevpeyvînan bi nirxandin û çavdêriyên xwe zihnê min vekir, Îshak Dursun ê ku beriya hevpeyvînan çû serdana malbatên em ê bi wan re bipeyivin û ew agadar kirin, pê re jî kir ku em hevpeyvînên xwe heta ku mumkin e bêyî ku malbatan bêzar û dilnerehet bikin pêk bînin û Ubeydullah Hakan ê ku em gihandin bajar, navçe û gundên me hevpeyvîn li wan pêk anîn, bi wêneyên xwe refaqetî me kir û wêneyê bergê yê vê xebatê jî yê wî ye.

## *Beş I*
## Rûbirûbûna bi rabihuriyê re: Gerîna li edaletê

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn peyva ku bi zimanan ve zeliqî "mirovahî" bû; ji bo wê dihat gotin, ya ku herî herî zêde ji dest hatiye dayîn e û ew e ya ku bi rastî di şer de bi bin ketiye. Kujerên "êdî ne mirov" ên ku ne bi tenê mirov kuştin, lê belê her weha miameleyên "derveyî mirovahiyê" bi mirov û cendekan re kirin, otorîteyên siyasî yên ferman dayî kujeran, "mirovahiya" li ber otorîteyên siyasî ranebûyî, tenêhiştîbûna ku bi mexdûran "mirovên qenc hemû mirine" da gotin, ev hemû mijarên metnên felsefî, edebî û siyasî ne. Ji bo bersivdayîna pirsa ka mirov çawa bûn kirde û temaşkerên vê hovîtiyê, van "gunehên li dijî mirovahiyê", ravekirina bi îdîaya dibêje, "cewherê mirovî" jihedbihurînê bi vî rengî li der nahêle jî hat ceribanin[5]. Ya rastî, tiştekî weke "cewherê mirovî" nebû, nedibû ku mirov sînorên tiştên mirov dikarin bikin destnîşan bike bi awayekî wisa ku ji çanda siyasî ya civaka ew mirov tê de dijîn û avahiya wê civakê ya îdarî qut be. Carinan li hin deveran wateya mirov "hevparê guneh" bû.[6] Di wê pêşgotinê de ku ji bo pirtûka Fanon a bi navê Lanetkiriyên ser rûyê erdê" nivîsandibû, Sartre dema behsa xelkê Ewrûpayê dikir, weha dipeyivî: "Li cem me wateya mirov "hevparê guneh" e, lewma me hemûyan sûd wergirt ji talankeriya mêtingeriyê." Dema ku "mirina mirovahiyê" pêk dihat şaristanî ava dibû.[7] Dîsa jî ji bo ku mirovahî ji nû ve were

5 Gunehên li dijî mirovahiyê li gorî terîfa di xala 7'an a Destûra Romayê de ku bi xwe metna damezrîner a Dadgeha Ceza ya Navneteweyî ye, weha ne: "kirinên li jêr ên ku beşek in ji êrîşeke belav yan jî sîstematîk a li dijî nifuseke sivîl in: (a) Kuştin; (b) Bi komelî tinekirin; (c) Kolekirin; (d) Surgûn kirina nifuse yan jî bi dare zorê veguhestina wê; (e) Bi binpêkirina qaîdeyên sereke yên hiqûqa navneteweyî girtin yan jî bi rengên din bêparhiştina ji azadiya fizîkî; (f) Êşkence; (g) Destavêtin, koletiya cinsî, bi dare zorê fihûş, bi dare zorê ducanîkirin, bi dare zorê nezayokkirin yan jî şêwazên din ên şiddeta cinsî yên ku evqasî giran; (h) Weke ku di paragraph 3'yê de hatî terîfkirin, zilma xwe disipêre sedemên siyasî, nijadî, neteweyî, etnîk, çandî, dînî, cinsî yan jî sedemên din ku bi awayê gerdûnî di hiqûqa navneteweyî de nabe werin qebûlkirin li dijî kom yan jî civakeke dikare were terîfkirin, bi kirineke di vê paragrafê de behsa wê tê kirin yan jî elaqedarî sûcekî ku selahiyeta dadgehê ye; (i) Bi dare zorê windakirina kesan; (j) Sûcê Apartheid (cudakeriya nijadî); (k) Kirinên din ên derveyî mirovahiyê yên bi heman awayî yên ku bi qesd dibin sedema êş û azarên mezin yan jî rê vedikin li ber zerarên mezin di duristiya bedenî, zêhnî yan jî fizîkî de." Ji bilî gunehên li dijî mirovahiyê, rayedarên Dewleta Komara Tirkiyeyê û kiryar namzet in ku bibin mixatebê Dadgeha Ceza ya Navneteweyî li gorî "sûcên şer" ên ku di xala 8'an a Destûra Romayê de hatine terîfkirin jî (binihêrin li Aydin, 2006). Ji bo peydabûn û guherîna têgeha gunehê li dijî mirovahiyê binihêre li Delmas-Marty, Fouchard, Fronza û Neyret, 2012.

6 Binihêre li Fanon, 2007, 34; derxistina pêş a peyvan karê nivîskarê vê metnê ye.

7 Ji bo analîza peywendiyên xurt ên di navbera şaristanî û şiddetê, û şaristanî û êşkencê de binihêre li Avelar (2004).

sazkirin ango ji bo ku ev hovîtî careke din neyê serê mirovan, diviyabû mirov ji nû ve werin teşwîqkirin ji bo hizirîn, mihakemekirin, bikaranîna melekeyên xwe yên kirinê, guhertina çand û avahiya siyasî ya heyî. Ev têgihiştin bû îlham ji bo tedbîrên siyasî û hiqûqî yên piştî şerî. Peymanên mîna Peymana Qirkirinê (1948), Peymana Mafê Mirovan a Navneteweyî (1948) û Peymana Hiqûqa Şer a Cenevreyê (1949) û dadgehkirinên mîna Dadgehên Nurnberg (1945) û Tokyo (1946) ji hewldanên pêşî bûn ku ketin rojevê bi armanca pêşîgirtina li ducarîbûna gunehên li dijî mirovahiyê.[8] Di salên 1970 û 1980'yî de li Rojhilatê Ewrûpa, û nexasim li welatên Emerîkaya Latîn û Efrîkayê bi destpêka jihevdeketina rejîmên komunîst û dîktatoriyên eskerî re, bi verastkirinên di çarçoveya "edaleta dema derbasbûnê" de "çanda rûbirûbûna bi rabihuriyê re" hat avakirin ku hema hema bûye xwedî xisleteke gerdûnî.[9] Ka em berê xwe bidin verastkirinên aîdê çanda ku van salên dawiyê li Tirkiyeyê jî deng veda.

### *Xebatên li ser edaleta piştî şerî*

Îfadeya dema derbasbûnê ya di nav peyva Edaleta dema derbasbûnê ne de cihê xwe digire, îşaret dike bi derbasbûna ji rejîmên otorîter yan jî ji demên şerên navxweyî ber bi demokrasiya lîberal û demên aştiyê, herçî têgeha edaletê ye îşaret dike bi tedbîrên hiqûqî yên elaqedarî sûcdaran û reformên siyasî yên vê demê. Li aliyê din gerdûnîbûna têgehên derbasbûnê û edaletê di demeke kurt de kete ber lêpirsînê. Roja me ya îro, pêvajoyên derbasbûnê û têgihiştinên geriyana li edaleta civakî yên ne yekser û mirov nikare wan pêş bibîne yên li welatên xwedî dîrokên siyasî û çandî yên siyasî bi rê ve diçin, çavkanî ne ji bo nêzîkahîtêdana rexnegir a li xebatên li ser edaleta dema derbasbûnê. Serê pêşî îtîraz hene li dijî ji berê de weke demokrasiya lîberal diyarkirina

8 Binihêre li Lundy û McGovern, 2008.

9 Em ê têgeha "edaleta dema derbasbûnê" li jêr bi awayekî rexnegir nîqaş bikin. Ji bo minaqeşeyeke li ser têgeha "rûbirûbûna bi rabihuriyê" re, û bi awayekî giştî dîroka xebatên rûbirûbûna bi rabihuriyê re û mînakên wê binihêre li Sancar, 2010. Gülener bi awayekî fesîh dîrokîkirina Ruti G. Teitel bi kurtî îfadekiriye û sê qonaxên ku li wan edaleta dema derbasbûnê (EDD) bi pêş dikeve dugêsinî dike: "Ji van qonaxan ya yekem bi konjuktura dinyayê ya hema piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn guherî re derket holê. Ev qonax wê pêvajoyê dihewîne ku tê de çerxên hiqûqa neteweyî cihê xwe didin hiqûqa navneteweyî û bi vî awayî jî hewl tê dayîn ku EDD bi destê hiqûqa navneteweyî were pêkanîn, paşê jî di nîzama duqutbî ya di şertên şerê sar de EDD bi pêş ket. Qonaxa duyem jî bûye xwediyê bipêşketinekê ku hakim bû li çaryeka dawî a sedsala bîstan û nexasim jî piştî jihevdeketina Yekîtiya Sovyetan li Rojhilatê Ewrûpa derket holê û peşê jî vegirte Efrîka û parzemîna Emerîkayê. Qonaxa sêyem û dawî ya bipêşketina EDD'yê dawiya sedsala bîstan xwe da der, ev ew pêvajo bû ku aşê wê digeriya bi bêîstîqarariyên siyasî û şîddeta bi globalbûnê re dayî der. Di vê qonaxê de bi rêya avakirina hiqûqa insanî biîstîqrarkirina civaka piştî şer û aloziyê veguherî yek ji armancên sereke yên EDD'yê." (2012, 47; Teitel, 2004, 70-71).

encam û berê pêvajoya jê re ya derbasbûnê tê gotin.[10] Wekî din, xaleke din a dibe sedema liberrabûneke mezin ew e ku dibêje destên demokrasiya lîberal bi "gunehên li dijî mirovahiyê" nabin. Em ê paşê behsa wan mînakan bikin ku dikin ku îtîrazên pêşî lê bin. Lê belê herçî mînakên dîrokî û minaqeşeyên teorîk in ku dikin ku îtîraza duyem lê be, ji çarçoveya vê xebatê dibihurin, lê belê dûr nîne ji bo xwendevanên elaqedar.[11] Çavkaniya rexneyeke din a li xebatên li ser edaleta dema derbasbûnê çawaniya gerdûnî û hiqûqî ya têgeha edaletê bi xwe ye. Destpêka vê rexneyê ew fikr e ku dibêje, ya gerdûnî gerîna li edaletê ye û edalet bi xwe di nava her civakê de dikare bi peywanda xweserî xwe were terîfkirin. Bi heman rengî, rexne hene li wê yekê ku mirov radihêjin gerîna li edaletê ya gerdûnî bi rengê ku hewldaneke sînordar be bi pêvajoyên hiqûqî. Ev rexne îşaret bi wî aliyê edaletê dike ku naçe hundirê dadgehan, ango îşaret bi aliyê wê yê civakî û siyasî dike.

Ya rastî, sedema wê yekê ku edalet ne tiştekî "tê levakirin", "pêk tê" ye, ne bi tenê kêmasiya sîstema edaletê ya modern e. Di cewherê edaletê de aliyek heye ku mirov nikare îşaret pê bike, aliyekî sabit nabe. Çawa ku Alain Badiou dibêje, "bêedaletî zelal û qetî ye, herçî edalet e zelûl û çelexwarî ye. Yên ku dûçarî bêedaletiyê dibin bi rengekî înkara wê nebe şahidiya vê yekê dikin. Lê belê, kî dikare şahidiyê bike li bêedaletiyê?"[12] Edalet pir dişibe demê, tê û diçe. Dibe ku "kêliyek" hebe ku em tê de bawer dikin me edalet pêk aniye, dîtiye, lê belê divê paşê em dîsa lê bigerin. Dibe ku têgeha ku em weke edalet bi nav dikin û bilind dikin, em bi rêya lêkera "adil bûn" û çalakbûneke ebedî ji nû ve terîf bikin. Adil bûn, bi îfadeya herî besît, dest pê dike bi bersivdayîna banga yên din, hewldana fêmkirina aliyê ku banga edaletê jê tê, tişta ji me dixwaze û vê yekê bi kîjan gotinan îfade dike. Edalet hunerekî bihîstinê ye. Yên ku ji xwe û ji heqîbûna xwe piştrast, naxwazin guh bidin vê bangê, jixwe ji bo dîtina yê adil ferz e mirov di heman demê de ji xwe bi şik be û xwe veke.[13]

Jacques Derrida terîfeke edaletê dike ku vê nîqaşê jî dihewîne: edalet xwedî xisleta diyariyekê ye ku bê berdêl e, ne li benda teqdîr û malavahiyê ye, nakeve nav gera aborî, bê hisab e, bê qaîde ye, bê sedem e û ne aqilane ye.[14] Ev mefhûma edaletê bi temamî berevajiyê têgihiştina edaletê ya li navenda wê

---

10 Bi sedema ku ji ber xwezaya xwe bi xwe jî demokrasî ne xwediyê sînorekî ye ku mirov derbasî bibe, yên ku peyva "edaleta piştî şerî" jî pêşniyar dikin (binihêre li Mihai, 2010, 184).

11 Binihêre li Agamben, 2001.

12 Badiou, 2004, 69.

13 Binihêre li Sokolof, 2005.

14 Derrida, 1992, 25.

îstîqrar û lihevkirin heye. Têgihiştineke edaletê ya li navenda wê îstîqrar û lihevkirin heye, fikra edaletê ya determînîst, yekser, progresîf, bi dawî û statîk pêş dibîne. Li gorî vê pêşbîniyê, dema ku carekê prensîpên edaletê hatin bicihkirin, hingê li ser navê parastina nîzam û ewlekariya warê gelemperiyê ew tê girtin li lihevnekirinekê, cudabûna fikrî yan jî rewşeke neder. Lê belê, çawa ku Derrida jî dibêje, ya ku zorê dike li sînorên sîstemên hiqûqî, siyaset, perwerde, saziyên civakî û warên gelemeperiyê gerîna li edaletê ya ebedî bi xwe ye.[15]

Gerîna li edaletê ya ebedî, rêwîtiya dîrokî ya têgeha edaletê bi bîr dixe. Bi awayekî ji rêûresmê mirov di edaletê digihiştin yan weke bersiveke/berdêleke cezaî/tolhildêr yan jî amûreke ku xizmet dikir ji bo armancên mezintir yên weke dilşabûn yan jî jiyana adilane; herçî vê dema dawiyê ye em dikarin bibêjin ku tevî nîqaşên di biwara pirengîparêziyê û demokrasiyê de mirov bi têgeha edaletê dadikevin.[16] Edalet her weha dikare bi awira li pirsgirêkên civakî yên cihê jî were terîfkirin: weke bersiva dayî newekheviyên bunyewî/aborî, edaleta civakî ya wekhevîparêz ku xwedî fonksiyona ji nû ve levaker e; weke bersiva dayî newekheviyên çandî, edaleta xwe disipêre cudakeriya erênî ya ku qebûla nasname û çandan misoger dike; weke bersiva dayî newekheviyên nûneriyên siyasî, edaleta navenda wê demokrasî ya ku beşek e ji beşdarbûna siyasî. Divê mirov ji bîr neke ku nêzîkahîtêdana femînîst jî van nîqaşan bi gewde dike; ev nêzîkahîtêdana femînîst îdîa dike ku etîk û pratîkên serdest ên ku xwedî wê îdîaya wekhevî, maf û gerdûnîbûnê ne bi têgihiştina mêr hatine bigewdekirin, lê belê roja me ya îro gerîna li edaletê ya xwe disipêre peywendî û pêdiviyan divê bi têgihiştina etîk a jinê û pratîkên wê yên çê ji nû ve were sêwirandin.[17] Heta, nêzîkahîtêdanên teorîk ên nû jî hene ku rexne digirin li nêzîkahîtêdanên femînîst ên ku cinsa jin ji xwe re dikin esas û alîkar dibin bi wan re û bi xwe jî tecrûbeyên nasnameyên cinsî yên cihê esas digirin. Bi vî awayî em dikarin bibêjin ku gerîna li edaletê teqabilî rûbirûbûneke bi rabihuriyeke kûrtir û ferehtir re dike ku ji bo vê yekê têgihiştina edaletê ya serdest kêm e.

Rêzkirin û sinifandina verastkirinên di pêvajoya edaleta piştî şerî de ku yek ji pêkhateyên mezin ên vê hewldanê ye, li ber pêkanînên cihê û nîqaşên nû her diçe zehmet dibe. Dîsa jî, em dikarin lîsteya "hêmanên siyaseteke berfereh a edaleta dema derbasbûnê" esas bigirin ku Navenda Navneteweyî ya Edaleta Dema Derbasbûnê amade kiriye.[18] Di lîsteyê de tişta pêşî behsa wê tê kirin

15 Binihêre li Derrida, 1999.

16 Binihêrin li Pali, 2013, 7-30.

17 Binihêre li Pali, 2013, 14-17.

18 http://www.ictj.org/about/transitional-justice [3'yê Nîsana 2014'an].

dozên ceza ne ku bi wan bi rêya dadgehên neteweyî/navneteweyî/têkilhev fail û berpirsiyar tên dadgehkirin.[19] Tişta duyem jî selihandin e; ango hikûmet wan tedbîran bigirin da ku pê zerara li kesên mexdûr were tezmînkirin. Ev tedbîr pêk tên ji hewldanên hem xwedî xisletên madî yên weke [tezmînkirina] bi milk, ya darayî yan jî bi rengê xizmetên tenduristiyê û xizmetên din ên bi vî rengî, hem jî ji wan hewldanên xwedî xisletên sembolîk ên weke daxwazalêborîna fermî, lidarxistina rojên bibîranînê.[20] Tişteke din jî reformên sazumanî ne di biwara hêzên eskerî, polês û dadgehan de ku erka xwe bi xirabî bi kar anîne. Ev siyaseteke reformê ye ku lê miqate dibe ku wezîfedarên dewletê yên di van saziyên navbirî de tên xebitandin yan jî yên werin xebitandin bi rejîma kevin re hevkarî nekiribin.[21] Herî dawî jî behsa komîsyonên heqîqetê tê kirin ku lêkolînan dikin li ser bunyeya sîstematîk û çavkaniya civakî ya binpêkirinên mafan û raporan diweşînin, ev komîsyon her weha şîretan dikin li desthilatdariyên siyasî.[22] Çawa ku Navenda Navneteweyî ya Edaleta Dema Derbasbûnê jî îşaret pê dike, ev ne lîsteyeke dawî lê hatî ye, lewma çerx û tedbîrên cihê yên li welatên cihê û heta heman çerx û pêkanînên cihê timûdaîm vê lîsteyê pirengî dikin.

Pêkanînên efûyê bi xwe di malpera Navenda Navneteweyî ya Edaleta Dema Derbasbûnê nînin. Behsa wan bêhtir di çavkaniyên li ser lihevhatinê de tê kirin. Hikûmetên nû yên ku lihevhatin ji xwe re kirine armanca li pêş û ji bo rûbirûbûna bi rabihuriyê re îradeya siyasî ya pêwîst bi wan re nîne, li şûna doz, komîsyonên heqîqetê û reformên sazûmanî, miraceetî wan pêkanînan dikin ku gunehkaran rizgar dikin ji hesabdayînê yên weke îlankirina efûya taybet, efûya qismî yan jî efûya giştî. Pêkanîneke din a belav jî ew e ku gunehkar di berdêla gotina tiştên bi wan dizanin û mikurhatina li sûcên xwe bikevin ber efûya bi şert û merc. Weke efûya sergirtî/nepenî ya ku encama şîrovekirina qanûnan ji qenciya sûcdaran re ye.[23] Lê belê pêkanînên efûyê yên bi vî rengî yên ku gerîna li heqîqet û edaletê ya mexdûr û civakan li ber çavan nagirin, para bêhtir li şûna ku xizmeta lihevkirinê bikin, zemînên nû ji şer û aloziyê re amade dikin. Tevî vê jî, meyleke bi wî rengî serdest e ku hewl didin îsbat bikin ku di navbera gerînên li heqîqet û edaletê, û pêvajoya lihevkirinê de têkili-

19 Ji bo analîza dozan binihêrin li Gülener, 2002, 53-57.

20 Ji bo minaqeşeya li ser tezmînkirina madî û sembolîk li qismê “Heqîqet”ê yê di vê beşê de binihêre.

21 Binihêrin li Gülener, 2012, 66-72.

22 Em ê li jêr bi mînakan rahêjin mijara komîsyonên heqîqetê.

23 Ji bo pêkanînên efûyan binihêre li, 2012, 63-66.

yeke yekser nîne.[24] Îdîa ew e ku dema mirov gerîna li edaletê ya cezaker bike destpêka heqîqet yan jî mehkemekirinan, hingê ev tercîhkirina rabihuriyê li şûna îro û sibe ye, civakê dike dubend, û lihevhatin û aştiyê zehmet dike. Lê belê, di warê têgihiştina edaleta selihandinê de ku em ê paşê minaqeşeya wê bikin, rewşeke tercîha di navbera lihevhatin yan jî edaletê de li meydanê nîne. Nexasim jî ji bo mexdûran, lihevhatina bê heqîqet û bê edalet, diyar e ne mimkun e. Gotinên wan kesên ji qirkirina li Ruandayê sax filitî têra xwe raveker in: "Lihevhatin. Ev peyv ji bo min û gelek xizmên min yên sax filitî êdî veguherî rewşeke mirov nikare xwe lê ragire"; "Dawîhatina li qirkirinê, dawiyê bi rastî jî li qirkirinê naîne, lewma qirkirin her ji hundir de dewam dike."[25] Tişta ku dike qirkirin bi dawî nebe ji bo wan kesên ji qirkirinê sax filitî ew e ku daxwazên wan ên heqîqet û edaletê pêk nehatine – û heta, heke em rêyên rast nebînin wê ev daxwazên wan tu carî pêk neyên.

### *Gerînên li edaletê yên cezaker û yên selihandinê*

Em dikarin bibêjin ku îro xebatên edaleta piştî şerî, bi du gerînên li edaletê yên ji hev cuda û belê hevtemamker tên birêvebirin. Ji van ya pêşî têgihiştina edaleta cezaker e ku binpêkirina qanûnan weke guneh dibîne û di esasê xwe de elaqedarî cezakirina wan kesan e ku qanûnan bin pê dikin. Ya din jî têgihiştina edaleta selihandinê ye ku binpêkirina temamîbûna têkiliyên madî û watewî yên mirovan weke guneh dinirxîne, ji bo wê ya esas ew e ku ev têkiliyên behsa wan hat kirin, werin selihandin.[26] Têgihiştina edaleta cezaker, bi ziwatekî hiqûqî yê dûrî civakê, bi awayekî serbixwe ji hêviyên mexdûran, birêveçûna wê jî ji jor ber bi jêr ve ye, serê xwe naêşîne ji şert û mercên ku sedema alozî û şerî ne û pê razî ye ku bi tenê failên "gunehên li dijî mirovahiyê" ceza bike. Ev pêvajoya cezakirinê jî bi piranî daxwazên edaletê tetmîn nake û nikara bi kêra mayîndekirina aştiyê jî were.[27] Herçî têgihiştina edaleta selihandinê ye, li navenda wê mexdûr hene, bingeha wê civak e, berê wê ji jêr ber bi jor ve ye, û meyla wê ew e ku bi rêya hewldanên aşkerekirina şert û mercên şerî diafirînin, çanda siyasî veguherîne û di avakirina aştiyê de bi xwe bibe xwedî dewrekê. Ev meyl encama nerazîbûnekê ye ku pêvajoyeke ewqasî tevlîhev ew derxistiye holê ku hiqûqa ceza ya ku li ser afirandina sûc û sûcdar ava ye, nikare çareser bike, dijberê qanûnîbûn-pisporbûn-giştîkirinê

---

24 Binihêre li Rosoux, 2009, 543-563.

25 Binihêre li Rosoux, 2009, 558.

26 Zehr, 1990, 181; Clark, 2008, di nava rûpel 340 de.

27 Ji bo nîqaşên teorîk û hiqûqî yên li ser edaleta selihandinê binihêre li Weitekamp û Kerner (2002); Walgrave (2002); Zehr û Toews (2004).

ye, û ne navendparêz e.[28] Ji bo têgihiştina vê nerazîbûnê ferz e ku mirov mafê rûbirûbûna bi rabihuriyê re weke mafekî sereke yê mirovan binirxîne, weke hêwateke çandeke siyasî ya demokratîk û pireng qebûl bike. Bi vê peywendê mirov dikare bibêje ku di nava têgeha edaleta selihandinê de kakilekî radîkal demokratîk heye, û teqabilî bêhtir tiştan dike ji bûna aliyekî edaleta piştî şerî. Heta, ji ber avahiyeke xwe ya normatîf û têkiliya xwe ya nêz a bi prensîpên etîk re, mirov gelek caran têgihiştina edaleta selihandinê disipêrin disîplînên ji hev cihê yên weke dîn, felsefe, zanistên civakî, îdealên komunîteryan û teoriya siyasî.[29] Li aliyê din, serketina têgihiştina edaleta selihandinê ango ji aliyê civakê ve qebûlkirina têgeh û çerxên ew pêşniyar dike, ferz dike ku têgihiştina edaleta cezaker jî bi awayekî sax û silamet bixebite. Ji ber vê yekê jî, ev herdu têgihiştinên edaletê divê ne weke dijberên hev yan jî alternatîfên hev werin dîtin, divê mirov bi awayê ku hev temam bikin rahêje wan.

Ji ber hiqûqa ceza ya modern em li têgihiştina edaleta cezaker bêhtir baniyane. Diyar e ku mentiqa edaleta ku hiqûqa ceza ya modern leva dike tolhildan e, lê belê ev guhertiye ji tolhildana şexsî û rêbazên wê û heta ji bo ku pêşiyê li tolhildana şexsî bigire li dar e. Qebûlnekirina sûcê failekî û mafê mexdûr li meydana giştî tê qebûlkirin, fail ji maf û azadiyên xwe tê menihkirin, hesta hêrsê û daxwaza tolhildanê ya kesê mexdûr rewa tê dîtin û bi vî rengî tê hedinandin, û vediguhere halekî bi kêra civaka giştî tê. Bi vî rengî, hiqûqa ceza ya modern bikêrhatina daxwaza tolhildanê ji bo jinûve avakirina nîzama exlaqî, ji bo lêvegerandina rûmeta şexsî, ji bo tezmînkirina zerarê, ji bo tesdîqkirina berdêla sûcekî bi awayekî gelemperî/dewletî, bi awayekî zimnî qebûl dike.[30] Têgeha ehliyeta cezaî ya ku di hiqûqa modern de heye, îşaret pê dike ku bi tenê failên tu astengiya wan a aqlî û îradî nebe xwedî wî mafî ne ku berpirsiyar werin girtin û bi tenê ew dikarin bên cezakirin, bi xweşdîtina wan ûlêborîna wan rûmeta wan tine nayê hesibandin.[31] Heta îdîa ew e ku mexdûr failan efû bikin jî mafê civakê yê Darizandina fail her dimîne (baqî ye), heke wisa nebe, wateya wê ew e ku zerara fail li mexdûr ango li civakê kirî jî di warê civakî de tine tê hesibandin. Dîsa jî, çawa ku dadgerên doza Eichmann jî nîşan dan, êşên mezin ên mîna qirkirinê ku “ji têgihiştina mirovî û wê de ne” û bi tenê li gorî “nivîskar û helbestvanên mezin” in, nabe ku bibin mijarên hiqûqê, wan qebûl kir ku bi tenê kirin û failên rê li ber pêkhatina van kirinan vekirî dikarin werin

28 Weitekamp, 2002, 323.

29 Pavlich, 2002b.

30 Saunders, 2011, 133.

31 Binihêre li Saunders, 2011, 133.

dadgehkirin, divê mirov bi awayekî realîst rahêje erk û sînorên dadgehan.[32]

Mirov dikare bibêje ku têgihiştina edaleta selihandinê di bingehê xwe de avabûye li ser rexneyên li çerxên edaleta cezaker di pêvajoya edaletê ya piştî şerî de. Ji van rexneyan, ya pêşî û ya herî girîng xisleta dadgehên neteweyî/navneteweyî ye ku hest, fikr, pêdivî û mafên mexdûran li ber çavan nagire. Wekî din ev rexne bi bahaneya ku mexdûr gerîna xwe ya li edaletê ne bi mafên gerdûnî û mucered lê belê bi rengekî cihî û pêdiviyên darîçav îfade dikin, îdîa dikin ku divê ji bo her civakê ziwatekî nû were peydakirin ku pêdivî û mafan tîne cem hev.[33] Yan na, rewabûna qanûn yan jî rêbazên cezakirinê yên ku dadgehên navneteweyî/neteweyî wan bi kar tînin li cem mexdûran timî wê kêm û qels be. Pêkhatina vê rewabûnê ji nêz ve elaqedar e bi avakirin, xebitîn û heta cihê dadgehan re. Dadgeha Ceza ya Navneteweyî ya Yugosyavyaya Berê li bajarê Holanda Laheyê ye, Dadgeha Ceza ya Navneteweyî ya Ruandayê jî li bajarê Tanzanya Arusha ye; ango ev dadgeh ne li welatên binpêkirin lê pêk hatî ne, li deverên ku zehmet e mexdûr û civakên peywendîdar xwe bigihînin wan ev dadgeh dixebitin. Ev dadgeh jixwe di warê xebitînê de jî têra xwe tevlîhev in û xerîb in ji bo xelkê cihî. Ev sedem jî dikin ku ev dadgeh mekanî jî qut bibin ji mixatebên gerîna li edaletê.[34]

Dadgeha Taybet a Sierra Leone ya ku di encama hewldanên navneteweyî û neteweyî de pêk hat û xwedî xisleteke melez e, li paytexta welêt, “li navenda mekanê sûc” xebata xwe dimeşîne. Tê gotin ku ji bilî yek doza ku ji ber ewlekariyê neqlî Laheyê hat kirin, vê yekê misoger kiriye ku “mexdûr, malbatên wan û welatî bi çavên serê xwe li edaletê binihêrin”.[35] Tê îdîakirin ku Darizandina kevneserokê Gestapoyê Klaus Barbie li Franseyê yan jî dadghekirina endamên cuntaya eskerî li Arjantînê ji bo van gelan yek ji “kêliyên damezrîner” e, zorê dike li wan kes û gelan ku bêgane wate beramberî hovîtiya pêkhatî da ku bibîranînên xwe yên elaqedarî trawmayên dîrokî yên sergirtî û tepisandî derêxin meydanê, û wan bi vî rengî tevlî pêvajoya rûbirûbûna bi rabihuriyê re dike.[36] Heke em wisa bihizirin ku yekane mixatebê gerîna li edaletê ne mexdûr in,

---

32 Ji efserên Naziyan Otto Adolf Eichmann sala 1962'yan li Qudsê hat dadgehkirin û paşê jî hat bidarvekirin. Arendt, 2012, 219.

33 Robins, 2011, 77-78.

34 Clark, 2008, 334.

35 Park, 2010, 100. Park binxêz dike ku Dadgeha Taybet a Sierra Leone yekemîn mehkeme ye ku sûcên bi darê zorê zewicandina jinên ciwan ên çekdar û bi dare zorê çekdarkirina zarokên temenê wan di bin 15 salan de xistiye ber lepirsînê. Ji bo hurguliyên der bare dadgehê de binihêre li http://www.sc-sl.org/

36 Arenhövel, 2008, 575.

gelên din ên ku ji wê civakê ne ku mexdûr jiyana xwe di navê de dewam dikin jî li pey “gunehên li dijî mirovahiyê” ne – yan jî diviya wisa bin – hingê girîngiya cihê fizîkî ya dadgehên elaqedar jî bi awayekî aşkere derdikeve holê. Edalet jixwe di warê zihnî de dûr hatiye xistin ji mixatebên xwe; dema ku ev edalet bi awayekî fizîkî jî ji mixatebên xwe dûr were xistin, hingê mirov dikare navê tecrîtkirina edaletê li vê rewşê bike.[37]

Christie vê rewşê weke “dizîna aloziyê” bi nav dike.[38] Ew dibêje alozî di heman demê de xwedî potansiyel in ji bo çalakî û beşdariya civakî, îdîa dike ku dadgehên ceza yên modern, parêzer û dadgerên profesyonel dikin ku aliyên aloziyê pasîf bibin û vê potansiyelê tine dikin. Ew dibêje ku yên ku di dadgehên ceza yên modern de herdaîm yên bi bin dikevin mexdûr in ku destûra wan nayê dayîn ku derdê xwe bi zimanê xwe îfade bikin, ku parêzer yan jî dozgerên bi zimanê hiqûqê yê kêm û bi şêwazekî bêzar nûneriya wan dikin û bi vî awayî jî ji pêvajoyê tên vederkirin. Paşê jî li gotinên xwe zêde dike û dibêje, ya ku bi rastî bi bin dikeve civak bi xwe ye. Christie îşaret pê dike ku guftûgoyên dawî li wan nayên yên di biwara wê yekê de ka hiqûqa li welêt nûneriya çi û kê dike û derfetên diyarkirina norman, bi gotinên din em îfade bikin, derfeta ku nîqaşên siyasî cihê xwe bibînin li holên dadgehan, ji destê civakê hatine standin. Ew weke fîgureke din ku hiqûqa ceza ya modern xemsar e beramberî wê, behsa failan jî dike. Ew dibêje, ji failan nayê xwestin ku sedemên xwe yên şexsî ji bo gunehên xwe rave bikin, ew bêpar tên hiştin ji wê êşê ku dema rûbirûbûna bi rastî ya bi mexdûran re tê tecrûbekirin, pê re jî ji wê poşmaniya paşê dikare bi wan re peyde bibe û belkî jî ji şensê li wî bihurînê jî. Christie ji bo ku ev şens peyde bibe û derkeve holê dadgehên taxan pêşniyar dike ku li navenda wan mexdûr hene û “kesên bê mekteb xwe gihandî” wan bi rêve dibin.

Christie ev rexne û pêşniyarên xwe sala 1977’an di peywenda hiqûqa taybet de ji bo Ewrûpaya modern îfade kiribûn ku lê pisporbûn û jihevqutbûna civakî, tax ji holê rakiribûn. Em dikarin bibêjin ku îro pûte bi van rexne û pêşniyaran tê dayîn di lîteratura edaleta piştî şerî de û di çerxên edaleta selihandinê

37 Li Tirkiyeyê pêvajoya dûrxistina edaletê yan jî tecrîdkirina wê xwe weke “bi sedema ewlekariya gunehbaran barkirina dadgehê” dide der. “Çar dozên elaqedarî kuştinên kiryar nediyar, windakirina di bin çavan de, kuştinên bêpirs û mehkeme, û şewitandina gundan ên salên 90’î bi îdîanameyên salên 2012 û 2013’an hatin vekirin û dozan jî dawiya sala 2012’an û îsal dest pê kir. Yek ji van dozên elaqedarî bûyerên li Mûş, Mêrdin, Colemêrg û Şirnexê bi tenê jî li bajarê bûyer lê pêk hatin pêk nayê. Doza Dêrikê birin Çorumê, ya Geverê birin Eskîşehîrê, doza Silopiya birin Enqerê, Doza Korkut jî birin Kirikkaleyê.” http://www.bianet.org/bianet/insan-haklari/151913-zamanasimina-ugramayan-davalar [2’yê Nîsana 2014’an].

38 Christie, 1977.

de yên ku bêhtir li deverên dinyayê yên li derveyî Ewrûpayê tên bikaranîn. Li aliyê din Crawford îdîa dike ku di helwêsta Christie de bi awayekî sergirtî û di têgihiştina edaleta selihandinê de jî bi awayekî aşkere romantîzmek heye beramber civakên ji rêûresmê û wan demên bihurî û heta hema hema nêzîkahîtêdaneke mîtîk heye.[39] Bi rastî jî, ew kesên ku piştevanên têgihiştina edaleta selihandinê ne, miraceetî mînakên erênî dikin ku di wan de çerxên mehelî yên wekelêborîn, lihevkirina çandî, navbeynkarî û palûte digerin. Lê belê divê mirov hayjixweheyî nêzî van mînakan bibe, lewma piranîya wan nexasim jî ji bo komên weke kesên bêmilk, jin, nasnameyên cihê yên cinsî, koçberan û bi rengekî giştî xwediyê wê potansiyelê ne ku dijminahiyên dîrokî yên di koka aloziyan de hene dewam bikin; û ya rastî, ev çerx bêhtir guncaw in ji bo pirsgirêkên taybet ên di nava malbat û eşîretê de.[40] Ji ber ku Dadgeha Ceza ya Navneteweyî ya Ruandayê ne weke hêvî jê dihat kirin bû, ji bo çareserkirina lihevnekirinên piçûk dadgehên ji rêûresmê yên bi navê gacaca hatin damezrandin. Tutsiyan ev dadgeh li dijî Hutuyan weke amûreke tolhildanê bi kar anî. Ev rewş jî rexneyên mîna yên li jor dike heq.[41] Lê belê helbet nabe ku di encama vê rexneyê de çerxên mehelî bi tevahî werin vederkirin.

Yek ji wan rêbazan ku li Sierra Leone rêxistinên civaka sivîl û saziyên din ên civakî miraceetî dikin ew e ku di wan rewşan de ku sîstema hiqûqê ya modern kêm e, rîtuelên ji rêûresmê bi kar bînin.[42] Yek ji van rîtuelan jî ji wan şahiyan e ku tê de ew şervanên berê li dijî malbatên xwe yan jî civaka xwe sûc kirine, lê belê îro poşman in, dixwazin îro ji mexdûran bixwazin li wan efû bikin, û civak wan qebûl bike, ev şahî bi “xweşûştina ji gunehan di çem de” dest pê dike û bi reqsan dewam dike yan jî di hin merasîmên daxwaza efûyê de “ji bo ku pêşiyan, miriyan û xwedeyan haş bikin şeraba xurmeyan dirijînin erdê”.[43]

39 Crawford, 2002, 109; herçî nivîsên tewandî ne, lê hatine zêdekirin.

40 Binihêre li Arriaza û Arriaza, 2008, 161; Baines, 2007, 114.

41 Hejmara dadgehên gacaca digihêje 11 hezaran. Jib o rexneyên dibêjin ev dadgeh veguherîn çerxên ku bi gunehbariyên neheq failan diafirînin, binihêre li Corey û Joireman, 2004; Betts, 2005; Kirby, 2006.

42 Park, 2010, 108-115.

43 Ji bo rîtualên bi vî rengî yên li Tîmora Rojhilat, Perû, Kamboçya, Ruanda, Uganda û Mozambîkê binihêre li Arriaza û Arriaza, 2008, 164. Pêvajoya ku ji bo şervanan pêk tê anîn dikare îlhamê bide jib o qebûlkirina cerdevanan ku li Tirkiyeyê yek ji hêzên paramilîter ên herî tevlîhev in. Xwarinên aştiyê yên eşîran li hev tînin yan jî li cem Elewiyan çerxa kişandina darê (cezakirina gunehkarî bi dûrkirina wî ji civakê ji bo demeke diyar) ji wan rêûresman in ku mirov dikare ji nû ve li wan bifkire. Di hin rewşan de ku bawerî bi destwerdana hiqûqa modern yan jî dewletê nîne, yan jî gihiştina wan zehmet e, çerxên nû yên mehelî jî dikarin werin vedîtin. Jixwe tê zanîn ku di gelek lihevnekirinên mehelî de PKK pirsgirêkê di qenciya komên bêimtiyaz ên weke jin û gundiyan de çareser dike.

Çerxeke din a bi vî rengî ya ji çanda ji rêûresmê jî ji Fambul Toka ku wateya wê "mihabeta malbatê" (bi Ingilîzî family talk) ye, îlhama xwe girtiye. Li gorî vê, komîsyonên piçûk ku ji lîderên dînî, nûnerên jin û ciwanan pêk tên li bin "siya dareke pîroz" dicivin. Di komîsyonan de fail û mexdûr li ber civakê tên cem hev, mikurhatin û poşmanî li ber agirê dadayî tên îfadekirin û sewalek tê qurbankirin.[44] Rêbazeke din a ji rêûresmê ya efû û lihevkirinê jî di nav xwecihên Acholî yên li Ugandayê de belav e. Li gorî vê rêbaza aştiyê, bi navbeynkariya Meclîsa Rûspiyan, serekên du eşîrên ku şerê hev dikin, "ava qurman a tahl vedixwin" (mayo oput) û "rimên xwe ditewînin" (gomo tong).[45] Hin rîtuelên ji bo haşkirina ruhên wan kesan ku dema sax bûn rastî miameleya xirab hatine yan jî bi awayekî guncaw nehatine veşartin, û armanca wan ew e ku pêşiyê bigirin li hesta tolhildanê ya heyî, ne bi tenê ferdekî lê belê civaka ferd endamê wê ya bi "şîdetê" qirêj bûyî paqij bikin û nîzama civakî ji nû ve ava bikin.

Cihê van rîtuelên bi vî rengî yên teatral di cîhana hest û fikr a nifşên nû de ne diyar e; mirov dikare bibêje ku ne mimkun e ji bo qirkirinên girseyî yên serdema modern pêk werin anîn û bi awayekî hûrgulî jî danakeve bi heqîqetên elaqedarî pirsgirêk û sûcên ku çavkaniyên alozî û şeran in. Dîsa jî tê îdîakirin ku hin rîtuelên ji rêûresmê ji bo sivikkirina hin cihêbûnên şerî ew yekcar kûrkirî di hin civakan de ji komîsyonên heqîqetê bêhtir bi kêr tên.[46] Diyar e ku divê endamên civaka elaqedar biryarê bidin ka kîjan merasîmên ji rêûresmê, di kîjan qonaxê de bi kîjan rêbazan li pêvajoyên modern werin zêdekirin. Ji bo ku pêkanînên bi vî rengî berfereh, watedar û bikêrhatî bin, aşkere ye ku xebateke pêş divê da ku binihêre ka di beşên cihê yên civakê de û nexasim jî li cem mexdûran çi wateya wan heye û ka mixateb wê çi qasî wan qebûl bikin.

Li ser mijara birêvebirina pêvajoyên modern bi destê civakên ji rêûresmê mirov dikare mînakên îlhamdêr li Guatemalayê bibîne.[47] Panzós Historial yek ji "malên bîrê yên mehelî" yên li Guatemalayê ye. Ji bo ku qirkirina sala 1978'an nede jibîrkirin, bi armanca berhevkirin û weşandina pratîk û rêûresmên çandî yên mehelî yên beriya şîdetê, danederên mehelî yên zexta piştî mohrkirina peymana aştiyê, avakirina abîdeyên bîrê, li Panzósê avakirina muzeyeke aştiyê û li herêmê vekirina odeyên bîrê, wê xebat meşandin bi tevlîbûna ji her gundî du kesên li gorî rêûresmên Maya hilbijartî. Xebatên ku du komên antropologên edlî ji bo

44 Ji bo dewra dûrxistin yan jî bi dawîkirina şîdetê ya rîtuelên qurbankirinê di civaka ji rêûresmê de binihêre li Girard, 2003.

45 Ji bo pêvajoya şerî a li Ugandayê, Dadgeha Ceza ya Navneteweyî û bikaranîna çerxên edaletê yên mehelî binihêre li Baines, 2007; Jeffery, 2011.

46 Park, 2010, 114.

47 Arriaza û Arriaza, 2008, 165-166.

dîtina gorên veşartî tevî xelkê cihî, otorîteyên dînî û hin saziyên mehelî bi rê ve birin, kir ku gelek cenaza werin dîtin. Paşê ev cenaze bi merasîmên ji rêûresmê li goristinanên – ku li wan lewhayên navê failan li ser wan nivîsandî hene – bên veşartin. Xebatên psîko-civakî yên ku kesên saxmayî ne bi tenê weke mexdûr lê belê di heman demê de weke hilgirên dîrok û çandeke biqîmet dibînin – û bi vî awayî baweriya xelkê bi xwe didin anîn – yên ku pûte didin bi nihêrîna li dinyayê ya Mayayan a ku li navenda têgihiştina watewiyata wê mekan heye û xwe disipêre têkiliya xurt a di navbera xweza û mirovî de, encamên erênîtir derxistine holê. Hasilî, mirov dikare bibêje ku têgihiştina edaleta selihandinê ya ku hewl dide ji çerxên bi vî rengî yên mehelî sûdê wergire, li gorî têgihiştina edaleta cezaker berferehtir e. Li vir mijareke girîng a ku divê em balê bikişînin ser heye; nabe ku çerxên bi vî rengî yên mehelî werin birêvebirin bi kargeriya hikûmet, saziyên navneteweyî û heta hin elîtên neteweyî bi armancên ji berê de diyarkirî di bin zexta demê yan jî rojevên din de.[48] Em bi rengekî din bibêjin, divê xebat were kirin bêyî ku mexdûr, mixateb û nirxên mehelî yên werin bikaranîn, bibin obje û heta heke gotin di cih de be, bêyî astengkirinê.

Tevî ku gelekî cihê ye ji van mînakan, em behsa ezmûna Bakurê Îrlandayê jî bikin ku weke karê "edaleta veguher" a ku tê de aliyên şerê hev dikin bi xwe beşdar dibin, mînak tê nîşandan.[49] Artêşa Komarê ya Îrlandayê ya Demî (IRA) û Hêzên Ulster ên Dildar (UVF) herdu jî komên paramilîter in. Şervanên wan û hikûmxwarên bere yên siyasî sala 1998'an di heman demê de du proje dan despêkirin. Yek ji van projeyan li devera Komarxwaz, Civaka Edaleta Selihandinê ya Îrlandayê (CRJI) ye û ya din jî li devera Yekîtiyê, Alternatîfên Bakurê Îrlandayê (Alternatives) ye. Komên paramilîter şîdetê ne bi tenê li dijî hev bi kar tînin, ew şîdetê li dijî endamên civaka xwe yên "ne dilsoz" jî weke amûreke cezakirinê bi kar tînin. Ji ber vê jî, piştî peymana aştiyê ya di navbera IRA û Meliktiya Yekbûyî de ev şîdet êdî ne weke beşeke şîdeta siyasî, lê belê weke şîdeta rojane nexasim jî weke beşeke êrîşên nijadperest û homofobîk dewam dike. Pirsgirêkên bi vî rengî weke xwedanadera vegirtina "Çanda Şîdetê" li serdema piştî şerî di nava gelek civakên demeke dirêj di nava şer û aloziyê de, tên zanîn. Armanca projeyên CJI û Alternatives ew e ku Rêxistina Polês a Bakurê Îrlandayê ya ku berê navê wê Teşkîlata Polês a Melikyiyê ya Ulsterê bû, veguherîne. Ev proje pêk tên anîn bi bikaranîna tevnên heyî yên civakî û çandî ji bo şûştina têgehên sûc, ceza û edaletê ji şîdetê û "normalkirina" wan da ku têgihiştineke ewlekariyê ya ne di xizmeta dewletê de lê belê ji bo xêra

48 Arriaza û Arriaza, 2008, 170-172.

49 Eriksson, 2009.

civakê dixebite bi cih bikin. Di têkoşînên çekdarî yên demdirêj de têgihiştina mirovan a "şer" û "aştiyê" bi rengekî ji şîdetê xweser bi pêş nakeve, lewma jî ev yek dibe pirsgirêkek ku têkoşînên ji bo aştiyê jî asteng dike.

***Mexdûr, şahid, yên saxmayî***

Kesên ku ji şeran, qirkirinan, gunehên li dijî mirovahiyê sax filitî, şahidên van bûyeran û mexdûrên wan weke aktorên ku xwedî ajoyên cihê ne ji hiqûnasên profesyonel, tevlî gerîna li edaletê dibin. Mirov dikare vê pêvajoyê weke beşeke bivênevê ya rexneyên li modernîteyê bibîne. Komên weke bêmilkan, hindikayiyan, jinan, nasnameyên cihê yên cinsî, miletên mêhtingehan, dîaspora derveyî têgeh û "serhatiyên mezin" hatine hiştin ku têgihiştina modernîteyê ya navend-Ewrûpî, ronakker û rasyonalîst ew afirandine. Ev komên li derve hiştî di serdema ku jê re dibêjin a post-modern yan jî post-kolonyal de di warê zihnî û pratîkî de dest werdidin cîhana siyasî û zanistî. Ev serdem jî rastî wê serdemê tê ku mexdûr dest pê dikin zorê bidin têgihiştina edaletê ya bi hiqûqê sînordar. Ne tesaduf e ku Chantal Mouffe heman serdemê weke "vegera ya siyasî" bi nav dike.[50] Destwerdana van komên navbirî teqabilî wê ji nû ve veguherandina meydana dewletî ber bi meydaneke siyasî dike. Ev meydana dewletî ji mêj ve bûbû meydaneke apolîtîk ji ber ku tevî ku ew li cinsiyetek, rengek, dînek û nasnameyekê pêçayî ye, bi binavkirina "neteweyî" kirasekî xisleta bêalî û bêalozî lê hatiye kirin. Di vê pêvajoyê de mexdûran nedikarî dest werdin meydana hiqûqa pozîtîf û dadgehên ceza, lê belê li ber wan radibûn. Mirov dikare bibêje ku mexdûran hingê ji bo îfadekirina têgihiştina xwe ya edaletê çerxên edaleta selihandinê ava kirine. Ya rastî, divê mirov her weha bibêje, di avakirina çerxên edaleta selihandinê de bi piranî aktorên mîna akademîsyen, hiqûqnasên mixalif û saziyên civaka sivîl bi rola pêşeng radibin, dewra mexdûran jî talî dimîne.

Nêzîkahîtêdanên edaleta selihadinê bi peyvên mîna "xurtkirin", "azadkirin", "kirdekirina" mexdûran, "derfetdayîna xweîfadekirinê" ji bo mexdûran xwe berdide meydanê û bi vê yekê jî rewşa "talîbûna mexdûran" ku tam jî beşek ji van peyvan e, xurt dike. Ev peyv wekî din bi bîr dixin "gelên hewl tê dayîn werin rizgarkirin" bi nêzîkahîtêdaneke ronakker, 'bindestên" weke mixatebê îdeolojiyekê tên dîtin û di têkoşîna xwe de veguherîn objeyan yan jî "gundiyên safik û paqij" ên ku romantîkên modern sirûdan ji wan re dibêjin. Gelek caran bi tuwanca ku bikaranîna peyva mexdûr bi serê xwe jî ji ber ku nihêrîneke ji jor ve li mirovên ku weke mexdûr tên binavkirin dihewîne, rê ve dike li ber nîqaşên dirêj.[51] Ya rastî

50 Mouffe, 2005.

51 Li vir divê em bibêjin ku di ferhenga Saziya Zimanê Tirkî de peyva "mexdûr weke "kesa/ê

pirsgirêk li vir ne peyva mexdûr bi xwe ye, helwêsta ku bi peyvên din yên li vê peyvê tên zêdekirin derdixe holê ye, ango helwêsta beramberî mexdûran e.

Pirsgirêka eslî ew pêvajo ne ku ji bo îfadekirina neheqiya li wan bûyî li mexdûran ferz dikin ku bibin xwediyê nasnameya mexdûran ku bi gotin û pratîkên diyar hatiye hunandin û bi vî awayî mexdûran careke din mexdûr dike. Mbembe li ber radibe ku rewşa mexdûrbûnê beriya rewşa kirdebûnê tê.[52] Dibe ku dema em li vir li şûna peyva kirde peyva mirov bi kar bînin, ev liberrabûn baştir were fêmkirin. Her mexdûr, weke herkesî ferdeke/î xwexislet e ku xwedî nasnameyên siyasî, çandî yên diyar e. Ya ku mexdûran di bin navekî de dike yek, ne mexdûrbûna wan e, têgihiştin û lêgerîneke edaletê ya hevpar e. Bi vî awayî ya ku divê mirov esas bigire, têkoşînên siyasî ne ku mexdûr – tevî mirovên din ku hewl didin şert û mercên siyasî û aborî yên ku ew mexdûr kirine biguherin – bi rê ve dibin. Têkoşîneke bi vî rengî dike ku mexdûr dest werdin terîfkirinên sûc, ceza, fail, berpirsiyar, heta û belkî jî beriya her tiştî yên mexdûr û mexdûrbûnê. Ya ji vê jî girîngtir, li şûna têgehên selihandin û başkirinê, ev têkoşîn têgeha "palpiştiya kolektîf" ne bi tenê bi bîra mexdûran, belê bi bîra me hemûyan dixe ku hewldana bihîstin û fêmkirina dem û dinyaya em bi yê din re parve dikin e, beramberê fikrî û pratîk ya bihevrejiyanê ye.[53] Li şûna ku bêhtir gotinan bikin li ser mexdûran, dibe ku bêhtir di cih de be ku di beşên elaqedar ên vê xebatê hemûyan de em yekser cih bidin nihêrîn û gotinên mexdûran.

### *Fail, berpirsiyar, yên temaşe kirî*

Berpirsiyar ew in ku ferman dane, fail jî ew in ku emir bi cih anîne, dîsa jî gelek rewş hene ku xeta wan ji hev dike, zelûl û nediyar dibe. Bi herhalî, hem di warê hiqûqî de û hem jî di warê siyasî de girîng e heke mimkun be ev cudayî were parastin. Herçî meseleya kî "gunehkarê" bi rastî ye, ew li gorî nihêrîna mexdûr diguhere. Dîsa jî me dît ku gelek mexdûr îşaret bi berpirsiyaran dikin û tesbîta Hannah Arendt parve dikin: "bi awayekî giştî, bi radeya dûrketina ji kesê/a amûra kuştinê bi destê xwe bi kar anî, radeya berpirsiyariyê jî zêde dibe."[54]

---

ku nehekî û zerar lê hatîkirin" hatiye terîfkirin. Em weke hemberê peyva Ingilîzî "victim" gotina "mexdûr" bi kar tînin. Lê ya rastî wê rasttir bûya ku me "victim" weke qurban wergeranda, lê belê ji ber ku peyva "qurban" ji bo mexdûrên nesax tê bikaranîn, me peyva "mexdûr" tercîh kir. Li aliyê din, heke pêşniyara peyveke guncawtir derkete pêşiya me, wê menedar nebûya ku em di bikaranîna peyva "mexdûr" de israr bikin.

52 Mbembe, 2002.

53 Pavlich, 2005, 62-63.

54 Arendt, 2012, 252. Li aliyê din, wateya peyva fail bi awayekî besît kesê karek kirî ye, ango tu nirxeke neerênî nahewîne. Lê belê dema ku em bi bîr bînin ku wateya peyva

Helwêsta edaleta selihandinê beramberî fail/berpirsiyaran ji ya edaleta cezaker bi gelekî cihê ye. Têgihiştina edaleta selihandinê sûc weke binpêkirina qanûn û hiqûqê nabîne, weke binpêkirina saxîtiya madî û watewî ya mirovan û têkiliyên wan terîf dike û bi vê jî, serê pêşî fail/berpirsiyar jî, qanûndanêr û qanûnparêz jî nake mixatebên dewletê belê dike mixatebên mexdûran ku dûçarî binpêkirinê bûne. Têgihiştina edaleta selihadinê van tiştan li ber çavan digire û diparêze; gihiştina fail/berpirsiyaran di zerara wan dayî de, rûbirûbûna wan bi kirinên wan re, poşmanbûn û daxwaza efûyê ji mexdûran û herî dawî îhtîmala xwedanaber barê berpirsiyariyên xwe. Ew îdîa dike ku tevlîbûna fail/berpirsiyaran li pêvajoya selihandina – û heta ya palpiştiya kolektîf a li jor me behsa wê kirî – têkiliyên ku wan binpê kirin bi awayê ku xwe jî veguherînin girîngtir e ji cezakirina wan. Ew binê hebûna pirsgirêkeke civakî û çandeke siyasî bin xêz dike ku bi cezakirina fail/berpirsiyaran nikare were çareserkirin. Ya rastî, mirov dikare bibêje ku armanca têgihiştina edaleta selihandinê veguherandina wê sîstemê ye ku zemîn pêk tîne ji bo fail/berpirsiyar da ku sûc bikin, zerarê li mirovên din bikin. Navekî din yê vê armancê pêşîgirtina li ya qewimî ye.

Em lê baniyan e ku fail/berpirsiyar di dadgehkirinên li holan de bi piranî ji ber sûcên li ser navê dewletê kirî bi tenê dibêjin, wan ji nû ve welat parastiye û bi tenê ferman pêk anîne, fail/berpirsiyar hema bibêje serfiraz in bi cezayên li wan hatî birrîn, û dibêjin "îro bûya min ê dîsa heman tişt bikira".[55] Bi vî awayî parastina welat a ku gunehbaran weke wezîfeyeke dîrokî û mezin, karekî dijwar xwe daye ber, hesta wijdan a mirovî dixelîne, dibe xwedî fonksiyona rewakirina karê kuştinê.[56] Wekî din ji ber ku fail û berpirsiyar ji bo gunehên xwe ji bilî "berjewendiyên neteweyî" tu bahaneya din jî nîşan nadin, ev jî dike ku civak têgeha berjewendiya neteweyî nexe ber lêpirsînê û dike ku civak xwe nede ber siyasîkirina meydana dewletî/neteweyî ya ku bûye meydaneke apolîtîk. Mîna ku mirovekî jiyana wî di tehlûkeyê de xwe bi awayekî rewa biparêze, binavkirina sûcên li ser navê berjewendiyên neteweyî weke

mexdûr "kesê stem lê bûyî" ye, hingê divê em wan kesên li vir weke fail tên binavkirin weke stemkar bi nav bikin. Lê belê ji ber bikaranînên cihê yên peyva xeddar (stemkar) di Tirkiyê de û bikaranîna berfereh a peyva fail di lîteratura bi Tirkî de, em ê her peyva fail bi kar bînin.

55 Mîralayê teqawîtbûyî Cemal Temizoz, û kevne cerdevan û îtîrafkar bi giştî heft kes ji ber kuştinên di navbera salên 1993-1995'an de li Cizîrê pêk hatî di doza Temizoz û yên din de hatin dadgehkirin; "tevahiya gunehbaran di îfadeyên xwe de gelek caran gotin, ji bo ku berjewendiyên dewletê biparêzin ew li dijî terorê têkoşiyane, nabe ku kirinên wan weke sûc werin dîtin û neheqî ye ku li şûna werin xelatkirin tên gunehbarkirin" (binihêre li Atılgan û Işık, 2011, 39).

56 Binihêre li Arendt, 2012, 114.

“teserûf yan jî kirinên dewletê” rewa dike ku dewlet jî di bin şert û mercên awarte de bi navê xwe parastinê, ango ji bo beqaya xwe, wan kirinan bike ku di şertên asayî de sûc bin.[57] Di vê rewşê de, wateyeke bi vî rengî derdikeve holê, weke ku qey gunehê dewletê yan jî dema rewşeke qanûnên awarte li kar be, berpirsiyariya şexsî wê nebe. Lê belê hingê, kesê xwedî meqam yê li ser serê dewletê jî di navê de keseke/î dikare were dadgehkirin li holê namîne. Lê belê çawa ku Arendt jî îdîa dike, nabe ku tu caran berpirsiyariyên şexsî ji holê werin rakirin û, ha ji ber vê yekê, pir girîng e ku ewên ku îdîa dikin tu gunehê wan nîne ji bilî bicihanîna fermanan û bi tenê diranekî çerxekê ne – tevî hejmar û navên kod ên li wan kirî, çawa ku Arendy wan bi nav dike – ji kirinên xwe şexsî berpirsiyar werin girtin, werin dadgehkirin, ango ji diranên çerxekê veguherin mirovan.[58]

Jixwe qanûnî jî ne mimkun e ku mirov îdîa bike li ser “fermana yên payebilindtir” sûc kiriye û bi vî rengî wesfê sûc û berpirsiyariya ferdî dewrî kesekî din bike. Di dawiya dawî de timî mimkun e mirov bi ya fermanan neke, û tam jî ji hev derxistina ka mirov wê bi ya kîjan fermanê bike ya kîjanê neke yek ji melekeyên aqlî û exlaqî yên mirovî ne.[59] Daxuyaniya fermandarê wargeha Treblinka ya ku birêveberiya Naziyan li Lehistanê ava kir, Franz Stangl bi gotinên xwe rê li ber nîqaşeke girîng vedike: “Min tu xirabî, bi şexsê xwe, bi qesd bi kesî nekir... Lê belê ez li wir bûm... Erê, ya rastî, ez hevparê berpirsiyariyê me.”[60] Dema mirov dibêje ez li wir bûm, lê mikur tê ku mimkunbûna ne li wê derê bûnê tu carî bi temamî ji holê ranabe. Heta ku mirov dikare bibijêre berpirsiyariya hizirîn û mihakemekirinê ango aliyê insanî yê mirovî heye. Bi vî awayî girîng e mirov bi bîr bîne ku para bêhtir fail ne cinawir yan jî sadîstên çavtarî ne, heta carinan dikarin endamên rêzdar ên civakê bin. Bi vî rengî dibe ku mimkun be mirov lê serwext bibe ka tişta kirî ku ew van sûcan bikin, çi ye. Arendt dibêje, rewşa ku bi navê bicihanîna fermanan tê parastin û

57 Arendt, 2003, 38.

58 Arendt, 2003, 32.

59 Sala 2006’an Neteweyên Yekbûyî Peymana Navneteweyî ya di biwara Parastina Her Ferdî ji Wendakirina bi Zorê de qebûl kir. Di xala 23. a vê peymanê de dibêje, “nabe ku ji bo wendakirina bi zorê bi tu awayî ferman û talîmat werin dayîn û şert e ku dewletên aliyê Peymanê di hiqûqa xwe ya navxweyî de misoger bikin ku payenizmên ku ferwateke bi vî rengî bi cih neanîn nabe ku li hemberî payebilindên xwe berpirsiyar were girtin û were cezakirin.” (binihêre li Atılgan û Işık, 2011, 45). Ji bo metnê temamî yê peymanê binihêrin li http://www.ihop.org.tr/index.php?option=com_content&view=article&id=404:buetuen-kiilerin-zorla-kaybedilmeden-korunmasna-dair-uluslararas-soezleme&catid=33:ceviriler&Itemid=114 [12 Mayıs 2014]. Tirkiyeyê hîna ev peyman jî mohr nekiriye.

60 Binihêre li Eksen, 2010, 287.

helwêsteke pasîf nîşan dide, divê weke destekdayîn were binavkirin û weke bi rengekî çalak razîbûn were dîtin.[61] Di vê rewşê de divê fail qebûl bikin ku wan fermanên dayî wan û îdîayên îdeolojîk ên ku zemîn in ji bo kirinên wan ên cezaî rast dibînin, erê dikin û destekê didin wan. Bi gotinên din em îfade bikin, ya ku divê em fêr bibin ne ew e ka sîstem çawa dişixule, fail çawa li vê gerîna aşê sîstemê zêde dibin, ya ku divê em fêr bibin ew e ka çima ew li vê gerîna çerxa sîstemê zêdebûne.[62] Ya rastî, ya ku wê aliyê sîstemaîk a gunehên li dijî mirovahiyê derêxe holê ne zincîra fermandariyê ye, aşkerekirina dîskursa îdeolojîk e ku vê sîstemê rewa dike. Lê belê em bi tenê dikarin vê dîskursê aşkere bikin, em nikarin wê li kursiya gunehbaran rûnînin; li ser kursiya gunehbaran divê timî ferdek hebe, mirovekî ji goşt û hestî li ser rûne, ya rast ev e.[63]

Nwogu îdîa dike ku komîsyonên heqîqetê yên ku xwe nadin ber ku li motîvasyonên kirinên şîdetê bigerin, serhatiyên mexdûr û failan li "hesabên kolektîf" dinivîsin û serhatiyen mexdûran di ser yên failan re digirin, nexasim jî di şerên sedema wan etnîk de ku sivîl beşdarî bûne, kêm dimînin.[64] Ji bo serwextbûna li motîvasyonên li pişt kirinên şîdetê divê mirov bi gotin û diskursên beriya şerî jî dakeve. Lewma "weke amadebûna mirina ji bo armancekê, amadebûna kuştina ji bo armancekê jî dikarin der barê armanc, kujer û kuştinê de bibin ravekirinek".[65] Lê belê em naxwazin vê ravekirinê bibihîzin. Nîqaşeke azad a di biwara rewşa zihnî ya failan de "dibe ku nîşan bide ku failên sûcên herî tirsnak jî zêde ji me yên mayî ne cuda ne".[66] Ya rastî, çawa ku Nwogu jî binxêz dike, heke mirov nexasim jî di şerên etnîk de qebûl neke ku fail û mexdûr zêde ji hev ne cihê ne, hingê wateya vê yekê ew e ku mirov îdîa dike ku hin civak bi awayekî xwezayî xirab û şerxwaz in, hin civak jî qenc û aştîxwaz in, û ev îdîa dikare heta bi fikra nijadperest jî biçe.

Girîng e ku mirov fail û mexdûran neke nasnameyên mayînde yên mirovan. Ji bo vê jî, divê avahiyên civakî-aborî û siyasî yên ku sedema şîdetê ne, werin minaqeşekirin, û têkiliya heqîqetên veşartî yên di serhatiyên failan de û "vegotinên mexdûrbûnê" bi van minaqeşeyan re çêke. Li vir armanc helbet ne ew e ku mirov serhatiyên failan deyne hember serhatiyên mexdûran û serhatiyên herduyan li ber hev bigire; armanc ew e ku mirov van serhatiyan

61 Arendt, 2003, 46-47.

62 Arendt, 2003, 58.

63 Binihêre li Arendt, 2012, 29-30.

64 Nwogu, 2010, 275.

65 Horowitz, 2001, 2; Nwogu, 2010, 278.

66 Osiel, 2001, 5; Nwogu, 2010, 278.

bigihîne hev bi rengê ku bi kêra serwextbûna li sedemên bunyewî yên li piştşîdetê werin. Wekî din, nexasim jî di şer û aloziyên etnîk de gerînên li heqîqet û edaletê dibe ku veguherin “têkoşîna destanwarî ya di navbera qenc û xirab de” ku di şexsê mexdûr û failan de pêk tê.[67] Serhatiyên şexsî yên mexdûrên “qenc” vediguhere “serhatiya neteweyî”, dîrokeke neteweyî ya xapînok û kêm, û herî dawî nasnameyeke apolîtîk a neteweyî ya koma etnîk ku ew endamê wê ne. Lê belê têkoşîna heqîqet û edaletê têkoşîneke siyasî ye ku armanca wê ew e ku sûcên failan bi qebûleke îdeolojîk a diyar û di warê terikandina melekeya fikr û mihakemeyê de bi tercîheke “apolîtîk” kirin, û çavkaniya van sûcan derêxe holê. Armanca vê têkoşînê di heman demê de ew e ku têkiliyên civakî ji nû ve û belkî ji bo cara yekem ava bike. Nwogu dibêje, pêdiviya me heye bi komîsyonên heqîqetê yên ku bixebitin bi armanca avakirina “hesta edaletê” ya koma etnîk a ku fail endamê wê ne ya di dema hovîtiya pêk hatî de ji dest dayî, têgihiştina “qenc, rast û adil”, û “hesta heysiyetê” ya mexdûran.[68]

Rexneyeke din li dadgehên ceza yên neteweyî/navneteweyî ew e ku dadgeh bi tenê failan û hindik berpirsiyaran mahkeme dikin û bi vî awayî guneh dikin gunehekî ferdî. Ango, mirov dikare weke xisleteke erênî ya dadgehan bibîne ku sûc were ferdîkirin, ango sûc bixin stûyê komekê yan jî miletekî hemûyî û pê re jî astengkirina ji nû ve hilberandina fikra neteweparêz a ku çavkaniya şerî ye. Têgeha “gunehkariya kolektîf” bêguman li pêşiya aştiya civakî astengeke mezin e. Têgeha “gunehkariya kolektîf” kesekî li dûv xwe nahêle yê bi rastî sûc kirî, berpirsiyariya wî ya şexsî heyî, ku mirov dikare hesab bipirse ji ber kirinên wî û wî dadgeh bike, teqabilî tu tiştî jî nake di warê hiqûqî û siyasî de. Ev têgeh di warê exlaqî de xapînok e. Bi ser de jî, dîsa çawa Arendt gotî, “li devera ku herkes gunehkar e, tu kes ne gunehkar e.”[69] Ji bo sûcên me nekirî em bi tenê dikarin xwe mecazî gunehkar his bikin; yan na em ê bibin xwedî helwêsteke şaş a mîna dema em sûcekî bikin û xwe gunehkar his nekin, heta em ê bibin piştevanê gunehkaran.[70]

Li aliyê din rast e ku ferd divê ji ber sûcên berê li ser navê koma ew aîdî xwedî berpirsiyariya kolektîf bin. “Her nifş ji ber ku ji dayik bûye nava dewamîbûneke dîrokî, hem bi emelên pêşiyên xwe pîroz dibe û hem jî radihêje barê gunehên bavên xwe jî”.[71] Di dawiya dawî de di rewşeke xwedî îmtiyaz de bi awayekî ne

67 Nwogu, 2010, 279.

68 Nwogu, 2010, 284.

69 Arendt, 2003, 21; 147-158.

70 Arendt, 2003, 28, 147-148

71 Arendt, 2003, 27.

yekser yan jî yekser sûdê werdigire ji wan destketiyan ku encama mexdûrbûna kesên din in. Em nikarin ji "berpirsiyariya temsîlî" ya ji bo tiştên me nekirî xwe bidin alî; "ev berdêlek e ku em didin ji ber ku em bi mirovên din re dijîn."[72] Bi vî awayî timî xisleteke siyasî ya berpirsiyariya kolektîf heye. Wekî din, rast e ku her hikûmet ji ber emel û qisûrên hikûmetên beriya xwe xwedî berpirsiyariya siyasî ye.[73] Lê belê qebûlnekirina vê mîrateya em behsa wê dikin ango qebûlnekirina gunehên kirî bi cezanekirina failan, nedîtina pêdivî û mafên mexdûran re hêdî hêdî dirûvê berpirsiyariya kolektîf, û sûcê kolektîf pê dikeve. Tevî Darizandinan, xwestinênlêborînê, bibîranînan û abîdeyên bibîranînê jî hê jî gunehê qirkirinê li tevahiya "Elmanan" tê barkirin; ne ferdên Bosnayî, Sirp, Xirwat lê belê "Bosnayî", "Sirp" û "Xirwat" weke gunehkarên şer tên dîtin; heman rewş ji bo Ruanda jî heye, ev jî mînak in ji bo vê rolê.[74]

Tam jî li vê deverê fonksiyona çerxên edaleta selihandinê ji nû ve derdikeve holê. Destwerdaneke girîng e, mirov sûcê ku weke binpêkirina qanûnan terîf dike, weke zerara li mirovan û têkiliyan dibe; zerarê weke newekheviyên bunyewî û fail/ferdên berpirsiyar jî weke aktorên ku dûvikên têkiliyên hêzê terîf bike. Ev destwerdan, dike ku berpirsiyariya ji tiştên qewimî ya saziyên fermî yên ku sûcên kirî û zerarê rewa dikin, faktorên kolektîf û kesên li kirina sûcan temaşkirî, xuya bike. Temaşekirina li bêedaletiyê bêyî ku tiştek were kirin yek ji wan qisûran e ku ne mimkun e were cezakirin; lê belê ev diyardeyek e ku bi qasî ku em karibin rave bikin ka çawa mimkun bû, bi qasî ku em berpirsiyariya kolektîf û siyasî ya ku kir mimkun bibe qebûl bikin, îhtîmala dubarebûna wê kêm dibe. Qonaxa yekem a vê pêvajoyê jî bêguman derxistina holê ya heqîqetan û qebûlkirina wan e.

### *Mafê Heqîqetê*

Têgeha "mafê zanînê" yan jî "mafê heqîqetê" vê dema dawiyê kete dinyaya fikr û hiqûqê. Ev têgeh mafekî mexdûran, xizmên wan û nûnerên wan yan yê civakê yan jî yê gelekî yê hem kolektîf û hem jî ferdî ye; mafê gihiştina rastiyên di biwara awayê pêkhatina binpêkirina mafê mirovan de, kite bi kite agahiyên li ser wan, sedemên wan û failên wan îfade dike. Fêrbûna tiştên qewimî, di metnên navneteweyî de ne bi tenê mafê mexdûr û malbatên wan ê "baqî" ye ango dem di ser re debas nabe, weke mafekî destjênabe û nabe were dewrkirin tê terîfkirin di biwara fêrbûna "dîroka zilmê" ku

72 Arendt, 2003, 158.

73 Arendt, 2003, 27.

74 Mendeloff, 2004, 368.

“beşek ji mîrateyê” “ya gelekî ye”. Ev terîf di prensîpên Neteweyên Yekbûyî yên “têkoşîna li dijî bê ceza mayînê” de cihê xwe digirin û berpirsiyarên girîng bar dike li milê dewletan di biwara lêkolîna binpêkirinên mafê mirovan, pêşîgirtina li tunebûna “bîra kolektîf” pêkanîna dadgehên serbixwe û karîger, û damezrandina komîsyonên heqîqetê û komîsyonên lêkolînê yên weke wê.[75] Belgeyeke din a Neteweyên Yekbûyî jî mafê edaletê tevî “gihiştina edaletê” û “tezmînkirina zerarê” weke “yekê ji çareyên edlî” yên ji bo mexdûran terîf dike.[76] Ji wan tedbîrên ku divê ji bo tetmînkirina hêviyên mexdûran werin girtin, yên ku ji bo mafê heqîqetê girîng ev in: Bi şertê ku zerarê neke li ewlekarî û berjewendiyên mexdûran, xizmên wan û wan mirovên ku ji bo alîkariya mexdûr bikin yan jî pêşiyê bigirin ku binpêkirin zêde bibin û dewam bikin dest werdane bûyeran yan jî ji bo wan ne tehlûke be derxistina holê ya rastiyan û parvekirina wan bi raya giştî re; lêkolîna cihê wendakiriyan, bi tesbîtkirina nasnameya zarokên revandî û mirovên kuştî re dabînkirina desteka pêwîst ji bo dîtina cenazeyan, naskirina wan, û li gorî rêûresmên çandî yên malbatan û civakan yan bi rengê wesiyeta mexdûran yan jî bi rengê ku tê qebûlkirin wesiyeta mexdûran e cenaze ji nû ve werin veşartin; bi rengê ku qebûlkirina berpirsiyariyan û naskirina rastiyan bihewîne xwestinalêborînê ji raya giştî. Li vir tişta girîng ew e ku direwşên ku em dikarin qebûl bikin ku di binpêkirinan de berpirsiyariya wan a yekser nîne jî berpirsiyariya dewletan baqî ye di warê derxistina holê ya rastiyên li ser binpêkirinan, aqûbeta kuştiyan û failên binpêkirinan de, di warê dadghekirina failan/berpirsiyaran de û ji ber ku nebûye xwediye wê îradeyê ku pêşiyê bigire li pêşiya binpêkirinan.

Em bi kurtî behsa xwestinalêborînê bikin ku yek ji berpirsiyariyên baqî yên dewletê ye. Bora dibêje, ji bo ku usûl û toreya lêborînxwestinê ne bi awayekî be ku mexdûran careke din biêşîne, divê ne nefsmezin û melûsanî be: “lê-

75 “Impunity: Report of the Independent Expert to Update the Set of Principles to Combat Impunity, Diane Orentlicher, Addendum, Updated Set of Principles for the Protection and Promotion of Human Rights Through Action to Combat Impunity.” United Nations Document E/CN.4/2005/102/Add. 1; ji bo analîzeke berfereh binihêre li Walker, 2010, 526-527.

76 “Basic Principles and Guidelines on the Right to a Remedy and Reparation for Victims of Gross Violations of International Human Rights Law and Serious Violations of International Humanitarian Law.” United Nations Document A/RES/60/147 (2006); jib o analîzeke hûrgulî binihêre li Walker, 2010, 527- 528). Herçî tedbîrên tezmînkirinê ne, li pên kategoriyan hatine dabeşkirin: îade, telafî, selihandin, tetmî û garantiya dubarenebûnê. Avakirina şert û mercên beriya binpêkirinan yan jî avakirina mafên hatî binpêkirin, heke mumkin be telafîkirina zeraran û yan jî selihandina wan, para bêhtir hewl tê dayîn bi tezmînata madî pêk were anîn; ev tezmînata madî jî ji peredayîna aynî û neqdî, û xizmetên psîkolojîk, tibî û civakî pêk tê.

borînxwestinên ‘mucered’ ku bi temamî ne diyar e behsa kîjan kirinê dike, ne diyar e ji kêlêborîn tê xwestin, kê mixateb dibîne, bi tenê weke jestên qels û bêkêr dimînin, bi tenê dikarin wisa bin.”[77] Weke mînak, sala 2010’an Meclîsa Neteweyî ya Komara Sirbistanê li ser gunehên li dijî nifûsa Bosnayî ya sala 1995’an li Srebrenîtsayê, di daxuyaniyekê de “sersaxî ji malbatên qurbaniyan re û ji ber nekirina her tişta mimkun ji bo pêşîgirtina li vê trajediyêlêborîn” dixwest; ji ber ku di vê daxuyaniyê de li şûna “qirkirinê” peyva “trajediyê” hat bi kar anîn, xizmên qurbaniyên Bosnayî îtîraz kir.[78] Ha ji ber sedemên bi vî rengî, divê mirov ji bîr neke kulêborînxwestin ne nuqteyeke ku yekalî û bi şewazê fermandêrî tê danîn, lê belê pêvajoyek e ku bi hevdîtinên li ser çarçoveya wê dikare bi pêş keve; bi gotina Bora,lêborînxwestin “ew e ku mirov dev ji guhnedan-nebihîstinê berde û guh bigire li hevokên nû.”[79] Ji bo ku mirovlêborîne veneguherîne qisûreke ji gunehî jî mezintir, divê mirov xwe nede alî ji navlêkirina sûc, ji birina navê gunehkar û mexdûran, û xwe dûr negire ji bikaranîna peyvalêborînê, bi gotineke din, divê ji heqîqetê mirov nereve. Jixwe ya ku heqîqetê bi xwe û daxwazekelêborînê ya ku heqîqetê teslîm dike bi serê xwe dike jesteke mîna tezmînatê jî kirineke bi vî rengî ye.

Xala ku Walker li ser mijara “mafê heqîqetê weke tezmînat” balê dikişîne ser jî vê kirinê guftûgo dike. Walker serê pêşî dibêje, her şêwazê tezmînatê sembolîk e, jixwe ne wisa bûya nedibû ku navê tezmînatê lê were kirin. Ew dibêje, tişta ku tezmînatê manîdar dike ji van jestan pêk tê: qebûlkirina kirina sûc û zerarê, girtina ser xwe a berpirsiyariya pêwîst û tevgera bi niyeta pêkanîna edaletê. Ew derdibire ku di warê madî û pereyî de çi qas gelek tezmînat were pêşniyar kirin jî ev jest nebin, tezmînat wê ne watedar be. Wekî din, ew li ber wê îdîayê radibe ku dibêje tezmînatên sembolîk ên weke xwestinalêborînê û bibîranînan ên bi destê dewletê tu carî ne “di dema heyî” de ne û ne miameleyên bi tesîr in, û bin xêz dike ku ya rastî tezmînata madî jî sembolîk e. “Lêborînxwestin mecbûrî peyvan, bibîranîn jî materyalên dîtbarî, yên ku mirov dikare dest bide wan û yên devkî bi awayekî temsîlî tên bikaranîn da ku hevbandorkirina behsa me li ser ragihînin; eynî mîna peredayînê ku ji bo pêkanîna heman armancê navgîneke malî bi rengekî sembolîk bi kar tîne.”[80] Di herdu rewşan de jî armanca hevbandorkirinê selihandina têkiliya heyî û afirandina tesîrên rastî yên di warê psîkolojîk, exlaqî, civakî yan jî siyasî de ye. “Bi rastî jî heke hevbandorkirin

77 Bora, 2013, 88.

78 Binihêre li Günal û Özengi, 2013, 242-243.

79 Bora, 2013, 89.

80 Walker, 2010, 530.

raweste yan jî bi awayekî biqisûr were dewamkirin, tesîrên wê jî wê têra xwe rastî bin: heke bivê ku em behsa çendekan bikin, em dikarin kîn, heqaret, êş, dudilîbûn, îxtîlafa hiqûqî û redkirinê bikin rêz."[81]

Ya rastî mirov her weha dikare bi bîr bixe ku herçî selihandina wan zerarên e ku çi madî û çi sembolîk tu tezmînat wê wan bi cih neke, tezmînkirin jixwe ne mimkun e, heta di rewşên bi vî rengî de jestên ji dil ku weke sembolîk tên binavkirin watedartir û avakertir in. Bi vî awayî, ravekirina heqîqetan hem şertekî bivênevê yê tedbîrên tezmînkirinê ye û hem jî hêmanê damezrîner e ku tezmînkirinê dike tezmînkirin.[82] Heta, Walker îdîa dike ku hin rewş hene ku di wan de aşkerekirina heqîqetan bi serê xwe jî dikare weke fiêleke tezmînkirinê were dîtin. Weke mînak, ew dibêje, di warê têkiliyên exlaqî/insanî de ku di encama binpêkirinên cidî yên mafê mirovan de zerar li wan bûye, dema di vê rewşê de heqîqet werin aşkerekirin, ev dikare xwedî xisleteke tezmînkirinê be ku hewl dide bawerî û hêviyê ji nû ve ava bike.

Çima ewqasî girîng e ku heqîqet werin aşkerekirin, fermî werin qebûlkirin, herkes bi wan zanibe? Mexdûr dibêjin, ew bi xwe jî nikarin bawer bikin ji tişta hatî serê wan yan jî şahidî lê kirine. Dibe ku ew xwe dixin şûna yên din, weha difikirin ku tu kes wê bawer neke ji vê hovîtiya ku nabe rastî be û his dikin ku wê zehmet be ji bo wan ku baweriya insanan bi xwe bînin. Dibe ku bixwazin ku yên qewimîn bi rastî neqewimîbin û weke rêyeke hewldana jibîrkirinê hewl didin ku bifikirin yên qewimîn nabe ku bi rastî qewimîbin. Derxistina holê ya tiştên qewimî weke heqîqetê, bi awayekî fermî qebûlkirina wê û herkes pê zanibe, rewşek e ku wê bike ku mexdûr ji nû ve bi xwe bawer bin û baweriyê bînin bi wan mirovên ku ew divê bi wan re bijîn. Helbet, ev ne rewşek e ku wateyên psîkolojîk û exlaqî lê barkirî ne, aliyekî wê yê siyasî û civakî jî heye.

Girêdana yekser a di navbera fermî qebûlkirina heqîqetan û rewabûna siyasî, têkiliyên civakî yên aştiyane de zelal e. Ji bo ku şîdeta dewletê dubare nebe, şer dewam neke, yên qewimîn neyên jibîrkirin û meyilên tolhildanxwaz werin sivikkirin, şert e ku heqîqet werin qebûlkirin.[83] Heta, mirov dikare qebûla fermî ya ji aliyê dewletê ya heqîqetan bi serê xwe jî weke awayekî edaletê bibîne.[84] Li aliyê din di civakên alozî û şer di wan de her heyî, demokrasî bi cih nebûyî, îradeya rûbirûbûna bi rabihuriyê re qels, îhtîmala qebûlkirina

81 Walker, 2010, 530.

82 Walker, 2010, 530.

83 Mendeloff, 2004, 359.

84 Goldstone, 1996, 491; Mendeloff, 2004, 360.

heqîqetan hem kêm e û hem jî bêguman wê ji bo hin beşên civakê bêzarker be. Lê belê, ev endîşe nakin ku mirov daxwazên derxistina holê yên heqîqetan û fermî qebûlkirina wan bide paş, bilekis ferz dikin ku zemîn ji van daxwazan re were amadekirin. Dibe ku heqîqet ji bo dema kurt weke tehlûkeyekê xuya bike ji bo lihevkirinê, aştiyê û demokrasiyê, lê di dema dirêj de têkiliyên ku hîmê lihevkirinê, aştiyê û demokrasiyê pêk tînin, piştrast dikin.[85]

Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê ya Efrîkaya Başûr sê terîfên heqîqetê dike: ya pêşî "heqîqeta diyardeyî/edlî" ku di biwara delîlan de ye û xwedî xisleteke qanûnî yan jî zanistî ye; ya diduyan "heqîqeta şexsî/gotinî" ye ku pê îşaret bi heqîqet û serhatiyên mexdûr û failan dike; ya sisiyan "heqîqeta civakî" ye ku bi lihevtesîrkirina civakî, minaqeşe û diyalogê tê avakirin; û ya çaran jî "heqîqeta dermanker/selihandinê" ye ku zerarên berê bûyî diselihîne û pêşiyê li dubarebûna di siberojê de digire. Dadgehên ceza yên navneteweyî/neteweyî li meydaneke sînordar li kar in ji bo ku bi tenê heqîqeta edlî derêxin holê û di ser heqîqeta edlî re hikûm bibirrin, komîsyonên heqîqetê yên fermî/nefermî weke hêwateke temamker a heqîqeta edlî berê xwe didin bihevguherandina heqîqetên şexsî. Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê ya Efrîkaya Başûr lihevkirineke ku ji vê pêvajoya bihevguherandin û lihevtesîrkirinê peyde dibe weke "heqîqeta civakî", qebûlkirina van heqîqetan li meydana dewletî bi awayekî fermî jî weke "heqîqeta dermanker/selihandinê" terîf kir, û pê re têkiliya têgeha heqîqetê bi edalet, lihevkirin û aştiyê re çêkir.[86] Têkiliya yekser a ku ne cihê nîqaşê ye ya di navbera heqîqet û edaletê de, gelo di navbera heqîqet û lihevkirinê yan jî heqîqet û aştiyê de heye? Gelek îdîayên cihêreng hene ku dibêjin, têkiliyeke bi vî rengî di navbera wan de nîn e. Dema ku cihê wan be, em ê van îdîayan minaqeşe bikin, lê belê li vir em bi tenê bibêjin ku mexdûr qîmet bi van îdîayan nadin.

### *Komîsyonên Heqîqetê*

Komîsyonên Heqîqetê derdikevin holê weke amûreke bipêşxistî da ku "di nava çerxekê de ku tê de meqamek heye ku bi rengekî girêker heqîqetan bibêje û xwedî hêza cezakirinê ya ku vê erkê misoger dike" ango ji bo afirandina rewşeke peyivîna azad biafirînin ku li dadgehan bi tu awayî peyde nabe yan jî di rewşên nebûna dadgehan de destûrê nede tinebûna heqîqetan.[87] Ev komîsyon li her welatî û di her rewşê de dibn xwedî fonksiyon û bunyeyên cihê,

85 Ji bo îdîayên dijber binihêre li Mendeloff, 2004, 372-375.

86 http://www.justice.gov.za/Trc/report/finalreport/Volume%201.pdf [2'yê Nîsana 2014'an].

87 Sancar, 2010, 100; 108-124.

lewma jî diyarkirina şêwazê îdeal ê van komîsyonan hem ne mimkun e û hem jî ne pêwîst e. Ji bo ku komîsyoneke heqîqetê bi awayê herî berdar bixebite prensîpên ku divê qîmet bi wan were dayîn bi rêya tecrûbeyên dinyayê hatine bidestxistin.[88] Pêkanîna van prensîpan bi awayekî ahengdar bi şertûmercên welatê pêwendîdar, bunyeya wî ya civakî-aborî û çanda wî ya siyasî re ne bi tenê girêdayî ye bi midaxilbûna dewletan ve, heta gelek caran ji dewletan bêhtir bi midaxilbûna rêxistinên civaka sivîl û tevgerên civakî ve girêdayî ye. Bi vî rengî, komîsyonên heqîqetê ji bo rêxistinên civaka sivîl weke amûreke nû ya demokratîkbûnê jî dikarin werin dîtin.[89] Li aliyê din, komîsyonên heqîqetê yek ji amûrên rûbirûbûna bi rabihuriyê re ne, mirov potansiyela wan û sînorên wan bi awayekî realîst bibîne hingê dikare hêviyên ji komîsyonan jî di wê astê de bihêle ku komîsyonan pûç nekin.[90]

Komîsyonên heqîqetê yên fermî ji aliyê hikûmetekê ve tên damezrandin ku dixwaze xwe ji rejîma berê qut bike û li piştê hêza dewletê heye. Xisleta wê dikare hem neteweyî û hem jî navneteweyî be. Komîsyonên heqîqetê yên ku bi beşdarî û înîsiyatîfa Civakên ku aliyê şer in, rêxistinên mafê mirovan, zanîngeh û rêxistinên din ên civaka sivîl tên damezrandin weke ne-fermî tên binavkirin û bi piranî xisleta wan neteweyî/cihî ye. Xisleta hevpar a komîsyonên heqîqetê yên fermî/ne-fermî ew e ku heqîqeta li ser binpêkirinên mafê mirovan ên di rabihuriya nêz de û di demeke diyar de pêkhatî derêxin holê û bikin ku civak siberojeke adiltir, bêhtir bi îstîqrar û demokratîk ava bike.[91] Bickford dibêje, bi xêra komîsyonên edaletê zehmet dibe ku tecrûbeyên mexdûran werin bêqîmetkirin û mandel kirin; û ev komîsyon ya rastî dikin ku bûyerên şîdetê yên berê qewimî yên ku her kes bi wan dizane – zanîna hevpar – fermî qebûl bibin.[92] Herçî Hayner e, tiştên ku ji komîsyonên heqîqetê tên hêvîkirin weha dike rêz: "derxistina holê ya suîstîmalên berê û fermî qebûlkirina wan, bersivdayîna pêdiviyên mexdûran, 'têkoşîna li dijî bêcezamayînê' û bipêşxistina şiyana hesab dayînê ya ferdî, xêzkirina xetên berpirsiyariya sazûmanî û pêşniyarkirina

88 Binihêre li González û Varney, 2013; Hakikat Komisyonları, 2014.

89 Binihêre li McConnachie, 2004.

90 Ji bo lêkolîneke berfirehtir a di biwara komîsyonên heqîqetê de binihêre li Sancar, 2010, 108-124.

91 Bickford, 2007, 994. Kurteya gotarê ya bi Tirkî di malpera Hakikat Adalet Hafıza Merkezi (Navenda Heqîqet, Edalet, Bîrê): http://hafiza-merkezi.org/kaynak.aspx?GResourceId=25&LngId=1. Ji bo tu bigihî rapora Komîseriya Bilind a Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî a bi navê Amûrên Piştî Şerî Pêkanînan Raserîbûna Hiqûqê li Dewletan û xebatên din ên li ser edaleta dema derbasbûnê ku Navendê wergerandine Tirkî binihêre li: http://hafiza-merkezi.org/kaynaklar.aspx?LngId=1

92 Bickford, 2007, 996.

reforman, bipêşxistina lihevhatinê û kêmkirina aloziya li ser rabihuriyê."[93]

Dema komîsyonên heqîqetê bi piranî tevî pêkanînên weke dozên ceza, bernameyên tezmînkirinê, reformên bunyewî bikevin dewrê, hingê çerxên ku bêhtir encamên erênî derdixin holê ne. Li aliyê din, bunyeyeke van mekanîzmayan heye ku karên nelirê, sucên aborî û sûîstîmalên din li der dihêlin û berê awirên xwe bi temamî dizivirînin ser gunehên li dijî mirovahiyê. Mirov dikare bibêje ku derketina holê ya heqîqetan xwedî fonksiyoneke zelilandinê û dermankirinê ye, lê belê ya ji vê jî girîngtir ew e ku xizmetê dike ji bo "tengkirina menzîla derewên dikarin werin qebûlkirin".[94] Komîsyon ne li ser binpêkirinên mafê mirovan ên hîna jî dewam dikin ava dibin, lê belê li ser binpêkirinên di rabihuriya nêz de qewimî ava dibin. Tevî vê, lêdikole ka çavkaniya van sûîstîmalên pêkhatî çi bû û hêza wan ji ku dihat, çawa mirovan xwe li wan kerr kir yan jî çawa hatin veşartin, pê re avahiya wê ya sîstematîk derdixe holê. Dema van hemûyan dike ew deng, şahidî û serhatiyên kesên saxmayî, mexdûr û xizmên mexdûran li pêş digire. Komîsyonên heqîqetê ne saziyên mayînde ne, karê xwe di nava mohleteke berê diyarkirî de temam dikin û divê raporeke encamê amade bikin ku rabihuriyê analîz dike û pêşniyarên ji bo siberojê jî dihewîne.

Bickford dibêje, mînaka pêşî ya xwedî fonksiyona komîsyona heqîqetê, Komîsyona Wendakiriyan a Neteweyî ya Arjantînê (1983) ye, lê belê bi bîr dixe ku beriya wê hin mînakên weke Komîsyona Lêkolîna Wendekariyan a Ugandayê (1974) jî – qet nebe di qonaxa damezrandinê de – li gorî terîfa komîsyona heqîqetê ne.[95] Di nava çil salên dawî de hin caran li heman welatî, gelek mînakên çawaniyên wan cuda peyde bûn. Hin ji wan bi qasî ku bibin mînak serketî hatin qebûlkirin. Hin jê jî bi awayê îro tê zanîn û bi awayekî giştî tê qebûlkirin, nikarîbûn fonksiyona komîsyoneke heqîqetê pêk bînin. Weke Hayner gotî, divê mirov hesabê mînakên qels û neserketî jî bike, lewma dersên girîng hene ku didin.[96] Ji ber ku ev xebat wê dersên mirov dikare ji mînakên erênî û neerênî derêxe lênekole, wê belavbûna cografî ya hewldanên navbirî ji xwe re bike esas û bi tenê hin şîroveyan bike.[97]

Lîsteya komîsyonên heqîqetê, beriya her tiştî nîşan dide ku ya rastî bêîstîsna her dewlet li ser wan bûyeran ava bûye ku damezrandina komîsyoneke heqîqetê hewce dikin. Li aliyê din piranîya welatên di lîsteyê de "welatên din-

93 Hayner, 2011, 20.

94 Binihêre li Bickford, 2007, 999; Ignatieff, 1996, 110.

95 Bickford, 2007, 997.

96 Hayner, 2011, 12.

97 Ji bo komîsyonên heqîqetê binihêre li Pêveka li dawiya pirtûkê.

yaya sêyem" ên li herêmên Efrîka, Emerîka Latîn û Rojhilatê dûr in. Komîsyonên heqîqetê yên Ewrûpa û Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê damezrandî îstîsna ne. Ma gelo sedema vê yekê ew e ku bi awayekî ku pêdivî bi komîsyoneke heqîqetê nemîne ev welat bi rabihuriyê re rûbirû bûne? Yan na, gelo komîsyonên heqîqetê yên ku bi pêvajoyên aştiyê ve tên zeliqandin, yek ji xwedanaderên mêhtingeriya nû ye? Lundy û McGovern îdîa dikin ku xebatên komîsyonên heqîqetê yên ku bi alîkariya saziyên navneteweyî yên siyasî û malî tên birêvebirin, di çarçoveya "paketeke edaletê" ya berê çêkirî de dixebitin, hewl didin civakên şer hatî serê wan bi gewde bikin li gorî modelên Rojavayî yên demokrasiya lîberal û geşedana aborî. Ew van xebatan weke awayekî mêhtingeriya nû terîf dikin.[98]

Herçî Ustundag e, dibêje, ji salên 1990'î û pê ve bi awayekî pêvajoyên aştiyê bûn xwedî xisleteke gerdûnî, wan peyva "mêhtingerî" li bazarê betal kir û bi awayê ku bi kêra desthilatdaran werin bi rê ve diçin. Bibîrxistina peyva "mêhtingeriyê" wê tiştê jî bi bîr dixe ku pêvajoyên aştiyê bi kişandina ser şerî ya balê dikin ku xuya neke, ango "deynekî dîrokî, berpirsiyariyeke bi rengekî din, sûdwergirtinekê, şêwazekî peywendiya newekhev". Ev yek anîna rojevê ya "têkiliyeke deyndêriyê" ye ku bi peyvên mîna aştî, lihevhatin, çekdanîn, pêkanîna demokrasiyê biedilê.[99] Deynê ku miletên mexdûr doza wî dikin ne bi tenê ew nirxên madî û watewî ne ku di pêvajoyên şer de ji dest dane, ew di heman demê de doza rûmeta xwe ya di pêvajoya mêhtingeriyê de xespkirî û erka xwe dikin ku pê karibin bi xwe tercîhên xwe yên siyasî û yên di biwara jiyanê de bikin. Dibe ku tehsîlkirina vî deynî ne mimkun be jî, lê belê em dibînin ku gerînên li edaletê yên ne-fermî û cihî yên mixalifê paketên lihevkirinê yên ku mirov dikare navê pîşesaziya aştiyê ya navneteweyî li wan bike, vê pîşesaziyê bi rengê ku li xêra mexdûran be vediguherînin.

### *Xebatên heqîqetê yên ne-fermî*

Otorîteya dewletê ya li pişt komîsyonên heqîqetê yên fermî, çavkaniyên wê yên malî, derfetên wan ên xwegihandina belge û delîlan û ya ji hemûyan jî girîngtir statu, qebûlbûn û darîçavbûna wan, bi piranî xebatên wan rewa dike û dike ku encamên xebatên wan bêhtir di rewacê de bin. Li aliyê din wisa tê hizirkirin ku tesîra civakî ya wan xebatan girîngtir tê dîtin ku

98 Lundy û McGovern, 2008, 276-7. Lundy û McGovern rexneyan digirin li xebatên bi destê "pisporên" Neteweyên Yekbûyî hatin birêvebirin bi îdxalkirina amûrên edaleta dema derbasbûnê li Kosovo, Tîmûra Rojhilat, El Salvador, Guatemala, Peravên Diranên Fîlan, Lîberya û Haîtiyê.

99 Üstündağ, 2013.

sêwirandin, birêvebirin, xislet û encamên pêvajoya vegotina heqîqetê bi beşdariya endamên wê civakê yan jî bi beşdariya mixateban tên organîzekirin.[100] Bickford li van hewldanan dikole weke xebatên mîna komîsyonan û projeyên heqîqetê yên navendên belgekirinê yan jî rêxistinên din yên ne-hikûmetî.[101] Ew dibêje ku xebat û projeyên bi vî rengî "pêşenga/nîşana" dadgehkirinekê yan jî komîsyoneke heqîqetê ne ku wê di demeke ne dûr de were kirin yan jî damezrandin. Ew wekî din mînakên "dadgehên/celseyên qelp" jî ku tetbîqkirina ne-fermî ya dadgehên ceza ne û erka wan a dadgehkirinê nîne, weke yekê ji projeyên ne-fermî yên heqîqetê dibîne (weke mînak, Dadgeha Jinan a Tokyo ya ku sala 2000'î li pêkanînên Japonya yên "koletiya cinsî ya eskerî" yên dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn dikola). Ew proje û xebatên hafizeçêkirinê yên li ser rûbirûbûna bi rabihuriyê re yên huner, şano, helbest û wêjeyê jî di çarçoveya xebatên heqîqetê yên nefermî de dinirxîne. Em bi tenê bi kurtî navên hin projeyên heqîqetê yên nefermî û mînakên din li vir bibin:

Komeke parêzeran mezbeteyên dozê yên di biwara eskerên dema darbeya eskerî de ku bi efûyeke giştî hatin berdan, kopî kirin û bingeha rapora lêkolînê ya bi navê Brezîlya: Careke din Na (Brasil: Nunca Mais) pêk anîn (1985).[102]

Komek parêzer, doktor û çalakgerên mafê mirovan ji koma hevpeyvînên bi sedan mexdûrî re û daneyên statîstîkî hîmê rapora lêkolînê ya bi navê Uruguay: Nunca Más danîn û pêşengî kirin ji hewldana SERPAJ (Servicio Paz y Justicia – Xizmeta Aştî û Edaletê).[103]

Dêra Katolîk a Guatemalayê projeyeke serbixwe ya bi navê Dermankirina Bîra Dîrokî (Recuperación de la Memoria Histórica) koordîne dikir, vê projeyê xwe disipart berhevkirina şahidiyên mexdûran. Ev proje bû pişt ji bo xebatên Komîsyona Ronîkirina Dîrokî ya Guatemalayê û rapora encamê ya bi sernavê Guatemala: Nunca Más amade kir (1998).[104]

Du rêxistinên civaka sivîl li Zîmbabweyê (Saziya Çavkaniyên Edlî û Komîsyona Katolîk ji bo Aştî û Edaletê) nerazîbûn nîşanî neweşandina rapora komîsyona fermî û ragihandina efûya giştî dan, wan ji ber vê yekê xebatên berhevkirina delîl û şahidiyan bi rê ve birin. Encama van xebatan sala 1997'an bû pirtûka bi navê Bidawîkirina bêdengiyê, avakirna aştiya heqîqî: li ser qerqeşûna li

100 Lundy û McGovern, 2008, 271.11

101 Bickford, 2007, 1003.

102 Bickford, 2007, 1005-1007; http://bnmdigital.mpf.mp.br/#!/

103 Bickford, 2007, 1007-1009; http://www.serpaj.org.uy/serpaj/

104 Bickford, 2007, 1010-1012; http://www.odhag.org.gt/html/Default.htm

Matabeleland û Midlandsê raporek 1980-1989.[105]

Ji bo destekdayîna pêvajoya aştiyê ya bi pêş diket, Ofîsa Bakurê Îrlandayê ya di serê salên 1990'î de damezrandî sala 1997'an Komîsyona Mexdûran ava kir. Vê komîsyonê nexasim jî xebatên ji bo tezmînata madî, şêwirmendiya trawmayê û xizmetên destekê ji bo mexdûran meşandin. Komeleya Bakurê Îrlandayê ya ji bo Çavdêriya Failan û Vegerandina wan li Civakê jî xebat dikirin ji bo berdana hikûmxwarên ser bi komên paramîlîter û zêdekirina wan li pêvajoya edaleta selihandinê.[106]

Xelkê Bajarê Bakurê Îrlandayê Ardoynenê Rapora Bloomfield ya Komîsyona Mexdûran ya li ser qewmînên dema jê re "Bêaramî" ("Troubles") tê gotin kêm dît, wan hevpeyvîn kirin bi malbatên 99 kesan re ku li bajêr hatin kuştin û bi navê Ardoyne: Rastiya negotî (Ardoyne: The Untold Truth) raporek amade kirin (2002).[107]

Bi înîsiyatîfa Zanîgeha DePaul a li Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê Projeya Dîrokê ya Iraqê hat sazkirin, armanca projeyê lêkolîna binpêkirinên dema desthilatdariya Baesê bû. Proje di navbera 2005 û 2009'an de xebitî û li ser şahidiyên mexdûran ava bû.[108]

Ji bo lêkolîna qirkirinên dema Kamboçyaya Demokratîk/Rejîma Kimerên Sor û aşkerekirina berpirsiyaran, Navenda Belgekirinê ya Kamboçyayê (DC-Cam) weke baskekî Bernameya Qirkirinê ya Kamboçyayê ya Zanîngeha Yaleê sala 1995'an hat damezrandin. Vê navendê xebatên dîroka devkî, pirtûk, kovar û filman meşandin ku zemîn amade kirin ji bo Dadgeha Kimerên Sor a ku bi hevkariya Hikûmeta Qraliyetê ya Kamboçyayê û Neteweyên Yekbûyî hatibû damezrandin.[109]

Aktîvîsta mafê mirovan Natasa Kandic sala 1992'yan li Belgradê Navenda

105 Bickford, 2007, 1012-1014; http://www.hrforumzim.org/publications/reports-on-political-violence/reaking-the-silence/

106 Aiken, 2010, 176-178. Ji bo agahdariyên hûrgulî yên di biwara vê komîsyonê de binihêre li http://www.cvsni.org/. Aiken, dibêje ku Yekîtîparêz berdana hukimxarên paramîlîter ên komarxwaz yan jî yekîtîparêz weke "qurbanîkirina edaletê" yan jî "bêedaletî" dibînin, û herçî neteweparêz in ku şerî weke têkoşîneke siyasî ya li dijî dewleteke neadil terîf dikin, destekê didin berdana hukimxwaran.

107 Lundy û McGovern, 2008; Bickford, 2007, 1014-1016. Lundy û McGovern balê dikişînin ser serdanên welatên hev ên endamê Komîteya Avakirina Bîrê ya Ardoynenê û endamên projeya Guatemala: Nunca Más û hevkariya wan. Ji bo agahiyên kite bi kite yên di biwara xebata li Ardonynenêbinihêre li http://cain.ulst.ac.uk/issues/victims/ardoyne/ardoyne02a.htm.

108 Bickford, 2007, 1018-1020; http://www.law.depaul.edu/centers_institutes/ihrli/projects/iraq.asp.

109 Bickford, 2007, 1020-1023; http://www.dccam.org/

Hiqûqa Insanî damezrand. Vê navendê ji bo gunehkarên şerî derêxe pêşberî Dadgeha Ceza ya Navneteweyî tevî Navenda Lêkolîn û Belgekirinê ya Sarayevo û Dokumenta ya li Zagrebê kar kiriye.[110]

Li Spanyaya ku "bi rabihuriya xwe re rûbirû nebûye û weke mînakeke ku baş veguherîbe demokrasiyê" tê nîşan dan, Komeleya Derxistinaholê ya Bîra Dîrokî ji pêşengên gerîneke li edaletê ye ku piştî bi sîh salan xwe nû dike. Ev komele ji sala 2000'î ve dixebite da ku bigihîje bermayiyên cenazeyên wan qurbaniyên di serdema Franco de di gorên komî de hatine veşartin.[111] Golob dibêje, Spanya di pêvajoya bihurînê ya ji çanda edaleta dema derbasbûnê ber bi "siyaseta piştî edaleta dema derbasbûnê" de ye, ji demekê ku tê de bîra şexsî dûrî meydana dewletî û fermî hatiye girtin, bîra kolektîf jî xistine "sarinca qeşaker" derbasî dema "helandina qeşaya rabihuriyê" bûye ku sala 2007'an zor li hikûmeta Zapatero kir Qanûna Bîra Neteweyî derêxe. Yek ji lingên van xebatan jî ew têkoşîna ji bo "zêdekirina li wê serhatiya mezin a neteweyî" ya "Spanyaya din" e. Avakirina vê "serhatiya mezin" dewam dike û "Spanyaya din" jî di serdema Franco de weke "dij-spanyolê ji bo netewe tehlûke ne" dihatin binavkirin, dihatin tinekirin û êşkence li wan dihat kirin.[112] Spanya mînakeke baş e ku nîşan dide rûbirûbûna bi rabihuriyê re belkî karibe were bipaşxistin, lê belê tu carî nikare were betalkirin.

Li Libnanê malbatên ku xizmên wan ji aliyê artêşa Îsraîlê ve hatî wendakirin, ji bo ku li xizmên xwe bigerin sala 1982'yan hatin cem hev û Komîteya Malbatan damezrandin. Sala 1990'î jî malbatên ku Rêxistina Îstîxbaratê ya Sûrî xizmên wan girtin û wenda kirin xebata bi navê Piştgiriya Libnaniyên Mişext û Girtî (SOLIDE) dan destpê kirin.[113] Tevî van, UMAM D&R a ku sala 2004'an hat damezrandin, projeyên arşîvê, xebatên bîrê û atolyeyên teknîk bi rê ve dibe, ji mînakên girîng in.[114]

Kar û xebatên Zochrotê îlhamê didin mirovan, ev komele hewl dide cihûwarên Filistîniyan ên ku Îsraîlê sala 1948'an texrîb kirin, "felaketa" Filistînî pê re rûbirû bûn bi navê wê yê bi erebî "nakbe"yê bi bîra civaka cihû ya li Îsraîlê bixe, û ji bo şert û mercên guncaw ji bo "Vegera Penaberên Filistînî" biafirîne wêneyan, şahidiyan, nexşeyan berhev dike, wan diweşîne û serdanan organîze

110 Bickford, 2007, 1023-1025; http://www.hlc-rdc.org/

111 http://www.memoriahistorica.org.es/joomla/; binihêre li Golob, 2008, 134.

112 Binihêre li Golob, 2008, 135. Wekî din binihêre li Escudero, 2014.

113 http://www.solidelb.org/; Jaquemet, 2009;

114 www.umam-dr.org

dike ber bi cihûwarên şên ên berê yên Filistînê ve.[115]

Ev mînak ne ku bi tenê gerîna li edaletê xurt dikin û dewlemend dikin, ew di heman demê de di lîsteya mînakên erênî de ne ku bipêşketinên li Tirkiyeyê pir kêm dikarin bikevinê. Ji ber vê jî ev beşeke herî zêde ya cesaretê dide vê xebatê pêk tîne. Hewldana Nifşê 78'an sala 2007'an Komîsyona Lêkolîna Rastiyan û Edaletê ya Girtîgeha Diyarbekirê damezrand; armanca wê ew e ku raporekê amade bike di encama şahidiya kesên berî û piştî darbeya eskerî ya 12'ê Îlona 1980'yî li Girtîgeha Diyarbekirê ragirtî, êşkence li wan bûyî, kesên xizmên wan wendakirî de û bi agahî û belgeyên wê demê. Xebatên vê komîsyonê hîna dewam dikin.[116] Hewldaneke din a girîng Navenda Xebatên Heqîqet, Edalet û Bîrê ye ku sala 2011'an li Stenbolê hat damezrandin; armanca wê belgekirina binpêkirinên mafên mirovan li gorî standartên gerdûnî ye û pê re jî bîrê biparêze û xizmeta gerîna li edaletê bike.[117] Komeleya Mafê Mirovan (1986) jî ji bilî karûbarên xwe yên din, lîste, nexşe û çavkaniyên girîng berhev dike di biwara nexasim jî wendakirî û gorên komî yên li Kurdistanê de.[118] Komeleya Alîkarî û Piştgiriyê ya Kesên Xizmên wan Wendakirî ya Mezopotamyayê sala 2007'an hat damezrandin, ew bi awayê ku milîtanên PKK'ê jî bihewîne li ser wendakiriyan û kuştinên failên wan nediyar dixebite.[119]

Lîsteyeke din a ku dikare mînakên li Tirkiyeyê bihewîne, dibe ku lîsteya tevger û rêxistinên civakî be; ev tevger û rêxistin ne bi zanînên diafirînin û heqîqetên derdixin holê, lê belê bi zexta civakî û siyasî ya diafirînin û bi "avakirina bîrê" gerîna li edaletê xurt dikin, zemîn amade dikin ji bo Darizandinan û komîsyonên heqîqetê. Mînaka van tevgeran a herî navdar Dayikên Plaza de Mayo ye; mînakeke van tevgeran ku pêk tên ji hevdîtin û bibîranînên birêkûpêk ên li meydanên gelemperî yên xizmên wendakiriyan bi armanca fêrbûna aqûbe-

115 http://zochrot.org/en

116 http://www.78li.org/index.php?option=com_content&view=article&id=134:diyarbakr-cezaevi-gercekleri-aratrma-ve-adalet-komisyonu&catid=49:hakikat-komisyonu&Itemid=64

117 http://hafiza-merkezi.org/ "Database ya kesên bi zorê hatîwendakirin" û raporên di biwara kesên bi zorê wendakirî de pêşiyê vedikin li komîsyoneke heqîqetê yan jî Dadgehên Ceza yên ku mumkin e siberojê werin damezrandin. Wekî din, yek ji xebatên navendê malpera "Pêkanîna bîrê li Tirkiyeyê" ji wan navnîşanan e ku mirov dikare tê de bibîne "mînakên erênî yên pêkanîna bîrê bi destê gelek kom û ferdên di dema dawî ya Împeretoriya Osmanî û ji destpêka damezrandina Komara Tirkiyeyê û vir ve rastî neheqiiyan hatine".

118 http://www.ihd.org.tr/

119 Hîna malpereke Meya-Derê nîne. Di malpera Navenda Bîrê (Hafıza Merkezi) de behsa projeyên Meya-Der beşdarî dibe yan jî bi rê ve dibe, tê kirin; hin ji van projeya wendakiriyan û projeya bankeya DNA'yê ne.

ta wendakiriyan, li Tirkiyeyê jî heye.[120] Em behsa piştgiriya Dayikên/Mirovên Şemiyê dikin ku serê pêşî pêk dihat ji jinên li Meydana Galatasaray a li Stenbolê civiyan, û niha ji bilî Stenbolê li bajarên cihê yên Kurdistanê jî dicivin û mêr jî tevlî dibin.[121] Malbatên ku komeleyek li Katmanduyê damezrandin bi armanca ku li xizmên xwe bigerin yên ku dewleta Nepalê ew wenda kirin, xebatên vê komeleyê jî mînakeke piştgirî û têkoşînê ya dişibe yên navbirî ye.[122] Tevî ku saziyên fermî pûte bi herduyan jî nadin, bi temamî weke Dayikên Plaza de Mayo ji bo gerînên li edaletê yên civakî yên demdirêj zemînekî girîng pêk tînin. Jaquemet bi bîr dixe ku lêgerînên li aqûbeta kesên hatî wendakirin "ne têkildarî miriyan lê têkildarî zinyan e" û "welatekî sax û bi silamet nabe ku li ser gorên komî were avakirin".[123] Aliyê elaqedarî zindiyan bingehê beşa duyem a xebata me pêk tîne ku em ê tê de minaqeşeya têgehên bîr, şîngirêdan, kîn/silbûn û dostaniya siyasî bikin.

120 Ji sala 19774an ve her roja pêncşemê jin tên cem hev li meydaneke li Buenos Airesê jib o fêrbûna aqûbeta kesên di serdema darbeya eskerî de li Arjantîê hatin wendakirin. Ev jin êdî bi nave meydanê re bûn yek. Sala 1986'an bûn du beş. Hikûmetê xwest bêyî ku tu lêpirsînê li dijî failan bide destpêkirin, cenazeyan bide malbatan. Jinên ku li ber hikûmetê rabûn Komeleya Dayikên Plaza de Mayo damezrandin. Jinên ku li pêşniyarên hikûmetê bêhtir vekirîbûn jî Xeta Damezrîner a Dayikên Plaza de Mayo pêk anîn (binihêre li Goddard 2007). Tevî vê dubeşbûnê jî em bi bîr bixin ku herdu kom hîna jî li heman meydanê bi hev re çalakiyê li dar dixin.

121 Piştgiryeke din a li Tirkiyeyê yekîtiya Şehit Anneleri (Dayikên Şehîdan) e ku ji bo zarokên xwe yên di şerê Artêşa Komara Tirkiyeyê bi PKK'ê re bi rê ve birî mirî hatine cem hev. Li aliyê din di navbera Dayikên Şemiyê û Şehit Anneleri de cihêtiyen mezin hene di warên siyasîbûn, gerîna li edaletê û têgihiştina aştiyê de. Minaqeşeya di biwara van cihêtiyan de di beşa sêyem a vê xebatê de cihê xwe digire.

122 Binihêre li Robins, 2011.

123 Jaquemet, 2009, 89.

## *Beş II*
## Siyaseta di biwara rabihuriyê de

Têkiliya bîrê, şîngirêdanê,lêborînê, rikdarî û silbûnan [xeydê] bi nasnameya kolektîf re û pê re jî bi awayekî neyekser bi siyasetê re têgehên damezrîner pêk tînin ji bo tişta ku em dikarin weke siyaseta di biwara rabihuriyê de bi nav bikin. Derfeta me çêbû ku di hevpeyvînan de ku hîmê lêkolîna me pêk tînin, em bi mexdûran re li ser hinekan jin van têgehan bipeyivin. Em ê di beşa piştre de behsa wê yekê bikin ka ew wateyên çawa li van têgehan bar dikin. Li vir bi xwe, em cih bidin beşên girîng yên nîqaşên dewlemend ên li ser van têgehan.

### *Bîr (Hafize)*

Nihêrîneke bi giştî tê qebûlkirin e ku bîr xwedî bunyeyeke hilbijêr û guherok e, ango her cara ku em berê xwe didin bîra xwe, li gorî dem û rewşa em tê de bibîranînên din ên li ser heman kêliyê em dikarin bibînin. Naxwe, em dikarin bîrê ne weke qotiyeke birbîranînan a ku hin obje, dîmen, hest tê de tên berhevkirin yan jî hebûneke pasîf lê belê weke hema hema hebûneke zindî bibînin. Ne mimkun e mirov bibêje bîr ileh elaqedar e bi rastiyên rabihuriyê re, ango bîr ne dîrok e.[124] Li aliyê din çawa ku Ricoeur dibêje, tişta ku bihurbariya di navbera bîr û dîrokê de misoger dike şahidî ye, lewma "li ber destê me tiştekî ji bîrê çêtir nîne ku nîşanî me bide tişta tê bîra me, beriya ku em aşkere bikin qewimiye, bûye."[125] Ev rewşa "şahidiyê" bi xwe destwerdaneke têkiliya di navbera dîrok û bîrê de bi awayê ku vê têkiliyê bi rengê ku bi kêra bîrê were birêkûpêk dike. Weke ku Sancar dibêje, "bi rengê ku guhertîbe ji 'dîroka" ji berê de di destê desthilatdariyan û otorîteyên zanistî-profesyonel de ye, 'bîr' ... têgehek e ku nûneriya tolhildana wan kesan dike ku piçûk tên dîtin, tên tehkîrkirin, nûneriya 'dîroka piçûk' a kesên nikarin xwedî îdîa bin li ser 'dîroka mezin' dike."[126] Berevajî zemanê desthilatdariyan ê yekser dewam dike (dîrok), zemanê xelkê (bîr), di nava jiyana rojane ya mirovan de, di arşîv, abîdeyên bibîranînê û heta mekanên bibîranînê nebin jî bi "reqsê" û "xwehildanê" tevgera xwe dewam dike.[127]

124 Rosoux, 2004, 161.

125 Ricoeur, 2004, 21.

126 Sancar, 2010, 65-66.

127 Binihêre li Gillis, 1995, 6; Özsoy, 2014, di nava rûpel 311'ê de. Özsoy dibêje, têkoşînên ji bo mekanên bibîranînê bi rêya "hevtesîrkirinên di asta jiyana rojane de yên di navbera bîr û cih/mekan de pûç dikin hewldanên muqtedîran ên yekrengkirina zeman û mekanê, şûştina zeman û mekan ji pratîk û texayulên heterojen yan jî dij-hegemonîk ên hafizeyî. (2014, 313). Vegotinên Kurdan hilberandî di biwara darvekirina Şêx Seîd li Meydana Deriyê Çiyê li Diyarbekirê û gora wî ya winda de û pratîkên rojane

Herçî aliyê kolektîf ê bîrê ye ku pir şexsî diyar e, di nava têkiliya navbera bîr û nasnameyê de ye. Nasnameya kesê/î pêk tê ji hebûna haya wê/wî ji kîbûna wê/wî, awayê fikirîna wê/wî, çi-kirina wê/wî. Herçî hiş e, bi hizirînê tê bidestxistin; hizirîna li ser qewmîn, tiştên kirî, tiştên bûyî, watedarkirina van hemûyan, binavkirina wan kesê/î dibe ber bi wê rêyê ve ku bigere li tişta ku kesê/î dike ew bi xwe, hayil be ji kîbûna xwe, û bîr bibe ka ew kî ye. Ji bo ku mirov xwedî hiş be û bîr bibe divê bihizire, ji bo bihizirê jî divê bîne bîra xwe. Bi vî awayî, têkiliya di navbera bîrê û nasnameyê de tê danîn.[128] Em dikarin bîra kolektîf jî hem weke parçeyekî vê têkiliyê û hem jî weke ku paralelî vê têkiliyê be, terîf bikin. Heke tiştên kesek bi bîr tîne û awayê bibîranînê girêdayî çerxên civakî be ku dikin ku kes xwe yek bibîne bi bûyerên xwedî xisletên damezrîner ji bo civaka wê/wî, hingê jî yek ji hêmanên ku bîra ferdî pêk tîne, bîra civakî/kolektîf e, yan jî bi gotineke din nasnameya civakî/kolektîf e.[129] Di vê rewşê de mirov dikare bîra kolektîf terîf bike weke hêza pêşandana daneheva şopên bûyerên tesîr kirine li seyra dîrokî ya civakekê û bibîranînên hevpar bi rêya cejn, merasîm, bibîranîn û pîrozbahiyan.[130]

Hêza pêşandanê ango derketina meydana dewletî/giştî girîng e; em ê elaqedarî şîngirêdanê qasekê paşê minaqeşe bikin, lê em niha bi kurtî behsa wê yekê bikin ka di rewşa şîngirêdanê de "dika" pêşandanê ku der e. Helbet tevahiya meydanên siyasî û dewletî/giştî dikarin di warê kolektîfkirina bîr û şînê de weke mekanekî ji serî heta binî guncaw werin nirxandin. Lê belê nexasim jî mekanên weke girtîgeh, wargeh, navendên êşkencê, komkujiyên komelî yan jî gorên komî yên rê vekirî li ber êş û şîna kolektîf dikarin bi rengê heyî werin parastin yan jî werin veguherandinî muzexaneyê yan jî rengekî din ê meydana bibîranînê û pê re mekanên bîra siyasî werin afirandin. Hebûna mekanên bi vî rengî, nexasim jî ji bo xizmên kesên goreke wan jî nîne wê bêhtir bi qîmet be. Ya rastî mirov dikare mekanên bibîranînê, weke goristanan, weke wan cihan bibîne ku mirovên şînê girêdidin nêzî mirovên ji dest dane û mirovên heman êşê parve dikin, dike.

Bîra kolektîf hêza derxistina ser dikê ya bibîranînan ango hêza xwe nîşandana

---

û siyasî yên ku ev vegotina çavkaniya wan in, nîşan didin tevî ku ji ber nebûna gora Şêx Seîd neafirandina mekanekî bibîranî jî Meydana Deriyê Çiyê hatiye veguherandinê "hawîrdoreke bibîranînê" (336-337).

128 Ricoeur, 2004, 104-105.

129 Binihêre li Sancar, 2010, 42-43. Sancar bi awayekî berfereh di heman pirtûkê de dadikeve bi mijarên cudayîbûn û terîfên bîra ferdî-kolektîf; bîra ragihadinî-çandî; bîra tomarker-fonksiyonel, ew her weha dadikeve bi têkiliya bîra negatîf û bibîranînê, xebatên bîr û bibîranînê jî (38-62). Wekî din binihêre li Assmann, 2001.

130 Ricoeur, 2004, 119.

li meydana giştî, digire ji berê xwe dane hev a ferdên xwedî heman bibîranînê, hatina wan a cem hev, hevgirtina wan. Bi ser de jî, ev rewşa berê xwe dane hevê, ne bi tenê di nava wan kesan de ye ku di heman heyamê de dijîn, ber bi nifşên siberojê jî berêxwedanekê dihewîne û bi rengekî bivênevê elaqedarî zimên e. Derketina meydana dewletî/giştî ya bîra kolektîf, ji yên din re kirina behsa bibîranînan, bi wateya çîrokkirina bibîranînan jî yekser bi zimanê kolektîf re elaqedar e. Bi vî awayî, bîra kolektîf ne bi tenê parastina bibîranînan e, her weha ya mekanên bibîranînan dihewînin û ziman e jî, di warê parvekirina bi kesên din re li meydana giştî ye, ew teqabilî çalakbûneke kolektîf jî dike. Heke em kesên ku têkiliyên me yên nêz bi wan re hene, û mafê me heye em hin bibîranînên xwe li wan bar bikin, weke tebeqeya di navbera bîra ferdî û kolektîf de binirxînin, hingê em dikarin têkiliya welatiyên ku hêvî ji wan tê kirin destekê bidin jiyana siyasî ya hevpar weke yekê ji van têkiliyên nêz bibînin.[131] Ricouer têkiliyên nêz weha terîf dike; bi awayekî dualî (mutual) û wekhev yên ku hebûna kesê/î dipejirînin, û yên ku kes hebûna wan dipejirîne.[132] Hingê mirov dikare têkiliyên nêz ên ku Ricouer wan terîf dike weke dostaniya siyasî ku Arîstoteles weke têkiliya mirovên adil û dilpak dibîne, bibîne ku sînorên dostanî û civaka siyasî diyar dikin.

Bi vî awayî têkiliya di navbera dostaniya siyasî ya li ser hîmê edaletê ava û bîra kolektîf de jî derdikeve holê. Yek ji tiştên ku bîra kolektîf vediguherîne mijareke siyasî jî ew e ku bîra kolektîf a der barê qirkirinan de ye ku tevî endamên din ên civaka wan hatiye serê ferdan. Bibîranînên ferdî yên di biwara kesên jidestdayî de tevî biryara hevpar a li ser mijarên kî, wê çi, çima û bi çi awayî bi bîr bîne, bîra kolektîf pêk tîne. Bîra kolektîf a ku mexdûr xwedî lê derdikevin tehlûke ye ji bo bîra fermî ya dewletên fail û rewabûna wan; ew bîra kolektîf a mexdûran deftera tiştên divê werin bibîranîn û werin jibîrkirin reş dike, serhatiyên serkeftinê dilewitîne. Dewlet bi tinehesibandina van qirkirinan hewl didin wan ji dîrokê bibin yan jî rewa bikin, pê re jî hewl didin bîra kolektîf a tehlûke û ne-fermî ya em behsa wê dikin ji holê rakin. Bêqîmetkirina jidestdanên mexdûran, destûrnedana şîngirêdana wan, bêhurmetiyên li beramberî şîna wan ji dûvikê van hewldanan in. Dostaniya siyasî, têkiliyek e ku zehmet e were danîn di navbera welatiyên hevparên van hewldanan û mexdûran de. Bihevrejiyana beriya danîna vê têkiliyê, bi tenê wê di nava cihêbûnekê de be bi rengê ku Odabaşi terîf dike: “ew ê neînin bîra xwe, û em ê jî ji bîr nekin.”[133]

131 Binihêre li Ricoeur, 2004, 131.

132 Ricoeur, 2004, 132.

133 “Ressam Odabaşı: Onlar hatırlamaz ama biz unutmayız (Ew naînin bîra xwe lê em ji bîr nakin)” , http://www.ajansafirat.com/news/kultur/ressam-odabasi-onlar-hatirlamaz-ama-biz-unutmayiz.htm [13’ê Nîsana 2014’an].

Ew ji bo çi naînin bîra xwe? Arendt dibêje, rêya herî ewle ji bo gunehkarekî da ku neyê girtin û cezakirin ew e ku sûcê xwe ji bîr bike, neîne bîra xwe û li serê zêde nefikire.[134] Fikirîn û bibîranîn bi xwe "rêya insanî ye ji bo me hemûyan da ku em li vê dinyaya ku em weke biyaniyan hatinê, cihê xwe bigirin, û şaxên xwe berdin."[135] Heke wateya devberdana ji fikirînê destberdana ji jiyana bi yên din re be, hingê wateya jibîrkirinê jî ev e. Heke mimkun be ku mirov bi qasî nefikire neîne bira xwe, bi qasî neîne bîra xwe poşman nebe, hingê ne mimkun e ku ewên ku sûc kirî, pê re jî ji yên din û dinyayê veqetiyayî, bêyî ku poşman bibin vegerin cihê jê veqetiyayî. Bîra ku mexdûr hewl didin biparêzin ji bo ku fail tişta kirî ji bîr neke, timî lê bifikire û vegere cihê jê veqetiya jî derfetekê pêk tîne. Bi ser de jî, fikirîn çalakiyeke bi rastî ye; mirovê li ser xwe bifikire xwe vediguherîne kesekî, kesayetiyekê.[136] Reda fail a vê çalakiyê, çawa ku dema sûc kirî xwe ji karê fikirînê dûrxistina wî nîşan dide ku ji rewşa xwe ya dema ew sûc kirî derneketiye, ne dildar e ku melekeya xwe ya mihakemeyê ji bo derxistina ji hev a qencî û xirabiyê bi kar bîne. Arendt dibêje, "tevî bîrokebûna" Eichmann, wî li dadgehê bûyerên ji bo wî girîng bi heman klîşeyan vegotin, ev kêmasiya wî ya axaftinê bû, û ev kêmasî elaqedar e bi kêmasiya fikirînê re: "sedema ne mimkunbûna danûstandina bi Eichmann re ne ew e ku derewan dike, sedem ew e ku wî zirxê herî ewle li xwe kiriye li dijî peyv û kesên din, û girêdayî vê jî li dijî rastiyê."[137] Ev zirx tedbîreke li dijî fikirîn û bibîranînê. Bi vî awayî fail naîne bîra xwe. Naxwaze ku mirov bîne bîra wî. Ji her tişta ku rabihuriya wî tîne bîra wî, weke ku ji reşeke şevê bireve, direve. Lê belê karê rabihuriyê ev e, ew pir tê serdana me, emên ku dixwazin li dinyayê bi vî halê wê, ango bi halê wê yê ku niha veguheriyê, bijîn.[138] Vegotina wê yekê, ka dinya çawa veguheriye vî halê xwe yê niha; ev serdan ji bo mexdûran parçeyeke destjênabe ya jiyana wan e, wateya şîna wan e.

### ***Şîngirêdan***

Weisband dibêje, "mirov bi tena serê xwe diêşin, lê bi hev re şînê girêdidin."[139] Bêyî ku şahid hebin, şîn jî nikare were girêdan, û şîn kerba şexsî vediguherîne tecrûbeyeke kolektîf. Ne bi tenê şîna ji bo xizmên me yên şexsî, em bi israr şîna xizmên me yên siyasî ya êşa ji bo jidestdayiyên xwe jî par ve dikin, ya

134 Arendt, 2003, 94.
135 Arendt, 2003, 100.
136 Arendt, 2003, 105.
137 Arendt, 2012, 59.
138 Arendt, 2003, 270.
139 Weisband, 2009, 363.

rastî, ji ber ku em dikarin vê şînê bi israr par ve bikin, em dikarin di warê hestan, civakî û siyasî de nêzî wan bin. Nexasim jî mexdûrbûna dibe sedema kerba şexsî, heke xwedî xisleteke siyasî û kolektîf be, hingê sînorê di navbera yê êşê dikişîne û yê şînê girê dide zelûl û tine dibe; şîn kerba yê din jî dihewîne û bi vî awayî israra şîngirêdana bi hev re dibe xwedî teşeyeke siyasî, vediguhere awayekî siyasetê.[140] Derrida jî dibêje, ezmûn û nêrîtên herî girîng ên ku civakekê dadimezrînin û dikin ku dewam bike, şîngirêdan û sozdayîn e. Lê belê ew her weha nazikbûna van ezmûnan jî qebûl dike; şîngirêdan û sozdayîn ne ezmûnên hewce ne, ew bi tenê muhtemel in; dema ku ne bi vî rengî û bi wî rengî pêk werin, ew îhtîmala civakeke ku peywateke civakî ya bi temamî cihê çêke, dihewînin.[141] Awayê ezmûnkirina şîngirêdan, sozdayînê û hîmê li ser hatî avakirin, diyar dikin ka ew civak berê çawa jiyaye û siberojê wê çawa bijî. Belkî jî ji ber vê yekê, dema dewletên serdest ji bo neteweya ku ew weke hêmana avaker a milet terîf dikin, tesbît dikin ka ev adet wê çawa pêk werin û wan fermî dikin, hingê nêrîtên şîngirêdan û sozdayînê yên miletên din xesp dikin.

Têkiliya ku Marc Nichanian di navbera şînê û aştiyê de datîne gelekî watedar e: " yekane rêya ku dike aştî di navbera aliyan de pêk were ew e ku herdu alî jî rêzê bigirin ji şînê re" û paşê jî şînê weke tişta "mirinê watedar dike", "lihevhatina bi mirinê re pêkan dike".[142] Naxwe, wateya rêzgirtina ji şînê re ev e: destwernedana pêvajo, merasîm û bibîranîna kesê li hemberî we ya watedarkirina jidestdayîna xwe û lihevkirina bi mirinê re û heta heke mimkun be hewldana ji bo wê yekê ku mirov bike ku ew kes wê pêvajoyê bi awayekî serfiraz û mamûr di ser xwe re derbas bike. Wateya wê ew e ku mirov pratîkên şîngirêdanê yên wê civakê li ber çavan bigire, çawa ku Das terîf dike, li meydana siyasî bûna xwedî wate ya sembol û usûlên şîngirêdanê yên wê civakê divê mirov li ber çavan bigire.[143] Helbet ev hewldan bangek e ji bo hevparbûna pêvajoya şîngirêdanê ya kesê li hember; ji aştiyê û wê de jê re daxwaz û îradeya bi hev re jiyanê divê. Mirov dikare ji vê re jî bibêje dostaniya siyasî. Jixwe Nichanian jî dibêje "heke em ne aştiyê lê dostaniyê tercîh bikin, hingê dibe ku em hêvîdar bin ku bi rengekî mirî jî wê li ber çavan werin girtin."[144] Lê belê, em dostaniya siyasî jî deynin aliyekî, meyla dewleteke tehekumparêz û fikra milet a ku nûneriya wê dike aştiyê jî li ber çavan nagirin, heta aştiyê weke rewşeke

140 Binihêre li Weisband, 2009.

141 Derrida, 1995b, 355.

142 Nichanian, 2011, 17, 48.

143 Binihêre li Das, 2003, 301.

144 Nicahnian, 2011, 15.

wekheviyê ango jidestdana serweriyê terîf dikin, xespkirina şîngirêdanê ye.

Nichianian di serdema Osmaniyan de Felekata rêvekirî li ber "heta bi radeya herî heyatî tinekirina" Ermeniyan weha terîf dike; ji jidestdan û xespa can, mal û nirxan û wêde, xespa îfadekirina van jidestdanan, xespkirina hêza sembolîk a îfadekirina "tinekirina xwîn, şîr, şerab, zêr, mermer... leheng û bavan" e.[145] Ew dibêje, sîstema tehekumê "xwediyê wê hêzê ye ku hêza şînê ya milet... kapasîteya wî ya hilberandina uslûban, bi gotinên din kapasîteya wî ya veguherandina xwînê bo wateyê ji nava wî biqetîne" û vê yekê tetbîq dike bi qedexekirina li milet a zelilandina "hestên xwe yên trawmatîk".[146] Heta ku hestên trawmatîk veneguherin dikekê, pêşandanekê, merasîmekê, bibîranînekê yan jî rîtueleke ku bi awayekî kolektîf her dihat kirin yan jî nû vedîtin, ji bo miletê behsa me li ser, wê bibe xwedî xisleteke texrîbker. Ew weke yekane tişta ku dikare vê tişta texrîbker rawestîne, hunerê dibîne, Nichanian aliyê siyasî yê meseleyê talî dibîne. Em qebûl bikin ku em li vê meydana talî ne û minaqeşeya xwe ya li ser mafê şîngirêdanê dewam bikin.

Her saniyeya dibihure, nihayê tine dike û yekane tişta di destê me de dimîne rabihurî ye ku tu carî yekbûyî em nikarin di destê xwe de bigirin.[147] Dîsa jî, çawa ku me li jor jî behsa wê kir, bi hewldaneke dawî lê nayê ya ku beşek e ji gerîna me ya li wate û nasnameyê, em hewl didin rabihuriyê bigirin. Ji ber vê yekê pêdiviya me pê heye ku em bi bîr bînin. Lewma jî, bibîranîn ne elaqedarî miriyan lê zindiyan e. Lewma "mirin û jidestdayîn di dilê tevahiya nasname û tecrûbeyan de heye".[148] Lê belê ji ber ku li gorî bunyeya xwe bîr şemîtonkî ye û nikare bibîranînê bi temamî biparêze ya ku li paş dimîne bi tenê girêdana şînê ye. Ji ber ku jidestdayîn, mirin û zeman nabe ku werin vegerandin, tişta ku dike ku tiştên me jidestdayî, miriyên me, rabihuriya me bi me re bimîne, şîngirêdan e. Sedema ku Derrida daxwaza têkilîdanîna bi rabihuriyê re weke karê şîngirêdanê yê daîmî dibîne jî ev e.[149] Bi vî rengî em lê serwext dibin ku dildariya arşîvkirinê ya ku tu carî wê ne nîhaî û bêkêmasî be û lewma jî timî karekî dawî lê nayê ye, karekî şîngirêdanê ye. Ji bo ku em neheqiyê li rabihuriyê nekin, tevî ku em dizanin wê tu carî temam nebe jî û heta jixwe ji ber vê yekê divê em arşîvkirinê dewam bikin û vekirina arşîvan li şîroveyên nû vekin.

---

145 Nichanian, 2011, 189. Nichanian dibêje ya hatî serê Ermeniyan ne bi peyva qirkirinê, lê bi peyva Felaketê ya ku ezmûneke berferehtir û gelekî kûrtir îfade dike, rave dike.

146 Nichanian, 2011, 194-195.

147 Binihêre li Dooley û Kavanagh, 2007, 3.

148 Dooley û Kavanagh, 2007, 7.

149 Binihêre li Dooley û Kavanagh, 2007, 7-8; Derrida, 1995b, 48-49.

Rêya parastina bibîranînên jidestdayiyan ew e ku mirov serhatiyên wan her ji nû ve bibêje û şîrove bike, ne sansurkirin û sînordarkirin e.[150] Heke ne wisa be, em ê serhatiyên wan ji siberojekê bêpar bihêlin û pê re jî neheqiyê bikin li jidestdayiyên xwe. Welhasil, bi tenê bi xêra arşîvkirineke bê rawestan û bê şîrove siberojeke rabihuriyê çêdibe. Bi vî awayî, çawa ku Derrida jî bi bîr dixe, arşîvkirin ne bi tenê elaqedarî rabihuriyê ye, heta belkî karekî bêhtir ji bo siberojê, meseleyeke siberojê, bersivek, hêviyek, sozdayînek, meseleya girtina berpirsiyariya ji bo sibe ye.[151] Bi vî awayî em qebûl dikin ku şîngirêdan karekî berpirsiyariyê ye beramberî yên di rabihuriyê de mayî û yên ku yên bên, karekî edaletê ye:

> Ji tavahiya nihaya zindî û wêde … li ber peyrewê yên hîna ji dayik nebûyî û yên mirî, li hemberî peyrewê kesên bûyî qurbaniyê şeran, şîdeta siyasî yan jî şêwazên din ên şîdetê, qirkirinên neteweperest, nijadperest, mêhtingerî, cinsiyetperest yan jî yên din, împeryalîzma kapîtalîst yan jî her şêwazê totalîtarîzmê, heke prensîpa berpirsiyariyekê nebe, edaletek … ne mimkun e pêk were, ne jî mimkun e mirov lê bifikire [herçî peyvên tewandî weke di orîjînalê de ne].[152]

Dema mirov xisleta şîngirêdanê ya ku nasnameyê dide kes û miletan, hêza ku sax bimîne, jiyanê bi awayê ew dizane ava bike, dide wan nebîne, ango dema ku mirov xwe ji endîşeya adilbûnê qut bike, ne mimkun e ku dostaniya siyasî ava bike. Ji ber vê yekê têkiliyeke ji nêz ve ya şîngirêdanê bi sîstemên siyasî re heye. Derrida dibêje, "siyaseteke ku zeman û mekanê şîngirêdanê birêxistin neke, nîne".[153] Mbembe jî bi heman rengî, merasîmên cenaze û rîtuelên definkirinê weke ji rêyên sereke yên merasîmîkirina endametiya welatîbûnê dibîne.[154] Bihevrebûnên mîna merasîmên cenaze, goristan, peykerên bibîranînê, abîdeyên bibîranînê û rojên bibîranînê hem hebûna siyasî ya kes û miletan û hem jî siyaseta dewletan diyar dikin; ew di nava xwe de kirineke sozdayînê ya ber bi rabihuriyê û siberojê ve jî dihewîne. Piştî gunehên li dijî mirovahiyê, qirkirinan, felaketan, em sozekê didin kesên jiyana xwe jidestdayî: "Em ê ji bîr nekin"; ji bo yên werin jî berpirsiyariyek heye: "Hûn ê bi bîr bînin". "Careke din qet na!" Lê belê, wê çawa bibe ku em ji bîr nekin, ya rastî, em ê çawa bi

150 Dooley û Kavanagh, 2007, 104.

151 Derrida, 1995a, 27.

152 Derrida, 2007, 12; ji Ingilîziya pirtûkê sûd hat girtin û Tirkiya wê de hin guhertin hatin kirin.

153 Derrida, 1993, 61-62.

154 Mbembe, 2002, 266.

bîr bînin yan jî soza xwe bi cih bînin? Em weke ku Goral dipirse, bipirsin: “Em ê çawa toreyeke civatê ya nû pêk bînin … ku li gorî giraniya bûyerên qewimî be?”[155] Bersiva ku Goral dide vê pirsê teqabilî karê arşîvkirinê yê Derrida tarîf kirî dike. Bi awayekî heq, îtîraza dibêje “bila vegotina mexdûrbûnê neyê kirin” ne di cih de dibîne. Heq e, lewma pirsgirêka bi rastî ne di vegotinên mexdûrbûnê de ye, di awayê bikaranîna van de ye. Goral pêşniyar dike ku vegotinên alternatîf yên ku “vegotinên fermî bêîstîqrar dikin” û serhatiyên “qehremanên alternatîf” – weke mînak kesên li ber binpêkirina mafê mirovan rabûyî – bixin bazarê, pê re tecrûbeyên cihê yên hafizeçêkirina û aktîvîzmê pêk bînin. Aliyê hem siyasî û hem jî insanî yê vê projeyê heye ku heta bi Arendt diçe:

> *... gelek mirov hene li vê dinyayê ku dikarin jibîrkirinê mimkun bikin. Lê timî kesek dimîne li paş ku wê serhatiyê bibêje. Lewma, qet nebe ji bo dema dirêj, tu tişt ‘di pratîkê de bêfêde’ nabe... ev serhatî ji me re dibêjin ku di vê rewşa sehm û sawê de piranîya mirovan wê serî bitewînin lê hin ji wan jî wê serî netewînin ... ji bo ku ev gerstêrk weke cihekî guncaw ji bo jiyana mirovan bimîne tiştekî ji vê zêdetir navê, û bi awayekî maqûl lê jî nayê gerîn.*[156]

Heke ya ku dike ku jiyan li vê gerstêrkê hebe, ew kesên ku bîra kolektîf çêdikin, wê diparêzin, bibîrtînin, yên ku ji bo kesên jidestdayî şînê girêdidin û dema vê dikin li ber xwe didin û serê xwe natewînin bin, hingê yên ku em ê sozê bidin hev da ku em rêyên bi hev re jiyanê peyde bikin jî ango yên ku em ê bi wan re dostaniya siyasî ava bikin jî divê heman kes bin. Arendt dibêje, tevahiya pêkhateyên siyasî yên xwe disipêrin peyman û lihevhatinan, bi awayekî ku cihê bin ji yên ku xwe disipêrin hikûmraniyê, bi tevahî dev ji pêşnedîtina têkiliyên insanî û bawerîpênehatina mirovî berdidin, li hawîrdorê giravên şiyana pêşbîniyê direşînin û lewhayên bawerîpêanînê datînin.[157] Ew dibêje, lê belê dema ku melekeya sozdayînê were sûîstîmalkirin ango dema ku bi awayê ku tevahiya siberojekê bihewîne were bikaranîn, hingê soz hêza xwe ya girêker ji dest didin. Di vê rewşê de ya ku em behsa wê dikin divê îradeyek be ku di wê astê de hatiye zeptkirin ku pêdivî bi giravan û lewhayan nemîne yan jî bêîradebûnek be ku sozdayînê bê nirx dike. Herdu jî îşaret bi rewşeke neanîna baweriyê ya bi hev re dike ku pê jiyana bi hev re ne mimkun be. Ew sînorên hewldanên edalet û aştiyê diyar dike di nava mirovên destûr yan jî derfeta wan a sozdayînê nîne yan jî di hewayeke siyasî de ku tê de soz bi cih nayên anîn. Ka em behsa melekeyeke din a insanî bikin ku sînorên hewl-

155 Goral, 2013, 41.

156 Arendt, 2012, 239.

157 Arendt, 2006, 352.

danên edalet û aştiyê diyar dike û dibe mijara xebatên li ser rûbirûbûna bi rabihuriyê re, di heman demê de asoyên dostaniya siyasî diyar dike û Arendt jî minaqeşeya wê dike, ev melekeya insanîlêborîn e.

### ***Lêborîn***

Arendt dibêje, heke ji bo pêşnedîtina têkiliyên insanî melekeya sozdayînê hinekî jî çare be, hingê jî behremendiyalêborînê[158] ye rêya derketina ji halê bêgaviya ji ber çalakiyên ku mirov hew dikare ji wan vegere.[159] Ya ku herdu melekeyên insanî jî bi hebûna yên din ve girêdide ew e ku sozên mirov dide xwe bixwe ûlêborîna xwe bi xwe dûrî rastiyê ne, ne girêker in û lewma jî ji civakîbûnê bêpar in. Ji bo ku mirov sozekê bide û ji bo ku mirov efû jî bike, pêdiviya mirovî bi kesên din heye. Beriya em dewam bikin, em çêl li mijareke girîng bikin. Arendt dibêje, di warê meseleyên insanî de mirovê pêşî yê ku bi rolalêborînê hisiya Îsayê Nasirayî ango Pêxember Îsa ye ku paşê bû nebiyê Xirîstiyaniyê. Li aliyê din, Arendt dibêje, bi awayekî serbixwe ji peyamên dînî yên Xirîstiyaniyê, doktirîna Îsa peyde bûye ji ezmûnên komên piçûk ên mirîdan yên ku li dijî otorîteyên dewletê yên li Îsraîlê li ber xwe didan û bi bîr dixe ku xurtiyalêborînê ya ku weha dihat qebûlkirin ku bi tenê ya Xwedê ye, aniyê ser rûyê erdê û di nava mirovan de bi cih kiriye. Bi vî awayê xwe, mirov dikare bibêje, doktrîna Îsa melekeya xwedayî ya li cem insên derxistiye holê. Lê belê, ya ku Arendt weke bersiv ji bo fikarên sekuler dibêje krîtîktir e: “dînîbûna peywenda vedîtinê û bi ziwatekî dînî îfadekirina vedîtinê, dema ku mirov li ber ya ku bi temamî laîk e bigire, ne sedem e ku mirov wê kêmtir cidî bigire.”[160] Baş e, naxwe aliyê bi tevahî sekuler êlêborînê çi ye? Belkî mirov karibe erka veguherandina cezayên îdamê ber bi cezayekî din ve û ku roja me ya îro weke ferzeke birêveberiyên demokratîk tê dîtin, weke pratîkeke laîk alêborînê bihesibîne.[161] Lê belê ya ji vê jî girîngtir û ya rastî aliyê wê yê divê siyasî were terîfkirin, rengê avaker, nûker û veguherîner ê têkiliyên mirovan e.

Heke yekane tişta ku xeleka lixweveger a şîdetê dişkîne, zincîra tolhildanê diqetîne lêborîn e, hingê ew dikare bi roleke girîng rabe di warê ji nû ve yan jî

158 Di vê beşê de peyva bi Tirkî bağışlamak wekelêborîn hat wergerandin. Carinan ji bo îşaret bi nuansên di Tirkî û her weha Kurdî de heyî were kirin, bexşandin jî wê were bikaranîn; lewma nivîskara pirtûkê, nuansa xelat û îhsanê di nava peyva bexşandinê de di peywenda rûbirûbûna bi rabihuriyê re girîng dibîne. Têbîniya wergêr.

159 Arendt, 2006, 342.

160 Arendt, 2006, 344.

161 Li aliyê din, li gorî Derrida, di bingeha têgeha gunehên li dijî mirovahiyê de jî têgihiştina Xirîstiyaniyê heye ku mirovî weke hebûneke pîroz û xwedayî dibîne û di hiqûqa navneteweyî de tu hêmana sekuler nîne (2001, 70).

ji bo cara pêşî avakirina dostaniya siyasî di civakên piştî şerî de. Ya kulêborînê dike melekeyeke insanî, ne encamên ku tê hesibandin kulêborîn wê rê li ber wan veke, ne jî wateyên lê barkirî ne; bi tenê îhtîmalên ku dikare biafirî-nelêborînê dikin melekeyeke insanî. Dema ku mirov bi şîdetê bersivê nede kirineke şîdetê dihewîne, hingê mimkun e ku şîdet cihê xwe ji ya siyasî re bihêle. Li vir ya siyasî tayê giştîbûnekê ye ku tê de bi bikaranîna behredariya mirovî ya kirinê ya ku nikare were diyarkirin û pêş nayê dîtin, timî pêvajoyên nû dide destpêkirin û mirovî azad dike, ew bi mirovên din re di nava têkoşîn û lihevhatinê de ye. Ew hevtayê gerîna li ziwatekî ye ku wê şûna kirinên wêranker ên şîdetê bigire, yên ku vegerandina wan ne mimkun e. Arendt dibêje, behredariya mirov alêborînê yekane tişt e ku mimkun dike ku mirov xwe xilas bike ji rewşa nayê vegerandin a kirineke wêranker, ji vê bêgaviyê.[162] Bi ser de jî, bi xêra hêza azadker û ji nû ve destpêker alêborînê û efûbûnê, dibe ku ji nû ve mirov bi hev re bijîn, barê ya ku nayê vegerandin sivik bikin.

Lêborîn rewşeke din dihewîne ku kaniya bunyeya siyasiyê ye, ango pêşnedîtinê. Weke ku Arendt gotî, berevajî hesta tolhildanê "lêborîn yekane reaksiyon e ku kirineke nû û kes ne li bendê ye ku hem dike yê efû dike û hem jî yê lê tê bihurîn ji encamên wê kirinê azad bibin."[163] Yê ku efû dike ji hêrs û kînê rizgar dibe; yê lê tê bihurîn jî ji qeydên kirina xwe ya wêranker xilas dibe. Mexdûr bilêborînê, hêza mirovî ya yekane ya melekeya kirinê û ji nû ve destpêkirina pêvajoyê ji fikr vediguherîne kirinê. Fail jî, li hemberî efûbûnê, ji nû ve berpirsiyar, azad dibe û dibe xwedî behremendiya kirinê. Dema ku tol jê bihata hilandin fail wê xwe xilas bikira ji qebûlkirina berpirsiyariyê, bi efûbûnê êdî ji nû ve ew xwedî berpirsiyariyeke nû ye.

Arendt dibêje, dijberiya di navberalêborîn û tolhildanê de di navberalêborîn û cezakirinê de nîne, û heta herdu jî xwedî xisleteke hevpar in û ew jî dawîanîna şîdetekê ye ku mirov deswernediyê dibe ku dewam bike. Ew li gotinên xwe zêde dike û dibêje, mirov tiştekî nikaribin ceza bikin nikarin efû jî bikin, tişta ku difikirin lê nikare were bihurîn jî nikarin ceza bikin.[164] Failên ku ne mimkun e mirov wan efû yan jî ceza bike jî weke failên wan sûcan ku weke "xirabiya radîkal" tên binavkirin, li her devera ku lê didin der, têkiliyên insanî bi awayekî tundraw wêran dikin û kefareta wan bi tenê "roja qiyametê" dikare were dayîn. Bi vî awayî, bijarteyênlêborîn û cezakirina failan ku hema hema tayê hev in, ji bo failên xirabiyên radîkal ango failên gunehên li dijî

162 Arendt, 2006, 342.

163 Arendt, 2006, 347.

164 Arendt, 2006, 348.

mirovahiyê nelê dibin. Nexasim jî dema fail sûcê xwe bixin stûyê sîstemekê, poşman nebin yan jî berpirsiyariya zerara dane red bikin, hingêlêborîn û cezakirin bêwate û ne mimkun dibin. "Heke ya ku lê tê bihurîn ne sûc lê belê kes be" hingê di wan rewşan de ku Arendt ji wan re dibêje "xirabiya bê rîş", di wan rewşan de ku fail hemû dibêjin, wan ferman bi cih anîne, guneh nekirine, hingê keseke/î mirov karibe efû yan jî ceza bike namîne.[165] Çawa ku em nikarin objeyên ne ruhber, heywan, felaketên xwezayî yan jî Xwedê efû bikin, em nikarin kesekî dev ji şexsiyeta xwe berdayî – em bixwazin jî – efû bikin.

Herçî Derrida ye, ew serê pêşî têkiliya ku Arendt di navbera cezakirin û efûyê de datîne red dike, û heta vediguherîne dijberiyê. Derrida dibêje, di sedsalekê de ku sûcên tirsnak (ango yên nabe mirov li wan bibihure) ji çi pîvaneke edaletê ya insanî bihuriye, bangalêborînê (bi şexsê sûcên nabe li wan were bihurîn bi xwe) ji nû ve hatiye zindîkirin.[166] Ya ku lêborînê mimkun dike, gunehên li dijî mirovahiyê bi xwe û nemimkunbûna cezakirina van gunehan e. Bi vî awayî, ew melekeya mirovî yalêborînê herî zêde jî elaqedar dike bi xirabiya radîkal û wê tiştê re ku nabe lê were bihurîn. Wateya vê tesbîtê helbet ne weha ye: "madem em nikarin ceza bikin, naxwe em efû bikin." Berevajî, nîqaşeke felsefî ya di biwara kirina efûyê bi xwe de dide destpêkirin. Ew dike ku em bifikirin ku bijarteyên cezakirin ûlêborînê netayê hev in;lêborîn çareyek e ku tam jî bi kirinên nabe werin cezakirin ûlêborîn, derdikeve holê, dikare bibe melekeyeke ku berê xwe dide xirabiyên bi vî rengî. Weke ku Derrida bi bîr dixe, heke em bi tenê amade ne li wê bibihurin ku dikare lê were bihurîn, hingê wê fikr û nirxa ku esasê melekeyalêborînê pêk tîne ji holê rabe. Kurt û Kurmancî, "lêborîn bi tenêlêborîna ya ku nabe lê were bihurîn e".[167]

Derrida wekî din li ber radibe ku şert hebin li pêşiyalêborînê, lewma dema ku mirov li fail bibihure bi şertê ku poşman bibe û dozalêborînê bike, hingê mirov melekeyalêborînê vediguherîne çerxeke besît. Derrida dibêje,lêborîn divê ne normal, normalker, bi qaîde, bi şert be, divê timî îstîsnaî û awarte be, bê şert bimîne, nabe ku mirovlêborînê bixe ber danûstandinekê û hesabkirinekê.[168] Koka etîmolojîk a peyva bexşandinê [bi wateyalêborînê] jî nihêrîna Derrida piştrast dike. Wateya bexşê di farsî û Kurdî de weke îhsan, xelat tê zanîn.[169] Naxwe bexşandin li vir weke îhsankirin ango bi awayekî mirov ne

165 Arendt, 2003, 111.

166 Derrida, 2005a, 33.

167 Derrida, 2005a, 32.

168 Derrida, 2005a, 32, 34.

169 https://www.nisanyansozluk.com/?k=ba%C4%9F%C4%B1%C5%9Fla-&lnk=1. Dîsa ji heman

li benda berdêlekê be tiştekî bide. Em tînin bîra xwe ku ya rastî, xisleta lutf, xelatê ya bexşandinê heye. Derrida vê bêşertbûna di cewherê bexşandinê de weke bêarmancbûnê jî nîqaş dike. Ew dibêje, dema ku esîl û watewî jî belêborîn bikeve xizmeta armancekê, ango ji xwe re kire armanc ku normalbûneke civakî, neteweyî, siyasî, psîkolojîk ava bike, êdî ne xwedî wateyalêborîneke bi rastî ye.[170] Derrida hay jê heye ku sêwirandinalêborîneke bê şert a bi vî rengî ya ku tu wate û armanca wê nîne, ya rastî karekî şêtane ye; lê belê fikralêborîneke bi vî rengî ew weke yekane tişt dibîne ku dest werdide boçûna ketûber a dîrok, siyaset û hiqûqê û vê boçûnê eynî weke şoreşê ji rê derdixe.[171]

Ya rastî, Derrida dema aliyê bêşertbûn û bêarmancbûn êlêborînê, rewşa wê ya ku mirov bi hêsanî lê serwext nabe, bi bîr dixe, ew li ber çerxalêborînê radibe ku di pêvajoyên edaleta piştî şerî de û nexasim di hin komîsyonên heqîqetê de tê bikaranîn, ya rastî ew li ber radibe ku efûkirin weke çerxekê û di xizmeta lihevhatinê de were bikaranîn. Ew bi bîr dixe, heke kesek yan jî saziyeke sêyem mudaxil bibe, hingê mirov dikare bi tenê behsa efûyekê, lihevhatinekê, tezmînkirinekê bike.[172] Heta, ew dibêje, di serdema globalbûnê ya ku em tê de ne, bi serokdewletên kulêborîna xwe dixwazin yan jî doza efûyê dikin, em şahidiyê dikin li wê yekê kulêborîn vediguhere pêşandaneke şanoyî.[173] Derrida Komîsyona Heqîqetê ya Başûrê Efrîkayê weke mînak nîşan dide, dibêje ew li ber armancên reng vedidin li dûvikê siyasî û civakî yêlêborînê yên weke lihevhatin, kefaret, selihandin, dermankirinê ranabe, lê belê ew li ber birina navê vê rewşê tevî navêlêborînê û sûîstîmalên siyasî yên têgehalêborînê radibe.[174]

Bicihkirinalêborînê di asteke bi vî rengî de weke tecrûbeyeke şexsî, awarte, nemimkun û neelaqedarî siyasetê, weke ku têgihiştina Derrida ji hewldana rûbirûbûna bi rabihuriyê re dûr bixe, xuya dike.[175] Lê belê, bilêborînê re, Derrida

çavkaniyê em pê dihisin ku peyva efûkirin [bi Tirkî affetmek] ji koka erebî afw tê û wateya wê jêbirin, tezmînkirin, betalkirina ceza ye. Di Tirkî de bağışlamak û affetmek bi awayekî giştî bi heman wateyê werin bikaranîn jî, di peywenda xebatên rûbirûbûna bi rabihuriyê re girîng e mirov bi bîr bîne ku wateyên cuda li herduyan bar in.

170 Derrida, 2005a, 32.

171 Derrida, 2005a, 39.

172 Derrida, 2005a, 42.

173 Derrida, 2001, 55.

174 Derrida, 2001, 56-58.

175 Heta, mirov dikare bi hev re rahêje têgihiştinalêborînê ya Derrida û têgihiştina lihevhelalkirinê yan jî helalkirina heqê xwe ya di Îslamê de. Dema ku mirov dualî ragihînin ku ew dest berdidin ji heqên xwe yên li ser hev, ev yek di Îslamê de weke lihevhelalkirinê tê pênasekirin. Piştî lihevhelalkirinê mafê bendeyan ji holê radibe, lê belê kirina ku mesele ye helal nabe. Li gorî kîtabi sehîhî Buxarî ya ku Îmamê Buxarî nivîsiye, "Bi lihevhelalkirinê zalim ji mezlû dixwaze ku heqê xwe li wî bibexşîne. Gunehê

têgehên mîna edalet, şîngirêdan, xelat, mêvanperwerî timî bi awayekî elaqedarî pirsgirêkên siyasî nîqaş dike û pê têkiliyên ku mirovî dikin hebûneke siyasî û fikra dostaniya siyasî ya ku dikare bi mirovên din re deyne dide mayîndekirin. Nuqteyeke girîng heye ku Derrida hevpar dibe bi Arendt re û têhna sereke ya li pişt hewldana rûbirûbûna bi rabihuriyê re bi bîr tîne. Ev hewldan nahewe di ziman û çerxên heyî yên desthilatdariya siyasî û hiqûqî de, û jê re rûbirûbûneke bi esastir divê bi meseleyên kokî yên weke mêhtingerî, tehekum, newekhevî, şîdetê re. Di dawiya dawî de demokrasiya me wê her kêm, edaleta me her dereng bimîne. Heta li gorî Derrida em timî li benda demokrasî û edaletê ne, lê belê ev li bendê man ne betaliyê belê berpirsiyariyê diafirîne. Weke ku Arendt bi bîr dixe, ferdî berpirsiyariya me ya exlaqî û qanûnî, kolektîf jî berpirsiyariya me ya siyasî xisleteke insanî ye ku em nikarin dev jê berdin û betal bikin heta ku em dewam bikin biaxivin bi xwe re û bi dinyayê re ku em tê de dijîn.[176]

Tengiyeke meseleyalêborînê ya yekser elaqedar e bi vê xebatê re, pirsa ka yên ku wê karibin lê bibihurin kî ne. Derrida dibêje, mixatebên ku rewa ye lê bibihurin, ya rastî bi tenê ew qurbanî ne ku êdî ne sax in yan jî hatine wendakirin, mexdûrên ku xizmên qurbaniyan in yan jî yên ku sax filitîn, weke qurbanî karibin werin hesibandin jî nabe ku yên sax filitî razî yan jî ehîl bin bikevin şûna yên nesax.[177] Ji ber ku yên êdî nesax nikarin lêbibihurin, ne mimkun e mirov li ser navê wan lêbibihure, dike ku meseleyalêborînê bibe pirsgirêke etîk û siyasî ya ku em êdî nikarin navêlêborînê lê bikin. Eynî mîna şahidiya ji bo yên êdî nesax,lêborîn vediguhere kirinekê ku yên saxmayî ne li ser navê yên nesax, belkî li ser navê îhtîmalên heke sax mabûna peyde bibûna yan jî li ser navê xwe dikin, biryareke li ser navê xwe didin.[178] Yên ku wê bi yên din re bijîn, şîdetê rawestînin û ji bo aştî û edaletê bi hev re hewl bidin, ne yên nesax in, yên zindî ne. Yên saxmayî dikarin ji bo êşa fail bi wan dayî kişandin ango wendakirina hezkiriyên wan, kesirandina hezkiriyên wan, dikarin li fail bibihurin. Dîsa jî ev ê nebelêborîneke heqîqî û mutleq.

ku encama tişta xwedê heram kiriye, tu kes nikare helal bike" (Abdi'l Latîfî'z Zebîdî, Sahih-i Buhari Muhtasarı, Tecrid-i Sarih Tercemesi ve Şerhi, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Enqere: 1984, VII, 376). Lê belê, lihevhelakirin jî dikare wekelêborînê bibe wateyên siyasî. Di nameya Abdullah Ocalan de ku di Newroza Diyarbekirê ya sala 2013'an de hatî xwendin, lihevhelalkirinê weha cihê xwe girtibû: "Dem ne dema îxtîlaf, şer, hevpiçûkdîtinê ye, dem dema tifaq, yekîtî, hevhimbêzkirin û lihevhelalkirinê ye."; binihêre li http://www.bianet.org/bianet/siyaset/145269-silahli-gucler-sinirdisina-artik-siyaset-donemi [15 Nisan 2014].

176 Arendt, 2003, 147-158.

177 Derrida, 2005a, 44.

178 Quattrone, 2006, 148.

Niha êdî yên ku wê şînê girêbidin ji bo îhtîmaleke ku heta hetayê ji dest hatî dayîn, fail bi xwe ne.

> *Ez dizanim ku tevahiya Hutuyên bi xwînsarî mirov kuştin dema dozalêborîna xwe kirin, wê ne jidil bin. Ji bo wan Tutsî wê timî dijminên wan bin. Lê belê ez bi xwe razî me li wan bibihurim. Ev ne mandelkirina zerara wan kirî ye, ne xiyaneteke li Tutsiyan e, ne jî tercîhkirina ya hêsan e. Sedema vê ew e da ku ez tevahiya jiyana xwe nepirsim ka wan ji bo çi hewl da min ser jê bikin, û êşê nekişînim. Ez naxwazim bijîm bi poşmaniya Tutsîbûna xwe yan jî ji ber wê bitirsim. Heke ez li wan nebihurim, yê ku wê êşê bikişîne, yê ku wê di nava xwe de xwe bi xwe bixwe, tine bike, yê ku wê nikaribe rakeve wê ez bim. Ez aştiyê dixwazim. Divê ez bi rastî aramiyê peyde bikim. Ez ji peyvên aşker ên kesên din bawer nekim jî, divê ez tirsê ji ser xwe biavêjim.*[179]

Ev gotinên Édithe Uwanyiligira ne ku ji qirkirina li Ruandayê sax filitî. Dibe ku daxuyaniya wî ya yekalî wekelêborîneke heqîqî neyê hesibandin, lê belê weke xelata di bingehêlêborînê de aliyekî wê yê ne li benda berdêlê û aliyekî wî yê siyasî jî bi rengê me li jor behsa wê kir, heye. Lê ne weke tuwanca Uwanyiligira ye, wateyalêborînê ne jibîrkirin e; heta li gorî hinan pêvajoyek e ku tê de mexdûr biryarê dide ka wê çawa qewmînan bi bîr bîne, mexdûr xurt dike û derman dike.[180] Di rewşên bêcezamayîna fail û berpirsiyaran de rewşek e ku mirov dikare bi ber bikeve, heke mexdûr têkiliyeke yekser deynin di navbera jibîrkirin û bêcezamayînê de,lêborîn û jibîrkirinê de. Li aliyê din, em dikarin bibêjin, jibîrkirin weke pêvajoyeke şexsî tê tecrûbekirin ku ne bi temamî di kontrola mirovî de ye, bi hêsanî dikare bişike; herçîlêborîne bi xwe, kirineke bi îrade û biryara mirovî ye, xwe disipêre daxwuyaniya li alemê vekirî, xwedî tesîreke navmirovî ye; hingê em dikarin vê têkiliyê bixin rewşeke li ser li hev nehatiye kirin. Bi vî awayî, bêyî jibîrkirinêlêborîn bi tenê di wan rewşan de dikare weke jesteke siyasî mimkun be heke heqîqet werin aşkerekirin, fail û berpirsiyar werin dadgehkirin, mexdûrbûn ji aliyê dewletê û meydana giştî/dewletî ve werin qebûl û naskirin.lêborîna siyasî jî jestên bi vi rengî terîf dike ku Digeser dibêje, bi tenê “alî di biwara xisleta sûc de xwedî têgihiştineke hevpar bin” dikare pêk were û nexasim jî ji bo destekê bide pêvajoyên lihevhatin û aştiyê tê rojevê.[181]

Di wan rewşan de ku mexdûr û fail divê bi hev re bijîn, dibe ku ji gotinan bêh-

179 Carse û Tirrel, 2010, 46.

180 Kohen, 2009, 405.

181 Binihêre li Digeser, 2001, 33.

tir, zemînek girîng be yê avakirî bi biryarên biçûk, jest û qebûlên selihandinê yên bêyî daxwazênlêborînê.[182] Heta, ya rastî, mirov dikare bibêje ku gotin yan jî li pêşberî herkesî bi awayekî aşkere ji mexdûr xwestinalêborînê xwe, xwedî tesîrek e ku kirinalêborînê şert dike, zorê li mexdûr dike ku bersiveke erênî bide.[183] Meseleya afirandina zemîna lêborînê û ne zora lêborînê di warê siyasî de girîng e. Bi awayekî serbixwe ji îhtîmalalêborînê ya mexdûran, divê hin tedbîrên siyasî û civakî werin girtin da ku hêrsa mexdûran li hemberî failan û kesên bêdengmayî li hemberî bêedaletiyê were kêmkirin û beriya her tiştî divê bêedaletî were qebûlkirin. Bi ser de jî ji bo aştiyê şertê pêş nelêborîn e, lê belê bawerî ye, hingê jîlêborîn dikare encameke zêde, ya mirov ne li bendê be.[184] Misogerkirina bawerîbihevanînê jî tevî qebûlkirina bêedaletiyê, bi tenê dikare mimkun be heke şert û mercên rê li ber vê bêedaletiyê vekirî ji holê werin rakirin, newekheviya civakî ku dike mexdûr "karibe dûçarî şîdetê bibe" û mafên mexdûrî "bi awayekî bêsînor karibin werin binpêkirin" were betalkirin.[185]

Em dema ji şert û mercên lêborîna şexsî bidin rê, mimkun e em ji nû ve bigihîjin têgeheke "lêborîna siyasî" ya ku hemtayê xebatên rûbirûbûna bi rabihuriyê re ye. Inazu çêl li Digeser jî dike û navê "lêborîna siyasî" li wê yekê dike kulêborînên şexsî ji aliyê ferdên heman civakê ve di nava serhatiyeke hevpar de bicivin û pêk werin.[186] Ew bi bîr dixe ku derfetên girîng ên xisletalêborîna şexsî hene ya ku şîdetê bi dawî dike, jiyan û siyasetê ji nû ve dide destpêkirin, tesîrên erênî yên civakî dike. Ji bo afirandina rewşeke ku wêlêborîna şexsî teşwîq bike, ew gavan dike rêz, yên weke dîtin û cezakirina failan, belavkirina doktrînên ku wê jiyana hevpar bi gewde bikin yên ku dewlet, qanûn û saziyên jirêûresmê dikarin biavêjin.[187] Li aliyê din, em pê dizanin ku zoralêborînê ji teşwîq û wêde çûye û veguheriye zexteke civakî ya ku teqabilî binpêkirina mafekî ku mexdûran cara duyem mexdûr dike. Heta, bi serê xwe, teşwîqkirinalêborînê jî dikare hêwateke zextê be. Bi rastî jî, weke di warê exlaqî de

182 Carse û Tirrel, 2010, 55-58. Di hejmara rojnameya New York Times ya roja 6'ê Nîsana 2014'an de di doyaya bi navê "Portreyên lihevhatinê" de wêne û serhatî cihê xwe digirin, ev dosya weke ku belge bike ku tevî tevahiya xisleta xwe ya zivêrker û nîqaş li ser heyî jî, ka çawa zemînekî bi vî rengî yêlêborînê peyde dibe; binihêre li http://www.nytimes.com/interactive/2014/04/06/magazine/06-pieter-hugo-rwanda-portraits.html?smid=fb-nytimes&WT.z_sma=MG_POR_20140404&bicmp=AD&bicmlukp=WT.mc_id&bicmst=1388552400000&bicmet=1420088400000&_r=3 [14'ê Nîsana 2014'an].

183 Binihêre li Saunders, 2011, 138.

184 Doorn, 2011, 15.

185 Doorn, 2011, 18.

186 Inazu, 2009, 311.

187 Inazu, 2009.

raser yan jî weke di mînaka Başûrê Efrîkayê de weke kesên destekdayî aştiyê nîşandana mexdûrên li failan bihurî, ji bo kesên li failan nabihurin pêsîrtenigeyeke nû diafirîne.[188] Ev yek mafê lênebihurînê yê ku ji bo mexdûran baqî ye ji holê radike.

Hinek jî îdîa dikin, ku aliyekîlêborînê heye ku di serî de xêra wê dide mexdûran, ew dibêjin, divêlêborîn were teşwîqkirin. Gobodo-Madikizela dibêje, piştî naskirina failan û fêrbûna heqîqetên di biwara tiştên qewimî de û piştî ku fail poşman bûn û dozalêborînê kirin, ango piştî ku mirov pê zanibe ji ber çi mirov dikare li kê bibihure yan jî nebihure,lêborîneke muhetemel wê mexdûr ji barê hestên neerênî yên weke kîn, hêrs û tolhildanê xilas bike.[189] Ew îdîa dike ku failê ku poşman e, doza lêborînê dike, êşê dikişîne ji nû ve weke mirovekî tevdigere, û êdî ne yê nabe lê were bihurîn e. Ewlêborînê bi wateya xwe ya heqîqî weke niçika "kêliyeke insanî" terîf dike, ku tê de hem fail guh didin wijdanê ku berê bêdengkirinbûn û pê re dibine insan, hem jî bi rêya ku bike ku êşên mexdûran xuya û bihîsbar bin pê re jî heysiyeta mexdûran ango mirovbûna wan li wan tê vegerandin. Li aliyê din, ne rast e ku mirov bibêje, ew kêliya ku tê de mexdûrên mirovbûna wan ji dest girtî û failên "ji mirovbûnê derketî" yê bûyî hevkarê hovîtiyê tên cem hev, wekhev mirovbûnê dide herdu aliyan. Em bi awayekî din û rexmî Arendt bibêjin, failan bi tenê ferman bi cih anîbin jî, ew her kirde ne ku difikirin û dikin, herçî mexdûr in, ev hatine veguherandinî objeya di hedefa şîdetê de. Di vê rewşê de mirov dikare di daxwaza failan a vegera li mirovbûnê bigihîje, lê belê tişta ku divê mexdûr ji nû ve bi dest bixin selahiyet û kirdebûn e.lêborîna ku li mexdûran tê ferzkirin wê wan ji nû ve neke kirde û erka ji nû ve mirovkirina failan jî ne karê mexdûran e.

Heqîqetên di biwara fail û sîstema fail parçeyek jê de ya rastî ew tişt in ku piraniya mexdûran pê dizanin. Heta, gelek caran, di wan rewşan de ku şîdeta siyasî bi awayekî sîstematîk pêk tê anîn, mexdûr li gorî failan xwedî bîrbirineke maqûltir û ferehtir in. Lewma jî hesibandina weke ku têkiliyek hebe di navbera bihîstina bahaneyan, fêrbûna heqîqetan ûlêborînê de heye, timî rast nîne.[190] Minaqeşeyeke girîngtir di pirsa Saunders de ya "nirxekî çawa yê hewldana mexdûran ji bo gihiştina di failan wê hebe?" veşartiye.[191] Pêvajoyeke fêmkirinê ya bi tuwanca em dikarin "rastiya" dibêje, di bin şert û mercên dişibin hev de her kes, heta mexdûr jî dikarin bikevin rewşa failan de qebûl

188 Binihêre li Saunders, 2011, 125.

189 Gobodo-Madikizela, 2010.

190 Saunders, 2011, 134-135.

191 Saunders, 2011, 135.

bikin, pêvajoyeke wisa ye ku Saunders li ber radibe. Ew dibêje, divê qebûlnekirina fêmkirina failan weke îfadeya girêdana bi prensîpên exlaqî ve were dîtin. Wateya vê îtîrazê, bi rastî jî ew e ku mirov wê feraziyê red dike ku dibêje, di bin heman şert û mercan de her kes wê bi heman rengî tevbigere. Dema ku mirov ji bîr dike ku hinek fermanan bi cih naînin, wateya vê yekê hingê ew e ku mirov wê îhtîmalê nabîne ku hinek dikarin melekeya xwe ya fikirîn û mihakemeyê ji dest nedin.

Divê mirov qebûl bike ku hin trajedî lihevhatinê nahewînin, wateya hin lihevhatinan nelêborîn e, nirxek yan jî wateyeke erênî ya civakî ya hin êşan nîne, mimkun e kulêborîn ne her tim rewşek be ku mirov teqdîr bike, her rastiya ku mirov pê hisiya ne ileh veguherîner û rizgarker e û nabe ku mirov êşên şexsî daxîne asta vegotineke neteweyî.[192] Dube, metnên edebî yên bala xwe didin meseleya rûbirûbûna bi rabihuriyê re analîz dike, û ew di romana Ariel Dorfmann a bi navê Mirin û Bakire de ku behsa serdema piştî Pinochet ya li Şîliyê dike, pirsa karaktera sereke Paulina ya ku îşaret bi failan dike û dibêje, “em yekî ji wan bikujin, ma çi wê ji dest me biçe?” bi bîr dixe. Ew cih dide reaksiyonên karakterên romanê yên ku mirov hewl dide bi wan bide bawer kirin ku xeleka lixweveger a şîdetê bê fêde ye, sedemek, wateyeke êşan heye, tiştine ku ew fêr dikin, dersên didin hene. Karakterên ku Dube li wan dikole, gotinên weha bi lêv dikin: “Em nikarin li şîdetê serwext bibin, aliyekî mirov fêm bike yê şîdetê nîne; em nikarin bibêjin ku ‘çawa be wateyeke êşê heye’, wateya êşê nîne; ango agahiyeke veguherîner a ku em ji tiştên qewimîn fêr bibin ku heta îro em pê nizanin, nîne; tu tişta ku mirov jê dersên civakî derêxe, dîrokên neteweyî pê binivîse nîne”. Dema ku em bi bîr bixin ku ya ku vê hesta hîçbûn û kînê diafirîne ne mexdûrbûn bi xwe ye, lê wateya li mexdûran tê ferzkirin û lilêborînê tê barkirin e, hingê dibe ku mimkun be em bibihîzin ka mexdûr çi dibêjin.

### *Rikdarî û xeyd*

Jean Améry, mexdûrekî serdema Naziyan e. Ji bo me beşa herî girîng a pirtûka wî ya bi navê Ji sûc û kefaretê û wê de bi sernavê Resentments e.[193] Ev peyv ji ressentiment a Fransî ye û wergera wê ya ber bi Tirkî ve bi serê xwe mijareke din a minaqeşeyê ye. Herçî ev têgeh e, nivîskarên ku ji bilî Fransî bi zimanên din berhem afirandine jî li şûna ku peyvê wergerînin zimanê xwe bi rengê wê

192 Binihêre li Dube, 2011, 9-11.

193 Navê pirtûkê yê orîjînal ku bi Elmanî ye Jenseits von Schuld und Sühne ye, wergera pirtûkê ya bi Ingilîzî sala 1980'yî bi navê At the Mind's Limits hat weşandin. Di orîjînalê de navê beşê Ressentiments e û di Ingilîzî de Resentments. Em li Ingilîziya wê esas digirin (Améry, 1980).

yê bi Fransî bi kar anîne.[194] Lêbûna heman çareseriyê ji bo Tirkî jî dûr dimîne ji peywenda minaqeşeya di vê xebatê de. Em pêşî bibêjin, wergera pêşî ya peyva ressentiment di Tirkî de hınç [rikdarî] e, paşê jî peyvên kin [kîn], gücenme [dilmayîn], küskünlük [silbûn/xeyd], kızgınlık [rabûna hêrsê], kırgınlık [dilsarî], dargınlık [xeyd] tên pêşniyarkirin. Herçî peyva hınçê ye, ferhengên Tirkî dibêjin "nifrîna mişt e bi hesta tolhildanê". Nişanyan bi xwe, dibêje, koka peyva hınçê bi farisî ye û wateya wê "nefesa bi şid" e. Welhasil, peyva hınç weke ku rewşa nifrînekê ya ku bi helkehelk li benda tolhildanê be, terîf bike. Lê belê ya ku em li vir minaqeşe dikin, rewşa redkirinalêborîn û lihevhatinê ye, rewşeke tê de nifrîn heyî hebe jî, ev meseleyek e ku nikare were ravekirin bi dozên weke heyf, tolhildan û kînê. Di koka peyva ressentiment de peyva sentiment heye ku wateya wê hest, hestiyarî, nazikbûn e. Dema em wê jî li ber çavan bigirin, hingê ya ku em behsa wê dikin her û her dîsa xwedana der a hestekê ye ku ya rastî rê vedike li ber xeydê û nifrînê diafirîne, ango vediguhere rewşeke hestiyariyê ya mayînde. Di vê rewşê de naxwe wateya lênebihurînê û lihevnehatinê bêhtir xeyidîn, israrkirina xeyidî mayînê, berê xwe zivirandinê, pişta xwe dan, nexwestina têkilîdanînê, li cem xwe girtina nifrînê ye. Em wê berdêlê bigirin ser xwe ku em li ber çavan negirin ku peyva xeydê carinan xwedî hin wateyan e ku vê rewşê hindik dibînin yan jî peyva nifrînê bi piranî tê bikaranîn ji bo vegotina rewşeke xêrnexwaz, nikare were kontrolkirin, em rewşa em li vir minaqeşe dikin carinan weke xeydekê –ku nifrînê dihewîne – terîf bikin. Lê belê peyva ressentiment a di hin metnan de ku em ê îşaret bi wan bikin û di hin rewşan de ku em terîf bikin, em ê neçar weke kînê wergerînin.

Jean Améry pirtûka ku me li jor behsa wê kir, di demekê de nivîsî ku xelkê li Elmanyayê û saziyên fermî îdîa dikirin ku pêvajoyên hiqûqî yên mîna Dadgeha Nüremberg, dadghekirina Eichmann û doza Ausschwitzê û dijminahiya li dijî cihuyan êdî bi dawî bûye, û hewl didan bibêjin em lawê îro ne. Yên ku li ber radibin ku elman hemû berpirsiyar werin girtin ji qirkirinê, û heta îdîa dikin ku elman jî mexdûrên serdema Naziyan in, dibêjin êdî bes e ku mirov behsa rabihuriya Nazî ya Elmanya dike, êdî dem hatiye ku rûpelekî nû were

194 Orhan Koçak, di pêşgotina pirtûka Max Scheler a ku wî navê wê weke kîn wergerandî, dibêje Scheler û Nietzche yên ku bi Elmanî berheman dinivîsin, peyva Fransî ressentimentê bêyî ku wergerînin Elmanî, bi rengê wê yê Fransî bi kar tînin, û qebûl dike ku zehmet e mirov vê peyvê wergerîne zimanên din. Tevî vê jî ew bi bîr dixe ku Scheler dibêje ev peyv bi Elmanî peyva groll bi bîr dixe ku di Tirkî de teqabilî hınç, kin, garez [kîn, xerez] û dibêje wateya wê ya herî guncaw jî – b rengê ku herî baş rewşên Scheler û Nietzche minaqeşe dikin ên xetimîn, astengbûnê jî îfade bike – peyva hınç [kîn] e. Tevî vê jî, di sernivîsa pirtûkê û di nava wê de jî wî biryar daye ku peyva ressentiment bi kar bîne (Scheler, 2004, vii-viii).

qulibandin. Lê belê, wê demê Arendt dinivîsî ku helwêsta giştî ya raya giştî xwe dida der di tevgerên kanc û bêgiram yên gunehbarên Ausschwitzê de ku bi dawedar û şahidan dikeniyan, digirnijîn û beşkirina qîçên xwe, vê helwestê xwe dida der her weha bi awirên ji xwe razî û tehdîtker yên ji temaşevanan vedidan.[195] Jankélévitch jî dipirse "ma gelo divê em li wan bibihurin?" û di wê demê de ku digot, "nebûna elaqeyê, bîrokebûna exlaqî û sereserebûna giştî kirin kulêborîn veguhere emrîvakiyekê", weke bersiveke ji kesan re ku dibêjin, "êdî bes e" dibêje, ev gunehê bêdawî û bi rastî jî bênav, çi qasî bibe mijara analîzên zanistî û nîqaşên hiqûqî, ewqasî sawa wê zêde dibe; kesekî ku bi vê bihise weke reaksiyoneke xwezayî divê xwe neavêje arşîvan, lêkolîneke liberhevgir a di warê dîroka şîdetê de neke, hewl nede failên tirsnak fîhil bike, divê ew ji bo ku tiştên qewimî neyên jibîrkirin têbikoşe û heta bi serê din ên dinyayê bide ser pişta gunehkaran.[196] Ew bi bîr dixe ku ya demeke dirêj ew li bendê mayîn nelêborîn xwestin jî bû, peyveke bi tenê ya têgihiştin û hevhestbûnê bû, û hema hema digot, "êdî pir dereng e": "Lêbihurin li wargehên mirinê, mir". Ji bo ku bêzariya xwe ya ji ber vê rewşa ku bi Arendt û Jankélévitch jî aşkere bû, û îtîraza xwe vebêje ji wan kesên digotin, "em bihêlin bila rabihurî di rabihuriyê de bimîne", ji bo ku xwe bigihîne "kesên dixwazin bi dostanî bi hev re bijîn" li ser xwezaya exlaqî û fonksiyona civakî ya hesta xwe ya kînê lêkolîneke felsefî dinivîsîne.[197]

Ew serê pêşî dibêje, mexdûr bûn ne rûmetek e, ew li Ausschwitzê zane nebûne, tiştekî ku li derve bîr nebinê yê nû fêr nebûne, nebûne xwedî hêzeke serwextbûnê ya kûrtir.[198] Bi vî awayî hîna di serî de ew bendekê li pêşiya wan daxwazan datîne ku hêviya kemilîbûnê ji mexdûran dikin yan jî hewl didin ji mexdûran qehremanan biafirînin. Hema piştre jî dibêje, armanca wî ew e ku li kînê bikole ku exlaqparêz û psîkolog mehkûm dikin, û wê rewa bike. Weke berdêla têgeha kînê weke ku Brudholm jî balê dikşîne ser, Améry du peyvan bi kar tîne: ressentiment û grudge (kîn, xerez). Ya rastî kîn û xerez tayê wê rewşê ne ku ferd ji nifrîna di dilê xwe de razî be, nexwaze ku tiştek hebe ku nifrîna wî kêm bibe û rê veke li ber bihurîna li kesê jê nefret dike, û heta dixwaze ku tiştekî wisa nebe.[199] Max Scheler jî bi awayekî dişibe vê, rewşa tetmînnekirina başkirina şert û mercên rexne li wan tê girtin, heta, ji ber ku

195 Arendt, 2003, 228.

196 Jankélévitch, 1996, 558, 569.

197 Binihêre li Brudholm, 2008, 78-79.

198 Améry, 1980, 19-20.

199 Binihêre li Brudholm, 2008, 87.

ev yek dike ku zewqa mixalefetê ji holê rabe rê li ber nerazîbûnê vedike, weke "rexnegiriya li kînê" bi nav dike.[200] Xala hevpar a di navbera rikdarî û kînê de jî ew e ku nifrîneke naedile vediguherîne xisleteke kesayetiyê ango mirovan dike "kîndar" ku Nietzsche bi xwe weke "mirovên rikdariyê" bi nav dike. Lê belê, rikdariya Améry teqabilî hestiyariyeke nifrînbarkirî ya nerazî ji bêedaletî û nehestiyariyê dike ku em dikarin bêhtir weke xeydê terîf bikin.

Scheler dibêje, tişta ku rê vedike li ber hesta rikdariyê, nekarîna kontrolkirina hestên mîna tehna tolhildanê, hesûdiyê, reşkirinê, kîna piçûkker û bênirxker, hiskirina zewqê ji ber bêsiûdiya kesên din, nekarîna ji xwe kirina der a van hestan bi rêya kirinên guncaw yan jî ji ber bêhêzî yan tirsê neçarmana tepisandina wan e.[201] Dema ku rave dike ka rikdarî çawa nexasim yên xizmetê dikin û yên li wan tê tehekumkirin dihewîne, tesbîteke girîng a sosyolojîk dike:

> *... çi qasî hevnegirtina di navbera hêza fiîlî ya komekê û statuya wê ya siyasî, destûrî yan jî jirêûresmê de mezin bibe, ev dînamîta psîkolojîk jî wê tesîra xwe zêde bike ... civakeke mîna ya me zemînê herî guncaw e ji bo ressentiment lewma tê de bi awayekî aşkere ji hev were derxistin, kêm zêde (siyasî yan jî yên din) mafên wekhev yan jî wekheviya civakî ya teşeyî û newekheviyên diyardeyî yên mezin ên di warê parvekirina desthilatdarî, dewlemendiyê û perwerdeyê de li cem hev in ... Bi awayekî ku bi tevahî serbixwe be ji karakter û ezmûnên ferdan, bunyeya civakî bi xwe dibe sedem ku enerjiyeke xurt a ressentiment berhev bibe ... Lewma, dema ku saziyên parlemanter bi derbkirina birêvebirin û qanûndanînê zerarê dikin li berjewendiyên milet jî pir girîng in weke çerxên ku hestên girseyî û komî werin vederkirin. Bi awayekî bi vî rengî dadgeriya cezaî – ya ku hesta tolhildanê dike der û tetmîn dike -, duelo (qebûxwestin, terad) û heta, heta bi radeyekê çapemenî jî heman fonksiyonê bi cih tînin ...*[202]

Ma Scheler li vir bi awayekî sergirtî behsa her şêweyê civakên hindikahî û mexdûrên dinyaya modern nake? Rikdarî welidiye ji hesta tolhildanê ya ku wekheviya şeklî, civakî û siyasî, edaleta şeklî, her awayê bi hev re jiyanê yê ku bi awayekî şeklî li hev hatiye çêkirin wê dide ser hev û hewl nade ji holê rake, lê belê bi tenê dixwaze bitepisîne; ma gelo ev rikdarî xwe li wan kesên ji şer, qirkirin û komkujiyan filitîne naale? Û heta, ma gelo êdî nabe rewşeke

200Scheler, 2004, 12.

201 Scheler, 2004, 9.

202 Scheler, 2004, 11, 28; herçî peyvên tewandî ne, weke di orjînalê de ne. Scheler ne parazvanekî wekheviyê ye, berevajî, ew ji fêdedariya hiyerarşî û raseriya xwedayî bawer dike. Ew balê dikşîne ser qolincên civakî ku têgihana wekheviyê wê diafirîne ku ji ber sedema bivênevêbûna newekheviyê timî wê şeklî bimîne.

bivênevê ku hesta tolhildanê bi her aliyî de "bipeşike" ango ew kesê ku pêşî berê xwe dayê ji wê kirina pêşî bibihure, pêşî berê xwe bide her şêwaz wesfê wî, fikra wî, nirxandina wî û paşê berê xwe bide her kes, têkilî, obje û rewşa li dora wî?[203] Heta kulêborîneke bi rastî neyê, kefaret neyê dayîn, rûmeta wan li wan neyê vegerandin û ya ji van hemûyan girîngtir, heta ku tedbîrên bunyewî yên ku misoger bikin ku tiştên qewimîn wê careke din bi tu awayî neqewimin, hingê em bibêjin, bi piranî ji bo hin mexdûran rikdarî vediguhere "sîleheke" destjênabe. Di wan rewşan de ku bi tenê fail tên cezakirin jî ne tolhildan be jî rikdarî dipeşike rayedarên payebilind, miletan û saziyên fermî yên ku xwe nadin ber berpirsiyiariya gunehên failan. Heta ku nasnameyên ku bi jidayikbûnê ve dibin yên mirovî yên weke cins, dîn, ziman, nijad, çandê, bi awayekî ji kirinên wan serbixwe îmtiyazan didin kesan, fail û berpirsiyaran diparêzin û li ser yên din tehekumekê ava dikin, rikdarî vediguhere neyartiyeke ji neyartiyên din kûrtir û lihevneker.[204] Scheler cih dide yekê ji helbestên Goethe yên di Dîwana Rojava-Rojhilat de: "Çima tu gazinan dikî ji dijminên xwe? Ma gelo mirovên ku li dijî hebûna te bi xwe di nava stemeke bêdawî ya bêdeng de ne dikarîbûn bibin dostên te?"[205]

Rikdariya ku Améry lêkola û hewl dide ku rewa bike, ya rastî, li hemberî vê stema bêdeng, rewşeke lomekirinê ye. Bersiva Améry ji bo helwêsta weke ku qirkirin hîç pêk nehatibe yan jî weke ku bi qirkirinê re rûbirûbûn pêk hatibe û bersiva wî ji bo gazinên ji mexdûrên ku qirkirinê bi bîr dixin ne ji ber ku qirkirinê bi bîr dixin lê belê ji ber ku hene, rikdarî – yan jî em bi wê peyva ku bikaranîna wê wê niha maqûltir be derbibirin – xeyd e. Ew bêzariya ji hebûna cihuyan bi xwe tîne bîra xwe û dixwaze bi bîr bixe; vê bêzariyê derfet dabû pêkhatina qirkirinê, weha xuya bû ji berê de heye û wê heta hetayê hebe. Ne weke mirovên normal ên ku berê xwe dane siberojê, ew qebûl dike ku ew û mirovên weke wî di nava rikdarî/xeydê de ne timî dixwazin vegerin, demê paşde vegerînin, ya ku vegera wê ne mimkun e paşde vegerînin. Ew qebûl dike ku sedema vê daxwaza "kelevajî/tewş" "têgihiştineke xelayî ya zeman" e.[206] Lê belê Brudholm tam jî vê daxwaza sedema wê têgihiştina zeman a xeliyayî ye, ango qabiliyeta rikdarî/xeydê ya hewandin û parastina halê sade yê tişta

203 Binihêre Scheler, 2004, 30.

204 Binihêre li Scheler, 2004, 35.

205 Scheler, 2004, 35; ji Ingilîziya wê fêde hatiye girtin û li ser wergera Tirkiya wê hin guhertin hatine kirin, binihêre li Scheler, 1998, 25.

206 Améry, 1980, 68. De ma ku Brudholm têgihiştina zeman a Améry û mexdûran minaqeşe dike, cih dide vê tesbîta Jankélévitch: "Mirov nikare gunehên li dijî mirovahiyê bi paşde vegerîne, naxwe nabe ku dem di ser cezayan re bibihure ku li van sûcan werin birrîn; dem û zeman li wan hukim nakin" (1996, 556-557; Brudholm, 2008, 106).

hatî binpêkirin weke "fezîleta rikdariyê" bi nav dike.[207] Ew dibêje, dema mirov pêrgî jibîrkirineke civakî dibe, hesta rikdariyê ya ku daxwazeke evqasî kelevajî û nemimkun dihewîne, dikare îradeya bibîranînê xurt bike.[208] Mandelkirin û jibîrkirina civakî asteng e li ber wê yekê ku yên sax filitî û mexdûr bi yên din re "di nava heman heyamê de" bijîn. Aliyek her ber bi rabihuriyê ve dimeşe, aliyê din jî dixwaze ber bi siberojê ve bibeze weke ku bireve. Ya rastî, helbet direve, hem ji rabihuriyê û hem jî ji şahidên rabihuriyê. Naxwe bi hev re jiyan wê çawa mimkun be? Lihevhatin wê çawa pêk were?

Brudholm dibêje, mexdûra/ê sax filîtî, nikare jiyana xwe bi civakekê re/di nava civakekê de dewam bike ku wê erjengiya exlaqî ya qewimî – bi ser de jî erjengiya exlaqî ya sûcekî li ser navê wê/wî hatî kirin - hîna qebûl nake. Bi ser de jî ev ne meseleyeke rikdariyê ye ku bi tenê ji ber qebûlnekirina tiştên qewimî û berpirsiyariya tiştên qewimî pêk tê; mesele meseleya wê tirsê ye ku yên qewimîn ji ber nebûna sozekê, garantiyekê dikarin dîsa biqewimin.[209] Yên ditirsin û yên ku mirov ji wan ditirsin bi tenê li rêyekê digerin ku bêyî ku li hev biqelibin bijîn. Lê belê ji bo lihevhatinê lihevqelibîn divê. Belkî jî ji ber vê yekê Améry redkirina lihevhatina dîrokî weke şertê lihevhatina civakî dibîne.[210] Bi gotineke din, lihevhatina mirovan bi hev re cihê ye ji lihevhatina wan a bi dîrokê re. Û ji bo ku ya pêşî bibe, divê ya duyem nebe, ango lihevhatina mirovan dikare li ser redeke rabihuriyê ya hevpar were avakirin.[211]

Améry bi awayekî mantiqî, bê wate dibîne ku dema mirov bi êşkencekarên xwe re, bi yên alîkarî dayî wan re û bi yên bêdeng li tiştên diqewimîn temaşe kirî re minaqeşe dike doza objektîfbûnê li wan bike: "xisleteke objektîf a ... hovîtiyê nîn e".[212] Ya rastî, ew bangê li her kesî dike, dema ku behsa rikdariya/xeyda xwe dike jî dev ji vê objektîfbûnê yan jî bêalîbûnê berde, vê carê bi xwe re be, xwe bibihîze, bêdeng nemîne. Dema ku ew dibêje, ezmûna êşkencê di herî bingehê xwe de "tenêtiyeke mutleq" e; yekane tişta ji ber ezmûna êşkencê dimîne hisa "xerîbbûna li dinyayekê" ye ku bi qasî ku tu pevragihana insanî nikaribe telafî bike mezin e û kesa/ê ji êşkenceyê sax filitî wê tu carî li dinyayê xwe li mala xwe his neke, ma ne diyar e ku ew dixwaze xwe ji vê hisa

207 Brudholm, 2008, 107. Ji bo têgeha Améry ya rikdariyê wekî din binihêre li Assmann, 2003; Zolkos, 2007.

208 Brudholm, 2008, 110.

209 Brudholm, 2006, 16.

210 Brudholm ve Rosoux, 2009, 40.

211 Brudholm, 2008, 116.

212 Améry, 1980, 70.

her dewam dike ya “terikandîbûnê” xilas bike, ev tenêtî, xerîbbûn, bêmalî, bê cih û warî xilas bibe?[213] Di vê daxwazê de ma ji hisên mîna tolhildan, heyfstandin, kînê bêhtir xeydeke/rikdariyeke mişt barkirî ye bi nifrînê nîne? Nabe ku îfadekirina vê xeydê/rikdariyê bi awayekî hêsan weke reaksiyoneke hestiyar were dîtin, lewma dema Améry ezmûna xwe radigihîne, ew kirinek û bangeke exlaqî û ya ji wê jî girîngtir gelemperî ango siyasî dike.

Îtîraza Arendt li veşartina hestên neerênî tê bîra mirovî, nexasim dema îfadekirina hovîtiyekê, perîşaniyekê, felaketekê. Qehirîn niçikeke bivênevê ya hovîtî, felaket, perîşaniya behsa me li ser e; weke mînak Arendt dibêje, heta ku xizaniya zêde hebe, ew beşa xizaniya zêde ye.[214] Ew bi bîr dixe ku ne mimkun e ku mirov bi awayekî ‘objektîf’ binivîse berpirsiyariya bêyî tewişandin dana der a bêedaletiya mirovî şahidiyê lê dike, bi gotineke din, bêyî ku mirov feraxet bike ji melekeyeke insanî ya weke nerazîbûna ji bêedaletiyê. Bi ser de jî mixatebê vê nerazîbûnê ne bi tenê ew mirov in ku di nava heman dema diyar de jiyane. Weke mînak elmanên nû ji dayik bûyî, eynî weke yên di serdema Naziyan de jiyayî û şahidî kirî li qirkirinê helbet bêguneh in. Lê belê guhertî be ji yên serdema Naziyan jiyayî jî berpirsiyariya wan dewam dike. Nifşên nû berpirsiyar nînin ji rabihuriya Naziyan, lê belê ji awayê rahiştina rabihuriya ku ji civaka dîrokî û siyasî ji wan re mîras maye, berpirsiyar in.[215]

Welhasil, mirov redkirina fêmkirina failan,lêborînê û bi awayekî giştî lihevhatinê rave bike weke daxwaza tolhildanê yan pirsgirêkeke psîkolojîk, yan jî naşhîtiya exlaqî, helwêsteke têra xwe serikî ye.[216] Heta, Brudholm dibêje, Améry peywendiyê datîne di navbera şêwazekî taybet ê rikdarî/xeydê û fezîlet û nirxên cihê de: “rabûna li ber jibîrkirin û lihevkeriyeke serikî; têkoşîna ji bo bidestxistina rûmetê; têgihiştineke kûr a di biwara xwezaya nabe were selihandin a tiştên qewimî de; belgeyek e ku dike ku fail di xwezaya exlaqî ya dilçepel a kirinên xwe bigihe û nuqteya kilît a nihêrîneke di biwara ji nû ve insanîkirina têkiliyan de.”[217] Ha ev nuqteya kilît ew dever e ku mexdûrên ku red dikin ku lêbibihurin û li hev werin, wan kesên ku wextekê neadil bûn vedixwînê da ku adil bin. Xeyda mexdûran çavek e ku dike ku serketina çerxên edaletê heta hetayê netemam bimîne, nihêrînek e ku timî edaletê bi tişta

213 Améry, 1980, 70, 39-40; dema ku Arendt behsa dostê xwe Waldemar Gurian dike, ji Gurian re dibêje, “yekane tişt a li vê dinyayê dike ku mirov xwe li malê his bike, dostanî ye” (1968, 251).

214 Arendt, 1994. 403.

215 Brudholm, 2008, 150.

216 Brudholm, 2006, 23.

217 Brudholm, 2008, 151.

siyasî re dike yek. Bi vî awayî, mirov dikare bibêje, hestên weke rikdarî, nifrîn û xeydê ku weke bistbûna di rabihuriye de tên binavkirin hestên erênî ne ku dikin ku mexdûr xwe ji rabihuriya xwe xilas bike, wî vedigerînin pirsgirêkên roja me ya îro, bi awayekî aktîf dike ku berê xwe bide failan, kurt û Kurmancî wan siyasî dike. [218]

Di têkiliyên me yên em bi kesên din re datînin heke em nifrîn û kînê bitepisînin, xeydê îfade nekin, wateya wê di heman demê de ew e ku em naxwazin bi mirovên weke wan re têkiliyê deynin; di têkiliya me ya bi zarokekî, pisîkekê, nebatekê, tiştekî re cih ji nifrîn, kîn û xeydê re nîne. Mirovên ku wê tu carî ji xwe nefret nekin û ji xwe nexeyidin ew in yên ku tên dîtin yan weke objeyên polîtîkayên civakî yan jî weke parçeyên pirsgirêkeke ku divê mirov rahêjiyê yan jî çareser bike.[219] Bi gotineke din, ewên ku em li hemberî wan ne hestiyar in. Heke em li hemberî kesekî ne hestiyar bin, hingê em nikarin pê re nîqaşê bikin; em pê re bipeyivin jî heta pê re muzakere bikin jî em nikarin pê re fikir bikin û bidin.[220] Dema ku Scheler dibêje, "kesekî ku agirê tolhildanê di dilê wî de nebe, nikare 'lêbibihure' û kesekî nehestiyar jî nikare 'xweş bibîne'" behsa rewşên insanî dike ku bi tenê kesên hestyar dikarin ji xwe re bikin kul û derd.[221]

Xeyd û rikdarî ku hestiyariyeke mişt in ji nifrînê, îşaret bi hêviyekê dikin ku hîna dipê ku aliyê hember berpirsiyariyê bigire ser xwe. Hebûna vê hêviyê girîng e ji bo birêxistinkirina haydarbûneke di biwara bêedaletiyê de, ji nû ve yan jî ji bo cara pêşî avakirina dostaniya siyasî. Mihai dibêje, hestên neerênî yên weke rikdarî û nifrînê nîşanên cudakerî, zext û bêedaletiyê ne, barometroyên krîza rewabûnê ne.[222] Di wan civakan de ku nebûna elaqeya siyasî beramberî kuştin yan jî wendakirinên failên wan nediyar veguheriye nexweşiya civaka sivîl, aşkere ye ku hestên bi vî rengî hişyarkereke cidî ne. Rast e ku civakeke siyasî ya ku nikare bersivê bide hêviyên edaletê yên rewa, îşaret bi hilweşîna xwe bi xwe dike.[223]

Mihai îdîa dike ku xisleta hestan jî weke ya fikran e û mirov dikare fêrî wan bibe. Heke edalet hestek e, hingê bêedaletî jî wisa ye û mirov dikare di ser kesên din re bi herduyan jî bihise. Bi vî awayî, ev hest xwediyê wê kapasîteyê ne ku di avakirina çanda siyasî ya demokratîk de bi roleke girîng rabin. Bi ser de jî heta ku

218 Binihêre li Hirsch, 2011, 182.

219 Binihêre li Brudholm, 2006, 13.

220 Strawson, 1974, 9; Brudholm, 2008, 11.

221 Scheler, 2004, 67.

222 Mihai, 2010.

223 Mihai, 2010, 194.

bi roleke bi vî rengî ranebin, îhtîmaleke mezin e ku ev hest bi awayekî bi şidtir derbasî nifşên nû werin kirin û veguherin tolhildana siyasî. Helbet ji bo vê yekê, divê were misogerkirin ku ev hest li meydana giştî û bi rêbazên guncaw werin îfadekirin. Dibe ku mimkun be mirov çerxên ku bikin qanûn û saziyên siyasî berê xwe bidin meseleyên ku ev hest îşaret bi wan dikin, bi van hestan bixebitîne. Heke çavkaniya kînê hestên ku mirov nikare wan biherikîne rêyên demokratîk, nasnameyên nayên naskirin û tirs ji wan heye, hingê diyar e ku hest ne bi tenê yên dinyayên şexsî ne. Kurt û Kurmancî, xeyd û rikdariya mişt e ji nifrînê dikare bibe zemînê dostaniyeke siyasî ya li dijî bêedaletiyê.

### ***Dostaniya siyasî***

Arîstoteles sînorê civakeke siyasî weke sînorê dostaniya di navbera endamên wê civakê de di heman demê de weke sînorê edaletê jî diyar kiriye.[224] Tişta ku nîşan dide ka civaka siyasî li ku dest pê dike û li ku bi dawî dibe di heman demê de nîşan dide ka dostaniya di navbera mirovan de jî li ku dest pê dike û li ku xilas dibe. Civakên ku di nava xwe de dijminatiyê dihewînin, di nava heman sînorên siyasî de li cem hev bijîn jî yek civaka siyasî ya bi tenê pêk naînin. Weke civakên siyasî yên cihê di bin heman birêveberiya siyasî de ne hingê. Mirov dikare bifikire ku têkiliya ku Arîstoteles di navbera civaka siyasî û dostaniyê de danî di serdema antîk de di nîzama bajar-dewlet de, teqabilî komên dînî yên serdema navîn, yên di rejîma împeratoriyê de û di serdema modern de di peywenda netewe-dewletê de jî teqabilî neteweyan dike. Li aliyê din dibe ku mimkun be ku di serdema postmodern ya pêkhatinên serenetewe û jêrenetewe de, têkiliya di navbera civaka siyasî û dostaniyê de ji nû ve teqabilî komên dînî û etnîk yan jî pevretiyên herêmî bike. Di peywenda rûbirûbûna bi rabihuriyê re û gerîna li edaletê de em îşaret bi awayekî piştgiriya siyasî dikin ku wê karibe dostaniya di navbera ferdên ji civakên cihê yên siyasî de jî bihewîne. Bi vî rengê xwe dibe ku wateya gerîna li edaletê tevahiyek yan jî çerxeke çalakiyên siyasî be ku teqabilî afirandina dostaniyên siyasî dike.

---

224 Aristotle, Nicomachean Ethics, 1160a. Arîstoteles sê terîfên dostaniyê dike ku xwe disipêrin menfeet, kêf û xuypakiyê. Ew dibêje; dostaniya bêqisûr ew e ku teqabilî têkiliyên demdirêj dike yên di navbera mirovên adil û wekhev de ku hevdu ji nêz ve nas dikin, ev dostanî li gorî wî ev dostanî kêm tê dîtin û xwe disipêre xuypakiyê. Dostaniya siyasî bêhtir ew şêwazê dostaniyê ye ku xwe disipêre menfeet û berjewendiyan. Li aliyê din ew îşaret bi dostaniyeke siyasî dike ku nabe bi tenê li ser berjewendiyên hevpar ava bibe, di rewşekê de ku welatiyê baş û mirovê baş rasta hev tên, dema têkiliyên welatiyan hîmê civakekê bin ku armanca wê jiyaneke hevpar a bi xuypakî û adil be (binihêre li Aristotle, Politics, Part XI; Ward, 2011).

Arîstoteles dibêje, ya ku civakan bi hev ve digire û tişta ku qanûnçêker ji edaletê bêhtir qîmet pê didin dostanî ye. Lewma dema ku bi zehmeteke taybet ew hewl didin şerekî dijminane yê sivîl berteref bikin armanca wan a herî girîng ew e ku ahengeke weke dostaniyê pêk bînin: "Û dema ku mirov dost in, pêdiviya wan bi edaletê nîne, lê belê dema ku adil in jî pêdiviya wan bi dostaniyê heye; û rewşa azamî ya edaletê jî karekî dostaniyê ye."[225] Ev dostaniya ku rewşa azamî ya edaletê pêk tîne, pevrebûna zêhnî û dostaniya dildarî ya wan kesan e ku xwe ji gotina heqîqetê nadin alî, li ser xwe difikirin, xwediyê îradeya mihakemekirinê ne.[226] Mirov dikare têkiliyên di navbera endamên heman civaka siyasî de weke dostaniya siyasî terîf bike; endamên vê civakê bi rewşeke xuypakî ya heman civakê bi hev ve girêdayî ne. Belkî jî ji ber vê yekê, Arîstoteles gotiye, dostaniya siyasî şûna edaletê nagire, ango ew çêkirina qanûnên adil bêwate nake û qanûnên adil jî dostaniyê misoger nakin.[227] Dostanî û edalet girêdayî hev in; edalet dike ku em xwe bi çavên kesên din bibînin, dostanî jî dike ku em kesên din weke xwe bibînin.[228] Bi vî awayî, tevî ku têkiliya Arîstoteles di navbera edalet û dostaniyê de danî bi herdu têgihiştinên edaletê yên cezaker û selihandinê yên li jor minaqeşekirî re heye, bêhtir mijara edaleta selihadinê ye.

Aliyekî edaleta piştî şerî jî ew e ku sîstema hiqûqê yan jî bêhiqûqiyê ya ku zemîn çêkiriye ji bo arîşeyê ji holê rake, bike ku sîstemeke nû û adil a hiqûqê saz bibe û raserîbûna hiqûqê misoger bike.[229] Heke qanûnên ku wê jiyana hevpar diyar bikin ji bo wê civaka ku piştî şerî ji nû ve yan jî ji bo cara pêşî pêk were, bi wî rengî werin çêkirin ku rê vekin li dostaniya azamî ya muhtemel a di navbera ferdên wê civakê de, hingê divê verastkirinên qanûnî yên ku derfetê diafirînin ji bo rûbirûbûna bi rabihuriyê re jî bihewînin. Lê belê ji ber ku qanûnên adil ên ku wekheviya welatiyan hîmê wan e, avabûna dostaniyê misoger nakin, lewma jî divê îradeyeke civakî jî pêk were ku bang li welatiyan bike ku adil bin ango ji bo hev fikar û endîşeyan bikin. Heta, mirov dikare bibêje, banga adilbûnê, banga wê yekê ye ku ji me dixwaze em elaqedar bin bi meseleyên ku mijara daxwaza edaletê ne û bi derdên kesên din ên ku em bi wan re dijîn, ango ew banga siyasîbûnê ye. Kom û ferdên bi hev re dijîn, ji bo ku ew karibin bibin endamê heman civaka siyasî kafî nîne ku bi tenê rêzê

225 Aristotle, Nicomachean Ethics, 1155b.

226 Binihêre li Salkever, 2008, 61.

227 Binihêre li Ward, 2011, 446.

228 Binihêre li Salkever, 2008, 66.

229 Binihêre li Bell, Campbell û Ní Aoláin, 2004, 308-312.

ji hev re bigirin; ji bo ku bigihîjin hev li ser terîfkirina edaleta ku wê dostaniyê ava bike, divê ku ew endîşeyên hev parve bikin.[230]

Arîstoteles dostaniya siyasî ya li ser hîmê jihevhezkirin û endîşeyên ji bo hev ava, pêş didît ji bo rejîmên siyasî yên adil ên ku bi tenê dikarîbûn li bajar-dewletên bi beşdariya siyasî ya yekser; dibe ku mirov bibêje ku cihê vê têgehê nîne li netewe-dewletên roja me ya îro yên xwe disipêrin demokrasiya parlemanter/temsîlî û di têkiliyên fermî yên ferd-welatiyan de ku li navenda wan berjewendî hene. Heta, mirov dikare bibêje ku Arîstoteles di biwara felsefeya siyasetê de şîroveyeke ji hedê xwe zêde kiriye. Jixwe, li gorî hinan ji bo avakirin û parastina edaleta civakî hebûna dostanî û piştgiriyê ne şert e, nebûna dostaniyê têrê dike û kafî ye.[231] Ev şertê têrker weke ku lê be xuya dike ji bo civakên şerê navxweyî li wan neqewimî, û ya rastî bêhtir ji bo civakên siyasî yên cîran. Lê belê heke mesele ew be ku komên di dema şer de bûyî dijminên hev yan jî ji ber ku veguherîn dijminan şerê hev kirin bi hev re civakeke siyasî ava bikin, hingê nebûna dijminatiyê, rastî wê rewşê tê ku jê re aştiya neerênî tê gotin û tê de sîleh nehatine danîn lê belê her weha nayên bikaranîn jî. Di rewşeke bi vî rengî de bi îhtîmala herî baş em dikarin behsa aştiyeke erênî bikin ku encama wê dê bibe damezrandina civakên siyasî yên cihê bi destê komên şerê hev kirî. Hellbet mirov dikare çareseriyeke bi vî rengî tercîh bike. Tercîha din bi xwe, gerîna li rêyan e ji bo avakirina civakeke siyasî ya ku gava wê ya pêşî rûbirûbûna bi rabihuriyê re be, bersivê bide banga edaletê û dostaniya siyasî mayînde bike. Aşkere ye ku lêgerîneke bi vî rengî, çawa ku me li jor jî behsa wê kir, bang li endamên civakê dike ku siyasî bin, ango demokrasiya radîkal ava bikin.

Tişta ku em bi demokrasiya radîkal behsa wê dikin ji nû ve bibîranîna bihevvegirêdana siyasîbûnê û dostaniyê ye, ango ji nû ve bibîranîna wateya têgeha siyasî ya resen û heqîqî ye. Ji bo vê jî mirov dikare Arîstoteles bike destpêk; ew, mirovî ji ber behredariya wî ya hizirîn û peyivînê weke "heywanekî siyasî" û dostaniyê jî weke dermanê ji bo jiyaneke bifezîlet û civakeke utopîk nabîne, ew wê weke rengekî çalakiyê yê ji bo jiyaneke baş a bi hev re dibîne.[232] Piştre em dikarin bidin ser şopa Arendt; ew, çalakiya mirovî tevî mirovên din ji kirin û gotinên azad ên li meydana giştî pêk tê weke "siyasî" bi nav dike, ew dinyayê "heke ji aliyê mirovan ve timî neyê peyivîn, bi wateya gotinê weke cihekî ku 'derî mirovahiyê' bimîne" dibîne û diyaloga siyasî ya heqîqî li navenda dosta-

230 Binihêre li Leontsini, 2013, 32.

231 Binihêrin Hope, 2013.

232 Aristotle, Nicomachean Ethics, 1170b; Salkever, 2008, 67.

niyê bi cih dike.[233] Tevî ku Derrida dema dostaniyê sînordar dike bi têkiliya yekane ya di navbera du kesan de weke ku dostaniyê ji piranîbûnê û siyasîbûnê bêpar bihêle xuya dike jî, wê ne şaş be mirov bibêje ku di bingeha texeyula Derrida ya "demokrasiya mirov li bendê" de weke kirineke daimî, dostaniya siyasî heye.[234]

Cihê ku demokrasiya mirov li bendê wê bide der, bêguman meydana giştî ye ku em îro sînorên wê ji nû ve minaqeşe dikin. Di serdema moderníteya dereng de meydana giştî/dewletî berevajiya dildariyên ferdî, alîgir, subjektîf û zerarker bi aqlê gerdûnî, bêalî û objektîf ji nû ve hat sînordarkirin, bû amûreke vederkirina mixalifan ji meydana siyasî û hepiskirina bêîmtiyazan li qada taybet. Bi vî awayî meydana giştî/dewletî ya ku bi çîtên neteweyî hatiye pêçan, hatiye girtin li ya siyasî, pirengiyê û çalakiyên azad ên mirovan tevî mirovên din. Bi siyaseta ku pratîk, minaqeşe û saziyên ku nîzameke mutleq her ji nû ve hildiberînin, hewl hatiye dayîn ku ev meydan were sabitkirin. Li aliyê din, çawa ku Mouffe jî bi bîr dixe sînorên meydana dewletî/giştî ango yên vê siyaseta serdest bi destê bûutê şerî ango bi destê bûutê siyasî tê binpêkirin, zor lê tê kirin.[235] Bi vî rengê xwe, ya siyasî teqabilê wê têkoşînê dike ku şêwazên hebûnê yên tine hesibandî, bêqîmetkirî, xistî bin nîrê hikûm ango mexdûr bi rê ve dibin ji bo ku cihê xwe di meydana dewletî/giştî de ji nû ve bigirin. Ev têkoşîn ne bi tenê têkoşîna meydana dewletî/giştî ye, di heman demê de têkoşîna mexdûran a veguherandina vê meydanê ye bi tiştên dibêjin û bi awayê dibêjin.

Çawa ku Mouffe jî îşaret pê dike, nabe ku siyaseta demokratîk were sînordarkirin bi armanca gihiştina lihevhatineke civakî bi tenê bi berjewendî û nirxan. Divê mirov qebûl bike ku di siyasetekê de ku siyasîbûn zindî ye, ne mimkun e ku mitabiqbûneke rasyonel a her kesî bihewîne û bivênevê cudabûna em/ew dide der a ku timî weke nasnamegirtina kolektîf xuya dike.[236] Hestên ku li jor me behsa wan kir jî bivê nevê li meydana dewletî/giştî rasta hev tên, û ev jî parçeyekî vê bivênevêyê ye. Lê belê, ev pêrgîhevhatin bêguman teqabil nake li şerê di navbera aîdiyetên sabit û xwezayî yan jî nirxên exlaqî de yên ku nabe li ser wan were muzakerekirin, ew teqabilî têkoşîna di navbera nasnameyên siyasî de dike. Heta, divê mirov qebûl bike ku demokrasî yekûna pêrgîhevbûnên bi vî rengî ye, ne şiklekî birêveberiyê ye; ew pêk tê bi tenê ji

233 Arendt, 1968, 24-26.

234 Derrida, 2005b.

235 Mouffe, 1993.

236 Mouffe, 1993, 30.

tecrûbe, “kêliyên siyasî” yên ku bi wan mirov ya siyasî bi bîr tîne û ji nû ve diafirîne.[237] Bi vî rengê xwe, dibe ku demokrasî ezmûneke siyasî ya demên derbasbûnê bi tenê be.[238] Dema ku em li dema derbasbûnê yan jî li dema piştî şerî weke dema rûbirûbûna bi rabihuriyê re bifikirin, hingê em dikarin bibêjin ku demokrasî û ezmûna ji nû ve avakirina civaka siyasî ya ku nabe bi lihevkirina destûrî were sînordarkirin, tayê hev in. Beriya ku em berê xwe bidinê ka minaqeşeya li jor çawa dikare rengê xwe li Kurdistan û Tirkiyeyê vede û tevî mixateban dest bi minaqeşeya mijarê bikin, em hewl bidin wê dema taybet ango “salên notî” teswîr bikin, êw salên ku bûn sedema destpêka vê minaqeşeyê û mixatebên me jî bi xwe şahidî lê kirin.

237 Hirsch, 2011, 180.
238 Hirsch, 2011, 170.

## *Beş III*
## **Salên notî li Tirkiye û Kurdistanê**

Dema ku mirov bi awirê îro li meseleyê dinihêre, mirov dikare bibêje ku salên rojava û rojhilatê Tirkiyeyê yên ku tu carî nehatine nêzîhevkirin, nikarîbûn nêzî hev bibin, herî zêde salên notî dûrî hev in. Li rojavayê Tirkiyeyê zarok li kolanên bi darbeya eskerî ya sala 1980'yî tenhabûyî, li malên bê pirtûk û li dibistanên bi senteza Tirk-îslamê mezin dibûn. Rêzefilma bi navê "Doksanlar" ("Salên notî") di kanaleke televizyonê ya taybet de tê weşandin û weke "rêzefilma zarokên dawî yên li kolanan lîstin" dihat terîfkirin, weke ku di danasîna vê rezefilmê de tê gotin, "salên 1990'î kanalên televizyonê yên taybet ên pêşî dest bi weşanê kirin, li her deverê xelkê guh dida kanalên radyoyê yên taybet, hema hema li her taxê ciwanên dixwestin bibin stêrkên muzîka popê hebûn, me wan salan telefonên destan û kompûter nas kirin".[239] Salên 90'î ji bo me wisa bûn, lê li aliyê din, ew zarok hebûn ku li kolanên wan sîleh, tank û mirî digeriyan, bavên xwe, xwîşk û birayên xwe û heta malên xwe ji dest dabûn, pê nizanîbûn ka dibistan çi ye. Ciwanên li rojava yên ku di nasnameyên muhafezekar, Tirk û apolîtîk de tengkirî yan jî xwe avêtî bextê wan nasnameyan, hema hema bêxeber mezin bûn ji hevsalên xwe yên li "rojhilat" ên îsyankar û ji ber Kurdbûna xwe bivênevê polîtîkbûyî yan jî neçar mayî polîtîk bibe. Helbet mirov nikare bibêje ku nifşên beriyan hingê jî pir dil hebûn hevsalên xwe yên Kurd bibihîzin û bibînin. Dîsa jî, têkoşînên derdorên çepgir di bin heman sîwanê de li dijî "dijminê hevpar" dikirin, dema ku li kêleka hev disekinîn, ehbabiyên bi cîran, hevpîşe û hevalên Kurd re ku heta ku ne Kurd bûn bêpirsgirêk bûn, ew demên ku "berê cudabûna Kurd û Tirk" nebû li paş mabûn. Li rojava bêdengî, li "rojhilat" şer hebû. Nedîtina oxirkirina ber bi şerî ve ya wan kesên ku ji rojava ji bo eskeriyê diçûn "rojhilat" yan jî nepirsîna kîbûna kesê li bereya dijber a şerî, nepirsîna sedema hebûna şerî, "nezanîna" wê ji ber edeba mirovî bû.

---

239 http://www.televizyondizisi.com/index.php/doksanlar-sokakta-oynayan-son-cocuklarin-dizisi/145624/35/ [6'ê GUlana 2014]. Di danasîna pirtûka bi navê 90lar - Çocuk mu, Genç mi? (Salên 90'î - Zarok yan Ciwan?) ya ku behsa heman demê dike, weha tê gotin: "ji sînemaya salên 90'î heta bi çanda wan a televizyonê, ji jiyana li kolanan heta bi têkoşîna civakî, ji salên dersxaneyan heta bi serhatiya destpêkirina zanîngehê, ji naskirina kekên çepgir heta bi 1 Gulanan, ji xwendina li imam hatipan ("dibistanên gihandina mele û xetîban) heta bi evînên me yên pêşî, heta bi mirovên salên 90'î navdar ên tesîr li jiyana me kirî, ji çanda muzîkî heta bi cilûbergan û heta bi jiyana nava malê ya salên 90'î, hema hema li ser her mijarê bi ziwatekî ji dil me bi nivîsê 'behsa xwe' kir" (binihêre li Aydemir, 2012). http://www.dr.com.tr/kitap/90lar-kitabi-cocuk-mu-genc-mi/kadir-aydemir/edebiyat/anlati/urunno=0000000383540 [6 Mayıs 2014].

Sernavê jor ê pirtûka bi navê 90'larda Güneydoğu'da Çocuk Olmak (Zarokbûna salên 90'î li Başûrrojhilat) a ku piştî salên notî bi bîst salan hat weşandin ne belesedem "Bildiğin Gibi Değil" ("Ne weke tu dizanî ye") bû.[240] Di rûpelê bergê yê piştê de dihat gotin, ev pirtûk "divê weke gotina kula dilê xwe ya ciwanên Kurd ji hevsalên xwe yên li bajarên mezin ên li rojava re were xwendin". Ciwanan behsa "jiyana xwe ya malbatî dikir ku tê de bavên wan, dayikên wan, xwîşk û birayên wan, hevalên wan li ber çavên wan lêdan dixwar, dihatin kuştin, zor li wan dihat kirin ku bibin cerdevan, li malên wan gule dihatin reşandin, 'mirovên ku hez ji wan dikirin, qîmet bi wan didan, yek bi yek wenda dibûn' û mişt ji bêrîkirina ji dil a xizmên wan ên ku ji dest dane." Avsiya digot, "ez bi tenê dixwazim ku xelk zanibe li vir me çi êş û azar kişandin." Avrêhanê digot, "dema ku tu zanibî aliyê hember li te serwext dibe, tu wê bibêjî temam, dibe ku tu pê re li hev werî, aştiyê bikî, lê belê ji bo ku ji te fêm nekin li ber xwe didin"; herçî Xêzek e, nerazîbûna xwe ya li hemberî wanên li rojava weha derdibirî: "dema ku li vir evqas zilm li me dihat kirin, yên li rojava timî ji me re 'terorîst' gotin".[241] Yên li rojava nizanîbûn, fêm nedikirin û heta gunehbar dikirin.

Van rojan, ew demên ku fêhmkoriya yên li rojava bi îfadeya herî baş dikarîbû bi cahiltiyê were rave kirin, êdî li paş dimînin. Heta li gorî Başak Canê asta cahiltiyê tu carî ne ewqas bû ku bibe bahaneyek:

> *Tevî astengkirinên bunyewî û burokratîk, sansûr û zextê hemûyî jî, pirbûna belge, şahidî û vegotinên di dema şer de û heta roja me ya îro hatin hilberandin nîşanî me didin ku nabe em xemsariya beramberî şerî daxînin meseleya nebûna agahiyê yan jî nezanîna bi êşên tên kişandin. Hêj ji nîvê salên 1980'yî ve girtenameyên parlemanê hene ku zilma şerî nîşan didin û piştrast dikin, pêşniyarpirsên nivîskî û devkî hene, biryarên Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê, raporên ku rêxistinên mafê mirovan ên neteweyî û navneteweyî, zanîngehan amade kirî, rêzenivîsên di rojnameyan de weşandî, hevpeyvîn, şahidiyên rojnamevanan û kesên saxmayî hene, tezên û raporên tiba edlî yên nivîsî hene. Ji mêj ve agahiyên di biwara şerî de hatine tomarkirin. Piraniya van agahdarî û zanînan li her kesî vekirî ye, hin ji wan bi awayekî belav hatine weşandin, nexasim van deh salên dawî ev zanîna di biwara şer de bi hejmar, wêne û nûçeyan her zêde dibe, her diçe bi rêya bêhtir çavkanî û kanalan li ber çavên her kesî tê raxistin. Lê belê ev agahiyên zêde dibin ne dawiyê li nijadperestiyê tînin, ne jî dikin ku mirov ji rabihuriyê dersan bigirin.*[242]

---

240 Rojin Canan Akın û Funda Danışman, Metis Yayınları, 2011.

241 Akın û Danışman, 2011, 87;61; 155.

242 Can, 2014b.

Weke keseke li bajarekî piçûk ê rojavayê Anatolê ji dayik bûyî, ez dikarim bibêjim, em di nava rojevekê de mezin bûn ku hema hema ne mimkun bû ku haya me nebe ji zanîna di biwara şer de ku salên 90'î belav bû. Lê belê, nexasim bi salên 2000'î re tevî ku em gihiştin belge û şahidiyên nû û kevin jî di piranîya hevsalên be de mandelkirin û nifrînê xwe da der, ev yek jî tesbîta dawî ya Can piştrast dike:

> *Nezanîn ne bi tenê tercîhek e; ji bo hin rewşên hebûnê zanîna ya bi rengên din, lêhizirîn yan jî parastina wê hilweşîner e. Rewşên hebûnê yên bi vî rengî yên ku nikarin bi tenê bi zext, sansûr, tirs yan jî nezanînê werin ravekirin, bi ya min wê fikra xweşbîn a ku dibêje, bi qewmînan nedihat zanîn, heke bi wan bihata zanîn, wê destûra wan nehata dayîn, ne mimkun dike.*[243]

Hingê, ew tiştên salên 90'î li "rojhilat" qewimîn bi temamî çi bûn ku yên li rojava naxwazin pê zanibin, zanibin jî naxwazin jê bawer bikin, jê bawer bikin naxwazin li ber rabin; ji bo çi evqas belge û şahid têrê nakin ku îradeya rûbirûbûna bi rabihuriyê re were afirandin? Weke ku Can di nivîsa xwe de dipirse, çawa dibe ku mimkun be mirov "rewşên şahidiyê yên ku banga çalakî, siyaset û veguherînê dikin" texeyul bike û hilberîne? Pirsa dawiyê xema herî mezin a vê xebatê ye. Em ê vê xemê di beşa bê de beriya ku em cih bidin gotinên şahidan bi awayekî kite bi kite minaqeşe bikin. Di vê beşê bi xwe de em hewl bidin berê xwe bidin meseleyên ku dikarin bibin bersiv ji pirsa pêşî re, ango salên 90'î li Kurdistan û Tirkiyeyê çi qewimî.

Helbet, beriya her tiştî divê mirov bibêje ku di rewşa awarte de hat kirin a ku heta hingê li Kurdistanê hebû. Em pê dizanin ku li Kurdistana salên 90'î veguherîneke civakî û bîrewerbûneke siyasî ya "hêjayî" vê qanûna rewşa awarte pêk hat ango dema serhildanan pêk hat. Herçî Tirkiye ye, salên 90'î newekheviyên civakî yên ku polîtîkayên neolîberal dikirin ku şax berdin, bêîstîqrariya siyasî, bajarên ku ji ber koçberiya bi darê zorê yan jî bi dilê xwe nifûsa zêde dibe ya ku hew di wan de hiltên, aloziyên civakî û çandeke populer a apolîtîk a rexmî van aloziyan û heta belkî ji ber van aloziyan di nav ciwanan de xurt dibû, hebûn. Di demekê de ku şerê sar hîna nû bi dawî bûbû, Tirkiyeyek heye ku dixwaze bibe endamê Yekîtiya Ewrûpayê, hema li ber serê wê şerekî ku Kurdan ji nêz ve û gelekî elaqedar dike dimeşe, lê belê dîsa jî ji bûyerên siyasî yên li dinyayê û minaqeşeyên teorîk bêxeber e. Bêguman diyarkirina xetên vê çarçoveyê hemûyan û dagirtina nava wê hem ji kapasîteya min û hem jî ji ya vê xebatê dibuhire, lê belê têra xwe weşan hene di wê astê de ku dikarin

243 Can, 2014b; nivîsên tewandî yên nivîskarê ne.

xwendevanên elaqedar tetmîn bikin. Em tevahiya taqeta xwe ji bo teswîrkirina salên 90'î yên Kurdistanê bi kar bînin. Beşa yekem a vê teswîrê helwêsta Komara Tirkiyeyê ya beramberî Kurdistanê dihewîne bi alîkariya bikaranîna lîteratura li ser dewlet, hiqûq û şîdetê, beşa duyem jî rabûna Kurdistanê a li ber Dewleta Komara Tirkiyeyê dihewîne û dema vê dike sûdê werdigire ji têgehên berxwedan, veguherîna civakî û siyasîbûnê. Beriya ku em dest bi vê teswîrê bikin, em bi kurtî cih bidin minaqeşeyeke di vê dema nêzîk de dest pê kirî.

Havîna 2014'an 'pêvajoya çareseriyê' ya ku bi hevdîtinên di navbera Abdullah Ocalan û rayedarên dewletê re dest pê kir û nexasim bihara 2013'an bi lez bû, ji nû ve hat cemidandin. Bi ser de jî weke nerazîbûna ji reng û dengvedana têkoşîna li Rojava li Tirkiyeyê pêkanîna qedexeya derketina kolanan, verastkirinên qanûnî yên nû ku çav li rê ye erkên polês zêde bikin û kuştinên bêpirs û îfade yên li nava kolanan, dîmenên salên 90'î bi awayekî xwezayî bîra kolektîf aktîf kir û kir ku pirsa "ma gelo ev vedigerin salên 90'î" derkeve meydanê û bigere.[244] Em deynin aliyekî ka gelo vegera ber bi salên 90'î ve mimkun e yan na, ya rastî bi hêsanî afirandina têgihiştineke zemîn çêdike ji bo aktîfbûna bîreke kolektîf a bi vî rengî, divê bibe meseleya esas a minaqeşeyê. Bi gunehên li dijî mirovahiyê yên salên 90'î re rûbirûbûn pêk nehatiye, fail û berpirsiyarên van gunehan nehatine dadgehkirin, gavên bi bingeh ên ji bo bersivdayîna hêviyên mexdûran hîna nehatine avêtin, helbet di rewşeke bi vî rengî de belavbûna gotina vegera ber bi salên 90'î ve, rewşek e ku mirov dikare fêm bike. Bi ser de jî dewlet hem bi tedbîrên qanûnî û gotinên dewletî hem jî bi pratîkên xwe yên şedîd hewl dide careke din çavên xelkê bitirsîne, hewldana dewletê ya bi vî rengî jî di wê astê de ye ku dibe hîmek ji vê rewşê re. Li aliyê din dema Cuma Çiçek dibêje ev vegera behsa wê tê kirin wê ne ber bi salên 90'î ve be, wê ber bi pêvajoyeke gelekî zêdetir bi şer ve be, îdîaya xwe disipêre van sedemên li jêr: bi rêya dewleta federa a Kurd a navenda wê Hewlêr û kantonên li Rojava damezrandî hem hevsengiya herêmî û hem jî ya navneteweyî bi wî awayî guhert ku li xêra Kurdan be, bi ser de jî Kurdên li nav dewletên cihê parçekirî di nava vê pêvajoyê de bûn yek û xurt bûn; seferberiya civakî-siyasî di warê cografî de fereh bû û weke kalîte jî kûrtir bû; dûrbûna nifşê nû û ciwan ê Kurd ji navendê û nifrîna vî nifşî ji rojavayê Tirkiyeyê, ev nifşê "di nava mexdûrbûna pirhejmar" a salên 90'î de "bi awayê ji mafên herî sereke yên weke sitirîn, xwarin, perwerde, tenduristî û karkirinê bêpar mayî, bi bîra kolektîf a di biwara şîdeta dewletê de mezin bûyî"; û herî dawî ferehbûna mekanî ya ku bajarîbûn û sazîbûnê bi xwe re anî û bi pêvajoya koçberiya

244 Çiçek, 2014; ji bo seyra dîrokî ya pêvajoya çareseriyê binihêre li Ercan, 2014.

bi darê zorê û bi tecrûbeya birêveberiyên cihî yên Kurd re bi pêş ket.[245] Ji van sedeman, qismî ji bilî ya pêşî, kokên hemûyan xwe disipêrin şîdeta dewletê ya ku Kurd salên notî dûçarî bûnê û berxwedana Kurdan an li hemberî vê şîdetê.

### *Rewşa îstîsnaî ya Tirkiyeyê:Kurdistan û Salên Notî*

Meyleke maqûl e ku mirov minaqeşeya serdema Naziyan a Elmanyayê, birêvebirina Franse ya krîza Cezaîrê, tehekuma Meliktiya Yekbûyî li ser Bakurê Îrlandayê, otorîteya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê li Guantanamoyê û siyaseta dewleta Tirk a Kurdistanê a salên 90'î û "rewşên îstîsnaî" yên gelek rejîmên netewe-dewletan bi rengê heyî, bi terîfa hikûmraniyê ya Carl Schmitt û têgeha rewşa îstîsnaî ya Giorgio Agamben minaqeşe bike. Schmitt dibêje, "yê ku rewşa serwer a îstîsnaî diyar dike, kes e".[246] Tişta ku mafê diyarkirina rewşa serwer a îstîsnaî dide jî têkiliya di navbera hiqûq û şîdetê de ye ku di cewherê damezrandin û hebûna yê hikûmran de heye. Ne hedê vê xebatê ye ku minaqeşeya vê têkiliyê bi qasî ku heqê wê ye, bike, lê belê ji bo ku em kurt û kurmancî behsa wê bikin, em ê sûdê bigirin ji gotinên Benjamin Walter: "tiştên ku her parleman di warê fonksiyona xwe ya sereke dike, bi tenê hem ji aliyê kok û hem ji aliyê encamê ve hukmên qanûnî ne ku bi şîdetê hatine bidestanîn."[247] Şîdeta di bingehê qanûnê de di heman demê de ew tişt e ku erka betalkirina qanûnan, cemidandina wan ango bi rêya şîdetê ji nû ve yan îstîsnaî çêkirina qanûnan yan jî parastina qanûnê dide hêza hikûmran; û ev hêza hikûmran qanûnê çêdike û wê diparêze, tebayên xwe ji şîdeta ji her şêwaz çavkaniya ji bilî xwe diparêze, ango xwediyê yekdestdariya şîdetê ya rewa ye. Bi vî rengî rewşa îstîsnaî ew rewş e ku hikûmran wê diavêje derveyî hiqûqa asayî û hikûmkirina xwe bi rêya şîdetê dewam dike. Em behsa wê minaqeşeyê bikin a di biwara wê pirsê de ka erka biryara hikûmranî ya rewşa îstîsnaî qanûnî yan jî rewa ye yan ne, em ê vê bikin dema em lê binihêrin ka gelo kîjan rewş weke rewşa îstîsnaî tê terîfkirin.

Agamben dibêje, yek ji hêmanên ku zehmet dike mirov li rewşa îstîsnaî serwext bibe têkiliya ji nêz ve ya rewşa îstîsnaî bi rewşên şerê navxweyî, îsyan û berxwedanê re ye.[248] Di van rewşan de ku bi piranî şîdet tê bikaranîin, çawa ku Benjamin jî dibêje, "ne ji ber sedemên derveyî qanûnê ku xizmeta wan dike, ji ber ku bi şexsê xwe li derveyî hiqûqê heye [ji ber ku ne di destê

---

245 Çiçek, 2014.

246 Schmitt, 2005, 6.

247 Benjamin, 1978, 289; wekî din binihêre li Derrida, 1992; Avelar, 2004.

248 Agamben, 2005, 5.

hiqûqê de ye] şîdet tehdîdekê pêk tîne.” Ev rewş, çavkanî ne ji bo xapiyanekê ku li gora wê bi rastî jî rewşeke îstîsnaî heye û divê qanûn werin cemidandin. Meseleyeke din jî pirsgirêka termînolojiyê ye. Agamben rewşa îstîsnaî weke rêzeke bûyerên qanûnî ku hema hema daîmî ye terîf dike, di teoriya elman de weke rewşa pêwîstiyê, di teoriyên îtalî û fransî de jî weke biryarnameya awarte û birêveberiya awarte, di teoriya anglo-sakson de jî weke birêveberiya urfî û erkên rewşa awarte tê teswîrkirin. Agamben îşaret bi girîngiya tercîhên peyv û binavkirinan dike û dibêje, rewşa îstîsnaî ne rewşeke wisa ye ku cudabûna erkan ji holê radibe (ango erkên hikûmetê zêde dibin), qanûneke taybet (weke mînak hiqûqa şer) lê ye, lê belê rewşek e ku tê de nîzama qanûnî bi xwe tê betalkirin û ev rewş di warê belavbûna erkên otorîteya eskerî yên dema şer li meydana sivîl de jî xwe ne bi rastî û eskerî lê belê bi gihiştina hev a rewşa birêveberiyeke urfî û betalkirina destûra bingehîn a xeyalî û siyasî dide der.[249] Jixwe, ew îşaret dike bi têkiliya di navbera hem rewşa pewîstiyê û rewşa îstîsnaî hem jî prensîpa şîdetê û prensîpa pewîstiyê û dibêje, rewşa îstîsnaî ya ku ji ber pêwîstiya berjewendiyên neteweyî û beqaya dewletê hatî ragihandin êdî ya rastî veguheriye rewşeke giştî, qaîdeyekê.

Rewşa îstîsnaî bi wê yekê dest pê dike ku ev rewş weke betalkirina demî ya destûra bingehîn yan jî hiqûqa asayî, weke rewşek e ku pêwîst dike ku rewşa awarte yan jî birêveberiya urfî were ragihandin, were terîfkirin. Bi vî rengê xwe, têkiliya di navbera şîdet û hiqûqê de careke din tê piştrastkirin. Rewşa pêwîstiyê bi piranî xwe weke pêwîstbûna qedexekirinê dide der. Agamben dibêje, “kesê qedexe li ser, bi rastî bi wateya temamî ne ew kes e ku wê/wî diavêjin derveyî hiqûqê û têkiliya wê/wî bi hiqûqê re qut dikin; ew kes e ku ku hiqûqê ew terikandiye, ango ew kes e ku li ser wê şêmûga di navbera hiqûq û jiyanê de, li wî cihê ku yê li derve û yê li hundir ji hev nayê derxistin, hatiye danîn û ew kes e ku li vir gef lê tên xwarin” û ew li gotinên xwe zêde dike û dibêje, tam ev şêmûg e mekanê hikûmranî.[250] Ango rewşa îstîsnaî teqabilî erka mutleq a hikûmranî dike ku tê de hikûmran dikare biryara jiyan û mirinê bide.

Ev minaqeşe alîkar dibe ku em serwext bibin li wê yekê ku dewleta Tirk di salên 90’î de Kurdistan veguherandibû mekanekî îstîsnaî û heta ev rewşa îstîsnaî dewamîbûnekê dihewîne ku ji beriya salên 90’î dest pê dike û ji wan dibuhire jî. Birêveberiya urfî ji sala 1978’an ve dewam dike, dema em lê bifikirin ku di navbera salên 1987 û 2002’yan de ev rewş weke rewşa awarte dewam dike, hingê mirov dikare bibêje ku Kurdistan 23 salan mekanekî îstîsnayê bû. Rewşa

249 Agamben, 2005, 4-5.

250 Agamben, 2001, 43.

awarte li gorî Qanûna Rewşa Awarte ya sala 1983'yan ango di encama "derketina holê a nîşanên cidî yên tevgerên şîdetê ên belav bi armanca jiholêrakirina her şêwaz nîzama demokrasiyê ya bi destûra bingehîn hatî damezrandin yan jî tunekirina maf û azadiyên sereke yan jî ji ber bûyerên şîdetê xirabûna nîzama dewletê bi awayekî cidî" de piştî pirsîna li fikra desteya Ewlekariya Milî, bi biryara Desteya Wezîran a 01.03.1984'an a bi hejmara 84/7781 hat ragihandin û ji bo wergirtina tedbîrên di xala 11'an a heman qanûnê de diyarkirî erkên pê destûra bingehîn betal bike, dane waliyê herêma rewşa awarte.[251]

Birêveberiya rewşa awarte pêşî li bajarên Çewlîk, Diyarbekir, Elezîz, Colemêrg, Mêrdîn, Sêrt, Dêrsim û Wanê dest pê kir, paşê bajarên Semsûr, Bedlîs û Mûşê jî weke bajarên cîran lê zêde bûn, herî dawî jî piştî ku Batman û Şirnex bûn bajar, bi tevahî li 13 bajaran hukmê wê dewam kir. Paşê pêşî hin bajar ji bin hukmê wê hatin derxistin û paşê bi betalkirinê rewşa awarte hat bidawîkirin. Di navbera 1987 û 2002'yan de waliyên herêma rewşa awarte ku ji ber

251 Ev tedbîr wiha ne: "a) sînordarkirin yan jî qedexekirina derketina kolanê, b) qedexekirina ger û civîna kesan û ajotina wesaîtan li deverên yan jî saetên diyar, c) dan sexîkirina ser, wesaît û tiştên kesan û desteserkirina tiştên xwedî xisleta amûra sûc yan jî delîl, d) mecbûrkirina li ser xwe gerandina belgeyeke ku nasnameyê diyar dike ji bo xelkê devera rewşa awarte û kesên ji derve ve biçin vê deverê, e) qedexekirin yan jî ferzkirina destûrstendinê ji bo çapkirin, zêdekirin, weşandin û belavkirina rojname, kovar, pirtûk, belavok, panoyên dîwaran û tiştên weke wan, qedexekirin yan jî ferzkirina destûrê ji bo xistina herêmê û li herêmê belavkirina ji van metbuatan ên li derveyî herêma rewşa awarte hatî çapkirin yan jî zêdekirin; desteserkirina pirtûk, kovar, rojname, broşur, afîş û metbuayên weke van ên çap û weşana wan qedexekirî, f) teftîşkirina gotin, nivîs, resim, fîlm, plak, bandên deng û dîmen û her şêwaz weşana bi deng, heke pêwîst bike tomarkirina wan yan jî qedexekirina wan, g) ji bo ku ewlekariya xwe misoger bikin ferzkirina girtina tedbîrên ewlekariyê yên taybet li ser sazî û bankeyên dewletê yan jî yên şexsan yên nazik û daxwaza zêdekirina van tedbîran, h) teftîşkirina her rengê lîstikên li ser dikê û peşandana filman, heke pêwîst bike rawestandin yan jî qedexekirina wan, i) bi ruxset jî bin qedexekirina li ser xwe gerandina her şiklê sîleh û guleyan û veguhestina wan, j) ferzkirina stendina destûrê yan jî qedexekirina li cem xwe mihafezekirin, amadekirin, çêkirin yan jî veguhestina her şêwaz cebilxane, bombe, madeyên texrîbkirinê, teqemenî, madeyên radyoaktîf, yan her rengê dermanên sotîner, peritîner û birînveker yan her şêwazê din ên jehran û gazên fetisîner yan jî madeyên bi rengê wan, û daxwazkirina radestkirina van madeyan û tişt, amûr û aletên bi kêra amadekirin yan jî çêkirina wan tên û yan jî desteserkirina wan, k) qedexekirina ketina herêmê ya kes û civakên ku zen ji wan tê birrîn ku nîzama dewletê yan jî ewlekariya dewletê xira bikin, derxistina wan a derveyî herêmê yan jî qedexekirina çûn yan jî bicihbûna wan a li hin deverên diyar li nava herêmê, l) Birêkûpêkkirin, qeydkirin yan jî qedexekirina ketin û derketina deverên li nava herêmê yên ku ew tesîs û pêkhate li wan in ku pêwîst hatiye dîtin ku ewlekariya wan were misogerkirin, m) qedexekirin, paşvexistin, ferzkirina standina destûrê ji bo tevahiya şêwazên civîn û meşên xwepêşandanê li derve yan jî li deverên sergirtî, yan jî diyarkirin, tesbîtkirin û texsîskirina cih û dema civîn û meşên xwepêşandanê li wan pêk werin, dan şopandin, di bin çavan de girtin yan jî pêwîst bike belavkirina her şêwaz civîna wê destûr dayî. Binihêre li Qanûna Rewşa Awarte ya bi hejmara 2935 a 25.10.1983'yan (Rojnameya fermî, 18204, 27.10.1983).

erkên xwe yên awarte navê "waliyê super" li wan dihat kirin, fermandarên artêşê, hêzên polês û hêzên paramîlîter bi hev re Kurdistan bi rê ve birin.[252] Ev dem, demeke weha bû ku waliyê herêma rewşa awarte biryarên eskerî distandin, rayedarên eskerî biryarên îdarî distandin û ev herdu jî têra xwe asayî û belav bûn, nexasim li navçe û li gundan, çawa ji mînaka serokatiya serpelî li Desteya Îdarî ya Navçeyê xuya ye, otorîteya sivîl tabihê otorîteya eskerî bû. Helbet, mirov nikare bibêje, ev tabihbûn bi tenê li Kurdistanê lê bû, lê belê bi şervanên profesyonel ên weke Tîmê Polês ê Herekatên Taybet, Tîmên Taybet ên Jendermeyan, bi avahiyên paramîlîter ên weke cerdevanan, bi hêzên kontra-gerîla yên weke Hizbullahê, bi pêkhatinên bêqidoş ên weke çeteyên Susurluk û Geverê (ku ji îtîrafkarên ji PKK'ê veqetiyayî, qaçaxçî, endamên teşkîlata polês û ji sercerdevanan pêk dihatin) û bi rêxistinên derveyî qanûnê yên weke Îstîxbarata Jendermeyan û Têkoşîna li dijî Terorê [JÎTEM], tevî merciyên fermî yên weke Saziya Tiba Edlî, otorîteya eskerî karê xwe dikir, vê jî derfet da kirinên cezaî yên dewletê bi qasî ku di şêwaz û asta wê de li tu devera din a Tirkiyeyê nebe.[253]

Otorîteya eskerî heta bi salên 90'î li dijî gerîlayên PKK'ê bi rêbazên konvansiyonel şer kir, lê bi ser neket, ji ber wê jî di salên 90'î de stratejiyeke nû ya li gorî "şerê ne nîzamî" pejirandibû.[254] Di çarçoveya vê stratejiya nû de ku Hêzên Çekdarî yên Tirk navê "şerê gurrahiya wê kêm" lê kiribû, avahiya îdarî a hêzên eskerî hat nûkirin, bi aksesuwarên mîna cerdevanî, JÎTEM û Hizbullahê hatibû biguçûpêçkirin.[255] "Hakimbûna li meydanê û nehewandina PKK'ê li herêmê" ew konsept e ku "di navbera salên 93 û 95'an de dema Silêman Demirel serokkomar bû, Tansu Çiller serokwezîr bû, bi dorê Dogan Gureş û Ismail Hakki Karadayi Serokê fermandariya Giştî ya Artêşa Tirk bûn" hat bikaranîn û wateya wê "bi qutkirina alîkariya ku sivîl didin

252 Di vê demê de 6 waliyên hêrêma rewşa awarte wezîfe kirine. Didu ji van li Stenbolê pêncan ji wan berê wezîfeya midûrtiya polêsan kiribû, sisê ji wan jî paşê ji partiyên rastgir bûn parlemanter. Ji bo lêkolîneke kite bi kite ya birêveberiya îdarî û eskerî ya herema rewşa awarte binihêre li Jongerden, 2007, 145-147.

253 Ji bo kurteyeke bi serûber a di biwara paşxana wê demê de binihêre li Goral, Işık û Kaya 2013, 14-20. Atılgan û Işık yekê ji pirsgirêkên pêvajoya lêpirsîn û dadgehkirina doza JÎTEM'ê de weha radigihîne: "di bin gelekan ji raporan de ku bi piranî li ser nedîtina şopên êşkencê û muameleya xirab hatine amadekirin, mohra midûrê şaxê Serokatiya Saziya Tiba Edlî yê Diyarbekirê heye, wî ji salên 1990'î heta bi nîvê salên 2000'î ev wezîfeya xwe dewam kiriye, ev yek jî dibe sedema peydebûna gumanên cidî ji objektîfbûna raporan" (2011, 37).

254 Binihêre li Goral, Işık û Kaya, 2013, 15.

255 Ji bo ji nû ve sazkirina Hêzên Çekdarî yên Tirk salên 90'î li Kurdistanê, binihêre li Balta Paker, 2010; ji bo pêkanînên cerdevaniya bi darê zorê binihêre li Kurban, 2009; Balta Paker û Akça, 2013; Özar, Uçarlar û Aytar, 2013; Tüysüz, 2014.

hêzên gerîla ji nû ve bidestxistina hakimbûna li meydanê" bû; Goral vê konseptê weha terîf dike:

> *Li vir 'konsepta' ku di asta navendê de hatiye sêwirandin û di biwara îcrakeran de li asta cihî 'xweserî', bi hev re hene. Li aliyekî konsepta navendî 'hakimbûna li meydanê' û encama vê ya pratîk ango stratejiya qutkirina girêdana di navbera PKK'ê û derdorên xelkê yên destekê didin PKK'ê/weke ku destekê didin PKK'tên qebûlkirin, dixin meriyetê. Ji bo vê bikin jî rewa tê dîtin ku derkevin derî sînorên hiqûqê yên asayî. Lê belê li aliyekî jî her yek ji komên ku wê derkevin derî vê meydanê, xwedî awayekî xwe yê kar, rêbazeke xweserî herêma xwe ne û cudatiyên wan ên nêzîkahîtêdanê hene ku ji ber têkiliyên cihî peyde dibin.*[256]

"Konsepta hakimbûna li meydanê" destûrê dide cudahiyên helwêstê yên bi vî rengî û heta pêdiviya wê bi wan heye. Di cewhera vê konseptê de faaliyetên kontra-gerîla hene, ev faaliyet bi amûrên mîna wendakirinên bi darê zorê, koçberkirinên bi darê zorê û înfazên/kuştinên ne qanûnî tê birêvebirin, ev amûr jî dikarin hem xwedî xisleteke sîstematîk bin hem jî girêdayî înîsiyatîfa cihî û kêfî bin. Soyler heman demê weha bi nav dike: "dewleta kûr a Tirk hingê dewlet bi xwe bû".[257]

Waliyên super û memûrên eskerî yên di her astê de li şûna destûra bingehîn a ku mafên sereke yên welatiyan misoger dike, bi qanûnên ku sînor danedianîn ji erkên dewletê re, û bi pratîkên "jixweberî" ên şîdetê Kurdistan bi rê ve birin; mirov bibêje, ev Kurdistan rewşa îstîsnaî ya Tirkiyeyê ye bi tevahî ne şaş jî be, dibe ku kêm be. Salên 90'î yên Kurdistanê "her tiştî ji giştiyê bi xwe çêtir rave dikin", "bi dildariyeke xurt li giştiyê difikirin", ha ev salên 90'î yên Kurdistanê nefsmezinbûna xisûsî ya Tirkiyeyê ya ne bi tenê bi salên 90'î sînordar, "nekarîna girtina wê li ber welatên din", nezanîna wê ya "ev der Tirkiye ye" gelekî baş rave dikin. Ji ber ku Tirkiye ne dewleteke hiqûqê ye, ew timî rewşeke îstîsnaî ye; lê belê Kurdistana ku hem li derveyî vê rewşê, hem jî li derveyî hiqûqa îstîsnaî bi xwe jî mayî, nayê wê wateyê ku Tirkiye li dinyanê îstîsnayek e. Ji bo tesbîtkirina vê rewşê kafî ye ku mirov berê xwe bide serhatiya modernbûnê ya dema damezrandina Komara Tirkiyeyê - ku dişibe ya netewe dewletên din.

Di wê demê de ku komên cihê yên dînî û zimanî di birêveberiya Împeretoriya Osmanî de û di bin şiklekî birêveberiyên nîv-xweser de dijiyan, Kurd di nava

256 Goral, Işık û Kaya, 2013, 17, 35.

257 Söyler, 2013, 316-317. Analîza têgeha dewleta kûr jî di heman gotarê de bi awayekî berfereh hatiye gotûbêjkirin.

rêxistineke ku ji yekîtiya eşîran pêk dihat, dijiyan. Di vê demê de derfeta Kurdan hebû ku zimanên xwe û çanda xwe dewam bikin. Pêvajoya navendîbûn û modernbûnê di demên dawiyê yên Împeretoriya Osmanî de dest pê kir. Saziya komarê ev pêvajo bi netewebûn û sekulerbûnê xurt kir, bi rêbazên otorîter û şîdetê bi rê ve bir. Wê ne bi tenê avahiya nîv-xweser ya navbirî, her weha danederên Kurdîtiyê yên di cewherê vê bunyeyê de heyî jî ji xwe re hedef digirtin. Nihêrîna serwer "pirsgirêka Kurd" û pê re jî Kurdîtî bi nîşanên paşvemayîn, muhafezakeriya dînî yan jî eşqiyatiyê disêwirandin, nedidîtin ku projeya netewebûn û modernbûnê ya Tirk çalakiyên sereke yên civakî yên li meydana şexsî û ya giştî yên Kurdan û pozîsyona wan ji xwe re yekser hedef digirtin.[258] Wê hewl dida ku bi prensîpên xwe yên ku armanca wan ew bû ku meydana civakî ku komarê weke dînî, jirêûresmê û heterojen dewr girtî, veguherîne meydaneke neteweyî ya sekuler, modern û homojen, wan hêmanên ku Kurdan bi nav dikin, berteref bike. Weke mînak medrese ji bo Kurdan meydaneke girîng a civakîbûnê bûn û perwerdeya bi Kurdî dikirin; projeya modernbûnê ya ku dixwest armancên xwe yên sekulerbûn, navendîbûn û netewebûnê di çarçoveya Tirkîtiyê de pêk bîne, ev medrese ji xwe re kirin hedef; vê yekê xizmeta tinekirina bîreweriya Kurdbûnê jî dikir.[259] Bi vî awayî, dema mirov têkoşîna Kurdbûnê ya ku ji damezrandina komarê û vir ve heye, bi tenê weke tevgereke li dijî modernbûnê binirxîne, ev ê bibe şixulandineke aqil a pir besît. Çawa ku Celadet Berdirxan jî dibêje, ya ku Kurd li ber radibin ne modernbûn bi xwe ye, modernbûneke Tirk e ku armanca wê asîmîlekirina Kurdîtiyê û tinekirina wê ye.[260]

Modernbûna Tirk çi qasî şibiya be pêvajoyên damezrandina netewe dewletên modern ên li welatên din, pirsgirêka Kurdistanê jî dikare ewqasî weke pirsgirêkeke mêhtingeriyê were fêmkirin. Metna klasîk a vê fêmkirinê beşa di biwara Tirkiyeyê de ya lêkolîna Beşikçi ye ku Kurdistanê weke "mêhtingeheke navdewletî" bi nav dike; tevî ku Beşikçi îdîa dike ku ji ber ku sînor, nav û tu statuya wê ya siyasî nîne ya rastî ne mêhtingehek e jî.[261] Lêkolînên teorîk yên ku di çarçoveya teorîk a mêhtingerî/piştî-mêhtingerî radihêjin pirsgirêka Kurd nexasim piştî salên 2000'î zêde dibin.[262] Nexasim li gorî çarçoveya teorîk a piştî mêhtingeriyê, pratîkên mêhtinger dikevin pratîkê pêşî bi rêya bikaranîna

258 Binihêre li Yeğen 2006, 140; Şahin Fırat 2006, 125.

259 Binihêre li Gündoğan 2009.

260Yê neqilkirî, Bayrak 1994, 68

261 Beşikçi, 1991.

262 Binihêre li Goral, 2014, 6.

gotina raserîbûnê ya nijadperest yan aşkere yan jî sergirtî, pê zanîna xelkên xwecih ên erdnigariyên mêhtingerkirî berhev dikin, paşê "dinyayên wan ên beden, bawerî, nirx, zimên, rîtuel û zêhniyetê bêqîmet dikin, pê wan texrîb dikin, û erdnigarî dagirkirî bi "hiqûqe mêhtingeriyê" ya cihê tê birêvebirin".[263]

Bariş Unlu jî ji çarçoveyeke dişibe vê, analîzeke liberhevgir a li ser têkiliya modernbûn û mêhtingehkirinê de dike: "heta ku fransî û Tirk, nikaribin zêhnên cezaîrî û Kurdan kontrol bikin, bi gotineke din, heta ku ew nikaribin her yekî ji wan bikin fransiyek, Tirkek, wan Cezaîr û Kurdistan weke mêhtingehekê bi rê ve bir û ev herêm xistin bin nîrê şîdeteke daîmî ya yekser a çandî û bunyewî."[264] Kurdistan hema hema daîmî di rewşeke îdareya urfî û rewşa awarte de hat hiştin; tedbîrên eskerî yên li vê Kurdistanê bi polîtîkayên nijadperest hatin destekkirin ên weke Tirkîkirina perwerdeyê û Tirkkirina burokrasiyê, surgûnkirina Tirkan ber bi Kurdistanê ve bi rêya mûçeyê zêdekirî, îskan, xizmeta mecbûrî, li aliyê din ber bi Tirkiyeyê ve koçberkirina Kurdên li ber xwe didin. Gundiyên Franse û Anatolê zêhnî û bedenî hatibûn fetihkirin; Unlu pêvajoya wan a fransîbûn/Tirkbûnê weke kolonîzasyon û pêvajoya di bin dagirkeriyê de hiştin û dûçarî şîdetê kirina cezaîriyên/Kurdên bersiveke erênî nedayî kolonîzasyonê jî weke mêhtingehkirin bi nav dike. Dema Unlu şerê serxwebûnê yê li Cezaîrê û têkoşîna siyasî ya li Kurdistanê li ber hev digire jî dewamîbûna terora dewletê û veguherîneriya şîdeta li hemberî wê jî bi rêya aliyên dişibin hev radixe ber çavan.

Şahin Firat jî balê dikşîne ser wekheviyên di navbera serdestiya mêhtingeriyê ya Ingilîstanê li ser giravên kelt û siyaseta Tirkiyeyê ya Kurdistanê û lêkolîneke din a liberhevgir pêşkêş dike. Di pêvajoya modernbûn û pîşesazîbûnê de dihat plankirin ku projeya netewebûnê temam bibe bi asîmîlasyona li navendê ya hawirdorê. Dabeşkirina kar a çandî û newekheviyên aborî dikevin nav hev, pê re jî rê vedike li şerên etnîk, hevgirtina di nava komê de û têkoşîna neteweparêziya dijber. Hechter vê pêvajoyê bi têgeha mêhtingehkirina navxweyî rave dike. Ev yek jî mimkun dike ku Şahin Firat weke mêhtingeheke navxweyî bi Kurdistanê dakeve.[265] Bi heman rengî, pêkanînên Ingilîstanê li ser mekanê wê yê îstîsnaî Îrlandayê û polîtîkayên wê yên derxistina ji mirovbûnê ya îrlandiyan, bi wî awayî ku wan ji jiyana siyasî bike der, daxîne jiyana rût û tazî, ango îcazeya mirovê dikare were kuştin bide wan jî ji wan mînakan e ku mirov dikare miraceatî wan bike dema ku mirov Kurdistana salên 90'î

263 Goral, 2014, 6.

264 Ünlü, 2014, 433.

265 Şahin Fırat, 2014, 378-382; Hechter, 1975.

ya Tirkiyeyê teswîr dike.[266] Li aliyê din, Şahin Firat bîlançoyeke kurt a şîdeta dewletê dide ya ku seranserê salên 90'î dewam kir, beriya wan hebû û piştî wan jî dewam kir li dijî rêxistin û ferdên mixalif ên ji her beşê û ne bi tenê li Kurdistanê li tevahiya Tirkiyeyê. Şahin Firat balê dikişîne ser wê yekê ku salên 90'î beriya salên 90'î dest pê kir û piştî salên 90'î jî dewam kir. Dîsa jî, mirov nikare serbixwe ji pêkanînên bêyom ên cerdevaniya bi darê zorê, şewitandina gundan û valakirina wan, ambargoya zad û qût, bi darê zorê ji cih û warên xwe kirinê, bêyî ku behsa kuştinên kiryarên wan nediyar, kuştinên derveyî qanûnê, di bin çavan de wendakirin, êşkencê, destwerdan û gorên komî bike, nabe ku mirov behsa Kurdistana salên 1990'î bike. Ha ev Kurdistan, resmekî şîdeta qirkirinî ya kolonyal a xwedî xisleta nirjadperest e ku li herêmên din yên Tirkiyeyê nayê dîtin.[267]

Ev dîmenê ku xwe li deverên din ên Tirkiyeyê nedida der, ji herêmên din ên Tirkiyeyê nedihate dîtin jî. Tedbîrên rewşa awarte li Kurdistanê bi konsepta hakimbûna li meydanê û bi navê şerê gurriya wê kêm de dihatin girtin; bi rengekî din mirov bibêje, gunehên li dijî mirovahiyê yan di çapemeniya herika sereke ya li Tirkiyeyê de, di akademiyê de, di "civaka sivîl"de û di raya giştî de yan hîç cihê xwe nedigirt, yan jî weke serketinên eskerî behsa wan dihat kirin.[268] Weha diyar e ku, weke Can, Şahin Firat jî wisa difikire ku mesele ne ji ber rewşa nezanînê, lê belê ji ber tercîha xwe li nedîtinê danînê ye, lewma ew dibêje ku girîngiya bi rastî ya salên 90'î ew e ku ev guneh hemû ji aliyê civakê ve hatine qebûlkirin. Em van salên dawiyê bi awayekî belav şahidiyê dikin li pratîkên lînçê ango li "civakîbûneke ku zemîn amadekiriye ku şîdeta bi rengekî 'taşeronbûyî' dema pêwîst bû bi hêsanî dewrî 'welatiyên hestyar' were

266 Şahin Fırat, 2014, 397-398; Kearns, 2006.

267 Binihêre li Şahin Fırat, 2014, 396; Foucault, 2003, 257; Diner, 2011, 72-74. Ji bo yekê ji stratejiyên şer ên li Kurdistana salên 90'î valakirina gundan binihêre li Jongerden, 2007; ji bo wendakirinên bi darê zorê binihêre li Goral, Işık û Kaya, 2013; Alpkaya, 1995; ji bo bê-gor-hiştinê binihêre li Özsoy, 2013; ji bo gorên komî binihêre li Çiçek, 2011; ji bo şewitandina navenda navçeyan û hevkariya bi bi Hizbullahê re binihêre li Çelik, 2014; ji şewitandina gundan û ambargoya zad û qût li Dêrsimê binihêre li Taş, 2007.

268 Ragip Duran rewşa çapemeniya nivîskî û dîtbarî ya salên 90'î weke "medyaya pileyên sermil" bi nav dikir; ji bo hevpeyvîna di biwara wê serdemê de pê re hatî kirin, binihêre li Toplum ve Kuram 9: 203-232. Wekî din, belgefilma Sami Solmaz a bi navê "Savaşın Tanıkları: Gazeteciler Anlatıyor (Şahidên şerî: Rojnamevan dipeyivin)" a sala 2013'an weke arşîveke girîng a li ser vê mijarê ye. Herçî lêkolînek berbiheve ye ku bêdengiya akademiyê ya li ser vê mijarê belge bike, hîna nîne. Dîsa jî, dema em bi bîr bînin ku heta bi salên 2000'î Ismail Beşikçi mînakeke bi tenê bû, salên 2000'î jî hemû akademîsyenên ku li ser meseleya Kurd bi awirekî navend -ne-dewlet xebitîn hemû li şûna cezayê girtîgehê, bi cezayên cihê re rûbi^ru man ên weke ji kar derxistinê, ketina ber lêpirsînê, yan jî bêparhiştina ji inwanê heqkirî. Dema mirov vê li ber çavan bigire bi awayekî têra xwe zelal divê bibîne ku bêdengiya salên 90'î nikare were belgekirin.

kirin"; Firat Şahin balê dikişîne ser wê yekê ku ha ev pratîk ne bi tenê bi destê îcrakerên şîdeta dewletê, lê belê her weha bi destê wanên ku li ber vê şîdetê ranebûyîn jî salên 90'î hatiye hilberandin.[269] Mirov dikare bibêje ku hewldanên lînçkirinê li Tirkiyeyê nû nînin, li pişt wan timî meqamên fermî hene û lê belê welatiyên taşeron wan pêk tînin. Lê belê 9'ê Adara 2014'an hewldana lînçkirinê li dijî rêxistina navçê ya Fethiyeyê ya Partiya Gelan a Demokrasiyê (HDP) û li dijî avahiya rêxistin lê, daxistina tabelaya partiyê, hewldana şewitandina wê, li şûna wê daliqandina alaya Tirk û şîdeta hîsterîk a ku di dema vê hewldanê de me şahidî lê kir, dibe ku jê re lêkolînek pêwîst bike.[270] Em bi gotinên Sartre bipirsin, "gelo nabe ku ew şîdeta jê nayê yê xwecihî biperçiqîne berê xwe dabe hundir, di nava me de li ser hev kom bûbe û li rêyeke derketinê digere, sedema vê yekê be?"[271]

Li aliyê din, tiştekе din hebû xweserî Kurdistana salên 90'î ku caran li herêmên din û/yan jî ji herêmên din ên Tirkiyeyê xuya nedikir: berxwedan. Bi ser de jî ev berxwedana ku salên 90'î têkoşîneke bi şid bû, ji şerekî ku bi tenê milîtanên PKK'ê ew bi rê ve dibir, bihurî, veguherî bîrewerbûneke siyasî ya topyekûn ku jin û ciwan pêşengiya wê dikin, halê hazir kirasê karbidestiyekê ku modelên demokrasiyê û birêveberiya cihî yên resen hildiberîne. Başûr û Rojavayê Kurdistanê jî di navê de, li cihên ku Kurd lê bûyî desthilatdar, ne mimkun e ku mirov nebîne ku bi awayekî ku hîna nebûyî nesîbê Tirkiyeyê siyaseta demokratîk dimeşînin. Hîna nehatiye dîtin ku rojeva Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) ya di girtenameyên parlemana Tirk de, profîla endamên wê yên ne Kurd, kotaya jinan, sîstema hevserokatiyê di tu partiyên din ên Tirkiyeyê de negeriyane.[272]

Navsereyên roja me ya îro ku zarokatiya xwe û destpêka ciwaniya xwe li rojavayê Tirkiyeyê di nava aştiyê û rehetiya apolîtîkbûnê de bi rengê Tirkîtiyê derbas kirin, weha xuya ye ku li pişt hevsalên xwe yên li rojhilat wate, yên ku di çandeke berxwedanê de ku xwe tim û daîm di teorî û pratîkê de nû dikir, bûn siyasî û bûn Kurd. Mîna mêrên li hember jinên ku bi têkoşîna femînîst pêşî jinbûna xwe bi dest xist, paşê ew problematîze kir, niha jî tevlî têkoşîna nasnameyên nû yên cinsî dibin. Bûyereke mirov dikare têbigihîje ye ku jinên dûr ji rehetiya mafên bi jidayikbûnê bidestxistî, timî rastî şîdetê hatî û neçar

269 Şahin Fırat, 2014, 401.

270 http://www.bianet.org/bianet/siyaset/154044-fethiye-de-hdp-binasina-saldiri [10 Mayıs 2014].

271 Sartre, 2007, 37.

272 Ji bo lêkolîna van xisletên ku heta bi Partiya Tirkiyeya Demokratîk jî şopên wan werin ajotin, binihêre li Kavak, 2012, 151-201.

wate têbikoşin di van mijaran de li pêştir in ji mêran ku di van mijaran de bi sedsalan tiralî kirine. Heta mirov dikare bibêje ku jin êdî mijûl in bi têkoşîneke cinsiyeta civakî ya gelekî kûrtir û ferehtir ku dubendiya banal a jin-mêr ji xwe re nake bingeh, ango hebûna xwe di ser mêr re terîf nake. Bi vî rengê xwe ew bangê li mêran dikin ku mêrtiya xwe bixin ber lêpirsînê. Helbet mirov ne dikare bibêje ku hemû jin û - heke em li şibandina me kirî vegerin - Kurd li wê asta me behsa wê kirî ne û ne jî hemû mêr û Tirk dikarin ji vê bangê fêm bikin. Dîsa jî çawa ku Unlu dibêje, mirov dikare qismî îdîa bike ku Kurdên ku “di pêvajoya derketina ji mêhtingehbûnê de azad bûn ji avahiyên zordar ên hem di nav dewleta Tirk de û hem jî di nav civaka Kurd de”, “dema ku azad dibûn zêhnên yên kolonîzekirî (Tirkan) jî azad kirin”.[273]

Em ê li jêr dakevin bi pêvajoya azadbûnê ku weke derketina ji mêtingehbûnê tê binavkirin, lê belê beriya wê em nirxandineke rexnegir bikin li ser pêvajoya ku heta beriya demeke kurt tevgera Kurd bi xwe jî îfade dikir. Helwêstên îdeolojîk û pratîkên hatî pêkanîn ên demên pêşî yên “tekoşîna azadiyê ya Kurd” dikarin bibin mixatebên rexneyên di biwara pêvajoya ji mehtingehbûnê şûştina Efrîkayê jî. Em tevî Mbembe bibêjin, di têkoşîna diyarkirina çarenûsa xwe de weke amûreke nîqaş li serê neyê kirin bicihkirina şîdetê, fetîşkirina desthilatdariya dewletê, bêqîmetkirina modela demokrasiya lîberal û tevgeriyana li gorî texeyula civakeke girseyî ya populîst û otoriteryan, tengiyên herî girîng ên pêvajoya xwe şûştina ji mêhtingeriyê û azadbûnê bûn.[274] Çawa ku me beriya niha got, divê em bibêjin ku qismekî mezin ê van tengiyan ji aliyê tevgera Kurd bi xwe ve bi têgeha xweseriya demokratîk ji holê hat rakirin. Li aliyê din, meseleya şîdetê hîna jî nazik e. Zehmet e mirov îdîa bike ku tiştên Mbembe ji bo têkoşîna xweşûştina ji mêhtingehbûnê ya bi şid a li Efrîkayê dibêje ji bo tevgera azadiya Kurd êdî ne lê ne:

> *[Weke pratîkeke pîroz] siyasetê dixwest ku ferd bi awayekî topyekûn were radestkirinî siberojeke utopîk û hêviyeke vejînê û pê re jî dixwest ku li ser vê rêyê her tişta bikeve pêşiya wî hilweşîne. Fonksiyona Rizgarker a Şîdetê, delîla fezîlet û exlaqekî bi rik ê ku di cewhera têgihiştina siyaseta weke êş û fedayê de heyî, di êş û azarê de veşartîbû.*[275]

Bi gotineke din, kesên ku endamê civakekê ne ku mêhtingeran ew “kirine qurbanî”, fituya kuştina wan derxistiye û kuştina wan meqbûl kiriye, paşê bi

273 Ünlü, 2014, 432-435.

274 Mbembe, 2002, 251.

275 Mbembe, 2002, 251.

destê xwe mirineke pîroz û rizgarker fesilandin, xwe "feda kirin", ev yek bi serê xwe weke tengiyê xuya nedikir.

Ji ber ku biryareke ku ferdekî bi îradeya xwe daye, dibe ku ew îtîraz xwe bide pêş ku dibêje, di navbera fedakirin û kirina qurbanî de cudatî heye. Lê belê di rewşekê de ku îradeya şexsî tê hesabkirin li ser îradeya kolektîf a ku bi mirina ferdan vedijî û mirin tê pîrozkirin, mirov dikare îdîa bike ku îradeya şexsî ji her demê kêmtir şexsî ye. Ya rastî, dema ku minaqeşekirina heqbûna şîdeta li dijî hem "amûrên zorê û îdeolojîk ên dewleta Tirk a mêhtinger" hem jî "hevkarên [wê yên] Kurd" û mezinbûna xwefedakirina ji bo "xweşûştina ji mêhtingehbûnê / azadiyê" weke helwêsteke xwedî xisleteke xiyanet û tehlûkeyê ya ku zerarê dike li têkoşînê bi xwe tê nirxandin, destekê dide vê îdîaya ku me behsa wê kir. Dibe ku mirov bibêje, di rewşa şer de dijmin yan jî mêhtinger bi xwe mafê jiyanê binpê dike û pîrozkirina mirina li hemberî vê jî bivênevê ye. Lê belê ne zehmet e ku mirov bîne bîra xwe ku siyaset tam jî di wan rewşan de ku weke bivênevê, mecbûrî, "pêwîst" tên binavkirin, tê betalkirin û îdîaya bivênevêbûnê jî şêwazekî bêhêvîmanê nîşan dide. Heke mimkun be ku mirov pêşniyara xweseriya demokratîk û israra aştiyê ya tevgera Kurd binirxîne weke derketineke ji vê bêhêvîmanê û vegera li siyasetê, hingê mirov dikare bibêje ku têkoşîna bi rastî ya ku wê zêhnê Tirkan azad bike ew e ku tevgera Kurd li pişt vê pêşniyar û israrê bisekine.

### *Rewşa Serhildanê ya Kurdistanê: Têkoşîna siyasî û civakî*

Kurdistana salên 90'î ne bi tenê ji bo dewletê mekanekî îstîsnaî bû, ji ber şîdeta serîhildanê û girseyîbûna wê ji bo Kurdan jî demeke îstîsnaî bû. Kurd ji destpêkê ve li ber reformên navendîbûna îdarî û modernbûnê yên Împeretoriya Osmanî û projeyên sekulerbûn û netewebûnê yên Dewleta Komara Tirkiyeyê rabûn û serî hildan; bêguman serhildanên wan ên beriya hingê, hewldanên wan ên partiyên siyasî, kar û xebatên wan ên çapemeniya nivîskî, hilberandina wan a çandî û zimanî sermayeyek amade kiribû ji bo girseyîbûn, veguherîna siyasî û civakî ya salên 90'î.[276] Bêyî ku em xislet, sedem û encamên wan minaqeşe bikin, bi tenê bi awayekî kronolojîk û bi nav em behsa tezahurên serhildanên çekdarî û mixalefetên siyasî yên girîng bikin: Serhildana Bedirxan Begê (1847); Serhildana Şex Ubeydulah (1880); Rojnameya Kurdistanê (1898); Cemiyeta Teawun û Teraqiyê (1908); Cemiyeta Hêvî ya Kurd a Xwendekaran (1912); Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê (1918); Serhildana

276 Di biwara vê sedsala dirêj de gelek çavkanî hene. Em bi tenê çend mînakan bidin: Bayrak, 1993; Bozarslan, 2002; Gündoğan, 2007; Özoğlu, 2005, Vali, 2005.

Şêx Seîd (1925); Serhildana Agiriyê (1930); Serhildana Dêrsimê (1938); Kovarên Hawar (1932-1947) û Ronahî (1942-1947); bûyera 49'an (1959); Partiya Demokrat a Kurdistanê - Tirkiye (1965); Li Tirkiyeyê Partiya Demokrat a Kurdistanê (1969); Mîtîngên Rojhilat (1967); Warên Şoreşger ên Rojhilat ên Çandê (1969, DDKO); Komeleya Şoreşger Demokrat Kurd (1974, DDKD); Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyeyê (PSK)/Özgürlük Yolu, Rizgarî, Ala Rizgarî, Kawa, Dengê Kawa, Têkoşîn ên ku salên 1970'yî çalak bûn, û Kürdistan Ulusal Kurtuluş [Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê] (KUK) (ku sala 1977'an ji TKDP'ê veqetiya); Partiya Karkerên Kurdistanê (1978, PKK); berxwdanên Girtîgehê yên Diyarbekirê (1980-1988); parastina komî ya endamên rêxistinan ên dadgehkirî piştî muxtireya eskerî ya sala 1971'ê û darbeya eskerî ya sala 1980'yî.

Herçî berxwedana civakî û siyasî ya li ser vê sermayeyê avakirî ye, PKK'ê amade kiribû hem bi têkoşîna xwe ya çekdarî ya ku hem li dijî Hêzên Çekdarî yên Tirk û hem jî li dijî komên weke serekeşîr, axayên xwedî erd, cerdevanan ên ku wê weke "hevkar" bi nav dikirin. Mefhûmeke Kurdbûnê ya nisbî teşegirtî êdî hebû ku PKK'ê ji dehesalên beriya xwe dewr girtibû û karîbû bigihîjîne derdorên berferehtir. Li aliyê din, PKK ji "uslûba romatîk a ku zextên milî yên beriya xwe îfade dikir yan jî milîtaniya reformîst a destûra bingehînparêz bi awazekî radîkal" cihê bû; wê "digot, civaka Kurd bi xwe jî ji rewşa koletiyê ya tê de berpirsiyar e û radigand ku bi tenê bi şîdeteke dij mêhtingerî ya li dijî wê bi xwe rizgarî mimkun e."[277] Mixatebên vê ragihandinê timî ne dildar bûn ku berê meyla xwe bidin PKK'ê jî, ji ber ku dewletê Kurdbûn gelekî beriya Kurdan bi PKK'yê re kire yek, encama wê li xêra PKK'ê bû. Akkaya dibêje, çalakiyên kolektîf ên ku "piştî têkoşîna gerîla û zexta zêde dibe ya dewletê piştî sala 1988'an" derketin holê bi saya "xebatên rêxistinbûyîn û çalakiyan ên PKK'ê li navendên navçe û bajaran" û "operasyonên dewletê yên valakirina gundik û gundên peywendiya wan bi gerîla re heyî" berfereh bûn. Karayilan bi gotinên xwe îdîaya Akkaya piştrast dike: "beşên xelkê yên ku li bajaran pêşî serhildan bi pêş xistin bi piranî derdorên welatparêz bûn ku dewleta Tirk gundên wan şewitandibûn".[278] Akkaya dibêje, "ne tiştek e ku mirov pê ecêbmayî bimîne ku di navbera van tevgeriyanên pêşî yên ku xwe weke xwedîderketina girseyî ya li cenazeyên gerîlayan bi bihara sala 1990'î re da der û têkoşîna gerîla û rêxistinbûyîna gerîla re girêdanên wê yên organîk hebin û di nava wan de hevtesîrkirin hebe".[279]

277 Goral, 2014, 3; Bozarslan, 2014, 25.

278 Akkaya, 2014, 87; Karayılan, 2011, 181.

279 Akkaya, 2014, 88. Çalakiyên bi vî rengî yên li dijî sivîlan milîtanên PKK'ê yên peywendîdar jî dike failên gunehên şer.

Her ku zarokên wan tevlî yên li derve yên li çiyê bûn û her ku zarokên wan bûn gerîla êdî ji bo Kurdan PKK ne bi tenê hêzeke şîdet û parastina li dijî şîdeta dewletê û desthilatdarên cihî bû, ew dibû hebûneke adil û bawerpêkirî ya ku wateya siyasî ya nasnameya wan saz dikir û tevna hestên wan ên kolektîf datanî".[280] Bersiva dewletê dayî vê hebûnê, nexasim di navbera salên 93 û 95'an de, bêhtir cerdevankirin, bêhtir şewitandin û valakirina gundan, bêhtir bi darê zorê wendakirin û bêhtir kuştinên derveyî qanûnê bû. Bi ser de jî, çawa ku mirov dikare di mînaka valakirina gundan de jî bibîne, di rêbaza dewletê ya bikaranîna van polîtîkayan de hin xislet hebûn ku ev dem ji demên din cuda dikirin. Polîtîkayên ji Kurdistanê kirina Kurdan û li Tirkiyeyê bicihkirina wan di demên berê de dihatin plankirin û birêvebirin, lê vê carê rêbaza, bi awayê kirina wan a der cezakirina wan, hatibû bikaranîn.[281] Bi ser de jî ne bi tenê gund, zevî û daristan jî hatin şewitandin, heywan hatin telefkirin, bendav hatin avakirin û bi vî awayî xweza hat texrîbkirin; van jî piştrast dikir ku dewlet xwe jê venade ku siyaseta wê ya bidestxistina serdestiya stratejîk veguhere şerekî "vegera jê tine".[282] Hewl dihat dayîn meydaneke jiyanê veguherînin meydaneke vala a şer yan jî weha dihat pejirandin û li ser vê meydanê bi hezar salan e şaristaniyên cûr bi cûr hatine avakirin, halê hazir jî li ser wê sermayeya çandî ya bi milyonan mirovî heye.

Di heman demê de PKK'ê jî beriya salên 90'î hin pêkanîn xistin dewrê û bi demê re ji wan gav bi paş ve avêtin; "li dijî sazî û kesên hebûna dewletê li gund û bajaran temsîl dikin" hewl da çalakiyên weke şewitandina dibistanan, kuştina mamosteyan, serdegirtina şantiyeyan, şewitandina maşînan bike; "bi qanûna eskeriya îcbarî" hewl da tevlîbûna nav refên gerîla zêde bike, ji Kurdên dewlemend bacê bistîne; li dijî "sîxur yan jî îxbarkeran" ku agahî didan dewletê û li dijî cerdevanan çalakiyên kuştinê yên tirsandinê yên bi navê "propagandaya çekdarî" li dar xistin û dadgehên gel pêk anîn.[283] Çalakiyên şîdetê yên li dijî sivîlan û yên ku berê xwe dan xelkê xwe li aliyekî, li aliyê din jî kapasîteya birêxistinkirina serhildana girseyî û berxwedêriya têkoşîna çekdarî; dibe ku hinek îdîa bikin ku ev hebûna PKK'ê li Kurdistanê di wî rengî de ne ku rewşa awarte ya dewletê ragihandî pêwîst û rewa bikin. Li hemberî vê şîdeta ku rewşa îstîsnaî pêwîst dike û şîdeta ku di rewşa îstîsnaî de tê bikaranîn û têkiliya van awayên şîdetê bi rewabûnê re em dikarin

---

280 Binihêre li Ergut, 2014, 221.

281 Binihêre li Işık, 2014, 32.

282 Ji bo qirkirina xweza û ekolojiyê li Kurdistanê binihêre li Arslan, 2014.

283 Binihêre li Çelik, 2014, 126-141.

di peywenda qewmînên beriya, dema û piştî ragihandina rewşa awarte de minaqeşe bikin.

Em van bînin bîra xwe; rewşa awarte ya li Kurdistanê ne sala ragihandina xwe ango 1987'an dest pê kir, bi ragihandina îdareya urfî re ji sala 1978'an ve fiîlî jixwe hebû; operasyonên komandoyan ên mezin ên bi biryarnameya sala 1969'an a bi navê "Sehîkirina komî ya gundan" dest pê kiribûn; beriya wê serdegirtinên gundan bi destê jendermeyan navdar bûn bi pêkanînên êşkence û şîdetê ku bi bahaneya qaçaxçîtî yan eşqiyatî kirine yan jî destek dane tevgera Barzanî ya li Iraqê; daxwazên herî girîng di Mîtîngên Rojhilat de yên li dijî van serdegirtinan bi van sloganên li jêr bi gewde dibûn: "Em ne jenderme, mamosteyan dixwazin!", "Em ne qereqolan, dibistanan dixwazin!", "Em doza bazukayan nakin ya fabrîkeyan dikin!" Naxwe ya ku em dikarin bibînin ew e ku dewletê bi destê xwe şert û mercên ku rewşa awarte pêwîst dikin, beriya rewşa awarte afirandine.[284] Lêkolînek heye ku îdîa dike ku erkên li Îrlandaya Bakur lê ne û siyasetên ewlekariyê yên ku dikirin ev erk karîger bin ne bi tenê bersivek in li hemberî şer, lê belê ya rastî qismî bingehê şerî bûn. Ev lêkolîn rexneyan digire li peyva fermî ya ku dibêje, qanûna rewşa awarte ya salên 1970'yî bersivek li dijî serhildana bi şid a li Îrlandayê bû û bi bîr dixe ku daxwaza betalkirina qanûna "taybet" a ku hingê 50 salên xwe temam dikirin, yek ji kevirên çarqozî yên têkoşîna îrlandiyan a salên 1960'î bû.[285] Ya rastî, tişta ku ragihandina rewşa awarte aşkere û îlan dike ne ew e ku li herêma lê îlan kirî tehdîtek heye li dijî dewletê, lê belê pirsgirêka "zerarlêbûna raseriya hiqûqê" ku sedema şerî pêk tîne û pê re jî hebûna krîzeke rewabûnê ya civakî, siyasî û qanûnî ye.

Muhim e ku em bi bîr bînin ku têkoşîna Kurdan ne bi tenê bi rêbazên bi şîdet hat birêvebirin. Salên 90'î di heman demê de teqabilî wê demê jî dikin ku partiyên siyasî yên Kurdan hewl dan di siyaseta Tirkiyeyê de cihê xwe bigirin. Piştî ku Partiya Keda Gel (HEP) a sala 1990'î hat damezrandin sala 1993'yan hat girtin, heman salê Partiya Demokrasiyê (DEP) hat damezrandin û piştî wê jî Partiya Demokrasiya Gel (HADEP) a ku di navbera 1994 û 2003'yan de xebatên xwe meşandin, hat. Sala 1994'an parlemanterên DEP'ê bi xiyaneta li welêt hatin gunehbarkirin, mafê wan ê destpênebûnê hat betalkirin û pênc ji wan hatin girtin. Ev yek weke ji nû ve dana ber bi çiyê ve a berê Kurdan hat nirxandin. Li gorî Barkey, van partiyan helwêstên cihê yên siyasî bi pêş xistibin jî, raya giştî ya Tirkiyeyê, dinya wê ya siyasetê û çapemeniya wê ev hersê partî

284 Binihêre li Gündoğan, 2011.

285 Bell, Campbell and Ní Aoláin, 2004, 311.

jî di meseleya xwe dûrnexistina ji PKK'ê de yek hesibandin, lê belê, li aliyê din desteka ku Kurdên siyasîbûyî didin PKK'ê nedîtin û qebûl nekirin ku ne mimkun e ku yek ji van partiyan karibe xwe ji rêxistinê dûr bixe.[286] Nedîtina desteka ku Kurd didin PKK'ê, ne korbûneke besît e, mirov dikare vê yekê weke wê rêbazê bibîne ku bi armanca tinehesibandina terora dewletê ya li dijî Kurdan, desteka em behsa wê dikin a ku qismî ji ber vê yekê bû girseyî û hêza PKK'ê li ser Kurdan hatiye tetbîqkirin. Jixwe, ev desteke ku bi tenehesibandinê tine nebû ji bo Partiya Gel a Demokratîk (DEHAP), piştî girtina wê ji bo Partiya Civaka Demokratîk (DTP) ya sala 2005'an damezrandî û ji bo Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) ku sala 2008'an ji ber tirsa girtina DTP'ê hatibû damezrandin jî lê ne.

Li aliyê din, yekane mekanê ku ev destek lê bi gewde dibe ne bi tenê parlemana Tirk û Tirkiye ye. Ji nîvê salên 1990'î û pê ve tevgera siyasî ya Kurd bi amûrên çapemeniyê, xebatên çandî û hunerî, rêxistinên sivîl meydaneke nû ya giştî ava kir, pê re "armanc êdî ne bi şer bi destxistina hêza dewletê bû, lê belê veguherandina civakê bi tevahiya aliyên xwe bû", vê jî bi ser xist ku desteka pasîf veguhere îradeya aktîf.[287] Weke mînak Sustam dibêje, "ji salên 1990'î û pê ve tevgera siyasî ya Kurd kete nav pêvajoyeke nû ya siyasî, li ser fonksiyona civakî û siyasî ya hilberîna çandî rawestiya ... û desteka wan a li bîreweriya siyasî li ber çavan girt". Îro li aliyekî li Diyarbekir û bajarên din ên Kurdistanê, li aliyê din jî li metropolên mîna Stenbol û Enqerê xebatên şano, wêje û weşangeriya Kurdî, bipêşketina di sektora sînema û televizyona Kurdî de nîşan didin ku hilberîna çandî ji destekdana bîreweriya siyasî û wêde çûye.

Ji bilî berxwedana siyasî û hunerî, mirov dikare bibêje ku yek ji meydanên têkoşînê yên salên 1990'î jî - em desteka diyasporaya Kurd a li berxwedanê li aliyekî deynin - di peywenda hiqûqê de Ewrûpa bû. Pêvajoyeke girîng a ku nîşan dida ku peyva fermî ya dewletê li ser xirakirina heqîqetan ava ye, ew doz bûn ku Kurdan li dijî Dewleta Komara Tirkiyeyê li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê (DMME) vekirin. Doza yekemîn a ku DMME'yê lêkola ya di biwara binpêkirinên mafê mirovan de sala 1996'an biryara wê da (doza Akdivar v. Turkey) aşkere dikir ku sala 1992'yan dewletê gundê Kelkomê (bi Tirkî Kelekçi) şewitandiye.[288] Bi ser de jî di heman dozê de îdîaya dewletê ya xelasnekirina rêyên hiqûqa nav Tirkiyeyê red kiribû bi sedema ku tu delîl nîne ku nîşan bide ku "rêya gerîna li heqê xwe di dema peywendîdar de di teorî û pratîkê

286 Barkey, 1998, 130.

287 Binihêre li Akkaya, 2014, 95; wekî din binihêre li Jongerden û Akkaya, 2013, 136.

288 Binihêre li Çalı, 2010, 318.

de rêyeke bitesîr û vekirî ye, di wê ast û kalîteyê de ye ku çareseriyê peyde bike ji gazinên aliyê miraceetker re".[289] Çali dibêje, di celseyên DMME'yê de bi tevlîbûna miraceetkerên ferdî, parêzer, dadger û wezîfedarên DMME'yê vegotineke alternatîfa vegotina fermî derdikeve holê, bi rengekî ji rengan xebateke komîsyona heqîqetê tê kirin ku tê de aliyê insanî yê hovîtiya girseyî li pêş tê girtin. Ev têkoşîna hiqûqê ku Kurd ferdî bi rê ve dibin û bi awayê yekser ne xwedî xisleteke siyasî ye, tevî kêmasiyên xwe hemûyan jî sûcên dewletê yên li Kurdistanê resm dike, repertuwara têkoşîn û ferhengê fereh dike û vê yekê her dewam dike.

Ev serhatî bi rewşa xwe ya kêm jî nîşan dide ku Kurd di salên 90'î de ne bi tenê mexdûr bûn, di heman demê de weke aktorên siyasî jî mixatebên meseleyê ne. Ger îro Kurd daxwaza aştiyê îfade dikin, ev resmê baweriyeke bi xwe ya bi vî rengî ye. Ji ber ku piraniya Tirkan şer weke Kurdan di warên xwe yên jiyanê de bi awayekî girseyî tecrûbe nekirine, dibe ku lê serwext nebin ka daxwaza aştiyê bi temamî çi ye. Li ber hev girtina Tirk û Kurdan, me weke du komên mezin ên homojên kêm pêk anî; ka em hewl bidin di ser du komên bêhtir dikarin li ber hev werin girtin ango Dayikên Aştiyê û Şehit Anneleri [ji bo dayikên esker û polêsên Tirk ên li Kurdistanê hatin kuştin] re qismî vê liberhevgirtinê temam bikin. Dayikên Aştiyê bi giştî ji bo aştiyê, bi taybet jî ji bo mafên xwe yên ferdî û kolektîf têdikoşin; tevlîbûna wan a nav jiyana siyasî berevajî ya Şehit Anneleri bi jidestdana zarokên wan dest pê nake.[290] Tevlîbûna zarokên wan a nav refên PKK'ê û "şehîdbûna" wan bi tenê aliyekî wê pêk tîne, ya rastî tevahiya jiyana xwe ew dûçarî bêedaletiyê bûn, ev jî zêmîn amade dikin ji bo pêvajoya siyasîbûna Dayikên Aştiyê.[291] Tişta ku Şehit Anneleri mehkûm û neçarî apolîtîkmanê dike dilsoziya wan a bi dewletê re ye. Ev malbat di stara artêşa ku weke saziyeke serbixwe ji partiyên siyasî û îdeolojiyan ya di ser siyasetê re tê terîfkirin û dewletê de ne. Bi vî awayî, ew xwe jî li cihekî ku di ser siyasetê re be bi cih dikin û ya rastî bi vî awayî bi rengekî ji rengan li wan tê qedexekirin ku ji bo dawîanîna li şerî amûrên siyasetê bi kar bînin. Ji dîskurseke hesabpirsînê yan jî lêpirsînê bêhtir, bi dîskursa terora têkoşîn li dijî tê kirin, Şehit Anneleri tên aşkirin, ya rastî hestên wan ên rikdariyê her tên xwedî kirin û ev nifrîn vediguhere daxwaza tolhildanê. Ev yek dike ku ew

289 Atılgan û Işık, 2011, 32.

290 Ji bo liberhevgirtineke kite bi kite binihêre li Sancar, 2001; Gedik, 2009; Şentürk, 2012; ji bo Dayikên Aştiyê binihêre li Can, 2014a; ji bo dewr û cihê jinan bi giştî di nava tevgera Kurd de binihêre li Çağlayan, 2013.

291 Payeya şehîdbûnê bi tenê "dibe nesîbê" kurên malbatên eskeran, ew "dibe nesîbê" Kurd û keçên malbatên PKK'yiyan, ev yek jî mijareke girîng a lêkolînê ye.

bêedaletiya berferehtir a civakî, aborî û siyasî ya ku di pirsgirêka Kurd de bi gewde dibe û têkoşîna Kurdan a ji bo aştiyê nebînin.[292] Yekane tişta dixwazin ew e ku dewlet dawiyê li terorê bîne û "xiraban" tine bike.

Li gorî Şehit Anneleri edalet jî "karê dewletê" ye. Ji ber vê yekê ev dayik di gerîna li edalet û aştiyê de roleke girîng ji xwe re nafesilînin. Ya rastî ji ber ku rikdarî û nifrîna xwe nikarin veguhezînin ziwatekî û nasnameyeke siyasî, heps bûne di nava rewşa mexdûrbûnê de û ya rastî li derveyî meydana siyasî û giştî jî. Herçî Dayikên Aştiyê ne, berevajî Şehit Anneleri, çalakiyên civakî û siyasî têra xwe jiyana wan a rojane mijûl dikin, ev yek jî alîkar dibe ku ev dayik hayil bin ji xwe û ji pêvajoyê. Dayikên Aştiyê siyasîbûnê tecrûbe dikin bi hayilbûna ji bêedaletiya ku avahiyeke sihê ya civakî, aborî û siyasî ew afirandiye; ev jî wan nêzîk dike aktorbûna siyasî yên banga edaletê û pêvajoya aştiyê.[293]

> *Heke em bi tesbîtên ji cihê cih ên Can kurt û kurmancî îfade bikin:*
>
> *Dayikên Aştiyê li ser mijarên aştî, derfeta edaletê,lêborîn, wendakirin û êşê hem bi pratîkên xwe hem jî bi gotinên xwe tecrûbeyeke mezin ber hev kirine. Ev tecrûbe pir girîng e, ne bi tenê ji ber ku di heman demê de ji ya şexsî û ji ya siyasî re, ji meydana şexsî û meydana siyasî re dipeyive, lê belê ji ber ku sînorên siyasetê berfereh dike, çi qanûnî/neqanûnî, çi sivîl/eskerî li her rêya siyaset lê tê hilberandin ji bo aştiyeke bi rûmet têdikoşin.*[294]

Mînakeke tevlîbûna gelek meseleyên cihê yên siyasî ya van demên dawiyê ji bo Dayikên Aştiyê li Tirkiyeyê ew e ku Meclîsa Dayikên Aştiyê ya Izmîrê çû serdana sersaxiya malbatên wan kesan ku di felaketa kana komirê ya Gulana 2014'an li Somayê mirin.[295] Weke Dayikên Plaza De Mayo yên Arjantînê yên dibêjin, "ew êşê vediguherînin têkoşînê", "dayiktiyê civakî dikin" û tevlî xwepêşandanên xwendekar û karkeran dibin.[296]

---

292 Binihêrin li Gedik, 2009, 31.

293 Tevî ku Çağlayan dibêje, têkoşîna Dayikên Aştiyê ne di wê astê de ye ku xizmetê bike di guherandina rola ji rêûresmê ya di siyaset û civake de, ew li gotinên xwe zêde dike ku "di destpêkê de bi rolên xwe yên cinsî yên ji rêûresmê bin jî derketina wan a ser meydana giştî/dewletî û xurt(kirina)bûna wan xwedî tesîr in di vekirina warekî têkoşînê yê bi vî rengî, nabe ku em vê yekê nebînin" (2013, 237).

294 Can, 2014a, 41-42.

295 Ji bo nûçeya bi navê "Barış Anneleri Somalı annelerle kucaklaştı (Dayikên Aştiyê û dayikên Somayî hevdu himbêz kirin)" binihêre li http://www.ozgurgundem.com/?haberID=108135&haberBaslik=Bar%C4%B1%C5%9F%20Anneleri%20Somal%C4%B1%20annelerle%20kucakla%C5%9Ft%C4%B1&action=haber_detay&module=nuce [22 Mayıs 2014].

296 Binihêre li Goddard, 2007, 88.

Gelo mimkun e ku Şehit Anneleri Dayikên Aştiyê ji xwe re weke dostên siyasî bibînin û veguherin kirdeyên siyasî yên ku tevlî banga aştî û edaletê dibin? Kirina xebatên behsa salên 90'î dikin, kirina zorê li dewletê da ku bi salên 90'î re rûbirû bibe, qebûlkirina wê ya gunehên li dijî mirovahiyê di salên 90'î de dibe ku ne bi tenê Şehit Anneleri, lê belê tevahiya derdorên li Tirkiyeyê teşwîq bike ku tevlî nav gerîna li aştî û edaletê ya Kurdan bibin. Li aliyê din realîst xuya nake ku mirov hêvî bike ji aqlekî dewletê yê ku bi "efûyên veşartî" yên weke di ser re bihurîna demê yan jî bêcezamayînê parastina berpirsiyaran dewam dike, di demeke nêzîk de îradeyeke bi vî rengî nîşan bide.[297] Têgeha di ser re bihurîna demê "ji hiqûqa taybet hatiye veguhestinî nav hiqûqa ceza, wateya wê jî ew e ku piştî ku dema diyarkirî ya kafî di ser re bihurî heke dewletê kirariyê pêwîst bi cih neanîn, dev ji dozê û/yan jî ceza berde" û lê belê tê îdîakirin ku "dema mijar binpêkirinên mafê mirovan ên giran ên weke êşkence, kuştinên bê dadgehkirin, bi darê zorê wendakirin, di bin çavan de kuştin bin, yan jî kuştinên fail nediyar bin, hingê bingehên têgeha di ser re bihurîna demê yên ji hiqûqa taybet hatî veguhestin" dikevin ber nîqaşê.[298] Lê belê ji ber ku dozên di biwara gunehên li Kurdistanê kirî de hatine bi cih kirin di "nav hukmên Qanûna Ceza ya Tirk a kevin a hejmar 765 de û li gorî vê ji bo lêpirsîna kuştinê sînorê di ser re bihurîna demê bi tenê bîst sal in", "bûyerên di qonaxa lêpirsînê de ku ji bo taqîbatê tu kirarî nehatiye kirin piştî bîst salan dikevin ber di ser re bihurîna demê."[299] Di vê rewşê de nexasim ji bo sûcên di navbera salên 1993-1995'an de kirî yan jixwe êdî dereng e, yan jî dem pir kêm dimîne.

Bêcezamayîn di hiqûqa navneteweyî de weha hatiye terîfkirin: "kêmasiya dewletan di mijarên li jêr de: bicihanîna berpirsiyariyên xwe yên lêpirsîna binpêkirinan; nexasim di mijara edaletê de misogerkirina vekirina dozê li wan kesan ku guman heye berpirsiyariya wan a cezaî hebe, Darizandina wan û bi awayekî li gorî usûlê cezakirina wan, pê re girtina tedbîrên guncaw di biwara failan de; garantîkirina peydekirina çareseriyên bi tesîr ji bo mexdûran û tezmînkirina zerarên li wan bûyî; garantîkirina mafê agahdarbûna ji binpêkirinan; û girtina tedbîrên din ên ku wê ducarîbûna binpêkirinan asteng bikin."[300] Ya rastî dadgehkirinên ku ji astenga bêcezamayînê yan jî di ser re bihurîna demê xelas dibin jî bi bêusûliyên cihê bêber dimînin. Dadgehkirinên

297 Ji bo xebateke berfereh a li ser mijara "bêcezamayînê" li Tirkiyeyê, binihêre li Kurt, 2014.

298 Binihêre li Atılgan û Işık, 2011, 61.

299 Binihêre li Adalet Vakti Türkiye'de Doksanlarda Gerçekleşen Faili Meçhul Cinayetler ve Kayıplar İçin Cezasızlığın Sona Erdirilmesi. 2012. Human Rights Watch, 45.

300 Atılgan û Işık, 2011, 11.

ku weke doza JÎTEM`ê û doza Temizoz û yên din tên zanîn mînakên herî baş tên zanîn in ji bo vê rewşê.[301]

Sedema bi rastî ya astengiyê ew e ku hîna îradeyeke siyasî û civakî ya elaqedarî rûbirûbûna bi rabihuriyê bi pêş neketiye û heta, liberxwedana li dijî rûbirûbûna bi rabihuriyê re hîna xurt e. Jixwe, dema gunehbaran di doza Temizoz û yên din de “di îfadeyên xwe de gelek caran” digot, “ji bo ku berjewendiyên dewletê biparêzin ew li dijî terorê têdikoşiyan, nabe ku kirinên wan weke sûc werin hesibandin û neheqî ye ku li şûna werin xelatkirin bûne gunehbar”[302], diyar e wan pişta xwe bi nebûna îradeyeke bi vî rengî xurt dikir. Kerime Elçi dema ku cara pêşî heft gunehbarên ku bi kuştina mêrê wê tên gunehbarkirin li dadgehê dîtin, “ricifiye” û “lê belê min xwe bi xwe sûnd xwar ku ji bo edaletê heta bi dawiyê têkoşim.”[303] Diyar e dema Elçi dibêje “edalet” ya ew çel lê dike cezakirina Temizoz û yên din e. Bi rastî jî, mexdûr dema piştî bi bîst salan dibêjin edalet, ew dixwazin çi bibêjin? Terîfa vê gerîna li edaletê çi ye, dozê li kê dike? Gerînên li edaletê yên ku bi edaleta hiqûqa ceza ango bi cezakirin

301 Doza JÎTEM’ê ji dozên cihê pêk tê. “Doz li dijî 7 gunehbaran vebûye ku di nav wan de Märalayê Teqawît Abdulkerim Kirca yê sala 2009’an xwe kuştî, Mahmûd Yildirimê bi navê kod ‘Yesil’, îtîrafkarê PKK’ê Adulkadir Aygan û Çawişê Pirspor Ugur Yuksel jî hene; di îdîanameya dozê de ji bo gunehbaran tê gotin, ev sûcê han kirine: ‘di bin navê JÎTEM’ê de “qaşo” li ser navê “dewletê” lê belê bi awayekî neqanûnî’ avakirina rêxistinekê ji bo kirina sûc, ji bo pêdangotina sûcekî êşkencekirina li mirovan û bi qesd kuştina mirovan. Îdîaname 13 salan piştî destpêkirina lêpirsînê kariye were amadekirin, dosyaya dozê bi bahaneya lihevnekirina wezîfeyê li Dadgeha Cezayê Giran, li Dadgaha Cezayê Giran a Taybet û li Dadgeha Eskerî bûye sedema lihevnekirinê û dadgeha wezîfedar karîbûye piştî bi 17 salan were diyarkirin. Di doza din de, gunehbar ji 11 kesan pêk tê ku di navê de Abdulkadir Aygan û hin îtîrafkarên din ên PKK’ê, û endamên îstîxbarata jenderme hene. Gunehbar tên sûcdarkirin bi ‘cihgirtina di nava JÎTEM’ê de’ li gorî xala 313’an a Qanûna Ceza a Tirk a bi hejmar 765 bi ‘avakirina rêxistinê ji bo kirina sûc’ û li gorî xala 450’î jî bi ‘kuştina bêhtirî mirovekî’ … Tevahiya gunehbaran bi awayê negirtî tên dadgehkirin.” (Atılgan û Işık, 2011, 35). “Kevne- Fermandarê Mîralayê Jenderme yê Kayeriyê Cemal Teizoz û kevne-şaredarê Cizîrê Kamil Atak jî di navê de 6 jê girtî li dijî 7 gunehbaran li Dadgeha Ceza ya Xwedî Erkên Taybet dozek bi rê ve diçe. Di vê dozê de tê xwestin ku gunehbar li gorî Qanûna Ceza ya Tirk ji ber ‘kuştina mirovan’, ‘avakirina rêxistinê ji bo sûckirinê’ û ‘bi kesên din dan kuştina mirovan’ werin cezakirin. Tê xwestin ku ji gunehbaran Cemal Temizoz 9 caran, Kamil Atak 7 caran, Temer Atak 2 caran, Adem Yakin 7 caran, Hidir Altuğ 3 caran, Firat Altin (Abdulhakim Guven) 6 caran, Kukel Atak jî carekê bi cezayê muebbedê yê hepsê werin cezakirin. Di îdîanameyê de tê îdîakirin ku gunehbar Mîralay Temizoz ji sala dest bi wezîfeyê kirî û pê de ango ji 1993’an û pê de li Cizîrê di bin kirasê ‘têkoşîna li dijî terorê’ de, ‘komek pêk aniye ku ji cerdevan, îtîrafkar û çawişên pispor pêk tê’, bi vê komê êşkence li 22 kesan daye kirin, bi darê zorê daye wendakirine yan jî daye kuştin, ev 22 kes jî bi gumana ku alîkarî dane rêxistina terorê PKK’ê yan jî ji ber sedemên şexsî xistine bin çavan” (binihêre li Atılgan û Işık, 2011, 38).

302 Binihêre li Atılgan û Işık, 2011, 39.

303 Kerime Elçi dema ku cara pêşî heft gunehbarên ku bi kuştina mêrê tên gunehbarkirin dîtî hîs kirin wisa îfade kirine (binihêre li Adalet Vakti, 2012, 20; jêrenot 56).

yan jî bi tezmînatê wê bi dawî nebin, hene; daxwazên di holên dadgehan de hilnayên ên weke xwestinalêborînê, dîtina wendakiriyan, derxistina holê ya heqîqetan û aştiyê hene. Ev daxwaz, dozê ne bi tenê li dewletê dikin, heta, carinan dewlet ne merciyek e jî. Yên dilmayî. Dema dibêjin "ez ê qet li wan nebihurim" çi dixwazin bibêjin? Rikdariya wan a beramberî dewletê, berpirsiyaran, failan û yên dengê xwe nekirî çi îfade dike? Bêrê wan û pişta wan li kê ye? Şertên wanên ku dibêjin, "ez ê li wan bibihurim" çi ne? Yên ku bê şert û merc lêdibihurin kî ne? Israra yên nexeyidî, dilê wan nemayî ji çi re ye? PKK li ku dera jiyana wan e?

Me ev pirs ji wan kirin. Hin ji wan bê bersiv man, me hin ji wan texmîn dikirin, me bihîstibûn, me bi wan dizanî, lê belê ev cara pêşî bû ku me hin ji wan dibihîstin. Tevî rêya herî baş a ragihandina van ne ev e jî ya ji me tê ew e ku em li ser rewşên mirovan ên xwedî xisleteke siyasî belgeyekê hilberînin. Gelo em dixwazin vê bigihînin kê? Gelo em dixwazin wê bigihînin welatiyên civaka Tirkiyeyê yên ne Kurd û Dewleta Komara Tirkiyeyê? Tevî ku em nafikirin ku tiştekî pê nizanibin heye jî em nikarin xwe jê vedin ku ji bo vê hewl bidin. Hema piştî komkujiya sala 1909'ê ku Ermenî bûn qurbaniyên wê li Edenê, Yaseyan çû Edenê, xwe gihand kesên ji komkujiyê filitîn û tiştên hatî serê wî jî di pirtûka bi navê Di nav xirbeyan de ber hev kirin. Yesayan di wê pirtûkê de digot, "hewldana min wê bibe ew ku ez tevahiya miletê xwe û heta hevwelatiyên me yên ku xerîb in li ajoyên me, êşên me ... bi wê sefaleta bê sînor re bînim cem hev"; gelo sed salan piştî wî mimkun e ku mirov xwediyê heman hewldanê be?[304] Gelo beriya bi sed salan jî ev mimkun bû? Belkî jî Yaseyan ê ku di nava xwe de pir baş pê dizanî ku hewldana bi rastî qet nabe ku ev be, xwestiye armanca "xizmetkirina ji tevahiya welêt re" terîf bike: "heke ji min hat ku ez ji dil bibêjim, ew bedenên di bin qamçiyên zilmê de qofbûyî xwedî îrade, hest in û ruhê wan mişt e bi agirê pîroz ... hingê tu kes wê cesaret neke ku wan mirovên nefspîçûk bêqîmet bibîne û bi kîndarî nêzî wan bibe."[305] Herçî şexsê min e, min jî dixwest karibin bi tenê vê bikim. Helbet, ez ê weke Yesayan behsa şahidiya xwe nekim. Jixwe şahidiya min ne şahidiyeke li hovîtiyê ye. Ez bi tenê şahidê şahidiya wan kesan im ku şahidî kirine li hovîtiyê. Bi vî awayî, helbet weke şahidekê ez ê hewl bidim ku hovîtiya wan lê şahidî kirî ji zimanê wan, rewşa wan a şahidiyê bi gotinên wan berhev bikim û ragihînim xwendevanan. Nichanian di wê pêşgotinê de ku ji bo Di nava xirbeyan de nivîsîbû dibêje:

---

304 Yesayan, 2014, 31.

305 Yesayan, 2014, 31.

*Yesayan dixwaze wateyekê li felaketê bar bike; dixwaze wan mirinan hemûyan, wan mirinên bêwate bike xwedî wate û helbet bi vî awayî dixwaze di heman demê de sedeman bi afirîna ji bo tiştên nivîsîne û nivîsandina xwe. Lewma li devera ku wate ji dest tê dayîn harbûn gefên xwe dixwe. Erê, li seranserê dinyayê ya ku mirinê watedar dike şîngirêdan bi xwe ye. Lê belê li beramberî felaketê, ya lê, bi temamî berevajiyê vê ye; ji bo ku şîngirêdan mimkun be wateyek divê.*[306]

Nichanian bi îhtîmam û bi israr qirkirina Ermeniyan weke Felaket bi nav dike; ew tesbîtên xwe li ser qirkirina Ermeniyan giştî dike û - heke em karibin bêyî ku bêhurmetiyê bikin li derba Nichianian û Ermeniyan bibêjin - dibêje, piranîya mirovên li ser hovîtiyên bi vî rengî girseyî dinivîsin - bi gotinên Nichanian - bi qasî ku hewl didin wateyekê ji mirinan peyde bikin ewqasî jî hewl didin wateyê ji rewşa xwe ya nivîsandinê re jî bibînin, ev çi qasî tengî jî be, dana dûv îhtîmalekê ye. Dema ku mirov zanibe ku edalet, şahidî,lêborîn, heta demokrasî bi tenê îhtîmalek in, ne ku nemimkunbûna van îhtîmalan zêde dike, bi tenê berpirsiyariya ku îhtîmala nemimkunbûnê li mirovî bar dike, zêde dike. Hewldana bicihanîna vê berpirsiyariyê di dawiya dawî de ji bo kesê nivîskar bergiriyeke şexsî ye li dijî “tehdîda harbûna” lê şahidî kiriye jî.

306 Nichanian, 2014, 22.

## *Beş IV*
## **Îhtîmalek: Vegotin, Binavkirin, Watedarkirin**

Bêguman tecrûbeyeke pir zehmettir e ku mirov li şûna analîzên siyasî yên der barê wê demê de bixwîne, heta xwendina şahidiyan, tiştên salên 90'î li Kurdistanê qewimîn ji kesên bi şexsê xwe ew dem tecrûbe kirî bibihîze. Tiştên tên gotin sawê dikin dilê mirovî, dilê wî bi kerban dişewitînin. Nexasim jî heke tu keseke/î li rojavayê Tirkiyeyê mezinbûyî bî, hingê dibe ku tu bi xwe bihisî ku tu kêliyekê difikirî ku ne mimkun e ku tiştên tên gotin, "rast" bin. Heta ku tu gumanê bikî ji rastbûna tiştên tên gotin, hingê tu wê ji wê/wî kesa/ê ku dibêje, her bêhtir bi dûr kevî. Ha hingê, ya rastî tu wê dibî dûv derewê. Ya rastî, ne girîng e ka çi qas ji tiştên tên gotin rast in. Tiştên tên gotin heqîqeta kesa/ê dibêje ye; ew dide der rewşa ruhê kesa/ê dibêje, pêdiviyên wê/wî, hêviyên wê/wî, girêdanên wê/wî yên hisî, fikrî, siyasî ku bi wê civaka xwe re ku di navê de dijî datîne.[307] Bi ser de jî, dema tu israra hinan ji kesên ku tu guhê xwe didiyê di gotina hûrguliyan de dibînî û dibînî hinên din qet dil nakin hûrguliyan bibêjin, hingê tu dipejinînî ku tiştên nayên gotin yan jî nikarin werin gotin, kurt û kurmancî "heqîqet" ji tişta te bihîstî bêhtir e yan jî ku tu wê tu carî heqîqetê nebihîsî. Di navbera te û wan de her ji gotinan û wê de tiştek heye. Hin jê dixwazin bi destdana birîna xwe behsa kerba dilê xwe bikin, destê xwe datînin ser dilê xwe, devê xwe dinixumînin bi destên xwe û destên xwe di ser rûyên xwe re dibin û tînin. Mesele ne hebûn yan nebûna dilê wan ji bo gotinê yan jî jêhatîbûna îfadekirina tecrûbeyên xwe ye, destên wan di valahiyekê de digerin ku bi tenê dikare bi ne mimkunbûna şahidîkirina li qewmînan were ravekirin, ku gotin cihê wê nikarin dagirin. Jixwe şîdeta dûçarî bûn "di heman demê de ji bo jiholêrakirina şahidiyan e jî ... ji ber ku wateya pratîkên şîdeta dewletê ya sîstematîk di heman demê de tinekirina şahid yan jî şahidiyê ye, hem zehmet e ku mirov behsa pratîkan bike hem jî telafîkirina wan hema hema ne mimkun e."[308] Ji bo kesên sax filitî, piranîya hêza wan a şahidîkirinê ji dest wan hatiye girtin. Şahidên bi rastî jî yên ku êdî ne sax in; yê ku karibin şahidiyê bikin li şiyana zilmkirinê ya mirovan û karibin tevahiya serhatiyê bibêjin ew in.[309]

Tevî ya ku mirov nikare heta hetayê şahidiyê lê bike, tu carî bi temamî nikare were gotin, mirov rabe ji mirovan bixwaze bibêjin, hedê xwe bibîne ku karekî

---

307 Binihêre Fujii, 2010, 234.

308 Goral, 2014.

309 Binihêre li Nichanian, 2011; Agamben, 1999, 13.

bi vî rengî bike, bahane û cureta vê kirinê gelo dikare çi be? Gelo mirov dikare çêl li wê yekê bike ya ku bi rêya tiştên gotî mirov bi tenê dikare tê bipejine, ya ku nikare were gotin û mirov nikare şahidiyê lê bike? Ya ku tu dikarî bikî ya rastî bi tenê ew e ku tu hewl bidî wê valahiya di cewherê şahidiyê de heye bibihîzî, lê serwext bibî, texeyul bikî.[310] Tişta ku tu dikarî bigihînî kesên din, tu nîşanî wan bidî, piştrast bikî hebûna wê valahiya ku tu carî nikare were dagirtin e; ev valahî ne bi tenê ji ber mirov, endamên bedenê, hest, erd, mal û heywanên ji dest dayî pêk tê, lê her weha ji ber nekarîna gotina wê jidestdanê jî. Bi rêya kesên saxmayî yekane tişta tu dikarî şahidiyê lê bikî ew valahî bi xwe ye. Dibe ku tiştên tên gotin delîlekê pêk bînin ji bo pêvajoyên hiqûqî, çerxên edaleta cezaker, tezmînatên madî û watewî, yên ku dibêjin, dixwazin weha be, tu jî dibêji, "xwezî wisa be". Ya ku wê pêvajoyeke edaleta selihandinê bide destpêkirin jî qebûlkirina wê valahiyê ye ku nikare were dagirtin. Tevî nemimkunbûnekê ya ku wê têkiliyan deyne, biselihîne, nêzîkî edaletê bike, hewldana ku wê baqî bimîne bi xwe ye.

Tiştên ku di vê beşê de em ê ragihînin belkî karibin çarçoveya vê valahiyê xêz bikin. Dema ku em tiştên me bihîstî radigihînin gelek prensîp hene ku rêzê ji wan re digirin. Hin ji van ev in: heta ji me tê weke beşên dirêj, bêyî xirakirina temamîbûna wan, bêyî berevajîkirina wan û tevî hin hûrguliyên di dema hevpeyvînê de xwe di gotinan de nedan der hewldana ragihandina tiştên ku me bihîstin, esasgirtina ewlekariya vebêj. Li aliyê din, em dikarin bibêjin, prensîpa ku di encama helwêstên rexneger ên vê dawiye de hem jî tevî Arendt em dişopînin "ne objektîfbûn e". Wê bibe pircarîkirin, lê girîng e: Arendt digot, heta ku xizanî hebe, nifrîna li dijî xizaniyê bixwe ji xisletên xizaniyê ye; feraxetkirina ji mafê îfadekirina vê nifrînê û heta ji berpirsiyariya wê feraxetkirina ji melekeyeke insanî ye.[311] Çawa ku beriya niha me têgeha rikdariyê ya ku dûvikê banga dostaniyeke siyasî ya muhtemel e, weke xeydê şîrove kiribû, li vir jî em dikarin têgeha nifrînê weke birêxistinkirina hayilbûneke li bêedaletiyê şîrove bikin. Em pê dizanin ku gelek bêedaletiyen ku di akademiyê yan jî raya giştî de cihê xwe nagirin, di encama helwêstekê de ku objektîf û zanistî tê hesibandin nayên dîtin û ev helwêst bi şexsê xwe xwedî xisleteke alîgirê dîskûrsa serdest û subjektîf e. Nexasim bi saya serê nêzîkahîtêdanên femînîst û post-kolonyal em fêr bûn û fêr dibin ku presîpa objektîfbûnê her amûrek e ku tê bikaranîn ji bo rewakirina dîskûrsên serdest, bêqîmetkirina zanîna derdorên ne serdest. Ustundag nêzîkahîtêdanên subjektîf, pêhesî, yekhejmar

310 Binihêre li Agamben, 1999, 13; Quattrone, 2006, 149.

311 Binihêre li Arendt, 1994; Geddes, 2008, 4.

û esasê wê heqîqet, weke “şêwazên zanînê yên jinan” terîf dike ku li gorî wê ne beramberî nêzîkahîtêdanên objektîvîzm, rasyoneltî, giştîkirin û fikra wê di rastiyê de sabit bûye ya zanistên civakî yên baviksalar.[312] Ji bo vê xebatê nuqteya herî girîng a ku îşaret pê dike jî têkiliya di navbera objektîftî/subjektîftî û siyasîbûnê de ye: “Lihevanîna objektîfbûnê, ango dîskûrsên ku normal dikin ku zanyara/ê civakî xwe dûrî mijara li ser dixebite bike û zanînê hilberîne, xwe disipêrin danjibîrkirina wê rastiyê ku zanyara/ê civakî mexlûqeke/î civakî ye. Le belê her ferd her kêlî di nava hin têkiliyên civakî de ye û ya rastî timûdaîm di navbera hin dûrbûn û nêzîkbûnan de tercîhên siyasî dike.”[313] Bi vî awayî em dixwazin bibêjin ku endîşeya objektîfbûnê terîceke siyasî ye ku ev xebat jê xwe dûr digire. Bi gotineke din em bibêjin, endîşeya ku berê vê xebatê diyar dike ne “berhevkirina zanînê”, “gihiştina zanînê” û “agahdarkirin” e, em dikarin bibêjin, endîşeya me hilberandina metnekê ye ku yê xizmeta wê yekê bike ku em alemekê tesewur bikin ku şahidên xwe ji dest dane.[314] Endîşeya herî girîng jî, ez wisa zen dikim ku ew e ku em belgeyekê biafirînin ku kesên em bi wan re peyivîn, di wan deveran de ku behsa wan tê kirin, resmekî bibînin ku zêde jî dûrî wan nebe, bibînin ku tiştên gotî bi rengê wan gotî û guncaw hatine nivîsandin. Helbet, heke wan binivîsanda wê bi tevahî guhertî bûya, herçî ez im, ez dinivîsim ji bo ku qet nebe hêja be ji bo behskirinê û bi hêviya ku bibe alîkariyek ji bo “şiyana jiyana bi hev re”.

### *Rêgeh û serdan*

Di Çile û Sibata sala 2014’an de li navendên bajarên Mûş, Bedlîs, Colemêrg, Mêrdîn, Batman, Diyarbekir û Stenbolê, li navçeyên wan û gundan me rêwîtiyek kir; di dema vê rêwîtiyê de em ji bîstûyek malbatan bi pêncî û şeş kesan re peyivîn.[315] Kesên em bi wan re peyivîn, em ê li jêr yek bi yek tevî endamên din ên heman malbatê ku em bi wan re peyivîn, bidin nasîn. Sedema serdana me ya yanzdeh malbatan ji destdana xizmên xwe di encama “kuştina bê mehkeme” de, ya du malbatan jî ji destdana xizmên xwe di bin çavan de; didu

312 Üstündağ, 2014.

313 Üstündağ, 2014.

314 Binihêre li Quattrone, 2006, 145.

315 Li Mûşê bi du malbatan re heryekê bi kesekî re; li Bedlîsê ji malbataekê bi çar kesan re; li Wanê ji malbatekê bi du kesan re û ji malbateke din bi sê kesan re; li Colemêrgê ji du malbatan bi heryekê du kesan re, ji malbatekê bi sê kesan re; li Şirnexê ji malbatekê bi se kesan re û ji malbateke din bi çar kesan re; li Mêrdînê ji du malbatan bi heryekê sê kesan re; li Batmanê ji du malbatan bi heryekê du kesan re û ji malbateê jî bi sê kesan re; li Diyarbekirê ji du malbatan bi heryekê du kesan re, ji malbatekê bi sê kesan re û ji malbateke din jî bi çar kesan re; li Stenbolê jî em bi du feran re peyivîn ku endamên malbatên em li Kurdistanê bi wan re peyivîbûn.

jê piştî ku hatin binçavkirin, didu jê jî beriya ku werin binçavkirin careke din tu agahî ji wan nehatiye girtin ango bi darê zorê hatine wendakirin. Em çûn serdana sê malbatan ji ber ku mal û/yan jî kargehên wan yan bi benzînê yan jî bi avêtina topên hawin hatin şewitandin û xizmên xwe ji dest dan, û em çûn serdana malbateke din ku di encama serdegirtina mala wan bi sîlehên agirî xizmên wan hatine qetilkirin.[316] Ji van kesên wendakirî heft jê sala 1993'yan, pênc sala 1992'yan, sisê jê sala 1994'anm didu jê sala 1996'an û yek jê jî sala 2005'an hatine wendakirin. Di dema serdanên me de ya/yê herî ciwan bîst salî û ya/yê herî pîr/kal heftê salî, em bi sîhûdu jin, bîstûsê mêran re peyivîn.[317] Me hewl da ji heman malbatê herî kêm bi du kesan re bipeyivin ku ji komên cins û temen ên cihê ne. Tevî ku hevpeyvîna herî kurt şanzdeh deqîqeyan û ya herî dirêj heştêûheft deqîqeyan dewam kir, bi piranî di serdanên me yên nîvrojekê dewam kirî de em bi her kesê/î re bi navînî çilûpênc deqîqeyan bi tena serê xwe peyivîn. Hevpeyvîn bi zimanê ku vebêj tercîhkirî hatin kirin û di encamê de sîhûdidu bi Tirkî, bîstûpênc bi Kurdî pêk hatin.[318] Ji bilî şeş hevpeyvînên ku me li mekanên weke kafe, komele û kargehan kirî tevahiya hevpeyvînan li malên kesên em bi wan re peyivî hatin kirin. Dema em xwe bisipêrin serdanên xwe yên xanî û kargehên kesên em bi wan re peyivî, em dikarin bibêjin ku ew ji çînên aborî yên cihê ne. Lê belê li tu malê dewlemendiyeke ku di çavê mirov de biçe nebû, tevî vê jî li çend malan xizaniyeke aşkere hebû. Tevî ku malbat bi piranî ji wê çîna ku jê re dibêjin jêra çîna navîn jî bin, heke kesên ji destdayî bav yan jî birayê mezin be, gelekî dem jê re pêwîst bûye heta ku bigihîjin vê rewşê.

---

316 Misogerkirina serdana malbatan bi awayê ku heta mumkin bû ku em wan netirsînin û zivêr nekin, bi saya serê Ishak Dursun e; ew beriya serdana me ya bi xwe çû malbat dîtin yan jî bi rêya saziyên mîna MEYA-DER û IHD'ê peywendî bi wan re danî.

317 Ji kesên em bi wan re peyivîn temenê 12'an di navbera 20 û 30 salan de, yê 16'an di navbera 30 û 40 salan de, yê 23'yan di navbera 40 û 60 salan de bû. Ji bilî biraziyekî û dotmamekê yên mayî hemû xizmên radeya yekem ên kesên ji dest dayî bûn. Ji jinan ji bilî pêncan yên mayî hemû kebaniyên mala xwe bûn. Me nivîsî ku mêran bi piranî gotiye, karker, cotkar û dikandar in û diduyan ji wan gotiye memûr in. Ji kesên em bi wan re peyivî yek jê jin 3 mezûnên zanîngehê, yek jê jin 5 mezûnê lîseyê, dîsa yek jê jin 5 mezûnê dibistana navîn bûn, jineke ciwan jî hîna xwendekara dibistana navîn bû. Kesên din ên bi wan re peyivîn yan dibistana destpêkê qedandine, ya nîvrê hiştine, terikandine yan jî hîç neçûne dibistanê.

318 Herçî hevpeyvînên bi Tirkî ne, ji bilî yekê yên mayî ji aliyê nivîskarê ve hatin kirin, bîstûyek hevpeyvînên bi Kurdî ji aliyê Berivan Alagoz ve, çar ê din jî ji aliyê Ishak Dursun ve hatin kirin. Hevpeyvînên bi Kurdî bi şêwezarê kurmancî bûn û ji aliyê kesên hevpeyvînkirî ve hatin wergeradinî Tirkî. Tevahiya hevpeyvînan hat tomarkirin; hevpeyvînên ku nedikarîn werin tomarkirin di hevpeyvînê de nehatin bikaranîn. Herçî ev awayê wan ê divê pirtûkê de ye, careke din ji Tirkî wergera wan a ber bi Kurdî ve hat kirin.

Li herêmên Kurdistanê ku ji gelek aliyan ve ji hev cihê ye; li navenda bajêr û navçeyên dûrî navendê yên li heman herêmê yan jî bajêr jî bin têra xwe ji hev cuda; bi malbatên rewşên wan ên siyasî û aborî ji hev cuda re; bi ferdên di warê temên, cinsiyet û perwerdeyê de ji hev gelekî cuda re; li ser bêedaletiyên ji hev cihê; bi zimanên cihê; li mekan û zemanên cihê me hevpeyvîn pêk anîn. Me pê dizanî ku ji van hevpeyvînan em nikarin xwe bigihînin encamên giştî û me ev ji xwe re nekire armanc jî dema me ev xebat bi rê ve bir. Û heta, xwezî mimkun bûya em yekanebûna her serhatiya me guh dayiyê bibêjin. Li aliyê din em dikarin bibêjin ku her serhatî teqabilî hin derd, daxwaz û meylên li Kurdistanê heyî dike. Bi vî rengê xwe, tiştên ku wan kesan gotî, hestên wan û fikrên wanên ku dûçarî bêedaletiyê bûne, ji wan salên 90'î yên bêqidoş sax filitîn, bi tenê dibe ku ji bo wan kesan watedar be ku meraqa wan heye fêrî heqîqetên li Kurdistanê û gerînên li edaletê bibin û niyeta wan a dostaniya siyasî heye.

### *"Çi hat serê te, te çi dît?"*[319]

Ricaya me ya yekem ji ferdên malbatên em bi wan re peyivî ew bû ku behsa tiştên hatî serê xwe bikin. "Ew roja" hemûyan xwedî bibîranîn û wateyên ewqasî bi hêz bû ku karîbûn pê emrekî terîf bikin.[320] Dema ku tiştên bi serê wan de hatî terîf dikirin, herî zêde gotinên hovîtî, zilm, tofan, komkujî, qiyamet, mehşer, felaket, êş û belayê bi kar anîn. Çawa ku me di beşa destpêkê de nivîsî, dema ku Mukaddes Xanê digot, "gotinan êdî xwe binax kiriye" wê dixwest bibêje ku ya rastî tu gotin nînin ku teqabilî tiştên qewimî bikin. Heke gotineke bi vî rengî hebe jî, ferd bixwaze tiştên hatî serê xwe bi gotinan îfade bike jî û heta îfade bike jî, hingê "weke ku ew gotin û pê re temasa bi jiyanê bi xwe re wê bişewite û biçe yan jî wê bibe temaseke bêhîsmayî."[321] Belkî jî tu carî bilêvnekirina hin gotinan, rêyeke dewamkirina jiyanê, dewamkirina şîngirêdanê be.

Hin hûrguliyên ku me dixwest fêrî wan bibin, heta ku ji ber xwe nehatin gotin, bêyî ku em pirsan bikin, heta ku mimkun bû bêyî ku em vegotinan qut bikin, me li wan hisand.[322] Kesên ku di warê hestî yan jî fizîkî de nêzîkî kesê

319 Azize Xana ku lî jêr em ê wê bêhtir kite bi kite bidin nasîn, di dema hevtîna me pê re kirî de bi vî awayî pirsa ku dixwest ku em jê bikin wisa terîf kiribû.

320 Navê pirtûka Nurcan Baysal tê de behsa "serhatî û jiyanên ji hewzeya Kawar a ser bi tetwanê" dike, "O Gün (Ew roj)" e, ev jî xwediyê wê xisletê ye ku wê giraniya "wê rojê" ku jiyanan diyar dike, terîf dike.

321 Das, 2003, 304.

322 Pirsên ku em dihizirîn ji endamên malbatê bipirsin, di qonaxa destpêkê a lêkolînê de ji

jidestdayî û ji ber temenê xwe jî dikarin bûyerê bînin bîra xwe, tiştên qewimî ta bi derziyê ve kirin û gotin.[323] Nexasim jinan û yên wê demê hîna zarok hin hûrgulî negotana nedibû, yên weke ka kîjan demsal bû, bûyer kîjan saeta rojê qewimî, ew hingê li ku bûn, çi dikirin, çi bihîstin, çi dîtin, çi li xwe kiribûn, çi xwaribûn, çi di destê wan de hebû û rewşa kesê ku ji dest dane ya hingê ka çi bû. Bi awayekî em hemû pê zanibin jî, me xwest em ji devên xizmên wan bibihîzin ka ew çi difikirin li ser wê yekê ka sedema tiştên qewimî çi bû, nexasim ka çima xizmên wan weke hedef hatin girtin. Ka tiştên qewimî çawa tesîr li malbatekê hemûyî kir, bi piranî ji ber xwe dihat gotin. Herçî tesîra li şexsê wan bûyî bû, diviyabû em ji wan bipirsin. Bi qasî ku me dît, yên ku tiştên hatî serê wan berê li meydana giştî parve kirin û piranîya mêran, meyildar bûn serhatiyan bibêjin ku nûneriya malbatê hemûyî dikin û bi piranî dîskûrseke siyasî bi wan re hebû; û wan tercîh nedikir ku behsa xwe bikin. Yên berê tiştên hatî serê wan bi kesî re parvenekirî û jinan bi xwe, yan ji ber ku li gorî wan ne guncaw bû behsa xwe ji "xerîbekê" re bikin yan jî ji ber ku êşên xwe yên şexsî hêjayî gotinê nedidîtin, xwe bi dûr dikirin bibêjin ka tiştên qewimî tesîreke çawa li ser şexsê wan kir.[324] Ka pêvajoya taziyê û şîngirêdanê çawa derbas bû, nexasim jî heke taziye hatibe astengkirin, ji wan mijaran bûn ku bêyî ku em bipirsin dihatin gotin. Em ê behsa qewmînan û tesîrên qewmînan, pêvajoya taziyê û şîngirêdanê bikin dema ku li jêr em kesên me bi wan re hevpeyvînkirî, bidin nasîn.

Me ji kesên em bi wan re peyivî pirsî bi hewldana teswîrkirina fikra edaletê, bawerî û gerîna li edaletê, ka ew kê/kîjan saziyan berpirsiyar digirin ji tiştên qewimî; ka ew failan yan jî berpirsiyaran weke gunehkarên sereke dibînin.

---

bo ku fikir bidin me, me bi akademîsyen û nûnerên rêxistinên civaka sivîl ên cuda yên li Stenbol û Diyarbekirê parve kirin. Navên kesên ku tevlî civînên me yên meha Îlon û Kanûnê bûn û alîkarî kirin bi vê xebatê re ev in: Ozgur Sevgi Goral (Navenda Heqîqet, Edalet, Bîrê), Ayşe Iclal Kuçukkirca (Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê), Bulent Kuçuk (Zanîngeha Bogaziçi), Nazan Ustundag (Zanîngeha Bogaziçi), Şemsa Ozar (Zanîngeha Bogaziçi), Cihan Aydin (Bariya Diyarbekirê), Mehdi Perinçek (Kevne-berpirsiyarê herêmê yê İHD'ê yê Diyarbekirê), Gamze Yalçin (Şaxê IHD'ê yê Diyarbekirê), Murat Aba (TİHV-Diyarbekir), Lezgin Yalçin (STGM-Diyarbekir), Ovgu Gokçe (DSM), Bariş Yavuz (TİHV), Hamit Acur (Göç-Der), I. Halil Oruç (MeyaDer), Yilmaz Kan (Göç-Der), Hulusi Zeybel (Şaxê IHD'ê yê Stenbolê), Neslihan Yuruk (Şaxê IHD'ê yê Stenbolê), Hüsnü Yılmaz (federasyona Huqûqzanan a Ewrûpayê ya ji bo Demokrasî û Mafê Mirovan), Nurcan Baysal (DÎSA), M. Emin Aktar (Kevne-serokê Baroya Diyarbekirê/DÎSA), Semahat Sevim (Komeleya Heinrich Böll Stiftung/DÎSA). Ji ber alîkariya wan em malavahiya wan dikin.

323 Ji kesên em bi wan re peyivî 12 jê, dema bûyera mijara hevpeyvînê qewimî piçûktir bûn ji deh salî.

324 Ji bo xebatekê ku behsa wê yekê dike ku jin "ne pêwîst" û "bêqîmet" dibînin ku tiştên hatî serê xwe bibêjin, binihêre li Bozkurt û Kaya, 2014.

Herçî agahiyên li ser wê yekê ne ka ji bo giliyê fail û berpirsiyaran bikin miraceetî kîjan merciyan kirine û miraceetên wan çawa bi encam bûne, ji ber xwe hatin gotin. Me hewl da fêr bibin ka mexdûrbûna wan çawa dikare "nisbî" were tezmîn kirin; ka daxwazên wan çi ne di biwara tezmînata madî, xwestinalêborîna fermî, derxistina holê ya heqîqetan de; ka fikrên wan çi ne di biwara Darizandina fail û berpirsiyaran, kêmkirina ceza ûlêborînê de, ka hêviyên wan ên ji dewletê û ji gelê Tirk çi ne. Tiştên em fêrî wan bûyî em ê parve bikin di beşa piştî vê de ya bi sernavê "Libendêmana edaletê" di çarçoveya çerxên pêvajoyên edaletê yên piştî şerî de ku me di beşa "Rûbirûbûna bi rabihuriyê re: Gerîna li edaletê" de minaqeşeya wan kiribû. Di beşa piştî wê de ya bi sernavê "Fikirîna li edaletê" jî em ê ragihînin ka îhtîmala kesên em bi wan re peyivîn a rûbirûbûna bi fail û berpirsiyaran re çi ye, şertên wan ênlêborînê û/yan jî lihevhelalkirinê, wate û berambera civakî yalêborînê/lênebihurînê tiştên wan gotî, û hest û fikrên wan ên siyasî li ber rohniya têgehênlêborîn, rikdarî û xeydê. Beriya ku em derbasî van minaqeşeyên hiqûqî û siyasî bibin, em hewl bidin kesên em bi wan re peyivî bidin nasîn û bêedaletiyên bi serê wan de hatine vebêjin.[325]

### *Mexdûr, şahid û yên saxmayî*

Em ê hewl bidin kesên em bi wan re peyivî li gorî rêza rêgeha hevpeyvînên me bidin nasîn, bi rêya gotinên wan ên li ser tesîra tiştên qewimî li ser wan û malbata wan û nexasim jî bi gotinên pircarî îfade kirî. Hingê bivênevê dibe ku carinan vegotinên gelekî hestyar, bêhtir jî resmên kerbê bidin der. Em dixwazin bi bîr bixin ku ji bo ku em karibin portreyên bêhtir bi kite kite yên kesên em bi wan re peyivî bibînin, divê em di beşên paşê de bersivên ku dayî pirsên peywendîdar jî li ber çavan bigirin. Agahiyên giştî yên di biwara wan de yên weke temen, perwerde, pîşe, rewşa wan a medenî, bi qasî ku êm fêr bûn, em parve dikin. Tevî ku di dema hevpeyvînê de me bi wan xîtabî wan nekir jî li vir ji bo xîtabê me tercîh kir peyvên xan û beg li dawiya navên wan zêde bikin.

### *Muş: "êdî weke berê nabe"*

Em hevdîtina xwe ya pêşî bi Abdulkerim Begê niha 43 salî re dikin, ew sala 1993'yan tevî bavê xwe yê beriya hingê gelek caran hatibû binçavkirin û gef lê hatibûn xwarin - tevî du kesên din - li avahiya dibistanekê hat binçavkirin, halê hazir ew li saziyeke dewletê kar dike û bi awayekî çalak jî di nava siyasetê

325 Em ê kesên em bi wan re peyivî bi wî avayî bidin nasîn ku em pêşnavê wan bi kar bînin, paşnavê wan û nav û paşnavên kesên wan ji dest dayî aşkere nekin.

de cihê xwe digire. Ew ji wê dibistana ku lê tên binçavkirin direve, lê belê bavê wî, herdu kesên din ên pê re hatin binçavkirin tevî agahdariya walî, şaredar, fermandarê alayê, parlemanterên herêmê û heta serokwezîr 18 rojan di bin çavan de dimînin. Roja ku agahî û temînat tê dayîn ku wê werin berdan jî termên wan hatin dîtin. Dema ku diçin cenazeyan ji nexweşxaneyê bigirin, "dozegerê hingê tevî du endamên tîmên tevgera taybet gelekî zextê dike da ku bûyerê hewaleyî navnîşaneke din bikin" Abdulkerim Beg dibêje: "Helbet me ev qebûl nekir" û li gotinên xwe zêde dike: "Ango rewşeke ku rêxistin [wan] bikuje, nebû. Ev herdu kes di bin çavan de bûn, tevahiya Mûşê pê dizane ku di bin çavan de bûn ... Dewletê ew girtiye, kuştiye." Sedema hedefgirtina bavê xwe jî weha rave dike:

> *Niha du sedem hebûn ku bavê min bijartin. Ya pêşî elaqeya wî ya ji pirsgirêka Kurd re bû... Sedema duyem jî ew bû ku bi nasnameya xwe ya dîndar elaqedarî pirsgirêka Kurd bû. Iewma siyaseta dewletê ya hingê weha bû, va ne, ew kulmek ermenî, kulmek eşqiya, kulmek cudaxwaz, kulmek insanên marjînal in. Li hemberî vê dema otorîteyeke dînî ya li herêmê xwedî giranî, muderisek, rehberekî fikrî [bibêje,] 'nexêr, ev tiştên dibêjin hemû ne rast in, li naverastê dozeke mafdar heye' li zora erka wê demê diçû.*
>
> *Erka behsa wê tê kirin, xwe jê venade û xizmên rehmetî û hezkiriyên wî çavtirsandî dike:*
>
> *Dema ku cenaze hatin nexweşxaneyê, xelk li pêşiya nexweşxaneyê hêdî hêdî kom bû. Ji bo ku wê girseya gel jî ji hev belav bikin... panzer bi ser xelkê de ajotin ... dema ku [me] cenaze birin gund da ku em wan veşêrin gule li karwanê cenaze reşandin ... [roja duyem a taziyeyê] ji sibehî heta êvarê qereqolê gule li hewayê reşandin da ku kes neyê taziyeyê.*
>
> *Roja sêyem neçar dimînin Mûşê bi cih bihêlin:*
>
> *Ewqasî zehmet e mirov bi ser wan gotinan ve bibe ku êşên me kişandî, êşên li vê herêmê hatî kişandin, êşên bi sedan, bi hezaran, bi dehhezaran malbatî kişandî îfade bikin, ango, ma em çawa dikarin îfade bikin... ji bo ku hesta aîdiyetê ya ku mafê te yê herî sereke ye heta bi hinavên xwe his bikî û wisa bijî tu evqas êşan dikişînî.*

Ji ber ku şert û merc ne guncaw bûn, me nekarî bi kesekî din ji malbata Abdulkerim Beg re bipeyivin. Keseke din hebû ku em ji malbata wê bi tenê bi wê re peyivîn, ne ji ber ku şert û merc ne guncaw bûn, lê belê ji ber ku tu kesa/ê din ji wê pê ve sax nefilitîbû: Aysel Xana niha 39 salî zewicî û pênc zarokên wê hene; Cotmeha sala 1993'yan bavê wê jinbava wê, ya/yê herî piçûk yek salî,

ya/yê herî mezin sêzdeh salî heft xwîşk û birayên wê tevî xaniyê tê de hatin şewitandin. Aysel Xan ji wan kesan bû “bi tenê bi serhatiya xwe karîbû dinyayek sefalet raxîne ber çavan.”[326] Di şerekî nêzî gund de gerîlayek û berbazek tên kuştin, li ser vê serpelê tê gund dibêje, ew ê gund bişewitîne û tişta dibêje, dike jî. Fermanê dide ku yek ji malên pêşî yên li keviya gund, mala bavê Aysel Xanê yê ku xerat û cotkar e, were şewitandin. Li gorî Aysel Xan û şahidên din dibêjin, ne destûrê didin ku yên li malê ji hundirû derkevin, ne destûrê didin ku zarokan di pencereyan re derxin derve û wan xelas bikin, ne jî destûrê didin ku yên li derve bikevin hundir û alîkariyê bikin:

*Wê êvarê me gelek êş û azar kişand... Ango dişewite, di pencereyê re me nihêrî, dişewite... ew çar [esker] in, ji ber dêrî xwe nedidan alî... Ez dîsa jî giriyam, min got, ‘malbata min, xwîşk û birayên min hene li wir’ ... Dema ku me çend gav diavêtin, li me dixistin. Dîsa dixistin hundirû... beriya ku roj bi tevahî hilîne, me dît esker weke ku xwe hinî dide ser hev [xuya ye]... Yek jê li ser [banê xaniyekî] sekinîbû, bi ser me de, li qisûrê nenihêre, mîz dikir, bi me dikeniya... Ya rastî ne esker bû, tîm bû. Hin esker digiriyan.*

Ne bi tenê Aysel Xanê karîbû esker û endamên tîman ji hev derêxe. Li gelek deveran cil û bergê wan û unîformayê eskeran weke hev jî be, tîmên bi sîlehên xwe û bi bejn û bala xwe ya ecêb tên terîfkirin, bi zalimtiya xwe û bêrehmbûna xwe dihatin nasîn û wekî din xelkê ew weke hereketa taybet jî dizanî, weke endamê dewletê yê ku salên 90’î li Kurdistanê herî zêde saw dida mirovan tê bibîranîn. Û hema di cih de tê bibîrixistin ku wan dixwest berpirsiyariya vê sawê jî bixin stûyê hine din: “Mêr hemû kom kirin, kî ji wan digirî, welê temaşe dikir, li wan dixistin... [serpelê nav birî] ew birin cem şaredariyê... li wir ji xelkê re peyiviye... ‘em bi we ve negihiştana gundê we hemû diçû”. Serpel tênê ser wê yekê qaşo ew bi wan ve negiştana PKK’ê wê gund hemû bişewitanda. Aysel Xan gelek caran disekine, xweziya xwe dadiqurtîne, carinan çavên wê şil dibûn, demên dirêj bêdeng ma û weha dewam kir:

*Piştre dema mêr hatin cenaze derxistin. Dibêjin te dîtiye, hîç nayê bîra min, ez qet nikarim xeyal jî bikim çawa bûn, cesed çawa bûn? Naxwe, bûne weke komirê, ango... Sê, çar rojan jixwe hişê min çûye, min nedizanî ka taziye çi ye... Ez sax im lê her roj, ez welê diperitim, dişewitim. Ez naxwazim wisa çîkî xuya bikim bi zarokên xwe. Ez hewl didim ji bo zarokên xwe li ser piyan bimînim.*

Sibeha wê şeva ku Aysel Xan dibêje, “me gelek êş kişand” yek ji mêrên li ber şaredariyê lêdan xwarî û piştre hatî binçavkirin jî, bavê Mukaddes Xanê yê mele û di-

326 Binihêre li Yesayan,2014, 94.

kandar bû. Ji ber êşkenceya di bin çavan de lê hatî kirin di halekî de bû ku nikarîbû derkeve derve, piştî bi yanzdeh rojan wî "ji nav cihê wî bi halê nexweş" careke din dibin û careke din tu xeber û pêjn jê nayê, ji çiriya paşîn a sala 1993'yan û vir ve. Mukaddes Xan bîstûheft salî ye, azib e, bi awayekî çalak elaqeya wê bi siyasetê re nîne, dibistana navîn qedandiye. Wê jî xwîşk û birayên wê jî piştî wendakirina bavê wê nikarîbûn çûna xwe ya dibistanê dewam bikin. Piranîya xwîşk û birayên wê yan ji ber zextan yan jî ji bo ku kar bikin koçberî Stenbolê yan jî derveyî Tirkiyeyê bûne. Em bi wê re li Stenbolê li mala birayê wê yê mezin peyivîn. Mukaddes Xan behsa bîstûyek salan dike ku bêyî hebûna bavekî, ya rastî bi libendêmana bavekî nayê zanîn sax e yan mirî ye derbas bûne:

*Ya rastî ez bibêjim, bextewerbûn ji me standin, çêtir e. Lewma siberoja me ji me standin... Bi carekê, di rojekê de hemû tine dibin, diçin... Êdî em nikarin xeyalan jî bibînin. Lewma di nava xeyalê de bavê me nîne. Tişta herî mezin a malê nîne, hîmê malê nîne. Hûn çi qasî dagirin jî dema hûn berê xwe didinê, parçeyê herî mezin kêm e. Ileh dirûxe... Ez dixwazim hema ku careke bi tenê jî be malbata xwe hemûyî li gel hev bibînim. Rojeke bi tenê be jî, hemû li cem hev, weke dema zaroktiyê em li ber heman sifreyê rûdiniştin... Bifikirin ev bîstûyek sal in û hê jî ez bêriya wê sifreyê dikim.*

Birayê piçûk ê Mukaddes Xanê, Ekrem Begê bîstûçar salî ji jiyana xwe kêmbûna bavê xwe weke "ji heyamên berê destpêkirin" terîf dike û behsa mîrateya bavê wî jê re hiştî dike:

*... piştî ku bavê min birin, jiyana min û ya malbata min veguherî xewnereşkekê. Çawa veguherî xewnereşkekê? Timî... em neçar man ji sifiran dest pê bikin, ji bin sifirê dest pê bikin... Me ya diviyabû, ya ji destê me hat, kir. Me xwe parast, bavê xwe parast... Niha jî dema em dijîn, em nikarin weke ku em bin, bijîn. Çawa em nikarin bijîn? Ez hewl didim weke kur [-ê wî] bijîm. Dema ku ez gotinekê, peyvekê tînim cem hev ji bo çêkirina hevokekê, vê yekê ji bo ku layiqê wî be, dikim. Ez li rabûn û rûniştina xwe hayil im, li cilûbergên xwe dîqet dikim... Tu çi dikî, bike, tu şaşiyekê jî bikî dibe ku rahêjin vê şaşiyê bikin malê bavê te... Ji ber vê yekê, temam, me fikra bavê xwe, rêya bavê xwe hevrêyê xwe zanî, me hewl da li ser wê rêyê bimeşin.*

Ma rêya bavê wî çi bû? "Neheqî qebûl nedikir. Bi zimanê xwe yê dayikê dixwest bigihîje nasnameya xwe... Ev îfade jî dikirin, li her devera lê bû, ev îfade dikirin. 'va ye, ev wekheviyek e hevbeş e, ev mafekî Xwedê dayî me ye. Nabe ku kesekî din vî mafî ji me bistîne.' " Ji bo ku bavê xwe bibîne miraceetî merciyeke îdarî dike û bersiva wê wisa radigihîne:

*heke hûn îfadeya em dixwazin bidin, em ê alîkariyên madî yên pêwîst hemûyan bi we re bikin... ‘hûn ê di îfadeya xwe de bibêjin, terorîstan bavê min bir, PKK’yiyan ew bir û kuşt’ îfadeya xwe biguherînin, em jî êdî madî watewî û êdî çi be, çi ji destê me tê, bikin.*

Ekrem Beg di ezmûnên zanîngehê de bi ser ketiye, lê ji ber ku şert û mercan destûr nedaye, nikarîbû bixwîne. Li gund kargeheke wî heye. Ji bo ku dê, xwîşk û birayên wî hinekî rehettir bijîn xaniyekî nû ava dike, lê dibêje, dayika wî bi israr e ku ji vê malê, ji mala ku bavê wî jê birine neçe: “Her cara ku erebeyek derbas dibe, dayika min derdikeve derve, dinihêre ka gelo ew anîn li cihekî danîn, anîn û avêtin.”

Cemile Xan qederê şêst salî ye, bi Tirkî nizane, tiştên em bi kurê wê re dipeyivin nabihîze, lê weke ku bihîstibe dipeyive:

*Ha welê, weke ku di canê mirov de birînek vebe... çi qasî tu qemûşka wê jê bikî, birîn her teze dimîne... qet nayê jibîrkirin... Îro ev parçeyê kaxezê yê piçûk li wir e... Nivîsa te çi qasî xweşik jî be, dema ez rahêjimê di nava destê xwe de holê bikim [bi destê xwe weke bievçiqîne dike], êdî ileh nabe weke berê.*

Di nava Cemile Xanê de tiştên bedew hebin jî êdî qet wê weke berê nebin, temenê wê yê ku şibandî kaxezeke qermiçandî derbas dibe, ne bi tenê bêyî ku mêrê xwe bibîne, lê belê her weha bêyî ku ev hijdeh sal in ku kurekî xwe bibîne yê ji çûna eskeriyê yan jî girtinê tirsiyayî û venegeriyayî gund. Belkî ji ber vê hesreta dawî lê nayê, kêfxweş e bi serdana me: “Ji te re, rewşa mirovî çi qasî jî ne baş be îro, gava kesek tê li cem te rûdine, li halê te dipirse hinekî jî be tu baş dibî.” Helbet yê ku bi rastî li bendê jixwe ne em in. Jixwe, dema ku heyeta mirovên maqûl tê gund û naçe serdana wan, keça wê Mukaddes Xan ev yek weha rexne dikir, weha dipeyivî[327]: “Li wir tevî ku navê bavê min gotin jî... kes ji wan ranebû bang li kurê wî, li jina wî nekir, negot, ‘ka ez bi jina wî re bipeyivim’... wê rojê dilê dayika min bi rastî jî gelekî ma, pir zêde dilê wê ma. Dilê mirovî dimîne jî. Tu evqasî berdêlê didî, evqas tiştan dikî.”

327 Di wê demê de ku weke “pêvajoya çareseriyê” dihat zanîn, hikûmetê heyeteke mirovên maqûl a ji 63 kesên “di nava beşên diyar ên civakê de xwedî xisleta nûneriyê” saz kiribû, ji bo lîsteyên vê heyetê li rojnameyên roja 3’yê Nîsana 2013’an dikare were nihêrîn. Serokwezîrê hingê Recep Tayyip Erdogan armanca damezrandina heyetê weha rave dike: “Em ê hem guh bidin fikr û pêşniyarên mirovên maqûl ên di vê heyetê de û bi wan bişêwirin, hem jî ew ê li herêmên me hin çalakiyan organîze bikin, bi xelkê me û rehberên fikr re bên cem hev.” Binihêre li http://www.milliyet.com.tr/iste-akil-insanlar-tam-listesi/siyaset/siyasetdetay/03.04.2013/1688872/default.htm [1’ê Çiriya pâşîn a 2014’an].

***Bedlîs: "rahiştinê û birin"***

Dîtira rojê, em digihîjin gundê ku lê em ê bi Nihat Beg re bipeyivin. Ev der, ji wan gundan e ku salên 90'î hatin valakirin. Gundek e ku li aliyekî zexta danqebûlkirina cerdevanbûnê li aliyê din tevlîbûna nav refên PKK'ê gelekî zêde bû. Bavê Nihat Beg di Çiriya Paşîn a sala 1993'yan tevî sê xizmên xwe ji gund tê derxistin û tê kuştin. Kesên vê dikin "bi kirasê gerîla ne", li deriyê wan dixin, li aliyekî dibêjin, maşîna wan xira bûye, doza alîkariyê dikin, li aliyê din ji bo ku bang li kesên di lîsteya wan de bike, bi israr bang li bavê wî dikin. Panzdeh roj di ser bûyerê re dibihurin, qereqol nasnameyên bavê wî û sê kesên din dide malbatên wan. Nihat Beg hingê duwanzdeh salî ye, neçar dimîne ji bo ku li xwîşk û birayên xwe binihêre kar bike: "barê malê hemûyî kete stûyê min. Şeş xwîşk û birayên min hene. Dayika min heye. Bapîrê min ez ji dibistanê girtim. tevî ku li dibistanê ez gelekî serketî jî bûm." Niha bi xwedîkirina heywanan mijûl e û li komeleyekê çalak e ku ji aliyê kesên li Kurdistanê xizmên xwe ji dest dane hatiye damezrandin: "Di rastiyê de tiştên wisa hene, vê dîrokê şahidî li komkujiyên bi wî rengî kir ku dema tu li wan dihisînî tu xwe ji bîr dikî. Dema ku ez tevî Nihat Beg diçim serdana gora bavê wî, ez weke ku pê dihisim ka gor çawa dikarin bibin dilmînî, ka kesên ku bêpar in ji gorên xizmên xwe yên ji dest dayî, çi his dikin.

Li gund em wekî din bi keçxaltîka Nihat Beg, Sinem Xanê re ku her weha ji şahidên wê şevê ye, dipeyivin. Ji beriya qewmîna bûyerê dest bi vegotinê dike:

> *Bavê Nihat... beriya bi hizrekê li gund digeriya. Weke mînak digot... piştî saet heştan ez jî werim mala we, derî venekin. Kontra gerila peyde bûye li her deverî komkujiyan dikin... xelke didin wendakirin... Weke mînak, bibêjin em heval in, em ji derve hatin, kesî nedizanî ka kî kî ye. Ma kî hevalan nas dike?"*

Ew behs dike ka piştî bûyerê gund çawa hat valakirin: "Êdî insan nesekinîn. Piştî ku rahiştin cenazeyê xwe, mirov reviyan. Gund vala bû... Ciwan hemû reviyan, bi tenê jin û mêrên pîr û kal man. Jixwe piştre ew jî reviyan." Gund heta sala 2001'ê vala dimîne, niha êdî yek yek mal hene ku agirê kuçika wan pêxistiye, bi tenê kal û pîr vegeriyane. Keça xaltîkeke din a Nihat Beg, Latife Xan jî tevlî sohbeta me dibe: "Her kes koçber bû, dewletek li dijî gundekî bû, her kes koçber bû." Herdu jin jî di çil saliyên xwe de ne, di Tirkiyê digihin lê nizanin bipeyivin. Sê zarokên Latife Xanê û ji malbata mezin bi giştî bîstûyek kes tevlî PKK'ê bûne, di şer de jiyana xwe ji dest dane:

> *Me nekarî cenazeyê yekî ji wan jî bigirin. Bi giştî me nekarî cenazeyên dehan jî bistînin... Hemû li der man, me nekarî wan bigirin... em nizanin li ku ne jî. Em*

*zanibin li ku ne jî cerdevan destûrê nadin em herin wan bînin... Welehî beriya bi du mehan em çûn, me qismek ji wan [ji bin erdê] derxist, anî, heft heb. Me hestûyên heft mirovan derxistin. Yek jê yê min bû... Welehî dema me ew hestû derxistin, heştêûdidu hestû, hestû bûn... Heştêûdu cenaze, hemû hestû [bûn].*

Ji bo ku em bi dê û apê Nihat Beg re bipeyivin berêvarê em vedigerin navenda navçeyê. Apê wî Necmettin Beg çilûçar salî ye, sê zarokên wî hene û teknîkerê avahîsaziyê ye. Dema ku birayê wî yê mezin tê kuştin wî eskerî dikir. Dibêje, gund "gundek bû ku sempatiya wî ji PKK'ê re hebû" û weha li gotinên xwe zêde dike: "Birayê min ne gerîla bû. Yên din jî, her çar jî ne gerîla bûn." Ber bi dawiya sohbetê ve, dema ku em bi awayekî berferehtir di biwara pirsgirêka Kurd de dipeyivîn, behsa bûyereke di ciwaniya wî de lê qewimî dike:

*... em diçûn dibistanê, bi tirs em diçûn... hingê em diçûn sinifa yekê ya lîseyê... sala 1991'ê Kuweyt hatibû dagirkirin. Alîgirên tevgera Nûr li vir meşek li dar xist... paşê jî veguherî meşa PKK'ê. Em jî li qehwexaneyê rûniştibûn. Em şeş, heft kes birin, girtin û heft, heşt rojan timî êşkence li me kirin. Hingê sala 1991'ê yên ku me ji wan re Herekata Taybet, tîm digot... em digirtin, tişta nedigotin, nedima. Bi wan gewdeyên xwe yên mîna yên heywanan, êdî ka ji ku ew dianîn, jixwe me hingê ew dîtin, ew nas kirin.*

Necmettin Beg fonksiyona tîmên taybet a ku berê Aysel Xan û gelek kesên din jî bi heman rengî terîf kiribûn, piştrast dike.

Dayika Nihat Beg zêde xwe nade ber axaftinê, demeke dirêj dipirse ka em kî ne û çi ji wan dixwazin. Piştî bi demekê dibêje, ew qebûl dike bi me re bipeyive. Di dema sohbetê de bersivên dirêj nade, gelek caran bersivê jî nade, lê belê pê gelek tiştan dibêje. Pirs çi dibe bila be, çi bersivê bide bila bide, di dawiya axaftina xwe de her carê heman hevokê tekrar dike Yeter Xan: "rahiştinê û birin." Di pêncî saliya xwe de ye, bi Tirkî nizane, hîç neçûye dibistanê. Dibêje: "Hingê ez weke bûka nû bûm, binihêre çi bi min hatiye... Lewma bedena min dihele... Tiştekî weke tofanekê bu. Tiştekî weke tofanê bû, hatin, rahiştinê û birin." Dixwaze kurê wê rabihuriyê li rabihuriyê bihêle; hem bê hêvî ye û hem jî ditirse. Tuwanca wê ew e ku heke dewlet nexwaze tu kes wê nikaribe vê bûyerê rohnî bike. Li dawiya sohbetê weke bersiva hêviyên wê yên ji me, hevalekî me got, hêza me nîne em meseleyê çareser bikin, li ser ve yekê wê got, "naxwe tu jî weke min î." Di rê de ez ji xwe dipirsim, "gelo ji bilî lênûkirina êşa wê me niha çi kir?" Ji pirsên min kirî ya herî rast, lê di heman demê de ya herî reşbîn. Lê me da rê. Bi ser de jî yên ku qebûlkirine bi me re bipeyivin li benda me ne, sibe divê em li Wanê bin.

### *Wan: "yê çûyî, çû êdî"*

Li Wanê em pêşî diçin mala Şengul Xanê. Birayê wê yê mezin ê rojnamevan Çileyê 1993'yan li kolanê bi sîlehê hat kuştin. Şengul Xan dibêje, beriya were kuştin gef lê hatine xwarin, lê wî gav paş ve neavêtin:

> *Ji dayika min re digot, 'ma xwîna min ji ya kê sortir e? Ez jî dizanim wê min bikujin. Ez ê hîç dev ji vî karî bernedim. Ez nekim, kî wê bike? Her kes ji zaroka xwe re dibêje, vê neke, weha neke, wê li ser te deynin, wê te bikujin. Ya ku em dikin jî ne tu tişt e, rojnameyeke me ye. Derxistina rojnameyê jî ne tiştek e, ango ne tiştekî qedexe ye.'*

Yek ji birayên Şengul Xanê "îxbarkerê hevkar" ê ku alîkar bûye di kuştina birayê wî de, kuştiye, niha di girtîgehê de ye. Yek ji xwîşkên wî ya li ber zewacê jî piştî bûyerê diçe çiyê, piştî ku tê girtin neh sal û nîvan di girtîgehê de dimîne. Şengul Xan 47 salî ye, pênc keçên wê hene, demekê di komeleyekê de dixebite ku xizmên girtiyan ew damezrandiye. Ew dibêje sala 1999'an ew jî hatiye girtin, sala 2001'ê keça wê ya hingê xwendekara lîseyê - ji dibistanê ji odeya midûr - tê binçavkirin, êşkencê li wê û keça wê dikin. Ew behsa yekanebûna birayê xwe yê mezin û tesîra jidestdana wî li ser malbatê dike:

> *[Ew] bi rastî jî deryayek bû, behrek bû, ango çiyayek bû. Dema ez dibêjim derya bû, ango bi rehetî mirov dikarîbû biçe cem wî. Dema ku ez dibêjim çiya bû, ango mirovî dikarîbû xwe bisiparta wî. Dema ez dibêjin derya, ango ew weke hêzekê bû... Ma ne min got, kirina behsa wî weke dinyayekê bû. Piştî ku ew çû ne ku mirov najî, belê mirov dijî... Ango ez ê ji rikan bijîm, ji rikan bikim, ez ji rikan ve dixwazim ya wî nikarîbû bike, bikim. Dema mirov nikaribe bi zaroka xwe dide kirin, heke zaroka mirovî nikaribe bi xwîşka/birayê xwe dide kirin. Herçî armanca kekê me bû, ev bû, ya me... kekê min li aliyekî deyne, ango ev têkoşîneke neteweyî ye, ji bo me, erê temam, ew êş, weke min gotî ew êş tiştekî din e... lê belê nabe ku ev xelas bibe, bi rastî jî nabe xelas bibe. Lewma mirov wê êşê, ew êş hêzeke wisa di dilê mirovî de diafirîne, rikeke wisa diafirîne ku mirov her diçe xurt dibe, rikdariya zêde dibe... Ango endîşeya zarokan e, ya malê ye, piştî hingê ev endîşe bi me re çênebû, ango weke malbat bi me re çênebû... ango tu endîşe û tirs bi me re nema... Di nava insên de rikeke wisa tê afirandin, tiştekî wisa kat dide ku weha vedibe, şax berdide. Wisa hêrs û rika mirovî çêdike, mirovî bîrewer dike, xurt dike, bi her alî ve mirovê bi gurç û pêç dike.*
>
> *Jina di çil saliya xwe de ya birayê wê, Sinem Xan bixwe, dema ku mêrê wê hat kuştin ji heft salan ve zewicî bû. Weha behsa mêrê xwe û kuştina wî dike:*

*“Weleh dijminên me nebûn... Bi tenê rojnamevan bû, li rojnameyê dixebitî, ji ber vê dan kuştin... Ne dijminê me ne tiştekî me hebû. Weleh mirovekî qenc bû. Bi xwedê wî tu kes neêşandiye.”*

Piştî bi panzdeh rojan em bi yekî ji birayên Şengul Xanê, Eşref Beg re dipeyivin li Stenbolê. Eşref Beg piştî erdheja Wanê neçar maye ji bo ku kar bike were Stenbolê, çilûpênc salî ye, xerat e. Ew behsa tiştên qewimî dike dema ku cenazeyê birayê xwe anî:

*Polêsan rêya erebeya cenaze birrî, ez li pêş bûm, ‘hûn çima wisa hêdî diçin, bilez biçin’... jixwe dora goristanê hemû girtine, hereketa taybet, polês, esker, holê tam dorpêçek bû. Ji bo ku xelk tevlî nebe, milet tevlî nebe tişta ji destê wan dihat [kirin], ango ew tişta psîkolôjîk dan.*

Behsa piştî kuştina birayê xwe çûna çiyê ya xwîşka xwe û girtina xwîşk û birayên xwe, pismam û dotmamên xwe dike, behsa zehmetiyên dayika wî kişandî dike û bi van, tiştên hatî serê malbatê vedibêje:

*Ya rastî weke malbat ya hatî serê me trawma bû. Her tişt felişî û hûrûmûr bû, di şevekê de. Di şevekê de hûrûmûr bû ango tu tişt nema. Hîna jî em bi ser xwe ve nehatine... Dema mirov behsa tiştên bi serê mirov de hatî dike, mirov dibêje, çawa ev li min qewimîn, çawa min barê wan hilgirt, çawa, ez mirovekî çawa me? ... Ez dibêjim, naxwe, em gelekî xurt bûn... Yên hatin kirin hovîtiyek bûn, yên qewimîn hovîtiyek bûn. Û me tu tişt nekiribû ku ev musteheqê me be... Me guneh kir; hingê tu wê bigirî û cezayê xwe bidî, ango tişta vê ne mirin e.*

Li mala duyem a li Wanê em çûn serdanê em bi Edip Beg re dipeyivin. Sîhûşeş salî ye û li şaredariyê li beşa paqijkirinê dixebite, zewiciye û du zarokên wî hene. Sala 1996’an li nava kolanê li ser bavê Edip Beg datînin û wî dikujin. Bavê Edip Beg demekê cerdevaniyê dike û heta sercerdevan e jî, paşê jî li HADEP’ê dixebite, gelek caran tê binçavkirin û êşkence lê dibe. Edip Beg dibêje, bavê wî ji ber ku apê wî “tevlî nav refên gerîla bûye” hatiye kuştin. Heta îdîa dike ku bi rêya cîraneke xwe ya hemşîre fêr bûye ku li ser bavê wî danîne, bavê wî birîndar bûye, demekê li nexweşxaneyê maye, lê belê dest werdane dermankirina wî û destûr nedane başkirina siheta wî. Zêde naxwaze bipeyive, bersivên kurt dide, weke ku dixwaze hevpeyvîn di cih de bi dawî bibe. Li dawiya hevpeyvînê dibêje, “ji vê ya hatî serê me re zilm dibêjin.”

Dayika Edip Beg, Yildiz Xan jî ji tişta hatî serê wê re dibêje “tofan”, dibêje fermî pêncî salî xuya dike lê di rastiyê de ciwantir e, pênc zarokên wê hene. Dema dibêje mêrê wê “diçû partiyê” weke ku di nava gotinan de bi awayekî nexwes-

tibe bibêje, gotibe. Ew jî weke kurê xwe bêdeng e, bê dil e bipeyive, gelek caran heman tiştê dibêje: “ev bîst sal in hatiye kuştin… Bîst sal di ser re bihurîne, çûye êdî… Yê çûyî êdî çû, bihurî û çû… Bîst sal bihurîn. Kurê min piçûk bû. Kurê min li ber şîr bû [dema bavê wî] hat kuştin… Yê çûyî çû êdî. Dem êdî çû”.

### *Colemêrg: “tu vê binivîse, wisa û wisa”*

Dîtira rojê em digihîjin Colemêrgê. Li mala pêşî êm çûn serdanê em bi Adem Beg re peyivîn. Bîstûheft salî ye, mamosteyê Ziman û Wêjeya Tirkî ye. Ew dibêje, “dema ku ez behsa Wêjeya Dîwanê dikim, mînakan ji wêjeya Kurdî jî didim… Di heman demê de Tirkan çawa wêje afirandibe, weke mînak serhatiyeke destanwarî, çîrokek gotibin, Kurdan jî heman tişt kiriye.” Dema ku behsa Leyla ile Mecnun (Leyla û mecnûn) dike behsa Mem û Zînê jî dike. Bavê wî Çileyê sala 1996’an tê binçavkirin û gelek di ser re naçe cendekê wî dibînin. Beriya wê, bavê wî giliyê serdarê fermana serdegirtina gundê wan dayî kiriye bi daxwaza tesbît û tezmînkirina zerara di encama serdegirtina eskeran a bi ser gundê wan de li wan bûyî. Tevî ku serdar bi şexsê xwe bi caran gefan lê dixwe da ku giliyê kirî betal bike jî, ew ber bi paş ve gavê naavêje. Rojekê, di dema kontrola li ser rê esker wî dikin bin çavan. Piştî bi sîhûçar rojan di nava wesaîta xwe ya şexsî ya bi şerampolê de berdayî bi awayekî bi êşkence kuştî hat dîtin. Ji ber ku Adem Beg hingê neh salî bû hûrguliyên bûyerê nayên bîra wî, lê belê ji bavê wî jê re mîrateyek maye ku dişibe ya ku Ekrem Beg behsa wê kir:

> *Heke mirov kurê kesekî navdar be, divê mirov li gorî wê rabe û rûne. Lewma, weke encam, mirov naxweze navê bavê xwe bilewitîne… Me hewl da layiqî navê bavê xwe bin. Me bi heman rengî qîmet bi mirovan de, xizmeta wan kir. Ya ku ji me hat, bila navê bavê me timî bi qencî were bibîranîn. Em timî ji bo vê xebitîn.*

Dayika Adem Beg, Zuleyha Xan çawa ku dest pê kir, behsa tiştên hatî serê xwe bike, behsa meziyetên mêrê xwe dike: “Belayeke mezin bû. Êşeke mezin bû… Mezinê malbatekê bû. Mirovekî mezin bû. Lîderek bû… Me gundê xwe bi cih hişt. Me malên xwe bi cih hiştin. Me dewleta xwe bi cih hişt. Me gundê xwe, mala xwe, pezê xwe, dewleta xwe hemû bi cih hiştin… Weleh ha holê em wate. Min pir êş kişandin.” Em jê fêm dikin, dema ku dibêje, “me dewleta xwe bi cih hişt” qesda wê erd û axa wê ye. Pêncîûheşt salî ye, heft zarokên wê hene. Bi destê xwe hin deverên rûyê xwe nîşan dide û dibêje: “Min bi çavên serê xwe dît… Welehî çermê wî rakiribûn. Tu vê binivîse, wisa û wisa.”

Roja me ya diduyan li Colemêrgê em bi Gulsima Xan re dipeyivin ku me bi gotinên “Ez silav û rêzên xwe ji çar parçeyên Kurdistanê re dişînim. Ji bo serokê me û gerîlayên me yên li çiyê. Hûn bi xêr hatin. Li ser ser û çavên min” pêşwazî dike. Ji ber ku şahidî kir li kuştina mêrekî bi destê esker û cerdevanan, Çiriya Pêşîn a sala 1995’an birayê wê yê hijdeh salî hatibû binçavkirin, birayê wê ev bîst sal in hatiye wendakirin. Tevî ku îtîraf, şahid, nîşane hatine dîtin ku dibêjin, birayê wê hatiye kuştin jî, dê û bavê wê yê rehmetî bêyî bi aqûbeta kurê xwe zanibin mirine. Gulsima Xan behsê dike ka dayika wê ya kor ji bo ku pirsa kurê xwe bike ji merciyên eskerî û îdarî bi salan ji gund diçû navenda navçê, ji wir diçû navenda bajêr û heta diçû bajarên din û vedigeriya:

> *Ji dayika min re gotine, ‘biçe Çanakkaleyê, kurê te li wir e’. Dayika min ji wan re gotiye ‘ez jineke çav şil im ji rondikan... hûn ji min şerm nekin, lê ji Xwedê şerm bikin... Taqeta min nîne ez biçim Çanakkaleyê. We çi bi serê kurê min kir?’ Weleh dayika min hat, êdî taqeta wê nemabû. Dayika min tu diyar nehiştin, kurê wê çû... Dayika min ji me xwestibû. Me wêneyê birayê xwe xiste ber sînga wê. Me dayika min sipart axê. Ji me re got ‘hûnê kurê min bînin ser gora min’. Got, ‘kurê min wê li cem min be û hûnê axê biavêjin ser min’. Ma gelo ev birîn wê ji dilê me biçe?*

Piştî ku birayê wê hat wendakirin, birayekî Gulsima Xanê tevlî nav refên PKK’ê bûye, di şer de hatiye kuştin, niha jî du keçên wê bi xwe li çiyê ne. Gulsima Xan behsa tiştên hatî serê wê dema li birayê xwe yê hatî wendakirin geriyaye, dike: “Ma çi bi me nedikirin! Em di bin zilm û zorê de bûn. Dijûn li me kirin. Li me xistin. Kaxet şewitandin û ji me re gotin, ‘me kurê we holê şewitand.’ “

Ber bi dawiya sohbetê ve, keça Gulsima Xan a sêzdeh salî Filiz dikeve hundirê odê. Ji me re dibêje, “ji bo parastina mafê her kesî. Mesela ji bo ku zaliman biavêjin hepsê” dema ew mezin bû, ew ê bibe parêzer. Li aliyê din jî dibêje, “mesela dema mamosteyên wisa tên ez naxwazim bixwînim.” Dema ku em dipirsin “mamosteyên çawa?” ew dibêje, “ramekî... Mesela hin mamoste tên. Mesela bi tenê dijûnan dikin... Dibêje, teredîn. Dibêje, korîzan. Mesela mamosteyek hebû. Mamosteyê Tirkî. Ji me re digot, ‘herçî ders e tu tişt nîne. Niha ez we berdim... hûnê keviran biavêjin.’ Heqaretên bi vî rengî dikirin.” Wan destûr nedaye ku dibistana wan bikin qereqol, bi serfirazî behsa vê yêkê dike: “Mesela me pankart nivîsî... Mesela me nivîsî, em tu carî naxwazin heşt salî rastî destavêtinê werin... Me protesto kir. Herî dawî welê dev ji biryara xwe berdan.” Ew rave jî dike ka çima pankarteke wisa nivîsîne jî: “Bi ya min esker bihatana bi giştî îhtîmal bû tiştên bi vî rengî biqewimin. Mirov dikarî vê ji eskeran bipê.” Ew dibêje, wê bihîstiye ku esker tiştên wisa dikin.

Birayê Gulsima Xan, Irfan Beg sîhûheft salî ye, taksiyê diajo, bavê şeş zarokan

e, hîna nû ji girtîgehê derketiye. Dema ku tê zanîn ku kesên di erebeya wî de diçin tevlî nav refên rêxistinê bibin, tê girtin û du sal û nîvan di girtîgehê de dimîne: “Min tu guneh nekir. Ez ajovanê taksiyê bûm. Kî were, li wesaîta min suwar dibe. JITEM jî PKK jî suwar dibe. tu erka min nîne, ez ji hevalekî xwe re bibêjim, ‘ka nasnameya xwe tê biçî ku?’ “ Dibêje, birayê wî yê tevlî nav refên gerîla bûyî kirine bahane û ew girtine, birayê wî yê hatî wendakirin jî carinan weke gerîla û carinan jî weke qaçaxê eskeriyê dihesibînin: “Got, tu birayê gerîlayekî, du gerîlayan î. Nabêje, fail nediyar hatiye kuştin. Dibêje li çiyê ye... Bi ser de jî eskerî me aciz dike, dipirse ka li ku ye. Ma ne we kuşt, wê li ku be?”

Bi darê zorê wendakirin û kuştinên fail nediyar nîşaneya rewşa awarte ya salên 90’î li Kurdistanê dihatin hesibandin, heta bi nîvê salên 2000’î jî kêm jî be dewam kirin.[328] Kurê Ayşe Xanê yê karên avahîsaziyê dikirin, diçû dirûtina giyê, weke “welatparêz” dihat nasîn, yê çilûsê salî û destgirtî, tebaxa sala 2005’an li Colemêrgê kuştî hat dîtin. Ev jî mînakeke dewamkirina me behsa wê kirî ye. Di nûçeyan de kuştina kurê wê weke “terorîstê di şer de kuştî bi dest ketî” tê ragihandin. Ayşe Xan heftê salî ye û dayika heft zarokan e. Ew xwe li ber behskirina kurê xwe nagire, bi destê xwe timî li ser sînga xwe dixe, dike hewar, bêhna xwe berdide, digirî û pê re dibêje. Em dibêjin, em dewam nekin, lê ew israr dike û weke ku di ber xwe de biaxive hin hevokan pircarî dike: “me gustîlk xist tiliya wî”, “çû û nehat”, “Tu kesî tiştek ji bo min nekir” Ew dibêje, ne bi tenê kurê wê yê hatî kuştin, zarokên wê yên din jî gelek caran ketine girtîgehê, tim û daîm bi ser mala wê de hatiye girtin û dixwaze biçe cem kurê xwe: “Yê ku karibe vê êşê ji bîr bike, wê Xwedê jî ji bîr bike... Birîna min kûr e. Birîna min pir kûr e. Birîna min ji dilê min nayê der... Kurê min tu tişt nekiribû. Li partiyê bû. Ma Kurd hemû ne li partiyê bûn?... Kurê min berberê deh kesan bû... Te bizaniya ka kurê min çi tişt kiribûn. Lê êdî fêde nake. Çû.”

Em bi kurekî din ê Ayşe Xanê, Kamil Beg re jî dipeyivin. Kamil Beg bavê çar zarokan e, bi karên elektrîkê mijûl e û çilûpênc salî ye. Ew dibêje, ji ber “hevkarên cihî” yên di kuştina birayê wî de tiliya wan heye, êşên wan qat bi qat zêde dibin:

> *Wê rojê qiyamet û felaketa min bû. Ez wê rojê weke roja mahşerê dibînim... Roja qiyametê bû. Roja xiyanetê bû... Tiştekî wisa hîç nedihat bîra min. Ew roj ji bo min rojeke reş bû. Roja felaketê bû. Roja ku tevahiya komkujiyên dinyayê bi ser me de hatin... Ez hîna jî di wê roje de me.*

---

328 Binihêre li Navenda Heqîqet Edalet Bîrê, Databasea Kesên bi Darê Zorê Wendakirî: http://www.zorlakaybedilenler.org/victims.php [2’yê Çiriya Paşin a 2014’an].

Serdana me ya dawî li Colemêrgê, ya malbateke welatparêz bû ku xizmê wan ê kuştî "milîs" bû. Beriya ku em dest bi behskirina hevpeyvînên bi endamên malbatê re bikin, divê em hinî behsa "milîstiyê" bikin. Di ferhengan de milîs weke "hêza çekdarî ya xelkê ya ku di dema şer de alîkariyê dike bi artêşê re" tê terîfkirin.[329] Mînakeke din a pêkanîna milîstiyê ya li Tirkiyeyê, Kuva-yi Milliye ye ku di dema Şerê Îstîqlalê [yê Tirkiyeyê] de hatiye damezrandin.[330] Milîsên PKK'ê yên li Kurdistanê ne bi tenê desteka çekdarî ya parastinê didan; wan pêdiviyên gerîlayan yên hewîna li bajaran, cilûberg, xwarin, îstîxbaratê jî dabîn dikirin. heta navê "milîsên neçekdar" li wan kesan tê kirin ku pêdiviyên bi vî rengî dabîn dikin, ango yên ku bi tenê desteka lojîstîkî didin.[331] Dibe ku mirov bifikire ku divê mirov milîsan weke sivîl nebîne, weke mirina sivîlan nêzîkî mirina milîsan nebe, ku ne rast e mirov di xebateke bi vî rengî de ku şîdeta dewletê esas digire, cih bide xizmên milîsan. Li aliyê din di rewşekê de ku beşeke girîng a xelkê nasnameya xwe ya welatparêz bi xizmetên milîstiya sivîl temam dikin - jixwe di beşa beriya vê de me behsa vê rewşê kiribû - em rabin milîsên ku di şerekî de nehatine kuştin weke sivîl qebûl nekin, ev bi tenê dikare bibe tercîheke îdeolojîk a ku ev xebat qebûl nake. Jixwe, milîsê çekdar be, heta gerîla bi xwe jî be, divê mirov bibêje, ew kesa/ê ku di şer de nehatibe kuştin, ji mala xwe, yan jî ji kolanê hatibe binçavkirin û piştre cendekê wê/wî hatibe dîtin, bi binpêkirinekê re rûbirû bûye ku tayê binpêkirina mafê jiyanê yê sivîlan e. Heta miameleya xirab a bi cendekê milîs û gerîlayên di şer de kuştî re û nedana malbatan a cendekan jî ji wan binpêkirinan in ku divê behsa wan were kirin. Bi vî awayî aşkere ye ku pêdivî bi lêkolîneke berfereh heye ya ku bi tenê ji hevpeyvînên bi malbatên gerîla re veqetandî be.

Jixwe Sarya Xana ku dema birayê wê yê milîstî dikir hatî kuştin ango Tebaxa sala 1992'yan deh salî bû û dema em oxir kirin gotî "weke ku we birayê min anîbe", weha dipeyive: "Heta niha tişteke weha me nedît... hevpeyvîneke bi vî rengî nehat kirin... Ez ne ji bo xwe dixwazim. Li ser navê dayikan hemûyan dîsa dibêjim... We Xwedê, bila ev hevpeyvîn bi dayikan hemûyan re were kirin. Dilê dayikan hemûyan xweş bikin." Sarya Xan lîse ji derve qedandiye û niha

329 http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&arama=gts&guid=TDK.GTS.5460bf4ade10a0.76643062 [10'ê Çiriya Paşin a 2014'an]

330 "Milet xwe mecbûr kiriye ku ferdên xwe yên ji nava teslîmî artêşê kirine, ku herêmên xwe yên rastî êrîşên dijmin tên, ku jiyana xwîşk û birayên xwe yên rastî êrîşa dijmin tên biparêze. Ha em ji vê re 'Kuvâ-yi Milliye' dibêjin. tevahiya gerdûnê jî wisa dibêje " [şaşî hatine sererastkirin]. binihêre li http://www.atam.gov.tr/dergi/sayi-24/kuva-yi-milliye [6'ê Çiriya Paşin a 2014'an].

331 binihêre li http://www.milliyet.com.tr/kacirma-eylemini-milis-grubu-/siyaset/detay/1805009/default.htm [6'ê Çiriya Paşîn a 2014'an].

tevlî xebatên jinê yên li şaredariyê dibe, dayika şeş zarokan e. Ew roja kuştina birayê xwe weha terîf dike: “rojeke reş bû. Roja komkujiyê bû. Roja rabûna qiyametê bû”. Ew dibêje, ji ber zextan tu kes nehatiye taziyeya wan; tiştên ku me beriya niha di biwara aliyê kolektîf ê şîngirêdanê de gotî, ew bi kurtî di du hevokan de îfade dike: “me bi hev re şîn girêneda. Me nekarî şînê girêdin.” Xwîşkeke Sarya Xanê li çiyê ye. Sarya Xan behsa wê yekê dike ku beriya birayê wê yê mezin were kuştin, gelek caran bi ser mala wan de hatiye girtin, endamên malbatê hatine binçavkirin û dibêje ka çawa birayê wê hatiye kuştin:

> *Dewlet dihat li mala me [li tiştan] digeriya. Zilm dikir li mala me. Rojekê dîsa hatin mala me... Bi pêlavên xwe ketin hundirê me... Paşê dewletê gelek caran bavê min kire bin çavan. Ez jî gelek caran kirim bin çavan... Wekî avêtin ser mala me... Tiştên me şikandin, rijandin... me got, ‘me tiştek nekiriye’. Em gelekî xistin bin çavan... Ji ber bibîranîna birayê min... Gotin, ‘alîkariyê bi PKK’ê re dike... Birîndaran dibe û tîne.’ Gotin ‘dermanan dibe.’ Ji ber vê.*

Ketina nava malan a eskeran bi pêlavên xwe, gelek caran hat îfadekirin, ev hûrguliyek e ku pir caran binê hat xêzkirin. Ji bo serdegirtinên malan mirov dikare bibêje ku ew bi pratîkên piçûkêxîner ên weke van dihatin pêkanîn û meydana şexsî vediguherandin meydana giştî, ew aliyekî taybet ê şîdeta dewletê bû ku encama wê ew bû ku “ciwanên Kurd kolanan veguherînin meydana şexsî”.[332]

Dema birayê Sarya Xan hat kuştin Yusuf Beg du salî bû. Ew niha hiqûqê dixwîne, serdegirtinên malan bi xwe nayên bîra wî. Ji ber ku dayika wî ya ku bi apê wî re zewicî bar kir çû bajarekî din, li cem dapîr û bapîrê xwe mezin bû. ew dibêje, ne elaqedar e bi siyasetê re, lê belê plan dike ku piştî ku bû parêzer şopê bigerîne li dûv bûyerên bi vî rengî. Bi piranî bersivên kurt dide, em nikarin sohbeteke dirêj bikin. Herçî dapîra Yusuf Beg Hevehan Xan û bapîrê wî Mehmet Ihsan Beg in, hem ji ber ku temenê wan û tenduristiya wan destûr nedida, hem jî ji ber ku sohbeta me gelek caran bi girî dihat birrîn, me nekarî bi wan re bipeyivin. Em pê hisiyan ku Mehmet Ihsan Beg piştî em pê re peyivîn bi şeş mehan wefat kir. Hevehan Xanê bi xwe ji me re karîbû van tiştan bibêje li ser taziyeyê:

> *...xelkê rahişt cenaze, bir û sipart axê. Weleh kurê min veşartin. Ew êdî hatibû kuştin. Parçe parçe kiribûn. Evqasik mabû... Şewitandibûn, agir berdabûnê, hindikek mabû. Kurik birin veşartin. Em jî çûn, me li malekê taziyeya xwe danî. Hikûmet dihat, henekê xwe bi me dikir, bi me dikeniya. Bi ser me de dihatin, digotin, ‘ev çi ye, ma dawet e? Me Apoyê we kuşt’*

Tiştên ku Mehmet Ihsan Begê rehmetî karîbû bibêje jî di biwara heman rojê de

332 Darıcı, 2011.

bûn: “Birine tabûrê û bi êşkencê kuştine. Naylon şewitandine û bi ser birînên wî de rijandine. Tevahiya bedena wî şewitandibûn… Jiyana me nema.” Divê ku navê jiyana bîst salan bi vê êşê be “jiyana me nema”. Yên li paş mayî dema ku lê difikirin ka jiyana xwe çawa dewam kirin, çawa li ser piyan man, çawa xwe li roj û şevê ragirtin, bi nifrîn û kerbê, hesteke mezin a îhtîramê hinavên min radipêçe. Ew bi ziwatekî hişk nebûyî, tûjnebûyî behsa êşên xwe, tiştên hatî serê xwe dikin, nifrîn û kerba min terbiye dikin. Bi roj tiştên ez guh didim wan, bi şev xewnên min bi sûret û rewşên nû rûh bi wan were jî, sibehî divê ez rêya xwe dewam bikim; ez ji xwe re dibêjim, “wan jiyana xwe dewam kiriye”. Dîtira rojê, em guh didin serhatiyên ku piştî wan dewam kirina jiyanê qabilê mûcîzeyan e.

### *Şirnex: “ma wê ji dilê me derkeve qey?”*

Davut Beg şeva dawî ya sala 1992’yan ji ber ku kesên çekdar ên hatî kurê wî bibin gule li xelkê malê reşandin, jina xwe, yek jê heşt rojî, yek jê çar salî, yek jê heşt salî û herduyên din jî di bîst saliya xwe de penc zarokên xwe ji dest dane. Ew behsa jiyana xwe ya piştî bûyera ku weke “komkujiyê” bi nav dike, dike: “Ez bi wan re miribûm, bi tenê Xwedê ruhê min nestandibû. Ez jî ev bi salan e bi wan re mirî têm hesêbê… Neçarmana jiyana tevî vê êşê ji mirinê jî zehmettir e.” Ew dibêje bêbextî li kurê wî yên dixwestin bibin hatine kirin, di dema bûyerê [ya ku dixistin stûyê wî] de ew di girtîgehê de bû. Dibêje, dema taziyeyê erkdarê eskerî yê ku fermana komkujiyê dayî “hatiye serdana wan”: “Dema ku me cenaze radikirin… serdarê eskerî hat. Bang li min kir, gef li min xwarin. Weha gef li min xwarin, ‘min zarokên te kuştin, tu gilî bikî ez ê te jî bikujim’.”

Bûka mezin a Davut Beg Hediye Xan jina kesê di serdegirtina malê lê dihat gerîn bû. Sê zarokên wê hene, çil salî ye. Mêrê xwe yên beriya hingê heşt salan di girtîgehê de mayî û sê salan pê re zewicî mayî ji dest dide. Hediye Xan dibêje, yên ku wê şevê hatî xwe weke “heval” dan nasîn, bang li mêrê wê kirin da ku derkeve derve, dema ku malbatê nehişt mêrê wê derkeve jî bi fermana “gulereşandin serbest” re gule li malê hatine reşandin:

> *Ma şev… Ew şev bi ser tu kesî de neyê. Ma şev… Ma ka li ku ye ya ji wê şevê zehmettir? Ka li ku ye ya ji wê şevê tirsnaktir?… Weleh heta niha jî ez û keça xwe li mal in, êvaran sebra mi li hundirû ye. Ez dibêjin, niha kesek di dîwêr re neyê. Hîna jî tirs di dilê me de ye. Hîna qehr di dilê me de ye. Ma wê ji dilê me derkeve?*

Xweziya mimkun bûya bi rengê Hediye Xanê gotî mirov binivîse saw û sehma wê şevê, lewma “belkî zen were kirin ku çîrok e”.[333] Em ya mayî ji texeyula

333 Di helbetsa Ahmed Arif a bi navê sîhûsê gule de rêzek e. Beşa ev rêz tê de wisa ye:

xwendevên re dihêlin û bi tenê çend hevokên wê yên di biwara wê şevê de ragihînin: “Destê min di nav birînên mêrê min de ma... Ka ji min re êşeke ji vê mezintir bibîne. tu tişt di destê me de nema. Ya di destê me de mayî xem û hizna me ye. Êşa me di destê me de maye.” Li aliyê din tiştekî din hebû ku bi qasî kuştina mêrê wê û endamên din ên malbatê ew diêşand û heta ji wê bêhtir xemgîn dikir jî hebû, wê ev yek bi hevokeke pircarî kirî îfade dikir: “Mirov pitika heşt rojî qetl nake.” Ya ku dixwest îfade bike ew diltengî û pêsîrtengî bû ku hewl dida kuştina mezinan watedar bike û di warê siyasî de bike ku werin fêmkirin, lê nedikarî kuştina pitikê ji bilî Kurdbûnê bi tişteke din re elaqedar bike: “Erê [mêrê min] di siyasetê de bû, [tiyê min] di siyasetê de bû. Ma pitika 8 rojî çi bû?... Naxwe ji ber ku ew zarok Kurd bû? Kurd bû, erê, pitika heşt rojî bû. Ma te pê dizanî Kurd e, Tirk e? Ma te pe dizanî ereb e? Pitika heşt rojî.”

Herçî bûka ciwan a Davut Beg, Azize Xan jî dema mêrê xwe ji dest da hîna hijdeh salî bû û ew heşt meh bûn ku zewicîbû; mêrê wê bi xwe xwendekar bû. Dema ku behsa wê yekê dike ka çawa heta bi roja îro hatine, dibêje, wan cendekên mêrê wê û yê yên din li hewşa mala xwe ya bi ser de hatî girtin û heta beriya demeke kurt lê mayî sipartine axê: “Me gelek êş kişand. Va ye, gora me li devê deriyê me ye... Em derdiketin û me didît, tiştekî welê...” Behsa wan dema dike ku demeke dirêj ji ber serê goran ranedibû, bi mêrê xwe û bêhtir jî bi xwesûya xwe re dipeyivî, ji bo xwesûya xwe dibêje, “Pir hez ji min dikir. Pir dixwest ez bibim bûka wê. Ez bûm bûka wê. Em pir bi hev re neman”. Tevî ku ne bi dilê wê ye jî Azize Xanê bi tiyê xwe re dizewicînin; ew dibêje, di destpêkê de ji vê rewşê pir ne razî bû, lê paşê rewş qebûl kiriye: “Ez carinan diçûm cem malbata xwe. Wisa, ji min re digotin, çîk, ‘tiştekî wisa bûye, tiştekî ku li dinyayê dikare were serê her kesî’. Nizanim, va ye, min got qeder e.” Tiştên hatin serê Azize Xanê bêguman ne ji wan tiştan in ku dikarin li dinyayê werin serê her kesî, lê belê malbata wê bi her halî, dema wisa gotiye, li bûyerên weke wê yên li Kurdistanê hiziriye. Mirov dikare bibêje, jinên ciwan ên ku piştî kuştina mêrê xwe bi tiyên xwe re tên zewicandin, cara duyem dibin mexdûr. Li aliyê din, van demên dawiyê êdî zêde neyê dîtin jî, ji bo parastina bûka xwe ya bi ciwanî bî maye, ji nû ve zewicandina wê dibe ku zehmet be, ne mimkun e bi tena serê xwe bimîne û ne xweşik e ku wê bişînin mala bavê wê yan jî bi armanca xwedîderketina li ewateta ji kurê wan mayî, malbata zavê bi awayekî “bi niyeta baş” vê tedbîrê digire. Dîsa jî dema Azize Xan dibêje, vê bûyerê jiyana wê “tert û bela” kir, helbet mafdar e. Belkî jî ji ber vê yekê, nikaribe bi temamî bersiva wê bide jî, heta îro herî zêde xwestiye ku jê were

---

“Kîrîvo, halê min eynî weha binivîse / Dibe ku bibêjin, çîrok e / Ev ne memikên gulî ne /guleya domdomê ye / Di devê min de parçe parçe.”

pirsîn ka “wê çi êş kişandine, çi dîtiye? Çawa heta bi vê deverê hatiye?” Çar zarokên Azize Xanê hene; dibêje, heke zarokên wê bixwazin biçin çiyê “ez ê tiştekî nebêjim”. Mêrê wê şofêrtiyê dike û tevî birayekî xwe yê li Iraqê dixebite, debara tevahiya malê dike.

Mala duyem a li Şirnexê em diçin serdana wê di Çiriya Paşîn a sala 1992’yan de rastî êrîşeke bi topên hawan hatiye, ji malbatê heft kes mirine û heft kes jî birîndar bûne, xaniyê malê bi xwe hingê hilweşiyaye û paşê ji nû ve hatiye avakirin. Ramazan Begê çilûsê salî şeva bûyerê bavê xwe, dayika xwe, xwîşk û birayên xwe, keça xwe û biraziyên xwe ji dest dane; ew ji me re rave dike ka çawa mimkun e topeke hawanê li maleke li navenda navçeyê bikeve: “di gerîna li maf a Kurdan de dewletê ji xwe û me re mirovên sivîl ji êrîşên xwe re kirin hedef. tu sedemên din nînin... Em weke welatî nedidîtin. Heke em weke welatî û insan bidîtana, ev bela wê bi serê me de nehata.” Dîsa mirov nikare bi ser wan gotinan ve bibe ku behsa wê şevê û tiştên piştre qewimî bikin:

> *Êdî, ma ez çawa behsa wê bikim, yên mirî, jixwe mirin, herçî zarokên mayî piçûk bûn. Zext gelek bû. Nexasim ji bo ku em bibêjin, PKK’ê kiriye gelek zor û zext li me dikirin. Ji bo ku em îfadeya xwe bi vî rengî bidin. Hem em dikuştin û hem jî li ser vê mijarê ji bo ku em gilî nekin timî gef li me dixwarin.*

Birayê Ramazan Begê sîhûheft salî Yusuf Beg ji wan kesan e ku wê şevê sax filitî. Yusuf Beg hingê şofêrê taksiyê bû, ew dibêje, hingê wî hewl daye birîndaran bi wesaîta xwe bigihîne nexweşxaneyê, li nexweşxaneyê [ji bo dermankirina wan] mudaxeleyî birîndaran nekirine, birîndarên rakirine bajarên derdorê jî jiyana xwe ji dest dane. Li dawiya sohbetê de em behsa zarokên wî û tesîra qewmînan a ku wê li nifşên nû bibe, dikin: “Min navê birayê xwe yê mezin, bavê xwe, dayika xwe, navê hemûyan hilda, min navên wan hilda. Em behs dikin ji zarok û neviyên xwe re bi destê dewletê. Heta em bimirin em ê bibêjin.”

Herçî Meryem Xan e, ew wê şevê bi giranî birîndar dibe, mêrê xwe û keça xwe ya heft salî ji dest dide. Mehekê li nexweşxaneyê dimîne, çavekî xwe ji dest daye û nikare destê xwe yê çepê bi kar bîne. Dema ku behsa wê şevê dike birînên xwe yên li ser, rû û destê xwe nîşan dide. Ew gotinên Yusuf Begê di biwara miameleya li nexweşxaneyê de erê dike: “Doktoran digot, PKK ye û li min nedinihêrî. Ne birînên min derman dikirin û ne jî li min dinihêrîn.” Demeke dirêj ji Meryem Xana piştî bi mehekê ji nexweşxaneyê hatî malê re nehatiye gotin ku mêrê wê û keça wê mirine:

> *Jixwe min nedizanî mêrê min miriye. Min nedizani keça min miriye... Ez hatim malê, min got, ‘ma [mêrê min] nayê malê?’ Gotin, ‘[mêrê te] çûye Iraqê’. ‘[Mêrê*

*te] çûye Wanê'. [Mêrê te] çûye filan deverê'. Ji min veşartin. Xwediyê miriyan kor in... Min got, 'ka kilîtê bidin min, ez ê cilûbergên mêrê xwe bîhn bikim, min bêriya mêrê xwe kiriye'. Kilît dan min. Min devê deriyê dolabê vekir... dolabeke hemî reş, vala... Min got, '[Mêrê min] miriye û hûn ji min re nabêjin?' ... Hîna jî ez bawer nakim. Ku dengek tê, ez dibêjim, mêrê min e ji Iraqê hatiye.*

Meryem Xan îro çil salî ye, keça wê ya hingê di dergûşe de û bêyî ku birîndar bibe ji êrîşê filitî û kurê wê yê ji serê xwe û pişta xwe birîndar bûyî niha mezin bûne; li aliyekî şikir dike, li aliyê din jî dibêje, "Min tu tişt ji jiyanê fêm nekir... Weleh tu berfa herî baniyên zozanan bînî jî nabe. Tu dizanî, derdê xirabûna mala te zehmet e. Derdê kezebê zehmet e."

Herçi Ahmet Beg e, wî wê şevê bapîr, dapîr, metik, ap û pismam û dotmamên xwe ji dest dane, ew bi xwe jî ji êrîşê birîndar filitiye. Ew tesîra bûyerê li ser malbata xwe rave dike bi nebûna mirovên ji dest dane û bi birînên yên sax filitî:

*Çawa, jiyana me şeht kir. Jixwe nîvî jê çû. Nivê mayî jî jixwe nîv in, kop û seqet in. Li mala me mirovên tam nînin, hemû seqet in. Di bedena yê herî piçûk de deh parçeyên hesin hene. Bêhvila kurê mezin ê metika min ha evqasî bi hundir de çûye. Jixwe kêliya din li vir bû, xweziya te bidîta, lê bawer dikim tiştek nayê bîra wî, parçeyê şarapnelê ye.*

Sala bûyer qewimî çar salî bû, paşê dibistana navîn qedandiye, niha şofêrtiyê dike û behsa kurê xwe yê çar mehî dike: "... em ê bidin xwendin, xwedê bike nesîb. Jixwe em dixwazin ji vê malê parêzerek derkeve. Ew birayê min ê piçûk ê ku min behsa wî ji te re kir, niyeta wî heye, lê heke derkeve. Heke dernekeve, heke Xwedê bike nesîb, ka hela bila ev mezin bibin."

Li wê malê şopeke di biwara wê şevê de, tiştek aîdê kesên wê şevê mirî nebû. Heta li malê telaşeke ji daweta mala cîran dipijiqî jî hebû; kesên em bi wan re peyivîn jî hîna nû ji merasîma dawetê vegeriyabûn. Dîsa jî, ez zen dikim ku dizanim ka çima dema ez ji wê malê vediqetiyam weke ku ji muzexaneyeke qirkirinê vediqetim, min his dikir. Tiştên min guh dayî wan rê vekiribûn li wê yekê ku li aliyekî ez bînim bîra xwe ka dema felaketên bi vî rengî diqewimîn min û xizmên min, me çi dikir, li aliyê din kiribûn ku ez zehmetiyê bikişînim bawer bikim felaketeke bi vî rengî evqasî nêzî me qewimî bû. Weke ku ji bo ku ez karibim ji heqî tiştên tên bîra min û vê zehmetiyê bikim der, min dixwest bibîhîzim ku felaketeke bi vî rengî li welatekî din, di sedsaleke din de qewimîbe. Bi zena min, min dixwest wisa hîs bikim ku neçûme serdana malekê û şahidên felaketekê, lê belê çûme ya muzexaneyekê û hin mirovên ku naxwazin felaketê bidin jibîrkirin. Lê belê li aliyekî mal bi qasî ku nikaribe bibe muzexane zindî

bû, li aiyê din jî şahid weke hebûnên ji mirovên asayî bûn, li ser wan şopên felaketê û rûyên mirovên jidestdayî hebûn. Çawa ku Nichianian jî dibêje, giraniya bêparmana ji wê tiştê ku li hemberî felaketê şîngirêdanê mimkun dike, ango ji wateya mirinê, giraniya her dewam dike ya ji ber nekarîna şîngirêdanê, li ser milên wan e.[334] Bedenên wan ên ji felaketê sax filitî weha xuyabû ku nikarin ruhên wan ên li wê şevê mayî yan jî tevî mirovên jidestdayî çûyî, hilgirin. Weke ku ditirsiyan wê nikaribin bi layiqê wê behsa dehşeta felaketê bikin. Li aliyê din, ji bo ku heqê saxmayînê bidin weke ku xwediyê wê hêzê jî bin xuya dikirin, ew hêza ku dewamkirina jiyanê ji bo mafên kesên jidestdayî yên li dinyayê û têkoşîna siyasî ya ku bû sedema jidestdana wan, û hewldana jiyana di rewşeke baş de dide wan. Belkî jî, ne yek ji van jî bû, niha li mala xwe, dema ku ez hewl didim halê xwe yê dema ez ji wê malê vediqetiyam vebêjim, ez wan û di şexsê wan de şahidên felaketê wisa bi bîr tînim.

### *Mêrdîn: "çi roja me roj e, çi êvara me êvar e bi me"*

Roja piştre em li Mêrdînê ne. Em diçin serdana Erdigan Xana pêncîhûçar salî û dayika heft zarokan; Çiriya Paşîn a sala 1994'an mêrê wê yê dezgeha seyar digerand ji bo ku îfadeya wî bigirin, dibin, ji hingê ve wê tu xeber ji wî wernegirtiye. Wê bi tenê dîtiye ku kesên mêrê wê birine bi kirasê sivîlan û çekdar bûn, wekî din bi tiştekî din nizane: "Ez çûm midûriyeta polêsan jî. Min got, wisa bûye. Min got, sivîl bûn. Sîlehên wan weke yên we bûn. Min got, bêtêlên wan weke yên we bûn. Hin ji wan jî dikeniyan. Tirkiya min nîne." Belkî jî tiştên ku ev bîst sal in ji xwe re dibêje, ji me re jî dibêje: "Em nizanin ka mir, yan sax e, rewşa wî çi ye, çawa ye. Çi roja me roj e, çi êvara me êvar e bi me." Erdigan Xan, li xaniyekî yek odeyî tevî keça xwe ya bîst salî ya li marketekê kasiyer re dimîne.

Em diçin marketa Zindan Xan lê dixebite. Em destûrê ji kardêrê wê dixwazin û pê re diçin kafeyekê. Bavê wê ev nav lê kiriye, lê belê ji ber ku memûrê nifûsê qeyd nekiriye, di nasnameya wê de navê wê cihê ye, ew bi xwe hez ji navê Zindan dike. Wê lîse qedandiye. Weke xwîşkên xwe dema zarok bû diçû Ordu û Rizeyê ji bo ku bindeqan biçine, ew dibêje, li wan deveran ji ber ku Kurd bûn miameleya xirab bi wan re dihat kirin. Ew dibêje, ew siyasetê naşopîne, li ser van mijaran tu tiştî nafikire; "dema ez difikirim, ji xwe diçim". Yekane tişta dixwaze ew e ku "li serê çiyayekî bi tena serê xwe, qet nebe bêyî ku derdek hebe bimîne." Em fêm dikin ku sedema wê yekê ku ew dixwaze lêxe û biçe ne bi tenê zexta dewletê ye, ya xizmên wê ye jî. Çawa ku em nikarin bi dirêjî bi dayika wê re sohbet bikin, wisa jî em nikarin bi Zindan Xanê re jî sohbet bikin.

334 Nichanian, 2014, 23.

Piştre em diçin mala xwîşka mezin a Zindan Xan, Mizgin Xanê. Mizgin Xan bi zaroka xwe ya çaran bi bar e. Tevî mêrê xwe ku wezîfedarê apartmanê ye û zarokên xwe li vê sîteya nû avakirî dimîne, li gorî qeydiyên nifûsê sîhûdu salî ye. Piştî ku bavê wê hat wendakirin neçar maye dev ji dibistanê berde û heta ku zewiciye jî kar kiriye: "Li nava odeyekê, heta ku ez zewicîm, em hemû di nava wê odeyê de man… Me, carinan taştê hebû, îsotên tirşî û çay bi hev re dixwar… Şeş salan em çûn bindeqan. Piştî bindeqan ez li malekê xebitîm. Ji neçarî. Di encamê de mêrekî mezin nîne, bav nîne." Ew bi bîr dixe ku nebûna bav û wefata bav ne yek tişt in:

*Yek ji min re dibêje 'bavê te yê rehmetî'. Ez nizanim ka rehmetî ye yan na? Ez yasînekê dixwînim, lê dil nakim ku li ser bavê xwe bixwînim. Ka miriye, yan nemiriye?… Çavê min li rêya bavê min e… Va ye, keça min bû yanzdeh salî. Carinan dibêje 'bavo' ez dilê xwe dibijînim keça xwe.*

Ewa ku Mizgin Xanê got, "ez dilê xwe dibijînim keça xwe" di rê de ji bîra min naçe. Ez difikirim, ha ev heqîqetek e; mirov nikare pê re bike der, telafî bike, bi tenê dikare qebûl bike û belkî jî yek ji wan heqîqetan e ku di biwara wan êşan de ye ku mirov dikare bi wan bihise.

Mala em hatinê, ji mala em jê veqetiyayî bi gelekî guhertiye. Dewlemend, mezin û qelebalix. Xwediyê malê Abdulselam Beg e. Ew pêşî rave dike ka kurê wî yê xwendekarê zanîngehê Çileya 1992'yan li nava kolanê hatî kuştin, çima hedef hat girtin: "[Kurê min] xwendekarekî welatparêz ê Kurd bû. Ez bawer dikim ew jî tevlî faaliyetên siyasî yên çalak bûye, ji ber wê şehîd bû." Helbet merasîmên cenaze yên welatparêzan jî bi serê xwe vediguherin faaliyeteke siyasî:

*Taziyeya me gelekî qelebalix bû… Sibehî zû me cenaze bi awayekî girseyî bir goristanê. Me cenaze veşart. Li wir bûyer qewimî. Helîkopteran gule li xelkê reşandin. Ji her aliyî ve gule li xelkê reşandin. Ez li goristanê ji ser hişê xwe çûm. Ez anîm malê. Polêsan bi ser malê de girt. Li ser biraziyekî min sîleh hebû. Ez jî birim. 5-6 rojan em di bin çavan de man. Gelek êşkence li me kirin… Piştî şehîdbûna wî dewletê em kirin hedef.*

Hevsera Abdulselam Beg, Şukriye Xan dibêje ku emrê wê di ser pêncîh salan re ye, heşt zarokên wê hene. Hevpeyvîn gelek caran qut dibû bi girî û bi bêdengiyê, ha di wê hevpeyvînê de wê tiştek pircarî dikir: "Kurê min gelekî bi qîmet bû." Qelebalixbûna merasîma cenaze diyar e ew hinekî aş kiribû û pê re alîkar bûye ku karibe hinekî şînê girêbide. Ew dibêje: "Dinya hat cem me. Kurê min pir bi qîmet bû. Her kesî gelekî hez jê dikir… Me digot qey, li dinyayê em hemû mirine. Dema kurê min hatibû kuştin dinya sekinîbû." Timî li da-

yikên mirovên ku weke kurê wê ciwan mirî difikire û dipeyive: “Mirov jî weke min in. Kezeba wan dişewite. Ew jî weke min in. Dinya xweş be, xweş e, ma ne werê ye? ... Weled pir zehmet e. Nayê dîtin. Weled pir zehmet e.”

Yasemin Xan jî weke dayika xwe timî dîsa dibêje ka birayê wê yê mezin mirovekî çi qasî bi qîmet bû û behsa bibîranînên xwe dike yên ku nîşan didin ka wê çi qasî hez ji wî dikir. Ew dayika du zarokan e, çil salî ye. Kurê xwe dişibîne birayê xwe yê hatiye kuştin: “Kurê min jî gelekî biaqil e, efendî ye, zarokeke pir serketî ye. Ez ji xwe re li gorî xwe dibêjim, belkî şûna birayê min bigire. Li ber çavên min wisa ye. Û heke tu gelekî hez ji kesekî bikî tu wî ji dest didî. Ew tirs jî her bi min re heye. Careke din ez nikarim heman tiştî di ser xwe re bibihurînim.” Di hişê min de ez ji xwe re dibêjim, heke dema Yasemin Xan bêdeng dibe, ez dikarim bêdeng bim, hingê dema ew digirî, ez dikarim bigirîm jî, yan jî ez di nava xwe de dibêjim, va ye, weke ku bibêje “êdî tu sedem nîne ji bo ku tu negirî, xwe bigirî” dinihêre. Belkî jî hênceta min ev e. Dema ku dibêje, ew bi rengê dizane, têkoşina birayê xwe dewam dike, ruh bi awirên wê ve tê; û di dawiyê de wê hevokê dibêje ku hevpeyvîna me watedar kir û belkî jî hewl dida min aş bike:

> *... ez jî natirsim yanî ji ber birayê xwe. Dibe ku min tiştekî weha nekira lê belê ji bo ku ne bêrêzî be ji bîranîna wî re, li gorî xwe ez wilo difikirim. Wilo, hinek, dema bipeyivin yan jî heqaretê bikin, ez nerazîbûna xwe nîşan didim... tu bixwazî jî nexwazî jî malbatek girêdayî hev e. Tu hez dikî, ileh mirov wê li ser wê rêyê be... Niha tu mirovekî elaqedarî mijarê yî, tu hatî mala min. Cihê te li ser serê min heye. Ez ê bifikirim ku qet nebe ew li cihê xwe rehet dike.*

### *Batman: “şûna piyê wî li wir bû”*

Li Batmanê, em pêşî diçin mala Mehdi Begê ku bavê wî yê di birêveberiya HADEP’ê de dixebitî, mela û dikandar bû, Çileyê sala 1995’an di nava minîbusê de di encama gulereşandinê de hat kuştin. Dema ku bavê wî hat kuştin Mehdi Beg eskerî dikir. Ew dibêje, beriya ku bave wî were kuştin bi ser mala wan de dihat girtin, carekê li xwîşka wî ya şanzdeh salî xistine, ew û xwîşk û birayên wî hatine binçavkirin. Piştî kuştina bavê wî tevahiya endamên malbatê yên ku dikarin kar bikin, dev ji dibistanê berdidin û bar dikin Stenbolê; Mehdi Beg dibêje, “ango bi rengekî derfeta jiyanê li vê deverê nedan me.” Ew bi xwe sala 2000’î vedigere Batmanê, niha çil salî ye, li şaredariyê kar dike, du keçên wî hene. Dema ku behsa tesîra kuştina bavê xwe li ser xwe û malbatê dike, eynî weke Ekrem Beg û Nihat Beg behsa mîrateya ku bavê wî ji wan re hiştî dike:

> *Ê, helbet hingê jî ez birayê mezin im, heta ku ji me hat em [li cihê lê] têkoşiyan,*

*me ji cihê hiştî dewam kir. Em hîna jî dewam dikin... Herhal em ê timî bi baweriya wî ya hiqûqê, lewma ew di heman demê de mela jî bû, perspektîfên rêveker hebûn ên ku wî ji me re hiştin. Ango, qet nebe di wê yekê de ku malbateke wisa mezin, malbateke qelebalix nekeve rêyeke xirab, para wî gelek bû. Ez gelekî ji wî bawer dikim. Gelek tiştên mezin ji me re hiştin. Tevî ku heta roja îro sax nema jî.*

Ew zehmetiya bê bav manê jî timî îfade dike, lê belê herî zêde jî awayê kuştina bavê wî bi zehmet e ku qebûl bike: "Dibêjin yê çekdar be, bi îihtîmalek e mezin bi sîlehê tê kuştin... heke tu endamê rêxistineke çekdar bî, di nava rêxistinê de bî, yan tu wê bi sîlehê werî kuştin yan jî tu wê bi sîlehê bikujî. Lê belê, heke niha tu sivîl bî, sîleh li ser te nebe, rê û rêbaza te diyar e, [cihê] tu lê radizî, lê dimînî diyar e. Kuştina wî [bê pirs û bê dadgeh], ez nikarim vê qebûl bikim."

Li qatê jêr ê mala ku Mehdi Bey lê dimîne dayika wî Bedriye Xan dimîne. Dayika yanzdeh zarokan e û şêst salî ye. Li pey hev behsa roja kuştina mêrê xwe, taziyeyê û piştî wê dike:

*"saetek dima ji çûna ava ya rojê re, ew dihat. Beriya ku reş bikeve erdê dihat malê. Ez diçim û têm, dibêjim, çima nehatiye, diçim û têm... Ewqasî gelekî mirov dikuştin ku ez ditirsiyam... Dema ku em pêhisiyan her kes li minîbus û erebeyan suwar bû, çû. Em çûn, li cem dewletê bû, nîşanî me nedan... Bû sibe, em çûn. Li wir şûştin, dan me. Me bir goristanê... Me veşart û em hatin malê... Ji malê heta bi goristanê gelek mirov hebûn. Ji polês, mirov jî bêhtir bûn. Dihatin li mirovan dinihêrîn. Ka mirov çi dikin, kî digirî... li me dinihêrîn, digotin 'de ka binihêre hela', bi me dikeniyan... Erebeyên polêsan ji goristanê heta bi malê li herdu aliyên rê jî bûbûn rêz... Me jiyaneke pir ne baş dît. Me êşeke gelekî mezin dît.*

Keçeke Bedriye Xanê jî li nêzîk dimîne, em dişînin pey "ka gelo dixwaze bi me re bipeyive", piştî ne bi gelekî Sabiha Xan tê. Dema ku bavê wê hatî kuştin, ew deh salî bû. Ew jî ji wan kesan e ku ji bo kar diçin Stenbolê; dema ku di "tekstîlê" de dest bi kar dike çardeh salî bûye. Weke birayê xwe, ew jî dibêje, ji ber ku ew li ser rêya bavê xwe meşiyane, nexasim jî li Stenbolê ew saxlem û li ser piyan wate: "Em jî heke zarokên wî ne, divê em nirxê wî hilgirin. Ev fikr timî hebû, hîna jî heye. Heke bi rastî ew fikr bi me re nebûya, dibe ku em îro bi deverên din de biçûyana." Dema ku dibêje, "bi deverên din de" qesda wê dîsa bi gotinên wê "derûdorên xirab" in. Li aliyê din behsa tesîra mezin bûna bê bav dike li ser xwe û li ser xwîşkên xwe yên din:

*Çûna bavê min gelekî, erê gelekî tesîr li me kir... Hebûna wî pir guhertî bû... Mirovek bû ku bi rastî jî qîmet bi jinê dida... Timî, erê timî ev tişt digot, ez hîç ji bîr nakim, keçên min wê bixwînin. Wê bigihîjin wê kapasîteyê ku xwe biparêzin. Ew ê, tiştekî wilo bibe ku divê ew xwe nedin tepisandin.*

Sabiha Xanê xwestiye biçe çiyê, yan jî weke hin xwîşk û birayên xwe bi rengekî çalaktir tevlî nav siyasetê bibe jî, piştî ku zewiciye neçar maye vegere Batmanê û li herdu zarokên xwe binihêre. Salên destpêkê yên zewaca wê zehmet derbas bûne, lê bi saya serê bavê xwe, ew dem li dûv xwe hiştiye:

*Min zewac bi tu şiklî nikarîbû qebûl bikim. Kevanîtiya malê yan jî bi tu awayî min nedikarî xwe rehet his bikim. Tiştekî wijdanî hebû... Min bavê xwe di xewna xwe de dît. Ji min re ev got: 'ji te, keça min baş li hev bikin... Mirov hemberê qenciyê dibîne. Girêdana xwe, peywendiya xwe bi xwîşk û birayên xwe re tu carî qut neke, lê xwe jî nede tepisandin.' Min xewneke bi vî rengî dît... Ew xewn têra xwe baş bû ji bo min.*

Li mala duyem a li Batmanê em çûn serdana wê em bi Raziye Xana dayika duwanzdeh zarokan û heftê salî re dipeyivin. Kurê wê ku li avahîsaziyan qalib girêdidan Tîrmeha sala 1993'yan êvarekê ji malê derdikeve û careke din tu xeber jê nayê. Kesên ku dibînin kesên sivîl wî li wesaîtekê suwar dikin xeberê didin malbatê. Dema ku diçin midûriyeta polêsan, fêr dibin ku kurê wan hatiye binçavkirin. Raziye Xan dibêje çardeh rojan xwarin jê re biriye û roja panzdehan polêsên ku gotine kurê wê ne li wir e, ranehiştiye xwarina wî:

Roja min a 15'an qediya. Ez çûm min dît ku cil û bergên wî danîne ser maseyê... Ji min re gotin, evên li ser maseyê cilûbergên [kurê te] ne. Xwarina roja çardehan jî li ser wir bû. Xwarina roja panzdehan jî di destê min de ma. Gotin, ne li vir e. Fera çavê min nema. Min hew bi xwe zanî... Dema ku wenda bû li ser rêya pê de çû şûnpêya wî... Şûna piyê wî li wir bû. Min xwest rahêjim wê axa dewsa piyê wî li ser çêbûyî û bixwim. Êşa wî bi min ewqasî giran bû. Zarokên min ji bêv sêwî neman, lê ji birayê xwe sêwî man... Ji xwîşk û birayên xwe re birayekî baş bû

*Kurekî Raziye Xanê jî li derveyî welêt dimîne û ji ber taqîba siyasî nikare vegere Tirkiyeyê, weke ku dixwaze piştrast bike ku neheqî li kurê wê yê hatî wendakirin hatiye kirin, weke hemû dayikên ku hewl didin mirina zarokên xwe watedar bikin, hewl dide yekanebûna kurê xwe vebêje:*

Wî eskerî kir ji dewletê re. Nezewicî, nekarî maleke xwe çêke. Heta ez sax bim, hestûyê min jî bihelin heta bi mirinê... Di mirinê de jî heta ku zimanê min bigere, ez ê bibêjim, wêneyê wî deynin ser gora min, bila li ber çavên min be.

Li nav hemû zarokên min, êşa wî ji ya hemûyan girantir e, bêhtir e. Kurekî qenc bû. Kurekî ji dil û birra bû.

Çawa ku di xebatekê ji kesên bi darê zorê wendakirî re veqetandî de tê gotin, xizmên wendakiriyan ji bo ku li xizmên xwe bigerin miraceetî rayedarên eskerî û îdarî dikin, ji ber ku ev kes timî "bi heman klîşeyan" û "bi xemsariyeke mirovan qehr dike" dipeyivin ji wan zivêr dibin, diqeherin, di heman demê de "di nava vê xeleka mirin û xemsariyê hemûyî de ji bo ku behsa yekanebûna wendakiriyên xwe bikin her diperpitin."[335]

Kurê mezin ê Raziye Xanê, Nizamettin Beg jî hewl dide fêm bike û vebêje ka birayê wî yê ku em fêr bûn endamê HEP'ê bû ji bo çi hatiye wendakirin: "Ez bawer dikim birayê min belavok belav kirine. Wisa gotin. Ji ber wê hat binçavkirin. Ji ber wê birin, kuştin." Dema ku tiştên paşê bi serê wan de hatin vedibêje, ji bilî zexta dewletê, derdekî ku vê zextê bi awayekî neyekser rê li ber vekirî, lê belê di heman radeyê de giran û heta belkî girantir jî îfade dike:

> *Piştî ku birayê min hat wendakirin xizm û cîranên me xwe ji me dûr kirin. Polês gelek caran hatin û dest pê kirin gef li me xwarin. Gef li me xwarin da ku em li birayê min negerin. Timî çavdêriya me kirin. Vê jî kir ku xizm û cîranên me xwe ji me dûr bikin. Hem zext û tirseke mezin bi ser me de hat û hem jî tenêtiyeke zehmet e mirov jê bawer bike. Demeke dirêj em neçar hatin hiştin ku bi vî rengî bijîn.*

Berêvarkî, beriya ku em ji Batmanê veqetin, em ji bo serdana xwe ya dawî diçin mala Idris Begê ku li şaredariye kar dike û sê zarokên wî hene. Bavê wî yê bazirgan û cotkar di heman demê de di HEP'ê de birêveber e; Çiriya Paşîn a sala 1991'ê li ber mala wan tê kuştin. Dayika wî jî şahida wê rojê ye, lê naxwaze bipeyive. Idris Beg dema ku bavê wî tê kuştin çardeh salî ye, ew dibêje, wî kesên bavê wî kuştine dîtine, cilûbergên li wan û pêlavên di piyên wan de tên bîra wî, û îro derkevin pêşberî wî, ew ê wan nas bike. Cilûberg û pêlavên Idris Beg terîf dike li cilûbergên hingê milîtanên PKK'ê li xwe dikirin tê, lê belê Idris Beg îdîa dike ku JITEM û Hizbullahê bi hev re ev mêrkujî pêk aniye. Gelek bûyer hene ku li gorî beyanên îtîrafkaran aşkere bûne ku "bi cilûbergên PKK'ê" mirov kuştine yan jî wenda kirine di rastiyê de endamên kontragerîla yên ser bi hêzên fermî yên dewletê yên ewlekariyê ne.[336] Ji ber ku kurê herî mezin ê malê ye, piştî kuştina bavê xwe, ji bo ku alîkariyê bike li debara neh xwîşk û birayên xwe û dayika xwe ya ducanî dest pê dike, li avahîsaziyan kar dike, li

335 Goral, Işık û Kaya, 2013, 71.

336 Ji bo mînakekê binihêre li Avşar, 2013, 174,

aliyê din jî lîseyê diqedîne. Dema ku dibin eskeriyê jî tevahiya malbatê ji bo ku kar bike koçberî Stenbolê dibe. Ew dibêje, wî pêşî li birayekî xwe girtiye ku dixwest biçe çiyê bi hênceta "qet nebe bila di nav me de mirovên zane jî hebin" asteng kiriye û şandiye zanîngehê. Beriya bi deh salan vegeriyaye Batmanê, hin xwîşk û birayên wî hîna li Stenbolê ne. Deh rojan paşê em bi yekê ji wan re li Stenbolê dipeyivin.

Nurcan Xan bîstûheşt salî ye, kurekî wê heye. Dema em pê re peyivîn bi kurê xwe yê duyem bi halekî bû. Dibistana destpêkê qedandiye, panzdeh salî hatiye Stenbolê û heta ku zewiciye di tekstîlê de kar kiriye. Di cih de behsa zehmetiya mezinbûna bê bav dike: "Bavê min gelekî bi me re elaqedar dibû. Bi rastî jî nebûna bêv... birayê min hîna ji dayik jî nebûbû. ka ez wêneyekî me nîşanî te bidim. Ka tu êş û azara dayika min kişandî bibînî, her zarokek... Wê roja hanê min ev wêne dît. Binihêre, zarokên piçûçik..." Weke jinên din ên ciwan ên bê bav mezinbûyî Nurcan Xan jî gelek caran xemgîniya xwe îfade dike ji ber ku piştî jidestdana bavê wan malbata wê li çar aliyê dinyayê ji hev belav dibe: "yanzdeh zarok sêwî mezin bûn. Her yek bi aliyekî de çû. Ne tiştekî hêsan e... Heke bavê min hebûya... ango kesê hatî serê wî bi vê dizane." Kurê wê yê sal û nîvî, destûrê nade ku em dûv dirêj bipeyivin, lê belê di wan deman de ku firsend çê dibe kurê wê ne li wir be, hingê jî bi piranî bêdengiyê û bersivên kurt tercîh dike Nurcan Xan: "Bi ya min agir berdan mala me. Tiştekî din jî... Em ji hev parçe parçe kirin."

### *Diyarbekir: "serketin jiyan bû"*

Em hevpeyvîna xwe ya pêşî li Diyarbekirê, li avahiya komeleyekê bi Mehmet Begê pêncîhûneh salî, bavê neh zarokan re dikin. Birayê Mehmet Begê li firinekê dixebitî, Nîsana sala 1994'an li kolanê rastî êrîşa çekdarî tê û tê kuştin. Ew bi xwe, bi gotinên xwe ji ber "Kürdistan İşçi Partisi [Partiya Karkerên Kurdistanê]" sala 1982'yan hatiye girtin û du salan di girtîgeha Diyarbekirê de maye. Ew dibêje zor li wî hat kirin ku bibe îtîrafkar, birayê wî beriya hingê hatibû binçavkirin jî bi ranavtina wî qebûl nekiriye bibe îxbarker û ji ber wê jî hatiye kuştin:

> *Birayê min ji ber min hat kuştin. Min destûr neda ku dewlet birayê min bi kar bîne... Dilê hevsera wî qul bû... Birayê min nexweş bû... Doktoran tu çare nedîtin... Jê re gotine 'em ê filan û bêvan xizmetê ji te re bikin'. Min got, 'birayê'm wê te bi kar bînin'... Di lêpirsînê de dema ku pirsa yekê/î ji te dikin, tu dibêjî ez nas nakim, ji te re dibêjin, 'tu bibêje ez nas dikim, soz, namûs, em ê te berdin' ... Min ji birayê xwe re got, 'dev ji vî karî berde'... Wan hingê ew di*

*nava nikilan de tengav kir. Sûd wergirtin ji nexweşiya wî. Ji nexweşiya hevsera wî sûd wergirtin. Ji xizaniya wî sûd wergirtin, Xwestin wî bixin nav xwe.*

Mehmet Beg dibêje, piştî ku birayê xwe sipart axê çar rojan di bin çavan de maye û behsa tiştên li goristanê qewimî dike: "li derdora goristanê 200-300 endamên hereketa taybet... ew min nas dikin. Ev keça wî li goristanê ye. Gor hatibû kolan. Nas û dostan amade kiribû. Dema bavê wê xistin gorê, keçê jî xwe avêt gorê. Dinya min hilweşiya. Min rahişt keçê himbêz kir. Keça wî hingê piçûk bû."

Keça ku Mehmet Beg behsa wê dike Ferya Xan e. Bi wê re jî em li heman komeleyê dipeyivin. Ji ber ku hingê şeş salî ye, ew roj tam nayê bîra wê, lê belê tiştên piştî kuştina bavê xwe qewimî bi dirêjî vedibêje:

*Piştî bavê min dayika min jî rehmet kir. Sala 1995'an... hingê dewletê em birin stargehê, ji ber ku dê û bav nîne. Ji ber ku derba herî mezin dewletê li me xistibû... malbatê nexwest... Metika min, xalê min û apê min hebûn... Ez û birayê min ê mezin jî wan em birin cem xwe. Xwîşkeke min a ji min piçûktir heye, metikeke min a mezin heye wê ew û birayê min mezin kirin... Birayê in ê mezin bi xwe çîk bû, piştî dê û bavê min Xwedê dizane ew psîkolojîk... Nikarîbûn wî zeft bikin. Kete kolanan... Va ye, herî dawî hevalên wî narkotîk danê. Va ye, me du salan tu xeber jê wernegirtin. Piştre xebera wî gihişt me, li Stenbolê, Bakirkoyê... Ji wir paşê hat Diyarbekirê... Herî dawî beriya bi du salan me ew di mala xweytîkirinê de bi cih kir.*

Ferya Xan niha ji derve ve dibsitana navîn dixwîne û li kreşa şaredariyê dixebite, alîkariya xwîşka xwe ya li zanîgehê dixwîne, dike. Eynî weke Nurcan Xan û Mukaddes Xanê, Ferya Xan jî ji bilî bavê xwe bi hesreta xwîşk û birayên xwe ye:

*Her yek ji me li deverekê dimîne. Temam, em çi qasî bimînin, bi ser hev de biçin û bên jî, me rewşeke malbatê nedît. Bi xwîşk û birayên min re weke adetê, yaw ji bo omletekê em bi hev jî neçûne... Dîsa jî tevî ku em ne bi hev re wate jî, ew qutbûn nîne di navbera me de. Neynûka yekî ji me li kevirekî bikeve canê yê din diêşe. Heta bi wê radeyê ye, lê dîsa jî, ez çi dizanim, hesteke cihê ya wê tiştê jî heye ku mirov ji bo lîstokekê bi hev biçe... Dema ku min zarokek didît ku bi dê û bavê xwe re dilîze, mesela wexta ez zarok bûm... dema ku di ber min re dibihurîn û diçûn dil ji min diçû...Yekane xewna min ew e ku rojekê em hemû karibin li ser lingên xwe bisekinin, di malekê de ku ya me ye, bimînin... Ew tiştek e ku mirov nikare rave bike, xwîşk û biratî. Nizanim, ji ber ku çîka dê û bav me zêde nedît, hesta xwîşk û biratiyê ji bo min tiştekî gelekî cihê ye... Mesela [xwîşk yan jî birayê min] telefonî min bike, tiştekî ji*

*min bixwaze, ji kêfan perr bi min ve tên. Ma ne ez xwîşka mezin im û ji bo ez pêdiviyeke wê/wî dabîn bikim li min [dipirse]. Ma ne pêdiviya wê/wî heye, doza alîkariyê dike. Dema ez vê dikim hem di warê watewî de hem weke xwîşk, çi dizanim, ez xwe gelekî baş his dikim.*

Dema Ferya Xan behsa xwîşk û birayên xwe dike hinavên wê direelin, dengê wê jî. Zehmet dibe em ji hev veqetin. Em ji cem Ferya Xanê diçin da ku bi xwîşk û birayekî re bipeyivin, ev yek jî bivênevê bi min weke tesadufeke xembar xuya dike.

Em diçin serdana xwîşk û birayekî ku bavê wan ê ku wezîfeya wî ya fermî îmamtî bû, ji mezinên eşîra xwe dihat hesêbê, Tebaxa sala 1992'yan di çilûdu saliya xwe de li nava kolaneke nêzî mala xwe rastî êrîşa çekdarî hat û hat kuştin. Mehmet Beg niha çilûsê salî ye, zewiciye, zarokeke wî heye, li şîrketa xwe dixebite, ew dibêje, apekî wî gerîla bû, apekî din jî birêveberê HEP'ê bû, û herçî bavê wî bû, xwe jê venedida ku cenazeyên gerîlayan ên dihatin bajêr bişo û weha dipeyive:

*Miftîtî ji bavê min re vê dibêje, ... 'Tu wê xutbê bixwînî ji bo alîkariya ji bo Bosna-Hersekê. Û alîkariyê berhev bikî'. Eynî di wê demê de, 18'ê Tebaxa 1992'yan komkujiya Şirnexê pêk hat. Bave min jî berê xwe dide miftî û jê re dibêje, 'Ez ê xutbê nexwînim. Dema ku agir di hundirê mala min de hebe, beriya ku ez agirê nava mala xwe vemirînim, ez ê vê xutbê nexwînim'... Ez behsa rojekê beriya ku were kuştin dikim.*

Bi çavên ku bi rondikan şil dibin behs dike ka çawa bedena bê rûh a bavê xwe li nava kolanê himbêz kiriye û paşê dewam dike:

*Dema ku me cenaze ji nexweşxaneyê derxist, çûnûhatina wesaîtan xitimî... Li aliyekî girse, îmam, mele hene, parlemanter hene... Li aliyê din dewlet dixwaze dest werde... Çawa me cenaze gihand Deriyê Mêrdînê destwerdanê dest pê kir... Ne kal û pîr hiştin, ser û çavên mirovan şikandin. Di merasîma cenaze ya bavê min de qederê dused û heştê kesî kirin bin çavan... Apê min, dapîra min kirin bin çavan... Bahane jî hûn milet sor dikin. Hûn girseyê li vir didin hev... Hûn ê biçin şîna xwe li gund girêdin. Ma tu dikarî lê bifikirî... Destûrê nadin tu bigirî. Dibêje, heke tu wê bigirî, tu wê li devera min diyarkirî bigirî. Heke tu wê bikenî jî li devera min diyarkirî tu wê bikenî.*

Mehmet beg dibêje, wan dîsa jî taziyeya xwe li malê daniye, vê carê jî bela xwe li kesên hatî taziyeyê dane. Dema sedema mêrkujiyê siyasî be, şîngirêdan bi xwe jî vediguhere têkoşîneke siyasî. "Bê îstîsna her kesa/ê hatî û çûyî ji ziyaretvanên me, ew tacîz kirin... Ji te re, di bin navê 'sexîkirinê' de, di bin

navê pirsa 'nasnameyê' de gelekî tacîz kirin... Piştre di ser [kuştina] bavê min re hîna bîstûçar roj nebihurîbûn li ser kurê metika min danîn bi sîlehê. Bi yek guleyê." Mehmet Begê ku bi xwe jî demeke dirêj di girtîgehê de mayî behsa kêmmana bavê xwe ya hîç lêneçûyî dike:

*Hîna jî, binihêre emrê min çilûsê ye, çavên min li bavê min digerin. tu tişt nebe jî bila kesek hebe ku ez roja cejnê destê wî maç bikim. Li cem me Kurdan stûna malê, tu heta bibêjî bes çîk be, heta tu bibêjî bes, ma ne dibêjin, bibe zilam, lê hebûna stûnekê li pişta te tiştekî cuda ye. Tiştekî cihê ye. Carinan hêrsa min radibe.*

Neh xwîşk û birayên Mehmet Beg hebûn. Piçûka xwîşk û birayan Fatma Xana bîstûçar salî ye, hîna nû zanîngeh qedandiye. Vegeriyaye Diyarbekirê, xwe ji ezmûnên memûrtiyê re amade dike. Dema ku bavê wê hatî kuştin hîna sê salî bû û sal nayên bîra wê, ya rastî demeke dirêj firsend çênebûye bîne bîra xwe û paşê jî nexwestiye lê bifikire li gorî gotina wê:

*Ez jî bêhtir, ango ez gihiştim vî emrî, lê belê hîna jî ez hewl didim zêde bi ser de neçim. Lewma hingê jixwe zêde îhtîmam pê nedan ku ev hatiye serê me... Ji wir em reviyan devera din. Hin tişt qewimîn û me nekarî bi êşa xwe bijîn. Li cem me timî wisa heyecanek hebû em pê jiyan. Ango em wisa timî bi tirsekê jiyan. Ango, em dikarin ên mayî çawa xilas bikin... Jiyan, bi rastî jî, ma ne em jê re dibêjin jiyan... Serketin jiyan bû. Ji ber wê jî ez wisa bibêjim, ez ya rastî zêde bi ser de neçûm, ango ez lê jî nefikirîm. Min hewl da lê nefikirim. Beriya bi çend salan min xwest li ser wisa biponijim. Lê belê gelek tesîr li min dikir... ango di navbera min û jiyanê de qutbûneke cidî çêdibû... Wisa ji dûrtir, ango min tercîh kir ez li xwe ji dûr ve binihêrim. Ango, li wê eza xwe, ez ji dûr ve dinihêrim.*

Di demeke dirêj de ku bi bêdengî û girî qut dibe behsa van tiştan dike. Dîsa gelek caran radiweste û behsa wê yekê dike ku dema ji wir direviyan devera din dîsa timî pêrgî heman tiştî dibûn:

*Demekê em li mala apê min wan diman. Avêtin ser malê... Ji min navê bavê min pirsî bû. Min got, min ji bîr kir. Hingê jî ez hîna heft salî filan im. Min ji bîr kir. Bi navê bavê xwe nizanim... Helbet min ji bîr nekiribû. Ji ber ku min ji xwe re got, wê di bin vê de jî tiştek bide der, dîsa wê zerarê li me bikin, min ji bîr kir. Got, 'tu çawa bi navê bavê xwe nizanî' û yek li bin guhê zaroka piçûk xist û ha wisa ez hejandim û hildam. Ez derxistim derveyî malê... Şeveke reştarî bû.*

Dema ku behsa tesîra wê şevê dike, di heman demê de dibêje, ka çawa hewl daye bi van tiştan hemûyan re bike der jî:

*Min digot, çîk, 'em malbateke çawa ne holê?Ya rastî miletekî çawa ne?Em timî êşê heq dikin? Ma divê em timî êşê bikişînin?' Ango, ma ne ez dibêjim, sedema wê yekê ku mirov dixwaze ser hin tiştan bigire, ev e. Weke ku, ji bo ku mirov karibe azadtir bifikire diviyabû berê awirê xwe biguhere... Welê ne bi awirê psîkolojiya bindestan... Ji bo ku mirov xurttir li ser xwe bisekine... Ew jî [ew şev jî] yek ji wan bû.*

Fatma Xan belkî jî behsa hûrguliyeke ku dike evqasî xurt be dike:

*... mixabin derfeta min çênebû ez bavê xwe nas bikim. Lê belê timî weke mirovekî gelekî mezin, ango dema mirovan ez didîtim miheqeq ez himbêz dikirim. Digotin, 'tu zaroka mirovekî wisa yî'. Ya rastî ez bi hezkirina mirovan mezin bûm. Ango zehmetî bi ser me de hatin, erê lê belê kêmasiya hezkirinê li cem min tu demê çênebû. Ango, bi tiştên bavê min li dûv xwe hiştî, bi tiştên ku bavê min kirî... Hem malbata min... jixwe me hevdu şidayî hembêz kir, hem jî nihêrîna mirovan gelekî cuda bû.*

Dîtira rojê em diçin serdana malekê ji bo ku em bipeyivin bi sê xwîşk û birayên milîsekî re ku Nîsana 1994'an di bin çavan hat kuştin. Mezina wan Rabia Xana şêstûsê salî û dayika heşt zarokan e. Beriya birayê xwe ew behsa bavê xwe dike; bavê wê gelek caran hatiye binçavkirin, her carê êşkence lê hatiye kirin, "ji ber xwarina lêdanê timî nexweş" bû û ji ber vê jî emrekî dirêj nejiyaye. Em li vir bibêjin ku ev hemû li Licê ya ku mala wan jî lê hatî şewitandin, qewimîne. Herçî birayê wê ye, demeke dirêj lê tê gerîn; herî dawî li mala xizmekî wan tê girtin û wî dibin. Piştî bi şeş rojan li Licê cendekê wî tê dîtin. Rabia Xan tiştên paşê qewimîn weha vedibêje: "Me taziye nedanî. Me newêriya. Hingê me nedikarî biwêrin... em li malê digiriyan. Bavê min digot, 'dengê xwe nekin. Polês wê niha were min jî bibe.' Hingê wisa bû... Hingê agir dibariya. Em di nava agir de bûn." Dema ku hewl dida rave bike ka çima birayê wê kirine hedef, dest pê dike û bêedaletiya ew bi xwe bûye mexdûrê wê vedibêje:

*Çima kuştin? tu tişta wî nebû. Revokê eskeriyê bû. Kuştin. Diçe eskeriyê. 12 rojan li eskeriyê dimîne û direve. Dibêjin 'ji eskeriyê reviyabû, ji ber wê kuştine'. Ez nizanim. Dibêjin, 'hinek giliyê wî dikin', dibêjin, 'milîs e'. Di nava siyasetê de bû. Ji ber siyasetê kuştin... Em çûn cem dozger. Dozger jî ji min pirsî. Keça min ji min re wergêrî kir. Got, 'birayê te ketiye şer û hatiye kuştin'. Min got, 'na, polêsan birayê min girt... ji malê birine. Şeş rojan di destê wan de maye û paşê kuştine'. Gotina min a 'kuştine' li zora wan çû. Min jî got, 'wan kuştiye. Polêsan biriye. Eskeran kuştiye'. Min got, 'gunehê birayê min nebû. Ji eskeriyê reviyabû'. Ma mirov qaçaxê eskeriyê dikuje? Ma mirov mirovî dikuje?Wî got,*

*'tu kengî ji gund derketiye?' keça min got, 'wê salê em derketine'. Got, "tu çima derketî?' Min got, 'balefiran bombe bi ser me de berdidan. Mala min şewitandin. Em jî rabûn, hatin'. Got, 'keça reş'. Keça min jî got, 'dayê ma ez reş im?' Min jî got, 'na, ji te dienitîne, ji ber wê wisa got'.*

Birayê Rabia Xanê yê herî mezin Hasan Begê pêncîûsê salî ye. Ew tevî birayê xwe yê hatî kuştin, wê şevê hatiye binçavkirin, roja din jî hatiye berdan. Ew behsa şopên êşkencê yên li ser bedena birayê xwe dike. Ya rastî, ew bi dirêjî behsa wê yekê dike ka gelekî beriya birayê wî were kuştin, çi zextan û zehmetiyan dest pê kiribû, ka çawa piştî ku gundê wan û mala wan hat şewitandin bajar bi bajar geriyane, çawa debara malbata bîst nefsî kirine, çi kar kirine, li ku derê stirîne, çawa her reviyane. Tiştên ku dema birayê wî hat kuştin his kirin jî dîsa bi gotina yekanebûna birayê xwe îfade dike:

*Dinya min nema. Ez vê dibêjim. Xeber hat. Hişê min ji vê dinyayê bar kir. Ma, ez çi ji te re bibêjim. Rojeke mezin bû. Ji bo me bi qasî dinyayê bû. Wê saetê dinya min nema. Lewma parçeyê canê min çû... Lewma birayê min bêqisûr bû. Birayê min zerar neda tu kesî. Birayê min weke rojê bû... li gundan her kesî digot, 'ew mirov hingiv e'. Hingiv çawa şîrîn be, ew insan jî wisa şîrîn e. Di nava miletê xwe de. Dizî nekiribû. Mêr nekuştibûn. Malê mirovan nexwaribû. Birayê min tazî bû. Piyê wî xwas bû. Digotinê, 'çima tu pêlavekê nakirî?' Wî gotiye, 'pereyê di berîka min de xwîna mirovan e, ez naxwim'.*

Em bi Taha Begê çilûheft salî re jî dipeyivin ku tevî birayên din wê şevê hatiye binçavkirin û paşe hatiye berdan. Ew jî behsa nêzîkatiya xwe ya bi birayê xwe re dike:

*Birayê min, ew, ji bira bêhtir, hevalê min bû. Timî li ber çavê min e. Weleh, ez bi wî re jî carinan hatime vê çarşiyê, heke ez deh santîman jî rê biçim ew li bîra min e. Xwîşk, bira û kurên her kesî niha li bîra wan in... Ez wisa hîç, weke darekê, tu tişt bi serê min nakeve. Mesela ez ê ji vir rabim biçim dikanê, ez berê xwe didimê çûme dermaxaneyê.*

Ew dibêje, milîstiya birayê wî kuştina wî rewa nake û behsa sedema milîstiya wî dike:

*Birayê min bi ya min esker nekuştiye. Hiç êrîş nekiriye, ango bi tenê alîkarî kiriye. Tiştên alîkariya lojîstîkî gihandine PKK'ê. Bi hezaran kesên weke wî hene, niha her kesî kiriye. Ango ji jinê heta bi zarokê. Ne li wî gundî bi tenê, dibe ku li tevahiyên çîkên rojhilat, ên Kurdistanê her kesî kiribe... Lewma PKK ne çîka min e, ne kurê bavê min e. PKK hêzeke têkoşînê ya çekdarî ya*

*Kurdistanê ye. Tiştekî me hemûyan e… Niha ev, li vê Diyarbekirê heke mirov serbilind digerin, bila şikir ji wê re bikin. Bi saya serê PKK'ê. Tiştekî vê nîne.*

Tiştên mîna gotinên Taha Beg, Eşref Begê ku li Stenbolê em pê re peyivîn jî dibêje: "Tevgera Kurd ne bunyeyeke bi tena serê xwe ye, di encamê de bunyeyeke ku zarokên ji vî miletî ji navê çûne, ango va ye xwîşka/birayê min e, xwîşka/birayê yê din e, xalê yê din e."

Malbata herî dawî em diçin serdana wê ji navçeya ku bavê wan lê hotelek dixebitandin, piştî ku hotel tevî bavê wan ê di navê de hat şewitandin, Çiriya Pêşîn a sala 1992'yan koçberî Diyarbekirê dibe. Hakan Begê hingê di hotelê de wê demê hîna çardeh salî bûye. Ji bo ku xwe ji şerê li derdora hotelê biparêzin, tevî sîhûpênc kesên li hotelê xwe berdane jêrzemîna hotelê. Ew dibêje, paşê yekser gule li hotelê reşandine û esker ketina nava hotelê, bavê wî ji kesên din veqetandine, kuştine, kesên mayî derxistine derveyî hotelê û agir berdana hotelê. Piştre jî ji wan xwestine cendek teşxîs bikin: "Niha 'tu vî cendekî nas dikî?' Min got, 'na, ma devereke wî ku mirov nas bike heye?' Min rakir, nihêrî kilît li wir e. Ha ji wê kilîtê min tê derxist. Piştre ez ji hişê xwe çûm. Min got, 'dozger, em nikarin cendek teşxîs bikin, lê belê ev kilît min dabû bavê xwe' ". Ew rave dike, ka çima bavê wî hedef hatiye girtin: "Li gorî fikra min, em li navçeyê malbateke diyar û darîçav bûn. Hingê xwîşka min a mezin gerîla bû, li çiyê bû. Dibe sedema mezin ev be." Ew bi çîroka çûna çiyê ya xwîşka xwe ya mezin nizane; dibêje, "xwîşka min, li malê bavê min bi du jinan e. Hingê, va ye… Êdî fikra wê ye, nihêrîna wê, baweriya wê ye hingê". Dema tên Diyarbekirê ji bo ku kar bike, navberê dide xwendina xwe ya dibistanê, paşê lîse qedandiye. Serê pêşî dîsa mala wan û kargehên wan di bin çavdêriyê de ne. Ew tesîra tiştên qewimî li ser xwe û xwîşk û birayên xwe wisa vedibêje:

*Wekî din, piştî bûyerê gelek bandor li min jî bû. Ez timî ji civakê direviyam. Dema min kesek didît, mirovek didît, min wisa weke hebûneke bi tehlûke ew didît. Ango, piştî wê bûyerê bi salan ez di nava xwe de mam… Ez dikarim bibêjim, herdu dayikên min, ya bi rastî û ya jinbav jî di navê de, tevî sêzdeh zarokan psîkolojiya hemûyan xira bû. Hem xwe di warê watewî de di nava valatiyekê de his kirin. Ez jî di navê de. Hem jî di warê madî de em di nav şertên pir zehmet de mezin bûn. Bi salan me dezgehên seyar gerandin. Vê jî li cem me, bi min re şikestinek çêkir. Min xwe di nava civakê de nedidît. Min xwe vederkirî his dikir. Me nikarî vê li ser xwe qebûl bikin. Ango, eyba kar bi xwe nîne, lê ma ne, dema mirov ji devereke diyar dadikeve devereke din, mirov xemgîn dibe.*

Birayê Hakan Begê ku pênc salan jê ciwantir Ozkan Beg jî wê rojê li hotelê bûye. Ber bi dawiya peyivîna me ya bi dayika wî re dikeve hundirê odê û alîkar dibe bi me re ji bo ku em pirsan bikin ji dayika wî. Em pê re hevpeyvîneke taybet nakin, lê piştî ku bersivên dayika xwe bi me gihandin, bersivên xwe jî digotin; em ê di beşa piştî vê de cih bidin wan.

Dayika Ozkan Beg, Nesima Xan şêstûçar salî ye û heft zarokên wê hene. Yek ji kurên wê piştî ku bar dikin Diyarbekirê, bajêr diterikîne û di qezayeke trafîkê de bi şewatê dimire. Keçeke wê jî çawa ku Hakan Beg jî behs kir, li çiyê ye. Nesima Xan serhatiya çûna çiyê ya keça xwe, têkiliya xwe ya bi mêrê xwe re û kurê xwe yê mirî li pey hev ji me re dibêje: “Çû çiyê. Meha wê qediya bavê wê hat kuştin. Lê belê, ji ber êşkenceyên li bavê wê hatin kirin çû. Gelek êşkence li bavê wê kirin. Rehma xwedê lê be... Heft salên bavê wan temam bûn. kurê min şewitî.” Paşê dest pê dike û dibêje, keça wê ketiye girtîgehê, ji bo keça xwe bibîne timûdaîm çûye Stenbolê û bajarên din û hatiye. Kuştina mêrê wê li aliyekî, ew bêhtir behsa zor û zehmetiyên bi kuştina mêrê wê re destpêkirî dike. Di dawiya her hevokê de weke gelek dayikên em bi wan re peyivîn şikir dike ji Xwedê re: “Keça min jî, deh salên wê qediyan, cezayê wê xelas. Got, ‘dayê, dema ez ji girtîgehê derketim, min li ezman nihêrî’... Ew jî hate mala xwe, şikir ji Xwedê re, niha li cem birayê xwe kar dike. Şikir ji Xwedê re.”

Kurê Nesima Xanê yê herî mezin Nimet Beg çilûşeş salî ye. Em li kafeya ew û xwîşk û birayên wî dixebitînin, diçin serdana wî; danê êvarê, kafe aram e. Nimet Beg dibêje, ew tevî zarokan xebitîne da ku ji dezgehgerandinê bigihîjin xebitandina kafeyê, di wê demê de jî timî gef li wan hatine xwarin û di bin çavdêriyê de wate. Sê zarokên wî hene, dibistana navîn qedandiye, demekê jî birêveberiya HADEP’ê kiriye. Tevlîbûna xwe ya nav siyasetê wisa vedibêje:

> *Helbet ji bo ku layiqî wan bim. Heke ew, bi rastî jî bi vê zilmê, li ber vê zilmê rabûne û heke ev zilm li wan kiribin û ew kuştibin, heke gelek mirovên me bi kuştinên fail-nediyar kuştibin, weke ferdekî em rabin li cihê xwe rûnin, ev ne rast e... Bi vî rengî min têkoşina xwe kir. Min tu nasnameya siyasî jî, ne bi wateya partiyeke siyasî. Weke Kurdekî, weke nefereki têkoşînê, li ku wezîfeyek hebe min hewl da li gorî qeweta xwe pê ve bibezim.*

Ew li gotinên xwe zêde dike ku di tevahiya vê pêvajoyê de jina wî jî xwe li ber zor û zehmetiyan hemûyan girtiye û tevlî nav têkoşîna siyasî bûye. dema ku behsa kuştina bavê xwe dike, hûrguliyek dike ku em fêm bikin ka birayê wî yê gotî, wî demeke dirêj mirov weke “hebûnên bi tehlûke” dîtine, dixwest çi bibêje:

> *Dihatin hotêla me û diçûn. Ev çawişê me yê pispor [kesê ku bavê wî kuştî]*

*hatibû... Dayika xwe aniye... ji ber ku xerîb e aniye wir, me fedakariya ji destê me hat kir, ango me mêvanperweriya xwe nîşan da. Ma ne, ew jî mirov in... Ma em ê ji ku zanibin ku wê wisa bi me bikin.*

Çawa ku me li jor jî got, ji bo ku em kesên me bi wan re hevdîtin kirî bidin nasîn, di vê beşê de tiştên me ragihandî bêhtir îfadeyên ji ber xwe gotî dihewînin. Îfadeyên ku portreyen me hewl da xêz bikin, temam dikin bi xwe, di beşên paşê de cihê xwe digirin ku bersivên dayî pirsên di biwara van mijaran de ne; gerîna li edaletê, têgihiştinalêborînê û hesta rikdariyê/xeydê.

*Beş V*

## Li benda edaletê: Dewleta Mixateb

Piştî ku bîst sal di ser qewmînan re bihurîn, di rewşekê de ku nexasim jî îradeya siyasî û daxwaza civakî ya rûbirûbûna bi tiştên qewimî re, ma gelo behskirina edaletê, gerîna li edaletê, fikirîna li edaletê, bi gotina mexdûran bawerîanîna bi edaletê gelo mimkun e? Heke mimkun be wateya wê çi ye? Edalet çawa tê terîfkirin? Gotin û peyvên ku dema mirov li edaletê difikirin, behsa edaletê dikin, bi kar tînin çi vedibêjin? Wateya bawerîanîna bi edaletê çi ye? Yên ku baweriyê bi edaletê naînin berê xwe dane ku û kê?

Helbet bersiva van pirsan li gorî dijwariya qewmînan, helwêsta ferdî ya mexdûran, rewşa wan a civakî diguhere. Dema ku me hewl da ku gerînên li edaletê, fikrên di biwara edaletê de yên kesên em ji bo vê xebatê bi wan re peyivin, terîf bikin, me çend rê danîn ber xwe. Pêşî em fêr bûn ka gelo miraceetî sîstema heyî ya edaletê kirine yan na, heke kiribin netîceyeke çawa bi dest xistin, ka gelo encama bi dest xistî tetmînker dibînin yan na. Me hewl da ku em fêm bikin, daxwazên çawa dikin dema ku edaleteke tetmînker, êşan kêm dike, medûrbûnan "nisbî" tezmîn dike, terîf dikin, van daxwazan ji ku deveran dikin û mixatebên wan kî ne. Wekî din, elaqedarî îhtîmala xurtbûna îradeya siyasî û daxwaza civakî ya ji bo rûbirûbûna bi rabihuriyê re pêwîst, me hewl da derêxin holê ka ev daxwaz, navnîşan û mixateb di pêvajoya edaleta piştî şerî de teqabilî kîjan çerx, minaqeşe û pêşniyaran dikin.

### ***Hewldan: Gerîna li edaletê***

Ji bîstûyek malbatên em çûyî serdana wan, çaran heta niha miraeetî sîstema edaletê ya heyî nekiriye. Ji van, xizmên diduyan di bin çavan de hatin wendakirin û ji ber kêmbûna delîl yan jî beyanan mimkun nebûye ku dozê vekin. Ji herdu malbatên mayî yekê, ji ber cerdevan û gerîlayên di malbatê de tercîh nekiriye miraceetî pêvajoya dozê bike, malbata din jî ji ber ku derfetên wê yên aborî û civakî destûr nedane, doz venekiriye. Ya rastî, piranîya malbatên doz vekirî jî, ji ber gefxwarinên fail û berpirsiyaran ên wê demê, hîna nû di dema nêz de karîbûn bikevin nav hewldaneke bi vî rengî û dozên hatî vekirin jî yan taqîba wan nikarîbû pêk were yan jî neerênî bi encam bûne. Di wan dozan de ku dewam dikin jî yan bi bahaneya ewlekariya gunehbaran dadgeh barkirina bajarên dûr yan ji ber ku gunehbar der nakevin pêşberî dadgehê yan jî ji ber ku gunehbarên derdikevin pêşberî dadgehê jî bûyera mijara dozê ye "bi bîr nayînin", hîna tu peşveçûneke hêjayî behskirinê rûnedaye.

Divê em bibêjin, ji bo pirsên me yên di biwara pêvajoyên hiqûqî de tu bersiva berbiheve nehat dayîn. Dema ku mirov li ber çavan bigire ku ji kesên em bi wan re peyivîn sîhûdu jin bûn ku peywendiya wan qels e bi wê dewletê re ku hiqûq temsîla wê dike û bi meydana giştî ya mêr lê serdest re; beşeke mezin a yên mayî jî ji ber ku hingê zarok bûn yan ciwan bûn, yan jî dibistanên bilind nexwendibûn, êdî mirov dikare li vê rewşê serwext bibe. Yên ku cinsiyet, temen, perwerde û dewlemendiya wan a madî jî derfet dida wan pêvajoya hiqûqî dabin destpêkirin jî, di dema miraceet û dadgehê de agahiyên birêkûpêk wernegirtine; lewma jî nikarin bersivên birêkûpêk bidin me. Li aliyê din, helbet mijara, ka gelo sîstema edaletê ya heyî çi qasî berbiheve û birêkûpêk dixebite jî mijara nîqaşeke din e. Dibe ku ji ber vê yekê be, helwêsta neelaqedar û bêhêvîmayî ya beramber pêvajoya hiqûqî ya piraniya kesên ku em bi wan re peyivîn, aşkere bû; kesên ku doz vekirî jî di navê de.

Rexneyên ku ji ber tevlîhevî û dûrbûna sîstema hiqûqê, zehmetiya xwe gihandina zanîn û belgeyên pêwîst û "nekarîna xwendina" yan jî "nekarîna fêmkirina" belgeyên fermî li sîstemê tên girtin ku me di beşa yekê ya vê xebatê de behsa wan kiribû, li vir heta mirov bibêje bes, lê ne. Wekî din, divê mirov bi bîr bixe ku miraceeta sîstemeke hiqûqê ya ku tê de fail û berpirsiyar bi xwe hêzên ewlekariyê ne yan jî hêzên êwlekariyê û dewlet dikin ku "dest bi wan nebe" û taqîba pêvajoya dadgehê di gelek waran de bi mesref e, barekî giran e û bêwate xuya dike. Ji ber vê yekê, me hewl da wan teşwîq bikin ku bersiva pirsên me yên li ser mijarên weke destnîşankirina berpirsiyaran, cezakirin û kêmkirina ceza, daxwaza tezmînatê, bi wi rengî bidin ku ferzî mesel qebûl bikin ku sîstemeke hiqûqê ya berbiheve û birêkûpêk dixebite heye yan jî rojekê wê hebe. Jixwe wê ne mimkun bûna mirov vê xebatê bike dema ku mirov bifikire ku ev yek wê tu carî mimkun nebe.

### *Fikra edaleta cezakar: "Ceza edalet e"; "heke tu dipirsî ka kê kiriye, dewletê"*

Tevahiya kesên em bi wan re peyivî, berpirsiyarê kuştina xizmên xwe bi yek gotinê weke "dewlet" terîf dikin. Helbet ev terîf di wan rewşan de ku fail ne hêzên ewlekariyê yan jî kesên bi ser komên paramilîter bi xwe jî bin, terîfeke rast e. Çawa ku me di qismê "Mafê heqîqetê" yê beş I de jî behsa wê kir, dema ku bi rêya aktorên me behsa wan kir heke bi şexsê xwe tevlî gunehên li dijî mirovahiyê nebûbin jî, berpirsiyariya wan di warê derxistina holê ya failan û Darizandina wan de dewam dike. Ji bo gunehên ku wezîfedarên dewletê bi şexsê xwe tevlî bûyî jî hem berpirsiyariyên wê yên hiqûqî yên weke Darizandina fail û berpirsiyaran û tezmînkirina zerarên mexdûran, hem jî berpirsiyariyên wê yên siyasî hene yên weke xwestinalêborînê ji mexdûran, avakirina

mekanên bîrê da ku qewmîn careke din rûnedin. Li aliyê din, ji ber ne sazî yan jî kom in lê belê ferd in ên ku berpirsiyarên kirinên xwe ne û dikarin werin dadgehkirin, ceza li wan dikare were birrîn, qet nebe di warê hiqûqa cezaî de berpirsiyarê ku weke "dewlet" îşaret pê tê kirin were şexsîkirin ango bi gotineke din divê sûc were ferdîkirin. Bi ser de jî, çawa ku beriya niha di qismê Beş I ê bi navê "Fail, berpirsiyar, yên temaşe kirî" de jî me minaqeşe kir, ev ê pêşiyê li wê nifrînê bigire ku dikare berê xwe bide civaka ku fail endamên wê ne. Ji ber sedemên ku me behsa wan kir, ji kesên em bi wan re peyivî me hewl da wan bersivan bistînin ku wê bi kêra me bên ku em "dewleta" ew îşaret pê dikin, resm bikin. Bi gotineke din, me hewl da fêr bibin ka ew fail û berpirsiyaran di warê gunehkarî û cezakirinê de çawa ji hev derdixin û li ser mijara cezakirinê ka çi difikirin.

Em dugêsinî bikin ku kesên em bi wan re peyivîn navên sazî, kom yan jî kesên diyar bi lêv bikin jî, weke berpirsê bi rastî îşaret bi "dewletê" dikin. Dema dibêjin "dewlet" û qesda wan berpirsiyarên astên jor ên siyasî û eskerî ne, navên serokkomar, serokwezîr, serokê fermandariya giştî, wezîrê edaletê, heta yên hin parlemanter û serokên partiyan dibin. Navên Serokkomar Suleyman Demirel, Serokwezîr Tansu Çiller û Serokê Fermandariya Giştî Dogan Gureş gelek caran tên birin. Di serî de jin, qismekî mezin ê kesên em bi wan re peyivîn jî, behsa navên wan berpirsiyaran dikin ku ji nêztir nas dikin, bi wan aşîna ne, heta bi çavên xwe dîtine. Em ewlekariya kesên em bi wan re peyivîn li ber çavan digirin û navên birêveberên cihî yên payebilind yên weke walî, qeymeqam, şaredar, û rayedarên eskerî yên weke fermandarê qereqolê, fermandarê jendermeyan, mîralay, serdar, serpel li vir nanivîsin. Ji ber heman sedemê em ê bi nav behsa van kesan jî nekin: "Hevkarên cihî", "îxbarker", îtîrafkar, cerdevanên ku bi rayedarên payebilind ên eskerî re dixebitin, û sercerdevanên ku êdî bûne birêveberên cihî.[337]

Ev li fikra dewletê ku di berpirsiyarên payebilind ên siyasî û eskerî de bi gewde dibe. Abdulkerim Begê ku em li Mûşê pê re peyivîn dibêje, "ji bo me nas-

337 Di wan rewşan de ku kesên em bi wan re peyivîn, navê berpirsiyarên navbirî gotin, me di nava paranteza bi goşe de sê xal û cînav bi kar anîn. Di navê de fermandarê JITEM'ê yê herêmê mîralay Cemal Temizoz jî 7 gunehbar bi sedema ku berpirsiyarên 52 kuştinên fail nediyar ên di navbera 1993 û 1995'an de li navçeya Şirnexê Cizîrê pêk hatî ne, li 6. Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê dihatin dadgehkirin; li gorî nûçeyeke di rojnameya Gunlukê ya roja 6'ê Adara 2010'an de di rûniştina li 6. Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê ji gunehbaran sercerdevan Kamil Atag, gef li xizmên mexdûran û şahidên ku li dijî wî îfade dayî bi van gotinan xwarin: "Navê kurê min Tarih [bi Kurdî Dîrok] e. Tarih wê dîrokê binivîse, bila tu kes evqasî bi hêsanî îfadeyê nede." Jixwe Atağ, 21'ê Kanûna 2012'an hat tahliyekirin.

nameya tetikkêş hîç ne girîng e, yê ku tetik dayî kişandin girîng e", li gorî wî yên ku esas divê werin dadgehkirin jî berpirsiyarên payebilind ên siyasî û eskerî ne:

*Helbet, heke di kuştinekê de tetikkêşî kiribe failan, divê cezayekî vê yekê hebe, lê belê bûyera bavê min ji kuştinên fail nediyar ên din guhertî ye, dewletê mohra xwe li bin vê mêrkujiyê xist û pêk anî... li dezgehên erkdar ên vê dewletê biryara wê hatiye dayîn, muhtemel e ku haya Saziya Ewlekariya Neteweyî jî jê hebe. Haya serokwezîr jê heye, jixwe me hingê da piştrastkirin ku haya serokwezîr jê heye, lewma yên ku bi serokwezîr re peyivîn hene. Haya serokkomar jê heye û ev ji kuştinên din ên fail nediyar guhertî bû, ji bo ku xelkê çavtirsandî bikin bi awayekî aşkere ev mêrkujî kirin... Ango Serokwezîr, Serokkomar, endamên Desteya Ewlekariya Neteweyî ya wê demê hemû rabin, berpirsiyariya xwe qebûl bikin, bikevin girtîgehê, wê wateyeke vê hebe, lê belê ew şexsê wê rojê li vir wezîfedar, ew nebûya wê kesekî din li vir wezîfedar bûya, ango mirov bûyerê bi xe stûyê wî, wî ceza bike, ji bo me tiştekî zêde îfade nake... Sibe kesekî derêxin, bibêjin, ev bûyer hemû bi înîsiyatîfa ferdî ya vî kesî pêk hatin, ji be ku em ji vê bawer nakin, em ê ji ber vê nerehet bibin. Ew kes were cezakirin, hezar sal ceza lê were birrîn jî em ê pê aciz bibin, ji ber ku em ê zanibin ku wî kesî herî zêde tetikkêşî kiriye. Kesên ku ew tetik dayî kişandin cuda ne. Ji ber vê jî, ango bi ya me aliyê hiqûqî yê meseleyê, çawa min got, edalet û bûyer derkevin holê. Edaleta herî mezin ev e.*

Ramazan Begê ku li Şirnexê em çûn serdana wî, ew ê ku xizmên xwe ji dest dan di encama îsabetkirina li mala wan a topa hawinê, berpirsiyariya dewlet bi parastina gunehkaran dixe stûyê xwe, terîf dike:

*Meclîs bi xwe berpirsiyar e. Serokkomarî, wezareta edaletê berpirsiyar in. Haya van saziyan hemûyan ji me heye. Me dengê xwe da bihîstin. Lê belê ev dewlet niha ne me, yên ku em kuştine diparêze. Naxwe berpirsiyar ev saziyên dewletê ne... Heke dewlet bi xwe ne gunehkar bûya wê ew saziyên gunehkar ceza bikirina. Kesan kiriye. Lê belê saziyên dewletê yên ku ew teşwîqkirine û wan diparêze gunehkar in.*

Ew dibêje, edaleta ku wê bi cezakirina gunehkaran pêk were bi tenê yek ji wan tiştan e ku wê barê êşan sivik bike, îşaret pê dike ku dermanê bi rastî jiholêrakirina newekheviya siyasî ye ku bingehê bêedaletiyê pêk tîne:

*Dema ku kesên ev kirî derketin pêşberî edaletê, û bi awayê rastî hesab hat pirsîn, sedemên kirina wan ji holê hatin rakirin, di encamê de evqas mirov ji ber daxwaza Kurdan a maf û azadiyan qetil kirin, dema ev pirsgirêk were*

*çareserkirin, êşa me wê sivik û kêm bibe... Cezakirina van insanan, lê ev kafî nîne. Lewma sedema van mêr û jinkujiyên li holê ye. Em ê timî bibin mexdûr. Heta ku weke milet mafê me nehat dayîn, em ê, mexdûrbûna me wê dewam bike... Ez dikarim vê bibêjim, bila edalet rahêje van û wan ceza bike. Çi ceza pêwîst be bila bide wan. Lê belê ev ceza wê birîna di hinavên me de nehedinîne... Divê pirsgirêka Kurd were çareserkirin. Em ji bo vê hatin kuştin.*

Herçî Meryem Xan e, ew berevajî tiyê xwe, bawer nake ku tiştek hebe ku êşa wê kêm bike: "Heft Kurdistan werin damezrandin jî êşa min kêm nabe." Li aliyê din jî dixwaze ku gunehkar werin cezakirin; bi awayekî kurt û zelal îşaret bi mixatebê xwe dike: "Em dibêjin, 'yê ferman dayî dewlet e.' Em dibêjin, 'bila dewlet destê xwe ji ser me bikişîne.' " Tiyê din ê Meryem Xanê jî dibêje "dewlet, lê belê bêhtir rayedarên eskerî yên payebilind ên li herêmê destnîşan dike: "Em nizanin kê ev ferman [daye]. Lê belê yê ew wezîfedar kirî dewlet e, [em dizanin top] ji tanka dewletê [derketiye], hingê jî [...] fermandarê navendê yê vê deverê bû... naxwe yê ferman dayî ew e... wî tetik nekişandiye bi ya min, lê belê yê ferman dayî ew e." Ew di heman demê de dixwaze ku hesab ji failan were pirsîn:

*Ez ji eskerê top avêtî gilîker im, ji yê dayî avêtin jî ango ji dewletê jî... Van mirovan bi dar ve bikin jî, dîsa jî nava min rehet nake, lê belê dîsa bila raya giştî yan jî her kes pê zanibe, vî mirovî kiriye, evqas mirovên bêguneh... ma divê cezayê ku evqas mirov kuştine çi be?Êdî divê mirov li wê jî bikole. Herçî ez im, heke ji min bipirsin, bi ya min îdam jî kêm e, lê belê ka divê cezayê wan çi be, ez nizanim. Ka êdî wê tevahiya temenê wan, wan di girtîgehê de bihêlin... heke heta dawiya temenê wan, wan di girtîgehê de bigirin, hingê belkî ez bibêjin, 'qanûn heye'.*

Biraziyê Yusuf Beg, Ahmet Beg jî birêveberekî cihî yê ku di heman demê de sercerdevan e jî dixe nava meseleyê: "Ango ew bû sersebebê wê yekê ku ev bûyer qewimî... Dikarîbû herkesê bixwesta bikuje. Hingê dewletê tiştek ji wî re nedigot... Bi ya min tu gunehê esker nîne. Esker bendeyê fermanan e. Bibêjinê, biavêje, ew diavêje. Lewma me jî kir. Bigota, lêxe, me lêdixist. Ango yê ku fermanê dide payeya bilind e." Ew nikare di navbera cazakirina berpirsiyaran û edaletê de peywendiyekê deyne, ya rastî weha diyar e, weke ku qanih nabe bi fikreke edaletê ya elaqedarî dewletê. Di dawiyê de van dibêje: "Cezayê muebedê lê were birrîn wê baş be... Weleh em ji dewletê ne li benda edaletê ne, lewma nîne, tu jê hêvî jî bikî nîne."

Nimet Begê ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn bi xwe îşaret bi zêhniyeteke

dike ku di şexsê endamên artêşê yên bavê wî kuştî, berpirsiyarên eskerî û siyasî de demekê serdest bû:

Ji Fermandariya Giştî bigire, heta bi hikûmeta dema Çillerê. Van hemûyan hingê di çapemeniyê de jî digot, di televizyonê de jî digotin, va ye texsîsatên pereyî yên veşartî hene. Di bin navê têkoşîna li dijî terorê de mirov perîşan kirin... Sûcdarên esas desthilatdarî û Serokê Fermandariya Giştî ne... Di encamê de ev hemû bi hev ve têkildar in. Çawişekî pispor bi tena serê xwe vî karî nake... Di encamê de payebilindê li vir jî heye. Ew jî bi tena serê xwe vî karî nake. Ya ku ev erk daye wî, ew bi vê erkê bigurçûpêç kiriye desthilatdarî ye. Dema Çillerê ye.

Herçî mijara dadgehkirin û cezakirna berpirsiyaran e, bi rûbirûbûn û welatîbûnê re tên elaqedarkirin:

> *Kesên ku holê mirov sax û zindî şewitandin, muebed, heke tu li çîka me bipirsî, em muebedê dixwazin. Ne îdamê. Em li dijî îdamê ne, lê em weke cezayê wan muebedê dixwazin... halê hazir her tişt, ew li cihên baş in. Va ne, wezîr in, serokwezîr in. Heke ew jî rojekê weke me werin dadgehkirin, êşê bikişînin, belkî hingê destê xwe deynin ser wijdanê xwe... Ji te, rûbirûbûn wê li wir pêk were. Heke rûbirûbûn e, naxwe hingê werin, binihêrin ka we çi aniye serê mirovên vî welatî. Em ji Rûsyayê nehatin. Ji dewleteke din nehatin. Em welatiyên Komara Tirkiyeyê ne.*

Birayê Nimet Beg, Hakan Beg bêhtir îşaret bi zincîra eskerî dike: “Heke tu li fikra min a niha bipirsî, min ê dîsa navên heman eskeran, fermandarê qereqolê bi lêv bikira. Heta bi Serokê Fermandariya Giştî yê wê demê Dogan Gureş, min ê giliyê hemûyan bikira. Lewma ez bi rengê ku hemû bi hev ve girêdayî bin difikirim.” Tevî ku dibêje, ji bo dadgehkirin û cezakirinê êdî pir dereng e jî, di biwara ceza de ne weke birayê xwe difikire:

> *Hingê, ango dema ku me doz vekir, dema ku me bi nav navê wan giliyê wan kir, hingê diviya çi pêwîst bû bihata kirin. Lewma bîst salan piştî bûyerê, bi awayekî, tiştek bibe jî, dîsa dilmayînek, hisek di hinavên te de heye. Tu ne rehet î, lewma ez ê bibêjim, ‘diviyabû ev insan hingê bihatana dadgehkirin’... Ya rastî ez dixwazim mirovên wisa bi îdamê werin cezakirn.*

Dayika wan Nesima Xan jî bi tenê navê rayedarê eskerî yê cihî yê payebilind bi lêv dike yê ku weke kesê ku “destûr daye” kuştina mêrê wê; ew dibêje, sûcdarên esas ne eskerên mêrê wê kuştî ne, yên ku ferman dane wan in, ango “dewlet” e û edaletê jî di cezayê muebedê de dibîne: “Dewletê negota ‘bikujin,

bişewitînin', wan ê nekira... Bila hîç dernekevin [ji hepsê]... Bikevin hepsê dilê min wê lê xweş bibe."

Tahsin Begê ku em her weha li Diyarbekirê pê re peyivîn, dema dibêje "dewlet sûcdar e" tim û daîm navê serpelekî bi lêv dike û dibêje, ew dixwaze cezayê hepsa muebed lê were birrîn. Li aliyê din tevî ku Serokê Fermandariya Giştî jî li lîsteya berpirsiyaran zêde dike, esas îşaret bi desthilatdariya siyasî dike:

> *Weke serpel ez giliyê [wî] dikim... Eynî fena te li hemberî min rûnişt, got, 'tu terorîst î, ez ê tê bikujim'. Got, 'Ez ê bavê te jî bikujim, tevahiya malbata te tine bikim'... Helbet, bê ka Serokê Fermandariya Giştî yê wê demê kî yê, jê fermana xwe distand... Di doza min bi xwe de divê [serpel] were dadghekirin... Tu dizanî divê cezayekî çawa lê were birrîn? Bi fikra min bi xwe, weke min mexdûr bûn... bi hezaran malbat hene... Cezayekî wisa lê were birrîn, jixwe ne mimkun e ku ew di bin barê cezayekî wisa de rabe. Jixwe ne li vê dinyayê... Jixwe divê cezayê muebedê lê were birrîn, li wir bimîne da ku wisa timî ew milet bikeve xewnên wî. Ew ê bibêje,... 'te çawa ew avêt pişt vî deriyî? Te çawa gule berda serê wî?' Li wir her şev, ango her kêlî, her deqîqe ev ê were serê wî. Piştre wê bifikire, bi wî fikrî bimire. Ew mirov wisa wê biçe... Wî [birayê min] tu tişt nekiribû... Ew çima wisa li wî dike? Çima vî zilamî ewqas komkujî kirin, tiştek ji bo van nîne? ... Çima kir, hikûmet e tişta li pişta wî, çîka JITEM`ê Tansu Çiller. Ez vê jî dibêjim. Ango, ev Tansu Çiller, çima di rojevê de tiştekî wê nîne? Li gorî min yê herî, ka ez ji te re yê ku ev [kirî] bibêjim, ez bi [wî serpelî] dizanim. Herçî sûcdara herî giran e bi xwe, Tansu Çiller e. Ma serokwezîr kî bû?*

Birayê mezin ê Taha Beg, Hasan Beg tevî ku weke berpirsiyar îşaret bi dewletê bike jî dibêje, mixatebê esas "hevkarê cihî" ye û dixwaze cezayê muebedê li wî were birrîn:

> *Insanê min birayê min nîşanî wan da. Ma dijminê min ji ku zanibe ew kî ye... Ez wî insanî qebûl nakim. Ku ew insan were girtin, ez naxwazim ku ji girtîgehê derkeve. Bila tevahiya jiyana xwe dernekeve. Lewma birayê min parçe parçe kiribûn... Ew insan ne xerîb bû, mirovekî ji gundê min bû... Hikûmetê nedizanî birayê min li wir e... Berpirsiyar dewlet e... Dewlet, polês birayê min bir... Kesê ku giliyê birayê min kirî guleya pêşî bera wî daye. Lewma ew nebûya, wan nizanîbû. Bila cezayê herî giran li wî were birrîn.*

Xwîşka Taha Beg, Rabia Xan jî hem ji bo failan û hem jî ji bo berpirsiyaran doza cezayê muebedê dike. Li aliyê din jî bawer nake ku daxwaza wê, wê bi cih were:

*Yên ku kuştî bêhtir gunehkar in. Yê ferman dayî jî yê kuştî jî sûcdar in... Ma wê kesekî bikujin bêyî ku ferman hatibe dayîn? Yên ku ferman dayî bi herhalî gotine 'van bikujin'... Heke wê ceza li wan were birrîn bila cezayê muebedê li wan were birrîn. Ji bo min pir zehmet bû. Ev bûn çend sal, em her roj digirîn, em li çolan digerin û digirîn. Em dibêjin, 'birayê me hatiye kuştin.' Em dibêjin, 'çawa kuştine, destê wî girêdayî kuştine, yan bi copan kuştine?' Ji bo min evqasî zehmet e ha. Heke sîleh di destê birayê min de hebûya. Di destê wan de jî sîleh hebûya. Bi vî rengî miribûya. Hingê wê bi min giran nebûya. Destevala bû û bi vî rengî hat kuştin. Ev bi min gelekî giran e... Ez dixwazim wan biavêjin hepsê... Jixwe ew in dewlet. Ma hîç wê ceza li wan bibirrin?*

Adem Begê ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn yê ku bavê wî hatibû kuştin, dibêje, ji bo edalet pêk were divê di serî de nûnerên asta jor ên dewletê, kesên tetik jî kişandî bi cezayê hepsa muebed werin cezakirin:

*Ew, ango dewlet, bifikirin di nava Tirkiyeyê de çeteyek heye. Ev çete bi tevahî ji aliyê mezinên dewletê ve tê birêvebirin. Weke mînak Mehmet Agar, Tansu Çiller, Suleyman Demirel, ango hingê ev hebûn. Çeteyeke di nava dewletê de, bi tenê yên li jor[-a dewletê] pê dizanin... yê ku ev tetik kişandî, yên ku ev mêrkujî kirî ji jorê fermanê distînin. Li gorî min, ji ber ku ji jorê fermanê distînin, sûcdarên esas yên li jor in. Ew, yên ku ferman stendin, helbet bi dilê xwe ew ferman stendin, lewma tu kes nikare tiştekî bi zorê bi kesekî din bide kirin... ango bi ya min yek ji yê din gunehkartir e. Bi ya min tu kes bêguneh nîne... Li gorî min divê edalet weha pêk were. Divê ev gunehkar hemû werin dadgehkirin, bikevin girtîgehê, cezayên xwe bikişînin. Li ser rûyê vê erdê bi tenê ev dibe... ev gunehên ku di destûra bingehîn de desnîşankirî ne, û cezayên wan çi be, bila ev bikevin girtîgehê, cezayên xwe bikişînin... Herçî ez im heqê wan mirin e, lê ji ber ku ne tiştekî di destê me de ye, bi tenê cezayê muebedê, wan bixin hepsê, bi ya min ev bi tenê wisa dikarin werin cezakirin. Lewma, de ka bifikire, di encamê de bavê min hatiye kuştin, ez dixwazim ku li kesên bavê min kuştî cezayê muebedê were birrîn.*

Nexasim jî jin gelekî navê rayedarên îdarî û eskerî yên payebilind ên li herêmê hildidin. Rewş ne ku dewlet di şexsê wan kesên navbirî de bi gewde dibe. Dayika Adem Beg, Zuleyha Xan berpirsiyariya kesê fermana kuştina mêrê wê dayî weha vedibêje:

*Heke yê ferman dayî, ferman nedaya, yê din jî ma ne wê nekuşta... Yê ku ferman dayî sûcdar e, ma ne wisa ye? Sûcdar e... Tevahiya vê tabûrê di destê [wî] de bû... Ew fermandarê esker bû. Ma heta ku ew nebêje, esker bi xwe tiştekî*

> *nake... Ma ne serdar bû? ... Weleh serdar bû... Serdar, ma ne serê hezaran e?... Serê wî dewlet bû. Ma [ew] ne dewlet bû? Dewlet bû...*

Ew difikire ku kesê ew behsa wî dike bi tenê bi îdamê dikare were cezakirin, û bi tenê ew cezayekî wisa heq dike; ji bo vê jî sedemeke wê heye: "welleh, mirov nikare bibêje van mirovan hemûyan bikujin. Yên kirî, yên berpirsiyar... Li hepsê tiştek nabe. Heps di destê dewletê de ye."

Irfan Begê ku em li Colemêrgê pê re peyivîn, yê ku birayê wî hatî wendakirin, navê heman serdarî bi lêv dike, lê belê îşaret bi desthilatdariya heyî jî dike ji ber ku tu gavan naavêje di mijara Darizandina berpirsiyarên siyasî yên wê demê û sûcdaran de. Ew dixwaze berpirsiyar mîna wan tevahiya jiyana xwe êşê bikişînin, lê belê bi ser cezayekî ve nabe ku dikare beramberê vê be; dixwaze di êsirbûnê de bibin wek hev:

> *... yên ku ferman dane gelek in. Mesela Deniz Baykal hebû, Tansu Çiller hebû, Mehmet Agar hebû. Wê çendê endamekî JITEM'ê peyivî. Beriya bi şe, çar mehan dibêje, me ev mirov kuştin. Nahêlin bipeyive. Di cih de wî wenda dikin. Mesela ev serokwezîr jî heye, ma kî ji vê Ergenekonê kuştine, înfaz kirine. Lê li van erdên Kurdistanê her roj hestû derdikevin... Ango çawa birayê min ceza kiriye, em jî wê dixwazin. Ango çawa şewitandibe, kuştibe, li ser danî be, em jî edaleteke wisa dixwazin... Edalet nîne. Li Tirkiyeyê edalet nîne. Niha, heke edalet hebûya, diviya bû ev kes, ev hestu di nava panzdeh deqîqeyan de bihatana derxistin. Ma niha serokwezîr pê nizane ev hestû li ku ne, haya Tayyip Erdogan jê heye. Ma Deniz Baykal pê nizane, Tansu Çiller nizane, Mehmet Agar nizane... Ango, hepsa muebedê, çawa ku birayê min wisa çû, em jî cezayekî ku tevahiya emr dewam bike, dixwazin... Ez çawa bibêjim, insanekî weke Abdullah Ocalan danîne Imraliyê, kes nabîne. Wê van jî wisa bibin, girtîgehekê çêkin û derî li ser wan asê bikin, em jî eynî wisa, li cem wan wisa em ê li hev bikin.*

Kesên ku ev qederê bîst salan e ku hem ji bo dîtina cendekê xizmên xwe û hem jî ji bo dîtina failan hewl didin, di mijara dadgehkirin û cezakirinê de carinan xwediyê wan daxwazan in ku em dikarin weke "bi qesasî" terîf bikin; ev yek ji me re ne daxwaza rikdarî û tolhildanê rave dike, lê belê nedîtina hiqûqê weke îhtîmaleke bi rastî ya edaletê, rewşa nekarîna terîfkirina aliyê dijber ji bilî weke dijmin, rave dike. Gotinên xwîşka mezin a Irfan Beg, Gulsima Xanê jî weke temsîleke din a vê rewşê ne: "Em doza birayê xwe dikin. Em doza hestûyên birayê xwe dikin. Em dibêjin, êdî bes e. Êdî wijdan qebûl nake. Ma wijdanê dijmin nîne. Niha li tabûrê eskerên dijminê me li serê digerin."

Gulsima Xan esas kesên ji nêz ve dîtine, nas dike, îtîrafkarên ji wendakirina birayê wê yekser berpirsiyar û cerdevanên hevkariyê dikin bi dewletê re gunehbar dike: “Cerdevanan jî mandel kir. Cerdevanan bigota, me anî. Ji dayika me re bigotana, filakes û bêvankes li tabûrê ne. Em şahid in. [Hingê] Dewletê nedikarî bide wendakirin. Wan jî negot.” Weke birayê xwe, dibêje ku wan êşek kişandiye ku bi birrîna cezayê hepsa muebedê jî îflah nabe:

*Em jî eynî ya li birayê me hatî kirin bikin [edalet çêdibe]... Ma cezayê muebedê bibirre wê çi bibe? Dayikên wan wê wan li pişt derabeyên hesinî bibînin. Ew ê biçe hevdîtina vekirî û wan bibîne. Dayika min ew ne li pişt derabeyên hesinî dît û ne jî li hevdîtina vekirî. Heta ku rihê wê ji bedena wê veqetiya jî got ‘ax’. Ma ev birîn wê ji bîra me derbikeve? Tevahiya êşên dayika min ji me re man.*

Davut Begê ku li Şirnexê em pê re peyivîn, û hevjîna xwe û zarokên xwe di êrîşa çekdarî ya li dijî mala xwe de ji dest dayî, dibêje, “Berpirsiyarên van qewmînan dewlet e. Ji ber ku dewletê ev ceza nedikirin, wav ev dikirin. Serdar [...] ev li ser navê dewletê kir. Serdar [...] berpirsiyar e. Ew û saziya [li vir] a eskerî.” Nikare qebûl bike ku berpirsiyar neyên cezakirin: “Divê ew tevahiya jiyana xwe di girtîgehê de bimînin. Çawa dibe ku wan bê ceza dihêlin... Niha, çi cezayê li wan dibirrin bila bibirrin, dilê min wê rehet nebe, lê belê ma çi ji destê min tê? Zarokên min çûn êdî, ma çi qîmetê wê heye.”

Bûka Davut Beg, Hediye Xan bi israr û bi tenê navê heman serdarî pircarî dike û dewletê di ser wî re berpirsiyar dike; daxwaza wê ya ceza jî zelal e: “Bi tenê serdar [...]... Destê dewletê jî heye. Ji bo çi destê dewletê jî tê de heye? Serdar [...] gotiye ‘min kir’... Erê ez dixwazim ceza li wan were birrîn... Van mirovan ev êş evqas salan xistiye hinavên min. Li gorî wê bila ceza li wan bibirrin.” Herçî bûka din a Davut Beg, Azize Xan e, tu navî bi lêv nake; pêşî dibêje, ew “kesên ferman dayî” berpirsiyar dibîne, piştre jî dibêje, şexsê wê bi xwe weke mixateb failan dibîne: “Derdê min [bi yê ferman dayî re] zêde nîne. Ma ez dikarim çi bibêjim? Ferman daye, kesekî bikuje. Hatiye, şeş kes kuştine. Malbatek tine kirin.” Ew jî weke xwezûrê xwe behsa êşekê dike ku bi cezakirina berpirsiyaran nehedine û behsa tişta esas a ku wê bîhna wê fereh bike vedibêje: “Çi cezayî didin, bila bidin, kîna min bi dawî nabe. Cezayê îdamê jî lê bibirrin... Bila bînin vir, em bi tenê rûbirû bi hev re bipeyivin û hew... Piştî hingê çi cezayî li wan dibirrin bila bibirrin.”

Nihat Begê ku li Bedlîsê em çûn serdana wî yê ku bavê wî hat kuştin, rave dike ku dema ew dibêje “dewlet” ya rastî behsa JITEM`ê dike û piştî berpirsiyarên siyasî yên payebilind bi nav dike, li gotinên xwe zêde dike ku Darizandina

tetikkêşan jî girîng e. Herçî ew e ji cezayê ku wê li berpirsiyar û failan were birrîn bêhtir elaqedar e bi derxistina holê ya awayê kirina sûcî:

*Niha ev çar kes tetikkêş in. Ev biryar ji ku girtin? Hingê Tansu Çiller qîreqîra wê ye, bang dike, 'navên Kurdan di berîka min de ne.'... Hingê çi Suleyman Demirel, çi Tansu Çiller, çi Dogan Gureş, çi Mehmet Agar bin, gunehkarên esas ev in... jixwe piştî ku ev çar fail hatin dadgehkirin, ceza li wan hat birrîn, weke ku tayê hûnandî wê ji hev biçe û ya mayî derkeve holê... Niha muebed ne derman e ji derdê min re. Ya rastî, pirsa ku tu jî, ez jî, em hemû jî meraq dikin beriya wan, ango wan kîjan... Li mirovekî bifikire, li hemberî te ye û tu wî sax dişewitînî. Ma kîjan mirovahî vê qebûl dike? Ew derkevin pêşberî civakê, pêşberî welêt, li gunehê xwe li tişta kirî mikur werin... ya rastî ne girîng e [ka wê çi ceza li wan were birrîn] ... îdamkirina wî, birrîna cezayê muebedê li wî yan jî di hepsê de mana wî, bila bi tenê were hemberî min, ka çima ev kirin, bibe bersiva pirsên ji bo min weke çiya, paşê çi dike bila bike.*

Apê Nihat Beg, Necemettin Beg jî dibêje, kesa ku dixwaze rojekê derêxin pêşberî wî Tansu Çiller e, wekî din îşaret bi JITEM'ê dike û li gotinê xwe zêde dike ku nexasim cerdevanên di nava JITEM'ê de jî divê werin cezakirin. Tevî ku bawer dike ku wê weke cezakirineke bi rastî pêk neyê jî, wisa difikire ku edalet bi tenê dikare bi cezakirinê pêk were; herçî rengê ceza ye, ji bo wî bê qîmet e:

*Ma edalet wê çawa pêk were, heke Komara Tirkiyeyê wan bigire, di bunyeya xwe de wê wan bixe girtîgehê. Jixwe elemanên wê ne. Ango, ez pê dizanim ku ew ê li wir, wê weke me neçe, weke welatiyekî li girtîgehê li ser ranzayên normal raneze. Em pê dizanin ku wê konforê jî ji bo wan misoger bikin. Ji ber ku elemanê wê ye. Ango, ew ê tiştina bike ji bo elemanê xwe. Ango dê wê sîstemê pêk bîne ji bo wî, lê em hê jî dixwazin werin girtin... Ango, tu çi qasî bikî jî, cezayekî çawa bixwe jî, wê êşa di dilê me de sivik û kêm neke... ji bo min ne girîng e çawa were cezakirin... Ne mirin. Ango ez ne alîgir im ku canê Xwedê Teala dayî were standin, lê belê bila hinekî êşê jî bikişînin.*

Edip Begê ku li Wanê em çûn serdana wî jî JITEM'ê û tetikkêşên bavê wî kuştî bi nav dike, û di şexsê birêveberên payebilind ên cihî de îşaret bi "dewletê" dike:

*Helbet kesê ku ferman dayî [bi ya min bêhtir gunehkar e]... JITEM'ê kir, dewletê kir... Em dixwazin sûcdar derkevin pêşberî edaletê. Em dixwazin ya heq bi cih bibe... Ango girtîgeh... heke ez bim, ez ê bibêjim muebed. Helbet, ez nizanim dewlet wê çi bike... Min ê bixwesta ku cezayê muebedê li failan were birrîn. Min dixwest dinyayeke bi edalet hebe. Eynî ew edaleta zemanê Hz. Omer were.*

Em lê serwext dibin ku edaleta ku Edip Beg dixwaze were, nîzamek e ku welatî ne bi tenê di azadiyê de, di esaretê de jî wekhev in û dewlet tê de hin sûcdaran naparêze: “Ma em ê rabin giliyê kê li cem kê bikim? Ma em ê giliyê dewletê li cem dewletê bikin?”

Idrîs Begê ku li Batmanê em çûn serdana wî, dibêje, bavê wî bi hevkariya JITEM û Hizbullahê hatiye kuştin, lê belê dema ku em behsa berpirsiyarên dikarin werin dadghekirin dikin, hingê berpirsiyarên siyasî yên asta jor bi nav dike. Ew dibêje, piştî ku berpirsiyarên asta jor hatin dadgehkirin, dor wê bigihîje tetikkêşan û ji bo berpirsiyaran daxwaza cezayê hepsa muebed îfade dike:

> *Ez vê ji edaletê dixwazin, hingê Tansu Çiller serokwezîr bû. Piştre, Abdulkadir Aksoy Wezîrê Karê Hundir bû. Wekî din çîk hebû, Mesut Yilmaz. Ez dixwazim ev werin dadgehkirin. Lewma çi hatibe kirin di bin parastina van de hat kirin... Tetikkêş, piştî ku ev daketin bazarê Mehmet Agar e, ew tetikkêşê wan e, ew tişt in, hemû wê derkevin holê, lê belê heta ku ev neyên dadgehkirin tu tişt wê dernekeve holê... ez dixwazim cezayê hepsa muebed li wan were birrîn.*

Daxwaza ceza ya xwîşka Idris Beg, Nurcan Xanê jî weke ya birayê wê ye, hepsa muebed. Ji tetikkêşan bêhtir di ser kesên ferman dayî û Hizbullahê re îşaret bi dewletê dike: “Ez Hizbullahiyan gunehkar dibînim. Wan ev kir... Jixwe zilamên dewletê bûn. Ew bi dewletê re bûbûn yek. Bi devê dewletê wan ev dikir... Ango, heq e cezayê muebedê li wan were birrîn.”

Mehmet Begê ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn û bavê wî yê îmamtî dikir li nava kolanê hatî kuştin bi xwe, dewleta ku tetikkêş bi kar anîn, ya rastî zêhniyeta dewletê derdixe pêş: “Tetikkêş timî paravan in. Ma ne min got ... tu dikarî dermancê bidî dest zarokekê jî, kesekî nîşanî wî bidî. Ew ê biçe li ser wî deyne, lê ez behsa sîstemekê dikim. Sîstemekê. Bavê min bi tenê nebû qurbaniyê kuştina fail nediyar. Li vî welatî çalên têzavê hene... Em behsa dewleteke bi vî rengî dikin.” Ew bi bîr dixe ku di “lîsteya kesên wê werin kuştin” a lîderê Hizbullahê - bi gotina damezrînerê JITEM’ê Mîralay Arif Dogan, Hîzbul-Kontra - Huseyin Velioglu de ku ew bi xwe 17’ê Çileyê 2000’î li Stenbolê “mirî hat bi destxistin”, navê bavê wî jî hebû, endamên Hizbullahê ku bi şexsê xwe berpirsiyar bûn ji kuştina bavê wî cezayê muebedê li wan hat birrîn û ketin girtîgehê, lê belê piştî bi deh salan serbest hatin berdan.[338] Ev tehliyekirinên me behsa wan kir, bûn sedema înfîalê hem li cem Mehmet Beg û hem jî mal-

338 Ji bo nûçeyên di biwara Hizbullah/Hizbul-Kontra de û nerazîbûnên li dijî tehliyekirinan binihêre li rojnameyên roja 4’ê Çile 2011’ê; weke mînak ji bo nûçeyeke bi dîmen binihêre li:http://www.cnnturk.com/2011/turkiye/01/04/hizbullahin.muebbet.saniklarina.tahliye/601834.0/[14`ê Çiriya Paşîn a 2014’an]

batên din ên mexdûran, ev înfîal xwe di gotinên jinekê de dide der ku mêrê wê ji aliyê kesên navbirî hatibû qetilkirin: “Ez xemgîn im, bifikar im, min mêrê xwe dîsa ji dest da. Ev 18 sal in min timî li ber xwe da, da ku edalet pêk were. Niha mêrkuj û kesên ku bavên sêwiyên me kuştin li naverastê xwe li ba didin û digerin. Ma ji vê re jî edalet dibêjin.?”[339] Li aliyê din, herçî Mehmet Beg e, ev kesên navibirî yên ku ew weke tetikkêş dibîne, tevahiya jiyana xwe di girtîgehê de bimana jî behsa deynekî xwe dike ku wî wê her hesabê wî bipirsaya: “Ka ceza lê hatiye birrîn yan na, ev pir muhim nîne. Bawer bike ne muhim e, lê belê ka sedema vê yekê ji min re rave bike.”

Xwîşka Mehmet Beg, Fatman Xan bi xwe giraniya sûc ji failan bêhtir li kesên ferman dayî û di şexsê wan de li dewletê dike: “Helbet ne bi tenê Hizbullah, em jî qurbaniyên siyaseta ku dewletê bi temamî... li van deveran pêkanî ne... [sûcdarê bi rastî] helbet yê berpirsiyar e. Erê divê navbeynkarek hebe, lê ya ku divê em bi berstûka wê bigirin divê dewlet be.” Fikra wê ya di biwara cezakirina berpirsiyaran de jî, çawa ku di Beş I de me tevî Derrida behsa wê kir, weke miroveke ku difikire edalet ji tolhildan û mubadeleyê wêdetir e, dişibe lewlebekê ku ew bi awayekî tebiî xwe pê bigire:

> *Ez dixwazim were cezakirin, lê belê herçî em in, nizanim, piştî evqas zehmetî, ya rastî wisa gelekî, aliyekî mirovî yê insanî çêdibe. Ango çi qasî canê te biêşînin jî, [radiweste] ez niha nizanim bila çi ceza be. Mixabin ez nikarim bibêjim ‘ez pir rikdar im, heke ev bibe ez ê rehet bikim’ filan. Ango piştî evqas êş aliyekî mirovî yê nerm çêdibe. Tu dil nahêlî êdî kesî biêşînî. Lê belê divê cezayekî wan, tiştin, ew tişta em jê re dibêjin edalet. Divê ji bo ku edalet pêk were cezayek hebe, çi dizanim, êdî cezayê hepsê ye, êdî şert û mercên jiyanê yên xirabtir in, ez nizanim. Tiştekî wisa... Ango ceza divê. Ya rastî, ez dizanim wê kafî nebe, lê piştî vêqas demê, lê belê dîsa jî cezayek divê, qet nebe ji bo edaletê.*

Ferya Xana ku dema bavê kuştî hîna şeş salî bû, û em li Diyarbekirê çûn serdana wê, ji bo berpirsiyaran dibêje, “... Gotin, Hizbullah e, lê ez fêr bûm ku li pişta Hizbullahê dewlet hebû. Ez fêr bûm ku dewleta kûr hebû”, bi vê re jî dibêje, yên ku bi rastî ji ber kuştina bavê wê sûcdar in, yên “ferman dayî” ne; ji bo failan jî îfadeyên “ew di destê wan de lîstik in jixwe, ew mirov hatine bikaranîn” bi kar tîne. Weke Fatma Xanê, hem bîst salên ketî navê û hem jî aliyên ferdî û civakî yên meseleyê jî dihesibîne, û di biwara berpirsiyar, cezakirin û edaletê de nirxandineke ji dil dike:

339 Binihêre li http://www.ozgur-gundem.com/index.php?haberID=2061&haberBaslik=Abim%20bir%20daha%20katledildi&action=haber_detay&module=nuce [14’ê Çiriya Paşîn a 2014’an]

*Welehî, êdî piştî ku evqas dem di ser re bihurî, ez nizanim. Hesteke pir tevlîhev e. Mesela, wexta ceza li wan mirovan hat birrîn, ez difikirim, gelo zarokên wan hene? Ka gelo ew ê bikevin vê rewşa em ketinê? ... Ji mirinê û wê de, mesela di girtîgehê de jî be, ji bo kesekî cezayê muebedê lê hat birrîn, ev mirin e. Heta, mesela, dema xelk, mirovên li derdorê li failan nifiran dikin, ez difikirim. Gelo zarokên wî jî hene? Lewma, ez naxwazim, tişta hatî serê min [kêliyekê disekine] tişta hatî serê xwîşk û birayên min, dijminê min jî be, were serê wî. Lewma jiyana me mehû bû... Ez li van difikirim, û çi zanim, nikarim tiştekî ji wan mirovan re bibêjim. Ez dikevim nav gêjiyeke çîkî. Gêjî... Heq dikin, lê heke zarokên wan jî hebin, malbata wan hebe. Ew mirov bimirin jî ew malbat wê mehû bibe, bikevin girtîgehê de jî. Nizanim, ji ber vê yekê gelekî difikirim û hesteke pir tevlîhev e. Ez nikarim vebêjim... Zarokên wan nebin heq dikin. Lewma ez, tiştekî xirabtir jê nîne ku mirov ferdê malbeteke ji hev belavbûyî be. Lewma wan her tişt bi plan û bername kir û gelek mirov hene ku weke min li başûrrojhilat dijîn, li erdnigarî Kurd dimînin. Tu li Diyarbekirê li deriyan bixî, [tu wê bibînî] ji her deh malan heft yan jî heşt di halê min de ne. Hin jê jî mirovên wisa ne ku cenazeyê xwe jî nestandine. Şikir, jixwe ez şikir dikim ku qet nebe me cenazeyê bavê min dît. Bi salan em li benda wî neman. Ka gelo sax e, yan miriye? Ew psîkolojî belkî bi gelek caran ji vê xirabtir e. Dema bi her aliyî lê dihizirim, pir nizanim.*

Em nikarin bi apê Ferya Xanê, Mehmet Beg re li ser vê mijarê bipeyivin; gellek caran navên îtîrafkaran bi nav dike, lê di qonaxa dawî de dixwaze ku berpirsiyarên asta jor ên siyasî tiştên ku li ser wê demê de dizanin, bibêjin: “bila Tansu Çiller rabe bipeyive, bila Mesut Yilmaz jî rabe bipeyive, Suleyman Demirel, sax e mirî ye, nizanim, bila rabe bipeyive.”

Mehdi Begê ku li Batmanê em çûn serdana wî û bavê wî bi destê Hizbullahê hatî kuştin jî pêşî bala me dikişîne ser dewleta li pişt Hizbullahê:

*Yanî niha, ma ne beriya niha [min gotibû] di dema bi awayê fail nediyar kuştina bavê min de navek derbas dibe... ez bi wî awayî li tetikkêş nafikirim. Ev li dijî tevgera Kurd, qet nebe li dijî xelkê wê yê welatparêz, hingê gotineke Tansu Çiller hebû: ‘Bi zuwakirina deryayê re girtina masî’. Ango, ya rastî, ev welatparêzekî, ango çavtirsandî dike, va ye [kuştinên] fail nediyar in, binçavkirin e, ragirtina li girtîgehê ye. Ya rastî, ew bi awayekî temam birêkûpêk nêzî tevgera Kurd bûye. Qet nebe xelkê wê yê welatparêz. Ne welê ji rêzê, ango ne pirsgirêkeke bi Hizbullahê yan jî di şexsê ferdê/î de bû... min di televizyonê de bihîst, digot, ‘Hizbullah xizneya dewletê ye.’ Bi rastî jî tam xebera vê gotinê ye...*

Ji ber ku baweriya wî bi sîstema edaletê ya heyî nîne, ew difikire ku nexasim jî li dijî hevkarên cihî “sîstemeke edaletê” ya cihê divê were bipêşxistin:

*Welehî dewlet wê vê edaletê neîne. Ka em bînin... Mesela bi zêhniyeta eşîretê... Eşîret wê çi bike? Wê lê bikole, li wir, di wê eşîretê de wê zilamê herî baş bikuje. Ha bi vî rengî, heke dewlet [bibêje]: 'kujerê vî, yê ku tetik kişandî ev e, yê ku dayî kirin ev û ev in, ji ber vê yekê jî me ew xistiye girtîgehê.' Niha bixe girtîgehê, ango ceza lê bibirre. Qet nebe, ez dibêjim, ev rêxistinên di bin navê Hizbullahê de, heke li Kurdistanê zemîn bide wan, ez hîç nafikirim ku ev edalet bi cih were.*

Li aliyê din, dema ku em jê fêm bikin, em bi pirsên xwe lêdikolin û pirsan zêde dikin, Mehdi Beg pêşniyara xwe bi rengekî din rave dike; ya rastî ew bêhtir gazinan dike ji ber ku ew nikare hiqûqa heyî weke amûrekê ji bo pêkhatina edaletê bibîne. Jixwe, di beşên pêş ên sohbetê de, ew gazinan dike ku gerînên li edaletê yên bi rêya hiqûqê neerênî bi encam dibin:

*Ne kuştin lê, hiqûqa min a ez pê bawer, hiqûqa partiya min pê bawer, mirov wî bibe pêşberî wê, û wê hiqûqê bixebitîne. Ez halê hazir, tu [hêviya] min nîne ne ji sîstemê ne jî ji hêviya min, hiqûqa min heye... Ango, hiqûqa ez behsa wê dikim, hiqûqa terzê partiya min ne înfaz e... Ango qet nebe wî/wê di dewreyeke perwerdeyê de, belkî jî çi dizanim, miameleya tiştekî ku wî bi demê re biguhere pê re bikin, ew bîrewer bibe ku ew bi rastî Kurd e, bi rastî jî li dijî miletê xwe tetik kişandiye. Û ez bawer nakim ku dewlet wê van zemînan biafirîne... Temam, di warê pereyan de, aborî de hilweşiyaye, lê têkoşîna me jixwe hiqûq e. Ma ne, niha di dema doza me de, ez bi xwe çûm cem parêzer. Bi giştî, ne bi tenê ango tevahiya endamên malbatê li ber rabûbûn, û hingê ji me re gotibûn tu rêya din a hiqûqê nemaye û bi wî rengî em qanih kiribûn... Weke Mehdi, weke ferdekî malbatê [barê vê yê] aborî, ez tiştekî di vê de nabînim. [Ya girîng ew e ku] Huqûq pir girîng e û ev, ev hovîtî, ev zilm di belgeyên fermî de cih bigire.*

Li gorî dayika Mehdi Beg, Bedriye Xanê têkiliya Hizbullah û dewletê gelekî zelal û çor e; edalet jî cezayê hepsa muebed e:

*Dewletê kir. Dewlet û Hizbullahê... Pişta xwe didin dewletê. Ma kî dikare wisa pisîka keseke din bikuje? Desteka dewletê nebe, ez nikarim rabim pisîka te jî bikujim... Dewletê lîste çêdikirin, 'Herin, vî û vî bikujin.' Pere jî didan wan... Bê pere jî nebû... Tetikkêş hizbullahî bûn. Dewlet sûcdar e. Bila dewlet tiştekî nede Hizbullahê! Çima dewlet destekê dide Hizbullahê? Ji bo çi Hizbullah mêran dikuje? ... Dewlet dizane Hizbullah kê dikuje... Hemû jî li cem wan in, tesbîtkirî, heye... Wan digirin, beriya ku du salên wan biqedin wan berdidin... Mesela kurê min be, yekî din be, kevirekî biavêje, deh salan dixin stûyê wî... Weleh bila cezayekî giran bidin wan. Bila di hepsê de bimînin.*

Keça Bedriye Xanê, Sabiha Xan jî bi awayekî bêhtir li dor bigere, rola dewletê di mêrkujiyên behsa wan kirî de û berpirsiyariya wê di pêknehatina edaletê de rave dike:

*Gotin, kesê li ser danî hatiye binçavkirin, lê bi tenê sê rojan di bin çavan de maye. Lê mikur hatiye ku kiriye. Ev, ev, ev kes. Ew mirov serbest berdane. Di vê rewşê de fikra min weha ye. Helbet dixwazim ku ceza lê were birrîn. Helbet dixwazim ku edalet pêk were, lê belê sîstem, dewlet her bi vî rengî dewam bike, bi tu awayî edalet pêk nayê. Ez dixwazim ku bi rastî jî edalet were vî welatî... Ez dixwazim her kes bigihîje edaleta xwe... ya rastî yê ku ev kir jî û da kirin jî dewleta kûr e. Em hemû jî bi vê dizanin.*

Dema ku dibêje, yên ku divê cezayê muebed li wan bê birrîn berpirsiyarên payebilind in, hingê behsa şert û mercên civakî û aborî jî dike ku destûrê didin bikaranîna hevkarên cihî:

*Ma ne, çawa ku mirovên bêguneh bi salan, tevahiya temenê xwe di girtîgehê de dimînin, ez heman tiştî ji wan re jî dixwazin... Hepsa muebed, ango tevahiya jiyana wan di girtîgehê de. Ez rabim, welê bibêjim, ma mirov çi dikare ji wan mirovan re bibêje, ew êdî ne mirov in... ne cezayê îdamê, cezayê pêwîst çi be divê ew be... û va ye, ez nikarim rabim, bibêjim, ez êşkencê lê bikim, filan. Nabêjim jî, ango, lewma ne wî mirovî, dewleta kûr ev kiriye... Ewên ku van mirovan bi rê ve dibin hene, ha ew, ez dixwazim, ceza li wan were birrîn, ew werin dadgehkirin. Mirov, xelk, ya rastî, piranîya miletê me ya rastî kor e. Hin tiştan bibîne jî xwe li nedîtinê datîne, yan jî mirovên wisa ne ku di warê madî de dikarin her tiştî bikin.*

Sabiha Xan weke ku edaletê ji cezakirin û wêde, weke pêvajoyeke veguherînê ya berferehtir terîf dike, weke derfeteke xistina berlêpirsînê ya ferdî û civakî ya çavkaniya bêedaletiyan û sîstema ku failan diafirîne. Vî navî lê neke jî, helwesta wê têgihiştina edaleta selihandinê tîne bîra me ku me di Beş I de minaqeşe kir:

*[Mana wan a digirtîgehê de] helbet wê tesîrê bike. Dibe ku şikestîbûnekê his bikin, belkî poşman bibe ji kirina xwe, lê ez dixwazim ku bi rastî jî li kirina xwe mikur were. Heke bibînim poşman bûye, heke bibînim ku bi rastî poşman bûye, hingê dibe ku hinavên min bibin çîk welê. Ne bi tenê ya me ji dest dayî. Hingê rojê belkî çend kesek dihatin kuştin, şehîd dihatin xistin. Êdî em, zarokên hingê, li erdê xwînê dibînin. Li ber çavên wan mirov dihatin kuştin. tu tişt [nikare] psîkolojiya hingê, ango divê bi rastî jî hesabê wê were pirsîn... Heke bi rastî edaleta bi rastî pêk were, ew mirov hingê wê werin dadgehkirin.*

*Ma ne min got, dadgehkirin, ne welê li pişt derabeyên hesinî yan bi kuştin, yan jî bi cezayê muebedê. Ma ne, welê bi rastî tu wê rûnî, tu wê wî mirovî di warê psîkolojîk de dadgeh bikî, ka li çi difikire, ka çima kiriye. Tu wê fêr bibî ka poşman bûye yan na. Heke ew mirov bi rastî poşman bûbe, jixwe wê xwe diyar bike. Jixwe, heke edalet were, ma ne min kêliya din got, yên mezin dewleta kûr ew derkevin holê hingê jixwe ev mirov wê li xwe mikur werin.*

Abdulselam Begê ku li Mêrdînê em pê re peyivîn, dema ku dibêje, ji bo endamên Hizbullahê yên ku kurê wî kuştin, ew cezayê hepsê jî kêm dibîne, nerazîbûna xwe îfade dike ji ber wê yekê ku fail bi destê dewletê tên parastin.

*... em Hizbullahê berpirsiyar digirin... Giliyê me û yê ku em pêşî berpirsiyar digirin dewlet e, yên ku bi dewletê re tevdigerin, yên ku hevrêtiya dewletê dikin, yên ku wezîfeyê dikin ji bo dewletê... Evên qewimî ne li gorî dilê me ne. Me diêşinin, ev neheqî ye... Wan rojê [...] 10-12 kes şehîd dikirin. Diçûn çaya wan vedixwarin û piştre jî ew serbest berdidan... Ev tetikkêşên dewleta zilmkar in. Dewletê ew timî diparastin. Niha jî diparêze... tu ceza bes nîne ji wan re. Heps jî ji bo wan sivik e. Heqê wan bidarvekirin e, îdam e.*

Jina Abdulselam Beg, Şukriye Xan, tu kes yan jî saziyê bi nav nake, lê di ser kesê ferman dayî re îşaret bi dewletê dike, lê belê di warê cezakirina fail û berpirsiyaran de ne weke mêrê xwe difikire:

*Mirovên ku kurê min kuştin jixwe weke heywanên xwîn bi çav û devê wan bûyî ne. Lê yên ku ew şandin, yên ku ew şandin sûcdar in... Heta ku sax in bila di girtîgehê de bimînin... Em bi kuştinê xemgîn dibin. Bila girtî be. Madem kuştin bi êş e, kuştin zehmet e. Di girtîgehê de be dîsa wê diya wî wî bibîne, malbata wî bibîne, bîhna malbata wî karibe were ber. Kuştin pir zehmet e... Lê bila [malbatên wan] zanibin, bila bikişînin.*

Herçî keça Abdulselam Beg, Yasemin Xan e, nerazîbûna wê li dijî wan kesan e ku birayê wê yê mezin bi şexsê xwe kuştin, ya rastî, hevkarên cihî yên ku ev kar ji bo pereyan kirin:

*[sûcdarê esas] yên tetik kişandî ne. Niha tu ji min re tiştekî, haa, tiştekî weha jî heye; bi zorê bi gefxwarinê tu wê ji min re bibêjî 'tu weha li vî/vê nekî ez ê te bikujim, ez ê li ser te deynim.' Tişta ku ji ber tirsê tê kirin tişteke din e, lê belê tişta ku ji bo pereyan were kirin tişteke din e... 'Here, vî û vî bikuje', lê tu nexwazî tu nakujî. Te ji bo pereyan dikir, naxwe yê sûcdar tu yî... helbet, ma [yê ferman dayî] jî ne gunehkar e? Hem ew û hem yê din, lê sûcdarê herî mezin ê qebûlkirî ye.*

Pêşî weke bavê xwe dibêje, fail mirinê heq dikin, heta dibêje ku ew dixwaze vî

cezayî bi şexsê xwe bi destê xwe bide: "Tu ji min bipirsî, heke ez bim, ez ê ne dozê bidim destpêkirin ne jî tiştekî bikim, ez ê biçim bi xwe li ser deynim." Lê belê paşê em têdigihin ku ew wisa dipeyive ji ber ku bawer neka ku dewlet û hikûmeta heyî failan dadgeh bikin û ceza bikin, ango ji ber ku qet bi sîstema edaletê ya heyî bawer nake wisa dipeyive, lewma heke sîstemeke edaletê ya xweş dixebite ya muhtemel hebûya ango heke fail bên dadgehkirin, ew dibêje ku hingê ew ê fikra xwe biguhere: "bila meubed di hepsê de bimîne. Bila nemire. Ango bila tevahiya jiyana xwe bimîne... Ma ne heqê wî ye?" Bahaneya daxwaza cezayê hepsê jî qet nebe bi qasî guhertina fikra wê ya ceza maqûl e: "... heke poşman bibe. 'Min çima kir? Min çima bi ya gotinên xelkê kir?' Yan jî heke dilê wî bi wî mirovî bişewite, [bibêje] 'min mirovekî ciwan xist bin axê.' "

Sinem Xana ku li Wanê em pê re peyivîn, a ku hevjînê wê hatî kuştin, pêşî dibêje, li gorî wê rayedarên payebilind bêhtir sûcdar in jî paşê failan jî li nav zêde dike; Daxwazeke wê ya taybet nîne di mijara cezakirina sûcdaran de: "Helbet yên ku ev ferman dane, yên ku kirine, bi kar anîne, bi wan dane kuştin... Ew bêhtir sûcdar in, wan yên din bi kar anîne. Ya rastî hevparên hev in, sûcê hemûyan yek e... Ceza edalet e, çi [cezayî] didin bila bidin. Êdî cezayê girtinê li wan dibirrin, çi cezayî li wan dibirrin, bila bibirrin."

Dişa Sînem Xanê, Şengul Xan bi xwe zelaltir e; ew yên ferman dayî weke sûcdarên esas dibîne û dibêje, rayedarên îdarî yên cihî yên payebilind jî berpirsiyar in ji kuştinan. Dîsa jî navnîşana dawî dewlet e:

> *Ango gunehkar ew in ku ferman dane. Tu wê biçî zilamekî diduyan bigirî, bibêjiyê 'here li ser vî deyne'... Di dema Hayri Kozakçioglu de ev kuştinên fail nediyar hemû bi hev re elaqedar in... Ango dewlet e, dewlet e. Ma kî dike? Ya ku ev anîn serê me, ya ku kir van bi me bikin dewlet e.*

Bi ya wê divê cezayê hepsa muebed li fail û berpirsiyaran were birrîn û îşaret bi dewamîbûna kuştinan dike û dîsa dewletê weke navnîşan nîşan dide:

> *Bila hîç dernekevin. Lewma tu gunehê van insanan nebû. Ango bi salan e evqas mirov hatin qetilkirin. Ma gunehê van mirovan çi ye? Yê şêst salî, ji yê bîst salî, ji yê sîh salî, ji yê çil salî, evqas kuştinên fail nediyar hene. Ya rastî fail ne ku ne diyar in. Navê wan fail nediyar e. Failê hemûyan jî diyar e. Ango li meydanê ye. Failê kê nediyar e? Ma heta doh [...] mirovên hatin qetilkirin, failê wan nediyar in? Ma mirovên li Roboskiyê hatin qetilkirin, failên wan nediyar in? Failê hemûyan jî li holê ne. Heke hûn dipirsin ka kê kiriye, dewletê. Ev tişteke ku xuya ye bi çavan. Ma, ne tiştek e ku mirov înkar bike.*

Yekî ji birayên Şengul Xanê îxbarkerê ku bi failan re hevkarî kiriye kuştiye, ji

ber vê jî cezayê hepsa muebed ê girankirî lê hatiye birrîn. Tevî ku dibêje, heke birayê wê ew îxbarker nekuşta, wê dê ew bikuşta jî, çawa ku em ê di beşa bê de bêhtir bi kite kit behsa wê bikin, bi tesîra têkoşîna siyasî jî, dibêje ku ew îro bi heman rengî nafikire, lê belê bi ya wê rast bû ku birayê wê îxbarkerê Kurd kuştiye:

*Na, ez niha nakujim. Bi rastî nakim, ango nikarim bikim. Hingê, ma ne min got, jixwe çil roj qediyabûn yan jî neqediyabûn. Hîna [birîn] taze bû, hîna em tam neketibûn nava têkoşînê. Ya hingê û ya niha gelekî ji hev cihê ne... hingê em weke niha fereh nedifikirîn. Hingê, wisa dawên êşiretan çêdibûn, wî ez kuştim, min ew kuşt, bila dilê min rihet bibe. Ango ev hebû. Ango, mirov ferehtir bifikire, wisa têkoşîna neteweyî, wisa ew tişt nebû... Fikra mirovan diguhere... wî bi ya min heq kiribû... diviyabû heq bi cih bihata. Lewma [îxbarker] ne dewlet bû. Qet nebe ne polês bû, Kurdek bû... mirov rabe xiyanetê bi mirovên xwe re bike tişteke din e... Tu birayê min î. Ev êş, weke min, bi serê te de jî hatine. Ango, ez bi vî rengî dibêjim, heq kiriye... Ew mirovek bû ku ketibû xwîna gelek mirovan, bi hezaran insanî. Mirovek bû ku debara xwe bi pereyên ji xwînê dikir... Heke eskerek [be] mecbûr e, wezîfeyek heye. Mirov wê bike tişteke din e, lê mirov rabe di berdêla pereyan de birayê min bikuje, ew jî tişteke din e.*

Herçî birayê Şengul Xanê, Eşref Beg e, kuştina îxbarkerî bi wê yekê rave dike ku ew bawerî peyde nabe ku edalet wê pêk were:

*Niha tişt e, ma ne dibêjin, 'mirov li cihê edalet lê nebe, edaleta xwe pêk tînin.' Niha mirov ewqasî bê çare ye ku ewqasî, wisa, lewma di civakeke wisa de mirov dijî. Ango, mesela em bibêjin mirov li metropolekê bimana, dibe ku ji bo mirov zêde nebe pirsgirêk... Ha, ne çîk e jî, ne xwînîbûn e jî, lê belê derbek li te xistine. Derb li te xistine û tu xwe sefîl his dikî... Dibe ku amiyane be, lê belê tişta em jê re dibêjin zexta taxê li vir ya rastî li kar e, û fiîlî heye... Mirov nikare li malbata xwe çîk bike, belkî dema mirov li rûyê wan binihêre şerm bike. Dema mirov li rûyê jinbira xwe dinihêre şerm dike. Psîkolojiyeke bi vî rengî hebû... Êdî serfirazî, bi gotina amiyane, ma ne em dibêjin, tu serfiraz digerî. Lewma te tola xwe hilaniye. Va ye, tişteke wisa ye ku niha ne bi tenê kuştina wî zilamî ye... di civakê de jî rehetbûneke cihê afirandiye û te peyam daye her kesî... Lewma di wê biwarê de ku edalet wê pêk were, baweriyek bi te re peyde nebûye. Dema ku ew bawerî peyde nabe, hingê tu neçar dibî edaleta xwe pêk bînî... Tevî ku nav hatin dayîn, nobetdarekî bi tenê jî nehat binçavkirin. Rewşeke wisa heye. Ji ber wê jî bi awayekî baweriya te ya bi edaletê jî derb xwariye.*

Li aliyê din nafikire ku divê cezayê îdamê li failan were birrîn. Ji bo berpirsiyarên siyasî yên asta jor jî dibêje, divê ji ber “gunehên li dijî mirovahiyê” ew li Dadgeha Ceza ya Naveneteweyî werin dadgehkirin:

*Yanî, helbet em ne alîgirên mirinan in, em binê vê xêz bikin. Ango, dibe ku hin kes rabin, ji te re, sibe ew ê li xwe mikur jî were, me kir, me wisa kir. Ango tiştên ku wê me tetmîn bikin. Lê pirsgirêk ne ew e. Pirsgirêk hêza li pişta wî ye. Hêza ku ew daye kirin e… Niha, helbet li dinyayê mînakên vê hene. Va ye, tiştên ku bi serê cihûyan de anîn, nizanim, ji te re, yanî ev li ku hatin dadgehkirin, va ye dîwanên edaletê hene. Va ye ji bo van hatine damezrandin. Ji bo tiştên li Bosna Hersekê hatî kirin, van… Lewma tu çîk î ji ber tinekirina neteweyekî. Te konsepteke wisa çêkiriye. Va ye, ew ê ku bi darbeya eskerî ya 1980’yî hatî tişteke wisa amade kiriye. Ango, welê bi cezakirina kesekî du kesan, ango em bibêjin, wijdanê me rehet bû, lê ma yên din? Lewma tu ne ji bo kesekî, 17.500 kuştinên fail nediyar hene yên ku tên zanîn… Ango niha biçin, bikevin girtîgehê, di hepsê de bimînin, ev ya rastî zêde ne girêker e, ango aşkerekirina tiştekê ye. Aşkerekirina sûcekî ye. Dîtina vê yekê ji aliyê dinyayê ve ye… Ya rastî tişta ji bo me gelekî girîng jî ev e… ha, erê cezayên wan, ên Dîwana Edaletê ya Laheyê hene. Ew meseleyeke din e, lê belê tu wê vê weke xelatekê bidî tevahiya civakekê. Tu wê civakê tetmîn bikî… Niha tişt e, hesteke insanî ye, ango ileh tu dixwazî bimire. Ya rastî ev di binehişê de ye, lê belê dema ku mirov di warê civakî de li meseleyê binihêre, ew rabe li wir were dadgehkirin, li gunehên xwe mikur were jî kafî ye. Lewma ev tiştek e ku wê asteng bike hinên din vê bikin. Ango mesele ew e ku kî bike bila bibîne ku rojekê mutleq ew ê li pêşberî wê dadgehê, wê/wî dadgerê/î, wê civakê, li pêşberî dinyayê bikeve wê rewşê.*

Kamil Begê ku li Colemêrgê em pê re peyivîn bi xwe ji kuştina birayê xwe nexasim îtîrafkar, îxbarker û cerdevanan berpirsiyar digire; ji ber wê jî behsa tu saziyeke din a fermî yan jî rayedarekî din nake; heta ew weke nûnerên herî xurt ên dewletê jî wan “hevkarên cihî” dibîne:

*Berpirsiyarên înfazkirina mirovên welatparêz hevkarên cihî ne… tu kes nikare kesekê/î ji mala wê/wî derêxe. Lê belê kesa/ê tu pê bawer, tu weke heval qebûl dikî te dixapîne, te derdixe… Ez nizanim hevkarê kîjan hêza tarî ye… Ez bi vê dizanim ku hevkarên cihî [birayê min] dan destê wan hêzên tarî, dan destê celadan. [Birayê min] birin û înfaz kirin. Ji bo pereyan ev kar kirine… Ez baş bi vê dizanim. Desthilatdariyê ev kir. Desthilatdarî bi ser kê ve bû? Dewletê. Dewlet jî ser bi dewleta kûr ve bû. Dewleta kûr jî bi ser kê ve be, ew. Axa, şêx li pişta van hêzên tarî ne…*

Yekane tişta ku Kamil Beg dixwaze ew e ku bi hevkarên cihî re nejî; û li gorî wî pêkhatina edaletê jî ev e:

*Heke kesek dibêje, 'ez mirov im' divê şertên mirovbûnê bi cih bîne. Ez divê heywanan nekujim. Xwezayê texrîb nekim. Divê ez mêran jî nekujim. Mafê wî jî ê jiyanê heye. Xwedê gotiye, 'min ew can daye, ez ê bistînim, nabe tu bistînî'. Bila van mirovan nekujin. Bila van mirovan bikin rêz. Bila her kes were û tif bike nav çavên wan. Bila neçin nav civakê. Çi bi hêza dewletê, çi bi hêza tevgerê, êdî bi hêza kê dibe bila bibe. Nabe ku ev mirov bikevin nav civakê. Ji bo civakeke paqij bila ruswa bibin. Ango divê weke vîrûsekê nekevin nava milet. Ez ê weke ferdê malbatekê, ku birayê wî şehîd bûye bibêjim. Mirovên xiyanet bi xelkê xwe re kirî, kî dibe bila be, cerdevan yan jî sîxurî kiribe, divê ev mirov ji holê werin rakirin. Ez nabêjim bikujin. Divê di nava civakê de di nava xelkê de xuya nekin. Bila wan biavêjin binê çalekê, ser giravekê, hundirê şikeftekê. Bila wan bixin cihekî. Bila neyên nav civakê... Ez dibêjim, bila werin teşhîrkirin. Çi ji nêz û çi ji dûr bila mirov bi van hêzên tarî re peywendiyê daneînin. Bila wan ji nav xwe bikin der. Wan teşhîr bikin. Bila her kes hesabê xwe bide da ku edalet pêk were.*

Di mijara dîtin, dadgehkirin û cezakirina fail û berpirsiyaran de dewletê mixateb nabîne, lê helbet, wateya vê ne ew e ku ji ber kuştina birayê xwe ew berpirsiyarên siyasî yên astên jor gunehbar nake, ew dibêje ku êdî ew xwe weke welatiyekî nabîne:

*Ji dewletê di daxwaza min nîne. Herçî dewlet e, hêviya min beramberî wê şikestiye... Ji dewletê tu hêviya min nemaye... Dewlet vê sîlehê ji bo ku mirovan bikujin dide dest wan... Bila sîlehê nede dest xelkê xwe. Bila hêzên tarî neyên welatiyên wê nekujin. Baweriya min ev e, rojek wê were dewleta Tirk wê were dadgehkirin. Kîjan mirov were kuştin, dibêje, 'ev li çiyê bû.' Li ser nasnameya wî çi diniviîse? Welatiya/ê Tirk, welatiya/ê Tirk diniviîse. Dewlet rabe welatiyê xwe, mirovê xwe înfaz bike. Ez bawer dikim, rojekê Tayip Erdogan jî li pêşberî edaletê hesab bide. Ez bawer dikim ku hêzên tarî wê hesab bidin.*

Dayika Kamil Beg, Ayşe Xan jî bi tenê dibêje, "dijminê me nebûn. Hikûmetê kir"; ew ji me dipirse ka daxwazeke wê ya bi çi rengî dikare ji hikûmetê hebe: "Kî wê çi bike? Hikûmetê kiriye."

Sarya Xana ku em her weha li Colemêrgê pê re peyivîn jî weke birayê xwe Kamil Beg, hêrî zêde dixwaze bi bîr bixe û ragihîne ku birayê wê yê mezin ê hatî kuştin welatiyê dewletê bû: "Ez dixwazim ku dewlet rabe bibêje, 'ev welatiyek bû... Me ev kir'. Bila ezabekî wijdanî bikişînin. Bila yek rabe vê bibêje, mesela bila dewlet rabe vê bibêje. Ew jî di encamê de welatiyê Komara Tirkiyeyê bû..." Ew berpirsiyar û failan ji hev cuda nake, lê belê ev yek, elaqedarî fikrên wê

yê di biwara welatîbûnê de jî, dike ku ew tiştên din ji hev cihê bike: "Herdu jî sûcdar in. Yê ferman dayî jî, fail jî sûcdar in... Bi tenê yek ceza heye ku dilê dayikên wan jî bişewite... Bila kezeba wan jî bişewite... Bila ew jî bên kuştin. Bila xwe bikujin. Bila ew jî çi ji xwe dikin bikin." Ya rastî îşaret bi çavkaniya bêedaletiyê ya siyasî jî dike, çêl li wê yekê dike ku edalet bi awayekî cihê ji mubadeleyê jî dikare were misogerkirin: "Heke çareserî pêk neyê, ez dixwazim tola xwe hilînim."

Biraziyê Sarya Xanê, Yusuf Beg xwendekarê fakulteya hiqûqê ye, tevî ku ew weke navnîşan îşaret bi berpirsiyarên siyasî yên astên jor ên wê demê dike jî behsa ji destdanekê dike ku ceza nikare telafî bike:

> *... Piştî bi bîstûçarsalan tu telafiya wê nabe. Ez tiştekî wisa klîşe bibêjim. Careke din neqewime em ê bextewer bibin. Bila neyê serê tu kesî. Telafîkirina mirinê nabe... Pirsgirêka min bi dewletê re ye, ne bi wan [fail] re ye... [yên ku divê ceza li wan were birrîn] ew in ku hingê li serê dewletê bûn... heke we di dema nûciwantiya min de bipirsaya, minê bigota kuştina qisasê wî, lê niha ez ê bibêjim cezayê hepsê. Jixwe em ê tu kêsî jî nekujin... Helbet ez muebedê dixwazim. Ev ne bi tenê ji bo bavê min e. Ji bo bi dehan kesan... Ya ku wê bike bîhna min were ber min, va ye, ew Suleyman Demirel û yên hingê li desthilatdariyê cezayê xwe bikişînin... Gelo telafiyek wê bibe? Nabe. Ango telafiyeke wê nîne.*

Herçî Nizamettin Beg e ku li Batmanê em pê re peyivîn, ê ku birayê wî di bin çavan de hat wendakirin, daxwaza wî ya herî girîng bersiveke di biwara aqûbeta birayê wî de ye. Tevî ku bawer nake ku fail werin cezakirin, ji bo "dewleta" ku ew weke berpirsiyar dibîne daxwazeke wî ya cezakirinê heye:

> *Berpirsiyarê tiştên qewimî dewlet e... Dewleta ku vî şerî bi rê ve dibe bi xwe berpirsiyar e... Mesele ne ew e mirov derêxe holê ka kujer kî ye. Kujer jixwe diyar e, dewlet e. Yê ku ev dan kuştin dewlet e. Yê ku van diparêze dewlet e... Ez bawer nakim ku [Fail] werin cezakirin. Helbet bila bi awayê herî giran werin cezakirin. Bila cezayê hepsa muebed li wan were birrîn.*

Ji bo dayika Nizamettin Beg, Raziya Xanê jî terîfkirina berpirsiyaran û daxwaza edaletê heman tişt e: "Ketiye destê dewletê. Kesa/ê hez ji min neke nebû, tişta min nebû. Bi tenê dewlet. Kete destê dewletê. Dewletê ev bi me kir... Ma ez ê ji dewletê çi bixwazim? Ez doza hestûyên [kurê] xwe dikim.

Ji bo Mizgin Xanê ku em li Mêrdînê pê re peyivîn û ev bîst sal in ku tu xeber ji bavê xwe negirtine bi xwe pêkhatina edaletê, ditîna bavê wê ye:

*Ez doza bavê xwe dikim... Ez bi tenê bavê xwe dixwazim. Yan saxê wî yan jî miriyê wî. Ma ez çi ji dewletê bixwazim!... Bila wan bigirin, bila di girtîgehê de bimînin. Belkî niha zar û zêçên wan jî hebin. Ez bi xwe, niha dilê min bi wan dişewite. Heke ez zarokên wan bixim şûna xwe, weke min bin, ew ê jî bibînin, ew jî wê vê êşê bikişînin... Ez dibêjim, ez nikarim weke wan xedar bim... Çi dibe bila bibe, em dixwazin yan hestûyekî bavê me yan jî bavê xwe dixwazin... Qet ne xema min e [ka wan ceza xwariye yan na]. Ez li bavê xwe difikirim... Ew ceza jî ji hiqûqê re maye.*

Xwîşka Mizgin Xanê, Zindan Xan jî pêşî weke xwîşka xwe ya piçûk dibêje, ew bi tenê bavê xwe dixwaze, lê herçî cezayê berpirsiyaran e, ew ne weke xwîşka xwe difikire, li gorî wê cezayê wan mirin e: "Ez bi tenê dixwazim bavê min were dîtin. Tişteke din nîne... Ez gelekî dixwazim gunehkar werin dîtin û laşê bavê min çi sax û çi mirî... Eynî weke ku li bavê min çîk kirin... [kuştina wan] erê."

Cemile Xana ku em li Mûşê pê re peyivîn a ku rewşa wê jî dişibe ya li jor û ev bîst sal in ku tu xeber ji mêrê wê nînin, weha dipeyive: "Ez dixwazim ku tişta wan kirî bi heman rengî were serê wan jî... Niha îro kesek agir diavêje ser min û ez dişewitim, mafê tu kesî nîne vê bike. Mirov bi tenê dikare bi yê ev kirî re hesab bi hev re bibîne. Heke ji destê mirov were, cezakirin baş e." Cemile Xan kesê dixwaze ceza bike bi nav jî dike; serpelekî ku beriya hingê mêrê wê kirî bin çavan, gef lê xwarî, ango kesekî ew nas dike, pê dizane, wê rûyê wî dîtî.

Keça Cemile Xanê, Mukaddes Xan tu navî bi lêv nake, lê belê bi ya wê sûcdarên bi rastî fail in:

*Ya rastî her kes sûcdar e, lê belê temam, çi qasî ferman jî dabine we, mirov rabe wan mirovan bişewitîne, raje bavê min bibe, tu wijdan vê qebûl nake... ango, temam yên ku ew ferman dayî jî nebûyana, lê belê kezeba wan çawa ewqasî zuwa û hişk bûye? Wê kêliyê, ez bi rastî jî dihizirim, dema ku ew mirov li wir dişewitîn, wan mirovan li wir çi his kir, ez gelekî meraq dikim.*

Mukaddes Xan minaqeşeya ku me di qismê bi navê "Fail, berpirsiyar, yên temaşekirî" yê Beş I de tevî Arendt kirî tîne bîra me: Arendt digot, "bicihanîna fermanan" failan ji berpirsiyariyê azad nake, berevajî vê, li gorî Arendt divê ev weke bi awayekî aktîf erêkirin, rast dîtina îdîayên îdeolojîk ên ku zemîn in ji bo fermanan, erêkirina wan û destekkirina wan were nirxandin. Li aliyê din ew kesên ku ne berpirsiyarên eskerî yên ku fermana kuştina xizmên wan dayî lê belê failên ji wan re tetikkêş tê gotin, ên ku kirina kuştinê bi destê xwe kirî weke sûcdarê esas dibînin, bêhtir elaqedarî "wesfên insanî" yên failan in; yên ku berpirsiyarên siyasî weke sûcdarê esas dibînin ne wisa difikirin. Li

şûna pirsên meydana hiqûqî yên weke "çawa, bi çi awayî, di bin kîjan şert û mercan de", weha diyar e ku bersiva pirsa peywendîdarî têgihiştina exlaqî ya "çima"yê meraq dikin. Bi zena min sedema wê yekê ku pirsa herî girîng ya ku mexdûr dixwazin ji fail û berpirsiyaran bikin "çima" ye, ev e - em ê vê mijarê di beşa bê de bi awayekî bêhtir bi kite kit minaqeşe bikin. Belkî jî ji ber vê yekê, ji cezakirina failên ku li gorî wê wesfên xwe yên mirovî ji dest dane, bêhtir, Mukaddes Xan xemrevîniya xwe di gihiştina gora bavê xwe de dibîne yê ku êdî ew bawer dike ku najî:

> *Bi ya min, çi cezayî li wan bibirrin bila bibirrin, ez ê nebêjim 'ox û xweş'... Lewma bifikirin, tevahiya jiyana wî, wî bixin hepsê jî bavê min wê venegere. Bikujin jî wê venegere. Ango, çi jî bikin barê dilê mirovî sivik nabe... Mirov helbet dixwaze werin cezakirin. Bila cezayê ji ber sûcê kirî li wan were birrîn, lê, ez dibêjim, bi rastî jî cezayê çawa bidin bila bidin wan, di encamê de kezeba me şewitiye... Bi tenê dîtina bavê min. Dema biçim ser gora wî, bila gorekî wî hebe. Bi tenê vê. Tişteke din jî na. Bi tenê ev [barê dilê min] wê sivik bike.*

Birayê Mukaddes Xanê, Ekrem Beg jî heman daxwazê, li pêşiya dadgehkirin û cezakirina berpirsiyaran datîne - belkî jî ji ber ku difikire ev ê hîç pêk neyê:

> *Niha, mesela tişta ez û malbata min herî zêde dixwazin, ew e ku qet nebe goreke bavê min hebûya. Qet nebe hestûyek, tiştek hebûya, gora bavê me hebûya, me qet nebe zanîbûya gora wî li ku ye... Bi serê kesî nakeve ku hikûmet vê qebûl bike, yan jî biçe wî [serpelê] bi fermana xwe dayî vir, bigire, ragire yan jî ceza bike.*

Li aliyê din, ew dibêje, aliyekî ji ceza û wêde yê edaletê heye; ya esas ew dixwaze ku berpirsiyar di êşa wan kişandî bigihin û nas bikin wê êşê:

> *Hûn wî bigirin, [bibêjin,] 'ev mêrkujê bavê te ye, rahêjiyê, bikuje, serjêke,' fikra min a şexsî ye, dibe ku tu bikî, lê dema kêliyekê tu li zar û zêçên vî fikiriyî, dema hûn rewşa xwe di ber çavên xwe re derbas bikin, hûn ê hingê rawestin... Bila min bixe şûna kurê xwe û çawa bavê min hat qetilkirin bi destê wî, bi çavên kurên xwe, dema çûn mala xwe bila ji zarokên xwe bipirsin, hûn ê çi bikin? Bila zarokên wan li şûna min biryara cezayê li wan were birrîn bidin... Piştî ku ji dadgehê derket bila biçe mala xwe, '... Min ev wisa wisa kir. Wisa zarokên wan hebûn. Em bibêjin, niha terorîstan ez birim û ez kuştim, hûn jî wisa bêxwedî di nava sefaletê de man. Hûn li min geriyan û we ez nedîtim û dewletê ev girtin, hûn bi van re rûbirû bûn, hûnê çi cezayî bidin wan?' Ez ji sedî sed razî me bi bersiva zaroka wî dayî. Zaroka wî çi cezayî bidiyê ez pê razî me.*

Ya rastî dema ku ew behsa tesîra dîtina fail û berpirsiyaran li ser şexsê xwe, malbata xwe û civaka Kurd dike, hingê rave dike ka piştî bi bîst salan çima

zehmet e mirov di navbera edalet û ceza de têkiliyeke yekser deyne: "Tevî ku hîç dijminê me nebûn, bi milyonan dijminên me çêbûn. Ji ber ku mêrkujê bavê me ne misoger e, bi milyonan kujer pêşkêşî me kirin. Hewl dan vê li hin koman yan jî li gel bikin mal. Vê di psîkolojiya me de, di jiyana me de cihekî mezin girt." Ev hevok bi temamî li hev dike bi minaqeşeya sûcê kolektîf/berpirsiyariya kolektîf re ku di qismê "Fail, berpirsiyar, yên temaşekirî" yê Beş I de em pê daketin. Beriya niha jî min gotibû, ji ber qebûlnekirina sûc, cezanekirina sûcdaran, û bicihneanîna pêdivî û mafên mexdûran, dike ku hêdî hêdî rengê sûcê kolektîf li berpirsiyariya kolektîf bibe.

Aysel Xana ku li Mûşê em pê re peyivîn, ji ber şewitandina malbata xwe weke yekane sûcdarî serpelê ku navê wî jî hil dide dibîne, ev serpel halê hazir bi awayekî negirtî tê dadgehkirin.[340] Aysel Xan hewl dide bibêje ku bi pêvajoya dadgehkirinê re li aliyekî êşên wê lê nû bûne, li aliyê din aramtir bûye. Ew dibêje, heta ku dewlet ji van gunehkaran paqij nebe, bawerî wê pê neyê:

> *Piştî ve rûniştina dozê, ji nû ve ev bûn du meh ez nikarim razim... Beriya wê, beriya ku dadgehkirin dest pê bike, bêhtir çîk bû, lê belê dema çûm wir, dema min ew dîtin, ez şok bûm... Ya rastî ez gelekî dixwazim ceza lê were birrîn. Em bibêjin, wî bidin min, bibêjin, 'tu wê çi jê bikî?' Ez wî wisa bi diranên xwe jî tişt bikim, wê dilê min lê xweş nebe. Dilê min xweş nabe, lê heke dadgerî cezayê wan bide, ez wisa dixwazim, ez dixwazim dewlet bide. Min berê nizanîbû kî ye. Min êdî zanî... Ez dixwazim cezayê muebedê lê were birrîn. Jixwe wisa jî bikin dilê min xweş nabe, lê belê dîsa jî ez ê ji dewletê re bibêjim, 'naxwe ev kir', lê heke vê neke, ez gelekî mexdûr dibim... Ez dixwazim ceza li wan were birrîn. Heke ceza li wan were birrîn, belkî ez ê hingê hinekî din karibim bi xew ve biçim... Gelo êşa min sivik dibe, ez pê nizanim, lê ew jî wisa serbest digerin, ev bîst sal in ez her li vê difikirim. Ango, ez dibêjim, van kir, dîsa diçin her tişta xwe dikin. Ez bi vê êşê dijîm, malbata min jî heta hevjînê min jî pê dijî. Ango, çima zarokên min? Heke ez xemgîn bim, ew jî xemgîn in... Wan tiştên pir xirab kirin. Ango ez dibêjim, bila dewlet vê bibîne. Dewlet bila van mirovên xirab bibîne. Ma ne, di nava dewletê de ye, kirasê dewletê li wî ye, lê xirab e, gelekî xirab e... Ez bibêjim, baweriyê bi [dewletê] tînim, na. Dewletê kir, esker bûn. Dema baweriyê jî pê naînim, dibêjim, ma ne em li vir dijîn, ma ne nizanim, çawa mirov baweriyê pê neîne, zarokên me jî diçin eskeriyê. Timî bi wê fikrê, ez dibêjim, bila zarokên min nefret nekin, ji ber wê timî ji bo zarokên xwe... Dixwazim ew werin cezakirin. Ew jî dema hinekî bikevin wir,*

340 Doza behsa wê tê kirin, bi bahaneya "ewlekariya sûcbaran" li bajarekî lli rojavayê Tirkiyeye dewam dike.

*belkî bifikirin 'me çima kir?' Ez dibêjim, bila wê şevê bînin bîra xwe. Serpelek hatibû dadgehê, digot, 'nayê bîra min'.*

Tiştên ku Aysel Xan dibêje, dike ku em li hin têgehên me di beşên beriya niha de minaqeşe kirî ji nû ve bifikirin. Em qismekî ji minaqeşeya di qismê bi navê "bîr" yê Beş II de bi kurtî dubare bikin: Dema ku me li têkiliya di navbera bîr û hizirînê dikola, me gotibû, heke fail eynî weke dema ku sûcê behsa me li ser kirî, dema ku were dadgehkirin jî xwe ji hizirîn û fikirînê dûr bigire û bi vî awayî tercîh bike ku neîne bîra xwe, em ê mafdar bin ku bifikirin ku ew naxwaze ji rewşa hingê ku  ew sûc dikir derkeve, ango ne bi dilê wî ye ku melekeye mihakemeyê ya jihevderxistina qenc û xirabê bi kar bîne. Û eynî mîna Aysel Xanê, ya rastî em ê li bendê bin ku bifikire, bîne bîra xwe, li sûcê xwe mikur were, êşê bikişîne û poşman bibe. Em ê bixwazin ku jiyan ji bo "wan" jî dewam neke, ew jî nikaribin razin; nikaribin razin da ku bifikirin, bifikirin da ku nikaribin razin. Dîsa di Beş II de di qismê bi navê "Rikdarî û xeyd" de me gotibû ku rikdariya Améry ya ku me weke xeydê bi nav kiribû li dijî wê helwêstê bi pêşketiye ku xwe li neqewimîna qirkirinê datîne yan jî xwe li wê datîne weke ku bi qirkirinê re rûbirûbûn pêk hatibe. Améry berevajî mirovên normal ên ku berê xwe dane siberojê, qebûl dikir ku mirovên weke wê di nava rikdariyê/xeydê de ne, timî dixwazin vegerin, demê bi paş ve vegerînin, ya ku nabe bi paş ve were vegerandin bi paş ve vegerînin. Jibîrkirina di nava civakê de asteng e ku yên saxmayî û mexdûr bi yên din re "di nava heman zemanî de" bijîn. Di vî halî de, têgihiştina edaleta cezaker a bi awayekî bi sihet dixebite, bi rengê ku azadî û mafên fail lê qedexe bike, dibe ku bi kêra wê yekê were ku hesta rikdariyê û daxwaza tolhildanê ya mexdûr a ku rewa tê dîtin, aş bike.

Li aliyê din, herçî Yildiz Xan e ku em li Wanê pê re peyivîn, tevî ku dibêje, "Yê ku gotî here wî bikuje sûcdar ew e... bila bikevin hepsê. Yên ew kuştî wê mecbûr cezayê xwe bikişînin", lê belê difikire ku êdî pir dereng e ji bo ku mirov van pirsan hemûyan bike yan jî li bersivên van pirsan hemûyan bigere: "Di roja xwe de derketa, her tişt wê bihata kirin. Her kesî wê îfade li ser bidaya. Îro bi xwe bîst sal di ser re derbas bûne. Ji nû ve mirov biçe dadgehan, ji nû ve têkoşîn, mirov bibêje, deh salan bila bikevin girtîgehê de. Êdî çû. Ew êdî çû... Ev bîst sal in ku hatiye kuştin... yê çûyî çû, deh salan bixin hepsê wê çi bibe." Dema mirov tiştên din ên Yildiz Xanê gotî jî ji ber çavan bigire, mirov dikare bibêje, belkî ji ber ku hîna jî ditirse wisa dipeyive: "Na welehî. Wisa, bila dernekeve holê... Pê re fitne heye, bela heye... Welehî, ez dibêjim, bila tu tişt nebe. Bila serê zarokên min nekeve belayê, bila di belayê de nemînin. Bila em li mala xwe bin û ew jî li ya xwe. Ya çûyî çû êdî."

***Rabûna li ber vê fikrê: Bêcezamayîn, kêmkirina ceza, tezmînata madî***

Nexebitîna bi awayekî baş a sîstema hiqûqê ya li Tirkiyeyê heyî, zehmet dike ku mirov têgihistina edaletê bi hiqûqa ceza ya modern re têkildar bike. Li aliyê din, çawa ku me di Beş II de behsa wê kir, heke em bînin bîra xwe ku Arendt ev gunehên ku weke "xirabiya radîkal" tên terîfkirin, weke gunehên ku li vê dinyayê nikarin werin cezakirin, bi tenê "mirov dikare wan hewaleyê roja qiyametê bike" dibîne, hingê em dikarin bibêjin, sîstemeke îdeal a hiqûqa cezayî jî wê kafî nebe ji bo van sûcên em behsa wan dikin. Dîsa jî tişta ku li vê dinyayê dike ku jiyana "bi hev re" ya "di nava mirovan de" mimkun be, divê ku ew be ku mirov bifikire ku ji bo parastina hesta edaletê, zindîhiştina wê û selihandina wê hîna tiştên werin kirin, hene. Jixwe, beşeke mezin a kesên ku em bi wan re peyivîn, bal kişandin ser mexdûrbûn û bêedaletiyekê ku cezakirina wê kafî nîne, lê belê difikirin ku cezayê hepsa muebed divê li fail û berpirsiyar were birrîn. Ya rastî ne ku cezakirinê kêm dibînin, ew cezakirineke bêyî pêvajoyên mîna derketina holê ya heqîqetan, xwestinalêborînê, çareserkirina pirsgirêka Kurd, pêkanîna aştiyê ne kafî dinirxînin. Me karî li fikra sîhûyek kesan bipirsin di biwara pêşniyara di berdêla mikurhatina li sûcên kirî ya fail û berpirsiyaran û gotina heqîqetan, kêmkirina ceza yan jî bêcezahiştinê de; ji van bi tenê çaran bersiva "erê" da, ev jî nîşan dide ku cezakirin girîng û watedar tê dîtin. [341]

Weke mînak Cemile Xana ku li Mûşê em pê re peyivîn, li ser mijara kêmkirina cezayê failan di berdêla mikurhatinê de dibêje, "fikra min ew e ku nabe ev were qebûlkirin", lê bêlê kurê Cemile Xanê, Ekrem Beg dibêje, "niha mirov li vê yekê bifikire jî ev wijdanê mirovî diêşîne.. Ango mirov nikare xwe li vê ragire. Nabe ku mirov li ber çavan bigire, bîne bîra xwe".

Adem Begê li Colemêrgê em pê re peyivîn bi xwe, dibêje, ne bi tenê mikurhatin, lê belê di berdêla aşkerebûna zincîra ferman-birêverberiyê de ku em dikarin navê heqîqetê lê bikin, mimkun e pêşniyareke bi vî rengî were qebûlkirin:

> *Na, bi ya min divê [ceza] neyê kêmkirin. Axirî, van zilaman bi zanîn sûc kiriye. Êdî piştî vê wê rabin, lê mikur werin, ê baş e, bila navê berpirsiyarê esas bibêjin. Berpirsiyarê li herî jor kî ye?... Hingê cezayê wan hindik be jî dikare were sivikkirin, lê belê yên li jor wê esas bên cezakirin. Lewma kê ferman dabe ya rastî divê ew were cezakirin.*

---

341 Pirsa li ser kêmkirina ceza di berdêla mikurhatin û heqîqetê de me li hevpeyvînên xwe zêde kir ji ber daxwaza parêzerên Baroya Diyarbekirê yên ku li gorî wan îhtîmal bû ku siberojê pêşniyareke bi vî rengî bikeve rojevê.

Dayika Adem Beg, Zuleyha Xan, ji ber ku pêşniyareke bi vî rengî weke "efû" şîrove kir vê bersivê dide: "Ez li wan qet nabihurim. Derdê min pir giran e, stûna navmala min birin."

Jinên ku dilê wan ev pêşniyar ranedigirt, bi piranî giranî û mezinayiya êşên xwe îfade dikirin. Hediye Xana ku em li Şirnexê pê re peyivîn, dibêje, "Welehî, ez qebûl nakim... heta ku êşa min kişandî tê bîra min ez qebûl nakim... Bila ji heqê wan bêhtir ceza li wan bibirrin. Hikûmet bîst salan ceza bide, ez ê çil salan bidim". Herçî xwezûrê Hediye Xanê, Davut Beg e, difikire ku ev pêşniyar ne adil in: "Ev neheqî ye. Xwedê jî vê qebûl nake, tu kes qebûl nake. Divê ew tevahiya jiyana xwe di hepsê de bimînin."

Meryem Xana ku em her weha li Şirnexê pê re peyivîn, dibêje, "Na, bila dayika wan jî bişewite... Ez gelekî êşiyam. Hinavên min pir dişewitin." Xwezûrê Meryem Xanê, Ehmet Beg jî weha rave dike ku mikurhatin û heqîqet ferz nakim ku ceza were kêmkirin: "Na, em qebûl nakin. Jixwe em dizanin tiştên wan kirî, em jixwe dizanin, diyar e jixwe. Ma wê li çi mikur werin?"

Rabia Xana ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn, dibêje, "Na welehî... Ji bo min pir zehmet e, ez qebûl nakim". Birayê wê Hasan Beg jî weha behsa wê yekê dike ka çima nikare vê pêşniyarê qebûl bike: "... kezeba min wê bêhtir bişewite, ez ê bêhtir bimirim". Li gorî Nesime Xana ku em her weha li Diyarbekirê pê re peyivîn, pêşniyareke bi vî rengî ne elaqedar e bi mezinahî û çawaniya sûc re: "Welehî bila tam bikşînin. Tişta wan bi me kirî kafiran jî bi me nekiriye... Ez dibêjim bila tam bikişînin, wan bi saxî şewitand, kirin xwelî." Kurê Nesime Xan, Nimet Beg jî wateya siyasî ya ku ev pêşniyar ji bo wan îfade dike, weha rave dike:

> *Pêşnûma qanûneke bi vî rengî, hingê ev li hev dikin. Em pişta perdê nabînin... Vê pêşnûma qanûnê li gorî xwe çêdikin. Ango tiştekî ku mirovên me rehet bike nîne... Li gorî xwe, ji bo zilamên xwe ji girtîgehê xilas bikin, ji bo ku kesên ji wan re kar dikin, yên ferman dayî wan, mirovên ku ev komkujî bi serê mirovan de anîn, derxin derve ji xwe re qanûnekê derdixin. Qanûneke li gorî me nîne li vir.*

Abdulselam Begê ku li Mêrdînê em pê re peyivîn jî weke Nimet Beg difikire: "Tiştekî di navbera wan û dewletê de ye. Çavên xwe digirin li wan kesên ku li ser navê dewletê kar dikin... Ev tiştên diqewimin ne li gorî dilê me ne, me diêşînin. Ev neheqî ye." Gulsima Xana ku li Colemêrgê em pê re peyivîn jî difikire ku pêşniyareke bi vî rengî ji aliyê mubadeleyê ve neheqî ye û weha dipeyive: "heke wan cezayê birayê min bi nîvî kiribe, em jî cezayên wan bi nîvî bikin." Şengul Xana ku li Wanê em pê re peyivîn jî bi sedemeke dişibe vê li ber vê pêşniyarê radibe:

*Çima li birayê min cezayê muebedê bibirrin, û li wî nebirrin? Çima îro bi hezaran mirovên mîna birayê min niha hemû girtiyên siyasî ne, ango ne sûcdar, girtiyên siyasî, ango êsîr in, ne sûcdar in, êsîrên şer in, û çima li hemûyan cezayê muebedê dibirrin? Ji bo çi ev mirov radibin van mirovan bi awayekî kêfî, radibin van mirovan li nava kolanê qetil dikin? Çima wê bi cezayêkî kêm xilas bibin? Ez vê qet qebûl nakim.*

Herçî Fatma Xana ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn e, tesîra jêvegerîner a ceza der dixe pêş û bersiva neerênî dide vê pêşniyarê:

*Ya rastî, min dixwest li xwe mikur werin. Lê, ez naxwazim welê ceza jî were kêmkirin. Lewma tişteke weha jî divê, ango ev divê ji hinan re bibe ders. Ango ji bo ji niha û şûn ve. Jêvegerîneriya ceza li vir girîng e. Ango di vê mijarê de welê ye. Divê ev bibe ders. Ji bo ji niha û şûn ve mirov evqasî êşê û zehmetiyê nekişinîn... Mirov bibîne ku encam ev e, ango qet nebe hingê mirov wê vê bibînin. [Ew ê bifikirin] 'Em çi qasî êşê bidin mirovan helbet wê berdêleke vê hebe. Ji ber vê jî divê em îro ji serî ve, carekê, pir bêhtir adil bin'.*

Azize Xana ku em li Şirnexê pê re peyivîn, dibêje, ew nikare bi awayekî ferazî bersivê bide pêşniyareke bi vî rengî, bi tenê li gorî şertên darîçav ên hingê dikare biryarê bide: "Ka bila bên, ez rûyê wan bibînim. Ka bê rûyekî çawa ye, ka mêrkuj in, ka çawa ne? Mirovên wisa kirî jixwe mêrkuj in, lê çima ev kirin? Çi biryar dan û wisa kirin? Ango ev biryar, biryareke gelekî mezin e, tişta tu behsa wê dikî biryareke zehmet e. Zehmet e mirov vê biryarê ji dehma ve bide."

Şukriye Xana ku li Mêrdînê em pê re peyivîn, ji wan kesan e ku difikire ku mirov dikare bersiveke erênî bide pêşniyarê. Lê belê dixwaze piştrast be ku heqîqet bi temamî hatine aşkerekirin:

*Xwedê heye, ji bo Xwedê, ji bo mirovahiyê tu wê bibêjî. Rehma te heye, tu mirov î... Lê belê ev bi tehlûke ye. Heke kesek bi qasî wî zalim be, divê ev jî were gotin, ma ne wisa ye? Heke insanetî heye, rehm heye, te ji bo çi ev mirov qetil kirin? ... Tu hikûmet î. Ma çi heqê te heye ku tu zarokên ku mirovan bi birçîbûn û xizaniyê mezin kirî bikujî?*

Nihat Begê ku em li Bedlîsê pê re peyivîn dibêje, ew ê pêşniyareke wisa erê bike; ew sedemên xwe jî wisa rave dike: "Helbet. 'di dawiyê de me ev kar kir', piştî ku ev yek wisa qebûl kirin, xwe bi xwe, bi xwe re rûbirû bûn... niha muebed ne çareya derdê min e yan jî ne çareya derdê malbata min e jî." Idris Begê ku em li Batmanê pê re peyivîn, ji ber sedemên dişibin van, bi awayekî erênî bersivê dide vê pêşniyarê: "Welehî bi sedhezaran mirov hene weke min, heke ew hemû qebûl dikin... Ez bi xwe nizanim, ez nikarim bibim bi qasî wan. Ez ê rûmeta mi-

rovan qet û qet nexim bin piyan. Ji ber ku wan ev hovîtî kiriye, em ê jî rabin wê hovîtiyê nekin... em ê pê razî bibin [ku hindiktir ceza li wan were birrîn]."

Eşref Begê ji Wanê yê ku em li Stenbolê pê re peyivîn, -berevajî xwîşka xwe Şengul Xanê ya ku neerênî li pêşniyara kêmkirina ceza dinihêrî - dibêje, ew ê bêyî dudilî pêşniyareke bi vî rengî erê bike, û derdên ku pêkanîneke bi vî rengî ji wan re bibe derman jî weha rave dike:

Em ê pêşî bibêjin, bila ev [pêşniyar] derkeve, ji bo wê em ê çîk bikin... Niha, mesela gelek tişt qewimîn, hûn bibêjin, ango mirov wenda ne... Mirov doza hestûyên xwîşk, bira, bav, apê xwe dikin. Heke der barê vê yekê de mikurhatineke ji dil be, ango dawiya dawî mirov e, hebûneke civakî ye, dibe ku her şêwaz guherîn û veguherîn li cem wî peyde bibin, ango di şert û mercên wê rojê de tu wê wisa di vê bigihîjî, ha, heke ew ji dil be tu jî dê tetmîn bibî. Bawer bike wisa ye.

Jina birayê Eşref Begê hatî kuştin, Sînem Xan bi xwe pêşî li ber vê pêşniyarê radibe, lê belê paşê ji bo ku vê pêşniyarê qebûl bike, şertekî datîne:

> *Na welehî ez qebûl nakim. Ez qebûl nakim. Cezayê wî çi be divê bikişîne... Divê cezayê wî lê were birrîn. Ez naxwazim cezayê wan were kêmkirin, erê welleh... Tu dizanî, ez ê çawa qebûl bikim? Heke ez ê qebûl bikim jî ji bo ku mirovên me û ciwanên me nemirin, bila efûyekê derêxin, bila ciwan ji çiyê werin û êdî xwîn nerije. Di vê rewşê de heke wê aştî pêk were, ez jî, ez ê ve ji bo mirovên me qebûl bikim.*

Ya rastî, kesên ku em bi wan re peyivîn gelek caran gotin, pêkanînên bêcezamayînê yan jî kêmkirina ceza ne di berdêla mikurhatin û heqîqetê de yan jî ne bi tenê bi heqîqetê re heke pê re jestên siyasî yên mîna xwestinalêborînê ya fermî û çawa ku timî tê gotin, çareseriya "aştiyane û demokratîk" a pirsgirêka Kurd jî hebe, dikare were rojevê.

Di bersivên di biwara tezmînata madî de jî yên ku derdikevin pêş heman tişt in. Em serê pêşî bibêjin, di wan dozan de ku heta niha destpêkirî, lê belê bi dadgehkirin yan jî mehkûmkirina fail yan jî berpirsiyar bi encam nebûne, ne mimkun e ku pereyên dayî mexdûrên dozdar weke "tezmînata madî" were dîtin ya ku me di peywenda rûbirûbûna bi rabihuriyê re behsa wê kir. ya ku em fêm dikin ew e, ev dayîna tezmînatan pêk tê dema ku îfadeya dibêje, fail û berpirsiyar PKK ne tê mohrkirin. Dibe ku ji ber vê sedemê be ku daxwaza tezmînata madî ya wan kesan dewam dike ku pereyên pêşniyarî wan hatin kirin yan jî tezmînata heq kirin, ji ber ku weke "pereyê lihevkirinê", "pereyê lihevhatinê" yan jî "heqê xwînê" dîtin red kirin, hinek ji wanên ku pere qebûl

kirin jî daxwaza wan a madî dewam dike. Em li vir li gotinên xwe zêde bikin ku daxwaza tezmînatê bi tenê ji bo wan kesan veguheriye rojeveke bi rastî ku piştî ku xizmên xwe ji dest dan zehmetiyên wan ên madî çêbûn û hîna jî ev zehmetiyên wan dewam dikin. Li aliyê din, bi awayekî giştî yên ku doza tezmînatê dikin, balê dikşînin ser giringiya hem mîqdara tezmînatê û hem jî uslûba wê, ya rastî balê dikşînin ser verastkirinên hiqûqî û siyasî yên ku divê pê re hebin ên weke derxistina holê ya heqîqetan, Darizandina fail û berpirsiyaran, xwestinalêborînê ji wan bi xwe û çareserkirina pirsgirêka Kurd bi awayekî demokratîk. Yan ji ber ku beriya niha pere li wan hatine dayîn, yan ji ber ku seyra sohbetê destûr neda yan jî ji ber ku ne bi dilê wan bû yan jî ne ehlê meselê bûn, em di biwara tezmînata madî de bi bîstûşeş kesan re nepeyivîn. Em li vir bibêjin, ji sîh kesên em bi wan re peyivîn heştan tezmînata madî bi temamî red kir, herçî bîstûdiuyên mayî ne - bi şertê ku tevî daxwazên verastkirinên siyasî û hiqûqî be - daxwaza wan a tezmînatê heye.

Ramazan Begê ku li Şirnexê em pê re peyivîn, daxwaza xwe ya tezmînata madî îfade dike, tevî vê jî îşaret bi hesabekî dike ku wê bi tezmînatê neyê girtin: "Daxwaza min a tezmînata madî û watewî heye. Evqas tiştên giran bi serê me de hatin. Helbet em ê vê bixwazin. Lê belê wateya daxwaza vê yekê sedema kuştina evqas mirovan ji holê ranake." Endîşeya wî heye ku heke tezmînat were standin wê ser heqîqetan were girtin û bêedaletiya di bingeha mexdûrbûna wan de wê ji holê neyê rakirin: "Divê pirsgirêka Kurd were çareserkirin Em ji ber vê yekê hatin kuştin." Biraziyê Ramazan Beg, Ahmet Beg jî çêl li wê yekê dike ku bi tenê bi tezmînatê nabe ku aştî pêk were: "Tezmînata madî filan, jixwe serê pêşî hat, me ranehiştiyê... Ew pereyê lihevkirinê bûn. Wan gelekî li ber da, lê me çîk nekir. Ango em ê bixwazin kesê kirî were dadgehkirin." Necmettin Begê birayê wî yê mezin hatî kuştin ê ku li Bedlîsê em pê re peyivîn rave dike ka çima pereyê hatî dayîn qebûl nekirine û ka çima divê tezmînat were dayîn:

> *Çîka wê bi pereyan nayê pîvan lê belê madem dewletê tiştekî wisa kiriye, divê berdêla wê jî bide... qet nebe zarokên wî, malbata wî bigihîjin xweşiyekê. Ango ne çîk e, ne çîka pereyan e, ango sed, sedûpêncîh milyar ne bedenek in... Ew belgeyek e ku nîşan dide dewlet sûcdar e... lê belê kêmbûna mîqdara tezmînatê hingê jî bi mirovî wisa çîk tê... tiştek e ku rûmetê dişkîne.*

Kurê birayê hatî kuştin ê Necmettin Beg, Nihat Beg bi xwe, tevî ku dibêje, tezmînat wê bi tu awayî mexdûrbûna wan bi dawî neke jî, behsa wan mexdûrbûnan dike ku dikarin bibin sedemên doza tezmînatê:

*... bi rastî, ez panzdeh salî, çardeh salî, tevahiya berpirsiyariya malê kete ser milên min. Şeş xwîşk û birayên min hene. Dayika min heye. Bapîrê min ez ji dibistana min girtim. Tevî ku ez li dibistanê gelekî serketî jî bûm... di warê watewî de tu kes qet û qet nikare zerara me tezmîn bike, qet. Ne em, tu malbat... tu malbat di warê watewî de, dîsa jî nikarin pereyên vê çîkê bidin. Man û nemana wê, jiyana wê nikare bi pereyan tezmîn bike.*

Ferya Xana ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn, dibêje, ew ne li dijî daxwaza tezmînatê ya malbata xwe ye, dema vê dike jî tiştên ku tezmînat nikare telafî bike jî dike rêz:

*Niha dozek heye pêk tê... Ya rastî ew ne bi riza min jî bû. Bi tenê ji ber berhêlîkirina derdorê... vegera wê ya madî wê tu tişta min, ne rûxiyana min û xwîşk û birayên min, ne malbata min a ji hev belavbûyî, ne dayika min a min ji dest dayî, ne bavê min, tu tiştî paş ve naîne. Ev bi min weke heqaretê ye, lê belê bi tenê ji ber berhêlîkirina derdorê... armanca min bi qebûlkirina wê jî jixwe paşê em li ya ku heqê me ye, ji aliyên siyasî ve, mesela bi rêya hiqûqê bigerin, bi vê wateyê me doz da destpêkirin.*

Mehdi Beg jî weke Necmettin Beg dayîna pereyan qebûl nekiriye, em bi wî re li Batmanê peyivîn û ew têkoşîna hiqûqî ya ku Ferya Xanê derxist pêş, parve dike:

*Na, ez ne alîgirê tezmînata madî me. Ew sêzdeh milyarên me standî jî, min îtîrazî parêzer kir... Ango heqê xwînê bûn, ne lihevhatin bû... bi vî rengî em vê heq dikin. Ji bo ku hiqûq bi cih bibe, çerxa wê bigere... em vê dixwazin û herçî pere ne, divê ev doz bi pere û madiyatê ve neyê girêdan... Ji bo me ango ji bo Kurdan bicihbûna hiqûqê ango li cem aboriyê hiqûq jî bixebite pir girîng e. Temam, di warê pereyan de, herçî abor e em ketin, lê têkoşîna me jixwe hiqûq e... [Ev ê nîşan bide ku] Huqûq gelekî girîng e û ev, ev hovîtî, ev zilm di qeydiyên fermî de were belgekirin.*

Idris Begê ku em her weha li Batmanê pê re peyivîn jî pêşî behsa zehmetiyên madî yên piştî kuştina bavê xwe, û behsa daxwazên xwe yên li ser Darizandina fail û berpirsiyaran dike, piştre bi yek hevokê bersiva pirsa me dide ku pê daxwaza tezmînata madî şerh dike: “her tişt ne tezmînata madî ye.”

Nimet Begê ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn jî piştî ku weke Idris Beg dibêje, “her tişt ne madî ye jî”, bi bîr dixe ku her tişt madî bûya jî, li naverastê mexdûrbûnek heye ku nikare were hesabkirin:

*Helbet divê tezmînata madî were dayîn. Dawiya dawî, tu kargehekê û [xwediyê wê] bixwe dişewitînî. Li vir çardeh zarokan tu sêwî dihêlî. Tu van ji dibistana wan dikî. Ji perwerdeyê dihêlî. Ji sihetê dihêlî. Jixwe ev hemû, her*

*yekî tezmînatek in... Tu psîkolojiya zaroka panzdeh salî xira dikî. Siheta wî namîne... Mesela, em bibêjin ev bîstûdu sal in, ew kargeha min ji dest min çû. Tu xebitîna wan li salan hesab bikî, ji trîlyonan dibihure.*

Hêviya birayê Nimet Beg, Ozkan Beg jî "pirsîna li hal" e ku wê tevî tezmînata madî were:

*Hêviya min ji dewletê, ew e ku ev mirov çîk bibin, cezayê wan li wan were birrîn û mexdurbûna van mirovan were tezmînkirin. Lewma van mirovan bi rastî jî gelek [êş û zehmetî] kişandin. Ma ne te ev yek kir. Piştî vê kirinê, ka çi bi vê malbatê hat, rewşa wê bû çi, çawa bû? Weke dewlet, dewletê diviyabû wezîfeya xwe bikira... ne bi tenê em, li hemû malbatan, diviyabû piştgiriya hemûyan bikira... Ji bo tezmînkirina mexdûrbûnan divê tezmînat were dayîn.*

Herçî Aysel Xan e ku em li Mûşê pê re peyivîn, îşaret pê dike ku di wê rewşê de ku fail û berpirsiyar nayên cezakirin, ew ê li ber dana tezmînatê rabe: "Welehî ez herduyan jî dixwazim. Dewletê hem ev bi min kir. Ev bîst sal in ez vê dikişînim. Jixwe êdî madî bide jî tu fêda wê li min nîne. Ji bo zarokên xwe dixwazim... ez pêşî dixwazim ew werin cezakirin."

Ji jinên em bi wan re peyivî, yên ku doza tezmînatê kir, ev daxwaz bi piranî bi zarokên xwe yên li pey [yê jidestdayî] mayî têkildar dikin.Yildiz Xana ku li Wanê em pê re peyivîn jî ji bo zarokên xwe doza tezmînatê dike: "Welehî ji bo zarokên min tezmînat derkeve baş e. Tezmînat, alîkarî ji bo wan derkeve baş e." Mizgin Xana ku li Nisêbînê em pê re peyivîn jî li keseke din difikire ku li pey [yê jidestdayî] maye: "Ji bo dayika xwe ez dixwazim. Ew tezmînat jixwe nikare tiştekî bi paş ve bîne. Ji bo dayika xwe dixwazim, ji bo dayika xwe jî, ew guneh e. Ne mûçeyekî wê heye, tu tiştî wê nîne feqîrê."

Fatma Xana ku em li Diyarbekirê pê re pêyivîn, şexsê malbata xwe nexe nav jî, malbatên din ên ku hîna zehmetiyên wan ên madî hene, ji ber zehmetiyên madî zerarên insanî li wan bûyî û berpirsiyariya dewletê di van zerarên navbirî de jî hesab dike û dibêje, divê tezmînata madî were dayîn:

*Divê ev hebe. Çima divê hebe? Lewma mirov ji ber vê yekê bi rastî jî timî li paş man. Ango, heman zehmetî gelekî hatin serê me jî... Dewlet divê bi misogerî bide... ê me bi xwe, şikir me ked û xwêdana xwe, bi kotekî hin tişt kirin. Ez vê zêde naxwazim, lê gelek mirov hene û hewceyê wê ne. Ango, gelek êş hat kişandin. Li nêzî min mirovên ku zarokên wan ji birçîna mirin çêbûn... Ma dibe ku mirov ji birçîna bimire? Di civaka me de gelek mirov ji birçîna mirin. Divê ev jî bi awayekî, ango helbet ev ne bi temamî telefîkirina hin tiştan e, lê belê hindikekî be jî divê dewlet rehet bike wan.*

Hasan Begê ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn, tevî ku pêşî dibêje, “di dilê min de pere filan nîne” jî behsa zehmetiyên hatî serê wan ên mîna wanên Fatma Xanê terîfkirî dike û bi vî awayî doza tezmînata madî bi sedem dike:

*Ez dixwazim. Destê min şikest. Ez seqet mam. Du kurê min li metropolê ji ber ku gotin, em Kurd in, kêr kirin. Zarokên min seqet in. Milê herdu kurên min kêr kirin. Seqet in. Ez dixwazim. Ez mafê xwe dixwazim. Ev bîstûpênc sal in ez ji gundê xwe derketime. Ez doza mafê xwe dikim. Heke heqê min jî heq e, ez doza heqê xwe dikim. Ji bo birayê xwe jî dixwazim.*

Davut Begê malbata wî hatî qetilkirin, ê ku em li Şirnexê pê re peyivîn doza tezmînatê bike jî, îşaret bi wan nerehetiyan dike ku pêkanîna tezmînata xweser ji tedbîrên hiqûqî û siyasî wê rê li ber wan veke: “Doza min a tezmînata madî heye, lê belê tevahiya mal û milkê Tirkiyeyê bidin min jî wijdanê min rehet nabe.” Bi wî rengî ku bûka Davut Beg, Azize Xan bawer dike ku doza tezmînata madî ya xwezûrê wê nîne; ew jî îşaret bi barê wijdanî yê standina tezmînatê dike: “xwezûrê min naxwaze... Em ê bistînin û li deverekê bibexşînin... Ango, wisa dibe weke ku mirov xwînê bistîne. Naxwazim bistînim.” Ya rastî endîşeya Azize Xan û yên din weke hev e: Gelek kes endîşe dikin, heke ku tezmînat were qebûlkirin, ser rastiyan wê were girtin û di meseleya Kurd de çaresernekirin wê dewam bike, ya ji vê jî rasttir, ew endîşe dikin ku têkoşîna bû sedema ku xizmên xwe ji dest bidin wê bê encam bimîne. Bi awayekî din mirov bibêje, li ber wê yekê radibin ku mirin werin bêwatekirin û metakirin. Bûyera ku weke “komkujiya Roboskiyê” tê zanîn, weke mînakeke ji dema nêz a ku bingeh e ji bo vê îtîrazê, di hevpeyvînên me de gelek caran behsa wê tê kirin. Êvara 28’ê Kanûna 2011’an di encama bombebarankirina Hêzên Hewayî yên Tirk de li navçeya Şirnexê Qilabanê, 28 jê ji heman malbatê 34 kesên ji gundên Roboskî û Bujehê jiyana xwe ji dest da; piştî vê hikûmetê tezmînat da malbatên xizmên xwe ji dest dayî, malbatan ev tezmînat bi sedema ku ew “ne pere lê edaletê” dixwazin, qebûl nekiribû[342]. Mukaddes Xana ku li Mûşê em pê re peyivîn, ji bo ku îtîraza xwe rave bike, behsa reda malbatên ji Roboskiyê dike:

*Bi rastî, ez li ser navê xwe dibêjim. Ez naxwazim. Lewma tu tişt wê şûna wî negire... Ango çi bidin li ber çavên me ne tu tişt e... Lewma, ma ne, dawiya dawî dewlet wisa dinihêre; em ê rahêjinê, bibin, bikujin, pereyê wê jî bidin û ew jî*

342 Ji bo agahiyên kronolojîk ên di biwara Komkujiya Roboskiyê binihêre li http://www.bianet.org/bianet/toplum/152440-kronoloji-roboski-katliami-nin-uzerinden-iki-yil-gecti [24’ê Çiriya Paşîna 2014’an]. Di biwara liberrabûna malbatan de ji bo nûçeyeke elaqedar binihêre li http://www.zaman.com.tr/gundem_uludereli-aileler-tazminata-el-surmedi_2189504.html [24’ê Çiriya Paşîn a 2014’an].

*wê li cihê xwe rûnin... Lewma ew bi mentiqê pereyan lê dinihêrin... Mesela di bûyera Roboskiyê de 'em ê evqas pere bidin malbatan, jixwe mesele wê xilas bibe, biçe'. Di encamê de tu çi qas pereyan bidî, çi qasî çîk bikî, ew êş nadebire, tu çi bikî ew êş nadebire.*

Yasemin Xana ku li Mêrdînê em pê re peyivîn, bi bîr dixe ku ya ku em behsa wê dikin, jidestdanek e ku tezmînata madî nikare telafî bike: "Ma wê mêl bide? Pereyan bide? Zêran bide? Dinyayê bide? Birayê me bi paş ve naîne. Em van naxwazin." Bavê Yasemin Xan, Abdulselam Beg jî mijara tezmînata madî ne weke tedbîrek yan jî gerîneke li heq a ji bo selihandina têkiliya di navbera welatî û dewletê de dibîne: "...ti elaqeya me bi tezmînata wan re nîne, em ranahêjin pereyên wan."

Yên ku dibêjin, bêyî tedbîrên hiqûqî û siyasî yên ku me behsa wan kir, tezmînata madî mexdûriyetan tezmîn nake, êşan kêm nake, îşaret bi wê yekê dikin ku ya rastî heke ev tedbîr werin girtin, mijara tezmînata madî jî wê êdî li rojevê nemîne. Sinem Xana ku li Wanê em pê re peyivîn, van tiştan dibêje: "Tezmînat? Bila dijminên me derêxin meydanê, bila bibêjin çima hat kuştin, bila bibêjin çima wisa kirin, ez vê dixwazim. Tiştekî din em naxwazin." Xwîşka hevjînê kuştî yê Sinem Xanê, Şengul Xan jî bi rengekî weke wê dipeyive: "Ma em ê çi ji doza tezmînata madî bikin? Em doza tezmînata madî naxwazin, derdê me ne tezmînat e jî, ev ne tiştek e ku me qanih bike, tetmîn bike."

Irfan Begê ku li Colemêrgê em pê re peyivîn, pereyên dayî wan weke tezmînatê bi nav nake û hîna weke gelek kesên ku li xizmên xwe digerin, bi israr e ku daxwaza wan ne tezmînat e: Ma em ê çi ji tezmînatê bikin? Em mirovan bi pereyan naxwazin. Me bi tenê doza hestûyan kir..." Ji bo xwîşka mezin a Irfan Beg, Gulsima Xanê wateya tezmînatê guhertiye: "Na welehî, em tezmînatê qebûl nakin. Li cem me Kurdan tezmînat ew e ku em doza heqê xwe xwêdana xwe dikin. Ev tezmînata me ye. Ma ez ê doza çi tezmînatê bikin? Bila cihê me warê me bide me." Ya rastî yên ku doza tezmînatê nakin, şertên yên qebûl dikin, bi awayekî sergirtî erê dikin; îfadeyên ku gotinên Abdulkerim Begê ku li Mûşê em pê re peyivîn, dikarin nûneriya wan bikin, bi kar tînin: "jidestdana madî ji bo me ne gelekî diyarker e, êşên hatî serê me ji bo me girîngtir in... Heke meselya Kurd bi rêyên aştiyane û demokratîk çareser bibe, pêşî wê êşa me kêm bibe, ya diduyê em ê bifikirin ku ji niha û pê ve em ê nebin qurbaniyê kuştinên fail nediyar."

Çawa ku li qismê "Mafê Heqîqetê" yê Beş I'ê jî me behsa wê kiribû, heta ku neyê qebûlkirin ku kirinên navbirî ne qezayek yan jî şaşiyek in, lê belê sûc

in, heta ku berpirsiyariya sûc neyê qebûlkirin û heta ku bi niyeta pêkanîna edaletê neyê meşîn, mîqdara tê pêşniyarkirin çi qasî mezin be bila mezin be, tezmînata madî watedar xuya nake. Heta di warê wan zeraran de ku gelek kesên êm bi wan re peyivî jî îfade kirin, yên ku tu tezmînata madî nikare cihê wan dagire, biselihîne, mirov dikare bibêje ku tedbîrên tezmînatê yên ku weke sembolîk tên binavkirin watedartir in û damezrîner in. Bi vê wateyê, li cih e heke em Walker bînin bîra xwe, ew dibêje, derxistina holê ya heqîqetan hem şertekî bivênevê yê tedbîrên tezmînatê ye û hem jî hêmana damezrîner e ku tezmînatê dike tezmînat.[343] Walker îdîa dikir ku derxistina holê ya heqîqetan bi tena serê xwe jî di hin rewşan de dikare weke kirinene tezmînê were hesibandin. Ya ku dikare pêşengiyê li pêkanînên hiqûqa cezaî bike û dayîna tezmînatên madî watedar bike, ji bilî aliyê têkiliyên civakî yên zerar li wanbûyî, di warê têkiliya dewlet-welatî de jî pêvajoya derxistina holê ya heqîqetan xwedî xisleta selihandinê û temînatekê ye di biwara dubarenebûna qewmînan de. Xwestinalêborîna fermî ya ku tê hêvî kirin bi vê pêvajoye re bimeşe jî temînateke bi heman rengî ya "careke din qet na" ye. Temînata aştiya mayînde jî, weke çareserkirina meseleya siyasî tê dîtin ku di bingehê bêedaletiyê de ye, ango weke bicihanîna daxwazên heq tê dîtin. Em ragihînin ka ev daxwaz û hêviyên bi heman rengî çawa tên îfadekirin.

### *Daxwaza edaleta selihandinê: Qebûlkirina heqîqetan, gor,lêborîn*

Daxwaza derxistina holê ya heqîqetan, kêm caran xweber tê rojevê, ya rastî, divê em bibêjin, ne daxwazek e ku ji aliyên malbatên xizmên wan bi darê zorê nehatî wendakirin, nexasim tê îfade kirin. Sedema vê jî ew e ku ji bilî yên ku dixwazin qet nebe goreke xizmên wan hebe, ji bo mexdûran em ne li wê dinyayê ne ku heqîqet divê lê werin aşkerekirin, lê belê li wê dinyayê ne ku heqîqet divê fermî lê werin qebûlkirin. Di qisma "Komîsyonên Heqîqetê" ya Beş II de jî me gotibû, fonksiyona herî girîng a komîsyonên heqîqetê jî esas ronîkirina vê dinyayê ye, ango pêşîgirtina li bêqîmetkirin û înkarkirina ezmûnên mexdûran e, "tengkirina menzîla derewên dikarin werin qebûlkirin" e.[344] Bi vê awirê mirov li mijarê binihêre, çawa ku me di qismê beriya niha de got, mirov daxwazên elaqedarî dîtin û hesabpirsîna ji fail û berpirsiyaran jî li bîra xwe bigire, hingê em dikarin daxwaza herî girîng a kesên em bi wan re peyivîn weke "qebûlkirina heqîqetan" terîf bikin. Ji bo kesên ku ev bi salan e dixwazin bi aqûbeta xizmên xwe zanibin jî helbet heqîqetek heye ku divê hîna

343 Walker, 2010, 530.

344 Binihêre li Bickford, 2007, 999; Ignatieff, 1996, 110.

were aşkerekirin, ya rastî zelûliyek heye ku divê ji holê were rakirin. Mînakeke ku rave dike ka çi qasî girîng e mirov ji heqî vê zelûliyê derkeve di serhatiya du xwîşkan de heye ku ji bo dîtina hestûyên bavê xwe ji Elmanyayê hatin Diyarbekirê; ew bûn mijara qunciknivîsa Nurcan Baysal jî. Herdu xwîşk "Çawa ku li balefirgehê dadikevin, bêr û tevr dikirin", diçin bejahiya bavê wan lê hatî kuştin, heta bi nîvê şevê erdê dikolin û piştre weha dipeyivin:

*Dawiya dawî, karek e ku pir mirov diwestînê, me bi tenê çend parçe kinc dîtin, lê me hestûyên wan kincan nedîtin, ez difikirim ku dibe ku şemitî be, ber bi deverekê ve çûbe. Divê tu her deverî bikolî, dever pir fereh e... Em dibêjin, em detektorekê peyde bikin, li wê meydanê li ku deverê cendekek hebe wê ji me re bibêje. Îro me li detektoran pirsî, dît, lê niha jî em li kesekî dizane bi kar bîne digerin. Dîsa jî hîna 5 rojên me hene li vir, heta em vegerin jî em ê dewam bikin bi bêr û tevr bikolin... Jiyana bi vî awayî pir zehmet e. Van 20 salên dawî belkî yek roja me jî bêyî ku em li bavê xwe bifikirin derbas nebû. Em timî fikirîn ku ew dijî, rojekê mimkun e vegere. Em hestûyên wî bibînin, wî li cihekî xweşik razînin, hem ew ê rehet raze û hem jî em ê rehet razin. Ma tu dikarî lê bifikirî, em bi hestûyên miriyê xwe jî gelekî kêfxweş dibin. Dîtina hestûyên wî wê ewqasî kêfa me bîne ku.*[345]

Mizgin Xana ku li Mêrdînê em pê re peyivîn jî, bi gotinên weke van, behsa wê yekê dike ku zehmet e mirov bi vê zelûliyê bijî:

*... goreke wî hebe, em Fatîhayekê li ser bixwînin, em dibêjin wê dilê me rehet bibûya... Ez bi tenê doza bavê xwe dikim. Çi saxê wî û çi miriyê wî. Ma ez çi ji dewletê bixwazim?... Yek pirsgirêka min heye, ez bavê xwe dixwazim. Çi mirî û çi zindî, hestû jî be em dixwazin. Axa wî jî hebe, em axa wî jî dixwazin. Ango em doza bavê xwe dikin... Di encamê de em sêwî bûn. Kesî li mala me av venedixwar, digotin, sêwî ne. Pir bi me zehmet bû. Me ji xwe re digot, bavê me heye, lê xelkê digot, sêwî. Gorek hebûya me yê bigota, 'bavê me miriye, em sêwî ne'. Gor nîne, ax nîne. Ji xwe re çawa xelk ji me re dibêje, 'sêwî ne'! Dê û bavê gelek kesan dimirin, ji wan re dibêjin, sêwî; lê belê li cem me ew pirsgirêk jî nîne. Gor nîne, ax nîne, tu tişt nîne, dibêjin, 'sêwî ne'. Ev, mesela, çawa dibe?... Niha jî ez dibêjim, filanê testa DNA kiriye. Ez ji xwe re dibêjim, hestûyek jî derkeve dilê me wê xweş û rehet bibe. Di encamê de em ê qet nebe bibêijin, yanî, miriye. Carinan jî dibêjim, bila dernekeve holê ew, êşa me dîsa wê gelekî lê nû bibe. Dudiliya min heye ji vê yekê. Ez dibêjim, derkeve holê, êş wê ji nû ve vede.*

345 Nurcan Baysal, "Biz Ölülerimizin Kemiklerine Bile Çok Seviniyoruz", 7'ê Çiriya Paşin a 2014'an; http://t24.com.tr/yazarlar/nurcan-baysal/biz-olulerimizin-kemiklerine-bile-cok-seviniyoruz,10324 [7'ê Kanûna 2014'an].

Mukaddes Xana ku li Mûşê em pê re peyivîn, li aliyekî dixwaze dawî li zelûliyê were, li aliyê din jî endîşe dike ku êşeke din şûna zelûliyê bigire:

*Bi tenê dîtina bavê min. Dema ez biçim ser gora wî, bila goreke wî hebe. Bi tenê ev. Tiştekî din jî nîne. Bi tenê ev yek wê [dilê min] rehet bike. tu tişta din jî wê sivik neke... Min ê qet nebe doza goreke bavê xwe bikira. Û ne tiştekê din. Ji bo ku dilê dayika min rehet bibe. Ji bo ku êşa wê hinekî din kêm bibe. Niha jî fail nediyar derdikevin, ji malbatan mînakên xwînê distînin, carinan mirov di nava xwe de dibêje, 'xwezî ne ew be' jî. Ji xwe re bifikirin, hûn nikarin li êşa ku wê diya mirov bikişîne bifikirin... Di encamê de hûn pê nizanin ka sax e yan na. Hîna jî hêviya we ev e. Di encamê de testa DNA'yê, tu diçî didî. Çi dizanim li aliyekî tu dibêjî, 'heke ew be'. Em ê çi bikin heke ew be. Hingê jî hesteke din xwe li bedena wê radipêçe.*

Dayika Mukaddes Xanê di biwara vê mijarê de tiştekî nabêje, lê belê birayê wê Ekrem Beg lipêşbûna daxwaza gorê derdixe pêş:

*Ji bo tevahiya gorên komî yên vedibin, em mînakên hestû didin, mînakên DNA'yê didin, li ber hev tên girtin û em destevala vedigerin... Niha, weke mînak tişta ku ez û malbata min herî zêde dixwazin ew e ku qet nebe goreke bavê min hebûya. Qet nebe hestûyek hebûya, gora bavê me hebûya, qet nebe me bizaniya li ku ye; em çi kêm û çi zêde, dikarin texmîn bikin ka di rewşeke çawa de çû; dema em hingê û niha li ber hev digirin, em dikarin texmîn bikin ka çi kişandiye. Em lê serwext dibin. Lê niha em dibêjin, qet nebe bila goreke wî hebe. Hîna jî em li pey wê ne.*

Raziya Xana li Batmanê em çûn serdana wê behsa têkoşîna xwe ya ji bo peydekirina hestûyên kurê xwe ya bêencam dike; ew kurê wê ku mêrê wê êdî qanih bûye ku najî:

*Gotiye, 'ez ji bin ala Tirkiyeyê derneketime, lê heke we kurê min kuştiye jî qet nebe hestûyên wî bidin min., ez hestûyên wî bisipêrim axê, bila bibin sebra min.' Got, 'min ew jî nedît'. Got, welehî min rahişt cil û bergên wî û ez hatim. Ha ji wê rojê ve em lê digerin, lê em nabînin. Em hestûyên wî nabînin. Qet nebe me hestûyên wî bidîtana. Mirov diçin ser gorên miriyên xwe, ser hestûyên wan. Qet nebe hinekî bîhna wan fereh dibe. Me ew hestû jî nedîtin.*

Kurê Raziye Xanê, Nizamettin Beg îşaret bi zehmetiyên watewî û hiqûqî dike ku bêgorbûn û zelûlbûn rê li ber wan vedike; û behsa terîfa xwe ya heqîqetê dike ku em dikarin weke "heqîqeta siyasî" bi nav bikin:

*Heke goreke birayê min hebûya, êşa me qismî jî be wê kêm bibûya. Bifikirin goreke wî jî nîne. Qet nebe, em ê biçûyana û Fatihayek li ser bixwenda. Me*

*yê xêra wî bida. Miriyên me jî nadin me. Birayê min ciwan bû. Bi salan e, em nizanin miriye yan sax e. Gerçî em jê piştrast in ku hatiye kuştin. Lê belê di biwara vê yekê de belgeyeke fermî nîne... Girîng e heqîqet derkevin holê. Lê belê ev mijar jî kafî nîne. Dawiya dawî kuştina van mirovan ne ji ber bûyereke ji rêzê ye... Ji ber meseleya Kurd ev mirov hatin kuştin. Ji bo wê jî divê pirsgirêka Kurd were çareserkirin. Hingê ev mirov jî wê di gorên xwe de rehet razin. Bi ya min heqîqet çareserkirina pirsgirêka Kurd e.*

Gulsima Xana ku em li Colemêrgê çûn serdana wê jî doza goreke ji bo birayê xwe bi rêya ciwanên Kurd, Abdullah Ocalan û têkiliyên dewlet-welatî îfade dike û dema vê dike, mijarê elaqedar dike bi çareseriya pirsgirêka Kurd re:

*Ev bûn 18 sal. Me ne hestû dîtin û ne jî gor...Em doza birayê xwe dikin. Em doza hestûyên birayê xwe dikin... Daxwaza min ji dewletê nîne. Daxwaza min ew e ku, Kurdên me hemû ciwan in. Serokê me ji bo me di zindanê de ye. Em doza hestûyên birayê xwe dikin. Heke Erdogan dibêje, em dewlet in, em jî li dewleta xwe ne. Heke dewleta me ye, bila hestûyên birayê min derêxe holê. Ha tişta ez bibêjim ev e.*

Heke Abdullah Ocalan îşareteke erênî bide, ew ê xwestinalêborînê ya dewletê ji xwe qebûl bike, û heta pêwîst bike ew bi xwe wêlêborîna xwe bixwaze; heke na, dibêje, "Heke bibêjin ezlêborîna xwe dixwazim. Ez vê qebûl nakim":

*Mesela tu serbest hatî mala min. Bila serokê me jî serbest were... Bi saya serê serokê xwe, gerîlayên xwe em îro nanê xwe dixwin. Bêyî ku dijmin hebe em rûdinin. Heke serokê me bibêje ev ji bo me rêyek e, bibêje 'em bi wan re rûniştin, em hatin ser masê. Hemû bibêjin, "ez lêborîna xwe dixwazim" ' em ê bibêjin.*

Gulsima Xan dibêje, bi şertê azadî û daxwuyaniya Ocalan ew ê daxwazalêborînê qebûl bike; ev tiştekî aşkere ye ku nabe mirov vî şertê ew datîne bi awayekî besîd weke pîrozkirina lîderekî şîrove bike; lewma ev daxwazalêborînê wê hatibe kirin di rewşeke weha de ku daxwaza wekheviyê ya Kurdan wê para bêhtir pêk hatibe, ango alî li ser heman maseyê, di şert û mercên wekhev derûniştibin ji bo muzakereyên ku bi awayekî erênî dimeşin.

Daxwaza birayê Gulsima Xanê, Irfan Beg a xwestinalêborînê zelaltir e; nebûna gorê jî ji bo wî nebûna dewletê ye:

*Welehî kengî hestû dan em ê rehet bibin. Bila goreke me jî hebe... Ango wê goreke me hebe. Cejnek be, înek be, em ê biçin ser wê gorê, Fatîhayekê bixwînin. Em tiştekî wisa dixwazin... Ango, ji bo çi li Tirkiyeyê bi hezaran kuştinên fail nediyar hene? Çima Tirkiye van mirovan vedişêre? Girtîgeh niha tijî ne ji bersûcên ergenekonê. Piranî nabêjin, 'ev mirov li ku ne, ev hestû li*

*ku ne?' Rojekê, serokwezîrek ranabe, nabêje, 'yaw, te ev mirov kuştin, çavên malbatên wan li rêyan in, ka li ku ne ev cendek?' Ango nabêjin. Naxwe, di nava du, sê saetan de dikarin van hestûyan hemûyan bidin xwediyên wan. Lê Tirkiye nade. Tirkiye hevparê vê ye... Dewlet di nava vê de ye... Na hêviya me nemaye. Lewma dewlet nîne... Heke li cem me dewlet hebûya, wê ji mêj ve ev hestû bidana... Heke ev mirov hestûyan bibîne wê dilê wî rehet bibe... Niha, serokwezîrek ev deh sal in li meclîsê ye... De rabin, hestûyên herkesî bidin wan. Ewqas dem di ser re bihuriye.lêborîntekê bixwazin. Rojekê ji van mirovanlêborînê bixwazin.*

Ji ber kêmbûna hêvî û baweriya bi wê yekê ku dewlet wêlêborînê bixwaze yan ji ber ku qebûlkirina heqîqetan li pêş e, yan jî ji ber kulêborîneke zimnî dihewîne, pir kêm caran xweber daxwaza xwestinalêborînê di hevpeyvînan de hat îfadekirin. Jixwe ev rewşa kêmbûnê kir ku em bifikirin ku kesê em bi wan re peyivîn ji daxwaza ji wan xwestinalêborînê bêhtir xwedî temeniyeke bi vî rengî ne. Li aliyê din, heke îradeyeke siyasî ya xurt û niyeteke civakî hebe, weha diyar e ev temenî wê veguhere daxwazê. Abdulkerim Begê ku li Mûşê em pê re peyivîn, van tiştên me gotî bi awayekî bi kurtî îfade dike:

*... dewlet, saziyên erkdar ên dewletê, serokwezîr bila rabin, bibêjin 'ez arşîvên wê demê hemûyan vedikim,' bila komîsyonekê damezrînin, êdî çi komîsyona edalet û heqîqetê çi tişteke din, bila komîsyonekê damezrînin, ez ê tevahiya agahiyan bidin vê komîsyonê, piştî ku komîsyonê jî lêkolîn kir, bila bibêje, 'esl û fesla bûyera filan demê li filan deverê rûdayî ev e' ... Ya rastî ji bo me heqîqet pir zelal li meydanê ye. Em ê, hîç gumana me çênebû. Ne weke kes, ne weke nav, lê em pir baş dizanin weke sazî kî sersebebê vê bûyerê ye... Lê em dibêjin, bila fermî bibe. Di serî de jî min got, di bin vê bûyerê de mohr heye, bila xwediyê mohrê derkeve holê, bila bibêje, erê ev mohra min e... Em her weha li bendê ne ku dewletlêborînê bixwaze, lewma me gelek êşên mezin kişandin.*

Şengul Xana li Wanê em pê re peyivîn jî dixwaze ku heqîqetên ji xwe aşkere ne, bi wî awayê ku fail û berpirsiyar werin cezakirin, werin qebûlkirin:

*Em jixwe bi heqîqetê dizanin... Va ye, ez navên wan ji te re dibêjim. Ew zilam bi xwe radibin, dibêjin, 'ez, ez, ez, filan û bêvanî kir'. Li holê ye... dozger, hakim pê dizanin, polês pê dizane. Hemû pê dizanin ku van mirovan ev mirov qetil kir, lê çima ev nayên dîtin? ... Bila dinya hemû pê zanibe. Ne bi tenê ez, bila tevahiya dinyayê zanibe. Û ez jî biçim ser gora wî û bibêjim, 'binihêre, temam, tu qetil kirin lê wan jî cezayê xwe xwar.' Qet nebe ez vê bibêjim.*

Lêborîna ku dewlet ji wan bixwaze jî qebûl nake:

*Ma wê ji kêlêborîna xwe bixwaze? Ji kê? ... Ma wê ji me bixwaze? Ma ew xwestinalêborînê wê bi cih were? Ma dê wê êşê bîne cih?Ev bîst sal in hevjîna wî maye li malê. Bi kîjan xwestinalêborînê dê wê teselî bike? Bi tenê tiştek heye ku em dixwazin. Ew jî, bila van mirovan bibînin. Derxistina holê ya van mirovan û cezakirina wan... Êş kêm nabe. Ne bîst sal, bîst sedsal jî bibihurin, ew êş her li cihê xwe ye. Ew kêm nabe, lê ma ne dibêjin, heq wê bi cih were.*

Birayê Şengul Xanê, Orhan Beg jî mexdûrên din û pêvajoya aştiyê jî li ber çavan digire û îşaret bi girîngiya daxwaza derxistina holê ya heqîqetan dike ku niha bi tenê temeniyek e:

*Dema ku hevdîtinên aştiyê dest pê kirin, muzakereyan dest pê kir, ya rastî dema ku pêşî di bunyeya meclîsê de hat damezrandin, vê yekê kela canê min gelekî rakiribû. Lewma ewqas tiştên qirêj qewimîn, ha belkî nikaribin ji sedî sedê wan derêxin holê, lê belê qet nebe nîvê wan derkevin holê, ev ê di civakê de rehetiyekê peyde bike. Lewma, çawa min got, mirov doza hestûyên xwe dikin. ango bi wê jî razî ye... heke tiştên aştiyê bikevin ser rêyekê dibe ku tiştên li pêş biguherin, lê belê ev daxwazek e ku destjênabe... Niha, elaqedarî vê pêvajoya çareseriyê ya bi pêş dikeve, ya rastî yek ji şertên pêşî Komîsyona Edalet û Heqîqetê ye. Ango, ez ji pêvajoyê bêhtir dixwazim ev komîsyon were damezrandin û her tişt çawa be wisa derkeve holê... Ev temeniyek e, temenî ye lê wê rojekê pêk were.*

Necmettin Begê ku em li Bedlîsê pê re peyivîn jî weke îhtîmaleke pêkhatina wê zehmet bibîne jî, dibêje, piştî qebûlkirina heqîqetan divê xwestinalêborînê û verastkirinên siyasî werin; ew her weha balê dikşîne ser tesîrên muhtemel ên erênî yên qebûlkirin û xwestinalêborînê li ser Tirkan:

*... ango, niha bila Komara Tirkiyeyê [T.C.], erê, rabe, ji xelkê re bibêje, 'kuştinên fail nediyar ên li Kurdistanê hemû di bin destê me de li gorî bernameya me hatin kirin'. Tirk jî wê ji vê fêm bikin... Bila bibêjin ka çima kirin... Gerçî T.C. jî wê doza efûyê neke. Lewma li Roboskiyê sîhûpênc mirov beriya bi panzdeh rojan kuştin [çêl li salvegera bûyerê dike] Hîna jî efûya xwe naxwaze. Ma vêca, îro, wê ji bo gelek mirovên hatin kuştin efûya xwe bixwaze? Ne mimkun e vê bike... Derkeve, li çapemeniyê derkeve, li cihekî, mesela,lêborîna xwe bixwaze. Bibêje, me ev kirin, ev û ev.. Bilalêborîna xwe ji van mirovan bixwaze û hin tiştan jî, hin pêşîlêvekirinên elaqedarî Kurdan jî êdî bêyî ku bitirse bike.*

Kamîl Begê li Colemêrgê pê re peyivîn jî navê komkijiya Roboskiyê hildide, daxwazên xwestinalêborînê û qebûlkirina heqîqetan weke şertên ku hebûna dewletê erê dikin, îfade dike:

> *Heta îro çend serhildanên Kurdan pêk hatin, çend kes heta îro hatin înfazkirin. Rojekê berpirsiyar, dewlet bibêje, ez ji filan malbatêlêborîna xwe dixwazim, 'me ev mirov kuştin... ka em leborîna xwe bixwazin'. Bila hinekî dilê mirovan rehet bibe... Bi tenê Xwedêlêborînê naxwaze. Ew dizane, ew çêdike, ew xira dike. Lê belê li dewletê divê edalet hebe. Divê heq û hiqûq hebin. Divê bibêje, 'mirov tên kuştin, mirov tên înfazkirin bi destê min'. Ka em behsa Roboskî bikin, li pêşberî çavên dinyayê çend ciwan hatin kuştin. Bi tenê bibêje, kê ev ferman da. Ez bang li Tayyip Erdogan dikim. Ez ji Tayyip Erdogan re dibêjim, 'Te çima birayê min da kuştin?' ... Dewlet divê ji Kurdan hemûyanlêborîna xwe bixwaze... Heke tu komîsyona lêkolîna heqîqetan damezrînî, kî tê bila bê, çi hêzên me, çi yên dewletê, destê kê yê qirêj hebe di nava van tiştan de... Daxwaza min ji dewletê ev e... Heke rojek were, ez bibînim ku di nava dewletê de rohniyek û edalet pêk hatiye, were ji dayika minlêborîna xwe bixwaze, bibêje, 'me kurê de înfaz kir û kuşt'. Hingê ez ê bibêjim, dewlet heye. Naxwe edalet hêdî hêdî li Tirkiyeyê belav dibe. Mafê mirovan heye, heqîqet heye.*

Idris Begê ku li Batmanê em pê re peyivîn, daxwazên xwe bi yek hevokê îfade dike: "Ez dixwazim ku rabin ji vî miletîlêborîna xwe bixwazin, careke din ev gûyê xwarî bila nexwin û cezayê muebedê bila li wan were birrîn." Yusuf Begê ku li Colemêrgê em pê re peyivîn jî difikire ku derketina holê ya heqîqetan, û xwestinalêborînê wê bi temînateke di biwara dubare nebûna tiştên qewimî, temam bibe, û weke Necmettin Beg, difikire ku ev yek wê tesîreke erênî li Tirkan bike. Hêviya wî nîne ku berpirsiyarên esas ên kuştina bavê wîlêborînê bixwazin, lê hêviya wî ji desthilatdariya siyasî ya heyî heye:

> *Elaqedarî bavê xwe, ez bi rastî jî dixwazim ku niha kuştinên fail nediyar werin rohnîkirin. Damezrandina komîsyoneke wisa, gelo niha heye ez pê nizanim, komîsyoneke wisa. Dibe ku hebe... Hinek hene cendekên kurên xwe, keçên xwe nedîtine. Ez dixwazim ku ev were çareserkirin... Helbet ya herî girîng ew [xwestinalêborînê] e. Helbet hêviya min ji Demirel nîne... ji dewleta niha bi xwe heye. Li ser navê dewleta berê xwestinalêborînê. Û her weha heke ji ber tiştên niha kirî jîlêborîna xwe bixwazin û careke din nekin, em ê bextewer bibin... Bi îhtîmaleke mezin ji bo rohnîbûna bûyeran divê mirov tiştekî weha bike. Heta kesek hebû, bi navê Pîrê Berfo ne wisa? Weke wê divê milet li parlemanê bipeyive, li rojevê be da ku karibe were çareserkirin. Ez bawer dikim ku li rojevê be, hingê wê kesekî şahidî li bûyerê kirî derkeve, were û behsa bûyerê bike, ez wisa difikirim. Divê wisa be... Divê bi tiştekî weke komîsyonê di rojevê de bimîne... Erdogan bixwaze dikare bixe rojeva Tirkan.*

Metika Yusuf Beg, Sarya Xan, çawa ku me beriya niha jî behsa wê kiribû, pêşî

bi bîr dixe ku birayê wê yê hatî kuştin welatiyekî vê dewletê bû û paşê daxwaza qebûlkirina heqîqetan derdibire:

> *Ez dixwazim ku dewlet rabe, bibêje, 'ev welatî bû... Me ev kir'. Bila wijdanê wan jî biêşe. Bila yek rabe, vê bibêje, mesela bila dewlet rabe û hela, vê bibêje. Ma ne ew jî di encamê de welatiyê Komara Tirkiyeyê bû... Çima her kes bêdeng ma? .. Heke em zanibin ew kes kî ne, dilê me wê hinekî rehet bibe. Naxwe rehet nabe, ne wisa? ... Ez dixwazim derkeve holê. Bila bibêje, 'wijdanê min ne rehet e' ... Bila dewlet bê deng nemîne.*

Meryem Xana ku em li Şirnexê pê re peyivîn jî timî têkiliya di navbera derketina holê ya heqîqetan û bi cih hatina heq de rave dike; çawa ku di Beş I'ê de me behsa wê kir, ew "mafê heqîqetê" terîf dike:

> *Mesela ez îro dixwazim mafê me hebe. Mesela ez dixwazim failên [kuştina] van insanan diyar bibin. Para me çi be em wê dixwazin. Tu bibêjî 'çi' em wê dixwazin, ez mafê xwe dixwazim, heq, hiqûq çi be, ez wê dixwazim. Heqê mêrê min diyar bibûya. Çima, ji bo çi? Ez vê jî dixwazim. Em ji bo xwe her tiştî dixwazin. Em mafê xwe dixwazin... Mafê min ew e, ji ber çi, çima? Ez vî mafî dixwazim. Tişteke din naxwazim... Bila aşkere bibe... Bila rastî derkevin holê... Dewlet bila heqê me bide. Em doza mafê xwe dikin. Em doza hiqûqa xwe dikin. Çima? Sebeb çi ye?Derdê we çi ye? Em doza vê dikin. Bila hikûmet jî li heqê me bipirse, siyaset [-a Kurd] li heqê me bipirse. Şeş mirov bûn. Em îro nikarin serê xwe ji şeş mirovên xwe neêşînin. Em nikarin dev jê berdin... Bila ew jî werin dadgehê li hemberî me, em jî biçin dadgehê. Bila ji me re bibêje 'ji ber vê yekê'... Bila rohnî bibe... Ji bo edaletê çi pêwîst be bila dewlet jî hikûmet jî bikin.*

Herçî Ferya Xan e ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn, girîngiya lipêşbûna mafê heqîqetê û jestên siyasî derdixe pêş ku me di mijara mafê heqîqetê de behsa wan kiribû:

> *Pêşî kê, ji bo çi, çima? Temam, belkî ev dewlet bû, lê belê beriya her tiştî lêkolîna yên beriya vê. Ji bo vê, çi zanim, ka komîsyonê didamezrînin, çi dizanim, parlemanter bi awayekî diçivin, tiştekî dikin? Çi dikin bila bikin, beriya her tiştî ji bo aşkerekirina wê. Paşê jî, heke hûn ji me bipirsin, hinekî derengmayî ye... Heta gelekî dereng hatiye mayîn. Bila beriya bi pênc salan bihata kirin, heta bila beriya bi salekê bihata kirin yan jî beriya bi du salan. Her diçe ev kar kangren dibe... Bi awayekî ew, çi dizanim, divê helwêstên ji dil nîşan bidin. Mesela mirovekî weke serokwezîr, tê Diyarbekirê dipeyive, dibêje, va ye, 'ez dixwazim weha bikim' lê belê diçe Enqerê 'yaw, min xwe ji xewnên xwe rizgar*

*kir'. Ê me, pêdiviya me bi xewnên te nîne. Em ew mirov in ku rastî hatin serê me. Ê me, wexta me jî çênebû em xewnan bibînin. Ji wext û wêde, ew fikir bi xwe bi me dûr diyar e.*

Fatma Xana ku em her weha li Diyarbekirê pê re peyivîn, hêviya xwe ya edaletê weke şiyana Kurdan a bêhtir kenînê, bêhtir mezinbûnê, bêhtir bipêşketinê terîf dike; dema behsa wê dike, fikrên xwe yên elaqedarî derxistina holê ya heqîqetan yan jî qebûlkirina wan û ji wan xwestinalêborînê jî îfade dike:

*Ya rastî baweriya min bi vê nîne. Baweriya min nîne ku [dewlet] wê birînên mirovan bipêçe. Lewma, ango, dibe ku niha hin hevpeyvîn, hin tişt tên kirin lê belê, ya ku ez dixwazim di jiyana ji niha û pê de qet nebe miletê min bêhtir karibe bikene, bêhtir mezin bibe, bêhtir mezin bibe, bêhtir bi pêş keve... Ma ne, mixabin li rojava [-yê Tirkiyeyê] wan deveran em dikarin baştir perwerde bibin, ne wisa? Yanî dewleta me dewleteke wisa ye. Perwerdeyeke çêtir li van deveran pêşkêşî me nekir û nake jî... Daxwaza ji dewletê ha ev e. Divê hin tiştan bîne vir. Ya bedew divê bîne vir jî. Ango, ew bexteweriya ku mirov divê pê bijîn, divê bike ku li vir jî mirov pê bijîn... Bêguman divê [lêborîna xwe] bixwaze. Çima? Ma ne ez dibêjim, di qerara ji min re hatî de, di ya ji me re hatî de, îfadeyek heye ku wateya wê 'mirin heq kiriye' ye. Ev çi ye vêca? .. Wateya vê ew e ku em hîç bi pêş neketine. Dewlet vê ji min re dibêje: 'Tu çi dikî bike, hûn çi qasî hewl didin hewl bidin, destê min [ê zilmê] her li ser serê we ye'. Wateya vê ev e. 'Kengî ez bixwazim dikarim kulma xwe li we bixim'. Wateya vê ew e, dibêje, tu wê bi hedê xwe zanibî. Helbet divê dewletlêborîna xwe bixwaze... Ango, divê heqîqet hemû derkevin holê. heke tu dibêjî, ma niha bes e, na ne kafî ye.*

Nimet Begê ku em her weha li Diyarbekirê pê re peyivîn, daxwaza têkildarî derxistina holê ya heqîqetan weke pêvajoyeke muqabil dinirxîne, bi rojeva siyasî re elaqedar dike, û weha dipeyive:

*Va ye Rêbertî dibêje, bila Komîsyona Heqîqetê were damezrandin. Serok Apo bi rastî jî pêşiya xwe dibîne. Em weke Kurd, ez weke neferekî vê têkoşînê, ez bi rastî jî bêhesab malavahiya wî insanî dikim. Tu wê bibêjî 'çima?' Niha ew her tiştî dibîne, dibêje, 'bila Komîsyona Heqîqetan were damezrandin'. Çima Komîsyoona Heqîqetan? Ango, kê çi kiribe bila derkeve holê. Heke me kiriye, ya me. Ê heke we kiriye, we bavê min... Ji Stenbolê welatiyek dihat vir. Min digot 'dewletê bavê min kuştiye' ... bawer nedikir... lewma televizyon tiştekî nabêjin. Ha Komîsyona Heqîqetan wê ji bo vê yekê were damezrandin. Komîsyona Heqîqetan wê biçe bi welatiyê li Şirnexê re jî bipeyive, bi malbat, dayikên eskeran re jî, wê bi dayika min re jî bipeyive û wê bi şahidên li wê derê*

*re jî bipeyive... Hêviya me ji dewletê ew e ku Komîsyona Heqîqetan damezrîne. Kî heq e û kî neheq e bila her tişt aşkere bibe.*

Li gorî birayê Nimet Beg, Ozkan Beg bi xwe, xwestinalêborînê ji wan bi awayekî fermî jesteke pêwîst û watedar e: "Lewma deynê wê ye ji van mirovanlêborîna xwe bixwaze. Diviyabû weke dewlet van tiştan li mirovên xwe neke. Di dawiyê de ew mirovên te ne."

Şukriye Xana ku em li Mêrdînê pê re peyivîn, dibêje, "Bila dewlet zarokên milet nekuje", li gorî wê heke tiştên qewimî careke din neqewimin xwestinalêborînê wê watedar be û ew temeniya xwe ya di vê biwarê de weha îfade dike: "Jixwe dema min şaşiyek kir, ez ji telêborîna xwe bixwazim, ev tiştekî baş e. Lê belê, bila bibêje, 'ez ê careke din nekim, em bira ne, em xwediyên hev in, em ê wekhev bibin'. Xweş e. Lê tu her û her bikî, dinya wê hişk bibe.". Azize Xana ku em li Şirnexê pê re peyivî ya ku ne razî ye ji ber ku ji bo hevjînê wê yê hatî kuştin û xizmên wê yên din ên hatî kuştin ji wan re sersaxî nehatiye xwestin, nexwestinalêborînê jî bi heman rengî dinirxîne: "Helbet tiştekî wisa bibe wê baş bûya, lê nebû. tu kes li heqê me negeriya, tu kesî li heqê me nepirsî. Rojekê jî kesek nehat. Çima bûye, çi bûye? Sersaxiyek jî nexwestin... Ango, tiştekî wisa ye, ma tu bûya te nedixwest? Bila bê sersaxiyê bixwaze ji bo şeş kesan. Dikarîbû bibe, çima nebû?"

Rabia Xana ku pêşî tu wate neda pirsa me ya li ser ji wan xwestinalêborîna xwe ya dewletê, paşê jî pûte pê neda, ya rastî nerazîbûna xwe ji bêcezamayîna fail û berpirsiyaran jî nîşan dide:

*Lêborîna xwe bixwaze... Tişta te gotî ez nizanim... Bi serê min nakeve... Ez nizanim. Ez nizanim, ez bibêjim yan nebêjim çêtir e... Îrolêborîna xwe bixwazin jî êşa me di dilê me de ye, ji dilê me dernakeve. Heta kêliya mirinê jî wê dernekeve. Belkî ku ez mirim, derkeve... Ez rehet nakim,lêborîna xwe bixwaze jî dilê min rehet nabe... Heke tiştek were serê wan dilê min wê rehet bibe. Naxwe ez rehet nakim.*

Ahmet Begê ku em li Şirnexê pê re peyivîn jî weke Rabia Xanê pêşî tu wateyê nade pirsa me, paşê jî dibêje, di rewşekê de ku bêcezamayîn serdest e, xwestinalêborîna xwe hem kêm e û hem jî bê wate ye:

*Ji me? ... Xwestinalêborînê? Ev ne tiştek e ku bi xwestinalêborînekê hal bibe. Heke bi xwestinalêborînê bibûya, xem nedikir... tu elaqeya vê bi xwestinalêborînê re nîne. Ango wê werelêborîna xwe bixwaze, ev ê êşa me, de dev ji me berde, em pîr bûne, em zêde çîk nebûn. Jinbira min bîstûdu,*

*bîstûsê salî bî ma, seqet bû, li ber çavên wê mêrê wê çû, keça wê çû. Ev bi xwestinekelêborînê nabin tiştek... Divê werin dadgehkirin, ango nabe ku ew bê ceza bimînin.*

Bi rastî jî jinbira Ahmet Beg, Meryem Xan dibêje, daxwaza xwestinalêborînê li aliyekî, ew ê xwestina tilêborînê qebûl jî neke:

*Ez li dinyayê xwestina wan alêborînê qebûl nakim... Heke Xwedê qebûl bike, ez ê jî qebûl bikin. Xwedê qebûl nake... Jiyana min pûç bû çû. Jixwe min tiştek ji jiyanê fêm nekir. Me dinya nedîtiye. Em nizanin ka dinya çawa çûye. Ma ez ê çawa xwestina wan alêborînê qebûl bikim? Ez li dinyayê xwestina wan alêborînê qebûl nakim.*

Bedriye Xana ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn jî ji wan kesan e ku dibêje, ew ê xwetsinalêborînê qebûl neke. Sedema wê jî, weke ku îşaret pê bike ku ew nebûna peywendiyan bi dewletê re tercîh dike, dewleta ku ew ji kuştina kurê xwe berpirsiyar digire: "Te kuştiye û bi ser de jî tu têyî ji minlêborîna xwe dixwazî. Ez qebûl nakim, ma ez qebûl bikim? ... Dijminê min e. Ma mirov dijminê xwe qebûl dike?"

Ya ku bi bersiva Bedriye Xan dide pirsa me ya xwestinalêborînê bi kurtî dibêje, helwêsta ku di berisvên wê yên din de jî xwe dida der û di beşeke mezin a wan kesan re ku em bi wan re peyivîn jî deng vedida, helwestek e ku ya rastî hemtayê rewşeke daxwaznekirinê ye.

### *Daxwaz nekirin: "Dilê tevahiya gelê Kurd maye"*

Dema Yildiz Xana ku em li Batmanê pê re peyivîn, gotî "Bila em li mala xwe û ew jî li mala xwe bin" "reda nêzîkbûnê" yan jî daxwaza dûrbûnê ya ku terîf dike ya rastî rengekî din ê rewşa nekirina daxwazê ya me behsa wê kirî ye.[346] Kurê Yildiz Xanê, Edip Beg vê rewşê bi awayekî zelaltir îfade dike: "Ma dewlet dikare çi ji Kurdan re bike? Jixwe Kurdan dikuje, ma wê rabe alîkariya Kurdan bike? ... Ez hêviya tu tiştî ji dewletê nakim."

346 Dema ku me ev xebat disêwirand, li Stenbol û Diyarbekirê em bi nûnerên hin rêxistinên civaka sivîl û akademîsyenan re hatin cem hev, me behsa vê kiribû. Di wê hevdîtinê de ku 16'ê Kanûna 2013'an li Stenbolê me pêk anî, Mamosteya Zanîngeha Bogaziçiyê Nazan Ustundag, bi rêya lêkolînên wê kirî gotibû, helwêsta kesên ku red dikin lêbibihurin weke redeke nêzîkbûnê dibîne, encama ew gihiştiyê ew e ku dema ew dibêjin, "em lênabihurin" wateya vê "bila dewlet nêzîkî min nebe" ye. Wê îfade kiribû ku wateyalêborîn her carê qebûlkirina ji nû ve ya nêzîkbûnekê ye. Em ê bilêborînê di mijara bê de bi awayekî ferehtir dakevin, lê belê bi fikra me mumkin e ku ev rewşa nekirina daxwazê ya ku li vir em munaqeşe dikin jî mirov dikare weke "reda nêzîkbûnê" bi nav bike. BBi vê rasthatinê em careke din malavahiya Ustundag dikin.

Taha Begê ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn, weha rave dike ku ew ê hêviya tu tiştî ji dewletê neke:

> *Ma ez ê niha ji mirovekî re ku xwe li kêlikekî ranagire, çi bibêjim? Ma ez ê wî çawa jidil qebûl bikim? ... Tu dizanî, ha wisa li kêlikekê dinihêre? ... Mesela li Licê çîka goristanekê çêkirine, ji bo gorê. Xwe lê ranagire. Mesela li Şirnexê, li Geverê çûn goran, li Mêrdînê çûn, texrîb kirin... Ango xwe li wê jî ranagirin.*

Taha Beg çêl li êrîşên li dijî goristanên li bajarên cihê yên Kurdistanê çêkirî dike. Li gorî nûçeya rojnameya Ozgur Gundemê ya 26`ê Tebaxa 2013'an, li gundê Bedlîsê Olekê, ji bo cendekên di gorên komî de û ji bo PKK'yiyên hatî kuştin "Şehîdgeha Xerzanê" tê çêkirin û tê ragihandin ku bi panzerên polêsan û maşînên kar ên giran êrîşek li dijî vê goristanê pêk tê; rojname di biwara mijarê de cih de gotinên serokê bajêr ê rêxistina BDP'a Bedlîsê M. Can Demir: "We bihîstiye di kîjan demê de di kîjan civakê de êrîşî goran hatibe kirin? Kîjan wijdan û mirovahî dikare vê bike? Gelê Kurd wê hesabê vê bêhurmetiya li dijî şehîdên xwe, li dijî cenazeyên xwe bipirse." Di hejmara heman rojnameyê ya 8'ê Îlona 2013'an jî vê carê nûçeyek heye ku tê de êrîşên li dijî goristanên li Mûş û Mêrdînê tên şermezarkirin; nûçeyê cih daye gotinên berdevkê MEYA-DER'ê yê Kopê Hakim Kaşçi: "... xwe li bedenên be ruh ên zarokên gelê Kurd jî ranagirin... Heke dewlet di pêvajoya aştiyê de jidil e, divê tavilê kesên ku van pêkanînan dikin tesbît bike û wan ji wezîfeyê dûr bixe." Serokê BDP'a navçeya Mêrdînê Nisêbînê A. Bari Eren jî gotiye: "Ev heqareteke li dijî tevahiya gelê Kurdistanê."[347]

Adem Begê ku em li Colemêrgê pê re peyivîn jî behsa rewşa nekirina daxwazê dike bi mînaka komkujiya Roboskiyê ku di rabihuriya nêz de qewimî û piranîya Kurdan weke heqareteke din di wê gihiştin:

> *Ji vê dewletê, ya rastî, tu hêviya min nîne. tu tiştî nake. Ka bifikirin, komkujiya Roboskiyê. Ka bifikirin, kê ferman da? Necdet Ozel. Serokê Fermandariya Giştî, bi şexsê xwe wî ferman daye, lê belê rêya Darizandina kesê ferman dayî nayê vekirin. Ka bifikirin, zilamek heye li meydanê. Li astên herî jor dewletê ye û derdikeve holê ku vî zilamî ferman daye lê nayê dadgehkirin. Ez nikarim ji vê dewletê hêviya tu edaletê bikim. Min tu carî jî jê hêvî nekir jî... Timî*

347 Binihêre li http://www.ozgur-gundem.com/?haberID=81767&haberBaslik=Bitlis%27te%20mezarl%C4%B1%C4%9Fa%20sald%C4%B1r%C4%B1%20&action=haber_detay&module=nuce; http://www.ozgur-gundem.com/? haberID= 83007&haberBaslik=Mezarl%C4%B1k%20sald%C4%B1r%C4%B1s%C4%B1na%20bir%20tepki%20de%20Bulan%C4%B1k%20ve%20Mardin%27den&action=haber_detay&module=nuce [5'ê Kanûna 2014'an].

*zexta dewletê heye. Mesela, mirov berê xwe didiyê, li sûkê bîstûçar saetan polês hene, di destê wan de kalaşnîkofên wan, hewl didin xelkê çavtirsandî bikin. Baş e, ez dikarim hêviya çi ji vê dewletê bikim? ... Dema ez dibêjim dewlet, bi piranî kî tê bîra min? Kesên ku dewletê bi rê ve dibin mesela. Serokwezîr e, serokê fermandariya giştî ye, ango ev tên bîra min û ez berê xwe didim van, yek ji wan jî hewl nade ku kuştinên fail nediyar yên rabihuriyê rohnî bike. Dema ku ez dibêjim, ji vê dewletê tu hêviya min nîne, ez timî behsa van dikim.*

Irfan Begê ku li Colemêrgê em pê re peyivîn, çawa ku me berê jî gotibû, nebûna gorê bi bêdewletbûnê re yek dibîne û pêwîst dibîne ku nekirina daxwazê ya xwe bi komkujiya Roboskiyê rave bike: “Na, me hêviya xwe birriye. Lewma dewlet nîne... Heke li cem me dewlet hebûya, ji mêj wê ev hestû bidana... Weke li Roboskiyê mirovan qetil dike. Wê rojê wan zilam beraet kir. Te sîhûçar kes qetil kirin, te çawa beraet kir? Naxwe, dewlet çîka vê ye. Dewlet hevkarê van e.” Xwîşka mezin a Irfan Beg, Gulsima Xan gotinên dayika xwe radigihîne, ev gotin, gihiştina di dewletê ya ku beşeke mezin a Kurdan parve dike, datîne holê: “Dayika min got, ‘Dewleta Tirkan tiştek nekir. Ez wêneyê kurê xwe bibim partiya Kurdan û derdê xwe bibêjim. Dewleta Tirk tu tişt ji bo min nekir.” Wê jî weke ku berê jî me ragihandibû weha gotibû: “Ti daxwaza min ji dewletê nîne ... Heke dewleta me ye bila hestûyên birayê min derêxe holê.”

Ayşe Xana ku em her weha li Colemêrgê pê re peyivîn, tiştên dişibin gotinên dayika Gulsima Xanê dibêje: “Tişta ez bibêjim ew e ku tu kesî tiştek ji bo min nekir... Ma li halê me pirsîn?”[348] Kurê Ayşe Xanê, Kamil Beg bi xwe, bi gotinên xwe belavbûna rewşa nekirina daxwazê ya di nava Kurdan de îfade dike: “Herçî dewlet e, tu daxwaza min jê nîne. Herçî dewlet e, hêviya min şikestiye... ji dewletê tu hêviya min nemaye... Dilê tevahiya gelê Kurd maye. Hêviya Kurdan nemaye.”

Ramazan Begê ku em li Şirnexê pê re peyivîn, dibêje daxwazkirin elaqedar e bi hêvîkirinê re: “Ferdî tu hêviya min ji dewletê nîne. Bi tenê bila qatilên xwe derêxe pêşberî edaletê. Bila wan neparêze. Em jî ji wê bawer bikin. Lê belê ez bawer nakim ku ew ê vê bike.” Biraziyê Ramazan Beg, Ahmet Beg jî weke wî difikire, û ew jî bi mînaka Roboskiyê nihêrîna xwe rave dike:

348 Em fêr dibin ku “ti kesê” ku Ayşe Xan gazinan jê dike ne bi tenê dewlet e: “careke bi tenê, ne ji vê partiyê ne jî ji deverek din li me ne pirsîn. Negotin, ‘ka hûn sax in yan mirin, man?’ Herkes çû mala xwe.” Li aliyê din, em li vir bibêjin, di nava kesên em bi wan re peyivî de yekane kesa ku bi awayekî aşkere gazin ji “partiyê” kirî Ayşe Xan bû, helwêsta giştî, tevî hin rexneyan dilsoziya bi partiyê, nexasim jî bi tevger û Abdullah Ocalan re û bawriya bi wan bû. Di beşa bê de em cih bidin daxuyaniyan li ser vê mijarê.

*Welehî, ma ez ê hêviya çi ji dewletê bikim? ... Ango, ez tu hêviyê ji dewletê nakim, em li bendê bimînin jî pûç e... Welehî em hêviya edaletê ji dewletê nakin, lewma nîne, tu li bendê jî bimînî nîne... Niha tu lê binihêrî, ya me heft kes bûn, ne wisa? Roboskî sîhûçar kes in. Kesê ferman dayî diyar bû, naxe stûyê xwe. Ma, wê ya me eşekere bikin?*

Birayê Ramazan Beg Yusuf Beg bi xwe dibêje, êdî ne mimkun e mirov êdî daxwazekê ji dewletê bike:

*Ti hêviya me ji dewletê nîne... Ango me ji dewletê hêvî dikir. Dewletê, qet nebe, ji me evqas mirov mirin, careke bi tenê jî li ser tu mijarê, ji dewletê ji parlemanterên wê heta ewlekariya wê, ji waliyê wê heta bi qeymeqamê wê, li ser tu mijarê tu tişt negotin, ev li zora mirov diçe helbet. Ango me xemgîn dike. Gerçî, hêviyeke me ya wisa jî nîne. lewma wan bi xwe kir, çima ji me re gotinan bikin?*

Nurcan Xana Batmanî ya ku em li Stenbolê pê re peyivîn jî daxwaznekirina xwe disipêre hem dema bihurî û hem jî bawerîneanîna xwe a bi dewletê. Li aliyê din, dema ku ber bi dawiya sohbetê ve daxwazên xwe dike rêz, xwe hewce his dike ku li ber tiştên li ser Abdullah Ocalan tên gotin, rabe. Ew difikire ku zexta tevgera Kurd nebe dewlet tu gava ku bersivê bide hêviyên wan wê neavêje. Ev fikr di heman demê de rave dike ka ew kesên ku baweriyê bi edaletê naînin berê xwe didin ku:

*Ti hêviya min nîne, heta niha, ev bêhtirî bîst salan bûn, ma ev bûyer wê ji nû ve bikevin rojevê? Jixwe em di nava bêedaletiyeke wisa de dijîn, êdî dewlet, jixwe yên ku ev kirin zilamên dewletê ne. Zilamên dewletê, ma dewlet wê rabe zilamên xwe bibîne? ... Divê dewlet êdî ji van bûyeran re bibêje, êdî bes e. Divê lêbikolin ka çima hatin kirin, ango her tiştî. Divê alîkar bin bi van malbatan re. Divê madî û watewî alîkariyê bidin wan. Ez nizanim, bila bipirsin 'we çi êş kişandin, we çi kir, me evqas êş û azar bi we dan kişandin, jiyanê çi danî ber we?' Ka bila ji me bipirsin... Bi ya min ew ji bo kesekî din dibêjin, qatilê pitikan, ji bo Apo dibêjin kujerê pitikan. Baş e, ew qatilê çi ne? ... Jixwe ji dewletê bêhtir ez baweriyê bi wan [tevgera Kurd] tînim. Ew nebin dewlet wê tu tiştî neke. Me ev kir, wisa û wisa, ango wê ranebin û wijdanên xwe rehet nekin. Divê hinek bipirsin.*

Sinem Xana ku li Wanê em pê re peyivîn, gazineke bi heman rengî bi hevokekê îfade dike: "Ti tişta ez ji dewletê dixwazim nîne, ê me, ma ne tu karê me bi dewletê nîne." Sedema rewşa daxwaznekirinê ya Davut Begê ku em li Şirnexê pê re peyivîn, ji ber hesta neheqî û bawerîneanînê ye:

*Dewlet dibêje, 'min nekir', dibêje 'PKK'ê kir' Dewlet qebûl nake ku. Welehî ji destê dewletê bê wê me di nava qedeheke avê de bixeniqîne. Hebûna navê Kurd li ser me ji bo dewletê sedemeke kafî ye ji bo ku me qetil bike... tu zerara min li dewletê nebûbû, hat û malbata min qetil kir. tu hêviya min nîne.*

Abdulselam Begê ku em li Mêrdînê pê re peyivîn, dewletê ji kuştina kurê xwe û ji hîna jî pêknehatina edaletê berpirsiyar digire; ji bo daxwazekê mixateb qebûlkirina dewletê weke ku zul bihesibîne diyar e:

*Ti hêviya me nîne. Em nikarin ji dewletê re bibêjin ka divê helwêsta wê çawa be. Ne jî em xwe li hemberî wê piçûk dixin. Em jî weke her miletî, weke miletê Kurd li heqê xwe digerin, li heqê xwe dipirsin. Çi ji destê me tê em dikin, ji bo yekîtiya me. Va ne, civînên me, meşên me, daxwazên me yên heq, êdî çi be, em wan dikin. tu bendewarî û hêviya me ji dewletê nîne.*

Mirov nikare bibêje ku gelek ji kesên em bi wa re peyivîn bi qasî Abdulselam Beg bêhêvî bûn, lê belê em dikarin bibêjin, di hevpeyvînên bi kesên xwedî daxwazên berbiçav ên weke derxistina holê ya heqîqetan û/yan jî qebûlkirina wan, tezmînata madî û xwestinalêborînê re jî rewşa zivirandina rûyî ku em weke daxwaznekirinê terîf dikin, carinan xwe dida der. Di lêgerînên wan ên edaletê de yên elaqedarî kuştin û bi darê zorê wendakirinên salên notî pêşketineke hêja pêk nehat, em vê deynin aliyekî, bêedaliyetiya bi komkujiya Roboskî û di daxuyaniyên elaqedari komkujiyê de bi gewde dibe jî weha diyar e ku rewşa daxwaznekirinê ya behsa me li ser, xurttir dike. Mexdûrên ku di lêgerîna edaletê de nikarin dewletê weke mixateb û hiqûqê weke navgînekê bibînin, xwe jî weke welatiyên dewleta peywendîdar nabînin û ev jî rewşeke ku mirov dikare lê serwext bibe. Di rewşekê de ku fail û berpirsiyar nayên dadgehkirin, heqîqet nayên derxistinî holê yan jî nayên qebûlkirin, hingê bivênevê sûc jî kolektîf dibe. Bi gotineke din, ne bi tenê dewlet, êdî Tirk jî hêdî hêdî vediguherin yek ji mixatebên ku Kurd berê xwe ji wan dizivirînin. Ji ber ku çerxên edaleta cezaker bi awayekî baş naxebitin, ev dike ku çerxên edaleta selihandinê jî bê wate bibin. Li aliyê din, hevdîtinên di navbera Abdullah Ocalan û dewletê de û israra Ocalan a ku beşeke mezin a Kurdan jî wê parve dike, weha diyar e ku ev ji wan faktoran e ku qutbûna siyasî ji bo niha rawestandine yan jî hêdî kirine. Helbet rewşa dawî wê girêdayî encamên van hevdîtinên em behsa wan dikin û şertên peymana aştiyê be. Ka gelo tedbîrên dikarin pêşiyê li qutbûna hestî bigirin dikarin çibin, em ê wan di beşa bê de minaqeşe bikin, ji bo vê jî em ê nexasim li mefhûmalêborînê û lihevhelakirinê ya kesên em bi wan re peyîvî binihêrin. Nirxandineke giştî ya hevpeyvînan jî li dawiya heman beşê heye.

## *Beş VI*
## Hizirîna li edaletê: “Kardeş Türkler (Tirkên Bira)”

Dadgehkirin û cezakirina gunehkaran, derxistina holê ya heqîqetan û qebûlkirina wan, tezmînata madî ji bo mexdûran, xwestinalêborînê ji mexdûran ji çerxên edaletê yên fermî ên cezaî û selihandinê ne; dema ku çerxên edaletê yên bi vî rengî bi qasî ku rê li ber bêedaletiyeke nû vekin dereng bimînin û zehmet bin, hingê her diçe bêhtir zehmet dibe ku mexdûr li edaletê weke îhtîmalekê bifikirin. Ya rastî, ew hizr xurt dibe ku edalet “li vê dinyayê” nîne, wê neyê “mala wan”. Hingê bivênevê difikirin ku bêedaletiya hatî serê wan tiştek e ku nikare were telafîkirin bi dewlet, hiqûq û siyasetê, kurt û kurmancî bi munasebetên dunyewî û yên navmirovan. Ya rastî, yekane sedema vê ne ew e ku edaleta ku bi cezakirinê re yek tê dîtin dereng dimîne. Ji ber gunehên wan ên li dijî mirovahiyê, û “xirabiya radîkal” a ku bi van gunehan re xwe dide der, ew fikr peyde dibe ku cezayekî “guncaw” ê li gorî fail û berpirsiyaran nîne; ev fikr jî rê li ber wê yekê vedike ku edalet ji dinyaya din re were hiştin. Bersivên dayî me, îdîaya Arendt a me di Beş II’yê de ragihandibû erê dikin: Mirov nikarin li wan kesan bibihurin ku nikarin ceza bikin, nikarin wan kesan ceza bikin ku nikarin li wan bibihurin. Nexasim dema ku fail poşman xuya nakin yan jî red dikin ku berpirsiyariya sûcên xwe bigirin ser xwe, hingê lênebihurîn yekane teselî ye ku di destê mexdûran de dimîne.

Em dikarin bibêjin, gelek kesên em bi wan re peyivîn bi tenê bi xêra baweriya xwe ya xurt a “pêkhatina edaletê di qiyametê de” yan jî cezakirina fail û berpirsiyaran li dinya din, hêsanîtir dikarin jiyana xwe dewam bikin. Li aliyê din, divê em behsa wê jî bikin ku ew kes jî hene ku qebûl dikin ku destketiyên gelê Kurd parçeyek ji pêvajoya edaletê ne; azadiya siyasî ya gelê Kurd û nexasim serbest berdana Abdullah Ocalan weke yekane rûdana dikare edaletê bîne vê dinyayê. Em bi îfadeyeke mezinkirî bibêjin, ev herdu meyilên xurt ên ku dikin ku em bibêjin “mala xwedê ava ku Xwedê heye”, “mala xwedê ava ku Ocalan sax e”, di hevpêyvînên me kirî de ji ber xwe tên gotin.

Ji bilî bersivên dayî pirsên elaqedarî têgehalêborînê ya ku me di Beş II de minaqeşe kir, em ê yên dayî pirsên elaqedarî mefhûma “helalkirina heqê xwe” jî di peywenda rikdarî/xeyd û dostaniya siyasî de ragihînin; me bi fikra ku dibe ku hemberêlêborînê yê di dînê Îslamê de be û ji ber ku me banga “lihevhelalkirinê” ya Abdullah Ocalan a di Newroza 2013’an de li ber çavan girt pirsên

elaqedarî vê mefhûmê jî kirin.[349] Nurcan Baysal di pirtûka xwe de dengvedana axaftina Abdullah Ocalan a me behsa wê kir, weha rave dike:

> *Çapemeniya Rojava [-yê Ewrûpayê] weşan dikirin bi wateya "li Diyarbekirê hewa cejnê", lê ya rastî li gelek malan kêfeke şikestî, libendêwateke bi hayjixweheyî û ji bilî wê metelmayîn, xemgînî û şikestina hêviyan jî hebû. Li aliyekî mirovan hewl dida xwe bi hêviya, wê ji niha û pê ve mirov nemirin, bigirin, li aliyê din li kolanên Diyarbekirê tevî barê rabihuriyê jiyana xwe dewam dikin. Xwe azadkirina ji vî barî hîç jî hêsan nîne. Ma me wê çawa ji bîr bikira Xwedêwo, çawa! Şerê esas belkî hîna nû dest pê dikir. Şerê li dijî mecbûrbûna jibîrkirinê! Me dikarî vî şerî bi tenê bikin bi rêya hesapjihevpirsînê û rûbirûbûna bi rabihuriyê re. Ne bi liehevhelakirinê. Me nedikarî li wan helal bikin li ser navê wan miriyan, zarokên wendakirî, zarokatiyên nebûyî. Hesab diviya. Hesab her weha diviya ji bo ku heman tişt careke din rûnedin. Hesab diviya ji bo avakirina siberojê.*[350]

Şerê ku Baysal difikire esas hîna nû dest pê dike, ji bo mexdûran gelekî jî lê xuya dike. Yek ji tiştên ku wê vî şerî hêsan bike, helbet Darizandina fail û berpirsiyaran e. Li aliyê din, ji ber ku ne mimkun e li dadgehên ku mekanê çerxên edaleta cezaker in pêk were, em ê di vê beşê de ragihînin ka îhtîmala rûbirûbûna fail û berpiriyaran bi mexdûran re çawa tê nirxandin; ev rûbirûbûn weke parçeyekî pêvajoya edaleta selihandinê tê dîtin. Ev îhtîmal, nîşaneyên girîng der barê wan heqîqetan de jî dide ku mexdûr dixwazin fêr bibin.

### *Îhtîmala rûbirûbûn,lêborîn, lihevhelalkirinê*

Bi awayekî serbixwe ji pêvajoyên hiqûqî, me karî bi çilûneh kesan re li ser hevdîtin û rûbirûbûna bi fail û berpirsiyaran re bipeyivin. Ji van sîhûyek kesî ev îhtîmal erênî nirxand; pirsên wan hebûn ku ji fail û berpirsiyaran bikin. Ya rastî, kesên ku bi tu awayî nedixwestin pêrgî fail û berpirsiyan bibin jî pirsên ku dixwazin bi awayekî bersivên wan fêr bibin bi me re parve kirin.

Ji kesên em bi wa re peyivî sisê li dadgehan pêrgî fail yan jî berpirsiyaran bûbûn. Wan vegot, ka van pêrgîbûnên veneguherî rûbirûbûnê çi tesîr li wan kiriye. Aysel Xana ku li Mûşê em pê re peyivîin weha peyivî:

> *Beriya ku dadgeh dest pê bike hinekî bêhtir çîk bû, lê piştî ku ez çûm wir,*

349 Di nameya Abdullah Ocalan a di Newroza Diyarbekirê ya 2013'an de van îfadeyan cihê xwe girtibû: "Dem ne ya îxtîlaf, şer û hevdupiçûk dîtinê ye, ya hevgirtin, bihevrebûn, hevhembêzkirin û li hev helalkirinê ye."; binihêre li http://www.bianet.org/bianet/siyaset/145269-silahli-gucler-sinirdisina-artik-siyaset-donemi [15'ê Nîsana 2014'an].

350 Baysal, 2014, 302.

*dema ku min ew dîtin, ez şok bûm... Min ew cara pêşî dîtin, min berê dîtibin jî min nedizanî, li wir min ew nas kirin... Dema ez û wî beramber hev bûn, min êrîş kir... Nexasim jî heke ku min wî çîkî bibînim, ango min ew [fail] nedît, ez dibêjim 'ka gelo ez wî bibînim, ez ê çi bikim?' ... Jixwe, înşelah ez ê wî bibînim, di vê rûniştinê de ez ê bibînim... Ev meh û nîv e ku ez timî wî di xeyala xwe de dibînim, ka gelo dema min ew dît ez ê çi bikim? ... Ez dixwazim gelek tiştan bikim, lê belê ji bo rûniştina dozê, li wir jî ez nizanim, ez hin tiştan bikim rast çênabe.*

Ew behsa rûbirûbûna bi fail re ya di xeyala xwe de dike:

*Ez çi pirsê bikin, gelo ew çi ji min re dibêje? Çima malbata min kuşt? ... Dibêje, 'min nedixwest bikim, ne ev mal bû.' ... carinan jî wisa, weke ku bi min bikene, dîsa xirabiya xwe nîşan dide. Ma ne ew tiştên baş wisa ji min re dibêje, ango ma ne ez dixwazim êrîşî wî bikim. Ew ji min re dibêje, 'Min nedixwest wan zarokan bikujim' ... Ez bawer nakim... 'Lewma te ew şewitandin, ew li wir diqîriyan, ew wisa li wir ne weke ji hişê xwe çûyî bûn,' ez wisa dibêjim. ... ez nizanim ku ez xeyalê dibînim, gelo ketiye hundir beriya ku bişewitîne? Ez gelekî li vê jî difikirim. Ez dibêjim, ez vê jê bipirsim, 'gelo tu pêşî ketî hundir yan na?' ... Ez dibêjim, ketibe hundir, dema wan dibîne, çawa destên te diçe tu wan bikujî? Dema ew dîtin, gelo çûye yan neçûye?*

Weke ku bixwaze ji fail bibihîze ku wî ev sûc ne bi zanîn û xwestin kiriye, dema ev suc kirî wî qurbaniyên xwe nedîtine; hewl dide bibêje, seyra hestalêborînê girêdayî bersivên fail û helwêsta wî ya dema bersivdayînê ye. Ew zehmetiyalêborînê bi zehmetiya jidestdayîna xwîşk û birayên xwe rave dike, dema vê dike jî gelek caran disekine, carinan jî digirî. Ew dibêje, ew îhtîimala helalkirina heqê xwe jî hîç li cem wê nîne:

*Nizanim, ez hîç vê hêviyê ji xwe nakim. Ez nizanim. Xwîşk û birayên min, ya rastî min ew xwedî kirin, ez li wan miqate bûm. Ez dayik jî bûm, dayika min timî nexweş bû... Min timî li wan xwedîtî dikir. Dema ez zewicîm jî diçûm wir... Min nedixwest dev ji wan berdim. Piçûk bûn, piçûka me ya xwîşk û birayan du salî bû. Me dil nedihişt em wê maç bikin. Dema dayika min mir, ew rohniya çavên me bû... çi dibe bila bibe, ez ê heqê xwe li wan helal nekim. Xwedayê min bila vê êşê bide wan jî. Bi tenê ew şexs, ez naxwazim zarokên wî jî vê êşê bikişînin. Bi tenê ew şexs.*

Dema ku em li Mûşê pê re peyivîn Ekrem Beg çêl li wî kesî kir ku Aysel Xan behsa wî dike û got, "... mirov nikare bi xwe bide qebûlkirin jî ku here bi wî mirovî re rûbirû bibe, çavên me û wî rasta hev werin". Em bi Ekrem Beg re vê

carê li Stenbolê hatin cem hev, piştî ku weke şahid tevlî rûniştina Aysel Xanê got, ew li bendê ye, bû. Ekrem Beg ji hestên xwe bêhtir behsa wê kêliyê dike ku çavên wî û yên fail li rasta hev hatin: "Serê xwe zivirand û li min nihêrî, weke ya ji ber mirovê qetilkirî mabe, weke bermahiyekê li min nihêrî." Ew hevokan saz dike ku Arendt ê dibêje, bêwate ye mirov fail û berpirsiyarên li gunehê xwe mikur nayên, poşmaniya xwe îfade nakin yan jî tu jesta nîşana poşmaniyê nakin, mafdar dike: "Heke ew dikare li xwe bi xwe bibihure, 'temam, min şaşî kir, temam ha min ev şaşî kirin'. Heke ew bi xwe karibe pêşî li xwe bibihure hingê dikare ji min jî doza vêlêborînê bike."

Irfan Begê ku li Colemêrgê em pê re peyivîn jî li dadgehê pêrgî failan bûye; ji hisên xwe bêhtir, pirsên ku dixwestin dema pêrgîhevbûnê bike lê nekarî bi me re parve dike:

> *Ma ji xwe em çi his dikin. Em dibêjin, em bi tenê doza hestûyan dikin. Temam we kuştine, lê hestûyên van zilaman bidin... Em ê bi temamî bibêjin, '[ew] birayê min bû, te çima kuşt? Sûcê wî çi bû? Kîjan mirov kuştibû?' ... Em nikarin serê van mirovan rakin. Nabe ku rabe... Ji bo çi, mirovekî ji mirovekî din ferman girtibe, mirovên sêzdeh salî, panzdeh salî înfaz dikin, dikujin? [Birayê min ê] Hijdeh salî ma çî wî hebû, ew kuştin? Ma em ê çawa li wan bibihurin? ... Em li wan nabihurin. Li dinyayê em li dijminekî wisa nabihurin. Lewma ew dijmin in. Ew çi qasî mirovên baş jî bin, îro li cem me dijminên mezin ew in. Niha ez li dinyayê nikarim ji Tirkiyeyê re bibêjim birayê min e. Ew dijminê min ên eslî ne. Binihêre, ez sibe biçim Parlemanê jî, biçim dinyayê jî ez ê bibêjim, dijminê min e... Min dayika xwe ji dest da, bavê xwe ji dest da, birayê xwe ji dest da. Tiştekî pir zehmet e... Çima ev kirin? ... Ka cendek li ku ne, nebû, bila hestûyan bidin me. Em doza hestûyan dikin.*

### *"Ma tu bûya tu wê lê bibihuriya"*

Yeter Xana ku em li Bedlîsê pê re peyivîn jî weke Irfan Beg dibêje, ew ê li dijminên xwe nebihure, ew pirsa me jê kirî li me vedigerîne: "Min dixwest dijminê xwe nas bikim... Min ê bigota, we çima belesedem kuşt?' ... Werin mêrê min ji malê derêxin, bibin bikujin, ma mirov çawa li vê bibihure, ne wisa? Ma tu bûya, tu wê lê bibihuriya?" Helbet me berê jî ev pirs ji xwe kiribû lê belê em ne amade bûn. Me bi wateya "Helbet a/ê hatî serê wê/wî dizane, xebera te ye" dikarin bersivê bidinê.

Herçî Hevehan Xan e ku li Colemêrgê em pê re peyivîn, dibêje, ne bi tene ji ber kuştina kurê xwe, lê belê ji ber binpêkirina rêûresmên cenaze û şîngirêdanê jî ew ê li "dewletê" nebihure: "Welehî, ez lê nabihurim. Ma ez çawa lê bibihurim? Hikûmetê kuşt. Nehişt ku em bisipêrin axê jî. Me bi dizîka ew veşart."

Şengul Xana ku li Wanê em pê re peyivîn jî piştî ku pirsên ku dixwaze ji failan bike, li pey hev dike rêz, difikire ku bihurîna li failan wê bike ku ceza jî li wan neyê birrîn û dibêje, ew ê li wan nebihure:

*Ango çima? Çima? Ji bo çi? We çima weha li van mirovan kir? Ma gunehê van mirovan çi ye? Çima? Bila ji min re rave bikin bi tenê. Dewlet li van bibihure jî ez ê li wan nebihurim. Birayê min wê li wan nebihure, jina wî wê li wan nebihure, lewma me gelek êşa van kişand.*

Nurcan Xana Batmanî ya ku li Stenbolê em pê re peyivîn jî dibêje, ew ê li failan nebihure, lê belê pirsên ku ji failan bike hene, pirsa wê ya pêşî weke ya herkesî ye:

*Min ê bigota, 'we çima kir? We çima canê evqas mirovî êşand? Evqas zarok hemû sêwî ne. Ka çi berjewendiya wê ji vê çêbû?'... 'Ferman dan we, baş e ma we li mirovan pirsî? Çima?' Bi tenê bi standina fermanê, dibêjin 'em bendeyê fermanê ne' ha, lê mirov carekê dinihêre. Ma êşandina canî çi ye? ... Tu radibî, nizanî ka li pey çi heye. Ka li pey xwe çi dihêle. Ka birînên çawa hene... Telafîkirina vê nîne, ma heye li gorî we? Ez ê lê nebihurim, qetiyen... Ez ê lê helal nekim.*

Ferya Xana ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn jî, dixwaze pirsên weke yên Nurcan Xanê bipirse ji fail û berpirsiyaran; dibêje, "tiştekî bi navêlêborînê nîne":

*Min ê beriya her tiştî bigota, 'çima?' lewma bila hinekî xwe li şûna mirovên wan kuştî, deynin. Jiyaneke wî jî heye. Malbat hebû. Di encamê de kesên kirî jî bi îhtîmaleke mezin xwedî zar û zêç in, malbat, ango hinekî wijdan û merhamet hebe, ez difikirim ku wê nekin... 'Çima?' 'Me çi kir?' Ma yekane sûcê me ew e ku em doza zimanê xwe, çanda xwe dikin?... Tiştekî wekelêborînê nîne. Ez lêbibihurim jî Xwedayê Teala wê lê nebihure... Ez lê nabihurim. Ez bibêjim, ez ê lêbibihurim, hingê min ê derew kiribe... [Lê helal] nakim. Lewma, ev bîst sal in, tiştên hatin serê me... mirov yekser ezmûn bike tiştekî pir cuda ye.*

Li gorî Zindan Xana ku em li Mêrdînê pê re peyivîn, di navberalêborînê û lêhelalkirinê de cudabûnek heye; êw îşaret pê dike kulêborîn wê teqabilî cezayên li vê dinyayê bike. Tiştên ku ji failan bipirse jî hene:

*Ez derkevim pêşberî wan û pirseke wisa ez ê bikim "bi çi heqî we bavê min wisa kuşt?... Ez ê ji wan bipirsim 'çima we tiştekî wisa kir, ma ne guneh e, we zarokên wî sêwî hiştin, malbata wî sêwî hişt' ... Na, ez li wan nabihurim... Lê ez ê [li wan helal] bikim... lewma dinya din heye... Di encamê de Xwede heye, ez ê wê tiştê nekim. Ez ê guneh nexim stûyê xwe, lê heqê xwe lê helal bikim, lê ez ê tu carî lê nebihurim.*

Pirsên xwîşka mezin a Zindan Xanê, Mizgin Xanê jî weke yên gelek kesan in, ya rastî bêhtir dişibin lêpirsîneke wijdanî; di berisiva wê ya li serlêborînê de cudatiyê naxe navberê, weke xwîşka xwe nake:

*Hingê ez ê wan hewaleyî Xwedê bikim. Lêbihurin karê Xwedê ye. Ma ez lê bibihurim wê çi bibe û ez lê nebihurim wê çi bibe... Ez ê bibêjim, 'hinavên min dişewitin. Ez doza heqê bavê xwe dikim ji we'... Ez ê bibêjim, 'ez lê nabihurim'. Ez ê bibêjim, 'tu çawa niha bavê min dibî?' Ez ê di rûyê wî de bibêjim, ez ê bibêjim 'niha te bibin, mesela nozdeh salan tu wenda bî, zarokên te weke me bin, ma tu wê xemgîn nebî?' Mesela bavê me di çi halî de ye? Gelo xistin erdê?... Na, ez heqê xwe helal nakim... Ne li vê dinyayê û ne jî li dinyaya din.*

Ti gotina ku Yildiz Xana li Wanê em pê re peyivî ji failan re bibêje, nîne. Ew jî weke Zindan Xanê difikire kulêborîn û lêhelalkirin ne yek tişt in û bi awayekî zelal îfade neke jî, îşaret pê dike ku ew ê "wê rojê" ango piştî ku fail hatin gitrin û dadgehkirin biryarê bide ka ew ê li wan bibihure yan na:

*Ez ê tu tiştî nebêjim. Ez bibêjim, yê çûyî çû. Êdî çû... Gotin ji çi re? Yê çûyî çû êdî... Welehî lê helal nakim... Çima kuşt? Ma çi kiribû?... Welehî nizanim. Belkî jî bibêjim, 'li te helal dikim.' Bibêje, ev bîst sal in hatiye kuştin, 'li min helal bike' ... Ez dibêjim, ez lê bibihurim jî, ez ê lê helal nekim... Xwedê dizane, belkî em lê bibihurin... Niha bi tu tiştî nizanim.*

Mukaddes Xana ku em li Mûşê pê re peyivîn pêşî dibêje, ew naxwaze rasta fail û berpirisyaran were, lê dema fikrên xwe îfade dike vê fikra xwe diguhere; lê belê ew dibêje, mirov nikare li failan bibihure:

*Mirov naxwaze çav jî pê keve... Li dinyayê ez naxwazim... Dibe ku gelek tiştên em dixwazin bibêjin hebin, lê belê wê kêliyê bi rastî jî mirov naxwaze. Lewma ew êş pir carî dibe... Xwezî bibihîze, ez çawa bibêjim, bi rastî jî dixwazim kesê bûyê sersebebê vê yekê bibînim. Kê da kirin? Çima? Gunehê wî çi bû? We çima kir? Helbet mirov dixwaze bersiva van pirsan bistîne. Lê belê piştî ku bersiv dan, meseleya ka rast in yan derew in, heye. Lewma di encamê de ew mirovên ku ji bo ewlekariya ruhê xwe dadgeh ji vir rakirin [birin bajarekî din] wê çawa rastiyê ji we re bibêjin? ... Bi ya min nabe mirov li wan bibihure.*

Azize Xana ku li Şirnexê em pê re peyivîn jî dibêje, ew ê tu carî li failan nebihure. Lê belê dîsa jî ew dixwaze wan bibîne û dibêje, ev daxwaza wê ya herî girîng e:

*Ma ez ê çi bibêjim, 'Çi heqê we lê hebû we tiştekî wisa kir? Çima mirovên evqasî ciwan, zarok, zarokeke heşt rojî, çima gelo? Ma çi bi te kiribûn? Çima? Ango, çi pirsgirêka wî bi me re hebû?' ... Ango, ez kengî rûnim, xeyala wê dikim.*

*Xwezî karibim bibînim, bipirsim, 'çima, ji bo çi?' ... Bila bînin vir, em rûbirû bi hev re bipeyivin, û ne tiştekî din.*

Dayika Mukaddes Xanê, Cemile Xan, dixwaze pirsên mîna yên keça xwe bike ji failan. Ew neheqî û êşên xwe derdixe pêş û dibêje poşmanî bê fêde ye,lêborîn jî ne mimkun e:

*Zarokên min gelek êş kişandin, ji bo wan ez ê lê nebihurim... Ma bi poşmaniyê re tiştek hal dibe? Ev bîst sal in, êdî poşmaniya çi? Me pir êş kişand, bila ew jî bikişînin... Mirov nikare vê bike... Ma niha em bi wan re werin hemberî hev, ez ji wan re çi bibêjim? Ez ê bibêjim, gunehê min, şaşiya min çi bû? We çawa em birin, weha li me kir? Te çi ji me dît?... Ez li perîşaniya xwe dinihêrim, ez li heqareta li min bûyî dinihêrim, berê xwe didim bêgunehiya xwe, me tu tişt nekiribû, ji ber vê mirov nabe bike... Nabe mirov lêbibihure... Xwedê heqê me li wan nehêle. Em li vê dipirsin, em vê dixwazin. Xwedê heqê me ji wan hilîne. Em lêbibihurin jî Xwedê li wan nebihure.*

Ji bo Hediye Xana ku li Şirnexê em pê re peyivîn jî poşmanî bê fêde ye; lê belê pirs her dimînin:

*Ez ê bi tenê vê bipirsim. Ez ê bibêjim, 'wê êvarê we çima wisa li me kir? Çi derdê we hebû? Çi kula we hebû ku we wê êvarê wisa li me kir?' Bila ew jî hinekî bi min rebipeyivin. Ez jî bi wan re bipeyivim... Ez lê nabihurim. Welehî ez bi tenê dozdar im... Ez lêbibihurim wê di hinavên min de bibe kul û derd. Bila cezayê xwe bikişînin, û ne tiştekî din... Bibêjin, 'em poşman in' jî fêde nake. Ma dema bibêjin, 'ez poşman im' hingê wê êşa min nemîne? Na, wê xirabtir jî bibe.*

Ayşe Xan e ku em li Colemêrgê pê re peyivin naxwaze fail û berpirsiyaran bibîne, ew dibêje, ew ê di bin tu şert û mercan de li wan nebihure: "Ma ez bibînim, ez ê çi bikim? Ez wan ji Xwedê re dihêlim... ew çi qasî poşman bin jî ez li wan nabihurim. Mirov çawa li wan kesan bibihure ku kezeba mirovî kuştibin?"

Hakan Begê li Diyarbekirê em pê re peyivîn şahidî kiriye li kuştina bavê xwe; ew jî dibêje, ew bi tu awayan naxwaze failan bibîne û ew ê tu carî li wan nebihure:

*Ez naxwazim bi wan re rûbirû bibim... Ewqasî ku di hundirê min de veguherîbû nifrînê li hemberî wan, lewma ev hovîtî bû û ne tiştekî din bû... Ango ji ber vê jî ez bi tu çavê mirovî li wan nanihêrim... Ango, ez nizanim, lê belê bi fikra min kesê ku ew kirî jixwe hestên wî yên insanî nînin... Ez ê tu carî lê nebihurim. Bi ser de jî ez bawer nakim ji vê gotina wan a bendebûna fermanê, ne zarok e... ez tu carî li wan helal nakim.*

Yasemin Xana ku em li Mêrdînê pê re peyivîn jî weke Hakan Beg difikire; nihêrîneke wê ya tarîtir heye:

*Ma ez ê bi mirovên lanetî re çi bipeyivim? Ez ê çi bibêjim? Niha tu min li şûna xwe deyne. Ma ez çi dikarim bibêjim? 'Te çima li ser danî' Ê jixwe te li ser daniye. 'Çi ji te kiribû?' Ê jixwe dizanim. Ez çi jê bipirsim? Ma ez bi kesê wisa re çi bipeyivim? Ya çêtir ew e ku mirov zimanê xwe jî çepel neke... Ez ê hîç lênebihurim... Na, ez ê hîç, hîç, hîş lê nebihurim.*

Gotineke Zuleyxa Xana ku li Colemêrgê em pê re peyivîn nîne ji failan re bibêje, tu litfa bibexşîne nîne: "Mirov dê bi qesasê xwe re were cem hev! Wê were û çi bibêje? ... Ez ê çi ji wî bipirsin? Ez dizanim ku mêrê min kuşt, ez ê çi jê bipirsim? ... Welehî ez li wan nabihurim... Ma kî li dijminê xwe bihuriye ku ez bibihurim."

Yên ku naxwazin pêrgî fail û berpirsiyaran bibin, wisa diyar e ku Arendt piştrat dikin; ew difikire ku ev hevdîtin bi tenê dikare were hewalekirinî roja qiyametê. tu rê nîne ku fail û berpirsiyarên weke lanetî dibînin, yan jî heta wan weke insan jî nabînin, yan jî wan weke dijmin dizanin, vegerin nav alema insanan.

### *"... heke bibêjin 'apo em poşman in, me xwe avêtiye bextê te ..."*

Hin ji yên ku dixwazin pêrgî fail û berpirsiyaran werin jî difikirin ku failê poşmanbûyî, dixwaze lê were bihurîn, êşê dikişîne hîna nû weke mirovan tevdigere, êdî ji rewşa ku mirov li wan nikaribe bibihure derdikevin. Heta, tiştên ku Davut Begê li Şirnexê em pê re peyivîn, gotî weke ku piştrast bike ku "dersên xwe yên herî ebedî yên di biwara jiyan û fikirînê de em ji wan kesan ku êşa .... hukmê dîrokê kişandî" distînin.[351] Davut Beg dibêje, heke poşmaniya xwe derbibirin ew ê li failan bibihure; û îşaret bi aliyê dunyewî yêlêborînê dike:

*Bila Xwedê heqê min ji wan hilîne. Heq û tola ez ji wan hilînim ne tu tişt e. Min her tişt ji Xwedê re hişt... Xwedê cezayekî wisa bide wan ku tevahiya jiyana xwe bi rezîlî bijîn. Min her tişt ji Xwedê re hişt... Ez xwe ji ber hestên xirab disipêrim Xwedê... Jiyana min serûbinî hev bû... Ev bîstûdu sal in min li du bûkên xwe û li keça xwe ya piçûk nihêrî. Ev bîstûdu sal in ku ez bêyî jina xwe û zarokên xwe dijîm. Ma hesta mirovekî wisa jiyayî dikare çawa be... Min dixwest li rûyê wan binihêrim. Ez meraq dikim wan çawa dikarî evqasî bibin cinawir... Ma ez çi dikarim ji wan re bibêjim? Ez bi tenê tiştekî dibêjim, Xwedê heqê min ji wan hilîne... Bila bên bibêjin, 'apo em poşman in, me xwe avêtiye*

351 Bhabha, 2001, 172.

*bextê te', ez ê ji wan re bibêjim, 'Xwedê li we bibihure'... Bila bên, bibêjin, 'ez poşman im', bila bibêjin, 'towbe'. Ez ê ji wan re bibêjim, 'Bila Xwedê li we bibihure, ez li we bihurîm.' Heke bên mala min, bibêjin, poşman in, ez ê li wan bibihurim... Ne muhim e bendeyên Xwedê li wan bibihurin, ya muhim ew e ku Xwedê li wan bibihure. Efû ji Xwedê ye, lê xwe bavêjin mala min, poşman bibin, ez ê şexsî li wan bibihurim, wan ji Xwedê re bihêlim.*

Şukriye Xana ku em li Mêrdînê pê re peyivîn jî dixwaze bi failan re bipeyive; weke Davut Beg dibêje, ew ê karibe di berdêla poşmanî û daxuyakirina towbê de li wan bibihure, lê belê ew ê li wan helal neke; ew dîsa aliyêlêborînê yê insanî û dunyewî derdixe holê:

*Ez dibêjim, ka ez pê re bipeyivim, derdê wî bi zaroka min re çi bû? 'Derdê te bi zaroka min re çi bû, te çima ev bi zaroka min kir? ... Min bi çi zehmetiyan dabû xwendin... Tu dikeve pêşiyê û wî dikujî. Tu jî bipeyive. Derdê te çi ye? ... Tu pê re bipeyiviya... Tu bipeyivî baş e. Zalimtî, zalimtî, zalimtî ne baş e' ... Ez û ew silhê bikin... Heke bibêje, 'ez poşman im.' Ji xwe di hinavên min de kîna wî heye, ez xemgîn dibim... Ji bo Xwedê heke ew careke din zarokê milet nekuje, poşman bibe, towbe bike. Heke bibêje, 'kesekî fêrî min kiriye, kesekî ji min re gotiye, min kiriye. Min towbe kir. Ez ê zaroka tu kesî nekujim.' Hingê em ê bibêjin bes e... Ez naxwazim kes wê [mirina zaroka xwe] bibîne... Dema dewlet baş be, ez ê jî dengê xwe nekim, ma ne wisa ye? ... Ya di hinavên min de tiştekî din e, welehî di hinavên min de li wan helal nabe.*

Yusuf Begê li Colemêrgê em pê re peyivîn jî bi şertê ku poşman bin, weha diyar e amade ye ku li failan bibihure; bi ya wîlêborîn mezinahî ye:

*Ez [failan] meraq dikim lê nizanim ka ez ê bixwazim wan bibînim, ez bi wê nizanim... Xwedê dizanê ez ê nexwazim... Girêdayî wê kêliya min a hingê ye, nizanim. Ez qet lê nefikirîm, ka ez rojêkê pêrgî wan werim wê çi bibe... Ez dizanim ku tiştekî wisa ne mimkun e... [Heke ji bo ku bibêjin, poşman in, ew êlêborîna xwe bixwazin, hingê] ez ê li wan bibihurim... Ango, bi ya min çîk bûye, hişê wî zilamî hatiye serê wî. Ez nikarim zilamî çîk bikim... Hingê wê fêrî çîkê bûbin. Ewqas êş û azar dan kişandin. Yê lê bihurîn, bûn em. Mezinahî ye. Ew ê, Xwedê dizane, di vê bigihîjin... peyameke siyasî nîne, peyama siyasî xilas nabe. Bi temamî ez ê peyameke insanî bidim.*

Herçî Eşref Begê Wanî ye yê ku em li Stenbolê pê re peyivîn, difikire ku ne bi tenê peyameke wî ya insanî heye, peyameke wî ya siyasî jî heye; serbixwe ji efûya giştî jî dibêje, ew dikare li fail û berpirsiyaran bibihure:

*Mirov dibêje, êdî tu têkiliya vî mi mirovahiyê, bi civakê re nemaye. Di encamê de wisa ye jî. Ha weke min gotî, heke ji wê deverê dikarin veguherin, va ye 'min şaşî kir, min ev, ev, ev şaşî kir, şert û mercên xweser ev bûn, hûn çi navî lê dikin bikin, lê ez îro dîsa li hemberî we me' ... Heke ji dil be, em ê jî lê bibihurin... Efûya giştî tiştekî din e... Ev gunehên li dijî mirovahiyê ne... Peyameke vê ya civakî û siyasî heye. Elaqedarî civaka mirov tê de dijî ye jî. Binesaziya vê ya hem feodal û hem jî siyasî heye. Ango, timî aliyê mirovî yêlêborîner li pêş e... Heke wê li hember min girtibe û anîbe, ez ê jî lêbibihurim... Jesteke dualî muqabil e... Ango ev testeke jidilbûnê ye. Ji ber wê jî em dibêjin, 'li piştê kî hebe, bigihîje serokwezîr, serokkomar, hingê jî hûn jidilbûna xwe nîşan bidin...' ez ê bibêjim, 'binihêrin, we ewqas komkujî kirin, we ewqas mirov kuştin, binihêrin ez raserî we me, ez ji wê bi rûmettir im, ez ji we bêhtir serbilind im. Erê we ruhek ji min stand, lê jiyana we vemirî. Lewma tevahiya jiyana we, ev deqa reş wê li ser we bimîne.'*

birayê Nurcan Xanê Idris Beg bi xwe ji kêm kesan e ku bê dudilî got, ew dixwaze fail û berpirsiyaran bibîne û li wan bibihure:

*Yekane tişta ku ez ê bipirsim wê ev be: 'Te evqas kes, te malbatek evqasî, te çawa ew Qurana li wê malê bê xwendin hişt? Ew malbat te çawa sêwî hişt?' Helbet ez ê vê pirsê bikim... helbet ji bo agahiyan bistînim, min ê bipirsiya, 'we çima kir?' Ev jî mafê min ê herî xwezayî ye... Piştî ku wan ev hovîtî kir çima ez li wan nebihurim? Ew ji mirovbûnê derketine, ma ez jî bibim weke wan? ... Piştî ku hatin,lêborîna xwestin, ji bo şexsê xwe dibêjim, dema ku ji tevahiya xwîşk û birayên min, ji malbata minlêborîna xwe xwestin, dema ew qebûl bikin, ez jî ez ê qebûl bikim.*

Ozkan Begê ku em Diyarbekirê pê re peyivîn li axaftina me ya ku bi mijara lêhelalkirinê dest pê kir,lêborînê jî zêde dike, û dibêje, îhtîmalalêborîna failan ne mimkun e heta ku baweriyê bi poşmaniya wan neîne:

*Ez ê li dinyayê lê helal nakim... Ez lê helal nakim... Dema ku li ber çavên te bibûya, te ev nedigot... Divê mirov xwe bixe şûna wî mirovî. Berî her tiştî ev mirov wê were, wê bibêje 'ez hezar carî poşman im, ferman hatiye ji bo tişta min kirî.' Girêdayî rewşa hingê ye... Şexsê min, ez niha nikarim tiştekî bibêjim. Lê li gorî rewşa ruhiyeta wî ya hingê, ka gelo bi rastî poşman e, yan jî bi tenê bi gotinan e... Helbet dixwazim bibînim. Dixwazim li nava çavên wî binihêrim û çend gotinan bikim... 'Heke malbata te û zarokên te biketana vî halî, te wê çi bikira?', bi tenê min ê pirs bikira û bixwesta bersiva wê bide... Ango, gelo te ev bi înîsiyatîfa xwe kir, yan jî dewletê ev ferman dabû te, te kiribû?' ...*

*Divê ew qebûl bikin. 'Min ev kir, ez poşman im'. Temam? 'Xwezî min nekira û wijdanê min ne rehet e, bi ezab e.' Divê ez jî li nava çavên vî mirovî binihêrim û di vê bigihijim... Bi rastî ez wî bibînim, di çavên wî mirovî de poşmanî, bi tenê bi rewşa ruhiyeta xwe ya wê kêliyê ev kiribe. Mirov bibe insan dîsa ez ê lê bibihurîma. Lê ez niha lê nabihurim. Lewma dema ew bûyer tê ber çavên mirovî, mirov nikare li darê dinyayê lêbibihure.*

Mehdi Begê ku em li Batmanê pê re peyivîn dibêje, pirsên wî hene ku ji failên nexasim weke hevkarên cihî bi nav dike, bipirse. Ew difikire kulêborîn hem girêdayî "helwêsta" fail û hem jî biryara malbatê ye:

*Ango, ka bila ne nijadperestî be, niha li welatekî şer dibe, kom, şer dibe, tu têyî kuştin, tu dikujî, ev şer e, lê belê ya ku ez hîç xwe lê ranagirim, qebûl nakim, naxwazim bibînim û bi salan ji bo vê jiyam, ew e ku Kurdek bi destê Kurdekî were kuştin. Min ê jê bipirsaya ku cihê şermê ye û ne tişteke ku mirov qebûl bike... Welehî ji bo li wî bihurînê, meclîsa [şêwra] me ya malbatê heye. Di meclîsa malbatê de herî kêm heft xwîşkên min hene. Çar jî birayên min hene... Ez weke Mehdi lê bibihurim, ango ji bo ku bi rastî jî mirov lê bibihure, terzê wî, helwêsta wî ji bo min pir girîng e. Li ku disekine? Çawa disekine? ... Niha ne pirsgirêka min a yekser e, ev pirsgirêkeke civakî ye. Mesela, niha wê di jiyana min de lê were bihurîn, pir zehmet e yanî... Welehî hinekî zehmet e. Bêbav mezin bûn. Ango, ya rastî pir zehmet e mirov wî aliyê nijadperest wî cinawirê di nava xwe de bikuje. Di nava her mirovî de cinawirek heye. Ango mirov timî his dike, ez timî his dikim. Ango ew aliyên xweşbîn û reşbîn her şerê hev dikin, di qirika hev de ne. Lewma, heke tu lê nebihurî, hiqûqa xwe bixebitînî, tu ferqa te ji wî namîne. Ê bila niha bê ceza nemîne, niha tu wê wî bidî dest kîjan hiqûqê? ... Niha cezayê îdamê jî, were ji te bipirse, ez niha, belkî zarokên vî zilamî hene. Ma ne min got, va ye, aliyê xweşbîn û reşbîn timî şerê hev dikin.*

Sabiha Xana ku em li Batmanê pê re peyivîn, dixwaze pirsên wijdanî ji failên bavê wê kuştî bike, dixwaze ew jî êşên wê bibihîzin. Ew dibêje, poşmanî bilêborînê bi encam nebe jî, jestek e ku wê barê dilê wê sivik bike:

*Ev ji bo malekî dinyayê ê çawa ye, ez piştrast im ku ji bo malê dinyayê ye, wî kiriye, lê mirov ji bo ku karibe destê xwe dirêjî ruhê mirovekî bike, çawa dikare evqasî kor be? 'Tu çawa tiştekî bi vî rengî dikî? Min ê hesabê vê bipirsiya... 'dema te kir, dema te tiştekî wisa kir, ma bi te re hîç tirsek, wijdanek, merhametek nebû di nava te de ku te karî tiştekî wisa bikî?' Min ê ev pirs her jê bipirsiya... Ez heqê xwe tu carî lê helal nakim... Ez dixwazim bi rastî jî tesîrê li wî insanî bikim. Zehmetiyên wê demê yên bi serê min de hatî yan jî bi serê me de hatî, dîsa jî helbet mirov wê tiştên kêmmayî his bike... Me*

*ew ji dest da. Ango em ê bixwazin ku nebûna wî û êşên ku piştî çûna wî hatin serê me bi wî bidim hiskirin... Lênebuhurîn di warê dînî de jî girîng e, lê belê herî zêde, bi rastî jî, ew jidestdan heye, ez hez dikim ku rengê wê jidestdana me di wî de bidim vedan... Dibe ku xwe sertewandî his bikin, belkî ji tişta kirî poşman bibe, lê ez dixwazim ku bi rastî mikur were li tişta kirî. Heke bibînim poşman bûye, heke bibînim bi rastî poşman bûye, belkî bi awayekî nava min çîk bibe.*

Yusuf Begê ku em li Şirnexê pê re peyivîn jî, pirsên wî hene ji fail û berpirsiyaran bike. Tevî ku ew dibêje, ew ê li wan nebihure jî, bi awayekî mafdar bi bîr dixe ku hîna tu kesîlêborîna xwe ji wan nexwestiye:

*Ma em terorîst bûn? Ma sîleh di destê me de hebû? Ma me çi kiribû, li mala me, li halê ku me xwe sipartî jêr zemînan, bi kîjan heqî topan diavêjin malên xelkê? ... Ango, çima kirin? Ma gunehê me çi bû? ... Ango,lêborîn tiştekî xweş e lê belê piştî vê saetê, ango sala 1992'yan niha 2014 e. Piştî ku evqas dem di ser re bihurî, mirovên ku hîna ji me daxwazeke bi vî rengî nekirî, êdî em ê çawa li wan bibihurin?... 'me kir' yan jî 'li me bibihurin' yan jî va ye, ji tu kesî me bihîst tiştekî wisa... Heke bibihîzim, êdî em ê ji Xwedê re bihêlin yan jî em ê bibêjin, 'Xwedê mezin e'... Welehî hîç nafikirim ku li wan bibihurim.*

Pirsên Nihat Begê ku em li Bedlîsê pê re peyivîn, nexasim ji bo berpirsiyarên siyasî yên astên jor in, lê belê ew dibêje, ew meraq dike kîjan hestê kiriye ku fail vî sûcî bikin. Lê bi bîr dixe ku weke ku têkiliya bihîstina rastiyan û fêrbûna heqîqetê bilêborînê re hebe qebûlkirin, timî rast nîne. balê dikişîne ser aliyê civakî yê biryaralêborînê û dibêje ka ji bo çi ew ê lênebihure:

*Niha, ango em ji salên notî bigirin, bifikire, nûqteya ku pêvajo gihiştiyê. Ma gelo divîyabû bi evqas kuştinên fail nediyar, evqas mirov jiyana xwe ji dest bidin? Ango hedana mirov nayê ji xwe nepirse... Ango ez ji xwe jî dipirsim û ji wan jî. Ez ê ji wan kesên ku îro hikûmet in, desthilatdar in jî bipirsim. Çi yên hingê û çi yên niha. Ma gelo birastî hewce bû, lazim bû evqas mirov jiyana xwe ji dest bidin... Bi rastî jî vî gelî ev heq nekir, tu carî nekir.Ti carî nekir, ango weke hemû gelan... Heke ez wan bibînim, weke min gotî, gotina pêşî yan jî pirsa pêşî ya ji devê me derkeve, Xwedê dizane weke, weke rewşa insanî jî û weke ya wijdanî jî wê ev be: 'Çima?', 'Ji bo çi?' ... We ferman ji kê stand? ... Niha ên me, li cem me ewqas mirov hene, ewqas malbat hene ku ez jî yek ji wan im. bila ew malbat jî [li ser mijaralêborînê] biryarê bidin, ez jî bi wan re... helbet di dawiyê de ev mezinahiyek e, lê belê bi rastî ji bo ku careke din neqewime û ji bo ku tiştên wan kirî di dîrokê de bên nivîsandin, ez ê li wan qet [nebihurim] ... Bikevin herêmê, mirovan bi saxî bişewitînin, bê pirs û bê mahkeme wan*

*bidin ber guleyan, ango bi rastî jî ez dixwazim vê ji wan bibihîzim. Tişta ku wan dema înfaz dikir, his dikir çi bû ... Ew têgeh çi ye ku te ewqasî hov dike, te ewqasî kovî dike, ku te ji rûyê de dike?*

Birayê mezin ê Yusuf Beg, Ramazan Beg, dibêje, ew naxwaze pêrgî failan bibe, û ew ya rastî ji dewletê li benda jesta poşmaniyê ye. Li aliyê din, dibêje, ka çima ew ê li fail û berpirsiyaran nebihure, lênebihurîn ne bi tenê ji bîr nekirin e, di heman demê de jî nedana jibîrkirinê ye jî:

*Dawiya dawî, dewletek heye ku ev mêr-/jinkujî bi wan dane kirin. Mirov bi wan re rûbirû bibe wê tu tişt neguhere... Mirov dikarin poşman bibin, li şaşiya kirî serwext dibin. Lê belê kesên ev kirî me nas jî nakin. Ji bo wê ne pir girîng e. Dewleta ku ev bi wan da kirin ji bo me girîng e... Ne bi tenê kuştin. Yên mirî jixwe mirin. Ma em çawa dikarin zilma li saxmayiyan kirî ji bîr bikin. Nabe mirov lêbibihure. Hem malbata me qetil kirin hem jî ji bo ku em vê ji bîr bikin, nekin doz her roj zilm li me kirin. Ji bo minlêborîn jibîrkirina van hemûyan e... wateya [lênebihurînê] ji bo gelê Kurd ew e ku êşên wî kişandî ji bîr neke. Ji bo gelê Tirk jî wateya wê ew e ku êşên me kişandî bibîne û parve bike.*

Edip Begê ku em li Wanê pê re peyivîn, weke her kesî, dixwaze pirsa ‘Çima?’ ji failan bike; bi ya wî herçîlêborîn e, wê bibe xwedîderneketina li heqê qurbaniyan:

*Werin hemberî min û ez wan bibînim, ma ez çi dikarim ji wan re bibêjim? Dikarim çi bibêjim? Ango, ya bûyî bûye... ‘Te ev çima kir? Ji ber çi te kir? Ma zerareke bavê min li te hebû?’ ... Tu lê bibihurî, lê nebihurî jî ew mirov venagere, lê belê tiştekî weha jî heye. Weke ku tu tişt nebûbe, heke lê bibihurim yan jî wî efû bikim, helbetlêborîn mexsûsî Xwedê ye, hingê me wê destavêtibe mafê van mirovên mirî.*

Necmettin Begê ku li Bedlîsê em pê re peyivîn, dibêje, ew naxwaze bi failan re lê dixwaze bi serokwezîrên wê demê re rûbirû bibe. Ew têsîra serxwebûnê ya muhtemel a kulêborîn dikare li cem failan peyde bike jî hesab dike û dibêje, ew ê li ser navê birayê xwe yê mezin li wan nebihure; lê belê malbata birayê wî yê mezin dikare vê biryarê bide:

*Min dixwest serokwezîra wê demê Tansu Çillerê bibînim... Min dixwest çi bibêjim? ... ‘Te evqas mirov kuştin, evqas, ma wijdanê te hîç naêşe? ... Ango ez, bila Xwedê wan ceza bike, ma ez çi bibêjim... Herçîlêborîn e, li gorî çanda min ew mirov were, were hemberî min, min tiştekî wisa kir, li min bibihure, rica bike, çîk bike, û ez lê bibihurim, ji ber ku ez difikirim ku ew mirov hêvî dike wê bi ser keve, ez ê li wî nebihurim... Wê niha bibêje, ‘min evqas Kurd kuştin, min*

> *evqas mirov kuştin. Kurd evqasî çîk in, kêm in... Minlêborîna xwe jê xwest, wî jî ez efû kirim û çû' ... Wî insanî rehmet kiriye. Li şûna wî, werelêborînê bixwaze, û mirov efû bike, nabe. Beriya min divê zarokên wî û malbata wî efû bikin.*

Pirsên Adem Begê ku li Colemêrgê em pê re peyivîn jî gelek in, dixwaze failan bibîne; ji ber ku weke tiştekî ku wê êşa wî zêde bike ya failan rehet bike jîlêborînê qebûl nake:

> *... ez dixwazim van ên ku ev anîn serê me bibînim... Ez ê bi tenê bibêjim, 'ma hûn hîç li zar û zêçên van nefikirîn, wê çawa mexdûr bibin, wê çawa zehmetiyan bikişînin, hûn ê êşeke çawa bidin kişandin? Zarokên van ên piçûk hene, dê û bavên wan hene, hevjînên wan hene. Ma hîç hûn nafikirin? Hûn mirovekî dikujin, we kuşt. Baş e, ma hûn li yên ku li pey man hîç nafikirin?' Mesela ez dixwazim van bipirsim... 'Naxwe tu jî li dijî Kurdan mişt bûyî ji kîn û nifrînê.' Min ê bigota, 'heke tu ne mişt bûya ji kîn û nifrînê, dawiya dawî ev mirov in' ... Ez heqê xwe helal nakim. Ez ê bibêjim bila Xwedê wan ceza bike... Ez li wan bibihurim, dibe ku êşa di nava dilê min de nehedine. Dawiya dawî, êş bi me dan kişandin, heke li wan bibihurim dibe ku êşa di nava dilê min de netefe... 'Ez li we nabihurim... Tiştek ji destê min nayê... Ez nikarim tiştekî bikim, lê li dinya din û li vê dinyayê jî Xwedê ya dilê xwe bi we bike' ... Wan jixwe tişta wê bikira kiriye... Ez li wan bibihurim tiştek wê neguhere. Nerehetbûn û êşa wijdan a di nava wî de belkî hingê nemîne. Dibe ku bibêje, 'ez çûm cem malbata wî, ez efû kirim', lê ji ber ku êşa dilê min kêm nabe ya dilê wî jî wê kêm nebe. Ango bila kêm nebe.*

### *"Serokê me jî were ser masê..."*

Ew kesên ku bi awirê siyasî nêzî mijaralêborînê dibin, girêdayî banga tevgera siyasî ya *Kurd* û Abdullah Ocalan - û weha diyar e, ev bang weke bûyerekê tê dîtin ku wê pêk were heke di têkoşîna ji bo mafan a Kurdan qonaxeke erênî ya baş li pey hatibe hiştin - nêzî şêwazekîlêborînê xuya dikin ku em weke "lêborîna siyasî" bi nav dikin. Mirov dikare bibêje ku ew ên ku siyaseta cihî ya tevgera siyasî ya Kurd, tercîhên wê yên îstîxdam û kadroyan erê nakin ji ber vê yekê Partiyê rexne dikin jî di nav de, baweriya kesên em bi wan re peyivî ya bi Tevger û Ocalan û dilsoziya wan weke ku hîç xira nebe diyar e. Nimet Begê kku em li Diyarbekirê pê re peyivîn, di wê mijarê de ku mekanên sûcên li dijî mirovahiyê veguherînin mekanên gelemperî bi armanca zindîhiştina bîra kolektîf, a ku em weke "hafizeçêkirin" bi nav dikin, dibêje, birêveberiyên cihî têra xwe ne pûtepêdayî tevdigerin û Partiyê rexne dike; tevî vê jî di mija-

ralêborîn û aştiyê de baweriya bi Ocalan û Tevgerê tîne îfade dike.[352] Ew fikra helalkirina heqê cihê ji îradeyalêborînê bi cih dike, û wê red dike;lêborînê jî bi şertê derxistina holê/qebûlkirina heqîqetan û Darizandina fail û berpirsiyaran ve girêdide, û bi vê jîlêborînê dike xwedî xisleteke siyasî. Pirsa ku dixwaze ji fail û berpirsiyaran bike, bê îstîsna pirsa hevpar a herkêsê em bi wa re peyivî ye:

*Em ê bibêjin, 'Sûcê vî mirovî çi bû? Te çima li ser danî, te çima kuşt?' ...lêborîn wê hinekî zehmet be... Angolêborîn hinekî, heke ez li wan mirovên ku bavê min bi saxî şewitandin, bibihurim, lê em Kurd xwedî wijdan in. Ango ne diyar e jî. Ma ne ez dibêjim, em weke wan bê wijdan nînin. Em bi rastî jî naxwazin mirov bên kuştin... ev mijareke din e. Ez heqê xwe li kesî helal nakim. Kê neheqî li me kiribe bila Xwedê bela wî bidiyê... Niha, dema tu dibêjîlêborîn, hingê tu ji her tişta xwe digerî. Êdî tu bi awayê ku bi êşa xwe re bimîne li wî mirovî dibihurî. Tu hingê wî efû dikî, wateya wê ev e, lê belê peyvalêborînê hinî giran e. Ez nizanim ka psîkolojiya wî ya hingê wê bibe çi. Bi rastî jî gelek êş bi me dan kişandin. Bila destê xwe deynin ser wijdanê xwe. Bila bibêjin, 'welehî me neheqî li we kir, me filan, filan, filan kir. Em bendeyê fermanê...' Bendeyê fermanê kî be, bila were, û were dadghekirin, hingê bila yê raserî wî were dadgehkirin. Hingê ez ê lê bibihurim... Rêberê gelê me yê Kurd, êşa vî gelî dibîne û parve dike. Em bawer dikin ku ew ê bi awayê herî baş vê bi wan bide qebûlkirin... Mezinên vê tevgera me, pêşengên Tevgerê, ew bi awayê herî baş pê dizanin. Ew ê bêguman hesabê wê gelekî baş bikin, ka Kurdan çi ji dest daye, wê çi bi destbixin, ka wê çi bibe.*

Dayika Nimet Beg, Nesima Xan ne weke kurê xwe difikire, bi zena wê heke ew li wan bibihure fail wê muaf bibin ceza, dibêje, ew ê li failan nebihure; lê belê ew jî nêzî fikralêborîna siyasî xuya dike. Ew derdibire, heke aştî pêk were, Abdullah Ocalan serbest were berdan, ji bilî failan ew ê heqê xwe li her kesî helal bike:

*Ez naxwazim ku ew derkevin pêşberî min. Ez dixwazim ku ceza li wan were birrîn... Ewqas zilm li me kirin... Wan mêrê min kuşt, wan ew şewitand. Ez bibînim, nikarim derdê xwe bibêjim. Ez nikarim tiştekî jî bibêjim... Bi tenê Xwedê derman bide derdê me... Welehî em ê efû nekin... Xwedê heqê wî nede wendakirin... Heke ev şer xelas bibe, heke deriyê girtîgehan vebe, aştî pêk were,*

352 Di hevpeyvîna bi telefonê de ya ku paşê me pê re kir, em fêr bûn ku daxwaza wî ya ku mekanê bavê wî lê hatî kuştin veguhere navendeke çandê ya bi navê bavê wî hîna jî pêk nehatiye, lê belê ew kêfxweş bûye ji ber ku  li ber wî mekanî di salvegera kuştina bavê wî de bibîranînek hatiye organîzekirin.

*Apo derkeve, ez li hemûyan helal dikim... Welehî ez di hinavên xwe de jî helal dikim, bi devê xwe jî helal dikim. Heke aştî pêk were, heke deriyê girtîgehan wê vebe, ez li hemûyan helal dikim... Welehî ez li wan herduyan helal nakim, ew herduyên ew şewitandî.*

Gulsima Xana ku li Colemêrgê em pê re peyivîn dixwaze ku fail û berpirsiyaran bibîne, heqîqetên bi wan ilam bûyî carekê jî ji wan bibihîze, lê belê tevî sedema xwe jî pêşî dibêje, ew ê li wan nebihure:

*Xwezî min bidîta. Çawa dilê me şewitandin. Çawa kezeba dayika min şewitandin... Bila werin hemberî min, bila bibêjin, 'rast e ... me ew jî birin tabûrê. Heta sê rojan jî di destê me de bûn. Roja paşê me ew li nîşangeha tabûrê kuştin. Piştre me ew şewitandin û avêtin çalê.' Bila werin hemberî min û van îfadeyên xwe jî bidin ... Lebihurîn? Na... Na. Ez ê bibêjim, 'wê roja ku we birayê min kuşt, hûn çima li me nebihurîn? Welehî em jî li we nabihurin. Hûn li mala xwe, em li mala xwe.*

Li aliyê din ew dibêje, ew li wî eskerî bihuriye ku bi mikurhatinên xwe kiriye ku fail û berpirsiyar derkevin holê; ew dibêje, fikaran dike ji jiyana wî eskerî:

*Erê, em lê bihurîn... Hat, got, 'wijdanê min nerehet e'. Esker bû. Di bin fermanê de bû. Ew esker bû, çû mala xwe, poşman bû, vegeriya. Her tişta qewimî got. Wî got, 'filan kes e'. Em rabûn, me doz vekir. Ew esker dan wendakirin. Êdî em nizanin, eskero ka tu hatî kuştin yan tu sax î? Em pê nizanin. tu xebera me jê nîne. tu haya me jê nîne ka çi anîn serê vî eskerî.*

Gulsima Xan li aliyê din jî weke ku mîna Nimet Beg û Nesima Xanê xwediyê mefhûmalêborîna siyasî be xuya dike; ew dibêje, ew ê failan şêxsî û bi dilê xwe efû neke, lê belê ji bo aştî û wekheviya siyasî ew ê li wan bibihure. Dema em jê dipirsin ka ew ê heqê xwe helal bike yan na jî li şûna bersivê bide, şertên xwe yên siyasî yên ku doza wan dike, îfade dike:

*Heke heqê me bidaya, azadî pêk bihata. Serokê me jî bihata ser masê, hingê mirov ji hertiştî dikare bigere... Erê, hingê mirov dikare efû bike. Ne bi tenê ji bo min. Gelek mirovên me hene ku ev hatiye serê wan... Heke serokê me were, bi Erdogan re li ser masê rûnin... Ya di nava min de bila di nava min de bimîne, hema bila serokê me bibêje... Dibe ku wextekê, bibêjin qesasê serê birayê te ev e. Dibe ku dilê min qebûl neke. Heke ez bibêjim ka ez bi sîlehê li ser deynim, hingê ez ê bibêjim, Serokê me efû kiriye êdî, pêdivî bi wê sîlehê jî nîne.*

Keça sezdeh salî ya Gulsima Xanê, Filîz, ber bi dawiya hevdîtinê tê cem me û fikrên xwe yên ku gotinên diya wê tesdîq dikin, bi me re parve dike:

*Ez lênabihurim, mesela ez ê ji bo çi lêbibihurim? ... Çima? Mesela beriya wê, mesela dapîra min, timî diçû doza hestûyên zaroka xwe dikir. Mesela heqek bidana, mesela Serokê me xistine hepsê, mesela çi bi destê wan ket? ... Mesela Serokê me berdin, em zanibin ku her kes wê heqê xwe bistîne... Mesela rabin Serokê mirovî biavêjin hepsê, hem jî bikujin. Dilê mirovî qebûl nake ku li wan mirovan bibihure... Ez ê pêşî bibêjim, Serokê me berde, heqê me bide.' Şehîdên me belesedem namirin. Ji bo armancekê dimirin. Em jî wan efû bikin... Mesela wan hestûyên xalê min bidana dapîra min, belkî dîsa jî tiştek bibûya. Mesela dilê min hîç qebûl nake ku ez wan efû bikim.*

Tiştên ku Filîz dibêje, piştrast dikin ka çawa di wan rewşan de ku fail û berpirsiyar nayên dadgehkirin, heqîqet nayên qebûlkirin, newekheviya siyasî ya ku çavkaniya bêedaletiyê ye ji holê nayê rakirin, çawa hestên mîna rikdarî û xeydê ji nifşekî derbasî nifşê din tên kirin.

Kamil Begê ku em her weha li Colemêrgê pê re peyivîn, dibêje, ew naxwaze ku fail û berpirsiyaran bibîne, herçî şexsê wî ye, ew ê li wan nebihure, lê belê heke daxuyaniyeke Ocalan ji bo vê were, şerhê datîne ji bo hevkarên cihî û derdibire ku ew dikare fikra xwe biguhere:

*Ez naxwazim. Ez çi qasî dilsozê rûmet û wijdanê xwe jî bim, dilê min wê destûrê nede min, kî dibêje bila bibêje... tu axaftina min bi wan re nabe ku bibe, kî bibêje bila bibêje... Ez naçim cihê ew lê. Ez nakujim... Lê ez lênabihurim. Ez bikevim binê erdê jî ez lênabihurim... Lewma, tu bi wê birînê, bi wê êşê nizanî... Bila ev neyê jibîrkirin. Çima bila neyê jibîrkirin? Dema ku ez li êşa dayika xwe difikirim. Ew ên [ku birayê min] birin û kuştin, ez herim li ber çavên diyên wan mejiyê kurên wan ji hev belav bikim. Ma ew dayik wê min efû bike? ... Yan jî ma ew xwîşk/bira wê min efû bike? Na, efû nake. Ez ne bi hesta tolhildanê dibêjim... Heke Serok bibêje, wan mirovan efû bikin, ev ji min û wêde ye. Ez nikarim ji vê bêhtir bibêjim. Em dixwazin Tevger jî li ser mirovên wisa raweste. Bila hevkarên cihî yên Kurd ên ku agir berdan malan û ew mal rûxandin berdêla vê bidin. Heke Tevger û gelê Kurd van hevkarên cihî efû bikin, em ê jî efû bikin... Ez ê di dilê xwe de efû nekim... Heke ez bi vî agirê ketî dilê xwe zanibim, kesekî ku di malbata wî de şehîd nebin, nikare bi vê êşa min zanibe... Ez dîsa jî ji tevgera Kurd re dihêlim. Derdê şexsê min ne tolhildan e... Me çavên xwe bi Serok vekirin. Bi saya serê Serok, tevgera Kurd û gelê Kurd em hatin heta roja îro. Li devera ku Serok û Tevgerê efû kir, heke ez bibêjim, ez efû nakim, ev ji hedê min û wêde ye. Ez tiştekî wisa nabêjim. Di Tevgerê de bi hezaran ê weke [birayê min] şehîd bûne... Dema ew bibêjin, em efû dikin, em jî, em ê ji bo xatir û keda Serok û Tevgerê êfû bikin.*

Hasan Begê ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn, naxwaze pêrgî failan bibe, lê dixwaze fêr bibe ka çima birayê wî hat kuştin. Tevî ku pêşî dibêje, ew ê tu carî li wan nebihure jî derdibire, heke daxuyaniya Abdullah Ocalan û îradeya hevpar a gelê Kurd guhertî be, ew ê biryara xwe biguhere; ya rastî ew dibêje şêwazekîlêborîna siyasî mimkun e:

*Ez naxwazim. Ez wan mirovan bibînim... Ez dizanim, ew mirov wê neyên pêşberî min. Bila cezayê wan çi be bikişînin... Tişta ez bibêjim ew e ku 'te birayê min kuştiye, birayê keseke/î din nekuje. Te canê min êşandiye, canê keseke/î din neêşîne. Ez dozdar im ji te' ... Ez tu carî lênabihurim... Di hinavên min de agirekî ewqasî mezin heye, destê min, milê min, lingê min çûye. Birayê min çi kiriye? Ma birayê min dizî kir, mêr kuştin? Ma birayê min nanê xelkê xwar? Birayê min gotiye, 'ez Kurd im.' ... Ez li van mirovan bibihurim, ew jî wê destmalên xwe bihejînin û bibêjin, 'ev li me bihurîn.' Ez li wan nabihurim... Dema aştî pêk were, bibêjin ji bo aştiyê... Gelê Kurd, gelek e ku şehîdên wî hene... Serok bibêje, 'li van mirovan bibihure', hingê min efû kirin. Wekî din bi tu awayê din efûya wan nîne... Kurdên xwedî şehîd, dema ku gelê me biryareke bi vî rengî stand, em jî, em ê bi destê wan bigirin. Lê ez bi tena serê xwe li wan nabihurim. Serok ji Imraliyê bibêje, 'li van mirovan bibihurin,' welehî em ê efû bikin. Welehî nebêjin, ez efû nakim. Heta ku biryareke hevpar dernekeve holê efûya wan nîne.*

Meryem Xana ku li Şirnexê em pê re peyivîn li aliyekî dibêje, ew nikarê gunehkarên ku Xwedê jî nikare efû bike, efû bike, li aliyê din dibêje, aştî bibe û Abdullah Ocalan were berdan, dibe ku ew heqê xwe li wan helal bike, li aliyê din jî dibêje, aştî pêk were jî û heqê xwe helal jî bike, nava wê dê aram û rehet nebe:

*Pirsa ez ji van mirovan bikim, nîne... Xwedê wan efû neke. Bila ev mirov werin girtin. Xwedê wan efû neke. Xwedê derd û bela bide bedena wan... Bila ew jî vî derdî bibînin. Bila zanibin ev derd pir zehmet e. Mala wan xira bibe. Êdî wê mala milet xira nekin. Yên ku malên mirovan xira dikin, mala wan xira bibe, êdî wê malan xira nekin... Ez efû nakim... Belkî Xwedê efû bike. Xwedê jî efû nake. Ez wan efû jî bikim Xwedê efû nake. Xwedê qebûl bike ez jî, ez ê qebûl bikim... Ez dibêjim bila aştî pêk were. Bila Serokê me berdin. Bila deriyên hepsan vebin... Hingê ez ê li wan helal bikim. Ma ez li wan helal nekim, ez ê çi bikim? Ez helal nekim wê çi bibe, ez helal bikim wê çi bibe... Ji bo aştiyê ez e li wan helal bikim... Welehî heft aştî pêk werin nava min rehet nabe. Bila aştî pêk were. Serokê me were berdan. Bila deriyê hepsan were vekirin... Ji bo aştiyê ez ê helal bikim, lê tu hinavên min tijî bikî ji berfê jî nihavên min hînik nabin. Dilê min rehet nabe.*

Raziya Xana ku li Batmanê em pê re peyivîn, naxwaze fail û bepirsiyaran bibîne; pir carî dike ku ew dixwaze bigihîje hestûyên kurê xwe, dixwaze ku Abdullah Ocalan û girtiyên din werin berdan û doza aştiyê dike, lê belê dibêje, daxwazên wê pêk werin jî wê zehmet be ku ew lêbibihure:

*Li ber çavên min ew dijminên kurê min in. Ma çavên min çawa bi yên wan re werin hemberî hev? ... Ez naxwazim wan bibînim. Bila neyên pêşberî çavên min... Ma ez ê êdî çi ji wan bikim? Ma min çi ji wan dijminan kiribû wisa li kurê min kirin? Mirovekî feqîr bû, mirovekî qenc bû, Xwedê dizane... Welehî ez ê ji bîr nekim. Dilê min êdî wê li wan ne vekirî be... Ez wan efû bikim jî, Xwedê wê wan efû neke. Xwedê vê hiqûqê wê qebûl neke... Bila Xwedê cezayê wan bide... Ma ez çi ji dewletê bixwazim? ... Ez doza hestûyên xwe dikim... Ez dixwazim aştî pêk were, ez dixwazim mirov nemirin, bila nekevin binê erdê ... Bila yên di hepsê de derkevin. Ez dixwazim Apo ji hepsê derkeve... Ez aştiyê dixwazim... Welehî zehmet e [ku ez lêbibihurim]... Bi dilê min zehmet e... Bi min zor e... Heqê min ji bo aştiyê, welehî êş tine nabe... ez çi bikim jî êş tine nabe... Ez çawa êşa xwe dikişînim, bi heman şiklî ez êşa yên din jî dikişînim. Ez ya eskeran jî welehî ya polêsan jî dikişînim, ya yên li çiyê jî dikişînim... Welehî zehmet e [ku heqê xwe helal bikim]... Ji bo aştiyê, aştî pêk were, mirov hew bên kuştin... Zimanê min nagere ku ez heqê wê nehêlim... [Heke ez heqê xwe helal bikim] ez ê wê ji dest bidim, ez ê heqê [wî] ji dest bidim. Bi min gelekî zor e... Xwedê neke heqê wan ji dest here... Ez dixwazin aştî pêk were. Ez dixwazim Apo ji hepsê derkeve. Heta em sax in, em li pişt Serokê xwe ne. Em doza aştiyê jî dikin. Ez dixwazim pêşiya eskeran vekirî be, dayikên wan li pey wan negirîn... Ez nikarim heqê xwe helal bikim... Êşên min pir giran in. Ji bo min zehmet e... Serok ji min re bibêje, hingê Serok dizane... Heta bi mirinê em ne ji zarokên xwe û ne jî ji Serokê xwe digerin.*

Kurê Raziye Xanê, Nizamettin Beg, ji wendakirina di bin çavan de ya birayê xwe re ya rastî êdî dibêje kuştin; ew dibêje, pirsa herî girîng a ku ji failên bi şexsê xwe tevlî vî gunehî bûne ew e ku li aqûbeta birayê xwe bipirse. Ew derdibire ku heke bibihîze poşman in, ew ê li wan bibihure û daxwuyaniya Ocalan a li ser vê mijarê jî wê tesîrê li biryara wî bike, lê belê rewşek heye ku ev daxuyanî jî kafî nîne:

*Ez nizanim hingê wê hestên min çi bin. Lê belê ez meraq dikim ka çawa wisa bûn cinawir, ez meraq dikim. Tişta pêşî ez ji wan bipirsim wê aqûbeta birayê min bûya... Em nizanin li ku ye û çawa kuştine, em dizanin kuştine. Ev bi salan e, kêliyek nîne ku lê nafikirim, bi şev tê xewna min. Ev bêgavî hemû hêrsa min radikin. Ji destê me tiştekî zêde jî nayê... Min dixwest bipirsim ka birayê*

*min çawa kuştin û li ku dere veşartin... Heke poşman bin, doza efûyê bikin, ez ê li wan bibihurim, lê birayê min ji bo min nemir, ji bo têkoşîneke siyasî hat kuştin. Heke tevgera siyasî ya Kurd efû bike, ez jî, ez ê efû bikim. Heke Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan efû bike ez jî, ez ê efû bikim... Li hemberî wan ez li kuştinê, tiştên weke yên wan hov nafikirim. Şexsê min, heke poşmaniya xwe îfade bikin, werin bibêjin, ez dikarim li wan bibihurim. Dawiya dawî, ew fail tetikkêş in. Esas dewlet e ya ku ev dan kuştin. Ez li dewletê nabihurim.*

Herçî Ebdulselam Beg e ku li Mêrdînê em pê re peyivîn, tevî ku der barê Abdullah Ocalan de tu şert yan jî hêvî bi lêv nekirin jî tuwanc bi pêdiviya başbûna şert û mercan dike ji bo pêkhatinalêborînê; ew dibêje, ji bo ku tiştên hatî serê xwe ji bîr neke ew ê li failan nebihure:

*Ez ê bi tu awayî bi wan re neyêm rûberî hev. Ez ê qebûl nekim. Ez hîç naxwazim wan bibînim... tu carî temaseke min û axaftineke min bi wan re wê nebe... Ez bi tu awayî wan efû nakim... tu carî li wan nabihurim...lêborîna wan, tine hesibandina êşên hatî serê te ne... Ez ê li wan nebihurim ji bo ku heqîqet derkevin holê, edalet pêk were, ji bo ji bîr nekim û nedim jibîrkirin... Lênebihurîn ew e ku Kurd êşên kişandî ji bîr nekin. Ji bo çi ev êş hatin kişandin? Ma çi guherî ku Kurd li wan bibihurin? Ma ji bo çi li wan ên ku ew kuştine û dane kuştin bibihurin?*

Pirsa Abdulselam Beg a 'ma çi guherî' sedema esas a wan kesên ku bi heman hêncetêlêborînê red dikin jî dide der: ango hestên rikdarî û xeydê ku pir zehmet e ku biguherin. Ew rikdarî û xeydekê terîf dike ku bi tenê jestên siyasî û tedbîrên hiqûqî yên mezintir dikarin wê ji holê rakin hem di mijara wekheviya siyasî û hem jî di mijara rûbirûbûna bi rabihuriyê re. Ya ku xwe li Abdulselan Beg dipêçe rikdariyeke li ser hev kom bûyî ye ji ber wekheviya civakî û siyasî ya şiklî, edaleta şiklî, her şewaz awayê jiyana bi hev re ya ku bi rengekî şiklî li hev hatiye anîn.

Me li jor behs kiribû ku Yasemin Xan jî weke bavê xwe gotibû, naxwaze failan bibîne û wê tu carî li wan bebihure. Rikdarî û xeyda wê bi xwe bêhêvîwateke mutleq dihewîne: "Ma aştî wê pêk neyê! Ez bawer nakim... Wê wisa dewam bike. Timî xwîn wê were rijandin, timî mirovên ciwan. Ez ê zaroka xwe bigihînim, mezin bikim, ew ê bên [û] bikujin. Wisa, ez ji vê bawer dikim."

### *"Ji bo aştiyê zimanê min kin e"*

Ji bo hin fikrên neerênî yên di biwaralêborînê de, yekane îhtîmala şikestinê, aştî ye. Bedriye Xana ku li Batmanê em pê re peyivîn, tevî ku dibêje, rexmî

aştiyê wê zehmet be li failan bibihure jî di dawiyê de dibêje, heke 'aştiyeke esîl' pêk were, ew ê failan ji Xwedê re bihêle:

*Ez dixwazim bibînim... Tiştên ji wan mirovan re bibêjim hene... Ez ê wan li dinyayê efû nekim... Ma ji bo çi bê qisûr û bê guneh tên mêrê min dikujin, bavê evqas zarokan? ... Ma ez ê çawa wan efû bikim... Dilê min naxwaze. Ez nikarim bikim... Heke wê aştî pêk were, hingê li ser ser û çavên min, hema bila aştî pêk were. Yê çûyî çû, êdî bila yên mayî neçin... Em aştiyê dixwazin... Bila dilê tu kesî neêşe. Bila aştiya mayînde û heqîqî were. Ne aştiya qelp û xapandinê... Heke aştiya bi rastî ye, li ser ser û çavên min... Heke aştî pêk were jî, wan kesan bînin hemberî min welehî ez ê wan efû nekim. Ez aştiyê qebûl dikim, lê wî bînin hemberî min, ez ê bibêjim, 'welehî ez wan efû nakim' ... Welehî helal nakim... Welehî zehmet e. Ji bo aştiyê zimanê min kin e. Xwezî aştî bihata, êdî ji Xwedê re mabûna. Xwezî aştî pêk were, aştiyeke esîl, ne aştiyeke qelp. Bila aştî bihata û ew ji Xwedê re bimana.*

Sarya Xana ku li Colemêrgê em pê re peyivîn jî dixwaze ji failan bipirse 'çima?' Ew dibeje, heta ku daxwaza "bila xwîn raweste" ku weke "çareseriyê" bi nav dike, pêk neyê, ew ê li failan nebihure, lê belê heke "çareseriyeke rast" pêk hat, ew ê biryara xwe biguhere. Di nava vê çareseriya rast de serbestberdana Abdullah Ocalan jî heye ku Sarya Xan dibêje, wê bike ku "şehîd" jî rehet bikin:

*Ez dixwazim ji wan bipirsim... 'Sedema we çi bû? We çima wisa kir? We bi gotina kê kir? Kê ev agahî da we?' Ez dixwazim fêrî van bibim... Ez lênabihurim... Ez çawa lêdibihurim? Kezeba bi hezarê hezaran malbatî şewitiye. Zarokên bi hezaran malbatî wisa çûne... Heke ez li wan bibihurim, tu tişt, hingê wê wijdanê min nerehet bibe... Ez ê wisa efû bikim. Dilê dê û bavê min şewitandin, dilê me şewitandin. Ez tiştekî wisa dixwazim ku çareserî were peydekirin. Êdî bes e, bila dil û kezeba dayikan êdî neşewite... Bila ev xwîn raweste... Ma dewlet nabêje çareserî? Bila çareseriyeke rast bibe... Bila çareseriyê bîne. Bes e ku kezeba van dayikan dişewite, bila ev xwîn raweste... Heke tiştekî wisa bibe ez ê efû bikim. Ez ê di dilê xwe de jî efû bikim... Heta ku ev mirov dernekevin holê û heta ku xwîn raneweste, êdî bes e ku dilê dayikan dişewite, heta dayik êdî hew bigirîn, mirov nikare efû bike... Dema Serok derket, birayê min jî wê derkeve, şehîdên Kurdistanê hemû wê derkevin.*

Sinem Xana ku li Wanê em pê re peyivîn failan weke "dijmin" terîf dike û naxwaze wan bibîne. Şertê wê yê ji bo qebûlkirina tiştaku em jê relêborîna siyasî dibêjin jî dîsa aştî ye:

*Ma mirov derdikeve pêşberî dijminekî ku wî dikuje? Mirov bikeve binê çaleke*

*bê binî û wan nebîne çêtir e... Xwedê bike em nebînin, Xwedê bike em nebînin. Welehî bila em bikevin binê behrê jî û em wan nebînin... Ma ez ê çi bibêjim, heke mirovên qenc bûna, ev nedikirin. Ma ez bi wan re sohbetê bikim, em ez ji wan re bibêjim 'we çima wisa kir?' ... Gunehê me nebû, dijminê me nebû. Ez li dinyayê nikarim li wan bibihurim. Li vê dinyayê jî, edalet e, ka çi ye li heqê wan neyê pirsîn, mafê me nedin me, li dinyaya din jî ez ê nikaribin li wan bibihurim, ez ji wan û îmana wan dozdar im... ji bo mirovên me, ciwanên me, ji bo ku şehîdên me çênebin, heke biryareke wisa bidin, bibêjin, 'ma em gavekê biavêjin' ez ê jî bibêjim 'erê'. Li derveyî vê, li cihê xwe bisekinin, bibêjin 'efû bikin', ez qebûl nakim... Heke gavê biavêjin, aştî pêk were, ji bo mirovên me yên li hepsan girtî, ji bo mirovên me yên li çiyayan, ji bo tevahiya mirovên me, ji bo ku xwîn nerije... Heke aştî pêk were, heke aştî pêk were, ji bo mirovên me, ciwanên me, erê, lê heke aştî pêk neyê, bibêjin, 'efû bike' ez nikarim efû bikim... Heta ez sax di dilê min re tiştekî baş wê derbas nebe. Ez bi tenê ji bo ciwanan ji vê re dibêjim, 'erê', bila êdî xwîn nerije, şehîdên me nebin, mirovên me neyên kuştin, lê helbet ya di dilê min de tişteke din e, ew cuda ye.*

Di qismê beriya niha de me qismî behsa fikrên Hasan Beg kiribû ku em li Diyarbekirê pê re peyivîbûn. Tevî ku pêşî gotibû, ew ê tu carî failan efû neke jî, îfade kiribû ku heke daxuyaniya Abdullah Ocalan û îradeya hevpar a gelê Kurd guhertî be, ew ê biryara xwe biguhere. Em li vir behsa şertekî wî yê din ê ji bo êfûkirinê bikin, ango daxwaza aştiyê: "Dema wê aştî pêk were, heke bibêjin ji bo aştiyê. Aştî tiştekî gelekî mezin e. Aştî mezin e. Aştî ne çiya ye û ne jî derya. Aştî tiştekî gelekî xweş e... Kurdên xwedî şehîd, gelê me dema biryareke wisa dan, em ê jî bi destê wan bigirin. Lê ez bi tena serê xwe efû nakim."

Xwîşka Hasan Beg a mezin jî dibêje, ew ê li failên ku niha naxwaze wan bibîne, nebihure, lê heke aştî pêk were dibe ku fikra wê biguhere:

*Ez zanibim ka ev kî ne, heke ew di vê rêyê de biçin, ez ê di rêya din re biçim. Ez ê rêya xwe biguherim, werin pêşberî min, ez ê berê xwe biguherînim... Ma mirov dikare efû bike? ... Na ... Welehî ez nikarim. Çûye, lê her roj li ber çavên min e, nabe, nabe... Belkî rojekê tiştek bibe... Niha dilê min qebûl nake. Dinya diguhere, mirov kal û pîr dibin, dilê mirovê çîkî dibe. Hingê ez nizanim... Heke wê aştî pêk were, belkî. Ez bawer nakim ku karibim li wan helal bikim.*

Her çî birayê mezin ê Hasan Beg, Taha Beg e, ew dibêje, bi şertê demokratîkbûna dewletê dibe ku ew ji daxwaza cezakirina failan bigere, lê ew ê heqê xwe li wan helal neke, li wan nebihure. Ew kêfxweşiya xwe ya ji aşkerekirina heqîqetan jî îfade dike:

*Tu dizanî, yekane armanca min ev e? Sekinandina ha vî şerî, ya vî şerî. Êdî mirov nemirin. Maf û hiqûqa mirovekî heye, di nava demokrasiyê de wekhevî. Jiyana bi çi Tirk, çi laz, çi Kurd kî dibe, çi xirîstiyan, çi ermenî re... Ne wisa bi gotinan, ez ê vê bidim, ez ê filanê bidim. Qanûnîkirin, qanûnî bike, heq û hiqûqa vê leva bike, mafê her kesî bidiyê... Heke bi rastî û ji dil be, ez ê ji mafê xwe, yê xwe, ma ne ez jê re wijdan dibêjim, heta saet çaran ez ranazim. Ez ê jî ha ji wê çîka xwe gerim... Helal nabe... Ez lê nabihurim... lê belê ez ê jê re bibêjim, ez gelekî spas dikim. Ma niha esker ew kuştibe, esker bi tişta xwe ew nekuştiye. Kesekî ferman daye... Sûc û gunehê esker nîne. Ez wî gunehbar nakim. Ez tu carî esker gunehbar nakim... Bila rabe ji min re bibêje, 'tiştekî wisa bû, me bir, me êşkence lê kir, paşê jî me ji paş ve gule berdayê, me ew kuşt.'*

Mehmet Begê birayê wî kuştî yê ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn jî îşaret bi pêdiviya avêtina gavên demokratîk bi destê dewletê dike, û dibêje lihevbihurîn bi tenê miqabilî hev dibe:

*Lêborîn weha dibe.lêborîn dualî dibe, yekalî nabe. Ev du sal in li vî welatî xwîn narije. Dayika esker jî nagirî, ya gerîla jî. Ev tiştekî gelekî baş e. Lê belê ev yekalî ye. Dewletê tu gav neavêtiye. Ne di mijara zimên de, ne di mijara çandê de. Navên gundên me guhertin. Gunehê me çi ye. Ma mirovbûn guneh e? Em Kurd bûn. Ev gunehê me bû. Xwedê em wisa xuliqandin... [Heke dewlet gavê biavêje] ez ê lê bibihurim. Ez ê destê xwe jî dirêj bikim. Dêyeke din, bila tişta hatî serê min neyê serê keseke din... Ez ê ji dil lêbibihurim... Ji bo ku sibe tu kes weke hevjîna min, zarokên min û jinbira min zehmetiyê nekişîne, ez ê li wan bibihurim. Yê li hemberî min bila min jî ji mirovan bihesibîne.*

Abdulkerim Begê ku li Mûşê em pê re peyivîn, ji rayedarên payebilind re yên ku dixwaze wan bibîne, dixwaze bi tenê bibêje, "agahiyên di destê xwe de bi raya giştî re parve bikin", li gorî wî dema di navê re bihurî êdî girîng dike ku heqîqet derkevin holê û werin qebûlkirin. Dema ku dibêje ya esas ne fail in, di şexsê berpirsiyarên siyasî de bihurîna li dewletê ye, ango behsa lipêşbûna girîngiya şertênlêborîna siyasî dike, şertên ji bo bihurîna li dewletê jî weha dike rêz:

*Em hazir in her tiştî efû bikin, bi tenê ku em bizanin em ê li kê û li çi bibihurin... em kesê/î mixateb nagirin, ango şexs ne girîng e, şexs sazî ye... Dewletê, em hazir in li dewletê bibihurin, lê du şertên me hene, ya pêşî bila pirsgirêka Kurd were çareserkirin, ya diduyê jî bûyer rohnî bibin... Em amade ne êşên me kişandî ji bîr bikin, bi tenê ku em zanibin ka em ê li kê bibihurin. Bila derkeve holê... Hingê bûya, dibû ku em lê nebihuriyana, lê di navê re bîst sal derbas bûn, ango em ê bibêjin, bi tenê bila derkeve holê, bi tenê, ma ne kesên wendakirî hene,*

*ew malbatên wendakiriyan her cara derdikevin televizyonê dibêjin, bi tenê hema ku em hestûyên xwe bibînin… Em jî, ango, derketina holê ya heqîqetan me bextewer dike.*

Mehmet Begê tetikêşên Hizbullahê bavê wî yê îmam kuştî, yê ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn bi xwe ji berpirsiyarên siyasî bêhtir dixwaze pirsan ji failan bike:

*Min dixwest bi vê zanibim, çima? Ango, ji bo çi? Çima? Ev mirov îmamek bû. 'Tu jî vê li ser navê dîn dikî, lê ez ravekirina wê ya zanistî naxwazim. Li gorî îdeolojiya te, te çima ew kuşt? Heke li gorî dînê Îslamê tiştekî bi vî rengî heye, bibêje' … Ka ez vê jê bipirsim. Ji bo çi, çima? Ji bo çi ev mirov? Lewma, weke tevgereke siyasî, em bibêjin, ez çûm. Cezayê min, ji ber filan û filanê min serî hilda li hemberî filan û filan dewletê. belkî min bi cezayê vê zanîbû. Min zanîbû ez ê vî cezayî bikişînim û min ji bo vê kir. Lê ev mirov kesekî sivîl e. Ne kesek e jî ku timî siyasetê dike… Ha, heke tu vê dibêjî, tu dibêjî, 'dewletê da ber min, ew da kuştin, hingê vê jî ji min re bibêje.' Ez ê hingê jî rehet bibim. Ez ê dîsa rehet bibim. Ez ê bibêjim, temam, dewletê em dijmin qebûlkirin… tu wê sedema wê ji min re bibêjî. Ceza lê [fail] hatiye birrîn yan na, ev ji bo min ne gelekî girîng e. Bawer bike ne gelekî girîng e, lê belê sedema vê aşkere bike.*

Tevî ku weke Abdulkerim Beg dibêje, ew dikare li failan bibihure jî, ji bo ku bibêje, ew vê weke meseleyeke talî dibîne, rave dike ka dewlet û "sîstem" divê çawa veguherin:

*Ji helalkirina heqê min û wêde, meseleyeke weha heye. Ango tu dewletek î. Tu vê weke bingeh dibêjî. Tu dibêjî, 'li ber perê Dicleyê karikek jî wenda bibe ez wê şevê ranazim.' Tu bela xwe ji karikan veke, te li ber perên Dicle ciwan nehiştin. Te mirov nehiştin. Tu wê hesabê vê çawa bidî? Nikare hesabê vê bide. tu kes nikare bide… Niha, ma ne ez dibêjim, ez ê vê ji tetikkêşan re bibêjim. 'Tu çima bêyî ku nas bikî vî zilamî dikujî? Xwedê aqil, fikir û mejî daye te.' … Lewma di rewşa normal de peyveke klasîk e, mejiyê wî hatiye şûştin… Kî mejiyê wî dide şûştin? Ev sîstem mejiyê wî dide şûştin. Hîç xweber nayê şûştin. Dikare angaje bibe, lê derdora ku te anagaje dike, diyar e. Sîstem diyar e. Ez xweber ne dibim cinawir, ne jî dibim melek… Ez ê li şexsê wî bibihurim, lê belê ez ê ji vê sîstemê re jî bibêjim, 'ho sîstem, heke tu dixwazî xwe ji van gunehan hemûyan bişoyî, tu pêşî wesfê mirovbûnê bide insên. Bila careke din ev neqewimin. Hatin serê min bila neyên serê nifşê piştî min. Pêşî çi ye? Ji elîfbêya perwerdeyê, ji sinifê yekê û pê ve tu wê mirovbûnê fêr bikî… Ez vê bibêjim. Lebihurîn tiştekî mexsûsî mezinan e. Ez behsalêborînê nakim, ez vê*

*dibêjim. Heke ev sîstem wê bi rastî xwe biguhere, heke wê veguhere, welew ku tu hingê bi awayê ez dibêjim biguherî û veguherî, ez jî qanih bibim. Heke tu wê van careke din neînî serê vî miletî, ez ê jî bibêjim, amenna.*

Xwîşka Mehmet Beg, Fatma Xan bêhtir dixwaze ku fêm bike ka kîjan ruhiyetê kiriye ku fail vî sûcî karibin bikin û wan ber bi muhasebeyeke wijdanî ve biajo. Ew weke şertêlêborînê, derketina holê ya heqîqetan û dubarenebûna tiştên qewimî, diyar dike. Û ew lihevhelalkirinê weke qonaxa beriya bi aştiyê jihevqutbûnê, yan jî ya ne bihev re lê li kêleka hev, bêyî bi hev bûnê, dûrî hev jiyanê, ne ya biratiyê ya cîrantiyê qebûl dike:

*Ez dixwazim ku carekê li wan mirovan binihêrim. Ew di awirên min de, dema ku li min nihêrîn ew ê gelek tiştan fêm bikin. Bi ya min... jiyaneke çawa, ango çawa, çawa dikarin bijîn, ez bi rastî meraq dikin evqas êşê didan mirovan, mirov tine dikirin, jiyaneke çawa dewam dikirin. Ew ruhiyeteke çawa ye wisa? Tu timî mirovan tine dikî û ji bo kîjan armancê? ... Ev hesteke çawa ye ku te karîbû wan qencên dinyayê yên li hemberî xwe bêyî ku dudilî bibî ji holê rakî. Armanca hemûyan hebû. Armancên hemûyan ji bo qencî bedewî, ji bo gelê wan hebû. Dema te ev kir, tu li çi fikiriyî dema te ev kir? Tu li çi fikiriyî? Ango ew çi bû ku evqasî xurt bû? Ya xurt çi bû bi rastî jî? Lewma, divê ne hêsan be wisa darî çav tu mirovên xwe, gelê xwe, bi ser de jî bi carekê karibî tine bikî. Bi carekê çi zanim wî dûçarî êşkenceyan bikî. Ew rikdariyeke çawa ye? Ya rastî ez vê meraq dikim. Ez hestên wan meraq dikim. Bi fikreke çawa? Bi bunyeyeke hestan a çawa tevgeriyan... Ya rastî ez di rewşên normal de gelekî efûker im. Ango ez timî tercîh dikim ê li hemberî xwe efû bikim. Ango, çi xirabiyê bi min bikin, bila bikin, lê belê vê yekê tevahiya jiyana min serûbinî hev kir, jiyana min jî bi temamî li ser vê meşiyabe... Ez nizanim, divê ev hatibe serê mirovî. Ez niha bi rastî jî nizanim ka ez ê çi bifikirim... Jidilbûna mirovê li hemberî min, yan jî çawa ku beriya niha min ji we re got, ez meraq dikim ka bi fikreke çawa, bi hesteke çawa ev kir. Piştî ku min ev hemû dîtin, ez nizanim hingê ez ê çi bifikirim. Niha ... pir zehmet e... Ango, heke ez lêbibihurim, belkî hingê jî awireke min a bi temamî nû çêbibe. Nizanim. Heke lêbibihurim, tu dizanî ez lêbibihurim ez e kengî lêbibihurim? Piştî ku hin tişt bi temamî derketin meydanê ez dikarim lêbibihurim. Heke êdî misoger be ku tiştên xirab wê rûnedin, ez dikarim lebibihurim. Ango, hingê ez dikarim jiyana xwe hemûyî deynim aliyekî. Ma ne ez dibêjim, ev, berdêla tiştinan nîne, lê belê heke tiştên wisa êdî wê hew werin serê mirovan, hingê bi hêsanî ez dikarim lêbibihurim... Ji bo ku karibim lêbibihurim, divê garantiya wê yekê hebe ku tiştên wisa wê hew biqewimin... Ez ê lê helal jî bikim. Ji bo ku em careke din hev nebînin, ez ê*

*lê helal bikim. Ango, êdî wisa bi temamî weke xwe, ez ê lê helal bikim. Ez cihê me. Ango em cihê ne, hûn cihê ne. Vêna êdî bi temamî bixin serê xwe. Ango hûn ê êdî bi tu awayî nikaribin zerarê li me bikin. Çawa ku min got, heke garantiya wê hebe, temam, hûn bi rêya xwe de, em rêya xwe de, em li hev helal bikin... Ango, êdî dûrî me bin. Ango bi tu awayî bila ne hêviyeke we hebe ji me, ne daxwazeke we, ne jî zexeteke we hebe li me. tu tiştî we bila nebe.*

Ev gotin wê tesbîtê piştrast dikin ku dibêje, yên saxmayî di nava wê civakê de/ bi wê civakê re jiyana xwe wê dewam bikin ku dehşeta qewimî qebûl nake. Ev yek ne bi tenê elaqedarî qebûlnekirina tiştên qewimî û berpirsiyariya di wan de ye, ew her weha elaqedar e bi nebûna sozdayînekê, temînatekê re di biwara careke din rûnedena qewmînan de.

***Qewlê biratiyê***[353]

Fatma Xanê "ji bo careke din hev nedîtinê" lihevhelalkirin qebûl kir; sedema vê ew e ku hêviya wê kêm bûye ku bi welatiyên din ên Dewleta Tirkiyeyê re di nava şertên wekhev de û di nava têkiliyên dostaniyê de bijî, û sedemeke din jî ew e ku bi hev re jiyanê timî weke zerar lêbûyîn û zext lêbûyîn xwe daye der. Doza dûrbûnê ya terîf û daxwaz dike yan jî reda nêzîkbûnê heta bi dewleteke wê bi xwe ve diçe:

*Evqas êşê, em evqas demê dikişînin ji ber wê ye, ango ji ber ku em ne dewlet in. Heke hin kesên em paraztî, li me xwedî derketî, yên ku weke me difikirin hebûna hingê ji serî ve te ew êş asteng dikirin... Heke tu wê sîstemê saz nekî ... dîsa garantiyeke te nîne, dibe ku sibe heman tişt dîsa werin serê te.*

Hîna di biwara Tirkan de di nava bêhêvîbûneke mutleq de nîne; hem dixwaze êşa hatî serê wan were fêmkirin û hem jî rûmeta wan a heyî were qebûlkirin:

*Niha, helbet ji gelê Tirk hêviyeke min heye. Ji sedî sed heye. Ew me hîç nas nakin. Ez yên ku me hîç û qet nas nakin, nas dikim... Min odeya xwe bi sê Tirkan re parve kir... Li odeya xwe, mesela, min nedikarî bi zimanê xwe bipeyivim. Vê yekê ew aciz dikirin... 'Tu wê zimanê me bi me bidî jibîrkirin.' Piştî ku ez nas kirim, fêm kirin ku ne wisa ye. Ango dîtin ku em jî dikarin têra xwe fereh binihêrin... ku em jî dikarin hevaltiya qenc bikin. Heta di hin tiştan de karîbûn ji min bibînin ku em dikarin pir maqûltir nêzîk bibin... ew, hîna ferehtir, ez dixwazim ev nihêrîn bigihîje her deverî: 'Ew jî mirov in'. Û divê*

353 Ya rastî me li şûna qewlê "biratiyê" yê "dostaniyê" bigota wê bêhtir li peywenda "dostaniya siyasî" bihata ku me di Beş II de munaqeşeya wê kiribû. Lê belê ji ber ku kesên em bi wan re peyivîn peyva "biratî" bi kar anîn, vê yêkê destûr neda me em peyva "dostanî" bi kar bînin.

*vê zanibin: 'Wan gelek êş kişandin, gelek zehmetî dîtin.' ... Ango, ez dixwazim ew gelekî bêhtir hestiyar bin... Bi rastî jî nihêrîna wan li me pir teng û kêm e... Gerçî, erê, medya tesîrê li gelek tiştan dike, li wan dike, lê belê divê xwe ji nihêrîna xwe ya li me xilas bikin. Helbet yê bindest, ... ez dixwazim ku ne weke, va ye, perçiqî, ne bi wê psîkolojiyê, hîna wisa, weke civakeke ku hin tişt dîtî û berdêla wê standî bibînin. Ango civakeke dikare serfiraz be û rêz jê re were girtin. Ez dixwazim ku wisa bibînin.*

Tiştên ku Fatma Xanê gotin, daxwaza nûkirina peyva "biratiyê" dikin; herçî raya giştî ya Tirk e, peyva "biratiyê" gelek caran bi lêv dike, geh siyaseta netewepe-rest û geh ya îslamî wê "weke enstrûwateke tepisandina daxwazên nasnameyê yên Kurdan, wekheviya yekker-wekhevker" bi kar tînin.[354] Behsa biratiya Tirk û Kurdan tevî ku ji aliyê hin kesên em bi wan re peyivî jî hatibe kirin jî, divê mirov bibêje biratiya ew behsa wê dikin, daxwaza kirina qewlekî nû yê biratiyê yê ku ne bi tenê Tirkîtiyê dihewîne, lê her weha Kurdîtiyê jî dihewîne jî dide der. Zuleyha Xana ku li Colemêrgê em pê re peyivîn jî tevî ku dibeje, ew bi Tirkan re bira ne, dema ku dibêje ew aştiyê ne bi tenê ji bo xwe ji bo Tirkan jî dixwaze, dixwaze têgihiştina biratiyê ya ew fêm dike jî bi bîra Tirkan bixe:

*Kurê miletê Tirk jî diçe eskeriyê. Bila ew jî neyê kuştin. Ew jî guneh in. Kurê wê jî weke kurê min e. Li cem min ferqa wan nîne. Em hemû ji umeta pêxember in, bira ne... Erê ez aştiyê dixwazim. Kurê min jî yê Tirk jî diçe eskeriyê. ez dixwazim ku aştiyeke xweş çêbe. Bila bi sihet biçin eskeriyê û vegerin. Bila tu kes nemire. Ez doza aştiyê dikim.*

Mizgin Xana ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn jî ji wan kesan e ku difikire di navbera Tirk û Kurdan de têkiliya "biratiyê" heye, ya rastî, nihêrîna wê ya li Tirkan weha diyar dibe:

*Niha ew jî, mesela ez çawa bibêjim, Tirk û Kurd ferq nake, di encamê de bira ne. Lê bila ew jî zanibin ku ev wisa bûye mesela. Ev mirov birine. Zarokên wan ên sêwî mayî hene, jinên wan hene, yên bê kar hene... Divê zanibin, ma ez çawa bibêjim... Mesela em bibêjin, diya min derdê xwe gotiye. Bila ew jî binihêrin, xemgîn bibin, 'çawa wisa li vê insanê kirine.' ... Belkî jî ew jî weke me bifikirin, ez nizanim, ji çîka wan re maye. Mesela li gorî dilê xwe dilê min bi hinan dişewite. Mesela carinen kesek dimire, eskerek şehîd dibe, heyfa min pê te... Carinan di televizyonê de dibêjin, bavê du zarokan nizanim çi jê hat. Ma dilê min pê naşewite, dişewite bi wan zarokan. Yê çûyî jixwe diçe lê heyfa yê mayî ye vê carê.*

354 Binihêre li Çiçek, 2011, 2.

Raziye Xana ku em li Batmanê pê re dipeyivin jî dibêje, ew ferqê naxe navbera şehîdên herdu aliyan:

> *Êşa yên ku ji miletê Tirk jî êşê dikşînin weke êşa min e. Min êşa yê ku li eskeriyê şehîdbûyî jî kişandiye... Weke dayik ez şewitîme, lewma jî şêwitîna hemû dayikan his dikim... Ne bi tenê ya xwe, min gelekî êşa misilmanan, ya eskeran jî kişandiye. Êşa min hebû, min jî êşa her kesî kişand.*

Aysel Xana ku em li Mûşê pê re peyivîn, xwe jê venade û dibêje "em bira ne", daxwaza wê jî aştî ye. Aştiyê jî weke piçûknedîtina Kurdan, ango qebûlkirina hebûn û nasnameya wan rave dike. Ew bi bîr dixe ku bi tenê di rewşa aştiyeke bi vî rengî de kîna dualî dikare vemire û "ji nû ve" mirov dikare bibe bira:

> *Ez dixwazim ku aştî pêk were... Bila sîleh bêdeng bibin... Bila bibêje Kurd, ma ne em Kurd in, em hene. Ez gelekî dixwazim ku ev bibin. Bila zarokên me xweş bijîn...ew jî [Tirk] bila me piçûk nebînin. Em jî li Tirkiyeyê dijîn, em welatiyên vir in, em xwîşk û bira ne. Hêviya min ji wan, bila me piçûk nebînin, em jî mirov in, em Kurd in, em hene... ma çima Tirk ji Kurdan nefret dikin? Yan Kurd ji wan nefret dikin? Çima em di nava civakeke bi vî rengî de ne? Helbet ez li vê difikirim. Carinan ez tiştên ewqasî xirab dibêjim, ango bi her halî ew jî mirov in, em jî mirov in, em misilman in, em xwîşk û bira ne. Ez dîsa wisa nava xwe çîk dikim, dîsa jî ez naxwazim nefret bikim. Dema ez wan dibînim wisa. Ez diçim Enqerê. Ew li wir in, ez diçim nexweşxaneyê. Li wir hemû Tirk in, bi piranî. Li wir tê serê me, timî tê bîra min. Ew Tirk in, em Kurd. Nizanim çima naxwazim nefret bikim ji kesekî, ji Tirkan... Bi tenê heke aştî pêk were, em hemû, em ê ji nû ve bibin xwîşk û bira.*

Ferya Xana ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn jî behsa bawerîpêneanîna xwe dike ya ku li hemberî dewleta heyî his dike; dibêje, ji ber ku nikarîbû piştrast be ku tiştên qewimîn wê careke din rûnedin ji fikra çêkirina zarokan bi dûr ketiye: "Lewma beriya her tiştî ez naxwazim ya hatî serê min were serê zarokên min. Belkî ji wê tirsê ez naxwazim." Ew dixwaze jidestdayiyên Kurdan, berdêlên wan dayî û nasnameya wan jî ji aliyê Tirkan ve werin qebûlkirin; ew dibêje Tirk Kurdan weke bira nabînin, lê belê piçûk dibînin:

> *Beriya her tiştî divê bi me bawer bin. Ango, li şûna ku wê me piçûk bibînin, bila bibêjin, em bira ne. Mesela, qet nebe bi salan Kurd jî êşiyan. Di heman demê de Tirk jî êşiyan bi salan. Ya herî hêsan, zarokeke malbateke Kurd yek li çiyê ye, yek li eskeriyê... Beriya her tiştî empatiyê bikin. Yekane daxwaza van mirovan zimanê wan, çanda wan, nasnameya wan... Bavê min, yên weke bavê min, bi hezaran mirov feda bûn ji bo vê... Beriya her tiştê, dema xwendin, bila bibînin ka mirovên Kurd çi qasî êş kişandine, çawa belesedem*

*hatine hebakirin, dewletê belesedem jiyana mirovan belesedem mehû kir. Ez dixwazim li şûna ku alîgiriya wan bikin, me mafdar bibînin... Li şûna ku wê înkar bikin bila qebûl bikin.*

Dema ku Ramazan Begê li Şirnexê em pê re peyivî behsa hêviyên xwe yên ji Tirkan dike, şertên biratiyê jî dike rêz:

*Madem em bira ne. Tirk me ji biratiyê diavêjin. Em birayekî bê ziman, bê maf yê ku pûte pê nayê dayîn in. Em vê qebûl nakin. Berê divê em bi Tirkan re bibin bira. Beriya wê ne biratî bû. Bila me weke bira qebûl bikin Bila wekheviya me pêk were, bila me bi nasnameya me qebûl bikin. Bila rêberê me serbest were berdan. Mirovên li çiyayên Kurdistanê ji bo azadiyê têdikoşin bila vegerin malên xwe. Em jî qewmînan ji bîr bikin.*

Herçî Gulsima Xan e ku em li Colemêrgê pê re peyivîn, ji bo wê wateya biratiyê wekhevî ye; ditîna wê yekê ye ku mirina mirovan ne belesedem bû:

*Bira ji bo çi birê dikuje? Em vê qebûl nakin. Êdî bes e, bila ew biratî rabe, ew xwîn zuwa bibe. Em doza aştiyê dikin. Em doza nasnameya xwe dikin... Heke mafê me bidin, Serokê me were, bi Erdogan re li ser maseyê rûne, hingê naxwe birayê min têkoşiyaye û ji bo têkoşîna xwe hatiye kuştin.*

Nizamettin Begê ku li Batmanê em pê re peyivîn jî bi rengekî bişibe vê behsê dike ka divê biratî çawa be: “hêviyên me ji gelê Tirk gelek in. Divê êdî jêgerin ku komkujiyên li vir qewimî nebînin. Bila werin hovîtiya li vir bibînin, bibînin ku biratî wisa nabe. Û bila bibin hevparê têkoşîna Kurdan.”

Necmettin Begê ku em li Bedlîsê pê re peyivîn jî dema daxwaza biratiyê îfade dike, dibêje divê hebûna Kurdan û rola wan di avakirina Tirkiyeyê de were qebûlkirin:

*Ango, em Kurd in, bira. Bi xwîna xwe, bi her tişta xwe, bi zimanê xwe, em Kurd in. Ango, em naxwazin Kurd tine bibe. Ango, bila Kurd jî hebin. Ango êdî em hevdu qebûl bikin, bi biratî. Çi Tirk, çi Kurd, çi yên din bi hev re. Ango me ev dewlet bi hev re ava kir bi qasî dizanim. Me tevde ava kir, tu kesî din ava nekir. Tirkan bi tena serê xwe ava nekir, Kurdan bi tena serê xwe ava nekir. Bi hev re şer meşandin.*

Mukaddes Xana ku li Mûş ê em pê re peyivîn jî weke Aysel Xan û Ferya Xanê dibêje, ew naxwaze Kurd piçûk werin dîtin û dixwaze karibin mafên xwe yên sereke bi kar bînin; ew ne mirinê lê çareseriyê dixwaze. Li aliyê din jî ji bo ku îfade bike tu gotina wê nemaye ji Tirkan re bibêje, wê hevoka ku me di vê xebatê de çend caran dubare kir, bi kar tîne:

*Diçin çiyê ji bo ku yekî, wî bikujin. Di encamê de wê dilê wê dayikê, wî bavî bişewite. Ne çareserî ye. Bi rastî jî ew ne çareserî ye. Temam, ez niha rabim, bi sedan, bi hezaran mirovî bikujim, bavê min venagere. Ez ê heman êşa bi min re peyde bû bi kesên din re jî peyde bikim. Mafê min nîne vê bikim... Kengî tişta ku Kurd dixwazin bide wan, temam e. Ya ku dixwazin bi tenê ew e ku bi zimanê xwe bijîn. Bi nasnameya xwe piçûk neyên dîtin... Di encamê de em jî li vir dijîn. Em jî hene êdî... Min ê ji [Tirkan] re çi bigota... bi rastî jî bila êşa min kişandî dijminê min jî nekişîne, lewma êşeke gelekî mezin e... Em ewqasî çîk bûne, êdî gotin jî ji devereké dernakevin. We got, we got, dema we hîç bersiv negirt jî gotinan jî xwe êdî sipart axê. Ango êdî hûn çi bibêjin jî fêde nake.*

### *"Bila ew jî bibêjin êdî bes e"*

Li gorî hinan jî hîna peyvên werin gotin, bangên werin kirin, rêyeke ku heta bi dostaniya siyasî biçe hene. Dema mirov dibêje Tirk, dayikên eskerên hatî kuştin tên bîra Şukriye Xana ku em li Mêrdînê pê re peyivîn, ew bawer dike ku ew ji ber alîkariyên dewlet bi wan re dike, bêdeng dimînin û bang li wan dike da ku ew jî tevlî banga wan a "êdî bes e" bibin:

*Dayikên wan jî hene. Kezeba wan jî şewitiye. ew jî di halê me de ne. Belkî ji ber ku hikûmet pereyan dide wan. [Dewlet] dibêje, 'hi ji te re pere, serê te sax be.' Bila ew jî weke me bibêjin, 'xwîşkino, em xwediyê hev in, em li biniya banekî ne, em xwîşk in, me tiştek bi hev nekiriye.' ... Bila ew jî bibêjin, êdî bes e. Em zarokên xwe bi zehmetî mezin dikin, bila wan nekujin. Ew jî bila bibêjin, ew wisa ne baş in. Em dibêjin, hema ku tiştek neyê serê zarokên me, bila em feqîr bin... Em feqîriyê jî qebûl dikin, ew qebûl nakin. Guneh e.*

Keça Şukriye Xanê, Yasemin Xan ji bo daxwaza dayika xwe ji çapemeniyê mînakekê nîşan dide û wê darîçav dike; ew dibêje cudakeriya li dijî Kurdan êdî divê bi dawî bibe:

*Mesela jinên Kurd, ên me, di televizyonê de derdikevin, dibêjin, 'bila esker jî gerîla jî nemirin'. Dibêjin, 'bila xwîn nerije, ev xwîn raweste', lê heke jinên Tirk jî rabin vê bibêjin, her tişt wê xweş bibe. Lê jinên Tirk [dibêjin,] 'bila bimirin,' ev [...] heye di televizyonê de. Çawa tiştekî wisa dike, ji Wanê re xwarin filan dişiyandin. Va ye, pêşî digot, 'bila nedin wir'. Ango bila nedin Kurdan. Ma tişta wisa dibe? Tu jî mirov î, ez jî mirov im. Tu jî ruh î, ez jî ruh im. Tu jî tu wê bimirî, ez jî ez ê bimirim. Çi cudatî heye?... Ango, em dibêjin, bila cudakerî nebe... Çi bibe, mesela nasnameya wan bidinê, Kurd çi dixwazin? Bila nasnameya min jî*

*hebe. Bila dibistana min jî hebe ku ez bi zimanê xwe lê perwerde bibim. Bêyî van aştî pêk nayê. Ma ev herdu tişt zêde ne?*

Bedriye Xana ku em li Batmanê pê re peyivîn jî dixwaze ku Tirk bibêjin "êdî bes e", ya rastî bibêjin "aştî" û nebêjin "bila welat sax be":

*Bila ew jî bibêjin 'aştî'. Bila dernekevin televizyonan û nebêjin 'bila welat sax be', bila bibêjin 'aştî'. Em dayik in. Bila dayikên Tirk û Kurd bibin yek û bibêjin 'aştî'. Bila xwe nexapînin. Ma dema kurên wan tên kuştin canê wan naêşe, dibêjin, 'bila welat sax be'. Bila bibêjin 'aştî'. Heyfa kurên wan e jî. Heyfa kurê min e jî. Heyfa mêrê min e jî. Heyfa yê wan e jî. Bila neyên kuştin. Dilê me bila evqasî neêşe. Ez bang li dayikên Tirk dikim, bila bibêjin, 'aştî' ... Heke biaqil in, heke dilê wan dişewite, heke misilman in, bila bibêjin 'aştî', bila nebêjin "bila welat sax be'. Çima dibêjin 'bila welat sax be'? Bila wisa nebêjin.*

Hasan Begê ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn, tevî ku tu hêviyên wî ji Tirkan newate jî, xwe jê venade û bangê li Tirkan dike:

*Tirk tu tiştî nake. em dibêjin 'şehîdên me', ew dibêjin, 'şehîdên we çi ne?' Dibêjin, 'terorîstê we, we kuştiye, dewletê hûn nekustine.' Wisa ji me re dibêjin. Ji bo çi ji te re nabêjin, 'em aştiyê dixwazin'? Tu jî bibêje. Ma tu ne hevparê min î? Ma di navbera kurê te û kurê min de çi ferq heye?Ma di navbera Tirk û Kurd de çi ferq heye? ... Birayê min ji bo çi tê şehîdkirin? Birayê te tê, birayê min dikuje, çima?... Bibêjin, 'êdî em hev nekujin', werin bibêjin 'aştî'...*

Herçî Şengul Xan e ku em li Wanê pê re peyivîn, difikire ku heqîqet hene ku divê ji şehit aileleri ["dayikên şehîdan" dayikên eskerên Tirk ên kuştî, têbîniya wergêr] re werin gotin û li ber peyva "welat parçe nabe" radibe:

*Ji Tirkan hêviya min heye... Hêviyeke min a mezin heye... Bi wan re [şehit anneleri] bipeyivin, ango heqîqetan bi wan re jî bipeyivin, ji wan re jî bibêjin, guh bidin êşên wan jî. Ango wan jî li van dayikan zêde bikin. Ev dayik jî, evqas mirovan zarokên xwe ji dest dane, bila bi wan re êşên xwe parve bikin. Bila xaleke hevpar hebe... Çend caran, dayikên me çûn serdana wan, lê kes nehat. Em dibêjin, bila ew jî bên. ev zarok, temam, eskerî, wezîfeya ji bo welêt, ew tişteke din e... ma çima zaroka te biçe li wir were kuştin? 'Şehîd namirin, welat parçe nabe'.*[355] *Baş e, naxwe ev parçebûna çi ye? Ev welatê çi ye ku parçe dibe? Van tiştan hûn bi wan re jî bipeyivin, ji wan re jî bibêjin... Tevî ku hîç gunehê van mirovan nebû, ma gunehê wan Kurdbûn e? Ma gunehek e ku mirov bi zimanê*

355 Wergera diruşmeyeke bi Tirkî (Şehitler ölmez, vatan bölünmez) ye ku bêhtir di merasîmên cenazeyên eskerên Tirk yan jî xwepêşandanên neteweperest ên Tirk de tê gotin; têbîniya wergêr.

*xwe, bi îradeya xwe, bi nasnameya xwe, bi çanda xwe bijî? … Ma çima ev jiyana bi rûmet ne mafê min e? Çima tu pê dijî, çima ez pê nejîm? … Yekane tişta em dixwazin ev e. Îro bi hezaran kes li çiyê ne, di zindanan de ne. Bi hezaran mirov jî di binê erdê de ne, di gorê de ne. Ma gunehê van mirovan hemûyan çi ye? Jiyaneke neteweyî ye. Jiyaneke bi rûmet e. Na, ez ji efendimê xwe re bibêjim, 'Şehîd namirin, welat parçe nabe.' Ma kîjan welat parçe bûye? Em çi parçe dikin? Kî kê parçe dike? Kî parçe dike? Kî ji hev dike? Kî terorê diafirîne? Ango mesele ev e… Ez dibêjim, ev mirov belesedem nehatin kuştin û bila ev mirov belesedem neyên jibîrkirin jî. Heke bi rastî jî van mirovan ji bo têkoşînê jiyanên xwe, bedenên xwe yên nûciwan di axê de veşartin, naxwe wezîfeya herkesî ye, ango her kes, ne bi tenê ya Kurdan. Ya Tirkan jî ya her kesî ye.*

Gulsima Xana ku em li Colemêrgê pê re peyivîn, Tirkan weke "dijmin" bi nav dike, dibêje ew êşa Kurdan parve nakin, lê her çi ew in ew ne weke wan in û balê dikşîne ser wê yekê ku li naverastê newekheviyek heye:

*Îro êşa te jî ya min e, ya min jî ya te ye. Dijmin vê nahesibîne. Dibêjin, 'êşa me bi tenê ya me ye, ya we ne ya me ye'. Em dibêjin, 'esker jî kurê me ye, yên çiyê jî kurên me ne' … Yên çiyê jî eskerên me ne. Yê di bin destê Erdogan de jî eskerê me ye… Erdogan bila were ser masê. Bila me jî li maseyê qebûl bike. Bila bibêje, ev para we ye. Ev jî para min e. Ev nasnameya we ye. Ev jî ya me ye… Welehî ma ez çi ji Tirkan re bibêjim? … Em doza heqê xwe dikin… Em dibêjin, 'êdî bes e.' Wî çawa maseya xwe, meclîsa xwe, serokê xwe dît, em jî maseya xwe serokê xwe bibînin.*

Birayê Gulsima Xanê, Irfan Beg ne weke xwîşka xwe ya mezin difikire. Dibêje, "Tirk baş in, em weke bira ne bi hev re. tu zerara wan li me nebûye, lê em dewletê naecibînin" û pê re jî tiştên ku Tirk dikarin bikin bi bîr dixe:

Tirk jî dikarin rabin ser piyan. Dikarin bibêjin, 'we evqas mirov kuştin, êşeke van jî heye, malbata wan heye.' Ango Tirkiye dikare rabe ser piyan… Ango Tirkiye rabe ser piyan her tişt wê aşkere bibe. Ango, em ne dijminê Tirkan in lê belê heke Tirkiye jî destekê bide me, em ê bi leztir çareseriyekê peyde bikin.

Adem Begê ku li Colemêrgê em pê re peyivîn, dixwaze Tirk Kurdan bibihîzin, heta werin serdana wan; ji bo li têkoşîna Kurdan serwext bibin, bang li Tirkên ku weke bira dibîne, dike ku werin Kurdistanê:

*Ti wextê, mesela weke min gotî, ne li Tirkan, lê li dewletê û dema dibêjim dewlet jî ev saziyên jor, serokwezîr, serokkomar e, heta ku ev ji ber sûcên xwe neyên dadgehkirin, ez ê timî bi nefret li wan binihêrim… Tirk, min Tirk timî weke bira dîtin. Lewma beşeke gelekî neteweperest a wan heye, lê ev beşa neteweperest çi ye? Timî nûçeyên ku ji televizyon û çapemeniyê bihîstî…*

*Bi ya min Tirk bila vê bikin. Li şûna ku wê hestên xwe yên neteweperest ji çapemeniyê bigirin, bila werin binihêrin. Derdê Kurdan çi ye? pirsgirêka wan çi ye? Bi hezaran salan Kurd ji bo çi têdikoşin? Çima? Em hîna jî dixwazin ku bi Tirkan re di nava aştiyê de bijîn. Lê belê ev aştî çi ye? Ji me re dibêjin 'heq didin we, hûn dikarin bibin parlemanter, rêya serokwezîriyê heye' lê belê ev bi tenê, ez çi dizanim, ev tiştên darî çav in, lê tu nikarî bibî jî. Li pêşiya te astengî heye... Hêviya me ev e: Bila Tirk werin, guh bidin derdên me... Ka kerba me çi ye, bila werin bibînin. Zext li me dibe, gef li me tên xwarin, zilm li me dibe, em tên kuştin... Çima em tên kuştin? Ma Kurd her mecbûr in werin tepirsandin? Bila werin, ka pirsgirêka Kurdan a esas çi ye, çima serî hildidin? Dema em berê xwe didin dîrokê, sedema her serhildanê heye. Yan zext e, yan şîdet e, yan zilm e... Bila werin vir, bi şexse xwe şahidiyê li van bikin, piştre bila hukmê xwe di biwara me de bidin. Ka heq didin me, hiqûqê didin me? Heke heq û hiqûqê didin me, xwe em sûcdar in. Heke bi tenê em serî hildidin, xwe em sûcdar in. Yekane tişta ez dixwazim ew e, heke tiştekî divê hûn binivîsin hebe, Tirk bila werin bibînin em di çi halî de ne, dewlet psîkolojiyeke zordar li ser me ferz dike, me çavtirsandî dike, bila van bibînin. Çawa bombeyên gazê diavêjin ser milet, çend zarok kor bûne, çend mirov ji ber bombeya gazê mirine, çend mirov bi guleyan yekser hatine kuştin, bila van bibînin.*

Sarya Xana ku em her weha li Colemêrgê pê re peyivîn jî, weke Adem Beg, difikire ku haya Tirkan nîne ji tiştên ku tên serê Kurdan; ji bo "zarokên gelê Tirk" û dayikên wan, ji bo ku "Şehîd" rehet bikin, ew yekane tişta ku wê şexsê wê jî teselî bike dixwaze, ango çareseriyê:

*Ez ji Tirkan jî bi tenê çareseriyê dixwazim... Gelê Tirk nizane. Ma gelê Tirk dizane ku birayê min şehîd bûye. Ma gelê Tirk dizane ku dewletê ev aniye serê min. Zarokên gelê Tirk jî weke zarokên me ne... Ez gelekî dixwazim çareserî pêk were. Êdî bes e ku kezeba van dayikan dişewite... Hingê wê şehîdên me jî rehet bikin... Ew jî wê rehet razin. Dema ez biçim ser gora wî, ez qet nebe jê re bibêjim tişteke wisa bûye. Çareserî bûye, kezeba dê û bavan êdî naşewite, xwîn sekiniye. Ev ji bo min teseliyek e, rehetbûnek e.*

Taha Begê ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn, li dijî Tirkan neyartiyê nake; lê belê dibêje, tiştekî gelekî girîng heye ku Tirk dikarin bikin, nexasim jî memûrên dewletê yên ku li Kurdistanê wezîfe kirine, ango ew ên ku haya wan ji tiştên hatî serê Kurdan heye; ev tişta girîng "şahidî" ye:

*Ji Tirkan, ji gelê Tirk hêviya min heye... Gelê Tirk wê bibêje, hevalo, heke tu li dîrokê binihêrî ma ne Tirkan bêhtir xwendiye? Xwende ne, hemû pispor in,*

*profesor in, doçent in, ango xwendine... Ew zilam wê li wir bibêje, 'ev Kurd jî li vî welatî ne.' ... Heke wijdanê wî hebe, yên ku ev dîtine gelek in. Yên eskerî kirî, yên ku memûrtiya polêsî ya normal kirî, yê mamostetî kirî, yên ku li ser vê erdê jiyayî, yê îmamtî kirî, heke xwedî wijdan in, hiseke insanetiyê, heke hindikek insanetî mabe, bila ew mirov rabin... Kê çi kiriye bila ew jî bibêjin... bila şahidiyê bikin. Belkî, yê ku birayê min kuştiye, çawa kuştiye, belkî ji eskeran ên sax hebin, bila derkeve holê. Bêguman gelek kes hene... Ango, niha piştî ku ne insan be, heke wijdanê wan mirovan heye tevgera ku li ser vê erdê kirî, Tirk wê rabin vê bibêjin... Ka xwînê rawestîne. Ka, dema cenazeyê wî eskerî diçe hingê ez malbata wî jî his dikim. Ez bi rastî dibêjim. Dema ew cenaze diçe ez malbata wî jî his dikim. Çawa dilê dayika wî, bavê wî diêşe? Ma bila neşewite niha.*

Nimet Begê ku em her weha li Diyarbekirê pê re peyivîn, dibêje, divê Tirk jî li dijî şer rabin, û têkoşîna demokratîkbûnê ya tevgera Kurd wê bi kêra gelê Tirk û Kurd were:

*Ma ez niha ji xwîşka xwe re bibêjim, Tirk jî weke me zarokên Anatolê ne û zarokên xizanan in. Tê, li vir ... li çiyayên herî asê yên Kurdistanê wan dixe nava şer. Wan diajo ser mayinê. Ew mirov li wir dimire. Rastiya şer ev e. Ew jî weke me wê bikin hewar, li ber vî şerî rabin. Niha bi tenê Kurd in ên ku li ber şer radibin û Kurd wê bi tenê ne Kurdan bi ser bixin. Kurd wê tevahiya mirovên bindest bi ser bixin... Bi tevgera Kurd re her kes wê azad bibe û Tirkiye wê demokratîk bibe. Hingê wê pêşî li Tirkiyeyê vebe. Ev welat hingê li dinyayê wê bikeve nava welatên herî baş.*

Birayê Nimet Beg, Hakan Beg jî weke birayê xwe dixwaze ku Tirk û Kurd bi hev re têbikoşin; weke Adem Beg jî Tirkan vedixwîne Kurdistanê da ku guh bidin Kurdan, ji neteweperestiyê bigerin:

*Bi ya min, ez dixwazim Tirk hinekî din xwedî aqlê selîm bin. Ez dixwazim hinekî din hestiyar bin. Her tişt ne weke tê gotin û tê bihîstin e. Ez dixwazim ew jî werin, bibînin ka çi hatiye serê van, çi êş hatine kişandin. Ez dixwazim ew jî weke Kurdan bi hev re tevbigerin. Ez ji Tirkan dixwazim ku bi hev re doza mafên xwe bikin. Ango, ez dixwazim ew jî bi hin rastiyan zanibin. Çi Kurd, çi Tirk, ez li dijî neteweperestiya zêde me. Ez vê rast nabînim.*

Idris Begê ku em li Batmanê pê re peyivîn, difikire ku mimkun e Tirk tevî Kurdan têkoşînê bikin, ew dibêje: "Tirk helbet dikarin tiştekî bikin. Tirk jî mesela, em dikarin bi hev re têkoşineke birayane bimeşînin." Nihat Begê ku em li Bedlîsê pê re peyivîn jî xwediyê fikreke weke vê ye; ew dixwaze ku Tirk "bi Kurdan re bibin yek":

*Bi têkoşînê, di encamê de dema bibin yek. Yekbûn, ango em timî dibêjin yekîtî. Ya ku em jê re yekîtî dibêjin, Tirkan, Kurdan rojekê ber bi yekîtiyeke bê kêmasî ve, li welatekî ku bi hev re mirov dikare lê bijî, ji bo ku bi rastî bi hev re weke bira karibin bijîn tevî min, ji bo vê divê xwe bide ber barê têkoşîna min. Di heman demê de heke derdekî wî jî hebe, yê min jî bi heman rengî, divê ez xwe bidim ber barê têkoşîna wî.*

Li gorî Mehmet Begê ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn, yê ku bavê wî bi destê Hizbulllahê hat kuştin, "heke kesek karibe vê çareser bike Tirk dikarin çareser bikin"; lê belê hevokên wisa saz dike ku dibêjin, Tirk divê pêşî li ser wateya "welat" bihizirin:

*Tirk, vanan, weke mînak tiştên min ji te re gotin, wisa di gelek malan de hene. Dema hûn van ji wan Tirkan re bibêjin, bi rengê objektîf ez dibêjim, ho Tirkino... "erê me li vir got, 'welat, milet Sakarya' lê gelo kîjan welat, kîjan Sakarya, Sakaryaya kê?" Hûn di ser kê re çûn û we ew kir Sakarya? Hûn di ser kê re çûn û we ev kir welat?*

Ekrem Begê ku em li Mûşê pê re peyivîn jî serê pêşî dibêje, divê tiştên qewimîn weke dijminatiyeke di navbera Tirk û Kurdan de neyê şîrovekirin:

*... heke hûn rabin vê bûyerê bi Tirkîtî û Kurdîtiyê bipîvin, hingê hûn ê şaşiyeke gelekî mezin bikin... Her kes vê kêliyê bi xwe jî xwedî fikreke diyar a siyasî ye, lê hûn rabin vê nefreta xwe ya li dijî Kurdekî, hewl bidin sûravka wê di serê Kurdan hemûyan de derêxin, ev ê rê veke li ver pirsigirekeke mezin, îzdîhameke mezin. Niha bi awira min jî ev ne bûyereke Tirk yan jî Kurdan e. Bêguman, bûyerên ku di navbera eskeriyeya wê demê yan jî derdoreke din de dayî der in û zerarên wan dayî xelkê ne.*

Li aliyê din protestoyên Parka Gezi yên Gulana sala 2013'an li Stenbolê qewimî bi bîr dixe weke mînaka wê yekê ka Tirk heke bixwazin dikarin çi bikin. Lê belê ew difikire ku ew ê nerazîbûneke weke vê nîşanî neheqiyên li Kurdan dibin nîşan nedin, û weke ku bibêje, "halbûkî" nihêrina xwe ya li Tirkan lê zêde dike:

*Niha, mesela beriya bi du sê mehan, di bûyerên Geziyê de bi sedan, bi hezaran ciwanên em ji wan re dibêjin ronakbîrên xwendekar ên zanîngehê, Tirk, di nava wan de mutleq Kurd jî hene, ji bo ku du dar neyên birrîn sîh rojan, çil rojan li wir nivistin, li wir şiyar bûn. Lê belê em ji Tirkekî re rabin bibêjin, li vir neh kes bi saxî hatin şewitandin, bavê min bi saxî di êşkenceyan de hat qetilkirin... Tirkek, yan jî ji wan ciwanan çend wê werin li vir çalakiya rûniştinê li dar bixin yan jî wê vê bi wijdanê xwe qebûl bike... Dema ku eskerek şehîd*

*dibe, ez yan jî malbata min, em ranabin û kêfa xwe naînin. Lewma dê û bavê wî jî hene. Ew jî ne bi dilê xwe diçe eskeriyê dike, ji mecbûrî ye.*

Eşref Begê Wanî yê ku em li Stenbolê pê re peyivîn, bawer dike ku di nava Tirkên tevlî protestoyên Parka Gezi bûyî de di biwara neheqiyên li Kurdan bûyî de hayilbûnek bi pêş ketiye. Ew difikire ku ev hayilbûn dibe ku gelê Tirkiyeyê teşwîq bike ku hesabê rabihuriyê bipirse:

*Gelê Kurd bi tena serê xwe ji gelê Kurd ev nayê. Ango, em vê bi tenê ji wir re bihêlin, belkî hîna sedsaleke din bikişîne, lê belê ileh gelê Tirkiyeyê. Tevî Tirk, Kurd, laz, çerkez, ereb, ango mirovên li ser vê erdê dijîn. Ango mirovên ku hinekî hestyar dikarin vê yekê bikin... tu kesî rabihuriya xwe nexist ber lêpirsînê. Çi danîn ber, ma ne em dibêjin, lewma not salan ev mirov wisa hatin manîpulekirin, wisa hat gotin. Ma ne min got, mesela li Geziyê hinekî din hewl dan fêm bikin... Lewma, gotin, 'naxwe bi salan e ev tişt tên serê van, me çima hîç dengê xwe nekir?' Xwexistineke ber lêpirsînê ya bi vî rengî jî çêbû, dibe ku teng be... Ango, hîna jî mesela derdorên nijadperest ên ku gelek tiştan qebûl nakin hene, lê em van zêde çîk nakin... Niha em mesela ji psîkolojiya çîkê jî êdî, mesela ez vê dibêjim, em xwe, bila weke neteweperestî neyê fêmkirin, divê em êdî ji wê psîkolojiya xwe bi Tirkan bidin qebûlkirin xwe xilas bikin. Bila ew êdî ji me fêm bikin, bila ew werin cem me. Bila bibêje, 'hûn kî ne? ... em hinekî fêrî Kurdî bibin,' ango 'em hinekî guh bidin we.' Ango, me êdî timî guh da wan. Divê êdî em ji psîkolojiya goşt û neynûkê, ya çîkê xwe xilas bikin. Lewma jî heke ew jî werin, heke ew gavekê werin, em ê sê gavan ber bi wan ve biçin.*

Beşeke mezin a kesên em bi wan re peyivîn banga têkoşîna siyasî ya hevpar kirin, dema em bi vê dakevin tevî bangên qewlekî nû yê biratiyê yan jî dostaniya siyasî, hingê em dikarin bibêjin, Kurd hîna jî xwediyê wê daxwazê ne ku tevî Tirkên ku wê bersivê bidin bangên edalete û fikarên wan, civakeke siyasî ya demokratîk ava bikin. Tiştên hinan ji wan gotî jî weke ku bibêjin, ev daxwaz her diçe qels dibe.

### *"Bi Tirkan re tu tişta min nîne"*

Meryem Xana ku li Şirnexê em pê re peyivîn, yek hevoka bi tenê saz dike ku hem dibêje neyartiya wê li dijî Tirkan nîne hem jî tu hêviyê ji wan nake: "Bi Tirkan re tu tişta min nîne". Kamil Begê ku em li Colemêrgê pê re peyivîn bi xwe sedema bêhêvîmana ji Tirkan bi gunehbarkirina wan rave dike: "Ji Tirkan tu hêviya min nîne. Ez tiştekî giran bibêjim. Jixwe her tişt bi destê Tirkan tê kirin."

Rabia Xana ku li Diyarbekirê em pê re peyivîn jî cerdevanan mînak nîşan dide,

û dibêje hin Kurd ji Tirkan xirabtir in, lê dîsa jî nikare wan Tirkên pişta wê dewletê digirin ku hem Kurdan "bombebaran dike" û hem jî her aştiyê "bi paş dixe", ji dewletê cihê bike:

*Ez ji wan bawer nakim. [Baweriya min] bi wan Tirkan nîne... Ev çend sal in dibêjin, aştî, mirov bawer nake... Welehî ez hez [ji Tirkan] nakim... Ew jî hez ji min nakin. Ew hez ji Kurdan nakin. Ez jî hez ji wan nakim. Tirk hez ji Kurdan nakin... Tirk Kurdan qebûl nakin. Em dibînin ku qebûl nakin... ev çend sal in dibêjin, aştî. Aştî çênabe. Her roj astengekê diafirînin. Mirov nikare baweriyê bi wan bîne... Hin Kurd hene ji Tirkan xirabtir in. Welehî xirab in. Mît û cerdevan ji ku derketin, ma ji Tirkan derketin? Ji Kurdan peyde dibûn. Hemû Kurd bûn... Min qencê wan nedîtin, di nava Tirkan de min nedîtin. Em li gund bûn. Bi helîkoptêran hatin ser serê me. Bi jetan bombebaran kir... Dewletê anî serê me. Dewlet bû, Tirk bûn, ez nizanim. Bi hev re bûn. Tirk jî ji dewletê nagerin.*

Necmettin Begê ku li Wanê em pê re peyivîn jî Tirkan gunehbar dike bi hevpariya sûcên kirî ji ber ku dengê xwe li dijî neheqiyên li Kurdan kirî nekirin. Li aliyê din, xemsariyê nake û dibêje "Tirkên baş jî hene":

*Welehî, ma Tirk dikarin çi bikin, Tirk tiştekî nakin. Ango destê xwe naxin bin vî barî. [Dibêjin,] 'çawa be artêşa T.C. [Komara Tirkiyeyê] li pişta me ye.' Li malên xwe rehet rûdinin. Bila Kurdan bikujin, ev ne girîng e. Ango, jixwe tiştekî bi navê Kurd jî nîne. Carinan di rojnameyan de di çapemeniyê de em dibihîzin jixwe. Hin Tirkên neteweperest radibin, dibêjin jixwe 'Kurd nînin.' ... Tirk, ew hîç li aliyê Kurdan nebûn, Tirk... Bila ew jî xwe bi rêxistin bikin weke me. ew jî bila dakevîn kolanan, [bila bibêjin,] 'bela xwe li Kurdan nedin.' Bila ew jî weke me derbên copan bixwin, gazê bixwin. Bila ew jî bixwin, bila ew jî rabin. Gelo, dema li me Kurdan dixin, kêfa wan tê, dema di televizyonê de di çapemeniyê de dibînin? Xwedê dizane kêfa wan tê, bi îhtîmaleke mezin. Lewma nerazîbûneke wan nîne, nerazîbûneke wan nîne... Di vê mijarê de ji dewleta T.C. bêhtir herî zêde Tirkên tirsonek berpirsiyar in. Bi qasî ya T.C. dike, gelê Tirk jî berpirsiyar e. Ango ew jî hevparê vî gunehî ye. Lewma dema ev sûc tên kirin bila mirovek dengê xwe bike. Em jî îro rêzê ji ala Tirk re digirin. Pêşiyên me di bin wê alê de şer kirin, erdên wan hatin girtin. Bila ala Tirk derêxista, mîtîngek li dar bixista, 'bira, van mirovan nekuje, tu çima dikujî, çi gunehî wî heye? Mirovên gunehên wan hene bibîne, yên ku ew kirine bibîne, tu radibî, ji xwe û me re li nava taxê diçî çîk dikî, radihêjî mirovan, wan dikujî.' Mirovekî wisa yê Tirk, bi rastî jî bi qasî dewleta Tirk ew jî gunehkar in. Ez li cem we vê jî bibêjim. Lewma tu nerazîbûna wan çênebû. Hîç, ango belkî di*

*nava wan de mirovên sosyalîst, rewşenbîr hinekî çîka wan çêbû li hemberî van bûyeran, wijdanê wan nerehet bû, lê piranîya wan bêdeng ma. Gelek ji wan belkî mirovên weha ne ku dixwazin Kurd ji kokê ve ji navê werin birin... Ez tevahiya Tirkan reş nakim. Tirkên gelekî baş jî hene.*

Mehdî Begê ku em li Batmanê pê re peyivîn jî tevî ku dibêje "Tirkên baş" ên ku nas dike hene jî, her behsa bêdengmayîna piranîyê dike; lê bêlê pêwîst dibîne ku lê zêde bike ku pirsgirêkeke bi heman rengî ji bo civaka Kurd jî lê ye:

*Min Tirkên gelekî baş jî dîtin, lê pir bêdeng in. Ez çi bibêjim, ez bibêjim, civaka bêdeng jê re... lewma beşeke mezin bêdeng rûdine... Lê belê heke rojekê ev serî hilnedin, îro neçin pêşiya edaletê, ne ew ê weke Tirk rehet bijîn û ne jî em ê rehet bijîn. Lê belê ji bo beşeke mezin a Kurdan jî ev lê ye.*

Ezîze Xana ku li Şirnexê em pê re peyivîn, herçî di biwara Tirkan de ye, hem ji wan bêhêvî xuya ye hem jî weke ku baweriyê bi wan neîne: "Na, hêviya min nîne... Dikarîbûn li heqê me bipirsin, nepirsîn. Ango, rojekê [ne-]hatin, [ne-gotin,] kê wisa kir, ma tiştekî wisa dibe?' tu tişt nebû... Em baweriyê [bi Tirkan] naînin." Edip Begê ku li Wanê em pê re peyivîn, dema ku di biwara Tirkan de bêhêvîmana xwe îfade dike, mînaka îstîsnaî ya vê rewşê jî bi lêv dike: "Nakin. Ma Tirk wê werin û mafê Kurdan biparêzin? ... Min yek dît, ew jî Sirri Sureya Onder e ... Tirk be, Kurd be, kî dibe bila be, divê destê xwe deynin ser wijdanê xwe. Ji bo ku ev xwîn raweste... ango divê Tirk û Kurd bibin yek û vê çareseriyê peyde bikin..." Herçî Yusuf Beg e ku em li Şirnexê pê re peyivîn, pêşî dibêje tu mînaka dijber nîne û tuwanc pê dike ku bê wate ye ku mirov hêviyekê ji Tirkan bike, tevî vê jî paşê jî dibêje, ew dewletê û Tirkan yek nabîne û ji bo Tirkan hemûyan neerênî nafikire:

*Ti hêviya me ji Tirkan nîne. Ma hêviyeke me ya çawa dikare ji Tirkan hebe? ... Hîna ne min bihîstiye û ne jî min dîtiye ku Tirkekî di bûyerên bi vî rengî li aliyê Kurdan cihê xwe girtibe. Vê, bi tenê heke her mirov dikare bi doza xwe, li pey miriyên xwe, li pey şehîdên xwe biçe dikare bigihîje deverekê... heke hûn dibêjin, bangek, ez ji Tirkan, ereban, ji tevahiya mirovan, ji her kesî alîkariyê dixwazim ji bo ku bûyerên bi vî rengî werin rohnîkirin, ji bo ku bibin destek, raya giştî be, çi dibe bila be, di çi mijarê de dibe bila be ji bo rohnîkirinê em doza alîkariyê dikin... em Tirkan bi dewletê re çîk nakin, ew jî weke me mirov in... Ne mafê me ye ku em mirovan hemûyan reş bikin... Helbet çepgirê Tirkan heye, mirovên wan ên mezin hene.*

Cemile Xana ku li Mûşê em pê re peyivîn jî dibêje ew ê tevahiya Tirkan zem neke: "Ma îro Kurdên me hemû weke hev in ku em bibêjin Tirk hemû weke

hev in. Na weleh, nabe ku mirov hemû weke hev bin... Em bibêjin yek Tirk e lê birayê me ye, yan jî yek Kurd e birayê wan e. Hemû ileh nabe ku weke hev bin." Nurcan Xana Batmanî ya ku em li Stenbolê pê re peyivîn, tevî ku difikire ku Tirk wê tiştekî nikaribin bikin, û wê nekin jî, vê rewşê normal dibîne. Li gorî wê heta ku siyaset neyê axaftin, fikrên cihê yên siyasî ne pirsgirêk in ku tesîrê bikin li hevaltiyan:

> *Ya rastî, ez aşkere bibêjim, tu hêviya min nîne ji wan. tu kes nikare tiştekî bike... Nakin.... Yek [ji hevalên min] Elewî ye mesela. Yeke din jî tam tersê wê AKP'yî ye mesela, lê belê dema ev mesele, biratî filan ketin nava meseleyê, ez bi wan re tu carî nakevim nav siyasetê. Hevala min a herî samîmî Ataturkparêz e... Min ew wisa qebûl kiriye. Ew jî mecbûr e min bi wî rengî qebûl bike... Ji ber ku Ataturkparêz e, ez wê çîk nakim, ez loman lê nakim. Xwedê dizane, ew jî wê min ji ber ku ez Apoyî me çîk neke.*

Abdulkerim Begê ku em li Mûşê pê re peyivîn jî difikire ku ji bo mirov hêviya tiştekî ji Tirkan bike divê serê pêşî dewlet biguhere:

> *Bi ya min gelên Tirkiyeyê ne gelekî hestiyar in, lewma dema ev bûyer qewimîn û mirovên li vir mexdûr bûyî dest bi koçberiya ber bi rojavayê Tirkiyeyê ve kir, me bi tenê helwêstên ku ne pir erênî bûn ji gelê Tirk, gelê Tirkiyêyê dîtin. Mixabin avahiyeke civakî ya pir hestiyar nîne. Lewma li Tirkiyeyê guherin maye ji înîsiyatîfa dewletê re. Lewma paradoksek heye bi rengê dewlet biguhere civak diguhere, dewlet neguhere civak naguhere.*

Sabiha Xana ku li Batmanê em pê re peyivîn, tesbîta Abdulkerim Beg bi awayekî neyekser erê dike. Ew dibêje, ya rastî Tirkên ku Kurdan ditepisînin jî tên tepeserkirin û tuwanc pê dike ku ji bo sekinandina vê xelekê divê Tirk jî serî hildin:

> *Ya rastî mirov hene ku dikarin Kurdan di nava kevçiyek av de bixeniqînin. Dema ku ez wan mirovan dibînim, ez dibêjim, na, zen nakim. Heke bi rastî sîstem biguhere. Ma ne bi rastî dibêjin, 'em tên birêvebirin'. Heke em rast werin birêvebirin, ev milet bi rastî were ronakkirin û mafê heq dike li milet were vegerandin... Ya rastî em rabin, serî hildin, belkî em tiştinan bikin, hingê ev dewlet heta roja îro wê negihişta vê astê... Ango, Tirk jî helbet wisa, Tirk jî wisa ne. Ango Tirk jî tên tepisandin, ez çawa bibêjim, tên birêvebirin lê Tirk jî zilmê li Kurdan dikin. Heke ne bi vî awayî bûya, heke em neyên mêhtingehkirin û perçiqandin yan jî her kes weke dizane tiştekî bike, belkî evqasî em nehatana vê astê.*

Ya rastî piranîyeke mezin a kesên ku em bi wan re peyivîn, li ser pirsên elaqedarî hêviyên wan ji Tirkan pêşî gotin, "ti pirsgirêka wan nîne bi Tirkan

re”, bersivên ku digotin, li hemberî Tirkan hestên wan ên weke rikdarî, nefretê nînin, dan. Lê belê ji ber ku li hemberî neheqiyên li wan bûyî dengê xwe nekirine, tevlî gerîna wan a li edaletê û pirsîna wan a li heqê xwe nebûne û ya ji wan jî girîngtir, ji ber ku hewl nedane li wan bihisînin, serwext bibin jî, mirov dikare bibêje, nifrîna wan heye li dijî Tirkan. Nurcan Baysal rewşeke hestê ya li gelemperiya Kurdistanê û li cem zarokên wê jî heye ya dişibe vê, tevî fikrên xwe wisa îfade dike:

> *Li Diyarbekirê di her civînê de her û her 'mezinên me' me di biwara 'hesasiyetên raya giştî ya Tirk de hişyar dikin. Baş e, ma Kurd, Kurd çi difikirin? Mirov zaroka Azize Çetin be wateya vê çi ye, li Colemêrgê ciwan bûn, li Diyarbekirê her roj hişiyarbûna bi dengê helîkoptêran, her roj temaşekirina li mirovên minaqeşe dikin di televizyon û rojnameyan de ka mafê te yê zimanê dayikê ku ji ber bûna te ya weke insan heye, divê çend saetan bidin te, hema hema di tevahiya raya giştî ya Tirk de her roj piçûkketin, wateya van çi ye? Ez weha difikirin, xweziya careke bi tenê jî Tirkan hewl bidaya têgihana me fêr bibin, pûte bi hesasiyeta me bidana... Êdî ez dixwazim em nebêjin, ew bibihîzin... Ez dixwazim hûn zanibin wateya Kurdbûnê çi ye, zarokeke Kurd çawa mezin dibe.*[356]

### *Têkoşîna îtîbarê*

Stargeha herî girîng a ku vê nifrînê derman dike, çawa ku li jor me çêl lê kir, nexasim jî li cem pîr û kalan, weke ku dîn be xuya dike. Di warê civakî bi xwe de jî, yek ji rêyên herî girîng ên xwe girtina bi jiyanê ve siyasîbûn e. Bi gotineke din, ya ku zemîn amade dike ji wê yekê re ku mexdûr bi awayekî çalak tevlî siyasetê bibin têkoşîneke hevpar e ku dike ku aliyê meseleyê yê civakî û siyasî timî zindî bimîne. Di Rapora Çareseriyê ya ji bo Aştiyê Hewldana Jinê de jî behsa aliyê têkoşîna siyasî yê ku nifrînê derman dike, hatiye kirin:

> *Ji destpêka pêvajoya çareseriyê û vir ve, jin bi awayekî çalak beşdariyê dikin li kampanyayên ji bo rawestandina avakirina qereqolên avahîsaziya wan bi lez bûye, yê ji bo standina cenazeyên PKK'yiyên di şer de jiyana xwe ji dest dayî, yan jî li kampanyaya li dijî hikûmetê a bi navê 'gavê biavêje'. Bi xêra vê yekê jî li şûna ku bi nifrîn û endîşeyên xwe weke trawmayê bijîn, bi awayekî aktîf destekê didin avakirina aştiyê.*[357]

---

356 Baysal, 2014, 175-176, 179. Baysal nerazîbûnê nîşan dide ji ber nebûna nûçeyeke hêja di raya giştî ya Tirk de dwer barê Aziza Çetina dayika şeş zarokan a ku di encama li mala wê ketina topekê de 17'ê Çiriya Paşîn a 2012'an li navçeya Hekariya Geverê jiyana xwe ji dest dayî. Ji bo nûçeya elaqedarî bûyerê binihêre li http://www.bianet.org/bianet/insan-haklari/141514-kazan-vadisi-ne-giris-cikislar-kapali [7'ê Kanûna 2014'an].

357 Barış İçin Kadın Girişimi Çözüm Süreci Raporu (Rapora Çareseriyê ya ji bo Aştiyê

Beşdarîbûna çalakiyên ji aliyê Dayik/Mirovên Şemiyê ve tên organîzekirin jî, nexasim ji bo jinên xizmên wan bi darê zorê hatî wendakirin, xwedî wateya hem têkoşînê û hem jî piştgiriyê ye. Nihat Begê ku em li Bedlîsê pê re peyivîn girîngiya têkoşîna siyasî û piştgiriya xwe jî weha rave dike:

*Muheqeq nifrînek, nefretek li dijî van heye, lê belê [tişta] ew ber bi vê rêyê ve ajotin [girîng e]... Di encamê de ev herêma Kurdan e. Mafê wan ê herî xwezayî ye ku bi zimanê xwe bipeyivin, perwerde bibin. Ê, ev têkoşîn ji bo vê ye... Bi vê bûyerê re, ango dema hûn gihiştin gelek rêyan, ez hevpar dibin bi heman malbatan re, bi wan malbatan re ku di heman rewşê de ne. Ez diçim, guh didim wan... Bi rastî jî tiştên wisa hene, vê dîrokê komkujiyên wisa dîtin ku dema tu guh didî wan, tu xwe ji bîr dikî.*

Hakan Begê ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn jî dibêje, kîn û nifrîna di dilê wî de her ku dibîne têkoşîn dewam dike, vediguhere hesta rehetbûn û bawerî-bixweanînê:

*Weke ku wisa, rehetbûnek xwe dide der. Wisa, weke ku di nava te de kîn, nifrîn heye. Dema mirov diçe mîtîngekê, çalakiyekê, dema ez dibêjim çalakî, qesda min dema tu diçî faaliyetan, wisa weke ku hindik be jî mirov rehet dibe... Bawerîbixweanînekê diafirîne... Roja ku ev tên kirin, qet nebe, ez dixwazim ku ji van mirovan were pirsîn. Em nikaribin bibînin jî.*

Ramazan Begê ku em li Şirnexê pê re peyivîn, dibêje hestên weke tolhildan, rikdarî, nifrîn pê re hene, lê belê wateya van hestan û tesîra wan li têkoşîna siyasî weha rave dike:

*Wateya [van hestan] pirsîna hesabê vê komkujiyê ye. Ji ber vê ez dixwazim di nava vê têkoşînê de bim. Nifrîneke min a mezin heye, lê belê ne bi wateya li ser danîn û kuştinê... Ev min bêhtir dixe nava têkoşînê. Ez hewl didim da ku ev bûyerên tirsnak careke din rûnedin. Ji her kesî re behsa wan dikim. Ev hest nakin ku ez bi tenê bimînim, dikin ku bêhtir ez bikevim nava civakê.*

Nizamettin Begê ku em li Batmanê pê re peyivîn jî dibêje, hestên wî dişibin van, lê belê ne şexsî ne û tişta ku dikare van hestan bidebirîne jî di çareseri-yeke siyasî de dibîne:

*Ez vê şexsî nafikirim. Di encamê de bi hezaran mirovên me kuştin. Ez bi wateya kuştina wan li tolhildanê nafikirim. Min dixwest ku ew cezayê xwe bikişînin... Birayê min ji ber ku Kurd bû hat kuştin. Bidestxistina mafên Kurdan û ji bo vê yekê têkoşîna wan, hingê weke ku tola min hatibe hilandin... Birayê min ji ber*

Hewldana Jinê), 2013, 34.

*ku Kurd, welatparêz bû hat kuştin. Ez jî dixwazim bêhtir di nava têkoşînê de bim. Ji bo ku Kurd mafên xwe bi dest bixin, ez bêhtir têdikoşim... Tolhildaneke şexsî di dilê min de nîne.*

Abdulselam Begê ku em li Mêrdînê pê re peyivîn, tevlîbûna xwe ya nav têkoşîna siyasî, hisa tolhildanê ya di dilê xwe de û hêviya xwe ya ku dê vê hisê bidebirîne vedibêje:

*Şehadeta [kurê min] em ber bi têkoşîna siyasî ve ajotin. Piştî wê rojê, heta ku ji min hat min cihê xwe girt di xebatên partiyê de... Dema ku em dibêjin, em dixwazin tola xwe hilînin, em dixwazin ji dewletê tolê hilînin. Di taziyeyê de pênc rojan me pişta xwe da dîwêr û em man; em ne rûniştin, ne razan. Heqaretên wan, êşkenceyên wan, ceyrana dan me; ev hemû dikin ku hisa tolhildanê zîl bide... Ji bo me tolhildan cezakirina vê neheqiyê ye... Divê heq û edalet bi cih were... Em ji bo vê têdikoşin. Tevlî xebatên partiyê dibin. Ji bo ku ev hesab bidin. Ji bo ku em heqê xwe bi dest bixin. Ji bo me, heke em weke gel mafê xwe bi dest bixin, ev jî tolhildan e ji bo me... Ev hest li cem min, êşên min kişandî ne... Israra me ye li hemberî van hemûyan, ya têkoşînê û doza mafê me ye... Bi tenê heke hebûna me were qebûlkirin, hestên me wê sivik bibin.*

Sabiha Xana ku li Batmanê em pê re peyivîn jî weha behsa giringiya ji bo xwe ya tevlîbûna nav xebatên Partiyê dema ew li Stenbolê dike, û weha fonksiyona wê rave dike:

*Heke ez nekatama Partiyê, belkî ez biketama nav derdorên xirabtir, ango min ê ew nirxê malbata xwe ji dest bida. Em ketin nav Partiyê. [Kirina] çalakiyên civakî... [êşa min] sivik dikir, têra xwe jî baş li min dihat, di encamê de mirovên me, êşên me. Dema ku mirov wê zorê û mêhtingeriya li ser Kurdan ferzkirî dibîne, bêhtir xwe nas dike... Di encamê de bavê min di têkoşîna li ser vê rêyê şehîd bû. Em jî, madem zarokên wî ne, divê em nirxên wî hilgirin.*

Ji bo dîtin û Darizandina fail û berpirsiyaran ew bawer dike ku divê ev têkoşîn dewam bike û heta bi dewleteke Kurdan bi encam bibe: “Helbet, bi tenê heke dewleteke Kurdan ava bibe ev ê bibe. Jixwe bêyî ku dewleta Kurdan ava bibe ne mimkun e tiştekî wisa bibe. Heke em hebûna xwe nedin hiskirin, heke em bi rastî nedin hiskirin ku Kurd miletek in, jixwe tiştekî wisa nakin.”

Zuleyha Xana ku li Colemêrgê em pê re peyivîn dema dibêje, “ez ne bi tenê ji bo Kurdan, ji bo Tirkan jî aştiyê dixwazim” ya ku dixwaze bibêje ew e ku dixwaze tu kes di şer de nemire, me li jor jî behsa vê kiribû. Wê wateya vê aştiyê ji bo xwe weha vegotibû:

*Ez aştiyê dixwazim... Bila erdê Kurdan bidin wan... Mafê wan bidin. Dewleta wan bidin... Erê, bila her kes li welatê xwe bijî... Bila aliyê Kurdistanê ava bibe, ew der guhertî be. Bila Kurd bi nasnameya xwe azad bigerin... Em pêşî nasnameya xwe dixwazin. Bi nasnameya xwe em bigerin. Em biçin doktor. Rabin û rûnin. Em doza nasnameya xwe dikin.*

Herçî Ahmet Beg e ku em li Şirnexê pê re peyivîn, difikire ku heta Kurdistan ava nebe Kurd nagihîjin mafên xwe. Li aliyê din, Kurdistan ava nebe jî bi peymana aştiyê heqîqet wê werin qebûlkirin û li nav raya giştî ya Tirkiyeyê deng vedin:

*Bila Kurdistaneke azad were damezrandin... Înşelah dema Kurdistaneke azad hat damezrandin, em jî em ê hewl bidin mafê xwe bibin wêdetir... tu rêyeke din nîne. Ez bawer nakim ku li vê dewleta Tirkiyeyê em tiştekî bikin... Muheqeq wê lihevkirinek çêbibe... Peymana aştiyê. Ango xwîn bi xwînê nayê paqijkirin... Helbet, dema wisa hevdîtin, muzakere çêbûn, ango dema hin maf dan me, hingê divê dewlet li vê mikur were. Dema lê mikur hat jî, jixwe Tirkiye hêmû wê bibîne... Bi tenê hingê yê nebihîstî wê bibihîzin. Bi nifşê nûrabûyî re jî, bûyereke wisa, hingê wisa vê malbatê, ê vê malbatê, ê vê malbatê, wisa bûyer, tiştin bûne, evqas kes ji dest dane. Bi tenê heke tiştekî wisa bibe, yên nebihîstî wê bibihîzin.*

Hin kes hene, ne ku bi tenê ji bo bigihîjin mafên xwe doza damezrandina Kurdistanê dikin, ew vê ji bo watedarkirina têkoşîn û mirina xizmên xwe weke bûyera herî girîng dinirxînin û lewma vê dozê dikin. Ayşe Xana ku em li Colemêrgê pê re peyivîn, ji bilî çûna cem kurê xwe yekane tişta xwestî ev bû: “Hema bi tenê ku bi ser kevin. Min Kurdistan bidîta. Ez jineke pîr im. Birinên kurê min pir in... Kurê min gelek tişt kiribûn.” Cemile Xana ku em li Mûşê pê re peyivîn, dema ku behsa gotinên mêrê xwe dike yên ku wî beriya ku di bin çavan de were wendakirin jê re gotibûn, dibêje wî jî daxwazeke dişibe vê kiribû:

*Rojekê hat, ji min re got, ‘xweziya Kurdistan ava bibûya û emrê min bi tenê kêliyek bûya.’ Min got, ‘binihêre Kurdistan ava dibe, heke emrê te kêliyek be, kî wê min û malbata min biparêze.’ Wî got, ‘hingê dinya wê xweş be, azad be’... Zimanê me serbest be wê ji bo min jî baş bibe... [Dewlet] bila zimanê me bide me, bila nasnameya me bide me, em jî azad bin... Ez dibêjim, bila her kes serbet û azad be. Ez dibêjim, bila her kes bigihîje mafê xwe. Bila ev êşên me kişandî belesedem neçin.*

Bedriye Xana ku em li Batmanê pê re peyivîn jî dibêje, berdêla êşên kişandî qebûlkirina mafên wê ye:

*Mafê me, mafê me, em bibêjin, nasname û axa me ye. Em bibêjin, zimanê me... Dewlet jî nade me... Em jî doza mafê xwe dikin. Me evqasî êş kişand, me mirin dît. Ji bo mafê xwe, nasnameya xwe, zimanê xwe, axa xwe, ava xwe û Kurdistana xwe... Em bibînin ku dewlet hin tiştan qebûl dike. Weke mînak nasname û zimanê me serbest bike. Girtiyê di hepsê de berde, hinekî dilê me wê rehet bibe. Erê me xwîna xwe rijand, lê belê hin tişt me dan, hingê dilê min wê rehet bibe.*

Dema ku xatir dixwaze jî daxwaz û temeniyên xwe li pey hev dike rêz:

*Hûn li ser ser û çavên min hatin... Ez gelekî razî bûm. Xwedê avekê li vî agirî bike. Aştiyê bike. Bijî Kurd û Kurdistan. Bijî Serok Apo. Bijîn ên di hepsê de. Bijîn gerîlayên serê çiyê. Xwedê aştiyê bîne ji van gelan re. Bila hemû bibin bira. Bila bi destên hev bigirin, bila ji hev razî bibin.*

Nimet Begê ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn, beriya ku bibêje, jiyana bi hev re girêdayî pêkhatina edaletê ye, pêwîst dibîne ku behsa rewşa Abdullah Ocalan a niha û destketiyên tevgera Kurd bike:

*Min porê wî dît wê roja hanê. Min êdî êşa xwe ji bîr kir, ya min çû. Vî mirovî gelê Kurd ji binê betonê derxist, ji binê hezaran kîlometroyî derêxist. Îro tevgera Kurd hatiye devereke baş. Televizyona wê heye, artêşa wê heye, çapemeniya wê heye. Tu îro li vir bi min re hevpeyvînê dikî... Ango, em îro li cihekî gelekî baş in, şikir ji Xwedê re, lê belê ev destketiyên nirxên qehremanên me dayî ne. Bila kes bi erzanî ji xwe re neke mal... Bila tu kes nebêje, 'min ev kir'... Ma ne ez dibêjim, doz ha ev e. Ji nifşekî ber bi nifşê din ve tê. Ew ji yê din re dibêje, 'bapîrê te wisa kuştin, apê te wisa kuştin'... Ha wisa tê. Heta ku ew êş nehedinin, heta ku edalet bi cih neyê, hiqûq bi cih neyê, ev ê wisa dewam bikin. Wê tu wextî jî xilas nebe. Kengî tu edalet û hiqûqa xwe rûnînî, vî aliyê xwe yê mexdûrbûyî bi awayekî xwedî wijdan, destê xwe, muhasebeya wijdanê xwe bikî û wan tetmîn bikî, hingê tu, edalet wê pêk were û mirov jî wê welatê xwe, çîka xwe jî efû bikin.*

Hevehan Xana ku li Colemêrgê em pê re peyivîn jî têkoşîna edaletê bi Partiyê re dike yek: "Em ê ji vê Partiyê negerin. Em ê xwîna [kurê min] li erdê nehêlin." Taha Begê ku em li Diyarbekirê pê re peyivîn jî behsa girîngiya vê Partiyê ji bo kesên xizmên xwe ji destdayî dike:

*Niha ez ne endam im, lê mîtîng e, çi ye, ez diçim her tiştî... Weke Kurdekî ez, niha kê bîne... ne xema min e. Wê diziyê bike, rê çêneke, çîka şaredariyê, wê çopê birijîne, ew hîç ne xema min e... Ez ê dengê xwe bidimê, bila zanibin, ez Kurd im, ez heme. Ne ku ileh bi sîlehê ez têbikoşim, ez wan bikujim... Hema heke dilê wan dixwaze, bila darekê bînin li wir girêbidin. Ne çîka min e... Ka bila xwînê rawestîne.*

Eşref Begê ji Wanê yê ku em li Stenbolê pê re peyivîn, dema ku behsa dilsoziya gelê Kurd bi tevgera siyasî ya Kurd re dike, balê dikişîne ser heqîqeteke ku dewlet naxwaze bibîne:

> *Ew tevger jî li te çîk bûye, xwedî derketiye bi her awayî... Rûmet daye te, lewma tişta Kurd herî zêde ji ber muzderîb dibin jî ev e. Bêrûmetî... Lê belê heke hin kes timî xwedî li te derketibin, rûmet dabin te, fikrên vê yên cihê hene... Hîna jî wisa ye, lewma tu parçeyekî wê yî. Heke berê xwe ji wan biziviranda, ev jî rastiyek e, wê evqasî mezin nebûya, bi pêş neketa. Em bibêjin, kesek, mirina birayê min ê mezin. Heke xwedî lê derneketa, ewqasî weke parçeyekî ji xwe nedîta, va ye min behsa wê kir, xwîşka min a mezin wê ne di nav wê partiyê de bûya.*

Ew difikire ku daxwazên Kurdan divê weke awayekî wefakariya beramberî peymanê were fêmkirin û bi cih werin anîn:

> *Kurdan tu carî xiyanet bi vî miletî re nekir. tu carî berê xwe jê neziviran d. Ev jî rastiyek e, lê belê îro daxwazên wan hene. Divê guh bidin wan. Berdêla wê çi dibe bila be, divê guh bidin wan. Dibe ku serxwebûnê jî bixwazin. Dikarin bixwazin, ev xwezaya mirovî ye. Ango, ev ê were minaqeşekirin. Ka çi kara wê heye, çi zerara wê heye. Ev wê cuda were nîqaşkirin, lê belê her tişt wê were çareserkirin, piştî wê mafê neteweyan ê diyarkirina çarenûsa wan heye. Bixwaze wê qut bibe, nexwaze nabe. Ew jî tiştekî din ê cihê nîqaşê ye, lê belê divê ileh ev pirsgirêk were çareserkirin.*

Adem Begê ku em li Colemêrgê pê re peyivîn bi xwe, damezrandina Kurdistanê ji bo aştiyê weke yekane rê nebîne jî, bi israr dibêje heta ku cudakerî hebe aştî wê pêk neyê:

> *Ez nabêjim em Kurd hema niha veqetin filan. Ez dibêjim, di nava aştiyê de, ango em bibin bira, aştî heke hebe, em di nava aştiyê de bijîn. Bila zilmê li me nekin, bi heman rengî bila zextê li me nekin... Ha li vir em bi îraniyan re man û ha bi Tirkan re, ha iraqiyan re. [Ya girîng ew e ku] Di encamê de em weke bira bijîn. Çi heqê wî tê qebûlkirin bila heman heqê min jî were qebûlkirin. Dema ez çûm Stenbolê, polês li nasnameya min nihêrî, bila min nekişîne aliyekî. Yan jî dema nîşana wesaîta min dît, nebêje "sîh" û min nekişîne kenara rê. Bila min weke yozgatî, izmîrî, enqereyî, stenboliyan bibîne... Bila bi pêşhukman li min nenihêre.*

Irfan Begê ku em her weha li Colemêrgê pê re peyivîn, tevî ku di biwara damezrandina Kurdistanê de daxwazek îfade nekir jî dibêje, heke Abdullah Ocalan û girtiyên din ên siyasî serbest neyên berdan ew ê baweriyê bi dewletê neînin:

*Abdullah Ocalan dibêje, 'vê KCK'ê berde, deriyê vê girtîgehê veke.' Ma gelekî zehmet e? Dikarin vekin, lê venakin. em, mesela dibêjin, 'Abdullah Ocalan berde, tu bernedî, nabe.' ...[hingê] em ê baweriyê pê bînin, hindikî jî be, em ê hinekî baweriyê pê bînin... Mesela, ez dibêjim, bi Abdullah Ocalan re dipeyive, dîtira rojê operasyon çêdibe. Li navendan, mesela li Stenbolê bi hezaran kesî digirin. Ji ber vê jî em baweriya xwe pê naînin. Niha, mesela ez bibêjim, bi hezaran kes, şaredar, birêveber niha avêtine girtîgehê. Ma zehmet e ku mirovek ji bo zimanê xwe bipeyive? ... Ma ez çawa bibêjim, dinya alîkar dibe lê Tirkiye alîkar nabe.*

Ekrem Begê ku em li Mûşê pê re peyivîn dema daxwaza serbestberdana girtiyên di girtîgehan de îfade dike, îşaret bi çend aliyên neheqiyên girtinên ji ber doza KCK'ê bi hev re dike:

*Niha jî gelek rewşenbîrên Kurd di girtîgehê de ne. Niha jî ku ji min re bibêjin, here zanîngehê, ez ê bifikirim ku biçim girtîgehekê û li wir perwerde bibim. Lewma çi derdora rewşenbîr hebe di girtîgehê de ye. Çima ev nayên efûkirin? Û wan tu komkujî nekiriye. Bi tenê ji ber fikrên xwe yên rewşen ev pêncî sal in, şêst sal in û tevî ku li dijî gelek nexweşiyên kujer li ber xwe jî didin, hîna di girtîgehê de ne.*

Abdulkerim Begê ku em her weha li Mûşê pê re peyivîn ji kêm kesan e ku bi awayekî aşkere fikra bihevre jiyanê îfade kir:

*Di encamê de êşên çi qasî mezin hatibin kişandin, bila hatibin kişandin, em mehkûmî hev in. Em mecbûrê hev in. Em neçar in ku bi hev re bijîn. Bi tevahiya cihêtiyên me, em neçar in hevdu qebûl bikin. Tew, jixwe jibîrkirin ne mimkun e, lê heke em jênegerin ku êşên xwe bikin kevirê çarqozî yê tevahiya têkiliyên xwe, em nikarin bi hev re bijîn. Heke li ser vê erdê em ê bi hev re bijîn, erê ne mimkun e ku êşên qewimî herdu alî jî ji bîr bikin, lê divê em wan biavêjin kurahiya dilên xwe, ez wisa difikirim.*

Em peyvê Abdulkerim Beg ên beriya niha jî li ber çavan bigirin û bi bîr bixin ku ew weke şertê bi hev re jiyanê yê herî sereke doza qebûlkirina heqîqetan dike. Bêyî ku daxuyaniyeke fermî ya bi nihêrîneke siyasî û exlaqî û qebûleke giştî ya civakî hebe ku dibêje, bêedaletiya hatî serê mexdûran nabe ku were qebûlkirin, zehmet dibe ku ew Dewleta Tirk weke dewleta xwe û Tirkan jî, biratî li aliyekî, di welatîbûnê de jî hevpar bibînin. Ji bo serwextbûna li vê rewşê, kafî ye em tecrûbeyên xwe yên şexsî bînin bîra xwe. Di wan têkiliyan de ku zerar li heysiyet û rûmeta me dibe, em hisa aîdiyetê jî ji dest didin û heke veger ji vê jidestdanê nebe, hingê ya dimîne tenêtî û tenêhiştîbûn e. Bi ser de

jî heke ev jidestdan tê serê endamên din ên civaka ku nasnameya me ya çandî û civakî pêk tîne, hingê heysiyet û rûmeta em doza lêvegerandina îtîbarê dikin, ne daxwazeke şexsî ye, lê belê dibe mijara daxwazeke siyasî. Ev daxwaz di heman demê de berxwedana li dijî lihevhatineke siyasî ye jî ku hewl tê dayîn bi erzanî were bidestxistin. Dema ku tiştên di rabihuriyê de qewimî neadil û rûmetşikên bin, bêyî lihevhatinê, yan jî bi lihevhatina bi rabihuriyê re ne mimkun e ku em li hev bikin.

### *Şensekî din*

Helbet ev şîrove hemû, heta îfadeyên gotin bi gotin ên kesên em bi wan re peyivîn jî fikrên Kurdan hemûyan û heta fikrên kesên em bi wan re peyivîn hemûyan jî bi temamî nadin der. Di xebateke li ser koçberiya bi darê zorê de, mexdûreke ku fikrên xwe gotî, sînorên vê xebata me jî diyar dike:

> *Hûnê gotinên wan bidin der û tiştên ku ew dixwazin bidin bihîstin ew ê ji we re bibêjin. Dema tu bi min re hevpeyvîneke dikî û ez dixwazim yên din bibihîsin, heta ku mimkun be, ez ê bixwazim ku tu bibî 'dengê min ê ku ez dixwazim tu bidî bihîstin'. Lê tu tu carî nikarî bibî 'dengê mexdûrî'. Tu navbênkar bî jî ew ne dengê wî mexdûrî ye. Zimanê wî guhertiye, lê zimanê ku wê ji bo te bi kar bîne gelekî guhertî ye.*[358]

Wê tu carî mimkun nebe ku mirov dengê mexdûr bibihîze, lê belê bihîstina tiştên ku dixwaze bide bihîstin û hewldana serwextbûna li wan nemimkun nîne. Bi vî awayî, beriya ku em bigihîjin encamên siyasî û civakî yên hevpeyvînên me bi kesên ku salên notî di şerê li Kurdistanê de xizmên wan hatin kuştin yan jî bi darê zorê hatin wendakirin, mimkun e hewldaneke di cih de be ku em hewl bidin di dinyaya hestî û fikrî ya kesên em bi wan re peyivî bigihin. Çawa ku beriya niha jî me îfade kir, pirsa "çima" li navenda jiyanan malbatên mexdûran e û heta ku bersiva vê pirsê neyê dayîn mexdûr xwe di dinyayeke îflah nabe ya nediyarî û bêbaweiyê de dibînin. Ev dinya, dinyayeke wisa ye ku lê ew hisa hakim e ku dibêje, tiştên qewimî dikarin dîsa biqewimin û tiştên ku biqewimin wê nikaribin werin kontrolkirin. Bersivên ku hewl didin ji pirsa "çima" re bibînin, ji heqîqetên muhtemel gelekî hişktir, bêhêvîtir û lihevneker in. Her ku êş hişk dibin, bersiv jî meyildar dibin ku heqîqeteke din biafirînin. Bêedaletiya hatî serê wan vediguhere normalbûneke nû, parçeyekî xwezayî yê nasnameya wan, mîrateyeke çandî ya ku wê ji nifşekî derbasî nifşê din bibe. Li dawiya vê veguherînê rikdarî heye.

---

358 Yağız, Amca, Erdoğan û Saydam, 2012, 204.

Ya ku rêya ber bi rikdariyê ve diçe dirêjtir dike, rikdariyê vediguherîne xeydê, bi gotineke din ya ku pêşiyê lê digire ku rikdariya wan a li dijî dewletê berê xwe bide Tirkan û bi xeydê sînordar dike jî têkoşîna hiqûqî, civakî û siyasî ye ku ji bo wan êdî veguheriye meseleyeke man û nemanê. Navê têkoşîna hiqûqî ya di pêvajoya edaletê ya piştî şerî de daxwaza dadgehkirin û cezakirina fail û berpirsiyaran e ku hîmê tedbîrên edaleta cezaî pêk tîne. Vekirina dozan, anîna fail û berpirsiyaran a dadgehê, lêpirsîna wan bi destê parêzer, dozger û dadgeran ve, pêvajoyek e ku mexdûr bi israr dixwazin bi çavên serê xwe bibînin û dema wisa bibe, hem şexsî û hem jî siyasî xurt dibin, û qanih dibin ku serweriya di jiyana xwe de ji nû ve bi dest dixin. Aysel Xana ku li Mûşê em pê re peyivîn di rûniştineke Darizandina kesên malabata wê qetil kirî de hazir bû; tiştên wê gotî weke ku nîşan bidin pêvajoya dadgehê qismî jî be ew tetmîn kiriye:

> *... Xwedê jê razî be [parêzer] hatibû. Çendek hatibûn, deh parêzer. Wan pirsên pir xweş pirsîn ji wan. Ew hatibûn, pir xweş derbas bûbû... Pirsên pir xweş ji wan pirsîn. Bersivên ne weke hev dan wan... Ez tam nizanim lê, min fêm kir li wan deran bûne, bi her tiştî dizanin, kirine... Dozger doza cezayê hepsa muebed a girankirî neh caran daye, dozger beg. Dadgehê hîna biryar filan nedaye lê di vê dadgehê de wan girtî tînin.*

Pêvajoyên hiqûqî êşa mexdûran bi temamî ji holê ranekin jî qonaxeke giring in ku hisa bêedaletiyê, hestên tolhildan û rikdariyê, rewşa tenêtî û tenêhiştîtiyê sivik dikin, û jidestdana heysiyet û rûmetê jî telafî dikin. Li aliyê din heta neyê qebûlkirin ku êş wê tu carî tine nebin, ev qonax li paş nayê hiştin. Qebûleke bi vî rengî, ne yeke weha ye ku hewldanan bêhûde dike û hewldanê jî ne hewce dike, ew dikare bike ku em bêhtir hewl bidin, dikare me ji wê nefsmeziniya me rizgar bike ya zextkirina li mexdûran ji bo jibîrkirina êşên hatî serê wan, ji bo bi rabihuriyê re li hev werin, jiyana xwe dewam bikin. Qebûleke bi vî rengî gaveke weha ye ku nîşan dide ku em têdigihijin ku ew ji bo dilsozî xizmên xwe yên ji destdayî, têkoşîn û heqê wan bimînin jî naxwazin ji bîr bikin û li hev werin, bi gotineke din ku em şîna wan parve dikin. Aliyekî din yê vê gavê jî fêmkirina wê yekê ku bêdengman, nepeyivîn, bersiv nedan a hinan jî divê em ne weke xwepaşvekişandinê, destê xwe kişandina ji jiyanê û gerîna li edaletê, lê belê weke destwerdaneke guhertî, dengekî din yan jî bi serê xwe weke peyameke siyasî bixwînin. Dema ku em bihesibînin ku ji bilî mafên welatîbûn û mafên mirovan ên sereke, pêdiviyên wan ên civakî û hêviyên wan jî hene, divê em aqil bişûxilînin ji bo çerxên edaleta selihandinê yên ku bingeha têgihiştina cezaî pêk tînin, yên ku hin kes kafî, hin kes jî girîng

nabînin, pêvajoyên hiqûqî yên ku piranî jî hîna nagihîjiyê bixe nava tevgerê û wan temam bike. Bi ser dejî, heke em ferz bikin ku pêvajoya edaleta cezaî wê rojekê bêqisûr bixebite jî, şahidên ku ne rast e mirov wan li kursiyê guneh-bar rûnîne, lê belê berpirsiyariya bêdengmayîna li hemberî bêedaletiyê li ser milên wan e; mirov derfetê biafirîne ku ew bi şexsê xwe tevlî pêvajoya seli-handina hesta edaletê bibin da ku ji berpirsiyariyên xwe xilas bibin, ev yek ji bo avakirina dostaniya siyasî yan jî nûkirina qewlê biratiyê wê timî lazim bibe.

Beriya her tiştî, ji ber ku li dijî civakeke çandî ya diyar e xwedî xisleteke sayasî ye, divê gunehên li dijî mirovahiyê jî bi vî navî werin qebûlkirin. Nexasim jî di wan rewşan de ku gunehên wisa bi destê wezîfedarên dewletê bi xwe ha-tibe kirin, her kesê ku dewletê bi erêkirina welatiyên din jî kirî dikare were kuştin, dikare were wendakirin ji statuya welatîbûnê jî tê daxistin. Di vê rewşê de divê halekî mirov dikare têbigihîje be ku mexdûr ji xwe re li dewleteke nû, statuyeke nû ya welatîbûnê û hemwelatiyên nû bigerin. Heta ku dewlet û welatiyên heyî niyeta selihandina têkiliyên xwe bi wan kesên dûçarî gu-nehên li dijî mirovahiyê bûyî re nîşan nedin, ev lêgerîn dewam dike. Çawa ku me li jor jî got, dadgehkirin û cezakirina fail û berpirsiyaran hem di warê ji wan stendina îtîbara wan a neheq û hem jî rawestandina destketiyên wan ên madî, nîşaneke girîng a vê niyetê ye. Ku bi şexsê xwe tevlî wan sûcen navbiri nebûbin jî ji wezi^feyên wan ên heyî dûrxistina rayedarên siyasî, îdarî û eskerî yên wê demê jî nîşaneyeke bi heman rengî ye. Ev cezanekirina ku wateya wê dewamkirina xelatkirina wan e, weke nîşaneke dewamkirina cezakirina mex-dûran tê şîrovekirin. Encama herî girîng a hevpeyvînên me îşaret bi hebûna mesafeya di navbera Kurdan û Dewleta Tirk de dike ku jixwe ji ber hebûna van nîşaneyan e. Ji bo ku ev mesafe mezintir nebe rexmî rewşên nexebitandi-na pêvajoyên hiqûqî û da ku negihîje heta bi têkiliya di navbera Tirk û Kurdan de tedbîrên mimkun e werin girtin jî ji aliyê kesên ku em bi wan re peyivîn, carinan bi awayekî aşkere û carinan jî bi rêya tuwancê hatin îfadekirin.

Çawa ku me beriya niha jî got, divê were teslîmkirin ku qurban û mexdûrên ku yan ji ber nasnameya xwe ya siyasî û çandî yan jî ji ber têkoşîna xwe ya siyasî, bi destê dewletê bi xistina dewrê ya îdeolojiyeke siyasî ya diyar, bi meşandina pêkanînên neasayî û kêfî bi awayekî birêkûpêk û di encama şerekî de ku hêzên paramilîter jî tevlî bûn hatin kuştin, hepskirin, êşkencekirin yan jî bi darê zorê wendakirin ji Kurdan pêk tên, û nabe ku ev were qebûlkirin; ev yek ji tedbîrên behsa wan hat kirin a herî girîng e. Ev qebûl weke gava herî heyatî xuya dike ku wê newekheviya civakî û siyasî tarez bike û heysiyet û rûmeta gelê Kurd lêvegerîne. Divê bêedaletiya ku ji ber ku Kurd bûn dûçarî bûn, bi heman rengî

bi cudakeriyeke pozîtîf a ku ji ber ku Kurd in wê sûdê jê wergirin ji navê were birin. Bi tenê hingê dibe ku mimkun bibe ku li ser xaleke hevpar a welatîbûna wekhev û mirovbûna hevpar, heta dostaniya siyasî Kurd û Tirk werin cem hev. Herçî derxistina bernameya tezmînata madî ya ye ku wê bi vê qebûlê re pêk were, ne bi tenê tedbîreke ji bo telafîkirina jidestdayiyan e, lê belê dikare weke tedbîreke qismî ji bo kûrtir nebûna newekheviya aborî ya heyî jî pêk were anîn. Divê mirov heqîqeta Baysal ragihandî li ber çavan bigire: "Di nava zarokên herêmê de ewqas xezaeb û trawmaya ketî serhev heye ku li cihên ku karibin kîn û xezeba xwe birijînin ê digerin. Xîşkan li erebeyan dixin, kevirên peyarêyan ji cihê wan dikin, kulîlkan diçirpînin, xezeba wan heye li dijî her kes û her tişta baştir dijî."[359] Li aliyê din, em bi bîr bixin ku tedbîrên tezmînatê yên bêyî xwestinalêborînê, merasîmên fermî yên bibîranînê û daxuyaniyên dewletî bêfêde û nabe werin qebûlkirin tên dîtin. Encameke din a erênî ya van qebûl û tedbîran hemûyan wê bibe ew ku pêşî li kolektîfbûna sûc were girtin ango nehêle ku sûc li hesabê Tirkan hemûyan were nivîsandin. Mirov nikare bibêje ku hîna meyileke mirovên em bi wan re peyivî ya bi vî rengî heye, lê belê hêrs, dilmayîn û xeyda wan a li hember Tirkan aşkere ye.

Divê mirov heqê tevgera Kurd nexwe di mijara hîna nedana der a vê meyila me behsa wê kirî de. Bi tevlîbûna nav têkoşîna siyasî û civakî a ku tevgera Kurd wê bi rêxistin dike, ji wan hatiye ku xwe dûrî gelek rewşên di warê psîkolojîk û civakî de hilweşêner dûr bigirin. Wan ev pêvajo ne bi tenê weke mexdûr lê belê her weha weke kirdeyên siyasî jî di ser xwe re bihurandiye û hîna jî pê dijîn. Bi qasî van Kurdan û divê Tirk û dewlet jî rewabûna tevgera Kurd û fonksiyona wê qebûl bikin. Çawa ku Goral dibêje,

> *ji nîqaşên xweseriya demokratîk heta bi lipêşgirtina behremendiya 'xwebirêvebirinê', ji avakirina tevgereke jinê ya xurt heta bi banga danîna têkiliyên guhertî bi xwezayê re, ji îdîaya avakirina 'civakeke exlaqi-civakî' a nû heta bi hewldana avakirina piştgirî, berxwedan û têkiliyên jiyana rojane ên cihê, ji afirandina ziwatekî nû yê siyasî û repertuwareke nû ya çalakiyan heta bi rêya seferberkirina derdorên fereh ên civakî hilberandina çalakiyan, tevgera Kurd ji îro ve ber bi şûştina ji mêhtingehbûnê ve gavan diavêje, hewl dide ezmûnan biafirîne. Em çi navî lê dikin bila bikin, hevdîtinên aştiyê yan jî çareseriyê heke hewldanên bi vî rengî han bide, zêde bike û pireng bike, ev ê wesf û meydana tesîra hevdîtinan kûrtir bike.*[360]

Bi vî awayî heke dewletê her şêwaz munasebeta bi Abdullah Ocalan, tevge-

359 Baysal, 2014, 179.

360 Goral, 2014, 8.

ra Kurd, partiyên wan ên siyasî û rêxistinên civaka sivîl re bi rê ve bibe bi bîreweriya ew parçeyek ji hewldanên gelemperîkirina rewabûna me behsa wê kirî ye, ev ê bibûya gaveke di cih de. Di pirtûka Baysal de serhatiyek heye ku behsa wê yekê dike ka çima azadbûna Abdullah Ocalan ji bo telafîkirina êşên ku gelekî şexsî xuya dikin bi roleke evqasî mezin radibe. Di dema serdana heyeta Zilamên/Mirovên Maqûl a Kavarê de dema ku ji jineke mêrê wê hatî kuştin tê pirsîn hêviya wê ji dewletê çi ye, bersiva wê dibe "pêşî azadiya Ocalan, piştre zimanê me û nasnameya me", li ser vê bersivê yek ji heyetê pirsa "çi elaqeya van heye bi tiştên hatî serê te re?" jê dike. Berdiva jinê weke kurteyeke tiştên em hewl didin li vir bibêjin e:

> *Ev 20 sal in ez ji xwe heman pirsê dikim. Çima ev anîn serê mêrê min? 'ÇIMA? ÇIMA' ... Ya rastî bersiveke ÇIMA'yê nîne... Ez dizanim ku bersiveke ÇIMA'yê nîne... Mêrê min ji bo têkoşînekê mir, ji bo me mir, ji bo gelê Kurd mir... Ev heqaret e li me... HEQARET li me kirin, HEQARET kirin.*

Baysal dibêje, wê gelekî ji Kavariyan peyva heqaretê bihîstiye û vedibêje ka ev peyv çi tiştan îfade dike: "Ev nîşana wê yekê bû ku Kurd zilma di nava şerê evqas salan de li wan hatî kirin beriya her tiştî weke 'meseleyeke rûmetê' dibînin. Pirsgirêka Kurd meseleya Kurdbûnê bû, Kurdbûn jî êdî meseleyeke rûmetê bû."[361] Weke her meseleya ku meseleya rûmetê ye, ji nêzîkbûna li meseleya Kurdbûnê re jî îhtîmam divê. Ev îhtîmam jî van tiştan hewce dike: qebûlkirina rewabûna têkoşîneke siyasî ya ku beşeke mezin a gelê Kurd weke nûnerê xwe wê qebûl dike û bi şexsê xwe tevlî dibe û xwedîderketina li têkoşîna îtîbarê. Erêkirin, qebûl, tedbîrên û îhtîmama behsa wan tê kirin, ne ji bo Kurdan û ne jî ji bo Tirkan ferzek in; belkî herî zêde ji bo îhtîmala bi hev re jiyana Tirk û Kurdan şensek be, şensekî din.

---

361 Baysal, 2014, 309-310.

*Beş VII*
# Nirxandin Û Pêşniyar

Li Tirkiyeya ku hewl dide ji agirbestê ber bi pêvajoya çareseriyê ve, ji pêvajoya çareseriyê ber bi pêvajoya aştiyê ve, ji hevdîtinan ber bi muzakereyan ve bi pêş ve biçe, bivênevê ew xebatên bi navê edaleta piştî şerî û esas xwe disipêrin rûbirûbûna bi rabihuriyê re wê her biçe girîngtir bibin. Di beşên pêşî de em pê daketibûn ka ev xebat bi çerx û amûrên bi çi rengî yên hiqûqî, siyasî û civakî dikarin werin birêvebirin, dema ku me ev kir jî, me cih dabû mînakên li dinyayê. Em bi bîr bixin ku hemû divê di heman wextê de werin birêvebirin û careke din di peywenda Tirkiyê de behsa van çerxan bikin:

### *Derxistina holê ya heqîqetan û qebûlkirina wan*

Gava herî girîng a pêşî derxistina holê ya heqîqetan û gunehên li dijî mirovahiyê yên bi destê hêzên ewlekariyê yên fermî yên dewletê yan jî rêxistinên wê yên paramilîter û qebûlkirina wan e. Qebûlkirina sûcên salên notî li Kurdistanê kirî bi awayê navlêkirî, aşkerekirina sazûmaniyên fermî û ne-fermî yên fail û berpirsiyar girêdayî wan, dema mirov berpirsiyarê mucered û dûr ê ku mexdûr weke "sîstem" bi nav dikin bi gewde bike, ev dikare hem êşa mexdûran kêm bike hem jî di warê pêşîgirtina li dubarebûna tiştên rûdayî de dikare di nava raya giştî ya Tirkiyeyê de hayilbûnekê biafirîne.

Daxwaza herî girîng a malbatên ku xizmên wan hatin wendakirin, daxwaza gihiştina beden û gorên xizmên xwe ye, ev hem parçeyek e ji daxwaza derxistina holê ya heqîqetan hem jî gava herî girîng e ku dike ku pêvajoyên şîngirêdanê temam bibin. Ji gorên komelî yên ku di bin çavdêriya mirovên ehlê meselê yên pispor, antropolog, arkeolog, saziyên tiba edlî, nûner û çavdêrên hiqûqî de bi îhtîmam werin vekirin, mînakên raçînkê wê werin bidestxistin; divê bi rêya bankayeke DNA'yê ya ku xizmên wendakiriyan dikarin miraceetî wê bikin, ev mînak ji bo liberhevgirtinê karibin werin bikaranîn. Wekî din pir girîng e ku tişta pêwîst were kirin ji bo ku malbat merasîmên cenaze yên li gorî rêûresmên xwe li dar bixin, xizmên xwe ji nû ve bisipêrin axê.

### *Darizandina fail û berpirsiyaran*

Yek ji wan gavan ku avêtina wê herî zehmet lê herî pêwîst e jî ew e ku fail û berpirsiyarên ev sûc kirî werin dadgehkirin û cezakirin. Tevî ku bi awayekî gelekî bi kêmasî û bê tesîr e jî, li Tirkiyeyê pêvajoyên dadgehkirinê yên vê dawiyê hatine destpêkirin, rûdaneke erênî ye. Lê belê bi bahaneya ewlekari-

ya gunehbaran birina dadgehan ber bi bajarên ku zehmet e ku mexdûr xwe bigihînînê, zehmetiyên di anîna dadgehê ya gunehbaran de û hewaya ku li dadgehê jî derfetê dide gunehbaran ku çavên mexdûran bitirsînin, dike ku ev rûdana erênî negihîje tu encama hêja.

***Ji wezîfeyê girtina berpirsiyar û rayedaran, aşkerekirina wan***

Dawîanîna li wezîfeya rayedarên siyasî, îdarî û eskerî yên wê demê ku hîna wezîfeyê dikin, ji dest fail û berpirsiyaran destketiyên neheq ên ku hîna sûdê ji wan werdigirin û îtîbarê digire, ev jî dibe ku bike ku bi awayekî ne yekser hisa edaletê bi pêş keve. Berpirsiyarên asta jor ên siyasî, eskerî û îdarî yên ku wezîfeya xwe dewam nakin jî çawa ku dikarin di database ya Navenda Heqîqet Edalet Bîrê de werin aşkerekirin, ev yek dikare bibe yek ji temînatên di wê biwarê de ku tiştên qewimîn wê careke din neqewimin.[362]

***Sazkirina Komîsyona Heqîqetê ya fermî***

Tevî ku sazkirina komîsyoneke heqîqetê ya fermî ya ku wê li tevlîbûna mexdûrên demê û destwerdana rêxistinên civaka sivîl vekirîbe hîna ji bo Tirkiyeyê ne weke îhtîmaleke demeke nêzîk xuya dike jî mirov dikare Heyeta Mirovên Maqûl û Komîsyona Pêvajoya Çareseriyê ya di bin banê Meclîsa Milet a Mezin a Tirkiyeyê de damezrandî şîrove bike weke rûdanên dikarin zemîn amade bikin ji bo komîsyoneke heqîqetê ya siberojê were damezrandin. Nexasim dema em li ber çavan bigirin ku di nava yên ku agahî dan Komîsyona heyî de Dayikên Şemiyê, Dayikên Aştiyê, Ji bo Aştiyê Hewladana Jinê û Navenda Bîrê jî hene yên ku ji aliyê Partiya Aştî û Demokrasiyê ve vexwendî, hingê pêkhateyên bi vî rengî dikarin weke amûrên pêkanîna raya giştî werin bikaranîn.[363] Li aliyê din, xebatên ne-fermî yên heqîqetê yên weke Komîsyona Lêkolîna Rastiyan û Edaletê ya Girtîgeha Diyarbekirê mînakên girîng in ku karê komîsyoneke heqîqetê ya ku siberojê were damezrandin, hêsan dikin û binesaziya wê amade dikin.

***Dana tezmînata madî û misogerkirina xizmetên civakî***

Diyarkirina zerarên madî û watewî ya li mexdûran bûyî û ji bo van zeraran dana tezmînata madi, ji bo dabînkirina pêdiviyên wan ên civakî û psîkolojîk dana xizmetên tenduristî, perwerde, starê ji wan gavan in ku dikarin bêyî biryarên mezin ên siyasî werin avêtin. Li aliyê din divê mirov pêşiyê lê bigire

362 Binihêre li http://www.zorlakaybetmeler.org/politicians.php [8 Aralık 2014].

363 Binihêre li Barış İçin Kadın Girişimi Çözüm Süreci Raporu, 2013, 14, 15

ku tezmînat û xizmetên ku wê werin dayîn, ne weke "heqê xwînê" yan jî "sedeqe" werin dîtin. Ji bo vê jî miraceeta li destek û zanîna saziyên cihî hem ji ber sedemên pratîk û hem jî yên siyasî, rêyek e ku divê mirov deyne ber xwe.

### *Dayîna daxuyaniya fermî ya xwestinalêborînê*

Dayîna daxuyaniyeke fermî ya xwestinalêborînê ya ku êş û sebra mexdûran qebûl dike, ji bo ku tevlî şîna ew girêdidin bibe destûrê dixwaze û temînata ji nû ve rûnedana tiştên qewimî dihewîne, bi serê xwe jesteke bi nirx a siyasî ye, ji bilî vê gavek e ku dikare bike ku kulekiyên di pêvajoyên aştiyê yên siberojê de bêyî zerarên mezin li paş werin hiştin. Daxwazênlêborînê yên fermî yên dewletên mîna Şîlî, Elmanya, Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê, Ingilîstan, Bulxaristan, Awusturya, Sirbistanê tevî gelek kêmasî û qisûrên xwe heke li nav raya giştî werin minaqeşekirin, dibe ku pêşiyê bigire li ber endîşe û tirsên qedîm ên Tirkiyeyê.

### *Destekdana fermî ji bo xebatên hafizeçêkirinê*

Di serî de Diyarbekir û Stenbol, li gelek bajaran xebatên hafizeçêkirinê tên meşandin ku rêzê digirin ji bibîranîna qurbaniyan re û derfetê diafirînin ku mekanên li wan gunehên li dijî mirovahiyê pêk hatî veguherin meydanên hafizeya kolektîf û muzexaneyan û ev mekan bibin abîde.[364] Lê belê ev xebat, ji ber sedemên mîna vekirina dozan bi bahaneya pesindayîna sûc û sûcdar li şaredarî û saziyên xwediyê înîsiyatîfê, nedana hin materyal û belgeyên xwedî nirxê sembolîk li xwediyên înîsiyatîfê, destwerdanên fizîkî û siyasî yên rayedarên îdarî yên cihî û navendî, vediguherin pêvajoyên ku mexdûran careke din mexdûr dikin.

Ji bo ku ev xebatên navbirî hemû xwedî xisleteke wisa bin ku "mekanîka siyasî ya xwe disipêre raseriya Tirkîtiyê dişikînin û tesîreke qismî ya şûştina ji mêhtingerbûnê" biafirînin, ango têr baş werin meşandin, îradeyeke xurt a siyasî û aqlekî nû yê dewletê hewce ne.[365] Pêkanîna niyet û aqlê selîm ê civakî ku wê îradeya siyasî xurt bikin jî karê aktorên sivîl e ku niyeta wan e çanda siyasî li xêra demokrasiyê veguherînin. Çawa ku Goral dibêje,

> *Li tu devera dinyayê pêvajoyên aştî û muzakereyan ên ku dikarin weke mînak werin girtin, li ser xeteke rast bi pêş ve diçin, encamên îdeal derdixin holê nînin û wê nebin. Li her devera dinyayê dewlet hene ku neçar wate di*

---

364 Binihêrin li http://www.memorializeturkey.com/tr/ [8'ê kanûna 2014'an].

365 Goral, 2014, 5.

> *encama hewldanên gelekî mezin ên wan mirovan de ku ji bo aştiya siyasî, ji bo ferehkirina meydanên piçûk ên bi pêvajoyen demî yan jî muzakereyê re vebûyî, ji bo pirsîna hesab ji failan, di pratîkê de pêkanîna daxwazên maf ên şênber têdikoşin, hinan ji van daxwazan bînin cih.*[366]

Zorkirina li Dewleta Tirkiyeyê û raya giştî ji bo aştiyeke siyasî, karekî ewqasî giran e ku nabe bi tenê ji mexdûran re bê hiştin. Bi ser de jî ji temeniyekê wêdetirbûna daxwaza bi hev re jiyanê, ferz dike ku mirov xwe bidin ber barê berpirsiyariyê. Gava pêşî ya xwe dana ber berpirsiyariyê ya herî hêsan û insanî jî guhdana li mexdûran e. Armanca vê xebatê jî ew e ku bibe çavkaniyek ji bo wan kesan ku mimkun e rojekê vê gavê biavêjin.

366 Goral, 2014, 8.

## *PÊVEK:*
## Lîsteya Komîsyonên Heqîqetê[367]

(1981) Qibris: Komîsyona Wendakiriyan[368]

(1982) Bolîvya: Komîsyona Neteweyî ya Lêkolîna Wendakirinyan[369]

(1983) Arjantîn: Komîsyona Netewweyî ya Wendakiriyan[370]

(1985; 2000) Uruguay: Komîsyona Lêkolîna Rewşa Wendakiriyan û Sedemên wan; Komîsyona Aştiyê[371]

(1985) Zîmbabwe: Komîsyona Lêkolînê[372]

(1986) Uganda: Komîsyona Lêkolîna Binpêkirina Mafên Mirovan[373]

(1986) Filîpîn: Komîsyona Serokatiyê ya Mafên Mirovan[374]

(1990) Nepal: Komîsyona Lêkolînê ji bo Dîtina Kesên di serdema Panchayat de Wendakirî[375]

(1990; 2003) Şîlî: Komîsyona Neteweyî ya Heqîqet û Lihevhatin (Rapora Ret-

367 Me ev lîste ji pirtûka Rêxistina Efûya Navneteweyî (http://www.amnesty.org/en/international-justice/issues/truth-commissions), ya Înstîtûya Aştiyê ya Dewletên Yekbûyî (http://www.usip.org/category/publications/truth-commission) û Hayner (2011) berhev kir.

368 http://www.cmp-cyprus.org/ Komîte di bin banê Neteweyên Yekbûyî de bi lihevkirina civakên Qibrisê yên Tirk û rûm hat damezrandin.

369 http://www.justiceinperspective.org.za/south-a-central-america/bolivia/national-commission-of-inquiry-into-disappearances.html

370 http://www.desaparecidos.org/nuncamas/web/english/library/nevagain/nevagain_000.htm. Ew tê zanîn bi wê yekê ku bi lêkolîna aqûbeta wendakiriyan dest bi xebatê kir, heta bi teşxîskirina failan û derxistina holê ya navendên binçavkirinê yên veşartî çû, bi raporeke bi navê Nunca Más bi dawî bû û "heqîqeteke gelemperî" ya nû afirand ku mandelkirina sûcên serdema dîktatoriyê ne mumkin dikir. Binihêre li Crenzel, 2008; Sancar, 2010, 217-226.

371 http://www.trial-ch.org/en/resources/truth-commissions/america/uruguay.html

372 Rapora vê komîsyonê nehatiye weşandin. Ji bo hûrguliyên pêvajoya li Zîmbabwe binihêre li Du Plessis, 2002.

373 http://www.trial-ch.org/en/resources/truth-commissions/africa/uganda.html

374 http://www.asiapacificforum.net/about/annual-meetings/12th-australia-2007/downloads/reports-from-apf-members/Philippines.pdf

375 Komîsyonê sala 1994'an raporeke ji du bergan a ku li 100 bûyerî dikola weşand, lê belê ji ber îstîfakirina du endamên komîsyonê, bêyî ku xebatên xwe bi dawî bike ji hev belav dibe. (Binihêre li: http://www.ncf.org.np/upload/files/782_en_World%20experiances%20of%20TRC-Commissions.pdf). Ji bo Edaleta Dema Derbasbûnê binihêre li Robins, 2011.

tig); Komîsyona Neteweyî ya Girtîbûn û Êşkenceyê (Rapora Valech)[376]

(1990) Ruanda: Komîsyona Navneteweyî ya Lêkolîna Binpêkirina Mafên Mirovan[377]

(1991) Çad: Komîsyona Lêkolînê ya Sûc û Sûîstîmalên bi destê Kevneserokdewlet Habré, Hevkarên wî yên Sûc û/yan jî Yekîneyên wî yên Zêdekirî[378]

(1992) Elmanya: Komîsyona Xebatê ya li ser Nirxandina Dîroka Dîktatoriya SED'ê [Partiya Yekîtiya Sosyalîst] û Encamên wê[379]

(1992) El Salvador: Komîsyona Heqîqetê[380]

(1993) Etiyopya: Komîsyona Lêkolînê[381]

(1994) Srî Lanka: Komîsyona Serokatiyê ya Lêkolînê ya li ser Jicihûwarêxwekirin yan jî Wendakirina Mirovan bi Darê Zorê[382]

(1995) Haîtî: Komîsyona Neteweyî ya Heqîqet û Edaletê[383]

(1992; 1993; 1995) Efrîkaya Başûr: Komîsyona Lêkolînê ya Kevnegirtiyên Kongreya Neteweyî ya Efrîkayê û ya Giliyên Girtiyên wan (Komîsyona Skweyiya); Komîsyona Lêkolîna hin Gunehbarkirinên li ser Miameleya Xirab a Endamên Kongreya Neteweyî ya Efrîkayê li dijî Dîl û Girtiyên Kongreya Neteweyî ya Efrîkayê û Sûîstîmalkirinên Mafên Mirovan (Komîsyona Motsuenyane); Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê[384]

(1995) Burundi: Komîsyona Navneteweyî ya Lêkolînê[385]

---

376 http://www.hpcrresearch.org/mrf-database/mission.php?id=57; Sancar, 2010, 226-241.

377 http://www.hrw.org/sites/default/files/reports/intlhrviolations393.pdf

378 binihêre li Hayner, 1994, 623-625.

379 Binihêre li Stan, 2009, 4-5.

380 http://www.hrw.org/reports/pdfs/e/elsalvdr/elsalv938.pdf

381 Binihêre li Hayner, 1994, 634-635.

382 http://www.usip.org/publications/commissions-of-inquiry-sri-lanka

383 http://www.usip.org/publications/truth-commission-haiti

384 Li gorî Freeman, dîroka komîsyonên heqîqetê li du serdeman dabeş dibe: beriya û piştî Efrîkaya Başûr. Ezmûna Efrîkaya Başûr têkiliyek yekser ya serhatiyên şahid, mexdûr û failan danî bi lihevhatinê re, bi vê jî helwêsta selihandinê ya komîsyonên heqîqetê guherandiye (2006, 26). Li aliyê din, Lundy û McGovern radigihînin ku hin "heqîqetên" malbatên qurbaniyan û mexdûran li Komîsyonê gotî, ji ber ruhê "lihevhatinê" yê îlhama xwe ji Xirîstiyaniyê digire û "xeyala avakirina netewe" êdî tê nemumkin kirin (2008, 271). Ji bo xebatên komîsyonê û rapora wê ya encamê binihêrin li http://www.justice.gov.za/Trc/ Ji bo xisleta rîtuelî, bi giştî prensîpên wê û tesîrên wê binihêre li Boraine 2005.

385 http://www.usip.org/publications/commission-of-inquiry-burundi

(1996; 2007) Ekvator: Komîsyona Heqîqet û Edaletê; Komîsyona Heqîqetê[386]

(1997) Guatemala: Komîsyona Rohnîkirina Dîrokî li ser Binpêkirina Mafên Mirovan û Çalakiyên Şîdetê yên Zerar Kirî li Gelê Guatemalayê[387]

(1998) Estonya: Komîsyona Navneteweyî ya Lêkolîna Gunehên li dijî Mirovahiyê[388]

(1998) Latviya: Komîsyona Dîrokzanan[389]

(1998) Lîtvanya: Komîsyona Navneteweyî ya Nirxandina Sûcên Rejîmên Dagirkeriyê yên Nazî û Sovyetan li Lîtvanyayê[390]

(1998) Lehistan: Înstîtuya Neteweyî ya Bibîranînê – Komîsyona Lêpirsîna Sûcên li dijî Neteweya Lehistanê[391]

(1999) Nîjerya: Komîsyona Lêkolîna Binpêkirina Mafên Mirovan[392]

(2000) Koreya Başûr: Komîsyona Serokatiyê ya Heqîqetê li ser Mirinên Gumanbar[393]

(2001) Kevne-Yugoslavya / (2002) Sirbistan û Karabaxa Çiyayî: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê[394]

(2001) Granada: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê[395]

(2001) Panama: Komîsyona Heqîqetê[396]

(2001) Perû:Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê[397]

(2002) Tîmora Rojhilat: Komîsyona Bixêrhatin, Heqîqet û Lihevhatinê[398]

386 http://www.usip.org/publications/truth-commission-ecuador-96; http://www.usip.org/publications/truth-commission-ecuador-07.

387 http://www.usip.org/publications/truth-commission-guatemala; ji bo helwêsteke femînîst a beramber edaleta dema derbasbûnê ya li Guatemalayê binihêre li Patterson-Markowitz, Oglesby ve Marston, 2012.

388 http://www.historycommission.ee/

389 http://lpra.vip.lv/komisija.htm

390 http://www.komisija.lt/en/

391 http://ipn.gov.pl/en

392 http://www.nigerianmuse.com/nigeriawatch/oputa/

393 http://www.pucl.org/reports/International/southkorea.htm

394 http://www.usip.org/publications/truth-commission-serbia-and-montenegro; Ilic, 2004.

395 http://www.thegrenadarevolutiononline.com/trccontents.html

396 http://www.usip.org/publications/truth-commission-panama

397 http://www.cverdad.org.pe/ingles/pagina01.php

398 http://www.cavr-timorleste.org. Peyva di navê Komîsyonê de ya ku me weke

(2002) Gana: Komîsyona Neteweyî ya Lihevhatinê[399]

(2002) Sierra Leone: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [400]

(2003) Cezaîr: Komîsyona Lêkolînê ya Demî li ser Wendakiriyan[401]

(2004) Komara Demokratîk a Kongo: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê[402]

(2004) Îndonezya: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [403]

(2004) Fas: Komîsyona Wekhevî û Lihevhatinê [404]

(2004) Greensboro, North Carolina, Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [405]

(2004) Paraguay: Komîsyona Heqîqet û Edaletê[406]

---

"bixêrhatin" wergerand ji Portekîzî ber bi Ingilîzî ve weke "reception" (pêşwazîkirin) hatiye wergerandin. Ev mîsyona "bixêrhatinê" ya Komîsyonê weke misogerkirina vegera qederê 85 hezar penaberên li Tîmora Rojava (Îndonezya) di dema bûyêrên Şîdetê yên sala 1999'an bi darê zorê hatin dersînorkirin yan jî ji cihûwarên xwe hatî kirin, tê terîfkirin. Çawa ku ji rapora dawî ya bi navê "Êdî bes e!" ("Chega!") ya Komîsyonê jî mirov dikare têbigihe, vê misyonê nekarî pêk were anîn, Komîsyon hatiye rexnekirin nexasim jî ji ber helwêsta xwe ya teng û rûxarî ya hiqûqî û siyasî ya beramber jinên li wargehên li Tîmora Rojava yên rastî destavêtinê hatî û failên sûcê destavêtinê kirî (binihêre li Harris Rimmer, 2010).

399 http://www.ictj.org/sites/default/files/ICTJ-Ghana-Reconciliation-Commission-2006-English_0.pdf

400 http://www.sierra-leone.org/TRCDocuments.html. Park (2010, 106) dibêje, ew têgihiştina Komîsyonê ya ku jinan, jinên ciwan, zarokan, yên seqetbûyî û şervanan weke mixatebên esas dibîne, hizirîna wê li ser edaletê û hiştina wê ya lihevhatinê ji xelkê re girîng dibîne, lê belê tevî vê jî bi Dadgeha Taybet a Sierra Leone re xebatên Komîsyonê bivênevê valahî hiştin û hewldanên edaleta selihandinê yên li ser hîmê civakê dikarin van valahiyan dagirin. Millar (2010) dibêje, beşa elît a perwerdebûyî ya ku têgihiştina heqîqet, edalet û lihevhatinê ya navend-ewrûpî kiriye malê xwe, xebatên komîsyonê erênîtir nirxandine, lê belê hêviyên xelkê cihî û mexdûran ji Komîsyonê têra xwe bi cih nehatine anîn. Ew rexneyan li wê yekê digire ku Komîsyona Heqîqetê vegotina heqîqetan tecrîd dike ji pêdiviyên mexdûran, mafên wan û sembol û rîtuelên çanda cihî, û pê dadikeve bi tenê weke dermankirina psîkolojîk.

401 http://www.usip.org/publications/commission-of-inquiry-algeria; http://www.amnesty.org/en/international-justice/issues/truth-commissions

402 http://www.usip.org/publications/truth-commission-democratic-republic-of-congo

403 http://hrli.alrc.net/mainfile.php/indonleg/131/

404 http://ier.ma; http://www.ictj.org/publications?keys=morocco&tid%5B%5D=81&language%5B%5D=en

405 http://www.greensborotrc.org. Xelkê Greensboro ev komîsyon damezrand ji bo lêkolîna komkujiya dema meşa Ku Klux Klan û Partiya Nazî ya emerîkî ya 3'yê Çiriya Paşîn a 1979'an pêk hatî. Bickford li vê xebatê weke projeya heqîqetê ya ne-fermî dikole (2007, 1016-1018)

406 http://www.usip.org/publications/truth-commission-paraguay; http://www.codehupy.org/

(2005) Îndonezya û Tîmora Rojhilat: Komîsyona Heqîqet û Dostaniyê[407]

(2006) Lîberya: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [408]

(2006) Romanya: Komîsyona Xebatê ya Dîktatoriya Komunîst[409]

(2009) Kanada: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [410]

(2009) Kenya: Komîsyona Heqîqet, Edalet û Lihevhatinê [411]

(2009) Maurîtîus: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [412]

(2009) Giravên Solomon: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [413]

(2009) Togo: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [414]

(2010) Honduras: Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê [415]

(2011) Peravên Diranê Fîlê: Komîsyona Diyalog, Heqîqet û Lihevhatinê [416]

---

407 http://wcsc.berkeley.edu/east-timor/east-timor-truth-commission/

408 http://trcofliberia.org/about/trc-mandate. Îfadeyên mexdûrên li welatên Efrîkaya Rojava (Gana, Gîne, Nîjerya, Sierra Leone), li Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê û Meliktiya Yekbûyî hatin berhevkirin, li Dewletên Yekbûyî rûniştinên vekirî hatin kirin, pê re mirovên li Dîasporayê jî li pêvajoyê hatin zêdekirin; ev weke xisleteke girîng tê bilêvkirin a ku a ku wê ji yên dişibihinê cihê dike (binihêre li Harris Rimmer, 2010, 164). Harris Rimmer rexne dike ku komîsyonên heqîqetê bi tenê mexdûrên li nava welatên elaqedar mixateb dibîne, kesên ku bi ddarê zorê ji cih û warên xwe hatine kirin û penaberan li derveyî pêvajoya aştiyê ya li welatê wan dihêle.

409 Binihêre li Stan, 2009, 7-8.

410 ji bo miameleya xirab a bi gelên cihî re hatiye damezrandin. http://www.trc.ca/websites/trcinstitution/index.php?p=3

411 http://www.tjrckenya.org/

412 http://www.usip.org/publications/truth-commission-mauritius

413 http://ictj.org/publication/confronting-past-better-solomon-islands#.UoMU9vmrEiN

414 http://cvjr-togo.org/fr/index.html

415 http://www.usip.org/publications/truth-commission-honduras-2010

416 https://www.ictj.org/our-work/regions-and-countries/cote-divoire

# ÇAVKANÎ


Agamben, Giorgio. 1999. Remnants of Auschwitz The Witness and the Archive. Zone Books.

Agamben, Giorgio. 2001. Kutsal İnsan Egemen İktidar ve Çıplak Hayat. Wergêr: İsmail Türkmen Ayrıntı.

Agamben, Giorgio. 2005. State of Exception. The University of Chicago Press.

Aiken, Nevin T. 2010. Learning to Live Together: Transitional Justice and Intergroup Reconciliation in Northern Ireland. The International Journal of Transitional Justice 4: 166-188.

Akkaya, Ahmet Hamdi. 2014. Ulusal Kurtuluş, Ayaklanma ve Sınırların Ötesi: 1970'lerden 1990'lara Kürt Hareketi'nin Değişim Dinamikleri. Toplum ve Kuram 9: 75-98.

Akın, Rojin Canan û Funda Danışman. 2011. 90'larda Güneydoğu'da Çocuk Olmak - Bildiğin Gibi Değil. Metis Yayınevi.

Alpkaya, Gökçen. 1995. 'Kayıp'lar Sorunu ve Türkiye. http://www.politics.ankara.edu.tr/dergi/pdf/50/3/8_gokcen_alpkaya.pdf [21 Şubat 2013].

Améry, Jean. 1980. At the Mind's Limits. Indiana University Press.

Arendt, Hannah. 1968. Men in Dark Times. Harvest Books.

Arendt, Hannah. 1994. Essays in Understanding: 1930-1954. Schocken Books.

Arendt, Hannah. 2003. Responsibility and Judgement. Schocken Books.

Arendt, Hannah. 2006. İnsanlık Durumu. İletişim Yayınları.

Arendt, Hannah. 2012. Kötülüğün Sıradanlığı Adolf Eichmann Kudüs'te. Wergêr: Özge Çelik. Metis.

Arenhövel, Mark. 2008. Democratization and Transitional Justice. Democratization 15(3): 570-587.

Aristotle. 2004. Nicomachean Ethics. Trans. and Ed. Roger Crisp. Cambridge University Press.

Aristotle. 1999. Politics. Trans. Benjamin Jowett. Batoche Books.

Arriaza, Laura and Naomi Roht-Arriaza. 2008. Social Reconstruction as a Local Process. The International Journal of Transitional Justice 2(2): 152-172.

Arslan, Serhat. 2014. Kürdistan'da Doğa / Ekoloji Katliamı. Toplum ve Kuram 9: 61-74.

Assmann, Aleida. 2003. Two Forms of Resentment: Jean Améry, Martin Walser and German Memorial Culture. New German Critique 90: 123-133.

Assmann, Jan. 2001. Kültürel Bellek, Eski Yüksek Kültürlerde Yazı, Hatırlama ve Politik Kimlik. Wergêr: Ayşe Tekin. Ayrıntı Yayınları.

Atay, Oğuz. 2004. Tehlikeli Oyunlar. İletişim Yayınları.

Atılgan, Mehmet û Serap Işık. 2011. Cezasızlık Zırhını Aşmak: Türkiye'de Güvenlik Güçleri ve Hak İhlalleri. TESEV Yayınları.

Avelar, Idelbar. 2004. The Letter of Violence Essays on Narrative, Ethics, and Politics. Palgrave Macmillan.

Avşar, Gülay. 2013. Ergenekon'un Öteki Yüzü: Faili Meçhuller ve Kayıplar Ergenekon Dosyaları İncelemesi. TESEV Yayınları.

Aydemir, Kadir, berhevker. 2012. 90lar Kitabı - Çocuk mu Genç mi? Yitik Ülke Yayınları.

Aydın, Devrim. 2006. Uluslararası ceza mahkemesi temel belgeler derlemesi: UCM Roma statüsü, Suç unsurları, usul ve delil kuralları, ayrıcalıklar ve bağışıklıklar. Kapasite Geliştirme Derneği Yayınları.

Balta Paker, Evren. 2010. Dış Tehditten İç Tehdide: Türkiye'de Doksanlarda Ulusal Güvenliğin Yeniden İnşası. Di nava Türkiye'de Devlet, Ordu ve Güvenlik Siyaseti de. Berhevker: Evren Balta Paker û İsmet Akça. İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.

Balta Paker, Evren û İsmet Akça. 2013. Askerler, Köylüler ve Paramiliter Güçler: Türkiye'de Köy Koruculuğu Sistemi. Toplum ve Bilim 126: 7-35.

Badiou, Alain. 2004. Infinite Thought Truth and the Return to Philosophy. Continuum.

Baines, Erin K. 2007. The Haunting of Alice: Local Approaches to Justice and Reconciliation in Northern Uganda. The International Journal of Transitional Justice 1: 91-114.

Barış İçin Kadın Girişimi Çözüm Süreci Raporu, 2013.

Barkey, Henri J. 1998. The People's Democracy Party (HADEP), The Travails of A Legal Kurdish Party in Turkey. Journal of Muslim Minority Affairs 18(1): 129-39.

Bayrak, Mehmet. 1993. Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri: Gizli Belgeler-Araştırmalar-Notlar. Özge Yayınevi.

Bayrak, Mehmet. 1994. Açık-Gizli/Resmi-Gayriresmi Kürdoloji Belgeleri. Özge Yayınları.

Baysal, Nurcan. 2014. O Gün. İletişim.

Bell, Christine, Colm Campbell and Fionnuala Ni Aolain. 2004. Justice Discourses in Transition. Social Legal Studies 13(3): 305-328.

Benjamin, Walter. 1968. Illuminations.Schocken Books.

Benjamin. Walter. 1978. Reflections: Essays, Aphorisms, Autobiographical Writings. Schocken Books.

Beşikçi. İsmail. 1991. Devletlerarası Sömürge, Kürdistan. Yurt Kitap Yayın.

Betts, Alexander. 2005. Should Approaches to Post-conflict Justice and Reconciliation be Determined Globally, Nationally or Locally? The European Journal of Development Research 17(4): 735-752.

Bhabha, Homi K. 2001. The Location of Culture. Routledge.

Bickford, Louis. 2007. Unofficial Truth Projects. Human Rights Quarterly 29(4): 994-1035.

Bora, Tanıl. 2013. "Tüm İnsanlar Önünde Özür Dilerim". Di nava Bir Daha Asla! Geçmişle Yüzleşme ve Özür de. İletişim Yayınları.

Boraine, Alex. 2001. A Country Unmasked: South Africa's Truth and Reconciliation Commission. Oxford University Press.

Bozarslan, Hamit. 2002. Kürd Milliyetçiliği ve Kürd Hareketi (1898-2000). Di nava Milliyetçilik Modern Türkiye'de Siyasi Düşünce Cilt 4 de. Berhevker: Tanıl Bora û Murat Gültekingil. İletişim Yayınları.

Bozarslan, Hamit. 2014. Sunuş. Türkiye'de Siyasal Şiddetin Boyutları içinde, İletişim Yayınları.

Bozkurt, Hatice û Özlem Kaya. 2014. 'Fotoğrafı Kaldırmak' Eşi Zorla Kaybedilen Kadınların Deneyimleri. Hakikat, Adalet ve Hafıza Çalışmaları Derneği Yayınları.

Braithwaite, John. 1999. Restorative Justice: Assessing Optimistic and Pessimistic Accounts. Crime & Justice 25(1): 1-127.

Brudholm, Thomas. 2006. Revisiting Resentments: Jean Améry and the Dark Side of Forgiveness and Reconciliation. Journal of Human Rights 5: 7-26.

Brudholm, Thomas. 2008. Resentment's Virtue Jean Améry and the Refusal to Forgive. Temple University Press.

Brudholm, Thomas and Valérie Rosoux. 2009. The Unforgiving: Reflections on the Resistance to Forgiveness after Atrocity. Law and Contemporary Problems 72(2): 33-49.

Can, Başak. 2014. Barış Anneleri. Toplum ve Kuram 9: 35-42.

Can, Başak. 2014. Yeni Bir Tanıklık Rejimi Kurulurken. http://zanenstitu.org/yeni-bir-taniklik-rejimi-kurulurken-basak-can [10'ê Sibata 2014'an].

Carse, Alisa L. and Lynne Tirrell. 2010. Forgiving Grave Wrongs. Di nava Forgiveness in Perspective de. Ed. Christopher Allers and Marieke Smit. Rodopi Press.

Christie, Nils. 1977. Conflicts as Property. The British Journal of Criminology 17(1): 1-15.

Clark, Janine Natalya. 2008. The three Rs: retributive justice, restorative justice, and reconciliation. Contemporary Justice Review 11(4): 331-350.

Corey, Allison and Sandra F. Joireman. 2004. Retributive Justice: The Gacaca Courts In Rwanda. African Affairs 103: 73-89.

Crawford, Adam. 2002. The state, community and restorative justice: heresy, nostalgia and butterfly collecting. Di nav Restorative Justice and the Law de. Ed. Lode Walgrave. Willan Publishing.

Crenzel, Emilio. 2008. Argentina's National Commission on the Disappearance of Persons: Contributions to Transitional Justice. The International Journal of Transitional Justice 2: 173-191.

Çağlayan, Handan. 2013. Analar, Yoldaşlar, Tanrıçalar Kürt Hareketinde Kadınlar ve Kadın Kimliğinin Oluşumu. İletişim Yayınları.

Çalı, Başak. 2010. The Logics of Supranational Human Rights Litigation, Official Acknowledgment, and Human Rights Reform: The Southeast Turkey Cases before the European Court of Human Rights, 1996–2006. Law & Social Inquiry 35(2): 311-337.

Çelik, Adnan. 2014. 1990'lı Yılların Olağanüstü Hal Rejimi ve Savaş: Kürdistan Yerellerinde Şiddet ve Direniş. Toplum ve Kuram 9: 99-145.

Çiçek, Cuma. 2011. Toplu Gömülen Kimliksiz Çocuklar - Kardeşlik Söyleminin Hafifliği ve Toplu-Mezarlar Gerçeği. Birikim 264-265, 90-96.

Çiçek, Cuma. 2014. Çözüm Süreci ve '90'lara Dönüş. http://www.birikimdergisi.com/haftalik/cozum-sureci-ve-90lara-donus [8 Aralık 2014].

Darıcı, Haydar. 2011: Politics of privacy: forced migration and the spatial struggle of the Kurdish youth. Journal of Balkan and Near Eastern Studies 13(4): 457-474.

Das, Veena. 2003. Trauma and testimony Implications for political community. Anthropological Theory 3(3): 293-307.

Delmas-Marty, Mireille, Isabella Fouchard, Emanuela Fronza û Laurent Neyret. 2012. İnsanlığa Karşı Suç.Wergêr: Berna Ekal. İletişim Yayınları.

Derrida, Jacques. 1992. Force of Law: The "Mystical Foundation of Authority". Di nava Deconstruction and the Possibility of Justice de. Ed. David Cornell, M. Rosenfeld, and D. G. Carlson. Routledge.

Derrida, Jacques. 1993. Aporias: Dying--awaiting (one Another At) the "limits of Truth". Stanford University Press.

Derrida, Jacques. 1995a. Archive Fever A Freudian Impression. Diacritics 25(2): 9-63.

Derrida, Jacques. 1995b. Points... Interviews, 1974-1994. Ed. Elisabeth Weber. Stanford University Press.

Derrida, Jacques. 1999. Justice, Law and Philosophy An Interview with Jacques Derrida. South African Journal of Philosophy 18(3): 279-287.

Derrida, Jacques. 2000. Of Hospitality. Stanford University Press.

Derrida, Jacques. 2001. To forgive The Unforgivable and the Imprescriptible. Di nava Questioning God de. Ed. John D. Caputo, Mark Dooley and Michael J. Scanlon. Indiana University Press.

Derrida, Jacques. 2005a. Cosmopolitanism and Forgiveness. Routledge.

Derrida, Jacques. 2005b. The Politics of Friendship. Verso.

Derrida, Jacques. 2007. Marx'ın Hayaletleri Borç Durumu, Yas Çalışması ve Yeni Enternasyonel. Ayrıntı Yayınları.

Digeser, Paul E. 2001. Political Forgiveness. Cornell University Press.

Diner, Dan. 2011. Karşıt Hafızalar Soykırımın Önemi ve Etkisi Üzerine. İletişim Yayınları.

Dooley, Mark and Liam Kavanagh. 2007. The Philosophy of Derrida. Acumen.

Doorn, Neelke. 2011. Forgiveness, Reconciliation, and Empowerment in Transitional Justice. International Journal of Humanities and Social Science 1(4): 13-22.

Du Plessis, Max. 2002. Truth and Reconciliation Processes: Lessons for Zimbabwe? The South African Institute Of International Affairs Report No. 44.

Dube, Siphiwe Ignatius. 2011. Transitional Justice Beyond the Normative: Towards a Literary Theory of Political Transitions. The International Journal of Transitional Justice 5(2): 1-21.

Eksen, Kerem. 2010. Tragic Error and the Augustinian Morals. Teza Doktorayê ya Nehatî Weşandin, Zanîngeha Boğaziçi.

Epözdemir, Şakir. 2005. Türkiye Kürdistan Demokrat Partisi 1968/235 Antalya Davası Savunması. Weşanên Perî.

Ergut, Ferdan. 2014. Devlet ve Politik Şiddet: Latin Amerika ve Türkiye'de Gerilla Hareketleri. Türkiye'de Siyasal Şiddetin Boyutları. Berhevker: Güney Çeğin û İbrahim Şirin. İletişim Yayınları.

Eriksson, Anna. 2009. A Bottom-Up Approach to Transformative Justice in Northern Ireland. The International Journal of Transitional Justice 3: 301-320.

Escudero, Rafel. 2014. Road to Impunity: The Absence of Transitional Justice Programs in Spain. Human Rights Quarterly, 36(1): 123-146.

Fanon, Frantz. 2007. Yeryüzünün Lanetlileri.Wergêr: Şen Süer. Versus.

Foucault, Michael. 2003. Society Must Be Defended – Lectures at the College de France, 1975-76. Picador.

Freeman, Mark. 2006. Truth Commissions and Procedural Fairness. Cambridge University Press.

Fujii, Lee Ann. 2010. Shades of truth and lies: Interpreting testimonies of war and violence. Journal of Peace Research 47: 231-241.

Gedik, Esra. 2009. Türkiye'de Şehit Annelerinin Savaş ve Çözüm Algıları. Fe Dergi 1(2): 29-43.

Gillis, John R. 1995. Memory and Identity: The History of a Relationship. Di nava Commemorations de. Ed. John R. Gillis. Princeton University Press.

Girard, René. 2003. Şiddet ve Kutsal. Kanat Kitap.

Gobodo-Madikizela, Pumla. 2010. Remorse, Forgiveness and Rehumanization: Stories from South Africa's Truth and Reconciliation Commission. Di nava Historical Memory in Africa: dealing with the past, reaching for the future in an intercultural context de. Ed. Mamadou Diawara, Bernard Lategen, and Jörn Rüsen. Berghahn Books.

Goddard, Victoria Ana. 2007. Demonstrating resistance: Politics and participation in the marches of the Mothers of Plaza de Mayo. Focaal-European Journal of Anthropology 50: 81-101.

Goldstone, Richard J. 1996. Justice as a Tool for Peacemaking: Truth Commissions and International Criminal Tribunals. New York University Journal of International Law and Politics 28: 485-503.

Golob, Stephanie R. 2008. Volver: The Return of/to Transitional Justice Politics in Spain. Journal of Spanish Cultural Studies 9(2): 127-141.

González Eduardo and Howard Varney, eds. 2013. Truth Seeking: Elements of Creating an Effective Truth Commission. International Center for Transitional Justice.

Goral, Özgür Sevgi. 2013. Geçiş Dönemi Adaletinde Hatırlamanın Önemi. Di nava Kürt Meselesinin Çözümüne İlişkin Algılar, Aktörler ve Süreç de. Heinrich Böll Stiftung Derneği

Türkiye Temsilciliği û Enstîtuya Diyarbekirê ya Lêkolînên Siyasî û Civakî.

Goral, Özgür Sevgi, Ayhan Işık û Özlem Kaya. 2013. Konuşulmayan Gerçek: Zorla Kaybetmeler. Hakikat, Adalet ve Hafıza Çalışmaları Derneği Yayınları.

Goral, Özgür Sevgi. 2014. Geçmişle hesaplaşma ve sömürgecilik: Kürt meselesine sömürgesizleştirme ekseninden bakmak. Ayrıntı Dergi 4.

Gülener, Serdar. 2012. Çatışmacı Bir Geçmişten Uzlaşmacı Bir Geleceğe Geçişte Adalet Arayışı: Geçiş Dönemi Adaleti ve Mekanizmalarına Genel Bir Bakış. Uluslararası Hukuk ve Politika 8(32): 43-76.

Günal, Asena û Özengi, Önder, yayına hazırlayanlar. 2013. Bir Daha Asla! Geçmişle Yüzleşme ve Özür. İletişim Yayınları.

Gündoğan, Azat Zana. 2011. Space, state-making and contentious Kurdish politics in the East of Turkey: the case of Eastern Meetings, 1967. Journal of Balkan and Near Eastern Studies 13(4): 389-416.

Gündoğan, Cemil. 2007. Kawa Davası Savunması ve Kürtlerde Siyasi Savunma Geleneği. Vate Yayınları.

Gündoğan, Cemil. 2009. Resmi İdeoloji ve Kürtler. Di nava Resmi Tarih Tartışmaları 8 Türkiye'de Azınlıklar de. Berhevker: Fikret Başkaya û Sait Çetinoğlu. Özgür Üniversite Yayınları.

Hakikat Komisyonları. 2014. Hakikat Adalet Hafıza Merkezi.

Harris Rimmer, Susan. 2010. Reconceiving Refugees and Internally Displaced Persons (IDPS) as Transitional Justice Actors. Contemporary Readings in Law and Social Justice 2(2): 163-180.

Hayner, Priscilla B. 1994. Fifteen Truth Commissions 1974 to 1994: A Comparative Study. Human Rights Quarterly 16: 597-655.

Hayner, Priscilla B. 2011. Unspeakable truths: Transitional Justice and the Challenge of Truth Commissions. Routledge.

Hechter, Michael. 1975. Internal Colonialism: The Celtic Fringe in British National Development, 1536-1966. Routledge & Kegan Paul.

Hirsch, Alexander Keller. 2011. Fugitive reconciliation: The agonistics of respect, resentment and responsibility in post-conflict society. Contemporary Political Theory 10(2): 166-189.

Hope, Simon. 2013. Friendship, Justice, and Aristotle: Some Reasons to Be Sceptical. Res Publica 19: 37-52.

Horowitz, Donald L. 2001. The Deadly Ethnic Riot. University of California Press.

Ignatieff, Michael. 1996. Articles of Faith. Index on Censorship 25: 110-122.

Ilic, Dejan. 2004. The Yugoslav truth and reconciliation commission Overcoming cognitive blocks. http://www.eurozine.com/pdf/2004-04-23-ilic-en.pdf [9 Nisan 2014].

Inazu, John D. 2009 No Future Without (Personal) Forgiveness: Reexamining the Role of Forgiveness in Transitional Justice. Human Rights Review 10(3): 309-326.

Işık, Ayhan. 2014. 1990'larda Devletin "Sivil Siyaseti" Olarak Zorla Kaybetmeler. Toplum ve

Kuram 9: 43-52.

Jankélévitch, Vladimir. 1996. Should We Pardon Them? Critical Inquiry 22(3): 552-572.

Jaquemet, Iolanda. 2009. Fighting Amnesia: Ways to Uncover the Truth about Lebanon's Missing. The International Journal of Transitional Justice 3: 69-90.

Jeffery, Renée. 2011. Forgiveness, amnesty and justice: The case of the Lord's Resistance Army in northern Uganda. Cooperation and Conflict 46(1): 78-95.

Jongerden, Joost. 2007. The Settlement Issue in Turkey and the Kurds: An Analysis of Spatial Policies, Modernity and War. Brill Academic Publishers.

Jongerden, Joost û Ahmet Hamdi Akkaya. 2013. PKK Üzerine Yazılar. Vate Yayınları.

Karayılan, Murat. 2011. Bir Savaşın Anatomisi: Kürdistan'da Askeri Çizgi. Mezopotamya Yayınları.

Kavak, Şeref. 2012. Kürt Siyasetinin 2000'li Yılları: 'Türkiyelileşme' ve Demokratik Toplum Partisi. Di nava Türkiye Siyasetinde Kürtler Direniş, Hak Arayışı, Katılım de. Berhevker: Büşra Ersanlı, Günay Göksu Özdoğan, Nesrin Uçarlar. İletişim.

Kearns, Gerry. 2006. Bare life, political violence and the territorial structure of Britain and Ireland. Di nava Violent geographies: fear, terror and political violence de. Eds. Derek Gregory and Allan Pred. Routledge.

Kirby, Coel. 2006. Rwanda's Gacaca Courts: A Preliminary Critique. Journal of African Law 50(2): 94-117.

Kohen, Ari. 2009. The Personal and the Political: Forgiveness and Reconciliation in Restorative Justice. Critical Review of International Social and Political Philosophy 12(3): 399-423.

Kurban, Dilek. 2009. Bir 'Güvenlik' Politikası Olarak Koruculuk Sistemi. Di nava Almanak Türkiye 2006-2008: Güvenlik Sektörü ve Demokratik Gözetim de. Ed. Ali Bayramoğlu û Ahmet İnsel.

Kurt, Gülşah. 2014. Cezasızlık Sorunu: Soruşturma Süreci. Anadolu Kültür Yayınları.

Leontsini, Eleni. 2013. The Motive of Society: Aristotle on Civic Friendship, Justice, and Concord. Res Publica 19: 21-35.

Lundy, Patricia and Mark McGovern. 2008. Whose Justice? Rethinking Transitional Justice from the Bottom Up. Journal of Law and Society 35(2): 265-292.

Mbembe, Achille. 2002. African Modes of Self-Writing. Public Culture 14(1): 239-273.

McConnachie, Kirsten, 2004. Truth Commissions and NGOs: The Essential Relationship The "Frati Guidelines" for NGOs Engaging with Truth Commissions. International Center for Transitional Justice.

Mendeloff, David. 2004. Truth-Seeking, Truth-Telling, and Postconflict Peacebuilding: Curb the Enthusiasm? International Studies Review 6(3): 355-380.

Mihai, Mihaela. 2010. Transitional Justice and the Quest for Democracy: A Contribution to a Political Theory of Democratic Transformations. Ratio Juris 23(2): 183-204.

Millar, Gearoid. 2010. Assessing Local Experiences of Truth-Telling in Sierra Leone: Getting

to ‘Why’ through a Qualitative Case Study Analysis. The International Journal of Transitional Justice 4: 477-496.

Mouffe, Chantal. 1993. The Return of the Political. Verso.

Mouffe, Chantal. 2005. On the Political. Routledge.

Nichanian, Marc. 2011. Edebiyat ve Felaket. Çev. Ayşegül Sönmezay. İletişim Yayınları.

Nichanian, Marc. 2014. Önsöz Yerine. Zabel Yesayan ve Yurttaşlık İlkesi. Di nava Yıkıntılar Arasında de. Zabel Yesayan. Çev. Kayuş Çalıkman Gavrilof. Aras Yayıncılık.

Nwogu, Nneoma V. 2010. When and Why It Started: Deconstructing Victim-Centered Truth Commissions in the Context of Ethnicity-Based Conflict. The International Journal of Transitional Justice 4(2): 275-289.

Osiel, Mark J. 2001. Mass Atrocity, Ordinary Evil, and Hannah Arendt: Criminal Consciousness in Argentina’s Dirty War. Yale University Press.

Özar, Şemsa, Nesrin Uçarlar û Osman Aytar. 2013. Geçmişten Günümüze Türkiye’de Paramiliter Bir Yapılanma: Köy Koruculuğu Sistemi. Weşanên Enstîtuya Diyarbekirê ya Lêkolînên Siyasî û Civakî.

Özoğlu, Hakan. 2005. Osmanlı Devleti ve Kürt Milliyetçiliği. Çev. Nilay Özok Gündoğan û Azat Zana Gündoğan. Kitap Yayınevi.

Özsoy, Hişyar. 2013. Araf’ta Kalmak: Tarih Mezarda Başlar. http://www.Kurdistan-post.eu/tr/toplum/arafta-kalmaktarih-mezarda-baslar-profdrhisyar-ozsoy [10 Mayıs 2014].

Özsoy, Hişyar. 2014. Şeyh Said’in Kayıp Mezarı: Kürtlerin Egemenlik Mücadelesinde Hafıza-Mekân Diyalektiği. Toplum ve Kuram 9: 307-338.

Pali, Brunilda. 2013. Theoretical analysis report on alternative epistemologies. Alternative Project: Developing alternative understandings of security and justice through restorative justice approaches in intercultural settings within democratic societies, KU Leuven.

Park, Augustine S.J. 2010. Community-based restorative transitional justice in Sierra Leone. Contemporary Justice Review 13(1): 95-119.

Patterson-Markowitz, Rebecca, Elizabeth Oglesby, Sallie Martson. 2012. ‘Subjects of Change’: Feminist Geopolitics and Gendered Truth-Telling in Guatemala. Journal of International Women’s Studies 13(4): 82-99.

Pavlich, George. 2002a. Deconstructing restoration: the promise of restorative justice. Di nava Restorative Justice Theoretical foundations de. Ed. Elmar G.M. Weitekamp and Hans-Jürgen Kerner. Willan Publishing.

Pavlich, George. 2002b. Towards An Ethics of Restorative Justice. Di nava Restorative Justice and the Law de. Ed. Lode Walgrave. Willan Publishing.

Pavlich, George. 2005. Governing Paradoxes of Restorative Justice. GlassHouse Press.

Quattrone, Paolo. 2006. The Possibility of the Testimony: A Case for Case Study Research. Organization 13(1): 143-157.

Ricoeur, Paul. 2004. Memory, history, forgetting. The University of Chicago Press.

Robins, Simon. 2011. Towards Victim-Centred Transitional Justice: Understanding the Needs of Families of the Disappeared in Postconflict Nepal. The International Journal of Transitional Justice 5(1): 75-98.

Rosoux, Valérie. 2004. Human rights and the 'work of memory' in international relations. Journal of Human Rights 3(2): 159-170.

Rosoux, Valérie. 2009. Reconciliation as a Peace-Building Process: Scope and limits. Di nava The SAGE Handbook of Conflict Resolution de. Ed. Jacob Bercovitch, Victor Kremenyuk and I William Zartman. Sage.

Salkever, Stephen. 2008. Taking Friendship Seriously: Aristotle on the Place(s) of Philia in Human Life. Di nava Friendship and Politics Essays in Political Thought de. Ed. John von Heyking and Richard Avramenko. University of Notre Dame Press.

Sancar, Mithat. 2010. Geçmişle Hesaplaşma Unutma Kültüründen Hatırlama Kültürüne. İletişim Yayınları.

Sancar, Serpil. 2001. Türkler/Kürtler, Anneler ve Siyaset: Savaşta Çocuklarını Kaybetmiş Türk ve Kürt Anneler Üzerine Bir Yorum. Toplum ve Bilim 90: 22-41.

Sartre, Jean Paul. 2007. 1961 Tarihli Baskıya Önsöz. Di nava Yeryüzünün Lanetlileri de. Frantz Fanon. Çev. Şen Süer. Versus.

Saunders, Rebecca. 2011. Questionable Associations: The Role of Forgiveness in Transitional Justice. The International Journal of Transitional Justice 5(1): 119-141.

Scheler, Max. 2004. Hınç. Kanat Kitap.

Schmitt, Carl. 2005. Political theology: four chapters on the concept of sovereignty. University of Chicago Press.

Sokoloff, William W. 2005. Between Justice and Legality: Derrida on Decision. Political Research Quarterly 58(2): 341-352.

Söyler, Mehtap. 2013. Informal institutions, forms of state and democracy: the Turkish deep state. Democratization 20(2): 310-334.

Stan, Lavinia. 2009. Truth commissions in post-communism: The overlooked solution? The Open Political Science Journal 2: 1-13.

Strawson, Peter F. 1974. Freedom and Resentment and Other Essays. Methuen.

Şahin Fırat, Bahar. 2006. Türkiye'nin Avrupa Birliği Uyum Süreci Bağlamında Kürt Sorunu: Açılımlar ve Sınırlar. Di nava Türkiye'de Çoğunluk ve Azınlık Politikaları de. Berhevker: Ayhan Kaya û Turgut Tarhanlı. TESEV Yayınları.

Şahin Fırat, Bahar. 2014. Türkiye'de 'Doksanlar': Devlet Şiddetinin Özgünlüğü ve Sürekliliği Üzerine Bir Deneme. Türkiye'de Siyasal Şiddetin Boyutları. Berhevker: Güney Çeğin û İbrahim Şirin. İletişim Yayınları.

Şentürk, Burcu. 2012. İki Tarafta Evlat Acısı. İletişim Yayınları.

Taş, C. 2007. Külden Evler. Tij Yayıncılık.

Teitel, Ruti G. 2004. Transitional Justice Genealogy. Harvard Human Rights Journal 16: 70-71.

Tüysüz, Nur. 2014. Geçici Köy Koruculuğu Sisteminin Toplumda Yarattığı Dönüşüm ve Korucu Olmanın Kişisel Gerekçelendirmeleri. Toplum ve Kuram 9: 177-201.

Ünlü, Barış. 2014. Kürdistan/Türkiye ve Cezayir/Fransa: Sömürge Yöntemleri, Şiddet ve Entelektüeller. Türkiye'de Siyasal Şiddetin Boyutları. Berhevker: Güney Çeğin û İbrahim Şirin. İletişim Yayınları.

Üstündağ, Nazan. 2013. Gever'den Wan'a. Özgür Gündem (13 Aralık).

Üstündağ, Nazan. 2014. Sosyal Bilimler ve Kadınların Bilme Biçimleri. Yeni Özgür Politika (19 Şubat).

Vali, Abbas, ed. 2005. Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri. Avesta.

Walgrave, Lode, ed. 2002. Restorative Justice and the Law. Willan Publishing.

Walker, Margaret Urban. 2010. Truth Telling As Reparations. Metaphilosophy 41(4): 525-545.

Ward, Ann. 2011. Friendship and politics in Aristotle's Nicomachean Ethics. European Journal of Political Theory 10(4): 443-462.

Weisband, Edward. 2009. On the Aporetic Borderlines of Forgiveness: Bereavement as a Political Form. Alternatives 34: 359-381.

Weitekamp, Elmar G. M. and Hans-Jürgen Kerner, eds. 2002. Restorative Justice Theoretical foundations. Willan Publishing.

Yağız, Özlem, Amca, D. Yıldız, Uçak Erdoğan, Emine û Necla Saydam, Malan Barkirin Zorunlu Göç Anlatıları. Timaş Yayınları.

Yeğen, Mesut. 2006. Devlet Söyleminde Kürt Sorunu. İletişim Yayınları.

Yesayan, Zabel. 2014. Yıkıntılar Arasında. Çev. Kayuş Çalıkman Gavrilof. Aras Yayıncılık.

Zehr, Howard. 1990. Changing lenses: A new focus for crime and justice. Herald Press.

Zehr, Howard and Barbara Toews, eds. 2004. Critical Issues in Restorative Justice. Willan Publishing.

Zolkos, Magdalena. 2007. Jean Améry's Concept of Resentment at the Crossroads of Ethics and Politics. The European Legacy 12(1): 23-38.

Em hewl didin yekê ji wan xebatên “rûbirûbûna bi rabihuriyê re” bikin ku pê armanca me ew e ku em guh bidin hest, fikr û daxwazên wan kesên ku dûçarî “gunehên li dijî mirovahiyê”, şîdeta dewletan bûne, van hest, fikr û daxwazan ragihînin dewletên berpirsiyar û kesên din ên ku dema ev sûc dihatin kirin, bêdeng bûn.

Em gotinên hinan ji mexdûrên şîdeta dewletê ya salên 90'î dikin yek bi wan gotinên felsefî û siyasî yên kesên li deverên din yên cîhanê êşên bi heman rengî hatî serê wan re ku ji bo rewşên dişibin hev yên di biwara dad, qanûn, lêbihurîn, rikdarî, xeyd û dostaniya siyasî de hatine gotin. Em şahidiyê dikin li wê yekê ku mirovên mêhtingehkirî, xizankirî, bêdengkirî, ji cih û warên xwe kirî, xizmên wan “tunekirî” nirx, peyv û siyasetên bi rik li ser xwe digirin, bi têkoşînê hildiberînîn diyarî wan mirovan, jiyanan û zanistan dikin ku ev zilm li wan nebûye, ew nedîtine, nebihîstine da ku “bi rabihuriza xwe re rûbirû” bibin.

Ev şahidî pêk nayê heta ku neyê qebûlkirin ku ev êş wê tucarî nebihurin û wê nikaribin werin îfadekirin. Bi liberçavgirtina wê yekê ku ji bilî mafên welatîbûnê û mafên sereke yên mirovan pêdivî û hêviyên wan ên ferdî û civakî jî hene, ev qebûl jî ferz dike ku em bihizirin li ser çerxên dada selihandinê jî ku wê wan pêvajoyên huqûqî bixebitîne û bide destpêkirin ku hîmê edaleta cezaî pêk tine, hin jê kafî nabînin, hin jê girîng nabînin, pirranî jî hîna negihiştiyê. Heke em weha qebûl bikin ku pêvajoyên dadê yên cezaî wê rojekê bêqisûr bixebitin jî, mumkinkirina bi şexsê xwe tevlîbûna pêvajoya selihandina hesta dadê jî ji bo wan şahidên nabe mirov wan li ser kursiyê gunehbaran rûnîne, lê belê bare berpirsiyariya bêdengmana li dijî bêdadiyan li ser milên wan e, wê timî pêwîst be ji bo avakirina dostaniya siyasî û nûkirina qewlê biratiyê.

Ha ji ber van sedeman di dema hevpeyvînên di çarçoveya vê xebatê de me hewl da fikr û hale wan ê daxwaznekirinê bibihîsin li ser mijarên gerîna li dadê ya mexdûran ku hêviyên wan ên ji dewletê jî dide der, daxwazên wan ên di biwara dadgehkirin û cezakirina fail û berpirsiyaran de; li ser îtîrazên wan ên li dijî bêcezamanê, kêmkirina ceza û dana tezmînata madî; li serderxistinaholê ya heqîqetan û qebûlkirina wan, û xwetsina lêbihurînê ji aliyê dewletê ve. Me hewl da serwext bibin li îhtîmala wan a rûbirûbûna bi fail û berpirsiyaran re, îhtîmala li wan bihurînê, ya qewlekê nû yê biratiyê/dostaniyeke siyasî bi tirkan re, heviyên wan ên di vê biwarê de û her weha serwext bibin li têkoşîna wan a ji bo rûmetê. Em niha jî hewl didin van ragihînin we.

“Rûbirûbûna bi rabihuriyê re” ne ji bo kurdan û ne jî ji bo tirkan ferzek e; belkî şensek be ji bo îhtîmala bi hev re jiyanê, şensekî din.

DiSA

DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ

ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL AND SOCIAL RESEARCH

ISBN 978-605-5458-24-9
9 786055 458249